# DURYAN
# 2

## Ji Nehdaran Heta Mexmûr

**Hewar Gabar**

***Ez vê pirtûkê di şexsê Şehît Merwan (Ahmet Özdemir) de diyarî tevayê şehîdên azadiya Kurdistanê û bi teybet Şehîdên koçberên wargeha Şehît Rustem Cûdî (Mexmûr) dikim.***

***Zeman, mesken û navên kesên bi vê pirtûkê re derbaz dibin hemî rastîne.***

***Vê gotinê baş jiber bikin; wekî mirovê azad li cîhanê ne nêrin, wekî mirovê têhnê azadiyê li cîhanê binêrin.***

***Rêber Apo.***

Rêza jinan wekî ristika mircanan bişiverêya bi nîvê zeviya mayînan re vekirîn, ji avzêma jor av dikişandin. Çep û rastê rêka nû vekirîn mayînbûn û guhên mayînên wekû 'pênç şîşik' dihatin binavkirin li ser erdê diketin. Ji ber wê, jinan pir bibalkêşî pêl dewsên hev dikirin û vê jî dîmenê rêzek tekûz derdixist holê. Gavek herî piçûk ya şaş, dikarî bibe sedemê firandina lingê yêkî ji wan.

Evdê Dêrşewî û hevjîna xwe Zeynep, li ser awayê vedana cihê naylona xwe li hev ne dikirin û gotinên ne xweş bi ber hev re tavêtin. Doktor Medya Alemanî, hê jî li ber serê termê jina yêxtiyar rûniştîbû û kirasê wêyê Bohtanî ji heriyê reng guhertibû. Nahîda Porspî ya ji devê yêkemîn û cara destpêkê bûyî şahidê gefa qirkirinê, li raser Medya rawestabû û bê deng li eşqa jiyana wê komika mirovan dinêrî. Cûma yê rêvebir, li derê çadira Şemsedînê Kalikî jipiya sekinîbû û bi kêran lêhvên wî ji ser hev ne dihatin rakirin. Tenê carna li demjimara xwe dinêrî û dubare awrên wî di valetiyê de noq dibûn. Dema Cûma li demjimara xwe dinêrî, bê hemd çavên herkesê li wêdê dizivirîn ser demjimara wan. Yên demjimara wan tune bi mereqek mezin li demjimara yên li teniştа xwe dinêrîn. Di wê bêhnê, di wê gavê de lênêrîna demjimarê wateyek ji pîvana zeman wêdetir hildigirt. Êdî demjimarê ne dem dihêjmart û wext nîşan dikir; bêhna hatina qirkirina wê komika serîwanvanan nîşan dida. Her carekî mîla demjimarê xwe hiltavêt, mirin gavek din jî nêzîktir dibû.

Hacî Elî yê Xwirsî, Ehmedê Arifê Mijînî, Mele Heyderê Amedî, Hacî yê Teterê Nerexî û bi dehan kesên din li pêşya cihê ciwanan, bikelecanek mezin nû dest bireqsa bablekan kirîn rawestabûn û zîq li rêya diçû Şêxan dinêrîn. Hemiyan bi hev re çixare vedixwar û dûyê biser wan diket ji hewa ve dibû çêlek ewr û di valetiya ezmana de wunda dibû. Ehmedê Arif, çavên xwe kuskusandin û bi pê re birhên wî yên spî û dirêj cirnêkên çavên wî nixumandin û bi awazek dilniya ema têr endîşe ji civata jipiya pirsa; "dengek ji hevalê Riza nehat û muhleta van bê bava dayî jî diqedê" kir.

Hacî Elî, hewlda bersîv bide û bi pê re Mele Heyder beşişî. Beşişandina watedar ya Mele Heyder, gotin di devê Hacî Elî de daleqandî hiştibû û hemî awir zivirîbûn ser Melê. Melayê ev balkêştiya xwe ferqkirî, xwest tama wê derxîne û kêmekî vesekinî. Dorçavên wiyên werimî û her tim dibêjîqey nû ji xew rabûye di nav qermîçokan de wunda bibûn. Gewriya xwe paqij kir, pora xwe ya wekî şebê bidestê xwe bipaşve tehf da û got;

"Pêwîst nake em fikaran bikin. Di vê tengahiyê de mirovek baqil dijminatiya PKK'ê nake."

"Nixwe wî kerê zikmeşkê lêhv reş, ji berxwe ew zirta mezin kir û çû?"

"Nizanim Hevalê Ehmet, ema gotin û kirin ne heman tişte. Herkes dikare her tiştî bibêje, ema pir kêm kes dikarin pir tiştan bikin. Ya din jî em ne komikek mirovin, em PKK'ê ne. Yên destên xwe dirêjî me bikin divê destpêkê qîma xwe bi dijminatiya PKK'ê bînin. Sedam, ne mirovek ewqas nezane. Li aliyê din Ereb jî be, Sedam jî be çandek ya Rojhilat heye. Di çanda Rojhilatiyan de cihê kuştina kesên xwe avêtîn ber stara wan nîne. Em niha di nav xaka dibin desthilatdartiya Sedam de ne û ev tê wê wateyê em mêhvanên wîne. Di çanda Ereban de edetê kuştina mêhvanan na nivîse."

Haciyê Teter, kelaşê xwe yê kêmekî qelew ji hev vekişand, wekî zêde bawer neke beşişî û got;

"Seyda, tiştên te gotîn rast dernekevin jî xweşin. Sebra mirov bi van gotinan tên, mala te ava."

Hacî Eliyê acizê Mele Heyder dora gotinê jê standî axaftina Haciyê Teter birî û dewamkir;

"Seyda wusa dibêje ema, qey ne heman Sedame di Enfalê de sed û heştî hezar Kurd kuştîn, Helebçe kîmya barankirî û tenê ji berkû Kurdbûn bi sed hezaran mirov bê ser û şûn wundakirîn?"

Dema Hacî Elî taxivî bi israr çavên xwe ji Seyda direvandin û li Ehmedê Arif dinêrî û gotinên xwe ji kesê sêyem re birêdikirin.

"Hevalê Hacî, ya ez dibêjim û tu dikar dikî ne heman tişte. Ez behsa çandekî dikim, tu dikara desthilatdartî yê dikî."

"Qey desthilatdarê ew talan, xirabûn û qirkirin pêkanî ne ji wê çandê tîmar dibû Seyda?"

"Niha em ne xwezgîniyên desthilatdartiya Sedamin, em pêgirtiyên wîne. Me bi awayekî xwe avêtiyê bextê wî. Ereb ji vê re dibêjin; "dexîl" Kurd ji heman tiştê re navê "xwegirtî" lê dikin. Di vê çandê de malîvan ne dikare xwegirtiyê xwe bikuje û ne jî bêxe der. Xwedê ji te razî."

"Ji bû gotinên te rast û yên min şaş derkevin em hemî duadarin. Jixwe piştî çend deqeyên din kê ji me rast dibêje, ya derkeve holê."

Beşişandinek ne jidil dêmê Ehmedê Arif yê di nav riha spî de wunda bûyî pêça û got;

“Mala hewe, bixwidê niha hevalê Riza li cem Sedam lingên xwe bi ser hev re avêtine û her tişt çareser kiriye. Rihetbin, mirina di rêya azadiyê de pîroze.”

Haciyê Teterê du hevjîn û ji asayî pir zêdetir zarokên wî heyîn, keserek kûr kişand û lêkir;

“Heke ev jin û zarok ne di nav lepê me de bûna jixwe mineta me ji kesî tinebû. Ya dest û lingê me girêdide zarokin.”

Bi gotina Haciyê Teter re cîbkokek piçûk ya fermandar û payebilindên Êraqê bikartînin di dîqê Şêxan re dabû der! Bêhn sekinîbûn û xwînê xwe ji dêman vekişandibû. Dilên reben ji asayî pir zêdetir diperpitîn û sefta singan dihingavtin. Fermandarê gefa qirkirinê û muhleta du demjimaran dayî û bi ser wextê dayî re deh deqe jî derbazbûyîn biheman tirimpêlê hatibû. Vê carê jî ji bû pêkanîna qirkirinê dihat! Gerkû civatê hemî hêza xwe li bîbûkên çavên xwe barkiribûn jî bi camên lewîtî re ajotvan û yê lirex nedifitirandin.

Reqasvanên şêxanî direqisîn bi hemî hêza xwe lingên xwe li zivta rê didan û dengê lingê wan çeqilên dara pîroz direcifandin. Tirimpêl hat û li ber civata şaqis rawesta. Ebû Nafi’ê deriyê ajotvan nû vekirî, dikenî! Hê lingê xwe yê duyem ji tirimpêlê dernexistî bi zimanê turkî bangkir;

“Ka Hevalê Cûma? Cûma li kûye?” got û ber bikomika zîq lê dinêre ve meşî.

Dema Cûma dît, di şûna fermandarê gefker de Ebû Nafi’i hatiye bêhnek kûr kişand û rêvebertiya wî hat bîrê. Gerkû Cûma pir rihet dengê Ebû Nafi’i dibihîzt ema, xwe nebihîstî dikir û deng ne dikir. Ji komîteya karê jiderve Eliyê Ziravikî, berbi cihê Cûma lê rûniştî ve bezî û bikelecanek bêhnveşirî got;

“Hevalê Cûma, Ebû Nafi’i bang dike we!”

Cûma, giran giran ji cihê xwe rabû û li Elî nêrî. Elî, bi hêsanî xendeya qermîçokên dora çavên wî yên ji şevê din ve kûrtir dixwiyên ferq kiribûn. Xwînê hêdî hêdî êrîş kiribû lêhvên wiyên qepûşik girtîn. Bi tiliya xwe ya nîşanê û beranekê kefşîla êxirên devê xwe paqijkir û bi dengek bê minet û jixwe bawer;

“Jêre bibêje, bila ew were vêdê” got û bi gotina xwe re civata xwe vexwend hundirê çadira li ber derê wêye û bilez çû hundir.

Ebû Nafi’i, bipîjaqên xwe yên dirêj û bigavên sivik da nav heriyê û birêbertiya Eliyê Ziravikî berê xwe da çadira Şemsedînê Kalikî.

Elî yê Ziravikî, paçê derê çadirê rakir û Ebû Nafi’i - bi pênaseya koçberên wargehê, Ebû Minafiq- bi ber Elî re serê xwe

êxist di çadirê de.

Cûma, li dawiya çadirê çarmêrkî rûniştîbû, rûyê wî tirşbû û birik hewldida çavên wî û yên Ebû Minafiq li hev nekevin. Moxaberetê dewleta Êraqê, hewlda li ser lingan merema xwe bibêje û ev daxwaza civatê jî bû lê, piştî çavên wî li xemla çadirê ket şaqis ma û kenî. Malîvanê di hundir de li ber derî jipiya rawestayî, ew vexwend hundir. Moxaberetê bi rastî jî minafiq û guhên wî dilepitîn, piştî bêhnek dudil benikê pêlava xwe vekir û derbazî hundir bû. Civatê ligor pêwîstiyên siyaneta mêhvanperwertiyê mêhvanê xwe jipiya pêşwazîkir û ji berya mêhvan here destê civatê bibejna xweya dirêj di nivî çadirê de rawesta.

Wêneyek yê Rêber Apo, ligel alek ya ARGK'ê aliyê paş yê çadira kevin xemilandibû. Merşek kevin, biser qetek nalyon re bi binê çadirê re hatibû rayêxistin. Mînderên xweşik li derdor hatibûn danîn û ji bû berpalkan çend balgih jî hatibûn rêzkirin. Ya endamê moxaberetê şaqis hiştî, di wê rewşê de ew xemilbû. Dema çadir û xemla heyî bi çav re derbaz dikir lingên wî yên mezin di heriya binê çadirê de diçûn xar û virçe, virç bi heriyê diket. Wekî her tim dîsa bi dengek bilind û lekimdanvan kenî û got;

"Heke dewleta Turk, rêvebertiya PDK û yên din ne ehmeqbûna dijminatiya we ne dikirin. Kê dikare bi têkoşîna were derkeve serî. Ez dihizirîm, niha nîvê we revîne û nîvê mayî jî di nav wan heriyan de neçar û reben digirîn. Yaho we kengê ev qamp avakir, we çawa ev tişt anîn, hûn çawa di bin vê berfê de, di nav vê heriyê de jiyan dibin? Bixwidê aqlê min têra jêhatina we nake. Hûn di van mercan de ewqas zindî, ter û jêhatîne û berevajî em mirî, hişk û bê kêrin. Raza vê çiye, birastî jî ez mereq dikim?"

Ji xeynî Cûma, hemî cîvatê xwe bi wesf û pesnên Ebû Minafiq piş kiribûn û dibin lêhvên xwe de dibeşişîn. Lê dêmê rêvebir tirşbû û awrên tûj ji mêhvan vedidan. Di rastiyê de Ebû Minafiq, hê li devê derî hêlwesta Cûma fêhm kiribû û jixwe ev pesnên bê pîvan ji bû nerm kirina wî dimezaxtin. Dema zelamê Turkomen hêviya xwe ji Cûma birî wekî tiştek jibîrkiribe û nû hatibe bîrê got;

"Haaa.. Jixwe min jibîrkir; Seyîd Reîs mayîna we ya li vêdê pejirandiye û heya çaresertiyek were peydakirin hûnê li vêdê bimînin!"

Vê mizgîniyê, di serî de Cûma û bêhnek kûr bi hemî civatê dabû kişandin. Rû êdî jidil dikenîn û heriya Nehdaran vegerabû Baxê Îremê. Lê wekî qet natirsin û li ser raman jî nabin, bi "him- himme" kî mesele derbaz kiribûn. Ebû Minafiq, li nav çavên Cûma nêrî û bi awayek heyfstan gotinên xwe ajotin;

"Hevalê Cûma, tu awiran ji min vedidî û eniya xwe li min

di qermiçînî. Ema sedemê vê êşa we ne ez û ne jî dewleta mine; sedemê wê Celal Telebanî ye. Dema Riza hat, yê her tiştî ji we re bibêje" û bêkû here destê civatê zivirî û ji çadirê derket. Dema zelamê Turkomen benikên pêlava xwe girê dida, cara yêke Cûma bipêre axivî.

"Em ferz bikin kû her tiştê tu dibêjî raste. Başe, tu wî kesê ji berya du demjimaran hatî û em biqirkirinê tehdît kirîn datînî kûdê? Qey di çanda Ereban de qewitandin û qirkirina xwegirtiyên xwe heye?"

Ebû Minafiq, li xwe zivirî û bi hêlwestek desthilatdartî çavkir civatê û bersiv da;

"Guhdarî wî nekin. Ew exmeqe û haya wî ji tiştekî nîne. Dilxwede sînorê dewleta xwe diparêze. Emê guhê wî bikişînin" û çû.

Eliyê Ziravikî yê li devê derî ji kundka rûniştî, bi vê gotinê re xwe avêt û çû ser rê. Wekî qazidê buhiştê, mizgîniya xêrê ji her kesî re radigihand. Di bêhnekî de gotin li ser û binê wargeha Zorava belav bibû.

Bi mizgîniya Ebû Minafiq re her tişt hatibû guhertin. Êdî nalyon vegerabûn qesran, herî û berfa di nav hev de hatî stirhan vegarabû gul û hendekokan. Êdî laşan sir û serma hîs dikirin û birçîbûyîn rabibû pêdarê. Jana binê lingên reqasvanan xwe dipesart, birçîbûyîn û westandina wan serî hildabû. Êdî her kesî bi hêsanî dengê çûkên li ser çeqilên Nehdaran ji hev vediqetandin û dikarîn dengê beytik, sîno, belekankan ji yên şalûl û bilbilan cuda bikin.

Piştî endamê moxabereta dewleta Seyîd Reîs ji Nehdaran veqetayî kêmekî, leşkeran çeperên xwe yên di nav koçberan de mayîn vale kiribûn û dorpêça dora koçberan jî rakiribûn. Ema qedexeya derketinê hê jî dewam dikir.

### Wargeha Nehdaran

Wargeha Nehdaran; bi qasî sê kêlûmitreyan li Başûrê wargeha Nînûva û hemabêje ewqasî jî li Bakurê Bajarê Şêxan (Eynsifnê), li ser rêya ji Duhokê diçû Şêxan cêh digirt. Li Başûr Şêxan, li Bakur Laleşa pîroz, li Rojava Baedrê û li Rojhilat jî gundên quntara çiyayê Xêra hebûn. Wargeh, di nîvê deriyê wekû parelêla sihûşeş dihat binavkirin û hêzên hevpeymanan wekû sînorê dewleta Êraqê kifşkirîn de bicêh bibû. Dolikek piçûk ji Rojava berbi Rojhilat ve di binê darê re derbaz dibû û li rexê bakurê darê menfesek hebû û rêya qîr bi ser menfesê re derbaz dibû. Aliyê Rojavayê dolikê ji xilaseka rê fireh dibû û tevayê firehtiyê bi mayînan hatibû rayêxistin. Mayînên di salên heştiyê de, di dema şerê Êraqê û pêşmergeyan de hatîn vedan, yan daketibûn kûrahiya erdê û wunda bibûn, yan jî bi

hêza ba û baranê ax ji ser wan şemitîbû û bi hemî sikatiya xwe li holê mabûn. Yên xeter û tirsnak ne yên li ser erdêbûn, yên di bin erdê de ji çavan wunda biyîbûn. Avzêma di nîvê firehtiya dolikê de derbûyî jêdera fer ya ava koçberanbû. Heta şiverêya ji bû avzêmê hatî vekirin; bi dehan lawir, jinek ciwan û zelamek navser lingê xwe gorî kiribûn. Heke ew mayînên mirinek sik li wan hatî barkirin û di kemînek bêbext de razayîn tinebûna, cihê wargehê yê ji girik û dolikên piçûk pêk dihat, perçeyek axa şîrîn ya Kurdistanê bû.

Cihê koçber lê sekinîn, navenda tuxaya leşkeriya parastina sînor ya Êraqê bû. Çeperên dişiphan kuxikên sa û cihê nobedarên parastvanên sînorbûn, li çep û rastê Nehdaran hatibûn rêzkirin. Navenda tuxaya leşkerî li ser girê di navbera Şêxan û Nehdaran de hatibû avakirin. Piştî endamê moxaberetê fermana erênî ya Seyîd Reîs anîbû, leşkerên li derdora Nehdaran çeperên xwe vale kiribûn û sê aliyên Nehdarê ji koçberan re berdabûn. Li pesarê tuxayê yê diket aliyê Nehdaran, çam hatibûn çandin û ji bilî dara Nehdaran li wê herêmê dar û deviyên bejna mirovekî derbaz dikirin tenê ew çambûn. Ji qam û mezintiya çaman kifş dibû kû temenê wan du, sê sal derbaz ne dikirin. Bejna yên herî bilind ne biser sê gazan (yêk gaz 75 cm ye) re bûn.

Di navbera aliyê Başûr ya wargeha Nînûva û rexê Bakur yê Nehdaran ne ji du kêlûmitreyan zêdetirbû. Tenê ji sêya yêkê koçberan, karibûn deriyê wekû dergahê sînorê dewleta Êraqê hatî kifşkirin derbaz bikin. Qismê din di qada tampon de mabû. Koçberên li ber her du rexên rê bicêhbûyîn, dibêjîqey di hazirtiya pêşwazîkirinekî de rawestabûn. Mirovên ji şevê din ve têkoşîna derbazbûyîna sînor didan, westayî û bê hal dixwiyan. Herî kêm di wê hindamê de sînor rakiribûn û qada tampon û sînorê hêzên hevpeymanan diyarkirî jî wateya xwe wunda kiribû.

Nîvro nû wexirîbû. Ezmanê hişîn û bê leke li raser rawestabû. Tîrojên tavê yên li pişta nalyonên nû hatî vedan didan, germahiyek mestvan bimalîvanên xwe didan jiyandin. Sira ew demekbû bandora xwe kêmkirî dubare ji Bakur ve destpêkiribû û wekî fîşekan li dêmên Zoravayiyên welatê Şêx diketin. Ava ji bin berfa bihewarî dihela diherikî, di dolika di nav wargeha nû de dibû royek nîvçe. Kort û çalên di nav malan de tijî av bibûn û vegerabûn birmikan. Ciwan û zarokên bi teybet ji bû qazyaxê û pêwîstiyên din ji dizî leşkerên Sedam ve berê xwe didan Şêxan, rêyek nû bi dolika binê Nehdaran re keşif kiribûn. Rêya nû vekirîn, ji rêya Hervîşim ya geliyê Dîcle bêhtir dixebitî. Her zarokê bîdonek pênç lître bidest diket, xwe tavêt wê dolika teqin û berê xwe dida bajarê Şêxan.

Kelaşê yêxtiyara ji şevê din ve termê wê bûyî dabaşa bazarê ji aliyê komek mirov ve hatibû rakirin û li ber serê tirba

zaroka Mehmûdê Osman spartibûn axa sar. Goristana ji şevê din ve malîvantiya du miriyan kirî, li pesarê Rojhilatê Nehdaran hatibû avakirin. Êdî hemwelatiyên wargeha Nehdaran yên dawî li rêvantiya wan were, yê li wêdê hatibûna veşartin û heya dawiya bê dawî yê li wêdê mabûna. Hemabêje li gor hacetên berdest xebatên avakirina wargehê berbi dawî hatibûn û kevaniyan destbi amadekariyên şîvê jî kiribûn. Govenda mecnûnan bi tevlîbûyînên nû û bihemî kelecana xwe tajot û dengê çîrok û stranên heta hingê di wargehê de qet nehatîn bihîstin di dola jêr de hê jî vedidan.

Karwanek çavnas ya ji sê tirimpêlan pêk dihat bi dîqê qulibandina Şêxan re dabû der. Karwanê "UN" li ser tenişta tirimpêlên wan nivîsandîn û alên hişînok li ser pêşya wan liba dibîn dêmên koçberan qermiçandibûn. Cîbên Başûriyan navê, "Landegros" li wan kirîn li ber serê dawetê rawestan. Piyerê rû werimî, çav kunîkunî û kêmekî zik daketî, bitevgerên giran ji tirimpêla xwe hat xarê. Seîdê Xirabreşkî yê di nav civata jipiya de henekan dike, li Piyer nêrî û bi uslûbê xwe yê xas û peyvan diguvêşe got;

"Heke mirov çaroxek ji rûyê vî nemirovî hebûya ticarî ne diqeta" û li mirovên derdora xwe nêrî û dewamkir;

"Hûn bixwedêkin, ev ji me çi dixwazin? Her ne ji bû qenciya me têne!?"

Melekê Mijînî yê li tenişta Seîd sekinî, di hemdê xwe de bersiva; "ew mîsogere" da.

Seîdê erê kirina civatê jî girtî, dengê xwe bilindtir kir;

"Wê demê li dûv me li çi digerêne? Ev çi duqoniye?"

Kenanê Kobanî yê ji kevin ve mayîna turkan lingek wî qutkirî, ji şevê din ve ne rûniştî û ji her rewşa wî kifşe bizorê jipiya disekine, dûvikê kopalê xwe li nav pêloxên agir da û bersiva Seîd da;

"Hevalê Seîd, em Rojhilatî bihêstên xwe û Rojavayî jî bi aqilê xwe tevdigerêne. Armanca wan, di mercên herî giran û hîvî lewazbûyî de xwe bêxin hîvî. Heke têkiliyên xwe yêkcar ji me qut bikin û herin, em jî yê hîviya xwe ji wan qut bikin û ji xwe re hîviyek cewher ava bikin. Ev jî berevajî aqlê wan yê desthilatdare. Jibû bikaribin me perçe-perçe ji hev qut bikin û teslîm bigrin, pêwîste hertim nêzîkê me bisekinin. Evan bi vî aqlî hemî mirovtiya cîhanê di nav penc û kulabên xwe de fetisandiye."

Beşişandinek jiqestîka dêmê Piyer nixwimandibû û bi rêya wergerê xweyê hêst sentetîk doza hevdîtinê dikir.

Cûma yê Rêvebir, Nahîda porspî, Medya Alemanî û çend kesên din di navbera Darê û gêra govendê de li ber agirek nîv vemirî jipiya sekinîbûn. Cûma xwest, rêvebirê DY were cem wan. Ema, diyare Piyer ji êrîş û tifkirina pîrekên ya wê sibhê dersa xwe baş girtibû û newêrî derbazî nav koçberan bibe. Piyer, lingê xwe qerastin

erdê û ji cihê xwe ne lepitî. Koçberên bi balkêşî li mezinê wê saziya qerase dinêrîn, di bin lêhvên xwe de birebentiya wî dikenîn. Li ser şepirzetiya Piyer, Cûma û çend endamên komîteya karê jiderve hatin û silavek sar lê veweşandin. Rêvebirê saziya fêris UNHCR, li hember koçberên bê minet di serhev de qumişîbû. Dibêjîqey yê ji şevêdin ve bi erz û eyalê xwe ve di bin berfê de, di nav heriyê de, li ser lingan ne koçber, Piyer bixwebû. Dewlet, sazî û sermaye çiqas mezin, bihêz û kutekbin, bêhn tê li hember berxwedananê di erdê de diçin xar û dihetikin. Aha ev bêhn, ew bêhnbû. Rewşa reben ya Piyerê DY, eyneya pergala mijûkdar ya wê gavêbû. Bi awayek şermokî û hetikî dest bi axaftinê kiribû Piyer.

"Bibûrînin, me jî ne dixwest wusa be. Ema, dixwazim eşkere û jidil vê bibêjim; hêzên dixwazin we qet bikin û teslîm bigrin ji xwelîseran wêdetir ne tiştekin. Vê jî bizanibin, hûn li kûdêbin, em amadene biqasî ji destê me tê bê şert û qewl bi we re arîkariya mirovî bikin" û bi hevalên xwe ve li tirimpêlên xwe siwarbûn û bi paş xwe ve vegeran.

**Nehdaran**

Nehdara yên dikara wan tên kirin, li derê dergahê wekû sînorê dewleta Êraqê hatî kifşkirin li Rojhilatê rêya qîr li ser bilindahiyekî cêh digirt. Darek berûbû û dara dabaşa gotinê ji qurmê xwe yê nêzîkê erdê dibû du ta. Ji wan her du tayên biqasî nîv mitreyî bi ser erdê re ji hev vediqetan, qurmê tayekî pênç çeqil û qurmê din jî bibû çar çeqil. Her çeqilêk yê dikara wan tê kirin, ji darberûyek asayî pir mezintirbû. Ji tayê pênç çeqil ji qurm ve, du çeqil hatibûn birîn û sê çeqil mabûn. Li gor gotinan; du birayê hev yên Şêxanî her du ta birîbûn û her du kes jî ji aliyê Sedam Huseyn ve hatibûn bidarve kirin. Di rewşa heyî de dara wekû Nehdaran dihat binavkirin, heft tabû. Ji tayên wê bigre heta bi cihê wê, ji derdora wê bigre heta bejna wê dibêjîqey, dara Nehdaran pir bizanebûn û bidisiplîn hatibû çandin, parastin û mezinkirin. Herêma mijara gotinê, ne deştek bê dar û rûtbû. Li her derî bihezaran darberû hebûn û kûjan ji wan hatibûya parastin, di nav çend salan de dikarî biqasî Nehdaran qam bavêta. Ema ji quntara çiyayê Gabar yê li Rojavayê Baedrê bigre heta bi quntara çiyayê Xêra, ji binya çiyayê Şêxan bigre heta bi bajarê Şêxan tenê ew dar hatibû parastin û mezinkirin. Ji rewşa heyî vekirî diyar dibû kû pîroztiyek mezin li wê darê hatibû barkirin û ji bû di qada xwe de bal bikişîne darên derdor hemî bi rêkûpêk dihatin birîn. Li gor dihat gotin; ne tenê ew der wekû 'Nehdaran dihat binavkirin; qada li jor hatî diyar kirin hemî wekû Nehdaran dihat pênasekirin.

Me got; dara pîroz ji qurmê xwe bibû du ta û tayê li aliyê Şêxan bibû pênc çeqil û yê li aliyê Laleş çar tabû. Di rastiyê de, ev dar ji Neh daran tenê darek dihat pejirandin. Di baweriya Ezdatiyê de, navê tayê li milê Şêxan "dara Sing"e û ya din jî "dara Birahîmê Ling"e. Wateya dara sing evbû; kesên ne gihatîn murada xwe, bidaxwaza bigihêne muradê dihatin, singek li dora qurmê darê dikutan û bi wî awayî murada wan hasil dibû. Hê jî li derdora qurmê dara Sing, bidehan singên daçikandî radiwestan û ji her halê wan kifşbû ne pir kevn jî bûn.

Ji Nehdaran, dara Sing û ya Birahîmê Ling li di nav wargeha koçberên Zoravayî de mabûn. Dara Zengilan û ya Qelenderan li Meydana Melekan ya li cem tirba Şêx Adî bûn. Dara Xwê li cem Kehniya Spî û dara Nezeran jî li pişta quba heman kehniyêbû. Dara Bereketê li serê çiyayê Erefat û dara Hesenê Geyar li geliyê Miriyanbû. Dara Berûyê, li pişta baxçeyê zeytûnan yê Laleş û dara Leylê jî li sûka Marîfetê cêh digirt. Ya balkêş, toxmê her neh daran jî berûbû.

## Şevek ya Nehdaran

Ji nîvê şevê re kêmek mabû. Çêlên ewrên ji Bakur ve dihatin bi dehfdana bayêkur bilez berbi Başûr ve diherikîn. Bayê dijwar û dibêjîqey ji nav keviyên berfa Zaxrosan derdiket li pişta nalyon û çadirên jihevketî dida û dengek lekimdanvan derdixist. Dengê nalyon û leşkerên Sedam yên di çeperên jor de, tevlîhev dibûn û li navguhê çeqilên dara Sing diket. Govendvanên nû govend berdayîn li cihê xewa xwe heyîrî mabûn û li ser rê dest bisohbetê kiribûn. Ji zigurdên Gabar Feqe û Weysî, ji nav reqasvanan veqetan û berê xwe dan çadira Egîdê Gabarî.

Sibha wê roja bi wezbet Feqe û Egîd, wêrek tevgerabûn û çadira niha qestê wê dikin ji warê mayî revandibûn. Her du zigurdên ji reqsê kêrsto biyîn, xwe di tenişta menfesa li Başûrê Nehdaran de berdan û li rastika derê çadirê rawestan. Dibêjîqey bayê dijwar di wê çalikê de bibû gêr û zîqe zîq bi singên çadirê êxistibûn. Singên di nav heriyê de bilez hatîn kutan leq bibûn û haxta bahoza dijwar çadirê rake û bavêje. Dema çavên Feqe li pêlavên derê çadirê ketin veciniqî. Bidehan pêlavên di nav heriyê de şekil û şemal guhertîn berebat dixwiyên, zêw û mewlûdên Gweyîna anîbûn bûra wî.

Di ketina hundir de kêmek dudilî derbaz kiribe jî cihek din û tiştek cuda nehat bîrê û paçê derê çadirê bi dilek kul û pazdehên bîrandar rakir. Zîlana Mêrdînî, Gulşaha Rojavayî, Zelala Amadî jî di navde heft hevalê jin li quncikê çepê yê jor rûniştibûn. Azad (Gelhat) ê Çêlikî yê birîna wî ya kevin edab girtî û ji bû doktor rêya wî li

nav mihaciran ketî, bi awayek hişk stûna paş ya çadirê girtibû û her kû pêlên bayê dijwartir dibîn bejna wiya kurt û lewaz jî dihejand. Refek hevalên xort yên bi Azad re hatîn, li quncika rastê xwe di ser hev de qumişandibûn û lîqe lîqa wan bû, bi halê Azad dikenîn. Heznêya malîvan ya zikê wê li ber deva, di nav her sê zarokên xwe de rûniştibû. Endamên hêza xweparastinê û zigordên bê mal Tahir, Gabar û du kesên din jî li quncika rastê ya devê çadirê jipiya sekinîbûn. Çixareyek stûr di deva de Egîd, bi stûna devê çadirê re girtibû û di berxwe de dijûnên kuç bi wan dihatin xar rêz dikirin.

Feqe got: "şev baş" û ji bû pêl kesî neke qevzên xwe fireh avêtin û li nîvê çadirê rawesta. Tevayê civatê bi rûkenî bersîva nû hatiyan dan û wekî rê ji wan re vekin xwe livand û keremkirin cem xwe. Yên nû hatîn hê ne rûniştibûn, pêlek bagera dijwar li çadirê da û bi refleksek xwezayî Feqe, bi stûna di destê Azad de û Weysî jî arî Egîd kir. Bagera bi dijwartiyek ne asayî diherike, singên çadirê yên Bakur rakirin, şelît qetandin, ew aliyê çadirê rakir û ket dibin çadirê de. Fanosa bi rex stûna paş ya çadirê ve hatî daleqandin beyî û li erdê ket. Qazyax rija û agir pêket. Gulşahê, birefleksek ser asayî re betaniya li ber pala xwe avêt ser guriya agirê ji nişkan ve bilind bûyî. Binê herî yê çadirê û betaniya bihêwî destûr nedan agir mezin bibe û vemirî. Bipêre serpeşkên gir yên baranê xwe li paşiya çadirê dan. Ji nişkan ve baran vegera taviyê û wekî lûlika misîn dihat xar. Di bêhnekî de, deziyê zuwa li kesî nehişt. Vedana çadirê ne tiştek zehmetbû ema, şelît ji çadirê qetabûn û di wê reşê de pêvekirina wan zehmetbû.

Tam dema Azad, Egîd û Feqe di bin bapeşka baranê de li asêkirina çadirê dixebitîn Huseynê Keleşê Hilalî, hevjîna wî li dûv û bi pênç, şeş zarokên xwe ve da biderê derî ve!

Huseynê navser, bejin navîn, qor û deziya zuwa li wî û malbata wî nemayî, bidengek pir asayî got;

"Şev baş. Çima hûn di reşê de ne?"

Egît şelîta çadirê berda û ber bi wan ve çû;

"Şev baş Hevalê Huseyn. Ka ji der ve nemînin, kerem bikin."

Ji bû mêhvanên nû hatîn fihêtî nebin, malîvan serpêhatiya xwe kurt birî û got;

"Bayê fanosa me şkandiye."

Huseyn, li malbata xwe ya di nîvê çadirê de wekî gulotanekî sekinî zivirî û ji keça xwe ya nû gihatî û dilopên avê di serê pozê wê de têne xarê re got;

"Keça min, pane fanosek bi te re hebû. Ka derêxe."

Bi ronahiya fanosa mêhvanan hol dubare ronahî bibû. Di bin şevaqa ronahiya zerhimî de, herkes bi rewşa yê din dikenî û hemî bi serê keçel yê Egît. Egîdê di nav heriyê de ketî, kefî ji sera

beyibû û serikî li nav heriyê ketibû. Ser û guhên wî hemî bi heriyê hatibûn sûtin û kunikên çavên wî jî di nav de, her der tijî herî bibûn.

Bû nirçe nirça Huseynê hêjî jipiyaye û hingî çavên xwe digerîne nizane yê li kû rûnê û bi dengek kîndar got;

"Hewara xwedê, ne ez nizanim ev dunya çi ji me dixwaze?"û destên xwe bi singa çadira di bin pêlên bayê û dilopên baranê de xwe hiltavêje ve hildan û dewam kir;

"Ey xwedayê mezin, ma me kitikên dêr û mizgevtan kuştine, ma me malê sêwiyan xwariye; te ev kilamet anî serê me."

Hevjîna wî ya Bîrhatê du salî yê kurê Egît êxistî di dawa xwe ya şil de û li cihê zarok rûniştî, gotina hevjînê xwe birî û bi awazek erzşkên got;

"Eybe Huseyn. Çi qarqara teye? Şukir ji xwedê re, qey çi ji me kême?"

Huseynê erz şkestî di ber xwe de got;

"Na willeh bavo, tiştek ji me kêm nîne" û dubare herkes kenî.

Hevjîna ji hevjînê xwe hîvî birî li Heznê zivirî û got;

"Hevala Heznê, qusûrê bibexşînin! Ji kul û gazindên van mêran me xwe jibîr vekir. Hûn mêhvanan dihewînin?"

Egîdê ser û guhên xwe ji heriyê paqij dikir, rê neda hevjîna xwe û bersiv da;

"Ew jî çi gotine xwêkê, li ser ser û her du çavan. Fihatiya reş, qey hûnê ji der ve bimînin."

Bapeşka baranê bihemî dijwartiya xwe dibarî. Malbatên nalyon û çadirên xwe di niwalik û dolikan de vedayîn, dibin lehiyê de mabûn û jin û zarok revîbûn ser cihên bilind. Yên karîn nalyona xwe ji lehiyê xilas bikin, naylon di serê zarokên xwe de kiribûn û çaverêyî rawestina baranêbûn. Yên keys dîtîn, zarokên xwe tehf dabûn di bin nalyona cîranekî de û yên mezin di bin baranê de sekinîbûn. Ji nişkan ve dengek bihewar û bibigirî yê jinekî ji tenişta menfesa ber derê deriyê derbendê bilind bibû! Ji qêrîna dihat kifşbû kû jina temendar digot;

"Cemîl, Cemîl... Ez li bextê xwedê me, bavê te naxweyê!"

Cemîlê sohr li pêşyê û koçberên dibin baranê de ji xwe re li mujûlatiyekî digeran li pey qulibibûn cihê deng.

Cemîl;

"Yadê xêre, çi qewimiye?"

Pîreka yêxtiyara dibin baranê de şil û pil bûyî û reşê wê bi zorê dihat fitrandin;

"Kurê min çi xêre! Bavê te ev du demjimare çûyî dibin vê menfesê de û ne zivirî ye. Hingî ez bang dikim jî deng jê nayê!"

Cemalê Amedî yê ji lingê xwe gazî, li Nînûva berpirsê asayîşê

û hê jî wî berjengê xwe diparêze; eletrîka xwe ya piçûk pêxist û berê wê da cihê pîrek nîşan dike.

Bi kaşê jêr ve cihê şemitandina lingê Egîdê Bilehî yê heştî salî hatibû dîtin. Bi dîtina dewsê re, jina temendar dengê giriyê xwe bilindtir kir û got;

"Axx… rebenê eza! Bixwedê mala min xirabû. Stûna xaniyê min xwirimî!"

Ava ji derdor diherikî di niwalê de dihat ser hev û dibû robarek har. Leqe leqa pêlên robarê li çep û rastê kuna menfesê diketin, dengê berq û birûskan didewisandin. Ciwanên jixwe deziyek zuwa li wan nemayîn nemerdî nekirin û xwe avêtin nav pêlên robar. Bi fanos û eletrîkan li yêxtiyarê wundabiyî digeran. Piştî kêmekî kelaşê bê can yê  zelamê bextreş ji nav avê derxistibûn.

Egîdê Bilehî; zilamek sohr, dirêj û temenê wî hemabêje li derdora heştî yê bû. Ji şevê bûrî ve derfetê destava xwe bişikîne peyda ne kiribû û ji bû destavê xwe berdabû devê menfesê. Ji nişkan ve lehî rabibû û hewl dabû bi cihê daketî re hawabikeve. Piştî du, sê mitreyan hawa dikeve lingê wî dişemitin û gindirvarî dibe û dikeve di nav ava devê menfesê de bûyî gol. Xwedê dizane; serê wî li cihekî ketibû û vexwimabû. Piştî av boş dibe û radibe, keleşa wî li ber xwe dibe û li devê jêr yê menfesê avêtibû qeraxê.

Ciwanan termê zilamê yêxtiyar rakirin û li binê Nehdaran danîn. Ava jibin kelaş di herikî tevlî ya baranê dibû û dubare dirija devê menfesê. Riha yêk hefteyî dêmê zelamê mirî nixwimandibû. Ax û gelaşê kunikên pozê wî xetimandîn jî tevlî xwînê bibûn. Ceynika wiya îhtîmalek mezin li kuçekî ketî û tewixî, kêmekî werimîbû. Doxîna bigulîvandik hê jî vekirîbû û ji heriyê rengê gulîvandkan wunda bibûn.

Gotûbêja; "em îşev an jî siba veşerin" ji zû ve destpêkiribû. Hevjîna zelamê xeniqî û ji serma û ji yêxtiyarî dilerize û di axaftinê de êdî zehmetiyê dikişîne; bi hemî karîna xwe hewdide bihêlin sibehî. Kurê wê Cemîlê sohr jî di nav de, piraniya mirovên li wêdê dixwestin heman şevê bispêrin axa sar. Jina temendar hêza xwe ya israrê zû wundakir û êdî ji kaze kazekî zêdetir deng jê ne dihat. Çend keçên ciwan jina bê taqet ketî, bi nav xwe re kirin û birin çadira cîran.

Baran bê navber dibarî. Herder bibû bêrm, gol û robar. Dengê berq û birûskan tevlî bagera baranê dibûn û perika guhan dilerizandin. Ji bilî qismek çadirê cihên wan bilind û xweş, bagerê piraniya nalyonan firandibûn û ji zû ve lehiyê dabû ser cihê wan. Herkes ji dervebû, jipiyabû û dibin baranê de bû. Di wê rewşê de kulana tirbekî ji bû ciwanan ne mujûlatiyek xirapbû. Komek zelam, piraniya wan ciwan tevr û bêrikên xwe rakirin û berê xwe dan cem

tirba jina şevê din veşartîn. Mele Heyderê Amedî û Mele Tewfîq, li ber serê termê zelamê yêxtiyar çok vedabûn û ayeta Yasînê dilorandin.

Dema Ehmedê Bêdeng, kêla ber serê mirî asê dikir, dengê Melayê misilmanan yê ji rika Êzîdiyan ve bi hemî hêza xwe diqêre û bangê ji asayî pir dirêjtir dike ji gundê Mûseka bilind dibû. Êdî barana dimohr jî rawestabû û bayê sar yê piştî baranê dûvikê şaşika Mele Tewfîq liba dikir.

Biwêja ***"yên mirinê dibînin li ber tayê têne"*** li wargeha Nehdaran li ser wateya xwe hatibû rûniştandin. Di rastiyê de ne tenê li Nehdaran; di tevayê jiyana mihacirtiya wê komika serhildanvan de hîviya ji tarîtiyê berbi şefaqê ve jêdera fer ya hêza azatiya van bû. Ji Bohtanê bi hîviya xwe ji gef û qirkirina artêşa Turk rizgar bikin derbazî Başûr bibûn. Ji Bihêrê û Şeraniş; bi hîviya xwe ji qirkirina Turkan dûr bêxin çûyîna geliyê Qiyametê û Etrûş pejirandibûn. Li geliyê Qiyametê, bi hîviya xwe ji serbirên JÎTEM'a Turk û pêşmergeyên PDK rizgar bikin hatibûn Etrûş. Ji Etrûş, bi hîviya xwe ji penc û kulabên Partiya mala Berzanî rizgar bikin, berê xwe dabûn Êraqa Sedam Huseyn. Sedam Huseynê ji aliyê pergala desthilatdaran ve hatî bosekirin, stoyê xwe ji gefên Tansu Çîler re tewandibû û ew serhildanvan ne hewandibûn. Herî dawî, dema artêşa Turkan û Pêşmergeyên PDK'ê fikên qirkirina wan dikirin, dubare berê xwe dabûn axa dibin desthilatdartiya Sedam de. Vê carê jî rû birûyê gefên qirkirina artêşa Êraqa Sedam mabûn. Dibêjin ya, xirabtir heye. Di rewşa herî xirab de, ya xirabtir li pêşber disekinî û bi ya heyî şad dibûn ew koçerên rikdar.

Aha rewşa koçberên li ser axa welatê xwe evbû. Ne cihek sererast ya di tê de bisitrin hebû û ne jî starek destava xwe lê bişikînin. Ne amêrek xwe li ber germ bikin hebû û ne jî cilek di nav de binivin. Ne zadek yê zikê xwe pê têr bikin û ne jî hîviya ji cihekî were. Ne firaxek ya av germkirinê hebû û ne jî ji bilî avzêma di nav zeviya mayînkirî de kaniyek ya avê. Ji bilî Doktor Medya Alemanî kû pir caran di çenteyê wê de dermanek janbir jî peyda ne dibû, ne bijîjkek û ne jî nexweşxane. Li ser devê rêyekî, ya aliyêk yê wê zeviya mayînan û aliyê din zeviya nû coht kirî û herî xwe li navtengê dide mabûn asê. Pêşya wan artêşa Êraqê girtibû û ji paş ve jî Pêşmergeyên mala Berzanî û quntrayên Turkan tajotin. Ema, remandina têkoşîna li dijî xirabtirê, zehmetî li ber wan hêsanî dikirin û gotin di cêh de be, ji mirovên her tiştên wan heyîn şadtir û bexteyartirbûn.

Dema hêstên bê çaretiyê di nav komekî, komanekî de bû desthilatdar, wate ew koman teslîmê mirina herî sik bûye. Li cihê kesekî, an jî komanekî baweriya xwe ya cewher wundakirî, li wêdê dikara hîviyê nayê kirin. Li dera hîvî namîne wirarên têkoşîn û berxwedanê nayên dîtin. PKK'ê, ti caran destûr neda ew komika

berxwedanvan hîviya xwe wunda bike, xwe di nav bê çaretiyekî de hîs bike, hîviya xwe bi hêzek desthilatdar ve girê bide û ji baweriya xwe ya cewher qut bibe. Mirin jî di nav de, raza li hember hemî mercên zehmetiyên jiyanê li berxwedayîna wan rêvanan evbû.

**Bêbextiya YNK'ê**

Roj li cêhê danûpezabû. Bayek nerm ya keziyên sar bi xwe re tanî çeqilên dara pîroz sivik dihejandin. Bi lênêrînek di jor de wargeha Nehdaran, ji qampek ya mihaciran bêhtir dîmenê gomeyên koçerên modern ratêxistin pêş çavan. Pişta nalyonên spî û hişîn yên bi nav axê re dixwiyan diman sergoyê karxaneyek ya nalyonan. Yên çadir bi dest wan ne ketîn –kû sê behrê gel bê çadirbûn- çalek li kendalekî, peserakî kulabûn û nalyona xwe di ser korta mijara gotinê de vedabûn. Bi vî awayî, tenê banê çala hatî kulan binalyonê dihat nixwimandin.

Li pesarê Rojhilatê dolê komek mirov tirba zarokê heftem û gora nehem dikulan. Kite- mitên mirovên ji bû firek qazyax, kêloyek dohn, şekir û pêwîstiyên din beyanî zû berê xwe dayîn gundên Êzîdiyan yên diketin Başûrê Rojavayê wargehê, dizivirin û barê wan bala hemweletiyên din dikişandin. Ji ber kû tiştên bi kutekî û heft belayan dihatin peydakirin, bi buhayek pir giran dikirîn. Hemwelatiyên bê dirav hê jî kurîşk didan zikên xwe. Koçberan, pêwîstiyên xwe ji bajarê Şêxan û gundên derdor dikirîn. Ema wekû fermî derketina ji nav malan hê jî qedexebû û gel ji dizî ve bi dola jêr re, rêya nîv demjimarî dikirin du demjimar û bi wî awayî xwe digihandin nav Şêxan. Di rastiyê de Êzîdiyên derdor ji misilmanên bi şûn ve mayîn pir bi wijdantir û merhemetirbûn. Ema dîsa jî keys û fesal rastiyekbû û keysê ketî di destê wan de baş bikartanîn.

Dewleta Êraqê ya dilxwe de wekû arîkarî ji koçberan re çend kîsik petete û kelaşên goşt anîn, hê jî di ketina qampê de li wê erdêbûn. Komîte û rêvebirên li ser qutê mijara gotinê kom biyîn, kûr kûr difikirîn. Zîna Hevlerî ya di nav komîteyên koçberan de herî kohne çixareya xwe bi kerb li erdê da û got;

"Aha de were û vî barî li vî kerî bike. Mane ji her malbatê re ji çara yêkê peteteyekî û xiramek goşt nakeve." Li endamê komîteya karê jiderve Cemalê Amedî zivirî û bidêmek tirş gotinên xwe ajotin;

"Heval, ji wan re bibêjin; yan bila tiştekî neyînin, yan jî bila tiştek berketî bûnin. Ev rastûrast li ser me şerê teybet dimeşînin."

Cemal, keserek kûr kişand, dibin simbilên xwe de beşişî û qet ne axivî.

Hê Zînê çareseriyek ji belavkirina qutê Seyîd Reîs re peyda nekiribû, Sofî Beşîrê Serhêsin bazda ser girikê binê darê, kumikê

xwe di serê xwe da baş ediland, destê xwe yê çepê êxist di bin guhê xwe de û bang hildêra;

"Heyhê.... Demjimar yêk û nîvê, li pesarê cem goristanê civîn heye. Tevayê gelê wargehê vexwendiye. Heyhê... Demjimar yêk û nîvê piştî nîvro, li kaşê goristanê civîn heye. Divê herkes were" û banga xwe sê caran dubarekir. Banga Sofî, ji her demî bêhtir bala koçberan kişandibû. Hê ji niha ve hemwelatiyan dest bi rexne û gazindên xwe kiribûn. Hê Sofî Beşîr ne gihatbû civata binê darê, dengê Tanzêrê Deştadarayî bi ser civatê ketibû.

"Qîma min ji van Hevalê vêdê re nayê. Partiyê rast temsîl nakin. Min ji hevalê Cûma re gotiye, ezê ji hevalê Riza re jî bibêjim. Heke encam newe girtin, ezê gilhê wan li cem Serok bikim" got û bi awayek kerb li Xelîlê Zînê zivirî û bi devoka koçerî gazindên xwe ajotin;

"Ba Xelîl qey tu raporekî ji min re na nivîsî?"

Xelîl, bi şermokî di berxwe de beşişî û bersiv da;

"Hevalê Mustefa (Tanzêr), emê raporê ji bû çi binivîsin?"

"Li ser ferq û cudatiya di nav qampê de. Hin têrin, hin birçîne" got û destê xwe baskî goşt û peteteyên li ser devê rê ve dirêjkir û dewamkir;

"Qey tu nabûnî, vî goştî çima belav nakin?"

Mehmûdê Kadûnî eniya xwe ya rût qermiçand, gewdeyê xwe yê gir livand. Zelamê gir û bilind çû û li ber Tanzêr sekinî. Tanzêrê bejin navîn û zik mezin li pêşberî Mehmût wekî yêk û sifra Erebî lêhatibû. Kêmek li Tanzêr nêrî û got;

"Tanzêr, xwedê ji te razî; dev ji vî edetî berde. Ka feqîran yê li kê belav bikin? Ma tu nabînî? Ne têra deh malan nake. Kêyê bixwe û kêyê lêbinêre?"

Zilamê birû û niyeta wî ya beskirinê nîne, xwe ji bin gewdeyê gir yê Mehmût kişand, xwe da aliyekî û got;

"Ez te jî nas dikim Mehmûdê Kadûnî. Tu jî komîteyî û niha te jî behra xwe hilaniye."

Zelamê li pêşberî Tanzêr şewilî û bi awayek şaqis li nav çavên wî dinêre bi dengek lave tevlî gef got;

"Tanzêr..! Şerme, eybe behra çi, ferq û cudatiya çi. Bes van gotinên sar bibêje. Ev gotin te bê semax dikin. Heke tu ewqasî ji komîteyan bi gomanî û di hezidî wan keremke tu jî bibe komîte. Qey kesî rêya te girtiye?"

Zelamê pehn û şûtika sist zikê werimî mezintir dixwiyîne, çend gavan bi paş ve çû û wekî tevzê xwe bike got;

"Tew, tew.. Willeh hûn vî goştî hemiyê bidin min ez nabim komîte. Kuro qey ez lixwe digrim bibim komîte."

Sofî Beşîr, serhêsintiya xwe hew zevt kir û tevlî sohbetê bû;

"Başe, heke tu lixwe nagirî bibû komîte, çima evqas dihezidî wan?"

Tanzêr, bi axaftina Sofiyê qam qut, beden lewaz û bê xizim re gurxweşbû û rabû ser lingên paş. Xwe ji gewdeyê sehwdar yê Mehmût dûr êxist û zikê xwe yê mezin qerast bedena lewaz ya Sofî;

"Ez na hezidim wan, ez dibêjim, bila ferq û cudatiyê nekin. Heke ez bibim komîte, ez nahêlim kes ferq û cudatiyê bike."

"Wê demê kerem bike. Heke gel bipejirîne bibe komîte û ew ferq û cudatiya tu dikar dikî ji holê rake."

Tanzêr zikê xwe yê mezin û gewdeyê xwe yê gir ber bi Sofî Beşîr ve şemitand, tiliya xwe ya stûr nêzîkê çavên wî kir û bi dengek gefbarkirî zirtên xwe ajotin;

"Sofî Beşîr, dilê min biteveye û naxwazim erza te bişikînim."

Sofî Beşîr, gewdeyê xwe yê hûr û lewaz ji bin siha zikê Tanzêr kêmekî dûr êxist û got;

"Qey min çi kiriye, tuyê erza min bişikînî?"

"Belê, belê! Te jin û zarokên xwe rêkirine nav turkan, ew di qesran de jiyan dibin û tu hatî vêdê zirtan dikî. Qey ji bangdanê zêdetir çi bi te diqedê?"

Sofî, bi te'ena Tanzêr ya neheq pir aciz bibû. Ema dizanî ew Tanzêre û divê mirov pêre dirêj neke. Lê dîsa jî ne xwest dibin gotinên wî de bimîne;

"Qet nebe bang bi min diqedê, tu kêr çi têyî?"

Dema Tanzêr xwe amade dikir, vê neqlê bi rastî êrîşê Sofî Beşîr bike, Riza û çend kesên din li wan sekinibûn. Tanzêrê çav bi Riza ketî veciniqî û gotina di devê xwe de daqurtand. Piştî Riza çû destê civatê û xweşbaşî li hemiyan da, destê Tanzêr girt û berneda. Kenî û bi şêwazek bihenek got;

"Hevalê Mustefa hê tu şer dikî?"

Tanzêrê di nav lepê zilamê sehwdar de perîşan dixweya û êdî melaqî jî jê ne dihat li civata ji berya kêmekî bi wan re şer dikir nêrî û got;

"Heval, gotinek heye dibêjin; hemî durinde goşt dixwin lê, tenê navê gur derketiye. Ya min jî ew meseleye. Ez dibêjim; bila kes ferq û cudatiyê neke, ev gel gunehe."

Riza yê zaravayê wî yê zikmakî Kirmanckî, Kurmancî nizane û bi herkesî re turkî taxive got;

"Kê ferq û cudatiyê dike?"

"Herkes!"

Riza, bi awayek pir biwate û rexnegir li nav çavên wî nêrî û got;

"Ankû ji xeynî te herkes?"

Gotin di devê Tanzêr de gewilî û nizanî yê çi bibêje. Riza, bi

dengê bilind kenî û dewamkir;

“Qey hûn tevlî civînê nabin? Kerem bikin em herin.”

Hemî li hevketin û berê xwe dan pesarê wekû cihê civînê hatî kifşkirin.

Ji bilî nobedar, kevanî û zarokên di dergûşan de hemabêje tevayê hemwelatiyên wargehê qulibûbûn cihê civînê. Piştî ji Nînûva barkirîn ew civîna gel ya yêkemînbû. Ji berya wargeha Nînûva barbike, ji bû peydakirina çareyekî rêkxistinê Riza Altun rêkiribû û têkiliyên dîplomatîk yên di navbera dewleta Êraqê, YNK’ê û koçberan de wî birêve dibirin. Çi qewimîbe, kê çi kiribe ji herkesî baştir wî dizanî.

Bi deqeyekî rêzgirtina ji şehîdên şoreşê re civînê destpê kirbû. Riza Altun, bi bejna xwe ya zirav û dirêj wekî kêlatek efsûndar sekinîbû. Pora wî ya gustîlok û dapên spî nû tevlîbûyîn qijtir bibû û serê wî ji asayî mezintir dixwiya. Qermîçokên li ser dêmê esmêr yê dibin pora qijbiyî de ji asayî piçûktir dixwiyê, kûrtir bibûn. Xetên li ser dêman dewsên jana di dilê wî de derdixist holê. Westandinek jandar rûyê wî pêçabû û xendeya li ser dêma jî ew êş ne dinixwimand. Çavên xwe li ser girseya dibêjîqey ji erdhejekî rizgarbûye û her yêkî ji bin kavlekî derketiye gerand û destbi axaftinê kir;

“Dîmenê heyî, rewşa li holê cêh ji ti şîrove û nirxandinan re ne hiştiye. Bê goman fik û hesabên me ne evbû ema, mixabin bi soza bêbextan ev dîmen û encam derket holê” got û axînek jidil kişand Riza. Çavên xwe di ser girseya gel de şemitandin ema, dibêjîqey li valetiya dolê dinêrî û gotinên xwe ajotin;

“Ez dizanim, pirsên çimatî û çawatiya rê ji vî encamî re vekirîn di mejiyê we de çaverêyî bersîvêne. Destpêkê em sedemên rê ji vî encamî re vekirîn bi awayek zelal û vekirî vebêjin, bipiştre emê pirsgirêkên xwe yên rojane gotûbêj bikin.”

Riza, bi turkî taxivî û girseya gel bêhtirî ji seda pêncî Turkî nizanî. Ema peyvên xwe ewqas zelal û rihet digotin û bêjeyên xwe ewqas bitosintî dihilbijartin, hemabêje herkes bi hêsanî têdigihişt.

“Dema gotegota valekirina Etrûş destpêkirî wekû rêkxistin, ji bû cihê qampekî me destbi lêgerînêkir. Hûn têkiliyên me, dewlet û hêzên derdor baş dizanin. Me daxwaz ji wan kir, qampa Etrûş bi giştî derbazî herêma Sohran bibe. Destpêkê bi hênceta zextên dewleta Turk, PDK’ê, DY û hêzên tên zanîn Yêkîtiya Niştimanperwerên Kurdistan (YNK)ê daxwaza me ne pejirand. Li ser israra rêkxistinê gotin; “bila qismek piçûk were. Piştî hingê emê binêrin.”

Hûn dizanin, qismek ji gelê me yê eyaleta Etrûş li Başûr belavbû, qismek hat Nînûva û qismek piçûk jî li Etrûş mabû. Li gor soza YNK’ê ji me re dayî, ew qismê mayî Etrûş yê derbazî herêma Soran- Zelê bibûya. Di roja dawî de rêvebertiya YNK’ê li soza dayî

poşmabû û em neçar man qismê mayî jî derbazî Nînûva bikin."

Riza yê bi kutekî, bêhn tengî û cir nexweşiya xwe dihat naskirin, ewqas jidil, hêstî û gotinên xwe bi tosintî hildibijartin kû peyvên wî yên ji rêzê jî mergê guhdarvanan dihingavtin. Dibêjîqey Riza, binavê PKK'ê lêbûrîn dixwest. Ema ew şêwazê melûl li zelamê hêlwest hişk ne dihat û hêstir di qirika guhdarvanan de dikir girêk. Awrên xwe yên kêmekî westayî dixweyan ema, tiştek ji kelecana xwe wunda nekirîn dubare bi ser girseya bi awrên hîvî barkirîn lê dinêrin re şemitandin û axaftina xwe ajot;

"Niyeta rêkxistinê ya demek evqas dirêj we li Nînûva bihêle tinebû û di encama hewldanên me de, di demek kurt de dewleta Êraqê hewandina we pejirand jî. Ema li ser zextên Turkan û hevkarên wan, Sedam Huseyn bi paş ve gav avêt û em hatin heta bibarkirina vê dawiyê.

Ji hinga qamp hatî Nînûva û pêve lêgerînên rêkxistinê yên vî gelî li cihek ewle bicêh bike berdewam hebûn. Hem bi dewleta Êraqê re û hem jî bi rêvebertiya YNK'ê re em di nav têkiliyan de bûn û di her keysî de me daxwaza xwe ya bi cêhkirina qampê tanî ziman. Ema rastiyek heye divê newe paşguh kirin; ev hêzên dabaşa gotinê nikarin li hember gefên Turkan û hevalbendên wan li berxwe bidin û li rexmê wan deriyê xwe ji me re vekin.

Dawî, Serokatiyê jî rêkxistin hişyarkir û me jî ji jêderên az û ewle agahî girt; artêşa Turk bi pêşmergeyên PDK'ê re plan dikin kû êrîşî wargehê bikin. Yên li berxwe bidin yên qetil bikin û yên din jî bi kutekî teslîm bigrin û derbazî Turkiye bikin. Wextê me kêmbû û divê me leza xwe bikira. Dubare rêkxistin bi YNK'ê re ket diyaloqê û ji bû Êraqê jî ez hatim erkdarkirin.

Fik û daxwaza rêkxistinê evbû; me dixwest li herêma Soran, li nêzîkê qadên gêrîla li cihek ewlê we bicêh bikin. Me tenê xwest rê bidin, em wargehê derbazî herêma dabaşa gotinê bikin. Me daxwaza tiştek din ji wan nekir. Her tiştên din rêkxistinê girtibûn ser xwe. Li ser israra me, YNK'ê û dewleta Êraqê pejirandin kû qamp di nav axa dibin desthilatdariya wan re derbaz bibe. Lê, rayedarên Êraqê gotin;

"Cihê qampê ne dibin ewlekariya me deye. Di dema barkirinê de îhtîmala êrîşekî heye û em nikarin vê berpirsiyartiyê rakin. Bila koçber şev, bipeyatî werin Şêxan û hûn jî tirimpêlên xwe bînin wêdê û bila li wêdê siwar bibin û herin."

Ev daxwaza me jî bû û me bi dilxweşî ev pêşniyara wan pejirand.

Li gor agahiyên me girtîn, hêzên dikara wan hatî kirin yan şeva me barkirî yan jî roja piştî wê yê êrîşê wargehê kiribûna. Heke bala we kişandibe ji berya şeva em bar bikin rojekî, DY navenda xwe girt, ala xwe daxist û qamp terk kir. Vê çûyîna wan ya bê sebeb,

fikarên me û agahiyên me girtîn piştrast dikirin.

Şeva em bar bikin rêkxistinê ji Zelê bigre heta bi ser sînorê parelêla sih û şeş, ango di navbera Kerkûk û Çemçemal de, bi sedan heval û welatparêz erkdar kiribûn. Bi dehan firin hatibin kirêkirin û nanê wan ji bû we hatibi hazirkirin. Ji ewlekariya rê bigre heta bi doktoran û embilansan hatibin amadekirin û bi qasî têra we bikin tirimpêl hatibûn hazirkirin.

Tam dema me dest bi barkirinê kirî, Ebû Nafi'i hat û got; "pêwîste hûn bar nekin!"

Me got; "çima, sedem çiye, çi qewimiye?"

Zilam got; "xeberek lezgîn ji Bexda hatiye, YNK li soza xwe vegeraye û gotiye; ez naxwazim di nav axa we re mihacir werin herêma min!"

Ez neçarbûm wê bêhnê, di navbera qirkirnê û barkirinê de biryarekî bidim. Bê goman biryarek hêsanî nebû û cêh ji dudiliyê re jî ne mabû. Min ji hevalan re got; "pêlê bikin û werin" û ji bû artêşa Êraqê, li ser sînor serî li kuştin û qirkirinê nede bilez derbazî Mûsil bûm. Wekî hûn dibûnin qirkirinek pêk nehat ema, destûra derbazbûyînê jî zêde nedan."

Riza, bi navê zarokên spehî yên di dergûşa wan dayîkan de mezin bûyîn hesap dida. Berpirsê fer û yêkemîn yê wî karwanê têr bela ewbû û bi wê zanebûnê peyv û hevokên xwe saz dikirin. Rewşa qewimî û ya heyî ewqas xweşik û wekî libên tizbeyekî lib bilib bi dar ve dikirin, meydan ji pirs û şîroveyên nû re ne dihişt. Ema, karwanê serkarwantiya wî dikir hê jî di nîvê ne kifşbiyînekî de li rêyekî digera û yê çawa rêya xwe bidomanda ne diyarbû. Serkarwanê rêvanên heqîqetê henaseyek kûr kişand û gotinên xwe domandin;

"Piştî xeteriya qirkirinê derbazbû û hûn gihatin Nehdaran; ji bû eslê meslê fêhm bikim û çareyek nû peyda bikim çûm Bexda yê. Li wêdê ji min re eslê meseleyê vegotin: Roja dawî ya em bar bikin, rêvebertiya YNK'ê serî li Komîsertiya bilinda koçberan ya Cenewre dide û dibêje;

"Dewleta Êraqê fik dike kû koçberan bîne û bavêje ser sînorê min. Ez daxwaz dikim; pêşiya vê kirinê were girtin."

Komîsertiya bilind ya koçberên DY jî zextê li rêvebertiya Bexdayê dike û dixwaze Bexda vê biryara xwe betal bike. Ew jî fermanê didin leşkerên xwe yên ser sînor û dixwazin derbazbûyîna me asteng bikin."

Hevalê Riza yê wan koçberan, helwestek jixwe bawer û bê minet ratêxist berçavan. Ema bêbextiya li rastê hatî jî bê hemd jî be rewşa wî ya ruhî bandor kiribû. Riza yê devdijûn, ji kesî re gotinên giran bikar netanîn û heta di nav axaftinên wî re dixwiya kû YNK'ê ji zextên ji derve û ji neçartî biryarek wusa girtiye. Ema di nêrîna

girseya amade de, ti zext û tehdît nikarin bibin sedemê bêbextiyê û bêbextiya her wekû bêbextî hatibûya binavkirin.

Endamê Komîteya Rêvebir ya PKK (Partiya Karkerên Kurdistan)ê Riza Altun bi gotina; “rêxistina xwe xwirt bikin, xwe bi parêzin, di demek herî kurt de emê wargehê ji vêdê rakin û li cihek ewle bicêh bikin” axaftina xwe qedand û mafê afaxtinê da girseya koçberan.

Tanzêr, bi cesareta ji Riza girtî çend gotinên eletewş avêtin holê û kêmekî girse pê kenî. Çend kesên melaqtî jixwe re kirîn huner jî çend zirt û pesin dan û bi çepkek dirêj û mezin dawî li cîvînê anî.

***

Şîn û şahî, evraz û nişûvî, êş û şadî hevtemamker û du aliteya jiyanêne. Yêk ya din watedar dike û bê hev bê watene. Heke qet av şêlo nebûya me yê çawa bedewtiya ava zelal ferq kiribiya. Heke tarîtiya şevê nebiya me yê çawa bîriya tîrojên rojê kiribûya. Heke mirin ne rastiyek hergîzbûya me yê çawa bi çar destan bi evînek bê eman xwe li spehîtahiya jiyanê pêçabûya.

Di xeta herî zirav ya di navbera mayîn û nemanê de, bi awayek herî zelal wateya jiyanê derdikeve holê. Yên ne ketîn ser destan qedrê lingan nizanin. Yên di tarîtiya herî zilomat ya şevê de, di boseya hirç û hovan de nemayîn bîriya tîrojên rojê nakin. Şadîtî, di xala herî lewaz, di devara herî teng de tif kirina rûyê sik yê xiyanetê û parastina hîviya serkeftinêye. Yên lûleya tifekên xayîn û nemerdan li ser eniya zarokên xwe yên çilikdar hîs ne kirîn, di bin tarîtiyek zilomat de li ber deriyên dagirkeran asê ne mayîn û bi trûskek hîvî barkirî ew fêrisa tarîtiyê ne qulibandîn zehmete xwe bigihînin tama vê şadîtiyê. Yên sênca duryana mirinê bi mergên xwe yên tazî ne qulibandîn, qedrê stîrîzerkên welatê xwe nizanin.

Wargeha Nehdaran hefteya destpêkê li dûv xwe hiştibû. Li gor derfetên di dest de gel cêhbûyîna xwe qedandibû. Her çend malan xwe kiribûn yêk, çalek kulabûn, bi ser re girtibûn, çar dar di her çar quncikên çalê de daçikandibûn, du betanî bi hev ve dirûtibûn û bi wî awayî pirsgirêka xwe ya serşûk û destavê jî çareser kiribûn. Doktor Medya Alemanî, bibû nexweşxaneyek lingdar û hemî pirsgirêkên gel yên tenduristiyê bi derfetên di destê xwe de derman dikirin. Gel pergala xwe ya siyasî û civakî ji nû ve avakiribû û piranî erkdarên kevin dîsa li ser erka xwebûn.

Ji ber kû derfetên vekirina dibistanan û ders dayinên tinebûn, hemî mamosta wekû komîteyên semtan hatibûn erkdarkirin. Asayîş, milîs tam tekûz li ser erka xwe bûn. Bê nan û av, bê star û avahî dibekû komanek bikarebe demekî jiyan bibe û

yêkîtiya xwe biparêze ema, di rewşên wusa  de bê rêxistin jipiya mayîn ne pêkanbû. Ji ber wê, ji berya her tiştî rêkxistina navxweyî dihat tekûzkirin û bi pişt re li ser pirsgirêk û pêdiviyên din dihat ramandin.

Leşkerên Êraqê jî hêdî hêdî fêrî wan kutekmêhvanan dibûn. Di fermiyetê de ji nav malan derketin qedexebû ema, leşkeran çavên xwe ji çûyîn û hatinan re girtibûn. Bi rêya tirimpêlan re çûyîna Şêxan hê jî qedexebû ema, ji rêyên dizî re zêde tiştek ne digotin. Jibû gel bikaribe jiyana xwe bidomîne, neçarbû zû çavnasî derdor bibe. Ji ber kû pêwîstiyên xwe yên rojane  bi buhayek pir giran ji gundên derûdor peyda dikirin. Her beyanî ref biref mirov ji wargehê derdiketin û ji bû pêdiviyên xwe berê xwe didan gundên derdor. Hizra, dibekû bi şaşîtî derbazî nav xaka di bin desthilatdartiya PDK'ê de bibin, zeravê wan diqetand. Aligir û kirêgirtiyên PDK'ê li gundên aliyê Êraqê jî hebûn û ew jî dibû cihê endîşeyên dilqelqîn. Lê li rexmê hemî xetertî, nenasî û xerîbiyê jî ji bû bikaribin rêvantiya xwe dewam bikin neçarbûn pêwîstiyên xwe yên xwarin û vexwarinê bi awayekî dabûn bikin. Ya hê jandartir, gerkû gundiyên derdor hemî kurdên Êzdî jî bûn, ji tirsa rejîma Seyîd Reîs newêrîn bi Kurdî baxivin û xwe wekû Ereb pênase dikirin. Vê jî di aliyê danûstandinê de pirsgirêkên mezin bixwe re tanîn.

Ji nîvê Sibatoka dîn du roj derbaz bibûn. Sibat li ser bayekî ne disekinî û her demjimara wê bi rengekîbû. Carnan di heman şevê de sê caran dunya dibû sahî û çar taviyên baranê dibarîn. Ji berya demjimarekî deqek ewr jî li ezmanan tinebû û piştî demjimarek din baran wekî lehiyê dibarî û hundirê avahiyên dimînin hêlînên kurîbeşkan vedigerandin bêrman. Ema, nîşeyên biharê li deşta pîroz her roj kifştir dibûn, av ketibû Nehdaran û wexte tirh bidin. Ji germahiya ava avzêma jêdera fer ya mihaciran kifş dibû kû dawiya axlêvê hatiye û êdî xweza xwe ji kirasê biharê re amade dike. Erdên li derdora malan xwe bi xemlek kesk xemilandibûn û gangilokan bejna xwe dihejandin. Bêhna axa şil û kulîlkên nû bişkivîn tevlî hev dibûn û bêhnên ne xwezayî dimaliştin û liber xwe dibirin.

Zûsibehek ya axlêvêbû. Bayê jor dêmên rêvanên rû neşuştî diferikand û derbaz dibû. Dengê çûkên çeqilê Nehdaran ji xwe re mesken girtîn bê aheng bilind dibûn. Dibêjîqey beytikên gundê Xwidêda terikandîn jî tevlî qedera wan rêvanan bibûn. Şalûl û bilbilên welatê Şêx, bi kaziba sibhê re bi dengên xwe yê mestvan "roj baş"ek dikişandin û rikdarên welatê Rojê ji xew hişyar dikirin. Sofiyên ji Xwedêtirs, êdî bi dengên şalûl û bilbilan hişyar dibûn û li ber awaza wan diçin sicûde.

Demjimara çalekiya şevê din di tekmîlan de hatî fik kirin û ji aliyê komîteyan ve ji gel re hatî ragihandin, nêzîk dibû. BERXWEDAN

JIYAN bû û hizra; ‘karwan bê têkoşîn na gihê serkeftinê’ di mejiyan de bê şikbû. Bi felsefeya “***Serê li ber minetan, bila here nav ziyaretan”*** dahola têkoşîna li hember dewleta Êraqê, ya wê sibha sar bihata kutan. Soz û zirtên Piyerê çav werimî, wekî kerengperan berhewa bibûn û toza wan jî ne dihat fitrandin. Dewleta Êraqê, rola mexdûriyetê dileyist û heta libek pîvaza rizî tanî, ambargoya li ser xwe bîst caran tanî bîra rêvebertiya Nehdaran. Taqet û diravên gel diqedan û yên biqedana. Jixwe ji bilî qismek pir piçûk, berê jî neqdek li cem wan tinebû. Dawî hefteyekbû qirêja di destê xwe de jî dabûn gundiyên derdor û heke rewşê wusa dewam bikira, ya pirsgirên birçîbûyînê bi xwe re baniyana.

Hêdî, hêdî gel li se rêya diçû Şêxan kom dibû û her kû diçû girse boştir dibû. Şadîtiya hêstên berxwedanê di dêmê kesên çep û rast ji wan kunên wekî hêlînên kêrvoşkên kedî derdiketin de dihat xwendin. Helwesta leşkerên Êraqê raber bike ne di xema kesî de bû. Berxwedana şeva destpêkê girseya gel biwêrîn kirîbû û di dêmê wan de wirarên endîşeyê ne dihatin dîtin. Girseya koçberan, bi nizbeta heta bi Şêxan bimeşe û li wêdê protestoya rûniştinê pêkbîne gihatibû hev. Leşkerên rewşa wan ji ya mihaciran kembaxtir dixwiya, ji wê kombûyîna ne ji rêzê ketibûn gomanê û guhên wan lûç bibûn. Neh, deh leşker daketibûn ser rê û ji dûr ve girse çavnêr dikirin.

Ji nişkan ve jinan pêşî kişand û girseya koçberan alên PKK’ê û wêneyên Rêbertiyê rakirin û bidurişmên; **“Bijî Serok APO!, Bijî PKK”** berbi Şêxan ve dest bi meşê kirin. Dibekû bi hatina ser desthilatdartiya Sedam Huseyn û pêve, cara yêkem be di nav xaka Êraqê de protestoyek girseyî li dar diket. Dest û piyên leşkerên ji wan çalekiya biyanî tevlîhev bibûn û ziman di devê wan de gewilîbûn. Yê çibikin nizanîn û şaşo maşo bibûn. Ji bilî gotina; “İrce-e” ango “paş ve!” peyv ji wan ne derdiket û bi pêşketina girseyê re bi şûn ve direvîn. Leşkerek ji hevalên xwe veqeta û bihewarî berbi navenda tuxayê ve bezî. Leşkerê şaqis, dilezand û biqîrek ne asayî bang dikir Ebû Casim. Hê girseya koçberan pênçsed mitreyî pêş neketibû, ji nivî zêdetir leşkerên tuxayê qulibibûn ser cadê. Ebû Casimê kelaşê wî dima qurmê tûyek xwehr, berbi girseyê ve hat û xwest çalekvan rawestin. Piştî bi fermana rêvebertiyê girse li cihê xwe sekinî; komîteya hatî amadekirin bi Nahîda porspî ya wergervan ve çû cem fermandar.

Girseya vesekinî, binîşana awrên nependî dubare ketibû tevgerê û ketibû di navbera fermandar û leşkeran de. Li ser hişyariya komîteya amadekar girse dubare rawesta û êdî bi pêş ve neçû. Singa leşker û girseya mihacir li hev sekinîbû û li nav çavên hev dinêrîn. Ya balkêş, di awir û tevgerên leşkerên Seyîd Reîs de wirarên kînê û neyartiyê ne dixwiyan. Siyanetek mezin didan jinan û pileya dawî

birêz tevdigeran. Dema mirov hêlwesta leşkerên dewleta Turk, pêşmergeyên mala Berzanî û leşkerên Êraqê tanî berhev; ferqa hêstên xayîn, çanda bîjî û esîl bihêsanî derdiket holê.

Hê gotûbêja di navbera komîteya amadekar û fermandarê di nav girseyê de wunda bûyî nû germ bibû, Ebû Minafiq, bi şandeyek payebilind ve hat û bilez ji tirimpêlên xwe daketin. Leşkerên xwe li ser rê kirîn sênc, rê ji şandeya nû hatî re vekirin û şande derbazî cem komîteya amadekar bû. Jibû girse bibihîze Ebû Minafiqê qurnaz, ji qestîka bi dengê bilind taxivî.

"Hûn mêhvanên mene û cihê we li ser serê me heye. Ji aliyê we ve jî baş tê zanîn; hemî dunyayê nikarî pêl derbenda me bike ema, we derbenda me şkand û dîsa jî bi hêstên mêhvanperwertiyê me rêzgirt. Wekû dewleta Êraqê, ne em sebebê vî encamî û vê zehmetkêşiya wene. Ya ketî ser milê me, me kir û em amadene her tişta ji destê me tê jî bikin. Ji bû qampek ewle û cihek xweştir, em çaverêyî fermana Seyîd Reîs Sedam El Huseynin. Fermana mijara gotinê ya di demek herî kurt de were û cihê hûn bixwazin emê we bibin wêdê."

Xwepêşandanvanên dibêjîqey ji bin hedan derketine, bi baldartiyek mezin guhdarî Ebû Minafiq dikirin. Zelamê qurnaz, ew baldartiya gel wekû siyanet dipejirand û dixwirî. Ema moxaberetê ew gel ji nêzîk ve dişopand û ji rika wan baş haydarbû, peyvên xwe bitosintî hildibijartin û hewl dida xwe neyêxe di bin barek ji taqeta xwe mezintir de.

"Mesela qût û pêwîstiyên din, ya ji destê me were em soz didin texsîr nekin. Ema, li gel hemî serîlêdanan saziya UNHCR nahes tevdigerê û xwe mujûl dike. Niha em rica dikin; huqûqa di navbera malîvan û mêhvan de binpê nekin û bizivirin cihê xwe."

Ji hevoka dawî bêhna gefê difûra û ji hemî rewşa wan kifşbû ne dixwestin serhildanvan bigihêne nav bajar û bibin sebebê hişyartiya gelê Şêxan.

Çalekî gihatbû armanca xwe. Ya hatî hedef kirin hatibû bidestxistin. Armanc, balkişandin û deng derxistinbû. Jixwe di rewşa heyî de zêdetir nedihat çaverêkirin. Bi fermana komîteya amadekar, girse bi durişmên wesf û pesnên Rêbertî û rêkxistinê didin zivirî û hat wargehê.

Ji bû hêzek têkoşer, ji şadîtî û moralê piştî çalekiyek serkeftî dilgeştir, biwatetir tiştek nîne. Jixwe ya hêzekî, kesekî berbi serkeftinê ve dişemitîne û taqate berxwedanê tîmar dike ew moral û motîvasyone. Berxwedana qetandina sînorê Seyîd Reîs, hêza koçber li hember wan mercên giran li berxwebidin afirandibû. Serkeftina li dijî gefên qirkirina artêşa Êraqê, taqeta gel bikaribe di wan mercan de xwe bicêh bike û li hember tevayê neyîntiyan jiyana xwe ji nû ve

ava bike derxistibû holê. Li gor dihat dîtin, nahesiya ji qestîka ya UNHCR, ya bi wê çalekiyê bişikesta û ew rêvantî berbi serkeftinê ve bikişanda.

Şeva piştî çalekiyêbû. Mîlên demjimara hêşedarên ji tirsa êrîşên pêşmergeyan qamp ji Bakur ve zincîr kirîn piştî nîvê şevê nîşan dida. Ji bilî dengên seyên Mûseka û dengên bilind yên leşkerên Êraqê tiştekî bê dengiya şevê xira nedikir. Sedem çiye nayê zanîn ema, du teybetiyên balkêş yên Ereban hene. Yêk; pir taxivin, ya din jî bidengek bilind. Îhtîmalek mezin dengê bilind ji coxrafya deşt jêder dibû, ema raza pir axaftinê hêjayî lêkolînêbû. Koçber, fêrî dengên leşkerên di çeperên pişta wargehê de bibûn û pir caran bilindahiya dengê wan, wekû bê zeravtî jî şîrove kiribûn. Lê, wê şevê seyên gundê Mûseka ne asayî direyîn û seyên têr çewt çewt bala hêşedaran vegerandibû ser deşta di navbera wargehê û Mûseka de.

Awazê ji nalyona Evdê Dêrşewî bilind bûyî destpêkê hêşedar veciqandibûn ema, piştî bêhnekî dengê zîz, zelal û ji nîvê mejî derdiket mest û serxweş kiribûn. Dengê mestvan û demek ne ji rêzê ji bin wê nalyona piçûk bilind dibû, guhdarvanên xwe kişandibûn ber keviyên zozanên welatê mayî.

*“Heyran jaro;*
*Zaxoka Behdîna limin dilgire.*
*Bi ser re Hêzile, bi bin re Xabûre.*
*Heke tu li kofî kêlan, bejn bilindan,*
*kemax kêrvoşkan, navkêl ziravan dipirsî;*
*Here xwe berde Eşîra Ertûşya nav Metîna.”*

***

*Şetyano tuyê li min hişînî.*
*Qirşik û qewalên cihê Bohta li ber xwe tînî.*
*Dema çavên min li bejna bilind, dêmê gulî dikevin,*
*Ti kul û mereq li ser dilê min namînin.*

***

*Keçkukê Bîşengê,*
*Malan daniye astengê.*
*Min divêm biçim tewafa xala gerdenê,*
*Xwe di hejîne ji navtengê.”*

Bi gotina dawî re kuxikek bê merîs li zelamê kal miselet bibû û te digotqey haxta bi xeniqe. Kuxika bûyî sedemê birîna stranê ji

xweyê wê bêhtir guhdarvan aciz kiribûn.

Hê hêşedaran xwe ji bandora strana mestvan ya Evdê Dêrşewî rizgar ne kirîn, reşê birek mirovê bela wela dimeşin bi nav zeviya jêr re dabûn der. Reşên mirovên di nav zeviya kilêpkirî de bê rêkûpêk tevdigerên destpêkê kutên bi dilên hêşedaran êxistibûn. Ema her kû reş nêzîk dibûn, temtêla wan ji ya hêzek çekdar dûr diketa. Dema elenda heyvê xwe ji çêlek ewr rizgarkir û rija ser wan, hat ferqkirin kû piranî zarokên bipiştî û çend mirovên gihatîne. Hêşedaran çeperên xwe girtin, emyetên çekên xwe vekirin û hingî ramanbûn, wateyek nedan wê refa mirovên xwe li nav wê zeviya kilêpkiriya herî dayîn. Ji berya bigihêne kuzikên hêşedaran pênçî mitrûyan, komî ser hevbûn, kêmekî di nav xwe de kirin piste pist û reşek ji nav wan veqeta û yêkser berê xwe da çeperê.

Hê di navbera hêşedaran û reşê berbi wan ve dihat de du werîs mayîn; nobedar bi dengek bilind û tehdîtkar qêrî;

"Tu kêyî?"

"Ezim, ez! Mele Resûlê Baseyî" got zilamê di bin piştiyê wekî girekî de devikî diçû erdê û bê rawestandin meşa berbi hêşedaran ve tajot.

Ew deng û ew nav li hêşedaran biyanî ne hatibû. Lê gelo çima û çawa hatibûn, ew ne diyarbû. Mele Resûlê dibin piştiyê mezin de piçûktir dixwiya, hat û li cem hêşedar sekinî. Hêlma li ser devê zelamê westayî diket dibû hêwî û xwêhdana ji poza diherikî û hêwiya simbêlên wî şil kirîn tevlî hev dibûn. Dema ji nêzîk ve li hêşaderan nêrî û naskirin; wekî zarokek nefêhm ji nav kulabên hirçekî rizgar bibe şad bibû. Piştiyê giran avêt erdê û hewlda destê hêşedaran maç bike. Hêşedaran bi siyanetek mezin zelamê navser himbêz kirin û ji hêşedaran Şahînê Şehrikî bi dengek şaqis got;

"Seyda, te vê kebarê xêre? Tu ji kûvê têyî, tuyê bi kûve herî?"

Seydayê navser, bejin navîn û di teqna zeviyên kilêpkirî de bê hal ketî, xwe li dûv piştiyê mezin berda erdê. Destên xwe ber bi ezmanan ve rakirin û wekî piştî salên dirêj dubare di derîzana mizgevta Sohr re bikeve hundir dua kirin û di ber xwe de got;

"Şukir ji xweda re keko! Vê carê jî destê min û zarokên min gihat muradê!"

Hêşedarê di rastiyê de dizane merema Mele Resûl çiye jî ema, bi refleksa hêşedartiyê got;

"Ev ne bersîva pirsa mine. Ewên he.. kêne?"

Mele Resûl, dîsa ji xwe re û di ber xwe de axivî;

"Şukir ji xwidê re keko, min xwe naskir! Ew zarokin, zarokê PKK'ne" got û ava di çavên Mele Resûl de kombûyî dibin elenda heyvê de dibiriqî û wekî ronahiya çirayê li çavên hêşedaran diket. Kelegiriya di qirika wî de asê mayî bikutekî daqurtand û dewamkir;

“Bê we hedara min nehat. Hûnê me bihêlin û bikûve herin?”

Ji bû Seyda çavên xweyên tijî hêstir ji hêşedaran veşêre birik li elenda heyvê dinêrî êdî. Ema zeraqên heyva çardeh şevî li hêstirên gir yên di laman de gindirvarî dibûn, didan û diteyîsandin. Hêşedarê şadîtiya vegera malbata Seyda hinavê wî digiz gizand, bihêlwestek şîretkar got;

“Dema alem bihewarî ji me direve, hûn berê xwe didin nav me; qey hûn dîn bûne?”

Zelamê vegerayî pêkerek ji heriyê û hêstirên şadîtiyê dirijîne vesikînî. Hêstirên xwe bi zenda xwe paqijkirin û bi dengek tijî poşmantî bersiva hêşedar da;

“Bila ez dînê PKK’ê bim, ne aqilmendê guhê gundê PDK’ê bim. Xwezî li birçiyê azad û qedap li têrê xwilam bikeve. Bi wê qurana min xwendî, ewên niha direvin bizanibûna yên heft qetê êşa min li vî gundikê he kişandî, bikişînin; di heyata xwe de dest ji vê jiyanê bernedidan.”

Piştî kelegiriyê qirika wî berda, berê xwe da komika li dûv xwe hiştî û bidengek şad û bikelecan bangkir;

“Qutê, Eyşê zarokan bînin û werin!”

Haxta bibiya berbang. Ewrên ji berya gavekî baran ji wan dibarî, bi hêza bayêkur ji hev belav bibûn û heyva çardeh şevî bi nav ewran re li dêmê Mele Resûlê Baseyî û zarokên wî yên ji gundê Mûseka revîn dikenî. Bayê cemidî, wekî sêlaxa berçeman li dêmê nobadaran diket û hinavên wan diqerisandin. Eşîra Mele Resûl ya hêstên şadîtî û şermîtiyê di nav hev de dihunandin hatin û nobedaran yêk û yêko destên wan şidandin.

Şahînê Şehrikî, dibin dûvêkên çavên xwe re û ji dizî ve zarokên wekî komika sêwiyan bi zorê jipiya disekinin hêjmartibûn. Pazdeh zarok û di nav wan de ya herî mezin kêmî sêzdeh salîbû. Du jin û Mele Resûl. Kelecanek şad ji çavên zarokên pelweste diherikî. Yên piçûk jî li paşta xwişk û birayên xwe xilmaş û bêdeng di sekinîbûn. Heriya bi pêlava zarokan ve kombûyî wekî berfmalka berfê gêr vedabû û ji giraniya kelaşê wan bêhtirbû. Nobedarekî keçika li pişta zaroka herî piçûk da ber singa xwe û berê xwe dan nav malan.

Mele Resûl; eslê xwe ji gundê Basa ya girêdayî Şirnexê bû. Di zarokatiya xwe de dest bi feqetiyê kiribû û bi demê re talibek navdar jê derketibû. Bibû melayek jêhatî û li Cizîra Bohta bibû melayê Medresa Sohr. Di hem wextê Mela dibe alimek navdar de PKK derketibû û bê dudil bibû yêk ji aligirên Tevgera Azadî yên destpêkê. Girêdayî meyl û alîgirtina xwe bibû hedefa êrîşên dewleta dagirker jî. Bi caran hatibû girtin û îşkencexaneya Amedê re derbaz bibû. Êdî debar nekiribû, du hevjîn û komek zarokên hûr li dûv xwe

hiştibûn û di sala 1989'ê de tevlî refên gêrîla bibû.

Li gor navîna temenê gêrîla Seyda, kesek temendarbû û di xebatên gel de cêh girtibû. 1995'ê bi pêşniyara xwe û bi erêkirina rêxistinê ji hola gêrîlatiyê veqetabû û li eyaleta Şehît Jiyan wekû mirovek welatparêz jiyana xwe domandibû. 1996'ê bi arîkariya rêxistinê malbata wî jî hatibû heman wargehê û du keçên wî yên herî mezin di heman salê de tevlî refên gêrîla bibûn.

*Hevjîna duyemîn ya Mele Resûlê Baseyî* ***Qudret Karahan*** *vedibêje*:

"Em di dema ambargoya Etrûş de hatibûn eyaletê. Mele Resûl ji berê ve li eyaletêbû û em jî li dûv wî hatibûn. Bi bihara sala 1997'ê re Hevalan ji bilî qismek mihacir biryara belavbûna eyaletê dabûn. Qismê mijara gotinê yê çûbûya herêma Sohran û navê me ji di nav wî qismî de bû. Lê Mele Resûl ji rêvebertiya eyaletê aciz bibû û em bi Spêrtiyan re çûn gundê Mûseka.

Dema em nû çûyîn Mûseka PKK û PDK li hevbûn û zextek zêde li ser me tinebû. Qismê destpêkê yên çûyîn Nînûva ji berya me bar kiribûn. Piştî em çûn, me temaşekir; gundê Mûseka û wargeha Nînûv li rex tenişta hevin. Em bi cîrantiya wargehê keyfxweşbûn û sebra me bi wan dihat. Ji berkû me xwe aydê wargehê hîs dikir û ew gund li me biyanîbû. Tiştek yê me û wan gundiyan ne dima hev. Bi goman li me dinêrîn û baweriya wan bi me ne dihat. Ji xwe me çadirên xwe li tenişta gund vedabûn û ti têkiliyên me bi hev re çênedibûn.

Piştî çûyîna me ya Mûseka demek kurt, şerê me û PDK'ê destpêkir. Mûsekî aktîf tevlî şer dibûn û kendalên di navbera me û wan de kûrtir bibûn. Me xwe li deriyê xiyanetê hîs dikir û vî hêstî em diperçiqandin. Li gundê me, li ber çavên me her roj êrîş diçûn ser gelê wargehê û malên wan dihatin talankirin. Piştî demekî birayê axayê gund, li Gara di şerê li dijî Hevalan de hat kuştin û evê zexta li ser me zêdetir kiribû. Êdî me ne wêrî em dikara Hevalan jî bikin û me di wî gundî de xwe wekû gerew hîs dikir. Ya xirabtir; em ji hev jî ditirsan. Êdî baweriya me û Spêrtiyan jî li hev ne dihat.

Zarokên gund li dibistanê li zarokên me didan û neheqî li wan dikirin. Zarokên me nivîsandina erebî nizanîn û mamosta latînî li wan qedexe kiribû. Xerîbe, di çavên Mûsekiyan de nivîsandina latînî hevcewherê PKK'ê dihat hesibandin. Kêyê kû tîpek latînî li cihekî binivîsanda biçavên PKK'ê lê dinêrîn û çavreşî tavêtanê.

Ji destpêkê ve me dixwest ji gund birevin û tevlî wargehê bibin lê, me ji axa û hin kesên di nav xwe de ne wêrî. Me digot, emê werin girtin û yê ziyanê bidin zarokên me. Piştî wargehê ji Nînûva barkir, agir ket di bin me de. Me êdî xwe bê kes û belengaz hîs dikir. Tebata me ne dihat. Di nav xerîbiyê de xerîp mayîn pir zore. Yên ew

êş nekişandîn, jana herî mezin re hevnas nebûne. Aha em li deriyê xiyanetê bi wê janê re hevnas bibûn.

Sibeha şeva qampa Nînûva barkirî, Faris Axayê gundê me û Memo yê Axayê gundê Xwedêda li ser jeneratora wargehê şerê hev kirin. Di şer de Memo û kurek yê xwe û ji gundê me jî kesek hat kuştin û Faris Axa jî giran birîndarbû. Faris Axa rakirin nexweşxaneya Duhokê û her du gund jî li ber xirabûnêbûn. Me jî xwest em ji wê tevlîheviyê sûd bigrin û birevin.

Me ne wêrî em ji Spêrtiyan re merema xwe vebêjin. Di rastiyê de herkes ji yê din titirsa. Ew ji me, em ji wan û herkes ji hev ditirsan. Em ji zarokên xwe jî titirsan. Şeva dawî Mele Resûl ez û Eyşê xefkirin û got;

"Ez difikirim îşev firsete û em birevin."

Bê guftûgo em her du tevlî nêrîna wî bibûn. Ewî ji derve nobet girt û dema xewê, me ji zarokên bîrawer re dikara revêkir. Keyfa zarokan jî pir hatibû. Ji berya zarok binivin, me cilên wan yên lixwekirinê di ser hev de li wan kirin. Jixwe ji du destan zêdetir cilên wan tinebûn. Dibin cilên zêde de wekî gokan li zarokên me hatibûn.

Zaroka min ya piçûk pênç rojîbû. Min ji ber zaroka xwe nikarî zêde tiştekî hilgirim. Lê, ji bû yên din hemiya me bar amade kiribûn. Ka kîjan zarokê kîjan barî hilgire me ew jî di êvar de kifş kiribû. Bê goman piştiyê herî mezin me ji Melê re amade kiribû.

Demjimar du yê piştî nîvê şevê, ji dizî herkesî ve em derketin rê. Ji bû kes di demek kurt de pê ne hesê û li dûv me nekevin; me sope û çira xwe jî pêxistî hiştibûn. Me di nav xwe de biryar girtibû; kûjan zarok bigirya me yê destê xwe danîbûya ser devê wê/î heya bisekiniya. Êdî, ew û şansê xwe. Piştî meşa du demjimaran em gihatin cem nobedarên wargehê.

Dema em gihatin nobedaran şadîtiya me hîskirî nayê vegotin. Hêstek, pênasekirina wê pir zehmete. Em dubare jidayik bibûn û gihatibûn murada xwe. Serpeşkên baranê destpêkiribûn û tiştek yê me tunebû. Ema keyf û kelecana hatina cem Hevalan hemî neyîntî didewisandin û dil di singê de ne dihat zevt kirin. Hemî neyîntî ji bîra me biribûn û wê demê me xwe di buhişta heft olî de hîs kiribû"

**Bazirganên Kiloxan**

Xanê;

"Keremke hevalê Rimezan, were xwe germ bike" got û bi darê di destê xwe de terafa tifikê kişand ji derve.

Muhemet, Ehmet û zarokên li dora guriya agir bose girtîn, ji zelamê nû hatî re rê vekirin. Rimezanê Spêrtî misînê destavê danî

teniştê, bistika radyo xwe êxist di cêhê wê de û tiliyên xwe yên ji serma hişîn bûyîn dan ser pêta agir û bi dengek keziyên gazindan jê difûrin got;

"Em gelikî xemsarin. Me dest ji xwe berdaye. Bi ser hatina me re mehek derbazbû û hê me cihê destava xwe jî çareser ne kiriye. Mirov di van dolan de li rasta deh kesan tê û dihetike."

Wekî bi ber dilê Rimezan ve here Muhemet got;

"Ev Ebû Minafiqe çiye, her roj gotinek cuda dibêje. Nixwe ma kê bawer dikir emê mehekî li ser vê rêyê bimînin."

Ehmedê qermîçokên rûyê wî wekî niwalokan dixwiyan û riha yêk mehî jî na nixwimîne navrana şalê xwe kişand û bi awazek tevz barkirî gotina birayê xwe birî.

"Ez têragihêm, hûn çawa dikarin hîviya xwe bi dijminê xwe ve girêbidin. Qey kengê, kê dîtiye dagirker zelal bûyîn."

Wekî bixwaze dabaşê biguhere Xanê ya ji hevjînê xwe pir ciwantir dixwiyê û zikê wê li ber deva, ket di navberê de.

"Hevalê Rimezan, radyoya te çi dibêje? Ev serê mehekiye têkiliyên me ji cîhanê qut bûyîn."

"Hevalan di BBC de got; heke qurocî dernekevin operasyonê em eleqa xwe ji wan nayînin."

Jina enî fireh û xezal ji çavên wê yên gir dihesidin, eniya xwe qermiçand û got,

"Ma Hevalên feqîrê çi bikin? Li gor ku dibêjin, not û heft hezar qurociyên fermî hene. Tu mît û ajan û yên veşartî jî tevlî vê hêjmarê bikî, xwe li dused hezaran dide. Ne bi kuştinê û ne jî bi girtinê xilas dibin."

Bi gotina Xanê re Xelîlê Spîndarokî misînê xwe danî rex yê Rimezan û tevlî civatê bû. Dêmê wî tirş û xemgîn dixwiya Xelîl. Wekî tiştekî xef bike, li civatê nêrî û bi awazek nivz got;

"Dibêjin Şemo (Şemdîn Sakik) reviye!"

Wê sibha cemidî dibêjîqey nûçeya Xelîl, avek sar li civatê werkiribû. Wekî çaverêtiyek wusa hebe, tu kesî nebaweriya xwe ne anî ziman û deng nekir. Dîsa Xanê gihat hewarê.

"Kê gotiye?"

"Milîsên ji Gara hatîn."

Piştî bêdengiyek kurt û giran Rimezan mijar guhert û got;

"Xêre hevalê Muhemet, hûnê biderekî ve çûbûna?"

Zelamê temenê wî bi ser şêstê re dixwiyê, riha xemor jî argûşkên çalbûyîn na nixwimîne keserek kûr kişand û bersiv da;

"Bixwidê, ne sope û ne jî tebaxa me heye. Em xwarina xwe li ser vê tifikê çêdikin û xwe li ber wê germ dikin. Em neçarin her roj herin pejîngan. Daska me jî nîne, kê heye gelo?"

Xelîl, bi dengek ji xwe bawer û wekî ji jêderek az xeber

girtibe gotinên malîvan birîn û lêkir;

“Hûn van rojan haj xwe hebin başe. Li gor tê gotin, ji bû derbeyekî li me bidin peşmerge û quntrayên turkan li van ser pêtiyan xwe veşartine.”

“Xem nake! Lê ez ji Ehmet re dibêjim; em her du bi hev re neçin. Heke tiştek biyêkî ji me hat, qenê yê din haj zarokan bimîne. Ew jî vê sibhê ketiye derdê kopalê xwe.”

Mam Nasirê erzen û pozê wî haxta bigihêne hev û nû gihatî cem civatê, beşişî û pirskir;

“Kopalê çi?”

Muhamet rabû ser xwe û aliyê wekû derî dihat bikaranîn yê nalyonê rakir. Nalyona di kurtekî de hatî vedan, her sê aliyê wê bi keviran hatibûn dîwar kirin. Serek yê darê wekû girş hatî bikaranîn li ser dîwarê paşiyêbû û di bin serê aliyê devê derî de kopalê Ehmet wekû stûn bikaranîbûn. Sê zarokên di bin çadirê de xwe li hev alandîn hê jî di xew de bûn. Ehmedê birayê mezin yê Muhemet, dixwest wê sibhê here stûnekî bîne û kopalê xwe ji stûnîtiyê rizgar bike. Muhemet, li ser pêşniyara Mam Nasir, çû dasika mala Fehîma Reşo ya Hilalî anî û her du birayên yêxtiyar di derê mala Huseynê Mele Osman re hawaketin û çûn.

Hevjîna Muhemet Benek’ê Hilalî **Xanim Ehmet** vedibêje;

“Piştî em hatîn Nehdaran ne sopaya em xwe li ber germ bikin û ne jî tebaxa em li ser xwarinê çêkin hebû. Dibin berf û baranê de, şev û roj me xwe li ber tifikê germ dikir û xwarina xwe li ser wê çêdikir. Ji wê sedemê hevjînê min neçarbû her roj here dar û pejîngan. Lê, tiyê min ji derp ketîbû û ti carî ne diçû.

Tiyê min; birayê Muhemet yê mezinbû. Temenê wî ser şêst û pêncê re bû. Dema ew qerdemêr, Xwedê keçekî dide mamê wî. Mamê wî soz dide kû heke çaverêyî keça wî bimîne, dema keçik mezin bibe yê bide wî. Ehmet jî bi wê xeyalê dimîne û na zewice. Piştî keçik digihê qîma xwe bi Ehmedê êdî navser nayîne û êdî kes din jî pê qayîl nabe. Ehmet, bi wî awayî bê mal û hal dimîne û ew jî bi me re tevlî vî karwanî bibû. Piştî em hatin Nehdaran, ji tineyî me kopalê Ehmet wekû stûn dabû bin girşê nalyona xwe. Wî jî dixwest wê rojê here, stûnekî bîne û bêxe di cihê kopalê xwe de.

Hevjîn û tiyê min, çarê heyva Adarê sibhê zû ketin dûv hev û çûn dar û pejîngan. Piştî heta derengê rojê nehatin, dilê min rehtbû û min ji derdor pirsa wan kir. Seyhana keça Huseynê Mele Osmanê cîranê me got; “ez jî çûbûm daran. Pêşmergeyên PDK’ê berdan me û em revîn!” Evê gotinê fikarên min zêdetir kiribûn û min xebar da Hevalan.

Her du zelamên me bê ser û şûn wundabûn û li gel hemî lêgerîn û lêpirsînan saroxdanek ji wan nedihat hilanîn. Em birek jin

û zelam wê şevê li dewsa wan çûn, me cihek nehişt û me nîşanek, saroxdanek ji wan peyda nekir. Zelaman ji ber pêşmergeyan ne diwêrîn nêzîkê tuxûb bibin lê, her roj em birek jin diçûn û li wan digeran.

Piştî wundabûyîna wan bîstûçar rojan, şivanek Êzîdî kelaşê wan dibîne. Şivanê Êzîdî, tê mala Resûlê gundiyê me û meselê vedibêje. Bi rêbertiya şivanê Êzîdî birek zelam çûn û kelaşê wan anîn.

Her du kelaş jî bê serîbûn. Destê her du ya jî bi têlan girêdayîbûn. Dema wan gulebaran dikin, Muhemet destê xwe dabû ber xwe û gule li kefa mista destên wî ketibûn. Me her du kelaşên bê serî nîvê wê şevê spartin axa Nehdaran.

Piştî hingê me bihîst, turkan ji pêşmergeyan serê berpirsên PKK'ê xwestine. Ji berkû serê her du zelamê me jî spîbûn û yêxtiyarbûn; serê wan dibin deriyê Xabûr û ji turkan re dibêjin; "ev kiloxên berpirsên PKK'ê ne." Turk jî berdelê her kiloxî pênçsed dînarê esîl didin wan kesên qatil."

Konê sersaxiya her du birayên ser jêkirî ne ji zû ve rakiribûn. Bandora bêbextiya Celal Telebanî germahiya xwe hê jî diparast. Êrîş û suîqastên PDK'ê tiştek ji leza xwe wunda nekiribûn û berevajî paşmergeyên mala Berzanî, di her keysî de êrîşî her tiştê wargehê dikirin. Bê goman ne tenê paşmergeyan, hemî qatil û serbirên Turkan cilên paşmergeyan li xwe kiribûn û wekî toleyên xirabûyî bi dora koçberan re çar dizivirîn. Mamosteyan, xwendevanan, komîteyên semtan û her qismê gel wekû dildar çek rakiribûn, tevlî hêza xweparastinê bibûn û li dijî êrîşên paşmergeyên PDK'ê û MÎT û tîmên turkan wargeh bose kiribûn. Hêst şidayîbûn, tilî li ser tetikanbûn û hewayek pir tîr û giran serwerbû.

Demhat û roja jinên kedkarên cîhanê xwe pesart.

Ji dûh ve komîteya amadekar ya xwirî jin, di nav zeviya hê dewsên teqnê lê zindîne de dest bi hazirtiyên pîrozkirina roja jinan kiribûn. Wekû dike, du stûn daçikandibûn û di navbera herî jor ya stûnan de panqertek 'Heştê Adarê Roja Jinên Kedkarên Cîhanê Pîroz be' li ser nivîsandî daleqandibûn. Bi bin nivîsandinê re, di nîvî de yê Serokatiyê, li her du rexan ya Hevala Bêrîtan û Zîlan sê wêneyên bejin mezin hilawistibûn. Li pêşiya stûnan wekû dike bi qasî bênderekî erd rebisandibûn.

Piştî taştêyek zû, ji wan kunên teng û herî ref biref jinên bejin û bala xwe bi kirasên Kurdî yên bilewendî xemilandîn rijabûn pêşya dike. Di nav demek kurt de, pêşya dike vegerabû deryayek rengîn. Dibêjîqey demsal ne axlêve, kewna biharêye û xwezayê deştika Şêxwelî bigul û kulîlkan pîncdaye û di bejna wan jinên tijî jiyan de bi milyonan gul vedane. Li aliyê din durişmên bi rengê

biharê yên Stiyên Stêr, xwedayên mêr ji xewna hezar salan ya bê heqîqetê hişyar dikirin. Zelamên patik qemitî, lamçal û çavcirnik ji dûr ve temaşeyî wê deryaya rengan dikirin û durişmên 'jin jiyan azadî' di guhê wan de vedidan.

Gelo di vê cîhana mirovtiyê de, mêr ji sedan çendê spehîtahiya jiyanê pêktîne? Heke dewlet û desthilatdartî tinebûya û girêdayî wê zordestî nemabûya, jiyana bi kûjan rengî hatibûya xemilandin? Dibêjîqey wê rojê û di wî warê awerte de paşhatiyên Enkiyên kurnaz vegerabûn rola xweya malxwertiya zemanê Berpenîr û di nav teqna Mezra Bohtana jor de teqinîbûn. Ewqas ji derb ketibûn, rebentiya ji şaristaniyetê sêwî mayîn di çermê stûr yê rûyê wan de dihat xwendin û wirarên jiyanê di bîbûkên wan de nemabûn.

Bi dengê pêşkêşvana ciwan, narîn û bejna xwe bikiras xiftanek spî pêçayî, hemî jin li hember şehîdan rep sekinîbûn. Piştî deqeyek ya rêzgirtinê berpirsê jinên wargehê Rewşen, bi tevayê stîtiya xwe derket ser dike. Rewşenê axatinek kurt ya siyasî kir û vegera nav temaşevanan. Pêşkêşvana pora wê ya lib libkirî xwe li kemaxan dide, koma skêçan ya penaber vexwendibû ser dike. Dabaşa skêçê, rêvantiya şeva ji Nênûva hatina Nehdaran bû. Ekro yê Ziravikiyê stûr, pehn û til meşk bizinbû û Caso yê Dêrhîniyê kurt, qor û piçûk jî kehrik. Sê, çar betaniyên helefa li bizinê kiribûn û tîkên wan di nav guhên wê de dihatin xar. Bi heman awayî betanî li kehrikê jî kiribûn û ew jî di nav betaniyan de wunda bibû. Bizin û kehrika xwe li rex hevibûn, bare bara hev dibihîztin ema, hev ne didîtin û li hev digeran. Ji berkû di nav wan betaniyên bê merîs de hev nas ne dikirin.

Ber bi dawiya skêçê ve qumên û rimên ketibû Başûrê wargehê û serpelên bagerê gihatibûn çeqilên Nehdaran. Bagera dijwar, panqerta di navbera her du stûnan de qetandibû û betaniyên kehrik û maka wê jî firandibûn. Bablîsoka li dûv bagerê hatî, ketibû di nav malan de û di valetiya ezmana de firaxên kevaniyan li nav guhê hev didan. Jinên meydana pîrozbahiyê berdayîn, ber bi nalyonên li ber bablîsokê reqsa Lazikî dikin ve dibezîn. Ekro yê bi destekî betaniya xwe girtî û bi destê din xwe bi stûna dike ve hişk şdandî, bi dengek tevz tevlî tinaz digot;

"Ne teyroke bablîsoke! Ne revin, ne revin!"

Di dîroka wargehan de têgînek rastiya wê guftûgoyê bi xwe re nabe hatibû rûniştandin. Wê jî ji eyaleta Şehît Jiyan destpêkiribû. Dîsa rojek ya heştê Adarê bû û li Eyaletê bi hemî germahiya xwe pîrozbahî lidarbû. Wekî sînorê wê tenê Eyalet, ewrek kerespî Eyalet nixwimandibû û teyrokek libên wê biqasî gozan barîbû. Dîsa hemabibêje, di piranî rojên jinan de baran dibarî. Jinan, ev rasthatin wekû rehma bereketê û mêran jî wekû dimohrtiyê nirxandibûn.

Qesta Ekroyê sikêçvan jî teyroka Eyaletê bû.

Rojên biharê jixwe dirêjbûn, rojên Nehdaran pir dirêjtir bibûn. Bitehfan jî ji cihê xwe ne dilepitîn û ji qamê pir zêdetir vezîlabûn. Rêveberê UNHCER Piyerê rûsar, bi vir û zirtên xwe ve çûbû û êdî wirarên wî jî ne diyarbûn. Qûtê dewleta Seyîd Reîs tanî ji feydê zêdetir zerer dida koçberan. Ji goştê tanîn, ji serê malbatekî re sed xiram ne diket. Komîteyan pirteqalên wan lib û libo belav dikirin. Petete û pîvaz jî wekeza. Diravên di destê gel de ji zû ve birhabûn û vê jî xewên şevan li rêvebertiyê diherimandin. Ya baş û kifşker mantiqa 'dema hebe emê bi hev re bixwin û kengê xilas bû emê bi hev re birçî bimînin' di nav karwanê koçberan de serwerbû û vî exlaqî hemî neyîntî didaqurtandin.

Nîvê şevê ji zû ve şkestibû. Hê Beşîrê serhêsin banga sibhê nedabû. Girvanên sirta dola bimayîn, ji hêza xweparastinê taxima Tahirê Osmanê Hîlalî bû. Di çek û rextan de pêçayî û wekî xezalek nû gihayî Tahir li pêş, Ehmedê Şehbaz li dûv, Ehmedê dirêjê navser, gir û dirêj li pey û taximê bi awayek bê deng da kaşê mila Rojavayê Nehdaran. Fermandarê ciwan û wêrek li sê çeperên serê milê hevalên xwe belavkirin û ew û du heval jî derketin çepera herî jor.

Piştî girvan gihatin cihê xwe demjimarekî, rojê tîrojên xwe wekû qevdên zeraqan li asoya wargeha Zorava belavkiribûn. Roj hilat û ya bihilê. Çepera fermandar Tahir, li raser wargehêbû. Dibêjîqey çala wargehê dihevîne di bin lingan de bû û lingê xwe bavêta yê biketa ser wargehê. Dûrbûna xwe ya ew qaseke pesartî aliyê Bakur zivirind û li ser wargehê girêda. Fermandarê ciwan, ti carî wekû wêneyek giştî di wê çarçoveyek de li wargehê ne nêrîbû. Çeltikê nan li mila Muhemedê Emerê Hîlalî, pezê xwe ji hevşiyê pişta wargehê berda û bi bejna xwe ya qut û girover da pêşiya pez û hawaket. Kurê wî Emerê zarok, bi lingê xwe yê di licime pez tajot û pehnava pişta Nehdaran li dûv xwe hiştibûn. Li pir cihên wargehê kom bikom jin li serê tifikekî hatibûn cem hev û nanê sêlê dipehtin. Bayê seherê bêhna xweş ya nanê duta li firnikên pozê wî didan û bêhna nan ti carî ruhê wî evqas ne hingavtibû. Kurkek bi çîçikên xwe ve ket di nav qada mayînkirî de û bê tirs û xem diçêrîn. Dayîk wekî nêçîrvanek yeman, bi arîkariya perên xwe, xwe hiltavêt û bi pencên xwe kulehek ji hewa ve zeft dikir û têxist qide-qid. Cîcikên deng dibihîstin li ber nikilê dayîka xwe kom dibûn û xwedê çi kiribe nesîb ji kelaşê kulha reben dixwarin.

Komîte û rêvebirên semtan bi gavên bilez li derê kulikên semtan komdibûn û li ser lingan fik kirina karê rojane dikirin. Berê wan li kulika semta çar ji kordînasyona wargehê Cûma û berpirsê komîteya karê jiderve Cemalê Amedî, derbenda kevin ya Êraqê derbazkirin. Her du jî ji lingê xwe dilicimîn ema, lingên wan yê

seqet ne hemanbûn û vê jî di meşa wan ya bi hev re de bê ahengî dertêxist holê. Salhê Tehtê yê Mijînî, ji semta çar ve bi bez ji her du rêvebiran bûrî û deriyê çadira Dr. Medya ya Alemanî da ber pelman. Dr. Medya çav lixew serê xwe yê zer ji çadirê derxist û bi hêlwestek dilniya guhdarî zilamê bilezkir. Zivirî hundir, çelteyê xwe yê dermanan rakir û bi hev re berbi semta wan ve bilez meşîn. Pêlava lastîka di lingên Medya de mezinbû û bi lingan ve ranedibû. Pêlava mezin meşa wê asteng dikir û bi zelamê pîjaq dirêj re ne digihat. Li xilaseka malan Sebriyê Ker, Ehmedê Îsayê Mijînî, Şefîqê Bilehî û Mele Mihyedînê Bilehî civat girêdabûn û ji tevgerên destên wan kifş dibû kû sohbetek ne xweş dikirin. Ehmedê dirêj gewdeyê xwe yê gir ber bi Tahir ve xirikand û bi devoka xwe ya Elkî got;

"Hevalê Tahir, aliyê keşfê ne qampe. Ev wusa tu li çî dinêrî?"

Bêkû Tahir dûrbînê ji ber çavên xwe deyne bersiv da;

"Li civata dêwan dinêrim mamê Ehmet."

"Dêw! Qey di nav me de dêw jî hene?"

"Erê, dêwên ji kaxezan zehfin" got, dûrbîna xwe danî û bideng kenî û gotinên xwe ajotin Tahir.

"Ehmedê Îsa, Mele Mihyedîn û Şefîqê Bilehî dor li Sebriyê Ker girtine. Niha qelebalixa Sebrî were heta bi vêdê qet şaş nebin."

Ehmed, eniya xwe qermiçand û wekî heyf bike;

"Li gor gote gotên tên kirin, ev malên li nêzîkê PDK'ê sekinîn na xwazin bi mere bar bikin, dixwazin birevin cem van xayînan."

Ehmedê Şehbaz gotin ji devê Ehmedê dirêj girt û bi hêlwestek aciz lêkir;

"Ez di şûna Rêvebertiyê de bûma, hê ne revîn minê kiribûna der. Yên bi fikir û hizrên xwe ne bi me re bin bila di nav me de nemînin."

Dema Tahir awrên xwe diqerastin xwendevanên ref bi ref li binê çamên li kaşika Başûrê qampê rûniştîn û bê lept guhdarî memosta Hacî Ehmedê Gundikî dikin got;

"Wusa ne bêje hevalê Ehmet! Meşa me êşdar û têr berdêle. Hinên di vê meşê de bikevin, hinên birevin ema, encam serkeftine."

Bi gotina Tahir re li aliyê gundê Xwedêda qirên ketibû çekan! Piştî şînikek çekên ferdî dengê bisfingan tevlî bibû û guleyên wan ji heva ve dest bireqsa Goyîkî kiribûn. Jinên çûyîn dar û pejîngan di jor de direvîn û pêşmergeyên PDK'ê gule di ser wan de dibarandin. Îsîfê Behdirê Hîlalî jî di nav darvaniyan de bû û çekdarbû. Zelamê navser, li milika pêşya çepera Tahir wan çok veda û êrîşkar dan ber fîşekan. Çeperên hêzên xweparastinê jî tevlî şer bûn û li her sê aliyên wargehê qirên bi çekan ketibû. Xweda dizane, pêşmergeyek birîndar bibû û qarêna wî li ser dengê hemî çekan diket. Bi dengê çekan re jin û mêr, çekdar û bê çek hemî şêniyên wargehê qulibibûn

wî alî. Êrîşkarên hatîn nêçîrê û bûyîn nêçîr, birîndarê xwe hiştibûn û ber bi gundê xweyî mirî ve direvîn. Pêşmergeyê ji ranê xwe yê stûr birîndarbûyî û li pey hevalên xwe kulî kulî direvî, dijûnên dê û bavan dikirin hevalên xwe yên tirsonek. Ji Pêşmergeyên tif kirîn binê lingên xwe û di nav kavlên xir û xalî yên gundê Memo de bi şûn xwe ve nêrîn, yêk til meşk, şaşik sohr derket ser xaniyekî û heta awaza wî derdiket dikir qêr û digot;

“Dehşîkên Sedam, dehşikên Sedam! Ne hûn bûne dehşikên Sedam, qey hûn şerm nakin desthiltînîn?”

Teybeta Hîlalî ya navser, kêmekî qelew û ji berya herkesî gihatî çepera Tahir wan, li ser te’nên pêşmerge yê bê fihêt eniya xwe qermiçand, tifkir erdê û got;

“De vêca were û safî bike. Gotinek ya pêşiyan hinek zayendperest hebû, jê re dibêje;

Şerê ji dûr ve heta bi reşketinê ajotibû. Bi tarî ketinê re pêşmergeyan, bi suîqastê jinek navser li nêzîkê derbenda Bakur ji ranê wê birîndarkiribûn. Piştî tarîtiyê Welatê Nehdaran daqurtand şev bû berevan û ji bilî nobedaran her kes zivirîbû mala xwe.

***

Cejna Newrozê bû! Ya star, dê li weledê xwe ne dibû xweyî. Rêxistinê, li pêşya dikeye ew hefteyeke dibistan hazir dike û dixemilîne bergeşa şekrokên cejnê danîbû. Her kesê dihat, diçû dest û serê kesên di rêzê de, cejna wan pîroz dikirin û xwe tavêtin dîlanê. Ji bilî nobedar û erkdarên rojê hemabêje tevayê hemwelatiyên wargehê li cihê cejnêbûn. Bê goman yê herî şad û bexteyar zarokên rû qemitîbûn. Penca xwe li bin şkêra çeqolatên reng û reng didan û biqasî dilê wan dixwest radikirin. Ne ji bû zêde şekir rakirine kesî awrir ji wan vedidan û ne jî kevaniyên kundên bi zendan wan re bigrin û penca wan vale bikin hebûn. Girêdayî vê, ji keyfa zarokan re gotin ne dihat kirin.

Yadê Xoxê ya Gundremoyî, Fatma Bilehî, Yadê Xanê ya Hîlalî û ewqas jî bavê şehîdan di protoqola cejnê de cejinvan pêşwazî dikirin. Piştî demekî ji rêvebirên wargehê Sebriyê Ker jî hat û wekî dîkê porê li serê rêza pêşwazîvanan cihê xwe girt.

Di nav zeviya ji berya hefteyekî teqna heriyê û êdî toz jê radibe gêra govendê dor vedabû. Welatê Nehdaran, di dîroka xwe de ti carî şahidît ji dîlanek evqas biheybet re nekiribû. Refa stranbêj û refa li wan vedigerand bi zorê dengê hev dibihîstin. Piştî demekî govenda mezin reqasvan ranegirtibûn û bi dehan rêzên govendê li pey hev hatibûn rêzkirin. Mecîdê Xirbebstîkî, serê govenda Şirnexî dikişand û ya star; dibêjîqey hestî di laşê keçikan de peyda ne dibûn.

Wekî hervûşmê ji çala Sergîsê Fileh derketî, tevayê laşê wan dilerizî û leylanok têxistin gêra govendê.

Ji bû belavkirina ewrê reş û tarî yê wargeh nixwimandî, rêvebertiyê bikeysê Cejna Newrozê fik kiribû kû mîhrîcanekî jî lidar bêxe. Xwendevan û mamosteyan bi derfetên di dest de dikeyek amadekiribûn û li ser paçek capûn ‘Newroza hezar û nehsed û not û heştê pîroz be’ nivîsandibûn. Bi bin paçê di navbera du stûnan de hatî daleqandin de wêneyek mezin yê Rêber Apo û li her du aliyên wî wêneyên Mezlom Doxan û Zîlan hilawistibûn. Jixwe turnovaya futbolê ya ji heşt tîman pêkdihat ji zû ve destpêkiribû. Piştî pîrozkirina cejnê, tîmên fitbolê yên derketîn fînalê yên bihata himber hev.

Heşirbû! Bi dehan govendên cuda li nav zeviya Başûrê Nehdaran gêr vedabûn. Herkesî govenda gundê xwe direqisî, rayên stûyê stranbêjan stûr bibûn û libikên xwêhdanê di eniyan wan de dihatin xar. Dayik, bav, pîr, heval herkes direqisîn û di reqsê de sermest bibûn. Bi dengê Selîmê Ehmedê Xatoyê Nêrwehî, ji nişkan ve reqasvan di cihê xwe de qerisîn. Selîm, bi dengê xwe yê az û bilind got;

“Hevalno, niha tîmên futbolê yên derketîn fînalê yên werin himber hev. Em hemî hevalan vedixwînin temaşekirina wan.”

Temaşevan, li çar dorên sahaya li pêşya dike hatî amadekirin wekî sêncê kom bibûn. Li pêşya tîma hêza xweparastinê Hewarê Şirnexî, li pey wî Mele Nûhê Hîlalî, li pey Siyabendê Hîlaliyê qelevan ema bê lepik û Emerê Mijînî û tîma hêza xweparastinê ketibû di sahê de. Li pey tîma hêza xweparastinê tîma mamosteyan Denîzê Hîlalî li pêş, Bulendê Geverî li pey, Yaqûbê Mihemed Xalidê Şirnexî li dûv û li dûv hemiyan Silêmanê Mijîniyê qelevan ketibû di sahê de. Qelevanên pê lepik li serê rêzan û her du tîman li rex hev rêz girtibûn. Ji xeynî kite, mitên xwendevanên di tîma mamosteyan de hemabêje liber hemî leyîstvanan şalên Bohtanî hebûn. Qemîsek mil qut di ser şarwalê navran daketî de li xwe kiribûn û dîsa ji bilî çend xwendevanan di lingê hemî leyîstvanan de pêlavên mekap hebûn. Yên mekap peydanekirîn jî qerempolên nalyon di lingê wan de bûn.

Bi pişk avêtina Zahirê Serhedî yê hakem û dîsa bi dengê fîrka wî leyîstokê destpêkiribû. Xwendevanan tîma mamosteyan û tevayê wargehê tîma hêza xweparastinê destek dikirin. Belkî di jiyana xwe de cara yêkemînbû, zarok û dê û bavên xwe dihatin himber hev. Xwendevanan bi tevayê awaza xwe pesnên mamosteyan didan û dê û bavan jî heman tiştî ji bû tîma hêza xweparastinê diqêrîn.

Nîviya yêkemîn ya leyîstokê yêk biyêk wekhev xilas bibû. Di dawiya nîviya duyem de, Mele Nûh gok ji quncikê çepê nîvîkir û Hewarê Şirnexî bi serê xwe avêt quncika vajî ya qelaya Silêmanê

Mijînî. Bi wî awayî tîma hêza xweparastinê bibû yêkemîn. Dema Zahirê hakem fîrika xilasiyê lê dida, di bergeşa li ser destê wê de bîstûdu rozetên wêneyên Rêber Apo li ser wan, yadê Mewlûda Şirnexî û çend dayikên şehîdan li dûv hev ketibûn di sahê de. Destpêkê rozetên tîma serketî bi wan ve kirin û bi rêzê ve rozetên hemî leyîstvanan bi singa wan ve daleqandibûn.

Piştî nîvroya heman rojêbû. Dîsa bi jin û mêr ve wargeh qulibibû pêşya dikeyê mîhrîcanê. Pêşbirka govenda xwendevanan nû qedabû û dora beza ciwanan ya heştsed mitreyanbû. Elî filis, Salim û Serhengê Geverî bi tirimpêlan bezvanên keç biribûn xala sifir ya bezê. Du xwendavanan kurdeleya xilasekê di ketina wargehê de hişk şidandibûn. Her kesî û biteybet dê û bavên bezvanan, bêhna xwe girtibûn û çaverêyî encamêbûn. Dazdeh keçên hevteng, bi fîrîka mamosta Muhemed Nûrî yê Hîlalî dest bi bezê kiribûn. Piştî pênçsed mitreyan Xezala Muhemed Xalid da pêş û êdî pêşvantiya xwe neda kesî. Kengê keçika esmer, kêmek tijî û xweşik kurdeleya yêkemîntiyî qetand û derbaz bû, xwe avêt himbêza dayîka xwe ya bi kelecan li pişt kurdelê sekinî.

Piştî bezvanan jî xelatên xwe girtin, pêşkêşvan bi awazek kelecan barkirî anonsa "govend serbeste" kiribû. Dema her kesî di govendê de hunerê xwe pêşkêş dikir Xezala di bezê de bûyî yêkemîn, bi keyf û kelecanek bê pîvan pêlava belekok ya xelat girtî bi ber singa xwe ve şidandibû û ber bi mal ve dibezî.

Jixwe şêwaz û rêbaza wê komika berxwedanvan her tim wusabû; herkû êrîşek giran re rû birû dima, bikeyf û gêwilek mezin hewldida bandora êrîşa di ruh de hatî çêkirin berteref bike. Bi alan, dîlan û tilîlî bersiva hemî êrîşên xayîn û xêr nexwazan didan. Di wan şertan de xweparastin, bê minet li ser lingan mayîn ne karê her bav egîdîbû. Divê tu ji her kesî zanetir, rêxistîtir, wêrektir û ya ji hemiyan girîngtir jî bawermendek bê dudilbî.

## Dîlên Êranê

Çaryêka destpêkê ya meha Nîsanê bû. Demsala Biharê ji dilê xwe re deşta pîroz xemilandibû. Nîsan û sîneman pala xwe dabûn binevşên terezin û bejna xwe liba dikirin. Bêhna kulîlk û hendekokan her der pêçabû. Tirhên dara pîroz bejin dabûn û kirasek kesk wergirtibû. Dara Sing û Berhîmê Ling, li ser textê xweyê Stiyan bi wezbetir rawstabûn. Ji bû çiyayêyan, hatina biharê wateyek pir cudatir dihilgirt. Ema wê biharê, ji bû rêvanên wargeha zorava wateyek hê cudatir hildigirt û avêsê hîviyên nûbû. Bi dehan malbatên di bin çadirekî de dihewan û toxtek xewa şevan li wan hasretbû jihev cuda bibûn. Malîvanên xweyî çadir, êdî xwe bê minet

bi çadirên xwe re vedizîlandin û bê minet lingê xwe dirêj dikirin. Yên bê çadir jî hilperijîbûn pesarê jor, wekî kuna kurîpeşkan ji xwe re di pesar de erd şeqitandibûn û qetek naylon di ser de nixwimandibûn. Êdî ne derdê lehiya bide bin wan mabû û ne jî ya hêwîtiyê. Bêhna axa şiloke kêmekî acîzker jî be, rewşa wan ji dûh pir xweştir û baştirbû. Ya ji hemiyan şadkertir jî sopeyên eledînên bêhnek kambax ji wan difûra danîbûn aliyekî û hemabêje heta zivistanek din û li warek din zêde ti pêwîstî biwan nemabû. Jixwe heta zivistanek din jî xwida delîle. Kê sax û kê mirî, ne belîbû.

Di bêhna heyî de pêwîstiya herî zêde xwe dipesart, girşên bin naylonanbûn. Her malbata ji hev cuda dibû, di pesarê jor de ji xwe re biqasî mezelekî erd dikola. Ji berkû di cihên kaş de erd dikolan, sê aliyê mezelê kendalên axêbûn û aliyê pêş vekirî dima. Ji bû bi nalyon an jî bi paçekî banê mezela xwe binixwmînin pêwîstî bi girşekî û stûnekî hebû. Piştî pêşmergeyên PDK'ê Ehmet û Muhemedê bira serjêkîrîn û serê wan birîn deriyê Birahîm Xelîl firotin Turkan, êdî ji bû stûn û pêwîstiyên din gel zêde belav ne dibû. Heke li gel her tiştî kesnan bixwestan herin jî rêvebertiyê destûr nedida. Û cihên gelê wargehê bikaribe girş û stûnan jê peyda bikin jî di bin destê PDK'ê de bûn.

Nîvro nû wexirîbû. Li ser rêya qîr ya di nav wargehê re derbaz dibe, tu xweliyê hilbavêjî ji mirovên hûr û gir, jin û mêran li erdê nediket. Jixwe gulotana liber siha dara pîroz, şilxa mêşên hingivî tanî bîran. Li pesarê Rojhilat, li cem goristana ji bîst tirban zêdetir dihewîne komik bikomik mirov rûniştîbûn û stranç dileyîztin. Zîna Hevlerî, li derketina Başûr ya wargehê jipiya sekînîbû û zîk li aliyê Şêxan dinêrî. Dibêjîqey çaverêyê kesna an jî tiştekîbû. Rêberê rêya Gara Emerê Batûyî, ji navenda hêza xweparastinê derket û bêkû li derdora xwe binêre yêkser berê xwe da mal. Hemabêje çaryêka zelam û ciwanên wargehê rijabûn pehnava pişta wargehê û kom bikom dileyîztin. Pehnava diketa Başûrê Rojavayê wargehê, li derdor erdê fer yê ne çandîbû. Pehnava kûr, di navbera girê navenda toxaya leşkerî û sirtê ber bi Baedrê ve dirêj dibe de cêh digirt. Ji berkû rastika fer ya beyarbû, ciwan li wêdê gok, sêtik dileyîztin û wekî din di her temenî de mêran li wêdê xwe bi leyîstokekî mijûl dikirin.

Cemalê Hestpistî, li pesarê Rojhilatê girê toxayê qormê darek çam bilez da ber dev dasikan û hê nîvê darê ne birî bi gewdeyê xweyê gir dar tehf da û şkand. Hê zelamê por xemor nû dar dabû erdê, du leşker di jor de bezîn û dan ber qêran. Cemal, çam bi çeqîlên wê ve danî ser milê xwe û di ser wargehê de revî. Serê wî yê nîv binîv spî bûyî û pora rengek hişînîve girtî bi nav çeqilên darê re bi zorê dixwiya. Hê zelamê di bin darê de tewayî nû gihatbû

hindama rê, Zînê bi dengek aciz û rexne barkirî got;

“Hevalê Cemal, ya tu dikî ne exlaqî ye. Divê em ji bû tiştek evqas erzan semaxa xwe li hember xelkê ne şkînin.”

Cemal, bêkû leza lingên xwe sist bike, bi devoka Torikî bersiva Zinê da;

“Erê diya mînê! Tu û mêrê xwe, xwe di çadira spî de vezîlînin. Bila ez û zarokên xwe di wê kuna kurîbehşik de, di nav axê de bigevizin.”

Dr. Medya Alemanî, bi çend hevalan ve temaşeyî Cemal dikirin. Piştî Cemal ji wan bûrî, bi dengek tinazker got;

“Hevala Zînê, ew qesra te ya spî li kûdê ye?”

Zîna jixwe esmer û ji aciziya gotinên Cemal esmertir dixwiya, qotiya çixarê ji kûrika êlekê xwe yê bi ser kiras de wergirtî derxis û got;

“Hevala Medya, Cemalê Hestpistiye. Hema çi tê ber deva wê dibêje.”

Piştî Cemal gihat nav malan, her du leşkerên li dûv bilez ber bi navenda toxayê ve zivirîbûn. Zelamek kiras spî û ji hemî tevgerên wî kifşe fermandarek paye bilinde, li derê toxayê çaverêyê leşkeran radiwesta. Fermandarê kiras spî, bihêrs tiştek ji leşkerê nû ji pey Cemal zivirîn re got, çend leşkerên din jî tevlî wan kirin û berê wan da koçberên li pehnava Rojava dileyîzin.

Komika wekû milîsên Gabarî dihatin naskirin, li aliyê dawiya pehnavê kêlûvêl dileyîstin. Leşkeran dor li wan girtin û bi gefa çekan xwestin wan bibin toxayê. Hinan ji wan gotin; “ne pirsgirêke em herin” hinan gotin; “em neçin” serî werhasil di nav xwe de gotina wan nebû yêk û li pêş şirteyan ketin û hawaketin girê toxayê.

Girê toxaya leşkerî li ser hatî avakirin, ji bênik û kurbanên wê diyarbû berê zeviya kurdaye. Fermandar li pêşya navenda toxayê ya ji kuxikekî pêkdihat, di bênikek fireh de sekinîbû. Li derdora wî xelekek ji şirteyan hatibû çêkirin û fermandarê ji her halê wî kifşe pir acize, di nîvê xelekê de çaverêyê hatina girtiyanbû.

Leşkeran, li pêşberî fermandarê kirasek spî bejna wî ya wekî qurmê darek çinar dinixwimîne, Gabarî rêzkiribûn. Bi nîşana serê fermandar leşkerek derket pêş û pozîsyona şînavê girt. Bi lekim û nîşanên leşkeran, fermandar xwest girtî jî heman pozîsyonê bigrin û şînavan bikişînîn. Di nav girtiyan de çend kesan hewl dabin wê fermana hisyetşkên pêkneynin jî leşkeran bi qêr û gefên xwe sehwek kilamet çêkir û di nav çend saniyan de ji bilî Gabarê Gabarî hemî girtiyan heman pozîsyon girtibûn. Ji bû girtî daxwaza fermandarê Erep pêkneyînin, Gabar xwe neqayîl kiribe jî beyhûdebû. Girtiyan ji zû ve pozîsyona şînavê girtibûn û  xwe neqayîlkirina Gabar, tenê bibû sebeb leşker êrîşê wî bikin.

Bi nîşana çavan leşkerekî miqes raberî fermandarê keçel û lêhv gilol kir. Fermandarê pidû hişînê navser, devê miqesê vekir û avêt pora Gabar. Gabar, bi stûkê destê fermandarê jehir ji dêmê wî dibare re îşk girt, destê wî bada û di şûn de tehf da. Fermandarê qerase veşewişî û qonikî li nav giyayê boş ket. Bi ketina fermandar re bi dehan leşkeran xwe avêtin ciwanê netebetî û dan erdê.

Fermandarê qona kirasê wî ji giyayê biharê hişîn biyî, bi arîkariya leşkeran rabû ser xwe û li raser neyarê xwe sekinî. Ciwanê di bin gulotana şirteyan de jî natebite, her çiqas hewlda nehêle guliya wî biqusînin jî li ser her mil û teşkên wî ji yêkî zêdetir leşker rûnişitibûn û hişk girtibûn. Leşkerekî bi guliya wî re hişk girt û serê wî bi erdê ve şdand. Fermandar dev miqesek li guliya wiya tenik da û bifermana fermandar rakirin jipiya. Dema leşkeran hewl dida çavên Gabar bi cemedaniyek sohr girê bidin, awrên wî li hevalên wî yên bê mehwer şînavan dikişînîn ketibû.

Di nav kesên şînavan dikişînîn de kesê herî yêxtiyar Mele Xelîlê Dêrşewî bû. Zelamê yêxtiyar û cara ewil bi teknîka şînavê re hevnasbiyî, nizanî şînavan bikişîne. Dest û lingên xwe qerastibûn erdê û qona wî li jor disekinî. Leşkerekî pêl pişta wî dikir û dixwest kemaxên xwe daxîne rasta pişta xwe. Piştî çend lekim, kulm û pehînan girtiyê neqayîl, li tirimpêlek bê merîs ya leşkerî siwar kirin û birin.

Tirimpêla ji aliyê bajarê Şêxan ve ji toxayê derketî, qederekî bi rêya qîr ve meşî û ket ser rêyek ax. Kêmekî di rêya ax de çû û berê xwe baskî Nehdaran ve zivirand. Gabar çav girêdayî jî be aqar nas dikir û bi awayek hêsanî dikarî berê tirimpêlê texmîn bike. Dema tirimpêlê berê xwe bibaskî wargehê ve zivirand, girtiyê bi zincirê rexê tirimpêle ve hatî girêdan bêhnek kûr kişand û ji xwe re got; “yê min bibin teslîmê rêvebertiya wargehê bikin.” Kêmekî jî be wê zenê ew rihet kiribû. Ema wekî texmîn kirî derneket û tirimpêlê bicaran ber guhert û li cihek ji wargehê ne dûr sekinî. Dengê vebûna deriyek hêsin hat û tirimpêl ket di hewşekî de. Bi arîkariya du leşkeran girtî ji sandoqa tirimpêlê daxistin û bilez di dirînceyan de birin xar. Piştî dirînceyên oliyekî xilaskirin di holekî de meşandin û li dawiya holê rawestandin. Bi şeqênek dijwar deriyek hêsin vebû û bi vebûna derî re çavên Gabar jî vekirin, lekmek hişk lêdan û avêtin di hundir de.

Bi tehfdana leşkeran re Gabar, li nav guhê sê, çar kesan ket û li nîvê mezela nivz rep sekinî. Piranî kesên di mezelê de jipiyabûn û bi dehan çavên kûr li biyaniyê nû hatî dinêrîn. Awrên Gabar, li kesê tam li pêşber û bi hêstek zarokî di beşişe ve qerisî mabûn. Çavên kûr, di rûyê çerm û hestî mayî de wekî hewtikan dixwiyan. Çermek tenik, zelal û zer gurmikên rûyê wî nixwimandibûn. Riha firk, navika zelamê biqasî pencekî derbaz kirîbû û çend dinanên zincarek hişîn

girtîn bi pidûyên helayî ve daleqayî mabûn. Nîvê serê mirovê di nav cilên xirarî de hûrtir dixwiya rûtbû û biskên bi patik û dorguhên wî ve mayîn li bin kurtikên kaban diketin. Xweza dizane, zelamê dema li ser kewna xwe kesek bejin navînbû, di ser hev de qumişîbû û bibû pencek. Bedena toxtek goşt li ser nemayî, di nav cilên kisikî û renk xak de wunda bibû. Ciwanê şaqis, ji çavên xwe yên wî dîmenê kilamet qeyd dikin bawer nekir û ji xwe re got;

“Çavên min yên demekî gîrêdayî mayîn, xeyalan dibînin.”

Çavên xwe yên ji wan ketî şikê ferikandin, serê wî bê hemd heja û dubare vekirin. Çavên wî bi lingên kesek din ve cemidîn. Neynokên wekî çelakan bi serê tiliyên lingek piçûk ve daleqayîn jî tenik û spîçelokîbûn. Gabar, bilez û şaqis çavên xwe li ser lingên zelamên dirêzê de jipiya sekinîn û bi hêstên zarokî li mêhvanê xwe dinêrin gerandin. Neynokê tiliyên ling û destan wekî nikilê teyrê dubirak dirêj daleqabûn û bibûn çelak.

Wekî nû hatibe ser hişê xwe, veciniqî Gabar. Li cihê malîvanan bi nîşana destan nîşakirî, ji berya bi rûnê temaşekir. Spêhan, wekî kunmûriya bêndera nîskan li erdê reş dikirin. Ji kundka rûnişt û pala xwe da dîwarê bêhna hêwîtiyê jê difûre. Kesê li ber dilxwede mêzeyê bi dîwar ve sekinî û pê kevçikek dar xwarina di qoçxaneya ji dohn û qirêjê reng guhertî de tev dide, bi nîşana destan ji mêhvan xwest xweş rûnê û çend libên baqilên li ser tebaxa qazyaxê nû kel pê hatî bi kevçikê dar raber kirin. Gabar, ev hêlwesta mêvanperwertiya Rojhilatî, bi tevgerek kubar red kir û jidil spas kir. Dema aşxanevan kevçikê tijî baqil di şûn de dikişand, zelamê li rex mêhvan destê xwe avêt baqilan û çend libên ketîn di desta de bilez avêtin devê xwe yê bê dinan. Aşxanevan libên di kevçik de mayîn berdan qoçxanê de û kevçikê vale danî serê wî yê keçel.

Sedem çiye ne dihat zanîn ema Gabarê di jiyana xwe de pir ne aram, di wê çalê de û di nav wan mirovên nîvhiştî de pir aram û rihet dixwiya. Dibêjîqey ya jiyan dibe ne rastiye û li ser dikê şano bi konsantreyek kûr rol dileyîze. Carna ji aramtiya xwe heyîrî dima û wate ne dida wê dilniyatiya dil û mejiyê wî tevizandîn. Di wê mezela bi qasî neh, deh mitre dam de, tam bîst û çar zilam diman. Ew jî li ser, bîst û pênc kes. Gabar, xwe ji wê şaqistiya destpêkê şemitandibû û li bîst û çar dîmenê mirovên wekî meymûnan ema rûyên wan ji guneh, xezeb û ji kînê maliştî dinêrî. Ji kesê li beramber rûniştî, serê biskên wî yên firk li erdê kombûyîn û dêmê lewaz di nav riha tenik de wundabiyî pirsa; “hûn kêne” kir.

Zelamê temenê wî ne bi ser çilê re ema, wirarên hîviyê di bîbûkan de ne mayîn, bi hêlwesta zarokek fihêtokî di wateya, “ez fêhm nakim” de milên xwe hildan û wekî berdilê mêhvan ve here her du destên xwe ber bi ezmanan ve hildan jor.

Mêhvan, bi awayek ecêb mayî li malîvanên xwe dinêrî. Her malîvanê çavên wî û mêhvan li hev diketin, bi hêlwestek zarokî dibeşişî û çavên xwe direvandin. Mêhvan, bi rik û biryar, mereqa ev "kêne" dikir. Li kesê li tenişta xwe, dapên reş di por û riha wî de ne mayîn û wekû temen ji yên din kêmekî mezintir dixwiya ema, biqasî pencekî lêhatî zivirî û bi arîkariya nîşanên destan got;

"Hûn kêne? Kurdin, Erebin? Hûn çima û ji kengê ve li vêdêne?"

Malîvan, bi tiliyên her du destên xweyên zirav, rayên wan jî helayîn û neynokên dirêj wekî çelakan bi wan ve daleqayîn nîşana hijmara hijdehê kir û bi dengek wekî zûrêna meymûnan got;

"Êran.. Êran, êsîr!"

Bi bihîstina wê gotinê re di mejiyê mêhvan de erdhejek nû destpêkiribû. Wate malîvanên wî dîlên Êranî yên şerê Êran û Êraqê bûn. Li gor îşareta malîvan, hijdeh salbû wekû dîl di destê artêşa Êraqê de bûn. Wate di sala duyemîn ya şer de dîl ketibûn. Di ser rawestandina şerê Êlûna 1980'ê destpêkirî û Tebaxa 1988'ê qedayî re tam deh sal derbaz bibûn. Mereqa di derbarê wan mirovên hemabêje temenê wan di navbera çil, çil û pênc salan de û axaftin û tevgerên wan ji mirovan zêdetir nêzîkê yên meymûnan mejiyê mêhvan dagir kiribû. Ema, êdî lebeta wan ya axatinê bi ti zimanî peyv çênedikirin û nîşanên dikirin jî tiştek îfade ne dikirin.

Dema firavînêbû. Aşxanevan bi dengek ji peyvên mirovan zêdetir dimîne zûrêna meymûnekî, hemî malîvan rakiribûn jipiya. Ji rêzê ve her kesê dora wî dihat diçû ber qoçxanê, her du destên xwe vedikirin û erkdar tijî kevçikê dar baqil berdidan di destê wî de. Kesê firavîna xwe digirt bilez ji rêzê derdiket. Her du destên xwe dibirin ber devê xwe û bi dimohrî baqilên xwe dixwarin. Dibêjîqey ji xelayê rabibûn û jixwe xela herî mezin jiyan dibûn. Avdeşoya ji nav tiliyên wan diherikî di paşila wan de dadiket xar. Ava di zikê wan de diherikî li ser maldoxîna şalê nîşana dîlîtiyê kom dibû û navrana wan şil dikir.

Her kesî firavîna xwe girtibû û xwaribû jî. Ema ji bû firavînê mêhvan, ji cihê xwe ne lepitî. Aşxanevan bi hêlwestek pir jidil kevçikê dar tijî baqil kir, anî û bisiyanetek mezin raberî mêhvanê xwe kir. Mêhvan dubare bi heman kubartî û siyanetê dîsa teklîfa aşxanevan red kir. Nayê zanîn ema, belkî jî aşxanevan fikirî be, mêhvan xwarina wan na ecibûne û li ber xwe ketibe. Kevçikê tijî baqil rûkir di qoçxanê de, her du destên xwe raberî xweda kirin û wekî meymûnan zûrî. Ciwanê girtî ji tevgerên aşxanevanê dîl pir hêstdar bibû û çavên wî yên dîmenan mijdar qeyt dikin tijî av bibûn û hêstirek gir rija xar. Rabû ser xwe û çû cem aşxanevan. Bi nîşana destan û memikên rûyan xwarin jê xwest. Di serî de aşxanevan,

şadîtiyek ne asayî dêmê hemî endamên malê pêçabûn. Aşxanevan kevçik tijî baqilkir û raberî mêhvan kir. Mêhvan kevçikê tijî baqil ji destê aşxanevan girt, nîvî rûkir di qoçxaneya çaryêka wê tijî baqil de û çend lib berdan di destek yê xwe de. Piştî mêhvan jî firavîna xwe xwar çixara xwe derxist. Hifdeh çixare di pakîta wî de mabûn. Rabû ser xwe, çixareyek ji xwe re hişt û şazdehê mayîn li ber malîvanên xwe gerandin. Heşt kes bê çixare mabûn û wan jî bidorê mizên bîrîbarkirî li çixareyan didan.

Dûyê mezela piçûk pîncdanyî, di kulekoka li milê jor ya deriyê hêsin re wekî berxêliyê diherikî. Kesekî ji derve ve derî da ber derban û kir qêr! Tenekeya li ber kulekoka derî hilda û li hundir nêrî. Leşkerê nû fêhmkirî dûyê çixarê ye, deriyê hêsin bi hêrs vekir û bi jop ket ser kelaşê dîlan. Leşkerê bedena îşlekê wî vekirî û sik got; "we çixare ji kû aniye" û bi jopê xwe bê mehwer mirovên xwe di ser hev de kirîn qomş di hingavtin.  Gabar, bi hêlwestek bê dudil bersiva leşker da;

"Ne deyne wan, çixare yên minin!"

Koçberê bi Kurdî bersiva şirteyê Ereb dayî dibêjîqey zêde bala wî ne kişandibû ema, dîsa jî wê tirba tarî de dengê wî yê mûxalîf têra hilciniqandîna zelamê çele xwehrî kiribû. Leşkerê ti carî li rasta bertekek dijber nehatî ji cêh kurveda Gabar. Gotina xwe ya  "dûxan memno'o" dubarekir û  jopê xwe hilda jor. Koçberê girtî, ji heva ve bi stoka destê leşkerê ji hêrsa kef û kinc bi lixabên ketî girt û çavên tevayê dîlan bi destên ji heva ve dilerizin ve daleqayî mabûn! Çavên Gabar û leşker li hev qerisîbûn. Ji hêrsa leşker dilerizî ema, Gabar aram û rihetbû. Piştî kêmekî destê ji heva ve di destê Gabar de sistbû û leşker destê xwe danî. Ji Gabar re got;

"Tu kêyî, li vêdê çi dikî?"

Gabar, bi hêlwestek jixwe bawer ema aram got;

"Hizbil Omal (Partiya Karker)!"

Bi hêlwestek li berxweketî û bi dengek lêbûrîn barkirî şirte got;

"Ya..! El efo, el efo" serê xwe hejand û weki ji xwe re baxive di ber xwe de got;

"Hizbil Omal mişkûle, mişkûle (partiya Karker pirsgirêke pirsgirêk)" û bi hêrs berê xwe da dîlan û bi dengek zirtker got:

" Ji van re çixare qedexeye ema, ji te re serbeste."

Gabar, bi hêlwestek tevzker qalikê pakîta xwe ya vale nîşa kir û got;

"Jixwe xilas."

Demjimaran hev tajotin û mêhvan û malîvan bi hemî semîmiyeta xwe bi hev re sohbetek ezop dikirin. Ema di rastiyê de, zêde tiştek jî ji hev fêhm  ne dikirin. Mêhvan, li hember malîvanên

xwe ewqas rihetbû dibêjîqey bisalane bi hev re jiyan dibûn. Dîsa aşxanevan heman dengê zûrênê derxist û dîsa herkesî li pêşberî qoçxaneya qirêj rêz girtibû. Vê carê mêhvan jî di rêzê de cihê xwe girt, behra xwe ji baqilên ji firavînê mayîn stand û heman bi şêwazê malîvanan xwar.

Piştî şîva xwe xwarin qederekî, Gabar li demjimara xwe ya reşa Qasio nêrî. Demjimarê bîst û şeş deqîqe nîşan dida. Bi lê nêrîna wî re awrên mereq barkirî yên hemî malîvanan zivirîbûn ser demjimara reş. Mêhvan destê xwe hilda û hêjmarên li ser demjimarê yêk û yêko nîşa wan kirin. Dema mêhvan hêjmarên li ser demjimarê nîşa malîvanên xwe dikirin, deriyokê li ser kuleka bi deriyê hêsin ve vebû. Ema kesê deriyok vekirî ne xwiyabû. Bi vebûna deriyok re yêk ji malîvanan rabû, serê xwe kir kuleka piçûk de  û wekî bi zûre dengek derxist. Yêk dinê li piş yê serê wî di kulekê de sekînî, bi awayek bê sebir dixwest serê xwe derxîne û ew serê xwe bêxe di kulekê de. Kir û nekir kesê ewil serê xwe êxistî kulekê de dernexist. Hema bi dawiya wî re girt û xwe pêve danî. Mêhvan jî di nav de hemî kesên li wê de, bideng kenîn.

Nîvê şeva tarî nû wexirîbû. Guriya di şûşeya fanosa lewitî de direqisî zerhimîbû û têra ronahîkirina mezela tirp ne dikir.  Ti kes ne nivistîbû. Malîvanan hê jî bi mereqa gava destpêkê li her derê mêhvanê xwe dinêrîn. Bi teybet jî her bêhn yêk dihat û li demjimara wî temaşe dikir. Kesê li tenişta mêhvan û ji gava destpêkê ve bi mereqek mezin ya siyanet bakirî li mêhvan dinêrî, destê xwe da cihê dev miqesa li guliya wî û wekî bêje, “çi ji vêdê hatî ye” dengek derxist.

Mêhvan, bi arîkariya nîşanên destan got;

“Yên we li vêdê digrin wusa kirine.”

Malîvanê eniya wî rût û pora wî ya tenik wekî şebê, destên xwe raberî xweda kirin û bû “mîne-mina” wî.

Bi duayên malîvanê asarê dinanan di deva de ne mayîn re zingên ketibû deriyê hêsin! Leşkerekî serê xwe di derî re dirêjkir û bi dengek bilind bangkir û got;

“Hizbil Omal, Hizbil Omal te’el (Paritya Karker, were)!”

Bi bangkirina leşker re çil û heşt dest rabibûn jor û hemiyan ji mêhvanê xwe re dua dikirin.

Singa Gabar û leşker di derî de li hev sekinîbû. Wekî Gabar tiştek ji bîrkiribe vesekinî û tişta jibîrkirî hat bîrê. Ji dizî leşker ve qarîşa demjimara xwe vekir, berda di destê malîvanê li piş wî sekinî de û derket ji derve. Leşkerên li devê derî rawestayîn dubare çavên wî îşk girêdan û birin.

Du leşkeran bi lekim û tehfan Gabar, bidirinca danê sibehî di tê de anîn xar re hawa êxistin. Li tirimpêla motora wê hê jî

dixebite siwarkirin, birin pêşya sindoqê û dan rûniştandin. Û bi pê re jî tirimpêl birêket. Veqetînekî bala girtî kişandibû; dema girtibûn bi zincîrek stûr destê wî bi sindoqa tirimpêlê ve girêdabûn. Niha destên wî serbestbûn û evê cudatiyê xweşvîntiyek xef li hinavê wî belavkiribû. Ji dizî ve kefiya ser çavên xwe kêmekî sistkir û hilda jor. Di paşiya sindoqa tirimpêlê re ji dûr ve çend ronahiyên zer û zexel dixwiyan. Dîsa ji dûr ve yêk-du caran dengê bangdana dîkekî bihîst. Di reş tariya şevek zilomat de çirûskek herî piçûk jî hîvî barkirîbû. Dengên dîkên nîvê şevê ti carî li guhên Gabar evqas xweş ne hatibûn.

Piştî tirimpêl ji dîlxaneyê derket pêncî mitreyan, gihatibû rêya qîr. Kengê tirimpêlê berê xwe ber bi Başûr ve zivirind û ket ser rêya qîr Gabar aqar naskiribû. Pêncsed mitreyan nêzîkê wargeha xwe bû. Ema berevajî wargehê berê tirimpêlê li Şêxan bû û ji xwe re got;

"Heke tirimpêl ji duryana toxayê ber bi Şêxan ve bibûre, ezê xwe bi awayekî ji tirimpêlê bavêjim û birevim!"

Wekî bizivire tirimpêlê li dûryana toxayê sistkir û di cêh de ajotvan pêl benzînê kir û bilez ber bi bajarê Şêxan ve ajot! Dema tirimpêl ji nişkan ve bilezketî leşkerê li raser girtî û ji piya disekinî di ser Gabar de ket û kefiya li ser çavan daket ser navmilan. Ji bû bala leşkeran ne kişîne kefî hilda ser eniya xwe û êdî çavên wî bi timamî azadbûn.

Kengê tirimpêl gihat rasta aqarek kort û bel ji xwe re got; "tam cihê revê ye." Ema tirimpêl ewqas bilez diçû cesaret nekir di wê lezê de xwe ji tirimpêlê bavêje. Di rastî yê de, di biryara revê de ne safî bû Gabar. Gelik sebeban bi hev re êrîşî mejiyê wî dikirin û di gotin; "pêwîstî bi revê nake, jixwe yê te berdin" hebûn. Ema, rêya zîndanên Mûsil û Bexdayê bi Şêxan re derbaz dibû û vê jî zeravê wî diqetand.

Tirimpêlê li derbendek leşkerî kêmek sistkir û ket di nav bajarê Şêxan de. Bajarek tarî, sar û sikbû Şêxan. Ji çend seyên peritî û li ser wan sergûyan nir nira wan zêdetir jîndar di bajar de ne dixwiyan. Piştî tirimpêlê di bazara bajar ya tarî de fitlek da xwe û ket di nav zikakên taxekî de. Piştî çend zikakên kurt li xwe badan dubare zivirî ser rêya diçe Nehdarê. Gabar, nefesek kûr kişand û ji bû xwe ji tirimpêlê ne avêtiye jidil spasiya Stiya mak kir.

Tirimpêlê li duryana toxayê sistkir, ji rêya mak ya diçe Nehdarê veqeta û hewaket. Li heman cihê girtîn û li tirimpêlê siwar kirîn peyakiribûn Gabar. Çawîşek turkomenê simbêlên wî wekî dûvê sa di êxirên deva de têne xar ji pêşya tirimpêlê peya bû û hat cem girtî. Kefiya dilxwede bi çavên wî re girêdayî vekir û bi turkomeniyek zirtonek jê re got;

"Nîha emê te bibin cem Zaîm. Tuyê di amadebaşiyê de

bisekinî û ew çawa bixwaze tuyê wusa bikî. Temam, te fêhmkir?”

Li ser gotina çawîşê turkomen, beşişandinek tevzker rûyê girtî pêçabû. Her du destên xwe kirin di kûrika pantorê xwe de û got;

“Na! Mîn fêhm nekir! Ez ne leşkerê te û zaîmê te me û ne mecbûrim li pêşberî we bikevim di amadebaşiyê de û tişta hûn bixwazin bikim.”

Turkomenê zêde guhdarî Gabar nake û bi awayek safî jê fêhm jî nake, tiliya xwe repkir û bi şêwazek tevzdar zirtên xwe ajotin;

“Emê li wêdê halê te bibûnin” got û bi bez ber bi lotkeya girê di navbera toxayê û wargehê de hewa êxistin.

Mila toxayê, ber bi Nehdarê ve her kû diçû bilindtir dibû û di lotkeyê de dibû girek tûj û bilind. Li ser nîvê gir rastikek biqasî du kulavên mîranî hebû. Fermandarê kiras spî, di nîvî rastikê de sekinîbû û di bilindahiya gir de wekî teşabetekî dixwiya. Neh, deh leşkeran çemberek teng li dora zaîmê xwe pesartî kupalê eynzeranî girtibûn. Çawîşê turkomen, girtî li pêşberî Zaîmê serê wî yê keçel di bin elenda heyvê de diteyîse sekinand û silavek leşkerî da.

Bi sekinandinê re, girtî her du destên xwe êxistin di kûrika pantorê xwe de. Çawîşê turkomen, bi hêlwestek hêrsdar destê wî ji kûrikan kişandin û bi teniştê ve şidandin. Ev tevgera bi caran hatî dubarekirin, sebra Tirkomen qedandibû. Li pêşberî fermandarê bi kîn û xezeb li girtî dinêre, Çawîş destê girtî dertêxist û wî dubare destên xwe têxistin di berikên xwe de. Çawîş êdî çar jê nekir, destên wî bi teniştê ve şdandin û demekî bernedan. Evî dîmenî rûyê bi girik û dolik yê fermandar kêmekî beşişandibû.

Bi nîşanek ya destê fermandar leşkerek derket pêş û waziyeta şînavê girt. Fermandar bi serê xwe ferman da girtî û xwest ew jî heman pozîsyonê bigre. Girtî serê xwe hejand û nîşana ‘hergîz nakim’ kir. Li ser rikdartiya girtî, rûyê reşê qermiçî ji acizî rengek hişînî ve girtibû. Kupalê xwe da dest leşkerekî, keleşkofa şoreşî ji dest girt, emniyeta wê vekir, kaşe kişand, lib bir ber û berê lûlê da depê singa girtî û qêrek dijwar ya wekî orêna gayekî jê bilindbû.

Girtiyê xwîn di dêmê wî de nemayî, sekna xwe xira nekir. Her du qumçeyên jor yê qemîsê xwe vekirin û bi her du destên xwe bedena xwe tazîkir. Lûleya keleşkofê li nîvê singa tazî dinêrî êdî. Ji hêrsa destê fermandar dilerizîn û bipêre çeka di destan de jî. Awrên fermandar û girtî li hev qerisîbûn û jiyana Gabar bi serê tiliya reş ya zelamê yêxtiyar ve daleqayî mabû.

Leşkeran hewl da tişta fermandar dixwaze bi zora fizîkî bi Gabar bidin kirin ema, fermandar destûr neda û dixwest bitirsê bide kirin. Fermandar çend qêrên din yên dijwartir dan û wekî

nîşan bigre berê lûleya tifeka xwe da eniya girtî. Ji dehê bi paş ve dest bi hêjmartinê kir.

"aşre, tis'e, semaniye, seb'e, sitte, xemse, erba'e, selase, isnên…!"

Lûleya tifeka zelamê reş, li nava her du çavên Gabar dinêrî û awrên wî bi devê wî hêsinê sik ve daleqayî mabûn. Dinanên rizî tilsimek tevzdar li dêmê di bin elenda heyvê de diteyîse û lama xwe bi qontaxê ve şidandî bar dikir û bi ser sihika keleşkofê re mergên girtî dihingavtin. Dunya gewrik, jiyana têr kaş û evraz bi teşbîha wêneyek mijdar li raser sêhka tifekê bilind dibû û ji nişkan ve li ber çavan dişemitî. Êdî pev nedihat tiştekî bihizire Gabar. Mejî qerisîbû û suweyda dil jî li hewarê ne dihat. Rûyê bê merîs yê celad û lûleya sik ya wê amêra mirinvan jî di nav de, her tişt mijdar û şêlo dixwiya. Du alîteya mayîn û nemanê wateya xwe ji zû ve wundakiribû û jiyan li ser lingê mirinê wedişewişî.

Dema zilamê Ereb hêjmara ji dehê ber bi jêr ve dihêjmart, ji nişkan ve li cihê zilamê yêxtiyar Merwan dabû der! Wekî her tim bejin û bala wî bicilên Bohtanî (Gêrîla) pêçayîbûn. Rextê tekûz û şidhayî li ser şûtikek belekzer disekinî. Bi newqa çeka xwe re girtibû û bi awrên yar barkirî li Gabar dinêrî. Dengê "Bijî Serok APO!" yê Merwan û şeqêna tetikê çeka fermandar tevlîhev bibûn! Bi ketina tetik re dîmenê Merwan wunda bibû, fermandarê dinan rizî bideng dikenî û hê jî  nefesa Gabar dijenî.

Êdî awrên fermandarê Ereb ji kînê hatibûn maliştin. Bi çavên şaqis ema heyrantiyek mezin li Gabar dinêrî. Li leşkerên derdora xwe zivirî, girtiyê rep disekine nîşankir û bi erebû tiştek ji wan re got. Tifeka di destê xwe de da xweyê wê, hat û eniya Gabar maçkir! Destê xwe li pişta da û got;

"Efiye, efiye Hizbil Omal betel, betel (aferî, aferî Partiya Karker lehenge, leheng)!

Hêjî duvajoyên erdheja di hinavê Gabar de pêkhatî, dewam dikirin. Ema bi dewla serê Merwan wekî bistek hêsin li cihê xwe rep disekinîbû. Nefesek kûr kişand û qerîsokê zimanê di dev de qerisî berdabû. Destê xwe da devmiqesa li guliya xwe û ji Zayîm re got;

"Te çima guliya min qusand?"

Fermandar bi beşişandinek lêbûrîn barkirî û bi nîşanên destan got;

"Pirça xwe bide cilêdê, pora teya hemiztir û xweşiktir were!"

"Ne bi zora te, heke bixwazim ezê bi viyana xwe wê bikin. wergerekî bîne, ez dixwazîm bi te re baxivim."

Zilamê Ereb, ev pêşniyara girtî bi arîkariya zimanê nîşanê kirî jidil pejirandibû. Gabar, çawîşê li tenişta xwe nîşan da û got;

"Ev turkomene, dikara tercimantiya me bike."

Ji bû esehkirinê, fermandar berê xwe da Çawîş. Çawîş, lingê xweyê rastê hişk li erdê da û di wateya ez 'zimanê wî nizanim' de got;

"La Seydî (na fermandar)."

Fermandar, ji leşkerên li derdora xwe re got;

"Ji min re leşkerek bi Kurdî dizane peyda bikin."

Du leşkeran xwe di jor de avêtin û piştî çend deqîqeyan bi kesek sist, leq û ji hemî halê wî kifşe kurdê gundek yê derdore anîbûn. Piştî pirsa fermandar, wî jî lingê xwe li erdê da û got;

"La seydî."

Fermandar li Gabar nêrî û di wateya bêje "şansê me nîne" de milên xwe hildan, bi siynetek mezin destê wî şidand û bi nîşana destan got;

"Me tu aciz kirî, bibexşîne. Êdî tu dikarî herî!"

Bi gotina fermandar re Gabar li pişt xwe zivirî û di hindama wargehê de xwe berda. Hê nû çend gavên dirêj daketibû bi dengê;

"Hizbil Omal, Hizbil Omal te'el" yê fermandar rawesta.

Lingên Gabar bi kaşê asê ve qerisî mabûn. Wargeh dused mitreyan bi bin re disekinî. Qulfek dabûya xwe li nav wargehêbû. Ema, piştî evqas semax wate neda reva xwe û ber bi fermandar ve hewaket.

Hê nû gihatbû cem fermandar, leşkerek qelew, di nav cilên peritî de wunda biyî û ji ber kû beziye kef û kinç li ser deva ketî gihatibû cem fermandar. Fermandar, jixwe bawer pirsa "tu Kurdî dizanî" ji leşker kir. Ewî jî lingê xwe li erdê da û got;

"La seydî."

Fermandar, bi heman hêlwesta bisiyanet xatir ji Gabar xwestin û Gabar bi bez daket nav wargehê.

Dema Gabar di kaş de dadiket, çavên wî li stêra sibehî ketibû. Ji aliyê Rojhîlat ve Stêra geş biqasî du werîsan hewaketibû. Di heman demê de Sofî Beşîrê serhêsin bezî ser textê Stiyê, destê xwe êxistin di kerika guhê xwe de û banga sibhê da.

Jixwe nalyona xwe di qontara jor ya heman girî de vedabûn. Pêta zerhimî ya fanosoka helefa di bin nalyonê de geştir dixwiya. Destê xwe li deriyê nalyon da û ket di hundir de. Bi hatina wî re Weysî serê xwe yê nû dayî cilêdê û di bin ronahiya fanosê de diteyîse rakir jor. Weysî, bi awrên şermdar beşişî û serê Feqeyê nû li cilêdê dayîn nîşan da û got;

"Tu bi kû ve biribûn, her kes pirsa te dike?"

"Çi ji serê we hatiye?"

Weysî, bidengek mixabin barkirî û poşmantî jê dirije got;

"Piştî ewqas şerm û fêhêtiyê wî erebê lêhv gilolê bê merîs em qibhetkirin û guliya me qusand. Min ji wan re got, eniya min ji

xwe keçele ne qusînin lê, dîsa ji bilî Mele Xelîl guliya me hemiyan qusandin.”

“Çima ya Mele Xelîl ne qusandin. An ji Yadê Fatim newêrîn?”

“Na looo.. gotin, ew yêxtiyare. Dilxwede efo kirin.”

Hê nû Gabar xilmaş bibû, dengê nalyona erkê derî dibûne û ya Zîna Hevleriya komîta taxê tevlîhev bibûn. Ji Weysî re got;

“Ji Gabar re bêje, bila aha niha were kolika semtê. Hevalê Riza çaverêyê wî ye.”

Piştî kêmekî li derê kolika semtê singa Gabar û ya Cûmayê rêvebir li hev sekinîbû. Ji rêvebirên semtê Eliyê Nêrwehî, Mehmûdê Kadûnî û Zîna Hevlerî jî li cembûn. Cûma, eniya xwe ya keçel qermiçand û dibin dûvikên çavên xwe yên şemşirî re li Gabarê ji doh ve şemal guhertî dinêrî. Bi dengek lekimdanvan û ji hevaltiyê şuştî got;

“Hevalê Gabar, em hewl didin vî gelî bi awayek silamet di nav axa Êraqê de bicêh bikin. Yên wekî te jî diçin û bi bê berpirsiyartî datînîn fermandarê giştî yê artêşa Bakur.”

Gabarê ti carî ava wî û Cûma di coyekî de ne herikî û dibêjîqey ji bû hev sûncdar bikin li mihaneyekî digeran, li nav çavên rêvebir zîq nêrî û bersiv da;

“Hevalê Cûma, ez jiberxwe neçûme û min ne daniye kesî. Ema heke tu wusa difikirî, min qenc kiriye.”

Mehmûdê Kadûnî bi hêlwestek siyanetkar ket di navberê de û ji Gabar re got;

“Keremke, di hundir de hevalê Riza li hêviya weye.”

Riza, Gabar jipiya pêşwazîkir û piştî xweşbaşê got;

“Xêre hevalê Gabar, çi diqewime? Ji dûh ve ev Ebû Minafiqe çiye, mejî li me reşkir. Eve deh care hatî û dibêje, ‘hevalê we nizanim daniye kûjan genaralî, nizanim kûjan serokî? Mesele çiye?”

Gabar wekî qewimî ji Riza re ta bi derziyê ve kir. Her kû Gabar vedigot, Riza bi dêmek bixende û keyfxweş serê xwe dihejand. Di dawiya vegotinê de Riza got;

“Wate, mesele eve. Vêca tu dizanî çima tu girtine û birine nav dîlên Êranî?”

“Na!”

“Ez ji te re vebêjim. Dewleta Seyîd Reîs, dixwaze bi hovîtiyên xwe peyama ‘lingên xwe şaş ne bavêjin’ bide me. Ema, te di cêh de ev peyama wan li nav çavên wan daye. Hevalên din çima evqas sik û tirsonek tevgerane, min fêhm nekir. Gelo, qey bi PKK’ê re nanek jî ne xwaribûn!”

***

Bûka biharê Nîsan, bi hemî wezbeta xwe li ser dike bejna xweya rengîn liba dikir. Dibêjîqey ji rika zivistana reş re welatê Şêx kesk xemilandibû. Kerengan şax dabûn û çavên sîrîkan li rêya sîrîkvanan qerimîbûn. Sîbeh zûbû. Tîrojên rojê nû zeraqên xwe avêtibûn berojê Nehdaran. Hemî Zoravayî li ser linganbûn û wekî mûriyan bi nav nalyonên belek re diqijvijîn.

Bihara rengîn devê tûrkê xwe yê xêran vekiribû û hemî candar jê diçêrîn. Bê gomane candarên herî zêde bihatina wê biharê şad, şêniyên wargeha Nehdaran bûn. Keysê bidest ketî ne direvandin û bergeşa xwe bigiyayên biharê dixemlandin. Parzonê wê yê hawîrdor gulîvandik lipişta Teybeta Hîlalî li pêş, refek jin bikaşê goristanê re hawaketin û dan berwarê beramber. Wê sibha bayê Nesîm bêhna hendekokan bi xwe re tanî, di bin nalyona Hacî yê Ehmedê Nerxexî de qelebalixek ne asayî bilind dibû. Dengê mêrê du jinan, li ser dengên din diket, nalyona tenik disimt û dûr vedida. Hacî yê Ehmet, bikerb serê xweyê keçel û ji ne şuştin destek qirêj bi qemçikê ve stûrbiyî ji bin nalyonê derxist û derket ji derve. Zelamê dibêjîqey ji cengek dijwar direve hê jî di berxwe de taxivî û berê xwe da koma komîteyên ji bû tekmîlê li ser cadê kombiyîn. Mamostayên ji neçartî betal mayîn û wekû komîteyên semt û taxan hatîn erkdarkirin, li nêzîkê derbenda leşkerên Êraqê li ser nîvê rêya zivt li dora Riza xelek girtibûn û bibalkêştiyek mezin guhdar dikirin. Her zelamê serê xwe ji hêlînê derdixist yêkser qesta wê civatê dikir.

Mala Mûsa yê Ker li rexa Bakur, li tenişta dola bimayînbû. Qetek nalyon bi bereveza kuçekî ve berdabûn û di bin de bicêh bibûn. Rêza mayînên pênc şîşik heta bi ber derê mala wan dirêj dibû ema, mirina di kemînê de zêda bala maliyan ne dikişand û pakî jê nedikirin. Du hevjînên Mûsa hebûn û bi hatina biharê re zarok bi bereketa wê xweyî dikirin. Wê sibhê jî hazirtiyên çûyîna sîrîk û kerengan dikirin û etlehî biruhê wan ne diket.

Dawa kirasê Şirnexî bibervekirî, kîsek yê ar li hev pêçayî di destan de ji bin nalyonê derket Xezala kin. Hê jina hûr ema az nû çend gav avêtibûn, Bihara hewiya wê jî da dûv. Mûsa, li derê malê li ser kuçek gincir rûniştibû û ji dûr ve li koma zelamên li dora Riza biyîn hevşî dinêrî. Hevjînan hev ji nedîtî ve hatibûn û pîrek bê deng bi ber Mûsa re bûrîn. Di dest de adodkek ya kerengan, kîsek di bin çengan de Cewahira hevjîna Meshûdê Kor jî jêlil hat û gihat wan. Piştî Cewahirê roj başek li pîrekan da, birûyek ken berê xwe da Mûsa û got;

"Roj baş hevalê Mûsa."

Zelamê navser û gir, bidengek nivz û dibêjîqey peyv diqirikê de asê dimînin bersiva Cewahirê da.

"Xêre hevalê Mûsa, mirov dibêje qey dengê te ketî ye?"

“Nizanim hevala Cewahir. Wextê em hatîn vêdê ji berkû cêh tengbû demek dirêj ji derve mam. Ji hingê ve qirka min, bi teybet girêgozka min têşê.”

Cewahirê bidengek tinazdar cixareya ji titna pelm pêçayî û nû pêxistî nîşakir û got;

“Ma tu wê qurme çixareya di destê xwe de nabînî? Dibêjîqey te û Meshûdê me çixare qibale girtî ye.”

“Ma nixwe em çibin Cewahir? Ya di destê me de jî mayî çixareye. Hûn ev jin dixwazin wê jî ji me bistînin. Kêmek maye hûnê bêjin; Serok gotiye “nehêlin bila mêr çixareyê jî ne vexwin.”

“Xwezî Serok tiştek wusa gotibûya” û hemî bi hev re bi xweziya Cewahirê kenîn.

Bihar;

“Keçê Cewahir, te ew adodik ji kû aniye?”

“Bixwedê nizanim Bihar, zarokan ji kû peydakirî ye. Ya cîrana te Zeynebê wan jî heye. Here bîne.”

Biharê bibez xwe bi kaşikê bin malê re berda derê mala Zeyneba hevjîna Mehmûdê Zoravayî. Zeynebê, li derê malê kereng hûr dikirin.

“Roj baş hevala Zeynep.”

“Roj baş Bihar. Ka keremke.”

“Min bihîstiye adodka we ya kerengan heye.”

“Belê. Binêre li ber milkê derî ye. Keçê baskî wan bêxêretên paşmergeyan ve neçin. Me dûh xwe bi zorê ji destên wan rizgarkir.”

“Çawa, ma çi çêbû?”

“Keçê dûh ez, Hewa jinbira min û Zeyneba hevjîna Hêwilê me li nav pîrekên Şêxaniyan ketin û çûn derdora warê van koçerên Ereb. Me ji wan piştikşkestiyan re got jî; ‘heke hinan pirskir ne bêjin ev ji qampêne’. Nizanim, demekî siwarek hat wêdê û bi wan pîrekan re erebî axivî. Piştî siwar çû demek kurt; ji gundê Mûseka birek paşmerge xwe berdan û yêkser berê xwe dan me. Û me got; de lingno me xilas bikin. Qederekî li dûv me jî ketin û bênamûsan têr dijûn jî kirin me û em ne girtin.”

“Hemî MÎT, tîm û dehşikên Turkane xwêkê. Çi hatibe serê me ji bêbextiya van xayînan hat. Na, na xwêkê, emê bi jor ve herin.”

Piştî Biharê ji xwe re adodkek jî peyda kir, her sê jin hilperijîn berojê jor û biber pehnava pişta Nehdaran re hawaketin girê pişta Şêxan. Dema jinên din li dûv kereng û sîrîkan ji hev belav dibûn, Xezal hawaket ser kuçek bilind û hewl da wirarek ji çiyayê Cûdî bibîne. Bi ser çiyayê Laleş re, rêze çiyayên dûr û bi nav xwimamê re diwiyan biteşbîha melhema birînan daketibûn ser birînên di dil de. Ji xwe re got;

“Ewê hee.. Cûdiye!”

Gote gotên barkirinê jî hêdî hêdî rojev dagirtibûn û Xezala çîrokek fêrîsa êşdar di nav bisedan qermîçokên rûyê xwe de dihewîne baş dizanî, ya hê bêhtir ji Cûdî yê Muradan dûr biketa. Ramandina dûreketinê agir bi hinavê wê têxist. Hêstirek gir ji çavên wê yên di nav qermîçokên dimînin niwalokên kul û êşan de hat xar û zarokên wê hatibûn bîrê. Têr li çiyayê wekî Cûdî qebûl kirî nêrî û vexwimiha ser kuç. Jixwe jinek bejin kurtbû, jan û kederên jiyanê ew hê bêhtir di ser hev de qumişandibû. Xezala dengbêje û dema hêstên wê difûran êşên xwe dilorandin, destê xwe êxistin di bin guhê xwe de û dibêjîqey hewara xwe digihand Cûdî yê muradan.

*"Çiyakê Cûdî pir bilinde te nabûnim.*
*Tu kaxezekî ji dayîka xwe re rêke ez bixwînim.*
*Heke hefsika Mêrdînê ne xweşe ez nemînim.*

*Çiyakê Cûdî wa bilinde.*
*Deştika Silopî kete di bin de.*
*Kulên alemê hemiyan belav bûn.*
*Ya min evdala xwedê tenê mane di dil de."*

Çîrokek fêrîs û jandar ya her rêvanek ya wî karwanê serhildanvan hebû. Ya hinan kurt û ya hinan jî pir kuldar, dirêj û mezinbû. Jixwe çîroka Xezal bibû derdek bê derman û kezeba wê diperitand. Hinavên wê dişewitandin û dibêjîqey bêndera xwêya kara di tê de derbibû. Ji bilî himbêza çiyayê Cûdî, tiştekî avêk hunik bikezeba di şewite ya Yadê de nedikir. Dibêjîqey mifteya raza murada wê li wî çiyayê biwezbet mabû û herkû jê dûr diket ji murat û mexsedên xwe jî qut dibû.

Sala destpêkê ya şerê çekdarî tiyê Xezal, Afarof Mehmût (Izêr Îlhan) tevlî gêrîla dibe. Piştî wê demek kurt bi gileh û arîkariya Hacî Ne'mo yê keyayê gundê Gilindor, leşkerên Turkan tavêjin ser mala wan, doza birayê mezin Mûsa dikin û birayê herî piçûk Qelender bi xwe re dibin. Mûsa jî xwe na spêre turkan û ew jî tevlî gêrîla dibe. Piştî îzayek mezin ji bû birayên xwe teslîm bike Qelenderê ciwan berdidin û ew jî tevlî dibe.

Her sê bira li pey hev dibin gêrîla. Bi pêşvantiya Hacî Ne'mo, dagirker dubare tavêjin ser gundê Spîndarok û bi terş û talan ve dişewitînin. Hevjînên Mûsa û jintiya wan Eyşê, bikomek zarokên hûr ve bi lêdan û îza dibin toxaya Şirnex. Du heftiya di hewşa toxayê de, di bin berf û barana zivistanê de dihêlin û bişertê ji gund bar bikin wan berdidin.

Piştî wan berdidin demek pir kurt, romiyên Roma reş dubare tavêjin ser gundê wan û gund bi her tiştî ve dişewitînin. Êdî, di bin

banê gerdûna xopan de gundek yê wan jî tinebû. Bi komek zarokên hûr ve, wê zivistana reş berê xwe didin xopana Silopya. Ema li wêdê jî turk bela xwe ji wan venakin û mala wan vedigerînîn baregihek leşkerî. Hê du salên wan li Silopiya ne qedabûn tiyê herî piçûk Metîn (Qelender Îşlek) di kemînek bêbext ya turkan de li Gabar şehît dikeve. Piştî şehadeta mamê xwe, zarokê duyemîn yê Yadê Xezal Cîhan (Ebabekîr Îlhan), sala 1991'ê çeka mamê xwe radike û ew jî tevlî şervanên azadiya Kurdistanê dibe. Piştî Cîhanê çardeh salî tevlî dibe sê salan, leşkerên turkan birayê wî yê mezin Eyhan û pismamê wî Osman digrin û cezayê bi darvekirinê li wan dibirin.

Hê Eyhan û Osman nû hatibûn girtin, dayîkên dil bikul mergên xwe li Bakur dihêlin û berê xwe didin Başûrê welat. Hê sala wan ya mihacirtyê timam ne biyî, ji zarokên Xezalê Şervîn (Gulê Îşlek) û Metîn jî dibin gêrîla. Piştî tevlîbiyîna wan bîst rojan, xebera şehadeta Cîhanê ciwan ji Cûdiyê Muradan tê. Di şerek giran yê bi artêşa Turk re lawê hifdeh salî li Cûdiyê Muradan şehît ketibû. Û bi ketina Cîhan re ji kezeba Xezalê qetek mezin qut bibû.

Li pey şehadeta Cîhanê ciwan du salan, ji Zaxrosan xebera şehadeta terezina wê jî hatibû. Û dil ker-ker bibû. Xedengên daxdar dilê birîndar kiribûn sed qet û xwêya karan lê wer kiribûn. Di heman sala Yadê kezîzera xwe wunda kirî de, PDK ya mala Berzanî tiyê navîn Afarof Mehmût jî li Hewlêr girtibûn û bi îza û îşkence qetil kiribûn.

Kûjan merg, kûjan dil, kûjan sing û hinav dikare ewqas jan bihevîne? Jixwe heke ya dabaşa gotinê dayikekbe, hemî lebetên di hinavan de dibin rijî. Birînên di dil de vedabûn rûyê wê û her birînê bidehan qermîçok li dûv xwe hiştibûn. Û di her qermîçokek ya li ser dêmê wê yê şîrîn de birînek kûr veşartîbû. Ji vê wêdetira mirovtiyê heye nayê zanîn ema, ya misoger û guftûgoyê bi xwe re nabe; mirovtî ne bibû şahidê berxwedanek ji ya Yadê Xezalan mezintir. Lê, li gel tevayê wan êşan jî ji rika dagirkeran ve, Yadê Xezal, wekî stûnek pola li ser xwe bû û ji bû vegera Cûdiyek azad bê dudil li berxwe dida.

Piştî zarokên pelweste hemî dibin gêrîla, rêvebertiya Partiyê biryara Mûsa yê Ker vegerîne nav malbatê digre. Jixwe hem di aliyê pêşketina temen de û hem jî ji aliyê nexweşiyê ve êdî Mûsa ji bû gêrîlatiyê jî ne pêkanbû.

Piştî tevlîbûyînê du salan, refa gêrîla ya di bin fermandartiya Mûsa de li Cûdî dikeve şer. Çeka pêt (lav) ya artêşa dagirker li ber serê Mûsa yê Fermandar dikeve û giran birîndar dibe. Pêta guleya lav perka guhê wî dişewitîne û perik diqumişe. Êdî hem Mûsa baş nabihîze û hem jî binavberên kurt vedixwime. Ji wê birîndartiyê û şûn ve êdî nikare di eniya şer de cêh bigre û karên paş eniyê dike.

Jixwe di aliyê temen de jî sêlm pesartibû şêstê û ji bû tevayê van sebeban pir ne bidil jî be stoyê xwe ji biryara rêvebertiya rêxistinê re tewandibû û vegerabû nav malbatê.

Çîrokek jandar ema bişeref ya her yêk ji wan mirovên di nav wan mayînan de, li ser wê rêyê û di wan kunan de jiyan dibûn hebû. Hema bibêje her dê û bavî ji yêkî zêdetir dalalên dilên xwe wundakiribûn. Hinan hevjînê/a xwe û hemiyan bi hev re welatê xwe jidest dabûn. Ji wan baştir kesî êşa bê welatiyê nizanî. Jixwe heke di welatê xwe de bostek axa te bihewîne tinebe, li wêdê şerê şerefê, şerê hisiyetê, şerê rûmete ji nan û avê jî lipêştire. Sûncê herî mezin yê dîroka mirovtiyê jê re şahidîtî kirî, dagirkertîbû. Jixwe heke dagirkerê dabaşa gotinê kerdizên Asya Navîn, hovên herî mezin yên malbata mirovtiyêbin; li dijî wan şerkirin deynê namûs û şerefêye. Aha jêdera raza birik li berxwedayîna yadê Xezalan evbû. Nixwe kûjan dayika kezeb şewitî dikare li dûv çûyîna çavreş û kezîzerên xwe tilîliyan bilîlîne!

***

Reş nû ketibû erdê. Reşê heyvêbû. Dengê çûkên çeqilên dara pîroz ji xwe re kirîn mesken ji zû ve birhabûn. Bayek sivik û nerm ji Bakur ve dihat û bêhna kulîlk û hendekokan bi xwe re tanî. Bêhna xweş, bêhna hêwîtiya jêdera xwe ji nalyonan digirt dadiqurtand û li stûna pozên koçberan dida. Ji berya wê kêmekî civîna hêza xweparastinê qedabû û taximên nobedar bilezbûn. Di çek û rextan de pêçayî taxima Qehremanê Gabarî, ber bi Bakur ve ji dara pîroz bûrî û da evrazê mila jor. Jixwe nobedarên aliyê Rojhilat ji zû ve çeper girtibûn. Dora çûyîna Gara ya taxima Sekvanê Bilehîbû û ji her rewşa wan kifşebû, hatina şevê bi werîsan dikişandin. Endamên taximê bilez û bez xwe hazir dikirin û yên amadetiyên wan qedayîn bêhna xwe li derê kulika hêza xweparastinê distandin.

Remboyê Nêrwehî, zelamek kurt û qorbû. Zelamê rûyê wî kel û melo cêhgirê fermandarê taxima rêvanê Gara bû. Cêhgirê çele xwehrî, dereng mabû û bilezbû. Li gel bilezbiyînê rexneyên Sebrî yê Ker yên di civînê de lêkirîn, ew aciz kirîbû û bi aciziya xwe ve ket di hundir mal de. Zarokên wî li dorê bûn bose û xwestin hej bavê xwe bikin. Ema rûyê bav tirşebû û di ber xwe de gotinên aciz û nayên fêhmkirin ji nav lêhvên wî dirijan. Ji her halê Rembo kifşe pir aciz bûye û zarokan xwe jê dan paş. Tenê Zîlana yêk salî li ser ranê wî rûnişt û wî jî keçik bi singa xwe ve şidand û maçek li pora wê ya gincirok da.

Dayîka zarokan, jinek esmer zirav û dirêjbû. Jinek li serxwe, az û jiyanyarbû. Henekvan û jixwe bawerbû. Dema bergeşa nîskê

datanî got;

“Xêre Rimezan, çima acizî?”

Hevjînê çav cirnik û nîşana awrên wî nayê birîn, bi dengek aciz bersiva Hemaîlê da.

“Xêre an jî gunehe nizanim. Gureyek ya mina rîs hebû hazir bike îşê min heye” got û kelaşê xwe yê hûrik bi baskî bergeşê ve xirand.

“Sertiliyên kitekî qetayiye.”

“Te ne veçiniye?”

“Rîs nîne Rimezan, ma ezê biçi veçinim” got û bi awrên tevzdar li hevjînê xwe yê wekî pelmekî û wê êvarê xwe li xweşmêrtiyê diqewimîne nêrî û pirsa xwe dubare kir;

“Te bersiva min neda, kê çima tu acizkirî?”

“Tu bi qedrê xwedakî qey di vê Kurdistana xopan de em tenê Kurdin? Şêvekî nobet, yêkî civîn, yêkî întîşar ya din Gara û di ser de jî Sebrî yê Ker. Xwedê ji hevalên me jî razîbe, nizanim van mirovên ecêb û kilamet ji kû peyda dikin û têxin belaya serê me.”

“Qey feqîr çi kirî ye? Mane tu dibûnî, ji sibha heta êvarî wekî kitka pê şewitî lingê wî nakevin di bin de. Pirsgirêka vî û yê din ve dibeze.”

“Ema kûjan çareser kiriye?”

“Ma çi ji destan hatiye û nekiriye?”

“Heke tiştek ji destan nayê, nixwe bila wekî bavê kurikê keç qîma xwe bi wî nayine, her gav zirtên xwe bi kûrika xwe nede. Ma ne eybe bi diravên partiyê zirtên xwe dide?”

Hemaîla zen dikir  pirsgirêkek mezintir ya hevjînê wê heye beşişî û got;

“Kuro, em ne bi Sebriyê Ker bûne Kurd û ne ji bû Sebriyê Ker hatine heta bi van deran. Em li dûv Serok û şehîdên xwene û heta nefesa me bijene jî emê her li pey doza xwebin. De rabe, rabe derenge. Niha heval li hêvya tene. Tu û Sebriyê Kerê bi pişt re xwe ji hev safî bikin.”

Axaftina wêrînker û bê minet ya hevjîna gir, têra kenandina rûyê hevjînê wê yê hûr kiribû. Piştî Remboyê qure ûrê xwe bi nîska helefa pînc da, bi goreya qetayî ve  xwe avêt û çû.

Şivanê Şevî, li derê kolika hêza xweparastinê çelteyên dagirtî didan pişta rêvanan û her milîsê barê xwe digirt derdiket ji der ve. Dema Şivan çelte hildida pişta Rembo got;

“Rembo, şansê te heye, hevalên din cebilxane rakirin. Yê te du tewb qumaşin, sivike.”

Ji qazidan Emerê Evdilmecîdê Hîlalî li pêş, Feqeyê Gweyînî paşvan û taxima rêwanê Gara ber bi dola binê malan ve derketibûn rê. Emerê Batûyî yê wê sibhê ji Gara zivirî, heta bi derketina wargehê

bi rêvanan re meşî. Destpêkê pêşiya rêzê wundabû û wekî taristanê dola kûr hêdî hêdî rêza mirovên çekdar û bipiştî daqurtand û ji çavan wundakir.

Nîsana bûka Biharê, rojên xwe yên dawî dihêjmartin. Roja sohr bi penc û kulabên xwe rûyê ezmanan nû pêçabû. Bayek hunik û nerm, bayê siherê rûyê niştecihên Nehdaran diferikand û derbaz dibû. Qisetên; 'hukmeta Êraqê qebûl kiriye Nehdarî derbazî axa di bin desthilatdartiya wan de bibin û li derdora Mûsil ji wan re cihekî amade dikin' ji zû ve rojeva şêniyên wargehê dagirkiribû. Narinc û Teybeta Hîlalî, li derê mala Teybetê nanê sêlê dipehtin. Zaroka wê ya yêk salî li ber singan Xeyîca bûka Ehmedê Elî jî hat û li ber tifika wan rûnişt. Teybeta gir û ji ber dûyê tifikê hêstir ji çavên reş diherikin, nanek yê sêlê pêça û da dest zaroka por qij. Dema li ser xanikê pê tîrik girik pehn dikirin wekî tinazan bike kenî û got;

"Keçê Xeyîc, Zubêyr kengê ji Gara ziviriye, ne got ev Apocî ji bû me çi difikirin?"

"Bixwedê xaleta Teybet, me ew dikar nekiriye ema got, Hevalan li aliyê Hacî Umran qira van pîsên xayîn aniye."

"Xwezî lib jê nehiştana. Ma hûn na bûnin, wekî gurên dev bixwîn bavên xweyên turk jî anîne û roj bîstûçar demijimare bi dora me re dizivirin."

Narinca girikan çêdike gotina Teybetê birî û biken lêkir;

"Nikarin Hevalan, bela xwe li me didin."

Wekî gotina Narincê di ser milan de neçûbe Teybetê, kêmek eniya xwe qermiçand û bersiv da;

"Ji bavê xwe ve bê minetin. Heke yên xwe ne ceribandîn mabin, bila ew jî kerem bikin. Ma we nedît, wê rojê di nav vî genimî de milîsan fîşekek li qona yêkî dabûn; wekî sa qare qara wî li ser van deran diket. Qey mêrin! Pişta xwe bi bavê xweyên Turk germ dikin."

Bi gotina Teybetê re, berê wê li semta yêk Rewşena rêvebira jinên wargehê gihat hindama wan. Piştî roj baş û quwetek li dayîkan da Rewşenê hewlda bibûre. Yadê Narinc, girêkê di destê xwe de danî, rabû ser xwe, dawa kirasê xwe ji ar weşand û ber bi rêvebira qam qut ve çû û got;

"Bi serê Egîda xwe kim hevala Rewşen, tu nabûri. Were em bi hev re taştê bixwin û bi pişt re here."

Rewşena pora wê ji ne şuştin wekî erzêlekî lê hatî, dibin kirasê Bohtanî de gureyek rîs û pêlavek lastîk wergirtî bi hêlwestek dagirtî bersiv da;

"Bibûrînin yadê bixwedê karê min heye, carek din îşileh."

Yadê Teybet bi rûyek ken û dilyar bangkir;

"Jixwe ticarî karê van Apociyan naqedê. De were em bi hev re taştêyekî bixwin. Kar xilas nabe."

Bi gotina Teybetê re Narinc jî gihat cem Rewşenê. Çû desta û destê wê berneda û ber tifikê ve kişand. Teybet jî ji hundir du lalîk tijî mastê çêleka zer û şûşeyên çayê anîn. Jixwe çadan li ser agirê tifkê ji zû ve dikelî. Li derê malê betaniyek rayêxistin, bergeşa xwe danîn û dest bi xwarina taştê kirin. Dema taştê dixwarin Teybet bi devoka xwe ya Goyikî pirsa; "keçê Rewşen, ma hûn ev Apocî yê me bihêlin ser vê rêyê" kir.

"Bixwedê yadê ez jî zêde tiştekî nizanim. Hevalê Riza şevê din ziviriye. Jixwe Sedam qebûl kiriye em derbazî nav axa Êraqê bibin; bawerim niha li ser cêh gotûbêj tê kirin."

Narinc;

"Keça min, bila me bibin cihek avî û xweş. Em zozanîne, em nikarin li germiyanan jiyan bibin."

Teybet;

"Na Narinc; hema em ji van pîsan xilas bibin û destê me û Hevalan jî ji hev qut nebe, me tiştek din navê. Yên cihan xweş dikin mirovin. Heke em Apocîbin emê cihê ne xweş jî xweş bikin."

"Bixwedê yadê hevalê Riza dikara cihek wekî Hemam Ezîze, Hemam Elî ye dikir. Û cihek din jî heye dibêjîn, Ednaniyê. Dibêjin yêk li ber ava Mezine û ya din jî li ber ava Zêye."

Xeyîc;

"Hema bila li ber avê be kûder be xem nake."

Rewşenê keserek kûr kişand, firek li çaya xwe da û got;

"Hevala Xeyîc, divê em xwe di her şertan de ji bû her cihî amade bikin. Ev dagirkerin û şansê me yê zêde bazarkirinê jî nîne. Ya misoger û gotûbêjê bi xwe re nabe, dewletên dagirker û dewletên din jî ji bû me zêde baş nafikirin."

Awrên Teybetê bi rûyê Rewşen yê qemitî û derzên terkên sivik li ser gurmikan dixwiyên ve qerisîbûn. Pariyê di destê xwe de danî, awrên wê vegeran hundir û bê livandin wusa ma. Kê dizane, belkî jî di wê jiyana têr êş û berdêl de qetên ji mergên wê ketîn dihijmartin. Gelo di şevên tarî de, di bin top û tifekên dagirkeran de çend caran sînorê li ser singa Kurdistana wê hatî danîn bi komek zarokê hûr ve çirandibû? Çend parçeyên kezeba xwe li çend beşên welat hiştibûn? Jana li dûv çûyiyan nêrîn çend dax li dilê wê dabûn? Ji xeynî wê tu kesî nizanî. Tenê ew û dîsa wê dizanî.

Wekî ji xew hilciniqe, çavên xwe yên gir û belek qerastin çavên hûr yên Rewşenê û wekî birînek kuldar vebêje;

"Keça min, di fêhmkirina dagirkeran de em zêde zoriyê nakişînin. Kula di dil de û xencera di pişta me de aha ev xayînên hene."

Bi cesareta ji Teybetê girtî Xeyîcê, destê xwe baskî taxa Mijîniyan ve kir û bi kenek tevz barkirî sohbet ajot;

“Hin yên me jî dihezidin wan. Her roj bi heyfek mezin dibêjin; nizanim ristika zêrên jina filankesê evqas dirêje û gerdeniya wê evqas pehne.”

Narinc;

“Ma hûn nabînin xwe kirine ber qona PDK’ê de û Heval dikin û nakin ji wan dûr nakevin.”

Rewşen bilezbû û rabû ser xwe. Her sê pîrek jî di ber de rabibûn jipiya. Çû destê her du jinên din û destê Teybetê girt û berneda;

“Ji we baştir, ji gelê vê wargehê bêhtir tu kes PDK ya mala Berzanî nas nake. Heke hê jî ji wargehê hin kes dihezidin wan, tenê mirov dikare ji aqlê wan goman bike” got û çû.

Roja dawiya hefteya destpêkê ya meha Gulanêbû. Nîvro nû wexirîbû. Ciwanên firavîn xwarîn bêhna xwe li sahên vîleybolê vedidan. Li her quncikek rast yê wargehê du dar daçikandibûn, bi niyeta fîle werîsek du, sê car lê gerandibûn û vegerandibûn saha vîleybolê. Ewqas xweş dileyîztin, yê nizanibûya yê bigota qey piraniya wan ciwanan vîleybolvanên profesyonelin. Jixwe hin tîm hebûn, mirov ji temeşekirna wan têr nedibû. Her şeş leyîstvanan bihêsanî dikarin pelman li gokê bidin û wekî fîşekê li aliyê berberê xwe bêxin qan. Li aliyê din, jixwe her du kes strancek di bin çengê wan de bû û li hev dixwirîn. Di wargehê de, li gel reqsên cor bicor yê stranc û vîleybol nizanîn hema bêje kêmbûn.

Nanek şikevayê Şirnexî di desta de Evdilayê dîn, ji Nehdaran bûrî. Nan kiribû palok, hem dixwar û hem jî bi zarokên li derdora xwe kombûyîn re henek dikirin. Silêmanê Aloşî, Mikaîl, Cibraîl û Niyazî yê Geverî, Yûkselê Bilehî, Mam Resûlê Hîlalî, Şiyarê Garisî û gelik zelamên din nêzîkî derbenda Sedam jipiya sekinîbûn û rojeva wan ya fer dbaşa barkirinbû. Civat germbû û ji her devî dengek derdiket. Ji berkû di rastiyê de tu kes tiştek misoger nizane û tiştên bihîstîn jî ji  gote gotê wêdetir ne diçûn. Cibraîlê Geverî çixareyek ji qotiya xwe ya piçûk pêça, qotî raberî Şiyarê Garisî yê li tenişta xwe kir û pirsa xwe ji Mam Resûl kir;

“Ma emê heta kengê li ser vê rêyê, di nav van mayînan de bimînin Mamê Resûl”.

Hefkûfê pirsê dûvê kupalê xwe yê sike li erdê da, jêlil li çavên zelamê du qetê xwe nêrî, wekî nexwaze bejna wî ya perixî bi bejna Cibraîl ya wekî spîndarekî re were pîvan du gavan texûpaşbû û got;

“Mamo, hevgirtin û sebir ji her tiştî pîroztire.”

Silêmanê Aloşî gotin ji devê Mam Resûl girt û bi dengek aciz dewamkir;

“Sebir, ma heta kengê sebir Resûlê Hilalî?”

Di sêrî de Mam Resûl ji xetê rûyên wan kifşbû hemî civat ji

tona dengê Silêman aciz bibû. Mam Resûl awrên xwe pesartin çavên cirnik yên Silêman, bejna wî ya kurt û kêmekî pehn muxila çavên xwe yên hûr re derbaz kirin û bersiv da;

"Heta hetayê sebir Silêman, heta hetayê. Yanî dibin zimanê te de çi heye, tu dixwazî bêjî?"

Silêmanê bivir li gozeka xwe dayî û hemleya dixwesta bike lê vegerayî awrên xwe pesartin erdê û qet deng nekir êdî.

Hê bertekên di hundirê civatê de li hember Silêman pêkhatîn sar nebibûn, karwanek yê tirimpêlan di dîqê Şêxan re dabû der. Civatê di naskirina karwanê ji sê cîbên spî pêkdihat, bi pêşya tirimpêlan ve şivikên antênan liba dibin û li ser tenişta wan bi tîpên mezin UN nivîsandî de zehmetî ne kişandibû. Bi dîtina tirimpêlan re qermîçokên eniyên qermiçî kûrtir bibûn û rûyên qemitî tirştir. Ema kesî tekûztiya xwe xira nekir û  tirimpêl ji nedîtî ve hatibûn.

Karwanê tirimpêlan li cihê leşkerên Sedam wekû derbend bikartînî rawestabûn. Ji tirimpêla pêş zilamek gir û bilindê rû melez derket û bi pê re kesên din daketin. Ji her halê zilamê gir û çend biskên bi dorguhê wî ve mayîn li ber bayê dikevin kifş dibû kû berpirsek mezine. Zilamê qure û di xwe de mezin, derket ser girê axa li rexê rê û jibû bala koçberan bikişîne û hin kes herim cem kêmekî vesekinî. Dema temaşekir kes lê nanêre û her kes ji nedîtî ve tê, ji tercûmanê cem xwe re tiştek got û tercûman bi bez hat cem koma zelaman. Tercûmanê bêhnveşirî û nîvî Erebî, nîvî Kurdî taxive got;

"Ev berbirsê Dewletên Yêkbûyî- UNHCR- yê Rojhilata Navîne."

Silêmanê Aloşî yê di bin berteka hevalên xwe de reng lê ne mayî û li hêncetekî digerê ewrên li raser xwe belav bike tifkir erdê, gotina zelamê bikelacan birî û wekî tevzê xwe lê bike got;

"Xweliye! Me bêbextên wekî te û wî pir dîtine."

Wergerê  gotinên Silêman ji nebihîstîve hatî û  jixwe jî fêhm nekirîn gotinên xwe ajotin;

"Mesûl, mesûl, Şêx" got û zivirî cem mezinê xwe.

Bigotina zelamê wergervan re ji rêvebertiya wargehê Sebriyê Ker, ji komîteya karê jiderve Kenanê Efrînî, Nahîda Porspî, Huseynê Mehmûdê Hîlalî, Eliyê Ziravikî bi komek jin û mêr ve derketin û hatin. Bi nîşanên destan kesên li derdor jî vexwendin cem berpirsê DY. Piştî zelamê lêhv hişîn, rûsar û komîteya gel çûn destê hev zelam, ji komîteyê xwest kêmekî bigel re sohbet bike û komîteyê jî bidil xweşî ev daxwaza wî pejirand.

Berpirsê ji her halê wî kifşe, zeravî wî ji girseya li pêşber diqetên û çavê wî yên şemşirî wekî yên kundan bi dora xwe re dizivirin, birêya wergerê xwe yê sererast bi ti zimanî nizane dest bi

axaftinê kir;

“Ez berpirsê UNHCR yê Rojhîlata Navînim. Ezê kurt baxivim û naxwazim we zêde bi westînim. Me û dewleta Êraqê li hevkiriye. Ewê cêh bidin û ewlekariya we bigrin û em jî yê pêwîstiyên we yên mirovî dabîn bikin.”

Berpirsê UNHCR, di dawiya axaftina xwe de got; “ema” û vesekinî. Li leşkerên lipiş xwe nêrî, dubare û ji her demî balkêştir çavên xwe bi ser girseya li pêşber re gerand. Kenek ji qestîka û ne jidil rûyê wî yê sar pêça, du sê caran koxî û dewam kir;

“Divê hûn jî zagonên komîsertiya bilind ya mihaciran û zagonên hûkimeta Êraqê binpê nekin û jiyanek wekî ya hemî mihacirên cîhanê qebûl bikin.”

Tam dema zilam pêl peyvên xweyên dawî dikir, Evdilayê dîn dûvikê kupalê xweyê biherî kir di nav teşkan de û got;

“Tirr… xaloooo!”

Zilamê zik daketî û jixwe henaseya wî ji asayî pir bileztir lê dide; bi tevgera ne liçaverê ya Evdilayê dîn nîv metreyî hilciniqî û xwe li nav leşkerên li piş xwe da. Û qerqeşeya di navbera berpirsê Rojhilata Navîn yê UNHCR’a Dewletên Yêkbiyî û Evdilayê de qewimî pîrkêna ken li ser guhdarvanan êxistibû. Eliyê Ziravikî, bilez bi Evdila girt û ji wan dûrxist. Ji komîteya karê ji der ve Kenanê Efrînî bi erebî got;

“Ew dîne!”

Berpirsê ji tirsa spî bûyî bi arîkariya hevalên xwe dubare derket ser girê axê. Ji bû şerma xwe birevîne kêmekî beşişî û bi tinazdartiyek wate barkirî got;

“Heke dînên we wusabin xwedê me ji aqilmendên we biparêze.”

Silêmanê Aloşî, mirovên li pêşya xwe tehfdan û derket pêş. Tifkir erdê, dûvikê kupalê xwe rakir û bizimanê xwe yê kêmekî viz qêrî;

“Em we û qanûnê we baş nas dikin. Qanûnên we, yên kedîkirin, birçî hiştin û qirkirinêne.”

Ji bû bûyera Evdilayê dîn dubare nebe, Cemîlê Amedî xwe avêt pêşya Silêman û xwest ji wêdê dûr bêxe. Silêmanê dûvikê kupalê wî li jor, di nav çengên Cemîl de bejna xwe ya kurt circirand û bi qêr got;

“Bila zirtan li me nekin hevalê Cemîl. Yan bila wekî mirovan erka xwe pêkbînin yan jî herin.”

Berpirsê ji latê ketî û ji hizrandina xwe pir zêdetir li rasta berteka dînan hatî got;

“Emê bi piştre bi komîteya were bicivin” û bilez li tirimpêlên xweyên spehî siwarbûn û çûn.

Meha Gulanê ber binîvî ve pere xwe dikutan. Piştî şîvêbû û tarîtiyê Laleşa pîroz nû nixwimandibû. Rûniştvanên wargeha Zorava yên şîvek jirêzê peydakirîn û peyda nekirîn xwe avêtbûn ser rêya qîr. Dema nûçeyên Med Tv bû  û kolika televîzyona semta yêk ya li Başûrê dara pîroz bidêvrebû. Azad (Gelhat)ê Çêlikî yê nû rêya wî li wargehê ketî û tebata wî di wê çaçoveya teng de ne dihat, hawaket ser cadê. Bîrînên wî yên kevin dîsa axivîbûn, edab girtibûn û hedara wî ne dihat. Rewşa heyî dest ne dida li nexweşxaneyekî tedawî bibe û bi hêviya janbirên Dr. Medya ve mabû. Ema, hem fihêt dikir û hem jî di ser milê xwe de ne dibir dikara êşên xwe bike û ji bû wekî kesek pir bi tenduris were dîtîn hewlek bê eman dimezaxt.

Azad, wargeh û wargehî zêde nas nedikirin û dixwest herkesî re hevnas bibe û biteybet gelik hej guhdarkirina dayîkan dikir. Herkû keys diket serdana malbatekî dikir û bê westan guhdarî serpêhatî, êş û bîriyên wan dikirin. Mirovek ewqas jidil, semîmî û nêzîkî canbû, rêya wî li kûjan malbatê diket dewsek jênebir di dilê malîvanên xwe de dihişt. Ji rêvebertiya wargehê bêhtir serdana malan dikir, guhdarî êşên dê û bavan dikir, bi ciwan re wext derbaz dikir û hewlek mezin dida gel serwextî pêvajoyê û rastiya têkoşîna azadiyê bike.

Li ser rê singa wî û Tahirê Osmanê Hîlalî li hev sekinî. Piştî çûn destê hev û xweşbaş li hev dan Azad ji Tahir re got;

"Tu ji kû têyî hevalê Tahir?"

Tahirê nû sêlm pesartî bîstê û hema bibêje ew û Azad bi teng hevre ne got;

"Ji navendê tême. Ji bû hevalên çûn jor min kêmek alîkarî kir."

"We amadekirin, taxima kê çû?"

"Belê. Ya Qehremanê Gabarî."

"Hmm, belê. Tuyê bi kû ve herî, karê te heye?"

"Na."

"Te şîv xwariye?"

"Na, ema ne birçîme."

"Nixwe were em kêmekî li ser vê cadê ji xwe re bigerêne."

Azad û Tahir li serê wargehê yê Başûr milê xwe dan hev û ber bi aliyê Bakurê ve ketin rê.

Malan li her du aliyê rê danîbûn û rêya qîr di nîvê wan re derbazdibû. Cihê fer yê gelê wargehê lê li ser xwe bigere û hewayekî bistîne ew rêbû. Jin, mêr,  zarok û her qismê gel wî demî  dirijan ser rê û bir bibir tor tavêtin. Dengê mirovan li nav hev diket û dibêjîqey guhê mirov li ber gurbeyek ya mêşên hingivîbû. Nalyonên tenik  jî deng ne diparastin û biteybet wî demê şevê humên û gumênek sivik ji wargehê bilind dibû.

Li hindama Baedlê stêrek geş şemitî û wekî fîşekek xetat bi ber Rojava ve wundabû. Zîna Hevlerî, Fedîla Mijînî, Îkrama Rojhilatî û sê, çar jinên din silavek dan û bilez ji wan bûrîn. Xwedê dizane civîna komîteyan heye û ji her halên wan kifşe dereng mabûn. Bi nav humêna Kurdî re keziyek dengê Turkî li guhê wan ketibû. Tahirê, biskên pora gustîlok di ser eniya wî ya pehn de dirijan û di bin tarîtiya şevê de jî rûyê gewrê girover tiştek ji şîrînatiya xwe wunda nekirî, bêkû li paş xwe binêre bihêlwetek tevzdar beşişî û got;

"Sebriyê Ker û Yaşarê Turk ew têne."

Azad, di fêhmkirina rexneya veşartî ya di dengê Tahir de dereng nemabû. Beşişandinek sivik rûyê wî yê esmer pêça û bihêlwestek dilniya ema şaqistiyek veşartî hildigre got;

"Çawa dizanî?"

"Ji axaftina Turkî."

Bigotina Tahir re, Yaşerê turk, Sebriyê Ker û Cemîlê Amedî biber wan re bilez derbazbûn.

Azad, beşişî û bitinazî pirskir;

"Xêrê komîte û rêvebertî hemî ber bi semta we ve diçin Tahir, ne Hîlaliyan serhî hilda be?"

"Na, na. Hîlalî di rojên teng de tiştên wusa nakin."

"Ema li Nînûva kiribûn."

Bigotina Azad re reşê zelamek zirav û dirêj, di çek û rextan de pêçayî, çeltê leşkerî lipişta bi nav çadirên li rojhilatê re hawaket û derket ser rê. Yêk din jî li dûv derket û rêza hevalan ber bi darê ve li ser cadê dirêj bibû. Azad, di dilê xwe de got; wate, ev qijevij û heyhedan ji bû van hevalan bû." Rêvebir û komîteyên amede du du, sê sê hevalên nû hatîn li malan belav dikirin. Bidengek hizirdar Azad got;

"Tabûra hevalê Karkerê Nerexî ye. Gelo çima hatine?"

Tahir, bi hêlwestek keyfxweş bûyî û bi kelecan bersiv da;

"Belkî hevalan îstîxbareta êrîşek mezin girtibe û ji bû parastina wargehê wekû destek hatibin."

"Hergîz karek wan heye. Ka em rêya xwe dewam bikin" got dema ji pirsên ji demiyê xwe de pêkhatîn li bersîvan digera Azad.

Her kû bi pêş ve diçûn nalyonan cihê xwe ji çadirên spî re dihiştin. Hema bibêje rûniştvanên wî aliyê wargehê hemî di çadiran de bûn. Kêm jî be, hin pez û çêlek jî li derdora çadirên wan dixwiyan. Ew cudatî ji bala Azad ne revîbû û pirsa;

"Rûniştvanên van semtan kêne" ji Tahir kir.

"Mijînî, Ziravikî, Repinî, Bilehî, qismek Hîlalî, qismek Nêrwehî û kit mitên malên din jî hene."

"Başe, çima yên van hemî çadirin û yên li derdora darê hemî nalyonin?"

Tahir beşişî û dîsa tona dengê wî rexne barkirîbû;

"Em gundikî bêjin; ev eşîrin û yên derbazî wî aliyê darê biyîn nav gundîne."

"Çawa yanî?"

"Dema em li Nînûva bûn dîsa ev semt li vî aliyê wargehêbûn. Yên dar derbazkirîn li aliyê Bakur, li semta pêncbûn. Şeva barkirinê semta pênc ji rêya qîr dûrbû û nikarîn bi erebokan tiştên xwe bînin. Ya din jî zilamên semtê hemî milîs û çekdarbûn. Piraniya wan bi şewtindina wargehê ve mijûlbûn û erkdarên parastinêbûn. Dema eskerê Êraqê nehişt gel derbaz bibe û pevçûn derket, vî qismî teng sistîkir û xwe berdan vêdê. Yên ji semta pênç hatîn derbazî pêşyê bûn û bi leşkeran re şer kirin. Yanî yên şerkirîn û rê vekirîn derbazbûn ema, bê tişt. Yên xwe ji şer û belayê parastîn û çaverêyî encam mayîn bi tiştên xwe ve li dawî man. Niha jî em ji van malên dawî mayîn pişt kulin û di dewamkirina vê rêkoşînê de ne safîne."

Azad, bi serê xwe hemfikirtiya xwe ya bi Tahir re nîşan da û got;

"Ez û Karker hevalê hev yê kevnin. Min ji zû ve nedîtiye û dixwazim xêrhatinekî lê bidim. Tu jî nayî?"

"Na. Ez kêmek westame û pêwîstiya min bi vehesandinê heye."

***

Xweparastin, karê mirovên zane û rêxistîne. Evînek mezin, baweriyek qayîm dafîrîne, dibe vînek pola û di boseya gurên har de armancperestên azadiyê dertêxe holê. Hêstên bi azadiyê ne tamijîn, zehmete di bêhna mayîn û nemanê de desthilînin. Gelo, heke Nîcolay Ostrovskî yê Urûs bi serpêhatiya wê komika berxwedanvan re hevnas bibûya, yê navê "Pola wusa reqbû" li pirtûka xwe kiribûya; nayê zanîn. Ema ya hergîz û rastiyê wê guftûgoyê bi xwe re nabe, dîroka toxmê mirov ji berxwedanek ya hemsalê serhildana wan rêvanan re şahidîtî nekiribû.

Dawî hefteyekbû çûyîn û hatina şandeyên Êraqê kêm ne dibû. Di navbera komîteya karê ji derve û şandeya dewleta Seyîd Reîs de têkoşînek bê eman tajot. Li ser cihê nû yê wargehê, mercên jiyanê û şertên her du aliyan tavêtin ber hev tengedariyên dilqelqîn dertêxistin holê. Her du alî jî ji hev ditirsan û lihev ne dikirin. Zarêvê rayedarên Êraqê ji wê komika rêxistî diqetan û ji ber Kurdên di nav xwe de ne dixwest wan mirovan li serê xwe bêxin bela. Li aliyê din, ji bû peyama "kurdên ji ber kurdên we direvin û xwe tavêjin ber stara min" bide cîhana dilxwede mirovyar û bi rêya wan şova demokrasiyê bike keysek narev ketibû di destê Sedam Huseyn de

û ne dixwest birevîne. Û yê çawa her du şebeş bi destekî bigirtana, hesap û kîtabên wê dikirin.

Di rastiyê de komîteya karê jiderve ya wargehê û rayedarên eleqeder yên Êraqê wekû cihê nû yê wargehê li ser Bakurê Edananiyê, ber peravên ava Zê li hev kiribûn. Jibû keşfa destpêkê şandeyek ya wargehê jî biribûn û cihê nû yê wargehê nîşa wan dabûn. Ema dawî çend rojbûn rayedarên Êraqê di aliyê cihê dabaşa gotinê de badek didan xwe û digotin; "kêmek li başûrê cihê me nîşa we kirî cihek din heye û ji cihê we dîtî xweştir û bi ewletire." Komîteya wargehê bigoman li vê fikir guhertina rayedarên Êraqê dinêrî ema, baş dizanî kû zêde şansê wan yê xwe pesartinê jî nîne. Li aliyê din, heke zêdetir karwanê koçberan li ser wê rê yê bima, dikarî encamên qet ne di hesab de jî bi xwe re bîne.

Danûpeza roja dawiya hefteya sêyemîn ya meha Gulanê bû. Dîsa di kolika komîteya karê jiderve de xirecir û cedelbû. Ji şandeya Êraqê berpirsê îstîxbareta Şîmal Ebû Elî cara yêkê hatibû wargehê û dixwest bi hatina xwe, wê pirsgirêkê çareser bike. Ji komîteya wargehê Cemîlê Amedî, Eliyê Ziravikî, Ebeydê Ehmedê Hîlalî, Huseynê Mehmûdê Hilalî, Melesînê Pîranî û lipêşberî wan şandeya Êraqê Ebû Elî, Ebû Minafiq û Ebû Ehmet bi awrên bigoman û dijwar li hev dinêrin.

Ebû Elî, li hevkûfên xwe nêrî, bihêlwestek qure û desthilatdar got;

"Cihê hûn dixwazin em qebûl dikin ema, ji bû em bikaribin bê serêş û pirsgirêk bi hev re bibûrînin sê şertên meyên sereke hene. Yêk; divê hûn têkilî Kurdên di nav me de nebin û ji bû rêxistina wan hewldanek piçûk jî nekin. Du; divê hûn bi ti awayî qaçaxçîtiyê nekin. Ankû, bê agahiya me tiştekî ji derveyî yasayên me nekin. Sê; divê hûn bertîlê ji ti rayedarên me re teklîf nekin û bi hukmê bertîlê wan bandor nekin."

Zelamê di qada xwe de yêkemîn, çavên xwe yên beq û dibêjîqey haxta ji hêlûnê bibeyên qerastin awrên Cemîl û bidengek gef barkirî dewamkir;

Divê bi ti awayî hûn van şertan binpê nekin. Ev xetên me yên sohrin û kesê serî li van tiştên me dikarkirî bide, emê wan giran ceza bikin."

Komîteya wargehê baş têgihiştibû kû di bin şertên Ebû Elî de kûjan xeter veşartîne. Nixwe ji bû wan mihacirên heyîriyê parî nanin, çima ji sê şertên sereke yêk 'bertîldayîn' be. Armanc, ji hev qetandina gel û gêrîlabû û wekî hemî şertên wî derkevin heman deriyî têgihiştibûn. Komîteya jixwe bawer, bê dudil şertên zelamê Êraqî qebûl kiribûn. Piştî navberek kurt, berpirsê komîteya wargehê Cemîl bersiva Ebû Elî da û got;

"Em şertên we dipejirînin ema, şertên me jî hene."

Ebû Elî, bi zekayek tûj ya dîplomasiyê xwe ji qestîka beşişand û got;

"Hay-hay kerem bikin."

Cemîl;

"Yêk; divê ne hêzên aydê Êraqê û ne jî aydê hêzek din, di bin ti şertan de tevlî karê me yê navxweyî nebin. Du; divê bi ti hêncetan ji aliyê hêzên leşkerî ve wargeh newe dorpêçkirin û ketin û derketina gel newe qontrolkirin. Sê; divê erd ji gel re were vekirin û gel bikaribe xwe bi çandinî û heywanvantiyê xweyî bike. Çar; divê ji bû avakirin û binesaziya wargehê alîkariyek lezgîn ji gel re were pêşkêşkirin."

Ebû Eliyê şertên Cemîl rêzdike bidest siviktî di defteroka xwe ya berîkan de qeyd dike, dubare bi çavre derbazkirin û bersiv da;

"Şertên we li ser çavên me. Jixwe di asta jor de jî Riza û hukmetê li ser van şertan li hev kirine. Tenê ya em bêjin eve, di aliyê avakirin û binesaziya wargehê de ji sedema hîsar li ser me ye dibekû biqasî hûn dixwazin em nikaribin lezgîn tevbigerêne. Ji bû tiştên diravî em qewlê şeş mehan bidin hev baştire."

Jiber rewşa Êraqê ya di bin dorpêça hêzên Rojavayî de ji kambaxê jî kambaxtirbû, qewlê şeş mehan li komîteya wargehê xerîb nehatibû. Dema rûyê her du aliyan jî dikenî  wekî bixwaze dawî li civînê bîne Ebû Elî got;

"Di nav du, sê rojan de emê ji bû lawîr û tiştan qamyonan û ji bû mirovan jî otobisan amade bikin û barkirina destpê bike. Ji bû em li wê gorê tirimpêlan amade bikin, hûn rêznava mal, mirov û lawiran amadebikin û teslîmê me bikin ya gelik baş be."

Dema şandeya Êraqê xwe keysxweş dikir rabe û komîte bi pişt re rêznavê bigihîne wan, Ubeydê Emedê Elî yê Hîlalî kaxeza bi tosintî rêznava şandeya êraqê daxwazkirî li ser rêzkirî danî ber serokê şandeyê.

Di rêznava hatî amadekirin de wargeha Nehdaran, ji du hezar û pênçsed û pêncî û şeş mal û yazdeh hezar û sed û şêst û sê kesan pêkdihat. Dema şandeya Seyîd Reîs derket ji der ve û ji bûyî birêketinê xwe amade dikir, Cemîl bi hêlwestek bitinaz  ji Ubeyd pirskir;

"Hêjmara me ewqas heye?"

Ubeyd bideng kenî û wekî tinazê xwe bi ecemîtiya Cemîl bike;

"Ew hêjmara helefa (UNHCR) ye."

"Başe ya rastî çiqase?"

Ubeyd rêznavek duyemîn ji berîka êlekê xweyê peritî derxist

û raberkir. Li ser rêznava di destê Cemîl de û gelê wargehê wekû "hêjmara rastîn" binav dike;

Semta yêk: 437 mal û 1963 kes

Semta du: 426 mal û 1916 kes

Semta sê: 424 mal û 1911 kes

Semta çar: 403 mal û 1815

Bi giştî 1690 mal û 7605 kes nivîsîbû.

Eliyê Ziravikiyê ji dûr ve û bibaldartî rêznava di destê Cemîl de bi çav re derbaz dike, bidengek xemgîn got;

"Gelo, emê biçend kesan bigihêne binecihê?"

Xendeyek bitinaz dêmê dirêj yê Ubeyd nixwimand û bersiv da;

"Qey di gerdûnê de binecih heye?"

Huseynê Mehmût bideng kenî û lêkir;

"Belkî hevalê Elî dikara Nîrvana, Baxê Îrem an jî Gabar dike."

Hemî bi hev re kenîn û Melesînê rûdewisiyê li rexê guhdar dike gotina Huseyn birî û sohbet ajot;

"Birastî jî ev Gabarî pir pesnê herêma xwe didin."

Elî yê Ziravikî, di hemdê xwe de û bi dengek dilniya got;

"Ma çibikin feqîran, ma tiştek din di destê wan de maye?"

Kenanê demek dirêj li Gabar gêrîlatî kirî û ji lingek yê xwe gazî got:

"Ema birastî jî Baxê Îrema Melayê Cizîrî dikar dike, Gabare."

Sibeh zûbû. Tîrojên roja nû hilatî wekî kumê keçel serê girên bilind pêçabûn. Dibêjîqey rojê, bitava xwe kumek zerê vekirî di serê çiyayê Laleş de edilandibû. Sekvanê Bilehî li pêş, girvanên wargehê di kaşê beramberê Nehdaran de daketin xar. Westayî û bê xew dixwiyan ema, serbilind û serevraz dimeşîn. Taxima pêr çûyî Gara, berê wê sibhê vegerbû û fermandarê taximê li ser cada binê Nehdaran tekmîla xwe dida fermandarê giştî. Qehremanê bejin narîn di amade başiyê de taxivî û serdar bi serê xwe gotinên wî erê dikirin. Komîteyên semta yêk, di valetiya pişta çadira Dr. Medya Alemanî wekû nexweşxane bikartîne de, jibû fik kirina karê rojê jipiya lihev bibûn hevşî. Nehdarî hemî jidervebûn, jipiyabûn û di nav hev de diqijvijîn. Di wê jiyana barê wê hîvî de herkes têr kar û bilezbû. Her kesê ber yê din re dibûrî, bi rûyek geş "roj başek" lê diwerand û derbaz dibû.

Ji bilî hin zarokên hûr û erkdarên pir dereng nivistîn, şêniyên qedema navîn li derê malan, liber tifikan, li derdora kevaniyan çok vedabûn. Piştî hatina berpirsê UNHCR yê Rojhilata navîn, gotûbêjên barkirinê bigiştî rojeva wargehê dagirkiribû. Guhên wan bel, herkes li benda lêdana zengilê civîna barkirinêbû.

Komîte, bi gotina berdevkê demê ya “heval serbestin” vefelitînbûn nav malan. Jixwe piraniya malbatan li derê kolik, nalyon û çadirên xwe bûn û çadirên malbatên sist û leq jî didan ber pelman û hişyar dikirin. Komîteyan, bi “roj baş”ek germ û xweş re digotin; “demjimar nehê rojê li meydana binê darê civîn heye. Divê ji her malbatê misoger kesek tevlî bibe.”

Mereqdarên dixwestin sebeba civînê ji niha ve bizanibin, bersiva “em nizanin” digirtin û komîteyên bilez, derbazî mala teniştê dibûn.

Wê nûçeya tevayê wargehê ji zû ve çaverê, tevgerek awerte êxistibû nav karwanê koçberan. Hê ji niha ve zilamên temendar komik bikomik li derdora cihê civînê kom bibûn û warê di xeyalên xwe de pênasedikirin. Tîkên êlekên komîteyên jin û mêr hê jî liba dibûn û yên dereng mayîn di nav malan de bilez diteyizîn. Dayîkên zarokên wan li milan û dapîrên fitlek din jî li xafika xwe didan ber bi cihê civînê ve ref biref birêdiketin.

Destê wî li ser milê Feqeyê Gwiyînî fermandarê tabûra gêrîlayên şevê din hatîn wargehê, li ser girikê li hindama dara pîroz sekinîbû. Bejna dirêj ya ciwanê narîn, di bin cilên gêrîla de biheybet dixwiya. Gêrîlayê malbata wî jî endamek ya wî karwanî, bisiyanetek mezin û dilnivziyek rakêş silav û xêrhatina mirovên li derdor vedida. Gerkû piraniya endamên hêza xweparastinê ew nasdikirin jî cara yêkêbû rêya wî bi wargehê ketî, nûbû û nûbûntiyê rakêştiyek cuda li fermandarê sebrîn bar dikir. Belkî jî ya ew ciwanê hê temenê wî ne gihatî bîst û pêncê evqas yardar dikir tiştek dinbû. Hin dem hene, dilan dadileqîne û di çincîrka tirsê de dihejîne. Aha di wê bêhnê de hewarî dibin yar, dibin pêjan û tirsê ditirsînin. Gelo Karker û hevalên xwe li hewarê hatibûn, nayê zanîn. Ema ya misoger, heyîna wan têra her tişta qenc kiribû.

Dema mîla demjimara elefiringî nehê sibhê nîşan dida, hûr û gir, jin û mêr tevayê wargeha Nehdaran li derdora çala civîn lê were lidarxistin kom bibûn. Ji rêvebertiya wargehê Sebriyê Ker, Emerê reş, Polatê Çelî û fermandarê tabûra nû hatî jî di nav wan de li rexê çalê sekinîbûn. Herkes çaverêbû Karker civînê birêve bibe ema, Sebriyê ker ji nav koma rêvebir derket, hat û di nîvê çalê de rep sekinî. Bi hatina Sebrî re, mine minek ya ne razîbûyînê li ser Nehdariyan ketibû.

Xoxê ya Gundikremoyî, Eyşê ya Dehlî, Fatê ya Repinî û rêzek jinên temendar û hema bibêje hemî bi tenga hev re li pêşya girseyê li raser çalê rûniştînbûn. Xoxê, bidestê xwe fermandarê destên xwe lipişt xwe girêdayîn nîşakir û got;

“Hema bila şûna Sebrî, vî hevalê xweşik civîn rêvebiribya.”

Wekî her tim ala partiyê di destan de Yadê Fatê, kefiyek kesk

û sohr û zer biser kitana spî re bi eniya xwe re  hişk şidandî û bi awayek amadeye ji girî re, xwe kelegirîkir û bi devoka xweya xas goyîkî tevlî sohbeta dapîran bû;

"Kurê Zelîxêye. Ay.. dayîka te nemîne, diyê gwehrî. Giya li ber bejna wî zer dibe."

Wekî her tim dîsa bi dengek darizandvan Eyşa Dehlî, axaftina cîrana xwe birî û pirskir;

" Çima kes hej vî Sebriyê ker nake?"

Xoxê, bihêlwesta xwe ya bê minet, gotinrû û xeber req dewamkir;

"Hema xwîna min na tevize vî camêrî. Tiştek ya wî namîne Hevalan û ne wekî Hevala ye. Belkî ev gotin li we xerîb were ema, rêveçûyîna wî jî namîne ya Hevalan xwêkê. Nizanim, Hevalan ev teşabet ji kû peyda kirî ye."

Girseya ji bû rêzgirtina şehîdên şoreşê rabûyî jipiya dawî li civata dayîkan anîbû.

Sebrî, di nîvê çalê de rep sekinîbû û girseya li derdora çalê rûniştî bi bin xwe re lê dinêrî. Evê jî di dîtinê de zelamê guh giran û bi çandek bîjî firşik bûyî, di ser hev de dibir û piçûktir dikir. Sebrî kêmekî li ezmanan nêrî, dubare serê xwe berda ber xwe. Du, sê caran koxî û bi Kurdiyek peritî, sê behrên  gotinên wî turkî dest bi axaftinêkir;

"Gelê minê welatparêz! Yêk rojev û fer mijara me ya civînê, barkirine.  Ji hinga em hatîn vêdê û pêve, di hevdîtinên me û rayedêrên Êraq de dabaşa me ya sereke her tim barkirinbû. Ema bi mihaneyên cor bicor xwe mijûl dikirin û bi paş têxistin. Rayedarên UNHCR jî alîgirtiya dewletê dikirin û bi hêlwestek wekî her tim ne jidil digotin; "heke hêza desthilatdar cêh bide û berpirsiyartiya ewlekariya we bigre ser xwe, ya dikeve ser milê me em jî yê pêkbînin." Serî werhasil, heta niha em li vêdê hiştin.

Di hevdîtinên di asta jor de yên hevalê Riza û hevdîtina doh ya komîteya me ya karê jiderve bi rayedarên Êraqê re kirî, biryara barkirinê hatiye dayîn. Li gor biryara hatî girtîn, di nav yêk, du rojan de barkirina dest pê bike" û ji bû barkirin rêxistî, birêkûpêk û bê pirsgirêk pêk were dirêj, dirêj şîretên xwe rêzkirin rêveberê Ker.

Sebriyê dema taxivî te digotqey dansa Îsqoçî dike, zirtên wî bi hewa ve difirîn, destê xwe li kûrika xwe dida û digot; "her tişt di vêdê de ye" diyare ji aliyê jorê xwe ve bi awayek mucid hatibû hişyarkirin. Ji tona dengê wî bigre heta bi tevgerên laşan û bitosintî hilbijartina peyvên bikartanî; hema bibêje her tişt guhertibû û pir bibaldar tevdigera.

Lê, ew bêjeya gel bêhna xwe girtî û bi bê sebriyek dilqelqîn çaverê, hê jî  ji devê rêveberê Ker ne derketibû. Hê jî kesî navê cihê

warê nû nizanî. Ew navê di mejiyê wan koçberan de mereqek rakêş avakirî, hê jî raza xwe diparast. Li aliyê din, hizra 'ma çi wateya navê cihê nû heye' di ramana girseyê de ne bê hukimbû. Jixwe ji wêdê û şûn ve, jixeynî çend kesên berê pêşmergetiya PDK'ê kirîn û qismek yê temenê xwe li bajarê Mûsil derbazkirîn tu kesî tider nas nedikirin. Ya tekez û rastiya wê bê guftûgo, warê nû avî û xweşbû. Evê jî têra aramtiya mejiyê wan kiribû.

Rêvebirê, ji ya çi bêje zêdetir li ser yê çawa bêje raman dibû, di dewam axaftina xwe de jî navek tekez kifş nekiribû û tiştên herkes dizane dubare kiribûn. Di dawiya axaftina xweya dirêj de got;

"Li gor soza dayîn me, siba an jî dusiba barkirina destpê bike. Her neh, deh malên tiştên xwe bêxin tirimpêlek barhilgir de û gel jî yê bi otobisan here warê xwe yê nû."

Bi gotina otobisan re tilsimek tevzker dêmê Nehdariyan pêçabû û Dehamê Avyanî devê xwe nêzîkê guhê hemgundiyê li tenişta xwe Yasînê simbêl boq kir û bi dengek nivz got;

"Hey lo min ne bawero. Cara yêkêye helefe (DY-UNHCR) yên me li otobisan siwar bikin."

Rêvebirê li ser bertekên gel û hişyarkirina jorê xwe wê sibha Gulanê hingî bixwazî siyanetkar tevdigera, mafê axaftinê dabû koçberên Nehdaran.

Hesenê Qulabî;

"Heval, em hemî jî baş dizanin; destê me yê bazarkirin, cêh bijartin û tercîh kirinê ne xwirte. Mixabin kurdên Kurdistana em ji bû rizgarkirina wê derketîn rê, em ber bi yêk ji dagirkerê herî xedar yê Kurdistanê ve ajotin. Ya em dixwazin eve; em naxwazin çavê me li destên Helefeyan an jî hin din bimîne. Me di vê rêvantiyê de ev saziya dilxwede mirovyar û di rastiyê de neyar baş naskir. Em mirovên rêncberin. Heke li warê nû, em bikaribin xwe bi heywan û keda destê xwe xweyî bikin ya pir başbe."

Piştî Hesenê Qulabî bêhn veşirî rûnişt û rêvebir tiştên Hesen gotîn li ser defteroka xwe ya piçûk nivîsandin, mafê axaftinê da kesê tenê destê wî li hewaye. Emerê Îsîfê Hîlalî rabû ser xwe, bi her du destan şaşika xwe ya goyîkî rastkir li girseya rûniştî nêrî û got;

"Niha bila kes şaş fêhm neke, di serê vê rêvantiyê de kuştin jî hebe, şewitandin jî hebe ji bû min veger ne mimkûne. Bê goman tişta partiyê qebûl kirî, em jî qebûl dikin ema, ez û tevayê gel mereq dikin, cihê em herinê li nav Erebaye, Kurdaye, cihek çawaye?"

Bi rûniştina Emerê Îsîf re, bi teşwîk û tehfdana dayîkên li derdor Emîna Hedrîşî mafê axafitinê girt;

"Heval, yên ciha xweş jî dikin û ne xweş jî dikin mirovin. Heke em hevgirtîbin, jidil bi şoreşa xwe re bin, cihê em herinê çiqas ne xweş jî be em dikarin xweş bikin. Ema ji Partiyê du daxwazên me

yên girîng hene. Yêk; divê destê me û Hevalan ji hev qut nebe. Du; divê ti hêzên jiderve tevlî rêvebertiya me ya navxweyî nebe. Wekû malbatên Şehît, gêrîla û welatparêz ev xeta me yê sohre û serkeftin."

Çend kesên sist, leq û baweriya wan qels bûyî xwestibin dilsarî, bê baweriyê pêşbêxin jî bibandor nebibûn û gotinên wê dayîka bejin navîn, lewaz û esmer ji tevayê kesên bi pişt re mafê axaftinê girtîn re bibû rêber û bi banga "hevalan skêçek amade kiriye bila kes belav nebe" dawî li cîvînê hatibû.

Dabaşa sikêçê, dîsa rêvantiya Nînûva ya ber bi Nehdaran ve bû. Samoyê Mele Mihyedîn, destek cilê nû yê Bohtanî û xwire-xwir jê tê li ber, Sebriyê Ker dileyîst. Lezgînê Teybeta Hîlalî, dîsa cilên gêrîla li ber ema, cilên xwerayîn û kêmek kevîn rola Cûma yê ji lingek yê xwe dilicime girtibû. Şeva ji Nînûva hatina Nehdarê zindî dikirin. Sebrî û Cûma, bi rê ve li rasta dayîkek yêxtiyar û di bin piştiyê li pişta xwe de ji hal ketî hatibûn.

Di destê Sebrî de cîhazek bêtêl, bi zimanê turkî bê navber ferman li ser fermanan dida milîsên di nav wargeha Nênûva de mayîn û dayîka bipiştî ji nedîtî ve hat û bi ber re bûrî. Cûma, piştiyê dayîkê hilgirt, bi desta re girt û li pey Sebrî meşîn.

Diyaloqên Sebrî û milîsan Casoyê Dêrhînî li pişt perdê û Samo pêktanîn;

Casoyê Milîs:

"Heval bir qisim Mijînî xwe li girkê Mijîniyan asêkirine û gelmiyor." *(heval, hinek Mijînî xwe li girkê Mijîniyan asêkirine û nayen.)*

Samo (Sebrî yê Ker);

"Ne demek gelmiyorlar ya? Kafalarına sıkın ve getirin." (*Çawa nayen, berdin serê wan û bînin.)*

Milîs;

"Heval, ben de jî dedîm, hevalan jî dedî û sende jî dedîn ema, heke em berdin serê wan, yên bimrin û nikarin werin." *(Heval, min jî got, heval jî gotin, te jî got ema…)*

Skêçvanên skêç dileyîztîn bi ti awayî perwerdeyek ya huner nedîtibûn û piraniya wan xwendin û nivîsandin jî nizanîn. Ema, jixwe devoka goyiyan balkêşbû û devokek xas û bê qusûr ya wan ciwanan bikartanî dibû tema, reng û xemla leyîstokê. Tenê axaftina wan, têra mirov ji kenan zik û pişt bibe dikir.

Ji xeynî Sebriyê Ker, tevayê temaşevanan ji kena zik û pişt bibûn. Sebrî, di navbera Emerê Reş û Fermandar Karkerê Nerexî de rûniştîbû û ji acizî rûyê wî bê navber reng diguhert. Karkerê bideng dikenî, devê xwe êxist di ber guhê wî de û got;

"Di pergalek demokratîk de huner eve. Hunera rast, bi awayek vekirî rexnekirina kêmasiyane. Çima tu aciz dibî? Divê tu

bi demokrasiyê re hevnas bibî û ji tirsa hunermendan baldartir tevbigerêyî hevalê Sebrî. Wate, hingê huner û hunermend bi heqîqeta xwe re bûye yêk.” Wekî girê xwe bi Sebrî bixwerîne Karker, bideng kenî û dewamkir;

“Tu spasekî deyndarê van ciwanayî.”

Rola dayîka yêxtiyar Ekroyê Ziravikî zindî dikir û diyaloqa dayîkê û Sebrî destpêkiribû.

Dayîk; destê wê di destê Cûma de bû ema, bi Sebrî re taxivî;

“Diyê gwehrî, ka hûnê me bi kû ve bibin? Di bin vê berf û baranê de, li ser van rê û rêbaran emê bi vê koma kuflet ve çawa jiyan bibin?”

Sebrî yê Ker; destê xwe li kûrika singê ya êlekê xwe da û nîvî bi turkî û bi kurdiyek peritî bersiv da;

“Anê, qet ema qet mereq nekin. Her tişt ema her tişt di vêdê de ye.”

Dayîk;

“Diyê gwehrî, bavê zarokan şêvekoriye û ji me wunda bûye. Dayika te gwehrî tebe, ka baş binê re ew jî ne di wêdê de ye.”

Gotina pêşkêşvan ya “dîlan serbeste” kenê bideng yê temeşevanan jî û ji qehra sohrbiyîna Sebriyê Ker jî bi xwe re biribû û herkes rabibû dîlanê.

Şeva heman rojêbû. Ji nîvê şevê kêmek derbaz bibû. Ji bilî dengên kite-mitên fîşekên xetatên yên ji çeperên pêşmergeyan diteqan, bi ser çadir û xîbetên wargehê re derbaz dibûn û li kaşê beramber wunda dibin tiştekî bê dengiya şevê xira ne dikir. Taxima Tahirê Osmanê Hîlalî, li çepera Rojhilatê derbenda di navbera wargehê û pêşmergeyan de nobedarbû. Tahir, taxim di çeperê de hiştibû, Sekvanê Bilehî jî girtibû cem xwe û di navbera her du kuzikan de kemîn avêtibû. Rojên dawîbûn û pir baldar tevdigeran. Ne dixwestin di wan rojên barkirinê de pêşmergeyên mala Berzanî bi bêbextî biçirizin nav malan û qetlîamekî pêkbînin.

Tahir û Sekvan, li serê dolika vêl xwe zikikî avêtibûn erdê û bibaldartî li aliyê PDK’ê dinêrîn. Ji nişkan ve di nav giyayê li teniştê de xiş-xişekî guhên wan hingavt! Dema bi baldartir li cihê deng jê tê temaşekirin, kesek pişt tewandî, serê wî yê keçel di bin elenda heyvê de diteyîse û ji dizî ve bi aliyê pêşmergeyan ve tevger dike li çavên kemînvanan ketibû.

Sekvan, bi dengek gefker ema ne zêde bilind, li kaşeya qilêşa xwe da û got;

“Tu kêyî? Xwe ne lepitîne min tu kuştî!”

Destpêkê kêmekî dengê zilamê keçel û êdî jipiya rep sekinî xirabû ema, zû xwe komî ser hevkir û bidengek bilind û rexnebarkirî bersiv da;

“Ezim heware.. ezim! Ma hûn nahêlin em birîne jî bavo, hewara xwedê!”

Nobedaran dengê Cemalê Çemanî naskiribûn ema, xwe lê ne anîn der û Tahirê kenê xwe bizorê zeft dike got;

“Destê xwe deyne ser serê xwe yê keçel û ber bi me ve were!”

Cemal dixwest, bi qelebalixek ne asayî xwe ji wê belaya ne di hesab de rizgar bike, bi şerefa xwe ve bizivire nav malan û heta jê dihat şen dikir.

“Kuro tu kêyî ezê bi gotina te destê xwe deyim ser serê xwe. Me ji te re got ‘em hatine birîne, birîne’. Qey tu rîtînê nizanî” û bigotina xwe re hewlda bi şûn ve bireve.

Kemînvanan destsiviktî kirin û her yêkî ji aliyekî ve gihatin Cemal. Zilamê wekî nîriya di nav avê de ji serûbin dilerize, dan pêşiya xwe û anîn çepera mak. Fermandarê bêlûkê Metînê Heletî û Tahirê Gabarî li çeperê mabûn.

Piştî Tahir ji fermandarê bêlûkê re rewş ravekir, Metîn ji Cemal re got;

“Te vî çaxê şevê xêre, tuyê bi kû ve çûbûya?”

Cemal, xafil hatibû girtin. Hê kes din ne bihîstî û di nav wargehê de hetka wî neçûyî dixwest xwe ji destên nobedaran rizgar bike. Ema çawa? Di serê xwe yê keçel de fikek çêdikir û deh jî xira dikirin.

“Kuro, destava min dihat û çav lixew derketim jiderve. Tu nebêjî, ne hatime ser hişê xwe û min hew dît hevalan dengê xwe li min kir.”

Metîn ji acizî kenî û heta destê wî çû paş zeleyek danî binê guhê Cemal. Guriya saroxekî ji ber çavan çû û lihev zivirî ema, neket.

“Rast bêje! Nixwe bi evîna Serokatiyê sond dixwim, ezê dest û lingên te girê bidim û siba li meydana civînê, li pêşya tevayê wargehê peletforma te bidim çêkim.”

Cemal xwirimîbû êdî. Ava di çavan de kom biyî di bin elenda heyvê de di teyîsî. Xwe avêt destê Tahirê ji Metîn nermtir dixwiyê û bi dengek lavekar got;

“Min kerîtî kir, min bibexşînin. Ez li bextê Serokatiyê me; bila kes pê nehesê! Hetka mina here û êdî nikarim di nav vî gelî de serê xwe rakim.”

“Bila, emê te bibexşînin ema, tu jî yê sozekî bidî me.”

Cemalê bi dengê însafdar yê Tahir hîvîdar biyî, xwe baştir komî ser hev kir û got;

“Bes, bila kes pê nehesê, soza xwedê be hûn çi bixwazin ez bikim.”

“Tuyê niha herî mal. Heta sibehî ne nivî û tiştên PDK’ê anîn serê te bifikirî û wekî şerîta fîlmekî ber çavên xwe re derbaz bikî.

Sibehî zû rabî û werî navenda me. Ezê pirtûka Serokatiyê ya binavê 'Ziman û Çalekiya Şoreşê' bidim te û heta tu neqedînî tu dev jê na berdî. Başe hevalê Cemal?"

Cemal, bi keyf û kelecanek mezin pêşniyara Tahir li ser ser û her du çavên xwe pejirand û berê xwe da nav malan. Piştî Cemal ji wan veqeta, nobedaran hev şîretkirin û bûyera Cemal qet û ti carî ji devê wan derneket.

**Nehdarî Bardikin**

Demjimara elefiringî heft û pênç deqîqe û li gor salnameya filhan bîst û çarê Gulana hezar û nehsed û not û heşt dinivîsand. Ebû minafiq li pêşyê, karwanê tirimpêlên barhilgir ketibû di nav wargehê de. Bi rê nîşandayîna komîteya amadekar ya barkirinê û bi seferbertiya tevayê erkdaran berê tirimpêlên kevin, bêmerîs û ajotvanên wan bikiras û egal dabin semta dawî. Jixwe sist û leq, neqayîl û vînlewaz hemiyan xwe li wê dawiyê dabin hev û dengên "ma tenê em kurdin, em westihan êdî bese" qels û lewaz jî be ji nav wan bilind dibû. Rêvebertî, ji qismek malên li wî alî piştkulbû û dixwesta wan zû birê bike.

Bihatina tirimpêlan re, Nehdariyan du hêstên sereke bi hev re jiyan dibûn. Yêk; şadîtî ya encam çi dibe bila bibe, ji PDK'ê dûrketin û li cihek ewle jiyanbiyîn bû. Du; jana ji ax û nirxên ji bû pîroztiya wan derketîn rê dûrketibûn. Belkî jî cara ewilbû, hêstên jandar yên xerîbiyê dilê wan bi dijwartî diguvaşt. Yên bikûve çûbûna, cihê herinê çawabû, yên li wêdê rû birûyê çi mabûna; qet fikrek yê kesî tinebû. Ema, ramandina tevayê ew hizrên neyînî têxistin der û avek hunik li hinavên wan werdikir; baweriya bi Hevalan bû. Zirme, zirma ramana 'heke hevalan gotibe, ne xweş jî be ema misoger raste û başe' di serê wan de lê dida. Ji berkû Hevalan ti carî derew li wan nekiribûn, di bin ti şertan de pişta xwe nedabûn wan û li her cihê ketîn di tengahiyê de bi berdêlê canê xwe jî be rêyek nû û bişeref ji wan re vekiribûn. Êdî, ya ew lê digeran ne xweşiya jiyanê, parastina namûs û şerefêbû.

Ji dawiya semta çar bibeza bayê barkirnê destpêkiribû. Jixwe tiştek yê wan tinebû û ji bilî girvan û nobedarên parastinê, tevayê erkdaran li dora tirimpêlan kombibûn û mal bardikirin. Rayedarên UNHCR'a mirovyar, dîsa Nehdarî şaş nekiribûn û ew rêvanên hêstbijûn mirov ne hesibandibûn. Belkî jî di nezera wan de Nehdarî ne mirovbûn. Jixwe ger dihata gotin; "Helefeyên ji bû mirovan otobisan hazirbinkin" jî tu kesî bawer nekiribû û hesabek wusa mejiyê wan re jî derbaz nebibû. Tiştên deh, pazdeh malan li tirimpêlekî dihatin barkirin û tevayê endamên malbatan jî li ser

tiştan siwar dibûn. Her tirimpêla barê xwe digirt bi ber bajarê Şêxan ve ji wargehê derdiket û li ser rêya qîr rêz digirt.

Dora barkirinê nû gihatibû taxa çaremîn ya semta yêk. Çend malên wekû giregirên gundê Mijîn dihatin zanîn û bê dilê xwe ji Nînûva jî hatîn, xwe ber barkirinê re ne dikirin. Jin û zarok wan ji çadiran derneketibûn  û di destên wan de dar û kupal, zelam li derê malan bê tevger radiwestan. Awrên wan şkestî û rûyên wan tirşbûn. Simalê Rimedan li dûv, ji komîteya amadekar ya barkarinê Cemîlê Amedî hat û li derê çadira Ehmedê Îsayê Mijinî rawesta. Bi rûyek ken û dilnivz ji malxwêyê şaşik melkep re got;

“Mamê Ehmet, hûn çima barnakin?”

Muhemet Nûrî rê neda bavê xwe, bi awayek ji dûh ve ji şer re amade bersiv da;

“Em bar nakin, ma hûnê me bi kutekî bibin?”

Wekî her du alî jî li hêncetan digerên, Simalê Rimedanê Hîlalî jî biheman şêwazî bersiv Muhemet Nûrî da û got;

“Hûnê bar bikin û bê hemdê xwe.”

Yêk ji Simal, yêk ji Muhemet Nûrî û xwe kişandin hev. Cemîlê berevantiyê dike ji ser pozê xwe kulmek ji Muhemet Nûriyê Ehmedê Îsa xwar û dibêjîqey biherikandina xwîna  bi pozê Cemîl re dahola cengê lêxistibû! Êdî, kefka kupalan ji hewa ve li hev diketin. Ji bû şer mezin nebe piranî erkdar, Cemîl û qismek Mijinî hewlek mezin dimezaxtin. Ema, di serî de Ehmedê Îsa û zarokên xwe, biqasî şeş, heft malên Mijinî ji zû ve ji şer re amadebûn û li rasta kê dihatin li wan didan. Mam Resûlê bejin kurt, rû dewisî ji jêlil hat, dijûnên giran kirin  û ji bû li Mijînya bidin nav li Hîlaliyan da.

Haciyê Ebo yê Mijinî, wekû bersiva Resûl got;

“Resûl, gotinên ji xwe zêde neke, ev ne Pirka Xweşanê ye.”

Tevayê wagehê qulibîbû cihê şer. Şerker û berevan tevlîhev bibûn û kê şerkere, kê berevane ji hev ne dihatin veqetandin. Ji Mijiniyên di nehatinê de xwe kifşkirîn û di bin kupalan de dinalîn bêhtir, qismek kesên ne dixwestin barbikin û cesareta xwe kifşkirinê ne dikirin; hingî ji wan dihat şer gur dikirin. Wan kesên dabaşa gotinê ji Mijiniyên ne razî zêdetir, li Mijiniyên berevan didan û dixwestin eniya ne raziyan xwirtir bikin.

Yûkselê Bilehiyê darek stûr di destan de, jêlil hat û dar danî serê Salehê Muhemedê Mendîz. Xwîna di nav çavên Salehê berevan de diherikî, di cêh de depê singa zelamê ciwan nixwimand. Sebriyê Kerê êlekê wî liba dibî û agir ji deva dibarî bi dengek bilind û turkî got;

“Vurun onları! (Li wa bidin!).”

Bi gotina Sebrî re yên heta hingê berevantî jî dikirin derbazî aliyê asayîşê bibûn û datanîn Mijînyên ne razî.

Tam dema berevan kêm û şerker zêde biyîn, qir û qiyamet li ser serê çend malên Mijîniyan rabiyî, sê heval li dûv fermandar Karkerê Nerxî da der. Karker, bi dengek bilind qêrkir û got;

"Rawestin!" û ew bi hevalên xwe ve ket di navbera aliyên şer de.

Bi dengê fermandar re çengên şerkeran daketin û darên xwe di ber xwe de berdan. Hin kesên jixwe fihêt û nizanin çima tevlî şer bûne jî ji zû ve darê xwe avêtibûn û bi awrên şermokî li erdê dinêrîn.

Fermandar, ji rêvebertiyê Sebrî û Cemîlê hê jî şirikên xwînê di sera de diherikin û ji aliyê naxwazin barbikin Ehmedê Îsa, Eliyê Seydo, Haciyê Ebo û çend giregirên din yên Mijiniyan di bin çadira Eliyê Seydo de kom kirin. Axaftinek kurt, hêstî û bibandor ji civata rûniştî re kir û çavên xwe yên gir û genimî existin di çavên Ehmedê Îsa de û axaftina xwe ajot;

"Mamê Ehmet, ne ji bû dê û bavê wî li ser pariyek nan bigirîn û xwe bavêjin ber lingên xayîn û xwefiroşan Şehît Lezgînan (Kurê Ehmedê Îsa) canê xwe fedakir. Ji bû dê û bavên wan heta dawiya bê dawî bikarinbin biserbilindî û bişeref jiyan bibin xwe fedakirin."

Ehmedê Îsa, bi hêlwestek poşmanbiyî û şermbarkirî got;

"Heval, niha hûn dixwazin me bibin cem Sedam. Ma çi ferqa Sedam û mala Berzanî heye, her du jî dijminin."

Kurê Ehmedê Îsa Muhemet Nûrî yê şer gurkirî û herî zêde bûyî armanca derbên erkdaran, bi ser milê berevanan re got;

"Bila mirovên duqon xwe kifş bikin. Hin erkdar û dilxwede rêvebirên we, ji bû em bar nekin me gurxweş dikin û heman kes jî gilhe me li cem we dikin. Soza xwedê be, yan emê di vê qampê de bin yan jî ew!"

Muhemet Nûrî, bi awrên xwe Evdoyê Mijînî nîşan dikir û bi gotinên wî re hemî awir zivirîbûn ser mirovê enî rût û birh spî.

Bi gotinên manîdar yên Muhemet Nûrî re tilsimek tevzdar dêmê zerîn yê fermandar nixwimand ema, zêde lixwe ne anî der. Beşişî û wekî gotinên kurê wî ne bihîstibin bersiva Ehmet da;

"Raste! Yêk ji dagirkerê herî xedar yê Kurdistanê Sedame. Ema mixabin, ji neçarî jî be meclîsa we bi hukumeta Êraqê re peymanek çêkiriye û di encama wê li hevkirinê de hûn bardikin. Heke em bi hev re bin û rêxistîbin tu kes nikare bi hisiyeta me bileyîzê. Berevajî, hûnê di nav lepên xayînan de rezîl û şepirze bibin."

Bi hêlwestek dilniya, jixwe bawer, yardar, beşaş û wekî xalê deyne pêşya neyîntiyê ,destê xwe li singa xwe da û gotinên xwe ajotin Fermandar;

"Xeman ne xwin û bila tirsa we nebe hevalno. Ez û tabûra xwe jî bi we re ne û ti hêz nikare tevlî me bibe."

Malên ne qayîl, zû qayil bibûn û bi arîkariya erkdar û cîranan barkiribûn û karwanê roja yêkemîn ber bi Şêxan ve derketibû rê.

Giyayê li derdora rêya Şêxan tiştek ji keskîtiya xwe wunda nekiribû û li ber bayê nerm û hunik xal xalok diketin bejna wî. Tirimpêla Ebû minafiq li pêşyê, karwan ketibû di nav bajarê Şêxan de. Piranî koçberên li ser pişta tirimpêlan, ji berya hingê ji dizî ve hatibûn û ne baş jî be ew bajarê sar û cemidî dîtibûn. Ema cara yêkê bû bi çavên serbest û azad li zikakên lewitî yên bajarê Êzdiyan dinêrîn.

Li seranserê her du aliyên rêya di nav bajar re derbaz dibû leşkerên Êraqê rêz girtibûn û ji tirsa leşkeran şêniyên bajar xwe vekişandibûn  di mal û dikanên xwe de û ji dizî ve li karwanê ber bi nekifşbûyînê ve diherike temaşe dikirin. Tenê tole û seyên li ser şikêrên geleşê di zikakan de bilind bûyî, azad û bê tirs dinirijîn hev.

Karwanê ji pêncî tirimpêlên mal barkirîn, du tirimpêlên barê wan çêlek û sê tirimpêlên pez hilgirtîn rêya mak ya di navbera Zaxo û Hewlêrê de qut kirin û berê xwe dan berîstana bê ser û bin. Ji xeynî Ebû Minafiq û çend hevalên wî yên bi tirimpêla xwe ya teybet pêşya karwan dikişandin, ne kesî dizanî ewder kûdere û ne jî berê wan li kû ye. Karwan ketibû di deştek bê dawî de û her kû pêşdiket giyayê li Nehdaran kesk pelezerî dibû û wexmek dijwar û germ dêmên rêvanên li ser pişta tirimpêlan talîst.

Dema bayê keziyek hewa hûnik lê dêmê karwan dîda, gihatibûn rasta bajarek di nav darê zeytûnan de wunda bûyî. Di nav bajarê avî û xweş de zengilê dêra filhan, minara mizgevta misilmanan û  stûna bîst û yêk per ya remza Êzdiyan li tenişta hev disekinîn. Teybeta Hîlalî ya wekî her tim gêwil bilind û rûgeş,  li keçtiya xwe ya spehî zivirî û got;

“Keçê Kurdê, mane van Apociyan gotibû, emê we bibin cihek avî û çiyayî. Ew cihê behs kirîn ne evder be?”

Kurdistana gewr û nû gihatî, hêstirên çavên xwe yên genimî paqijkirin û bidengek kelegirî  got;

“Xwezî!”

Ema karwanê tirimpêlan birêya mak re ji bajar bûrî û yêkser berê xwe vegerand Başûr. Ji bû rêya wan li nav bajaran nekeve rayedarên Êraqê, ew bi rêyên nependî re dibirin û li her du aliyên rê binavberên kurt leşker hatibûn rêzkirin. Bigotina Êraqiyan, Şirteyên çekên xwe çeprast girtîn, li ber rê di amadebaşiyê de rawestabûn. Pir caran tirimpêl bi rêyên ax re derbaz dibûn û rêvanên di bin tîrojên roja deştê de qemitîn, di nav tozê de kêmek mabû bixeniqin.

Dema karwan di qontara çiyayekî re derbaz dibû, Ehmet Atarê di ciwantiya xwe de çend caran rêya wî bi Mûsil ketî ji hevrêyên xwe yê di nav tozê de gewr bûyîn re got;

“Hema bixwedê, heke ez ne şaşbim ev çiyayê Mexlûbê Şêxaye. Heke ev Mexlûp be, ev bajarê li Rojavayê me jî Mûsile.”

Evdila Yilmezê gundiyê Ehmet û mijgûlkên wî jî di nav tozê de wunda bûyîn, bidengek acizî û xemgînî têkel tevlî sohbetê bû got;

“Wate em ji Mûsil jî bûrîn.”

Rêvanên nizanin yê bikû ve herin, hazirtiyên rêyek evqas dirêj û zehmet jî nekiribûn. Jixwe derfetên hazirtiyên xwe bikiran jî tinebûn. Her malbatê du, sê bûdonên pênç lître av bi xwe re anîbûn û yan ji germa nikarin vexwin yan jî ava wan ji zû ve xilas bibû. Zarok, ji germa û têhnan digiriyan û dê û bavan ji qehra nikarîn li rûyên wan jî binêrin.

Karwanê tirimpêlan birexa derek ji hemî rewşa wî kifşe cihek dîrokî re derbazbû û gihat ser rêyek mezin. Bi rêya ji boşatiya tirimplên wê kifşe bajarên mezin bi hev ve girêdide re nû biqasî nîv demjimarî meşîbûn. Demjimar du û nîvê piştî nîvro bi ser pirek dirêj ya li ser rûbarek mezin re derbazbûn û li Başûrê serê pirê sekinîn.

Wê vesekinînê û wî cihê avî, avek hunik di hinavên di peritin de kiribûn û jidil yêqînkiribûn kû cihê warê wan yê nû ewdere. Heta hinan hazirtiyên danîna malan jî kiribûn. Ema,  ji gotûbêja li tenişta rê di navbera şandeya wargehê û rayedarên Êraqê de dewam dike û ji hemî halê wê kifşe nexweş û dijwar derbaz dibe hîviyên rêvanên ji bû mal danînê xwe keysxweşkirîn zû şikandibûn. Ebû minafiqê ji tevgerên wî kifşe hatiye acizkirin, bidestên xwe nîşana ‘dewam bikin’ da ajotvanên tirimpêlên karwan.

Hêstirek gir ji çavên birng yê hevjîna Îsfê Mendîzê Mijinî re daket û li ser lama wê ya di bin toz û germahiya dijwar de jî tiştek ji spehîtahiya xwe wunda nekirî cûyek kûr vekir. Jina navser û bejin navîn mirîşka xwe ya belek ya ji germa fetisî di tenişta tirimpêlê de avêt, li kurê xwe yê di şerê wê sibhê de serê wî şkestî û şopên xwînê bi ceynikan ve hişkbiyîn nêrî û got;

“Salihê min, qey em ne vê sibhê birêketibûn?”

Salihê ji tirsa girî ne wêrî li çavên dayika xwe binêre, awrên xwe pesartin çiyayê li milê rastê sirta wî wekî pişta hêştirekî xwehr û mehro ber bi Başûr ve dirêj dibe û bersiv da;

“Belê diyê, çima pirs dikî?”

“Kurê min, cihê em jêhatîn bihar bû, li vêdê havîne” got û kelagiriya di qirika xwe de asêkirî êdî zevt nekir û berda. Hevrêyên dibin tîrojên bişewt yên ew mirov ti carî ji derbên wan yên ewqas dijwar re nebiyîn şahit jî nemerdî nekirin û tevlî giriyê jina spehî bûn.

Li çar rêya din nîva deştekî de, li ser tebeleya rêya Başûr nîşan dida ‘Kerkûk 80’ nivîsandibû. Yên car û zemanan rêya wan li bajarekî ketîn, ji yên din re gotin; “bajarê Kerkûk, heştî kêlûmitreyan

ji vêdê dûre.” Karwanê tirimpêlan li çar rêyê berê xwe ber bi Rojava ve zivirand û ket di nîvê deştek rast û mezin de. Dexlên zewiyên li her du aliyên rê ji zû ve hatibûn durûtin û melûyên qirşê ji ber devê derasê mayîn li ber bayê bela wela bibûn. Di nav xwimama tozê de ji dûr ve milek rût, dirêj û ne zêde bilind dixwiya. Li ser pişta tirimpêlan bayek dibêjîqey ji nav pêta dojehê derdikeve, li rûyê koçberan dida û şirikên xwêhdanê di eniyan wan de tanîn xar. Ya star, toz û xwêhdan li ser dêmê wan zivirîbû teqna heriyê û çermê di bin wê teqnê de mayî ji germa lûçikîbû.

Her kû diçû, sirtê beramber nêzîktir dibû û çiyayê rût û sik qet ne dima çiyayên wan. Li neqebek teng û pozê du girikan nêzî hev dibe, karwanê tirimpêlan ket di nav çêlek toza spî de. Toza wekî badeva berfhûrkê û ji hewa ve wekî girek ewrê spî dixwiya wekî depoqanê bi rûyên bixwêhdan ve dizeliqî û li ser rûyan vedigera teqnek tîr. Nefesa zarok û mirovên li ser pişta tirimpêlan qut bibû û ji kezebê dikoxîn. Kengê pozê tirimpêlên karwan ji neqebê daket aliyê din, bi nav toza êdî rengek sohrî ve girtî re reşek wekî latek gewr û bilind di nîvî deştê de derketibû pêşiya wan. Emerê Îsîfê Hîlalî, destê xwe ji çavên xweyên ji toz û xwêhdanê dişewitin re kir çeper û got;

“Ev sayloya genime.”

Hevjîna wî ya xavika spî li rûyê xwe pêçayî û tenê çavên wê dixwiyan bi hêlwestek şaqis mayî pirskir;

“Kuro Emer, vêca ‘saylo’ çiye?”

Yêxtiyarê di ser hemî halan de xwe bi zanebûna xwe kêmekî qure kirî bersiv da û got;

“Saylo, embara dehlê ye. Hingî ev deşt bixêr û berekete hukimet, ji bû dexlê di tê de biparêze embarên wusa çêkirine.”

Karwan, bi ber sayloya Mam Emer re bûrî û ket di nav bajarokek hişk, zuwa, xir û xalî de. Kite mitên mirovên di zikakên bajarokê ji gundek kêmekî mezintir de dixwiyan, dibêjîqey ji bin hedan derketibûn. Karwanê koçberan, zû ji nav wan şikere xayînên agir ji taqên wan vedidin derketibû. Tirimpêlên di bin tozê de reng guhertîn û hemî bi heman rengê sik hatîn nixwimandin, berê xwe zivirandin Başûr û bi qontara Rojava yê çiyayê tazî û şewitî re ajotin.

Ew du çarekbû karwan ji bajarokê kavil derbaz bûyî. Ebû Minafiqê pêşiya karwan dikişîne, ji rêya qîr veqeta û di nav erdek beyar re yêkser berê xwe da qontara çiyê. Wekî koviya pezê mêşin, tirimpêlên koçberan jî dabûn dûv. Toza gewra sohrî ve ya ji ber tekelên tirimpêlan radibû, wekî konek erebû dadîketibû ser rêvanên li ser pişta tirimpêlan. Bayê dijwar û keziyên bablîsokê li pêşiyê reqsa Torikî dikin, toza tîr û hûr di ebanda devên rêvanan de. Ji bilî mirovan, candarên di tiripêlan de ji zû ve fetisîbûn û li ber

rexê dirêjiya rê kelaşên mirîşkan, elokan, kêrvoşkan û lawirên din li hev diketin.

Karwanê tirimpêlan li qontara çiyê, di nav girê tozê de li hev zivirî û şandeya Êraqê fermana "dakevin" da koçberan. Jin û zilamên zarokên wan ji têhna, ji germa û ji toza dijwar û ew jî ji qehra xeniqîn û haxta bixeniqin xwe ji tirimpêlan avêtin û bi kerp bezin cem şandeya Ebû Minafiq. Emerê Îsifê Hîlalî li pêş û bi sedan kesan dor li şandeya Êraqê girtibûn. Mamê Emer, kefka kupalê xwe rakir jor û got;

"Ya minafiq, te em anîne vêdê çi? Ka we digot Ednaniyê li ber ava Zê ye, di nav dehl û hişînatiyê de ye? Te ji bû mirinê em anîne vêdê" û li Sebriyê Ker û Cemîlê Amedî zivirî, bi dengek rexne, gazind û lave têkel barkirî dewamkir;

"Sebriyê Ker, heke armanca we kuştina mebû pêwîst nedikir hûn me heta bi vê tehtil erdê bûnin! We dikarî, me li Nehdarê jî bikujin."

Sebriyê devê wî kefşîl girtî, mihrokên xwêhdanê di eniya wî de dihatin xar û çavên wî ji xwêhdanê sohr bûyîn serê xwe berda ber xwe û qet ne axivî. Ebû Minafiqê di boseya mirovên ji tozê vegerayîn pêkeran û agir ji devê wan dibare de mayî reng avêtibû. Ji qestîka xwe beşişand, ji tirsa qon û qono çû, li navguhê Sebriyê li pişt sekinî ket û got;

"Komîteya we cihek ewle xwest û artêşê ji me re got, 'Ednaniyê nêzîkê perelêla sêh û şeşe û em nikarin li wêdê wan ji êrîşên PDK'ê û Turkan biparêzin'. Ji neçarî me hûn anîn vêdê" û destê xweyê dirêj baskî Rojava ve kir û di bin tirsa siha kefkên kupalan de axaftina xwe ajot;

"Dîcle bi rex me re derbaz dibe, eve bîst kêlûmitreyan ji vêdê dûre."

Gel bi yêk dengî qêrî û got;

"Aha niha me vegerînin cihê em jê hatîn, nixwe emê we û xwe bi hev ve bişewitînin!"

Piştî şandeya wargehê jî hemfikirtiya xwe ya bigel re nîşan da, zelamê Tirkomen bi dengek melaq got;

"Wê demê çend kesan ji nav xwe hilbijirin û bila bi min re werin. Emê bigerêne û cihê ew qebûl bikin emê we bibin wêdê."

Koçberan, Îsifê Mendîzê Mijinî, Yûkselê Bilehî, Emerê Îsîfê Hîlalî û Ehmedê Amîna Kalhesinî wekû komîteya keşfa cêh hilbijartin. Dema komîteya keşfê li cîbên rayedarên Êraqî siwardibûn Ebû Minafiq, ji şufêrên tirimpêlan re got;

"Hûn jî hêdî hêdî li dûv me werin û di ketina Mexmûr de çaveriyî agayî me bisekinin."

Dawa kirêsê wê bibervekirî, destî bivirek têr kelem di desta

de û  ji şer re amade Teybeta Hîlalî, bi awayek aciz û wekî ji xwe re baxive got;

“Vêca Mexmîr kûdere diyê?”

Mûxaberetê guhdîk, bi dengek tevzdar pirsa Teybetê bersivand û bi beşişandinek melaq got;

“Ne Mexmîr, Mexmûr, Mexmûr.”

“Erê, erê Mexmîr! Ka her navê wê çi çopilme be” bersivand Teybeta li belayekî digere.

“Ew bajarê niha em bi nav re derbaz bûyîn.”

Jina dêm fireh û şirikên xwêhdanê li ser laman bûyîn co, lêhva xwe bada û bihêlwestek acizî û tevz têkel got;

“Bajar, de bajarê te serê te bixwe îşileh.”

Zilamê îstixbaretvan xwe nebihîstî kir, li tirimpêlên xwe siwarbûn û birêketin.

Dema şandeya keşfê berbi Mexmûr ve bi şûn ve dizirvirî li qontara çiyayê li pişta bajar, çend dar û cihek wekî mêrgê li çavên wan aliqîbûn. Emerê Îsîf, destê xwe baskî cihê mêrg ve kir û got;

“Di zena min de li vêdê av heye?”

Ebû Minafiq, gotin ji devê zelamê yêxtiyar û dewsên toz û xwêhdanê li ser keviya şaşika wiya kelekî girt û bikeyf got; “Belê, belê” û berê tirimpêlê da cihê dilxwede mêrg.

Dema gihatin cihê dilxwede mêrg çi bibînin; mêrga qesta wê kirîn biçend kursên rûlan û du, sê zirbiyên li ber serkeratê ew pêşwazîkiribûn. Bêhna gêjker, dijwar û genî ya ji ava diherike bilind dibû, li pozê wan da û erqên ferşandinê li ser dilên wan êxist. Şandeyê bi pozên xwe re girtin û ji coya avek  hişîna tarî dirijîne deştê texûpaş bûn.

Şandeya keşifvan li wêdê, jipiya civînek awerte lidarxistin. Sebrî got;

“Em nikarin bi şûn ve herin û em nikarin zêdetir li Nehdaran bimînin. Tehl jî be û genî jî be qet nebe li vêdê avek heye û evder nêzîkê vî bajarokiye. Pêşniyara min; em mala deynin vêdê.”

Emerê Îsîf;

“Ji bû bindest li ber tayê werin, serdest destpêkê mirinê nîşa wan dikin. Ya me jî bû ew mesele” û tevayê şandeyê biyêk dengî bûryar dan li ser wê mêrgê deynin.

Rêyek qîra yêk şerît ji Mexmûr dihat û li fitloneka binê dara bî û rojên xwe yên dawî jiyan dibe diqeda. Rêya navbûrî ji wêdê û şûn ve axbû û ber bi kavlê aşek yê avê re hawadiket û baskî qontara çiyê ve dewam dikir. Kavlê bîra aşê avê, hê jî jipiyabû. Li pişta aşê xirabe goristanek bê xweyî û li tenişta Başûr kavlê gundek mezin radiwesta. Di nav kavlên gundê dema li ser kewan xwe mezinbû, çend malên wekî koxikan hê jî avabûn. Du zelamên yêxtiyarên ji mal

derketîn, bi awrên şaqis li koma wan mirovên ser û guhê wan di nav tozê de wunda bûyîn û cil û bergê wan cuda dinêrîn.

Emerê Îsif, ber bi zelaman ve çû û silavek germ li wan da. Destê xwe baskî gundê kavil ve kir û got;

"Bira evder kûdere, navê vêdê çiye?"

Yêxtiyarê di nav cilên xirarî de duta dixwiya, bi zaravayê Soranî û bi dengek tepisî got;

"Êre Qesrane, Qesran" û dema zelamê şaşikek sist û melkebû li ser sera gêr vedayî xwe keysxweş dikir axaftina xwe dewam bike Emer rê nedayê û vê carê jî destê xwe baskî bajarê li paş mayî ve kir û pirsa navê wî kir?

"Ew şarê Mexmûre. Di wext û zemanê xwe de şarek gewre, navdar û xoşbû. Sedam, hemû cemawerê wê derîkirdiye. Êste xalî ye, kem xelk lê mawe" got û ji bû mereqa xwe derbaz bike rê neda Emer û pirsa "êwe kîne, êwe xelkê çênderêne" kir yêxtiyarê Qesranî.

Wekî li nav xwe bide bersiv da Emer;

"Em PKK ne, ji Bakurê Kurdistanê hatine."

Yêxtiyarê Sohran û di jiyana xwe de yêk ji peyvên ji devê bê dinan yê Emer dirijên ne bihîstîn got;

"Kûûû..?"

Emer, bi dengek hê bilindtir bersiva "PKK, PKK!" da.

Zelmê gundî dîsa got; "Kûû…?"

Mamê Emerê jixwe aciz, lêvegerand û got;

"Kû û quzilqurt! Hizbil Omal, Hizbil Omal. Tûrkiye."

Dema Emerê Îsîf û zelamê Sohran li ser zererên ava genî û zehmetiyên coxrafya wê herêmê taxivîn roja sohr perê xwe dikutan û hazirtiyên avabûnê dikir. Di heman demê de pêşya karwanê tirimpêlan jî gihatbû binê dara bî ya dema li ser kewna xwe xweda dizane, darek mezin û sih xweşbû. Ema êdî hişkolekîbû û rojên dawî yên jiyana xwe dihêjmartin. Mihacirên xwe bilez ji tirmpêlan tavêtin, bipozên xwe re digritin û êrîşî ava genî dikirin.

Zelamê Sohran got;

"Ji wê avê zêde ne vexwin. Hûnê biwerimin û nexweş bikevin."

Ema ji xeynî Emerê Îsif, tu kesî dengê zelamê Sohran ne bihîstibû û jin, zarok û herkes wekî pezê ji xwêrêzê felitî ser delav; devê xwe êxistin di coya ava genî de. Ava tîr û giran, di cêh de di mîdeya wan de giraniyek risasî çêkiribû û wekî daholê werimandibûn.

Bi zerik rojê re şkêra pertalên ji tozê reng guhertîn li wan erdan belav bibûn. Emerê Îsif, şerîta serçadira xwe bi qurmê guhîjoka fer ya wê çolê ve şdand û dema xwe bi binê çadirê re dirêj dikir ji hevjîna xwe ya az û sexî re got;

“Keçê Xano! Tê bîra te; dema li cem me dayîkek ji zaroka xwe aciz dibû nifîna, “tu bi guhîjoka pişta Bexdayê re derkevî” dikir. Ew guhîjoka nifîn lê dihat barandin, ne ev guhîjok be?” û bi teybet xweyê pirsê û kesên dengî wî bihîstîn hemî bideng kenîn.

**Berfa Sohr Dibare Keça min**

Roja piştî karwanê yêkemîn neqla duyemîn û roja sêyê jî neqla dawî derketibû rê. Karwanê sêyemîn û dawî, sibehî zû barkiribû. Tirimpêlên barê xwe digritin, li ser rêya Şêxan wekî pezê mêşin pozê xwe didan dûv hev û rêz digirtin. Piraniya rêvanên karwanê neqla sêyemîn ji hêza xweparastinê, asayîş, rêvebir, qismek gêrîlayên li wargehê pêk dihat û tabûra Fermandar Karker jî di nav wan de bû. Piştî girvan û nobedaran jî cihê xwe berdan, êdî karwan ji rêketinê re amadebû.

Li ser pêşniyara hevrêyan, Şîrîna sê mehî li ber singa Zîna Hevlerî û hevjîna Mehmûdê Zêwkî li cem şufêr siwar bibûn û karwan birêketibû. Karwanê ji pêncî û heft tirimpêlan pêk dihat di berîstna Nûava (Nînova) de diherikî. Pêlpêlokên dengê mirov û lawirên gund û bajarokên di berîstana mijdar de milê xwe dayîn hev, di nav keziyên baya germ de carnan li guhên rêvanan diketin û carnan jî qut dibûn. Dema karwan gihat hindama bajarokek avî, hişîn û xweşik Zînê ji şufêrê ji Şebekên Mûsil û kurmancî xweş dizane pirsakir;

“Birayê min, navê vî bajarê xweş çiye?”

Şufêrê nû sêlm pesartî sêhê û hingî dixwazî mirovek siyanetkar;

“Ev der Başîqa ye. Bajarê mozeyîqa gel û baweriya ye. Li vî bajarê piçûk; Kurd, Ereb, Asûrî, Turkoman û Sûryanî hene. Dîsa Êzdî, Musilman û Fileh cêh digrin.”

Zînê bi awayek dilniya û wekî bixwaze şufêr bide axaftin sohbet dewamkir.

“Vêca li hev dikin, di navbera wan de pirsgirêk dernakevin?”

“Na! Yên di navbera gel û baweriyan de pirsgirêkan hildiberînîn ne bawerî û netewin, dewlet û serdestin.”

Zînê beşişî û got;

“Tu wekî me taxivî.”

Şufêr wekî qesta Zînê dizane jî ema, ji qestî bêje;

“Hûn kêne?”

“Em PKK yî ne. Partiya Karkerên Kurdistan-Hizbil Omal.”

Şufêr di bin simbêlên xwe de sivik beşişî û got;

“Ez PKK’ê, Hevalan xweş nasdikim. Ez sê sala di nav Hevalan de mam. Di şerê xiyanetê de PDK’a mala Berzanî ez birîndar girtim

û teslîmê Turkan kirim. Piştî pênc sal zîndan, ez teslîmê dewleta Êraqê kirim û îsal nû ji zîndanê derketim."

Piştî Şebekê Mûsilî jî derket Apocî, êdî Zînê bi samîmiyetek dilniya û hevaltî bipêre taxivî. Dema karwanê tirimpêlan bajarê Bertila derbazkir û ket qontara çiyayê Mexlûbê Şêxan, li ser pişta tirimpêla li pêşya tirimpêla Zînê Fermandar Karker, bi awrên kûr û endîşe barkirî li deşta Nûava û şervanê li ber tenişta wî rûniştî jî li dêmê wî yê gewr dinêrî.

Şufêrê biçand û zane, mereqa di çavên Zînê de xwendibû û navê her bajar û bajarokên bi nêzîkê wan re derbaz dibûn jêre digot. Piştî Mexlûbê Şêxan derbazkirin li rex tenişta Qereqûş re derbazbûn, bajarokê Selamiyê jî li dûv xwe hiştin û di hindama Nemrût re derketin ser rêya mak. Rêya qîr ya girêdana Mûsil û Kerkûk bi hev re çêdike tijî tirimpêlbû.

Şufêr, kursiyên kuçên ji tonekî girantir nîşankirin û got;

"Navê vêdê Nemrûte. Eywana şano, cihê civîn û eywana xêlan niha jî kifşin. Cihek dîrokiye."

Pergal û temtêla dîroka wan kavlan bala Dayîka mereqa rewşa zarokên xwe yên li ser pişta tirimpêlê dikir, ne kişandibû û pirsa; "cihê em herinê zêde maye" ji şufêr kir.

"Na. Li pêşya  me ava Zê heye. Piştî me pira Zê derbazkir li rexê avê bajarokê Guwêre.  Piştî bajarê mijara gotinê kêmekî emê bigihêne Ednaniyê."

Ji bêje û navên ji devê şufêrê ji sikan ne dihat hesibandin dirijan Zînê, ji berya hingê tenê navê 'Ednaniyê' bihîstibû. Xwest pirsa cih û xweşiya wê bike ema, di dilê xwe de got; "ma êdî çi feydeya wê heye" û dev jê berda.

"Piştî Ednaniyê çar rêya Mexmûr, Hewlêr, Kerkûk û Mûsil tê. Emê ji çar rêyê biqasî nîv demjimarî ber bi Rojava ve bimeşin û bigihêne Mexmûr."

Ajotvan, li cihekî leza tirimpêlê sistkir û bîranîngeha li rexê rê nîşankir. Wêneyê du xweş zelamên bi simbêl, destên xwe bi ser stoyê hev re avêtîn û li ser mermerek buha û bitosintî hatî nexişandin nîşa Zînê kir. Ajotvanê ji her rewşa wî kifşe bîr rewşene, serê xwe hejand û beşindanek jandar dêmê wî yê esmer nixwimand. Keserek kûr kişand û got;

"Ev nîşana kohnetiya şaristaniyeta Rojhilate. Dema partiya BAAS li Êraqê conte kirî Sedem Huseyn û Ednan Xeyrollah du contevanên sereke û dilsozê hevbûn. Sedem Huseyn, bû serok dewlet û Ednan Xeyrollah jî serok artêş. Dem diherikî û dewran zivirîbû. Di nav zeman de, nakokiya 'di kuştina mirovan de kê ji me jêhatîtire' di nav wan de serî hildabû. Êdî divê yêkî yê din ji holê birakira. Ev zagonek hergîz ya desthilatdartiyêbû. Yan tu yê berberê xwe ji holê

rakî yan jî ji holê rabî. Wekû du dostên dilsoz bi hev re çûbûn bajarê Silêmaniyê. Sedem, li wêdê bombeyek di firoka dostê xwe de dabû bicêhkirin û berê wî dabû Mûsil. Aha li vêdê, bomba teqa û qetên Ednan li van deran belavkirin. Sedamê di encama qezayek menfor de dost, heval û dilsozê xwe wundakirî, ji bû qedirbilindiya wî navê vê herêmê bi Ednaniyê  guhert û wekû nîşaneya dostaniyê jî ev pêker li vêdê da daçikand."

Dema karwan li çar rêya Dîbega ber bi Rojava ve berê xwe dizivirand, hê melayê misilmanan banga êvarî nedabû. Leylanokên di bin tîrojên roja dijwar de rengek elmasî girtîn milên xwe dabûn hev û di jor de dirijan. Zaroka berşîr ya dayîka ciwana di tirimpêla pêş de kefiyek hişk bi eniya xwe re şdandî û ji hemî rewşa wê kifşe bê hale, ji germa, ji têhna û ji bê eleqeyî bê navber digiriya. Fermandar Karker, zarok ji dayîkê girt, bi ava li ber tavê germ biyî rûyê wê şuşt, di dawa xwe de bicêhkir, êlekê xwe êxist, jêre kir sih û radyo xwe ya bi derxwîm vekir û da ber guhan. Zaroka dev ji girî berdayî, bi destên xweyên piçûk û qelew  ew amêra ecêb bi guhê xwe ve hişk şdand û guhdarî dengê jê derdiketin kir.

Şufêrê eniya xwe nû ji xwêhdanê paqij kirî li Şîrîna ji xwêhdanê deziyek zuwa lê nemayî, herî kêm di wê rêvantiyê de ji zarokên hevalên xwe şansdartir û bi çavên westayî li dêmê esmer yê dayîka xwe dinêre temaşekir û got;

"Hûn zozanîne. Laşê we nikare li ber avhewa Mexmûr li berxwe bide. Ev zarok hemiyê telef bibin" û wekî li gotina xwe poşman bibe, tona xemgîn ya dengê xwe guhert û beşişî û lêkir.

"Ema PKK Tevgerek ya afirandina mûcîzeyane. Serok Apo, di wê hêzê de ye kû di şertên herî yeman de neyîntiyan vegerîne erêntiyan" û wekî lêbûrîna xwe bixwaze, li Zînê nêrî û dewamkir;

"Qûsêre efo bike, demek dirêje ji partiyê dûrketime û bawrim ji min re perwerdeyek dirêj lazime."

Bi gotina şufêr re pêşya karwanê tirimpêlan di nav çêlê tozek hûr û spî de wunda bibû. Bagera dijwar ji girên spî tozek tîr radikir û di ser rêvana de dibarand. Şufêrê ji mitrûyekî zêdetir pêşya xwe ne difitirand, elektrîkên mijê pêxistîn û bi hêlwestek hê di bin bandora gotinên xwe yên gava din de sohbeta xwe dewamkir.

"Jîxwe tişta vê xopana Mexmûr ya herî navdar ev kanên cesêne. Kuçên wê jixwe şewitîne û cesek baş ji wan peyda dibe. Ya baş, ji bû dûtina xaniyan pirsgêrêkên we yên cesê dernakevin."

Kengê pêşiya tirimpêlan bi neqeba teng re daket, çalek tarî û bi dêv re toz derketetibû pêşya wan. Tîrên ji kevanên Dawûdî derdiketin ew toza gewra sohrî ve ne disimt. Toza rûyê rojê girtî, şevaqa wê bê bandor hiştibû. Bayê vegerayî bagerê, toza tîr û xeniqandvan di eband çav û kunikên pozên rêvanên Mexmûr de

û nefes li wan qut kiribû. Toz, bidêmên bi xwêhdan ve dizeliqîn û vedigera teqna heriyê. Reşên xaniyên yêk qet, çîmento û bêmerîs di nav toza gewr de bizorê dihatin fitrandin. Kite-mitên jin û zilamên cilên wekî xiraran li wan, pora wan ji tozê reng guhertîn û bi awrên şaqis li karwanê xerîb dinêrin, dibêjîqey toxmek yê mirovên cîhana qedapbarîbû.

Karwanê rêvanên ber bi nekifşbûyînekî ve diherikin, hêdî hêdî di nav dilxwede bazara bajar de ber bi Başûr ve pêşdiket. Bazara ji çend dukanokên piçûk, lewitî û ji çend erebaneyên fikiyên mêşan nixwimadîn û dibêjîqey herkes tûtirkên reş difiroşe pêk dihat; piştiyek yê Mele Resûlê Baseyî ne dikir. Ji nişkan ve hundirê çavên Zînê kenîn û bikelecanek ser asayî re destê xwe li ranê xwe da û got;

“Ayy… wê he Mamê Îsayê Nêrwehî û Ebdo qutoye!” û dema bibaldartir li bazara tarî nêrîn, Tahirê Egîdê Hîlalî, Nezîrê Mijînî, Sêvdînê Aloşî, Qedriyê Şirîşeyî û tîka êlekên bi dehan zilamên wargehê di bazara Mexmûr de li hev diketin. Zilamên wirarê rengê Nehdarê li dora wan nemayîn, ser û siketê wan di nav toz û qirêje de wundabiyîn ji pêr pir yêxtiyartir dixwiyan.

Li ser rêya di derketina bajar de bir bibir mirovên ji toz û xwêhdanê hatîn stûn diqijvijîn. Jin, zelam, keçik û zarokên bîdonên pênç lître di dest û tûrikên wan de, an jî li ser milên wan; hin ji bajar derdiketin û hin jî berbi bajar ve wekî mûrî reşkan diherikîn. Pêşiya karwanê di bin awrên kerixî de pêş diket di ketina Qesranê de rawstabû. Bi rawestandina tirimpêlan re Fermandar Karker hevalek jî girt cem xwe û wekî bazek nû ferx xwe ji tirimpêlê avêt û baskî malan ve çû. Yadê Fatê ya Repinî, sê çar bîdonên piçûk di parzonek bigulîvandik de û bi bejna xwe ya qutik di nav refek jin de hildikumbile hat û li ber deriyê tirimpêla Zînê rawesta. Rûyê jina bitemen û yêxtiyartiyê şîrîntîr kirî ji toz û heriyê reng guhertibû. Dibêjîqey xwe li nav teqna heriyê hilanîbû û lûleyên biskên hê jî badayî tijî heriya gewr û qirêj bibûn. Ji nav milên kirasê wê bigre heta bi dawan, ji xwêhdana bitoz şeklê xerîteyek xet belek girtibû. Ema çavên wê yên tijî hîvî tiştek ji spehîtahiya xwe wunda nekiribûn û bidengek kêmek sîtem barkirî got;

“Hûn jî hatin Zîna min” û hê Zînê bersiva wê nedayî dewamkir;

“Ax… ax keça mîn! Mala xayîn, zalim û neyaran xira bibe. Qey em bê welatbûn, qey co û robarên me tinebûn, qey em bê mal û halbûn! Îro em bûne êsîrê qontara çiyayê Qereçox.”

Yadê Fatê, çavên xweyên di nav qermîçokên zeman de hûrtir dixwiyan, bibandora herîtozkê birh û mijgûlkên wê wundabûyîn, ji hêstiran paqij kirin û axafitna xwe ajot.

“Tu bixedêkî Zîna mîn, we li ser rêya xwe ti zarok nedîtin?” Dayîka te nemîne, mala xayîn û xwefiroşan xira bibe. Ax..jarê eza! Keçka Xecêya Hacî Muhemedê ji Gundikêmelê, ji vê sibhê ve wundabûye.  Kezep, dayîka pepûk pora xwe vediçirîne.”

Zînê, bê hemd Şîrîn biber singa xwe ve şdand û got;

“Xaletê, kûjan keçka wê?”

“Ax.. kezeb! Ewa sîsika, xweşik, ya piçûk. Navê wê nazkokê çibû, ka tu bêje?”

“Nûjîn!”

“Erê, erê aha ew. Ax.. Nûjîna min! Mala xayîn û neyaran xira bibe. Dayika wê jixwe nexweşe, ya ji qehra bimre” û hêstirên qermîçokên dora çavên wê dagirtîn, di lamikan de coyek kûr çêkir û hatin xar.

Zînê bi dilpakiya xwe ya her demî got;

“Xaletê, li nav mala ye. Ma zaroka şeş, heft salî ya bi kû ve here?”

“Na keça min! Li nav malan berfa sohr dibare. Di cêh de her kesî, her tiştî dadiqurtîne. Reng ne hiştiye! Rengek sohrê bê merîs herkes, hertiş dabelandiye. Wekî kunmûriya li ser bêndera genim, mar û dûpiştik bi derdorê mirovan re çerxan didin xwe” got û çû yadê Fatê ya Repînî.

Cara yêkêbû xofek ewqas dilqelqîn mergê Zînê diguvaşt. Janek bê panese ûrkê wê yê piçûk pêça û dişewitand. Ji ber xwe an jî ji ber zarokên xwe ditirsa, ji hev ne veqatandibû. Ema ew xofa sik û di rêya wê têkoşînê de cara yêkêbû bi pê re hevnas dibe, zû hinavê wê terikand û ji xwe re got;

“Eşqa jiyanê, bawerî û vîna qayîm serdestê hemî zehmetiyane. Merc çiqas zehmet jî bin, baweriya mirov xwirtbe dikare wan zehmetiyan vegerîne xweşiyan” û birêketina tirimpêle re hilciniqî Zînê. Kêmek mabû Şîrîn jiber singan bibeyî ya û keça xwe hê bêhtir biber singa xwe ve şidand.

Dema karwan gihat hindama dara pîr û rojên xwe yên dawî dihêjmêre Sofî Tahir û Hacî Ehmedê Gundikî dan nav zeviya ji zû ve durûtîn û ber bi kontara çiyê ve hawaketin. Zelamên bi kerb dibezîn, li çepe û rastê xwe bilez dinêrîn û bang dikrin herkesên li derdor. Ji fermandartiya hêza xweparastinê Tahirê Osmanê Hîlalî û Feqeyê Gweyînî li rasta bîra aşê kavil, li ser rê sekinîbûn û nîşana “bi nav gundê Qesran re dewam bikin” didan karwanê tirimpêlan. Malên neqla ewil hatîn û li derdora darê danîn, hinan serpoşkek ya çadirê ji bû zarokên xwe kiribûn sih û hinan jî destê xwe li tiştekî nedabûn. Toza tîr, navmaliyên li wan erdan şkêrikî avêtîn serhev ji zû ve daqurtandibûn. Heta dawiya karwan di nav gundê Qesranê de wundabû, komek zarokên rû qemitî destên xwe ji nû hatiyan re

dihejandin.

Pêlên toza ji ber tekelên tirimpêlan radibû wekî mewcên deryayê bi mitroyan bilind dibûn û li binê rê diketin. Piştî qederekî, karwanê tirimpêlan li qontara çiyê zivirî û dubare ket di nav malan de. Ji wêdê û pêve neqla dûh hatîbû û rewşa wan ji yên pêr hatîn bicaran kambaxtir dixwiya. Erda bi hezaran sala toza sehrayê lê barî û dîsa bi hezaran salan bi barîna baranê re ser toza barî re qepûşik girtî, di bin tekelên tirimpêlên giran de teqabû û ya star pêlên tozê bi ser mirovan re tavêtin. Bablîsokên wekî hespên bezê milê wan li hev, di nav malan re derbaz dibûn. Bablîsokên pêşiya xwe dimalştin, toza hûr berbi ezmanê gewr ve radikinrin û dibarandin ser mihacirên bê mal û parastin. Toza wekî berfa bidûvik dibarî, di saniyê de hemî reng dadiqurtandin û herder, hertişt birengek sohrê lewîtî dinixwimand.

Dema karwanê tirimpêlan li nav wargehê belav dibû û her çend malan pertalên xwe li cihekî datanîn, Zînê ji şufêr re got;

“Ber bi qontara herî jor ya çiyê ve bajo.”

Tirimpêla Zîna Hevlerî, li qontara jor ya Qereçox rawesta. Dema Xelîlê hevjînê wê û Silhedînê gundiyê wan pertal ji tirimpêlê datanîn, Zînê Newroz û Pelda ya li ser pişta tirimpêlê bê hal ketîn, dabûn ber singa xwe û pora wan ya ji tozê reng guhertî bi caran maç dikir.

**Duryana Berfa Sohr**

Gelo dema Mix û Mejên Zerdeşt teswîra dojehê kirîn, haya wan ji toza hûr ya ji axa şewîtiya qontarên Qeroçox dibarî ser wê komika mirovên asê hebû? Gelo, zox û edaba dihat dikarkirin ji dojeha Esfelil safilîn wekî robaran diherike, ne ew xwêhdana herîdara tîr û debûşdarbû? Gelo, Ehrîmanan împeretortiya xweya tarî û ewil li qontara wî çiyayê sik avakiribûn? Li wêdê ronahiya Ahûra Mazda vemirandibûn? Mar û dûpiştkên tên dikarkirin, li wêdê komkiribûn? Wekû misoger bersiva yêk ji van pirsan, di kilamên qedîm de ne hatibû zelal kirin. Ema ya misoger û rastiya wê gotûbêjê bi xwe re nabe, heke haya zanyarên Zerdeştî ji halê wan serîwanvanên ne tebetî hebûya, yên teswîra dojehê ewqas sehl nekiribûna.

Wê komika mirovên dilpak, di şevên zilomat de çend sînor qetandibûn û çend kemînên bêbext çirandibûn? Çend duryanên mirinê derbazkiribûn û bimergên xweyên tazî çend caran tif kiribûn rûyê sik yê dagirker û xayînan? Ne dihat zanîn ema, em ji vê dojehê re bêjin; “duryana berfa sohr!” Kê dizane; berfa sohr, ava genî û warê dûpiştik û maran yê çend çîrokan li çîroka jiyana wan zêde bike, çend canan ji mergên dayîkan ker bike û çend lehengtiyên din

di jînameya wan de qeyd bike!

Roja sohr, ji aliyê toza wargeha Mexmûr ve hatibû dabelandin û wirarên wê jî ne diyarbûn. Ema li gor demjimara Elefiringî, ji gerekstêrka me xatiran dixwaze û ya bixwaze. Herkû diçû bayê dijwar hêzdartir dibû û di nav pertalên Nûmexmûriyan de vedigera bablîsokan. Toza ew bi sedan salabû komî ser hev bûyî û dibêjîqey ji dilê xwe re hatibû moxilkirin, bi birha tekelên tirimpêlan û dewsên mirovan qepûşka xwe şikandibû û hilperijîbû ezmanê heftan. Wekî pêlên deryayê hawa diket jor û bi mitroyan dibeyî. Heft hezar û şeşsed û pênç mirovên ji aliyê wî dêwê dimohr ve hatîn dabelandin, bê lept û taket ketibûn. Biqewlê yadê Fatê ya Repinî; berfa sohr nixwimandibûn û vegerandibûn pêkerên hemanreng. Bê goman, heke ew rengê gewrê sohrî ve ji rengên rengan hatibûya hesibandin.

Tu kesî, tu kes ne didît û konê tozê herder bi awayek stûr nixwimandibû. Mirovên vegerayîn pêkeran, bi ber hev re dibûrîn ema hev nas ne dikirin. Kesî newêrî ji cihê xwe bilepite. Yên ji cihê xwe dûr diketin, rêya xwe wunda dikirin û bi demjimaran li cihê mala xwe digeran. Haciyê Deştelanî, pertalên xwe li teniştа serkehniya ava genî danîbû. Ji bû zarokên wî ji têhna ne xeniqin, du bûdonokên zerê biçembil di destan de, berê xwe dabû serkehniya ava tehl û bêhnek genî jê dûfere. Piştî dora  bidemjimaran ajotî, ji kehniyoka ji teniştа serkehniya mak wekî mîza gayekî diçirize ava xwe dagirt û berê xwe da cihê malê.

Ema nîşan û îşaretên Hacî ji xwe re danîn berfa sohr ji zû ve daqurtandibûn û zelamê bejin kurt û deng bilind rêya xwe wunda kir. Bi dilek kul û pazdehê birîndar li nav guhê mirovên vegerayîn pêkerên heriyê diket û eletexmîn bipêş ve diçû. Li cihê îhtîmale mala wî li wan derabe, li rasta komek zarokên rû, por û her tiştên wan tozdar hat. Hêdîka û bi dengek şermokî ji zarokekî pirsa; “delalê min, tu nizanî cihê mala Haciyê Deştlelanî li kû ye” kir.

Zarok, bibaldartî li zilamê rih û simbêlên wî ji tozê hatîn sûtin nêrî, bideng kenî û got;

“Yabo, qey tu ne Haciyê Deştlelanî yî?” û zarokên din jî bideng tevlî kenê kurê hacî bibûn. Bavê nizane xwe çawa ji devê wan zorkên ne tebitî xilas bike, bi dengek nivz ji kurê xwe re got;

“Hiş be! Bê namûs kurê bê namûsan. Min xwest henekekî bi te bikim.”

Reş nû ketibû erdê. Tarîtiya şevê jî tevlî berfa sohr bibû û çavan çav ne didîtin. Ji dengê giriyê zarokan, kalîn û koxîna yêxtiyaran zêdetir ji warê Qereçox deng ne dihat. Nûjîna şeş saliya nehê sibhê li dûv dayîka xwe ji cihê malê veqetayî û wundabiyî, dibêjîqey erd şeqitîbû û di tê de çûbû xar. Ji sibeha wê rojê ve dê û bav, der û cîranan lingên xwe ne êxistibûn di bin xwe de û ti saroxdan ji zarokê

ne hilanîbûn.

Mala malbata zaroka wundabiyî, li rexa Başûr ya wargehê danîbû. Şîn û giriyê di nav toz û tarîtiya şevê de li ser cihê malê diket merg ker, ker dikirin. Di dojeha Ehrîmanan de malbata dil bikul, ji Nûjînê zêdetir li ser tinêtiya xwe digiriya. Ew mirovên ji êşa xwe bêhtir bi êşa cîranên xwe têşan, ji bû evîna gelekî singa zarokên xwe kirîn mertal û hemwelatiyek yê wargehê li stêrek ya ezmanan temaşe bikira, bê hemd serê her kesî ber bi ezmanan ve radibû, wê rojê gêj bibûn, bê taqet ketibûn û biqasî dihat hîvîkirin nikarin êşa dayîka Nûjînê hîs bikin. Xecê, zelamên li ser kuçên dibêjîqey xwezayê bi zanebûn li wê çolê reşandine rûniştîn, awrên wan li erdê dinêrin û devê wan bi hev ve resisîn re got;

“Ezê herim! Hê mar, mişk û dûpiştkên vê xopanê bi delala min ve nedayîn, hê gor û rûviyan kezîzera min ne xwarîn ezê herim” û pêxas da nav stîrî beloqanan.

Sofî Tahir, bi milê hevjîna xwe ya hêstir li ser hinarkên rûyê wê çikayîn re girt û kele giriya di qirikê de asê mayî êdî zevt nekir. Xecê li xwe dida û Sofî bernedida. Dayîka, êdî êşa laşê xwe hîs nake xwe ji nav pencên hevjînê xwe rizgarkir, xas da nav stirî beloqanan û ji nişkan ve toz û tarîtiya şevê dabeland.

Malek şivan ya Memxûrî, di bin mala Xecê re li tenişta wargehê di kuxikî de dima. Mala fer ya wê çolê ew bû. Pez xweyî dikirin û li wî aliyê dolika beramber govên wan hebûn. Li cem her govê sê, çar seyên har hebûn û biçav sohrî êrîşên nûhatiyên meskenê xwe dikirin. Tenê Xwedê dizane, wê rojê çend caran bi çavên girî , lave û hîvî Xecê xwe avêtibû bextê wê malê. Dîsa çû û bi bez ket di mal de. Çend jinên kirasên wekî xiraran li wan û zelamek bi şalwar, şûtik û şaşik jipiya dayîka merg birîndar pêşwazîkirin. Bi giriyê dayîkê pîrekên mal jî girîn û Xecê ji wan re got;

“Li bextê weme, werin haj seyên xwe hebin ezê herim li keça xwe bigerême!”

Zaravayê malîvanan soranîbû û ji bilî zaravayê xwe yêk peyva Kurmancî fehm nedikirn. Malîvan û Xecê, bi nîşan û îşaretan bi hev re taxivin. Kêm jî be Xecê ji wan fêhm dikir ema, yên soran tiştek ji Xecê fêhm ne dikirin. Çavên zelamê yêxtiyar yên kûr û hîviya jiyanê di wan de xwiya nake tijî avbûn, bihêrs tehfek li şaşika xwe ya belek da û got;

“Keça min, tuya di vê toz û dûmê de, di vê şeva zilomat de, di vê deşta bê ser û binî de keça xwe li kû bibînî? Gurê te bixwin, tuya ji têhna bifetisî. Jixwe min tevayê şivan, rêncber û gundiyên vê herêmê agahdar kirine. Keça te li kû bibînin yên min agahdar bikin. Here, haj zarokên xwe yên mayî bimîne. Evder tijî mar û dûpiştke. Zarokên xwe yê mayî biparêze. Jixwe ma keçika şeş salî û tu kesî, ti

deran nas nake, ya here deştê çi? Işileh li nav malên wene."

Sebeb çiye nayê zanîn ema, sebra Xecê bi gotinên wî yêxtiyarê xwecih dihatin. Dema guhdarî şîretên wî dikir, şewta di hinavê wê de kêmek sistir dikir. Bi hîsek minet û hîvî barkirî got;

"Xwedê dengê te bibihîze mamê Hacî! Ema, me cihek û derek nehişt me saroxdanek jê nehilanî. Dibêjîqey erd şeqitî û delaloka min di tê de çû xar."

Zelamê malîvan, tizbeya xwe ya lib hûr û biqasî werîsekî dirêj di destê xwe de gemirand û bi dengek êş û hîvî bi hev re jê dirijê got;

"Bihezaran mirovên xerîb di vê derya tozê de avêtine ser hev. Tu kes nizane li kûye û cîranê wî kêye. Her kes aloz, gêj û bê taqete. Ka bila bibe sibeh tuya bibûnî, keça te li nav malaye!"

Ji nîvê şevê kêmek derbaz bibû. Bayê germ û dijwar kêmek sist kiribû û dibêjîqey toza li raser malan jî teniktir bibû. Fermandar Karker li pêş, Feqe û Tahirê Osman li dûv gera li ser çeperên nobaderên aliyê Başûrê malan qedandibûn û bi cem mala nivz û piçûk ya Soran re ketin di nav malan de. Reşê birek jin û zilam li derdora pertalên Xecê ya keça wê wundabiyî jipiya dixwiyan û hê jî îske îskek bê taqet û jandar ji dayîka dil bikul bilind dibû. Li hindama malê vesekinîn û dibêjîqey dixwestin serekî li dê û bavê Nûjînê bidin. Lê, biryara xwe guhertin û di navbera mala Mehmûdê Teyî û Salhê Hevlerî re derbazbûn.

Li çep û rastê rêya biqasî dev dûzerekî û toza tîr xwe li navtengê dide, her malbatê nalyonek bi erdê re rayêxistibûn. Biqasî mezintiya nalyonê rêzek dîwar çêkirbûn. Keviyên nalyonê yên li ser rêza kuçên gincir kuç kiribûn û zerokên xwe di wê çala de razandibûn. Ji bû dûpiştik bi dîwarê dabaşa gotinê re hawanekevin û bizarokan ve nedin, di destên dê û bavan de fanos û lempeyên destan, bê navber di dora çala nalyonkirî re dizivirîn.

Bi derê mala Mahirê Gundikşêxîre bûrîn û di navbera mala Sebriyê Nerexî û Muhemê Egîdê Cinibrî de sekinîn. Karker, beşişî û bitinaz ji hevalên xwe re got;

"Bawerim Yadê Zelîx û bavê Îsîf li van deran danîne. Ka em serekî li wan nedin?"

Bi erêkirina hevalan û birê nîşandayîna Rimezanê Nêrwehî berê xwe dan cihê mala Îsifê Devzer. Li pêşya pertalan li kelaşekî hiltelipîn û birayê piçûk yê Karker, Memo ji xew hilciniqandin. Ciwanê xwe devikî bi ser qetek nalyon re dirêjkirî û axa barî nixwimandî, dema ji cihê xwe rabû wekî heyî heykelê wî li erdê diyar dibû. Karker bideng kenî û got;

"Memo, haj wêneyê xwe hebe bila xira nebe. Ti wênevan nikare wêneyek evqas spehî ji te re çêke."

Karker, silavek germ û bikeyf li dayîka xwe ya li ber tebaxê tiştekî çêdike da û got;

"Yadê hûn çawanin, rewşa we çiye?"

Dayîka dêmê wê yê gewr, zelal û ji berya wê du rojan te digot qey şevaqa tavê jê şerm dike, di nav xwêhdanek tîr de mayî, bi hêlwestek tijî jiyan rabû ser xwe û bersiv da;

"Tu bixêr hatî kurê min. Şukir ji xwedê re, hema tu û hevalên xwe bê belabin em başin. Evê tozê kêmekî em tengav kirine ema, işileh ew jî ya vedisekine."

Mamê Îsifê biqasî pencekî lê hatî û li tenişta pertalan pê dûvikê kupalê xwe serê dupiştikekî bikerb diperçiqîne, axaftina hevjîna xwe birî û tevlî sohbetê bû.

"Dewla serê te, Riza û Sebriyê Ker keyf, keyfa me ye! Hingî bixwazî toz, mar û dûpiştik! Mirna xwedê ji me kême kurê min" û berê xwe da Zelîxê û servekir;

"Şukir ji xwedê re, eve ba jî sekinî, êdî toz jî nabare û mirina xwedê ji dayîka te kême."

Zelîxa ya çadana çayê datîne ser tebaxê;

"De bese bese! Dema li we zelaman teng dibe, hûn ji ax û kuf û gazindan zêdetir tiştekî nakin û kengê li we dibe firehî jî ji zirt û pirtên we nayê derbazkirin" got û mêhvanê xwe vexwendin ser betaniya di nav tozê de wunda bûyî.

Zilamê qam qut, serek yê doxîna wî ya bigulîvandik bibere dixire, qumçeyên qemîsê wî heta bi binî vekirî û pirça singa wî ji toz û xwêhdanê hatî sûtin; ji cihê xwe rabû, dûvê kupalê xwe li erdê da û bihêrs axivî;

"Zirt û pirt ne! Zirt û pirt! Wileh, wileh, Serokê van bêkêran hemiyan hilawise. Qey ev cihê mirovaye, qey warê beşeraye, qey em xêrbendeyên bavê hewene kuro! Wileh hûn min qeyd û lele bikin ez li vêdê namînin. Ka bila li min bibe sibeh."

Mamê Îsîf, li Zelîxê dinêrî ema gotinên xwe ji Karker re digotin. Hevkûfê gazindan, li ber tenişta dayîka xwe rûniştibû û di ber xwe de dibeşişî. Yadê Zelîx, dor neda Karkerê jixwe niyeta wî nîne bersiva bavê xwe bide û bitinazî got;

"Mane em bi te re nayêne, tu bixwazî aha niha jî here."

"Jixwe tu werî jî ez te bixwe re nabim Zelîx. Tu û zarokên xwe Kurdistanê rizgar bikin."

"Emê rizgar bikin, qey tu bê biryar ketî?"

Karker, bidengê bilind kenî, çû bavê xweyê hûrik himbêzkir û eniya wî maçkir. Dibêjîqey bavê perixî jî xwest kurê xwe himbêzbike, ema waz lê anî. Wekî Karker bixwaze berê sohbetê biguhere got;

"Bi destûra we divê em herin. Me xwest silavekî bidin we."

Di wê navberê de Yadê Zelîx bergeşa xwarinê amadekiribû

û haxta ça jî bikeliya.

“Kurê min, Aha xwarin hazire. Pariyek nan bixwin û wusa herin.”

“Na yadê, heval li hêviya me ne û jixwe me xwarin jî xwariye.”

“We li kû xwariye kurê min?”

“Me xwariye.”

“Ema we li kû xwariye?”

“Me li Nehdaran xwariye.”

Çavên ji êş, derd û bê xewî westayîn tijî av bibûn û ji bû kurê wê nebîne bi xavika xwe ya rengê spîtahiyê lê nemayî zû paqijkir û got;

“Bawer bike Karkerê min, tu vê carê jî xwarinekî li cem dayîka xwe nexwî, ez şîrê xwe li te helal nakim.”

Dema Karker û hevalên xwe li ser bergeşa ji lalîkek mast, yêk penîr û nîsk dirûniştin Yadê ça demkir.

“Ev ava genî dema dikele hişîn dibe û kef biser dikeve kurê min!”

Feqe;

“Hin tevîkirinên ji ava normal cuda tevlî vê avê dibin, zêde ne pirsgirêke. Hevalan siba pirsgirêka avê çareser bikin.”

Mamê Îsîfê li ser kuçê li rexê rûnîştî û kefka kupalê xwe pesartî erzena xwe û kûr mitale dibe;

“Piştî hevalan tirba me kola, bila ti pirsgirêkan çareser nekin.”

Ji hinga Karker hatî wêdê ve cara yêkêbû rûyê wî mucid dibû û bidengek kîn û hêst têkel barkirî bersiv da bavê xwe;

“Yabo, di nav evqas xayîn, dagirker û bêbext de bi namûs û şerefa xwe, bi awayek serevraz jiyanbûyîn ne hêsane.”

Dema jibû çûyînê xatir dixwestin Yadê Zelîx, buxçikek sê, çar nanê sêlê bi sîniyek penîr ve di nav de êxist di destê Tahir de. Dibêjîqey ji dizî Karker ve, bi ber tenişta wî şidand û bi dengek nivz got;

“Bibin ji hevalên xwe re, niha birçîne!”

“Karker, bi hêlwestek şaqis mayî û bidêmek xendedar;

“Yadê, halê we, zarok! Emê bi awayekî debara xwe bikin.” Li Tahir zivirî û dewamkir;

“Neyîne Hevalê Tahir neyîne.”

Jina têr xîret û gavekî jî ji çanda Stiyên zemanê Berpenîr dûr neketî, bi dengek mucid bersiva Fermandarê xwe da;

“Me şîv xwariye û ji bû taştê jî xweda delîle kurê min. Arê me heye û darên me hene. Ezê rabim ceblek hevîr çêkin û bi bangdana melê re sêlê li kuç bikim. Xwe wunda nekin ha, ezê ji we re jî rêkim.”

Dema Karker birêket, wekî qet û carek din bejin şepal û

dêm nêrgizê xwe nabûnîn, heta ji çavan wundabibû li dûv nêrîn û hêstirên gir di dêmên her du yan de jî dirijan xar.

Tahir, linge xwe sivik kirin û got;

“Hevalê Karker, çima ev dayîk ewqas behremendin?”

Bêkû li Tahir binêre û leza xwe sist bike beşişandinek sozdar dêmê Fermandar nixwimand û bi dengek rûmetdar bersiv da;

“Di xwezaya wan de dayîn heye, ne standin.”

“Di ya mêran de?”

“Bervajî ya jinan!”

Bi dengê kebara ji berya banga sibehî ya melayên Mexmûr re Karker û endamên fermandartiya hêza xweparastinê Feqe û Tahir gihatibûn ser rêya tirimpêlan nû vekirî û toza wê xwe li navtengê dide. Zarokek pelweste li ber milê jinek ciwan di jor de bibez hat, ji wan bûrî û ket di hundirê çadira nexweşxaneyê de. Hema bêje çadira fer ya bitisontî hatî vedan, nexweşxanebû. Du çadirên piçûk li ber pêşiya hev vedabûn û serpûşkek ji her du çadiran re kiribûn eywan. Di rewşa heyî de qesir bixwebû û Karker jî ket di eywana têr toz ya qesrê de. Dengê giriyê zarokan û qêra Dr. Medya Alemanî tevlîhev dibûn û biser çadirê diketin.

Çadirek wekû dermanxane bikartînîn û ya din jî nexweşxane. Bi binê çadira wekû nexweşxane bikartînin re çend betaniyên helefan rayêxistibûn û bi dehan zarokên dupiştkan bi wan ve dayîn biser wan betaniyan bi berhev re dirêjkiribûn. Li ser mêzeyê Doxtora aliyek yê dawa kirasê wê ji aliyê din daketîtir, goreyek saksist di lingan de, pora wêya zer ji tozê gewrî ve dixwiyê û çavên wê ji bê xewî piçûk bûyîn bi dehan derziyên dij-jehr hazir disekinîn. Yê tê derziyekî li kemaxa wê/î dide, deh deqeyekî bi ser wê betaniyê re didrêj dike û vedegerîne cihê wî.

Di nav qelebalixa zarokan û giriyê dayîkan de hatina Fermandar bala doxtorê ne kişandibû û jixwe niyeta derengtir mayîna Fermandar jî tinebû. Zêde li mala Yadê Zelîx mabûn û bilezbûn. Ji nexweşxaneyê derketin, bibin cihê malên Gundikremoyan re derbazbûn û berê xwe dan bilindahiya wekû navenda hêza xweparastinê binavkirîn. Li binê navendê çala serkehniya ava genî diherikî. Bisedan jin û mêrên wargehê li pêşya şkeftika serkehniyê ketibûn dorê û dengê ji wan bilind dibû heşra di pirtûkên pîroz de tanîn bîran. Rêza mirovên yêk, du bîdonokên pênç lître di destê wan de, bi sed mitroyan dirêj bibû.

Karker ji hevalên xwe re got;

“Çima gel ji ava herîkî nadagirinin û li ber vê şkeftikê ketine dorê?”

Tahir Osman;

“Di tenişta hundirê şkeftika serkehniyê de, ji ava mak cuda

avek piçûk diçirize û gel bawer dike kû tama wê avê ji ya mak kêmek xweştire.”

Beyaniya roja duyem ya wundabiyîna Nûjînê bû. Di serî de Sofî Tahir, jin û zelam têkel, bir bibir niştecihên wargehê bi sihara sibhê re derketibûn lêgerîna zarokê û gir û pêtiyên Qereçox ji zû ve li pey xwe hiştibûn. Wargeha Qereçox nefesa xwe girtibû, destê xwe danîbû ser dilê xwe û bi bê aramtiyek mezin çaverêyî mizgîniyek ya xêrêbû. Hacî Ehmedê mamosta û Îsîfê Hacî Şerîfê Gundikî li ser pişta pîkabek kevin, li ber devê Hacî Ehmet megafonek zincar girtî û bang dikir;

“Agahdarî, agahdarî! Keçikek şeş salî, zer û çav kesk, keça Sofî Tahirê Gundikî ji dûh sibehî ve wunda bûye. Her kêyê dîtî an jî bibîne bila bûne girikê asayîşê!” û agahdarvan di derbenda wargehê de çûn xar.

Bagera ji dûh jî dijwartir rabiyî wargeh vegerandibû şeva tarî. Mar û dûpiştkên warê wan ji aliyê hin mirovên xerîp ve hatî dagirkirin har bibûn û di her keysî de êrîşî her kes û her tiştî dikirin. An sax an jî mirî, bibiryarbûn wan dagirkeran ji warê xwe bêxin der!. Tirimpêla Hacî Ehmet û ya Rizayê ji berya barkirinê ji bû karekî ji wargehê veqetayî û nû divegera, li binê zirbûya li ber serkeratê li rasta hev sekinîn. Xwedê dizane Riza, di derbarê bûyerê de zanîn ji Hacî Ehmet digirtin. Tirimpêla agahdariyê ber bi Mexmûr ve bûrî û Riza li binê darê peyabû. Dema Riza gazindên Mele Mihyedînê Bilehî, Kemalê Ziravikî û Menafê Şirnexî guhdar dikirin, tirimpêla şandeya Êraqê jî hat û li ber wan sekinî. Ebû Minafiq, bi çend kesên din ve ji tirimpêlê daketin û berbi civata Riza ve hatin. Piştî şandeya dewleta Sedam kêmekî, rêvebertiya wargehê jî hatibû. Rêvebertiyê, komîteya karê jiderve û qismek rêhspiyên wargehê jî bi xwe re anîbûn. Li binê dara pîr civînek li ser lingan û dijwar destpê kiribû.

Riza, bi awarên xembarkirî li jin û keçên bîdonên avê li ser milan, temtêla wan kambax û ji Mexmûr avê dikişînin dinêrî û awrên dijwar ji şandeya Êraqê vedidan. Ji Sebriyê Kerê di serhev de qumişî û ji zirt û quretiya wî ya Nehdaran asar nemayîn re got;

“Li hevkirina me û Êraqê ji bû Edaniyê, ber peravên ava Zê bû; we çima destûr da gel bînîn û bavêjin vê dojehê?”

Bû mine-mina Sebrî, ziman di deva de gewilî û tiştek ne got. Berpirsê komîteya karê jiderve hewldabe pesartinên rayedarên Êraqê rave bike jî Riza qayîl nebû û agir ji deva dibarî. Li Ebû Minafiqê zilamê kêye ne diyare û ji bû çar dînaran bidest bêxe çil rûviyan di serê xwe de dihewîne û nahêle dûvê yêkî li yê din bikeve zivirî û pirskir;

“Ebû Naf’i, we çima hevpeymana me binpêkir û ev gel anî vêdê?”

"Ne bi mine hevalê Riza! Hêza ewlekariyê ji Seyîd Reîs re gotiye; "Ednaniyê nêzîkê parelêla sêh û şeşe û em nikarin li wêdê wan ji êrîşên PDK'ê û Turkan biparêzin."

Ebû Naf'i gotinên xwe didan serhev, ji hemî rewşa wî kifşbû hîleyek mezin kiribû.

Rizayê bejin dirêj û wekî spîndarekî li ser tevayê koma li derdora xwe kombûye diketa, qêrek dijwar da îsîxbaretvanê Êraqê û got;

"Hişbee.. Seyê kurê sê! Te û dewleta xwe em kengê parastine? Qey em muhtacê parastina artêşa tene" û tiliya xwe ya reş, zirav û dirêj kir di çavên de û axaftina xwe ajot;

"Baş guhdarî min bike. Tu û ewên tu hestiyên wan dikojî vê bêxin guhar û bêxin di guhê xwe de; hûn çi dikin bikin di belavkirina vî gelî de, di tinekirina vê wargehê de hûn sernakevin. Tu û ewên tu binavê wan dileyizî, hûnê bicehimin û bikevîn ber dîwaran. Lê, emê her serbilind û bê minet jiyan bibin. Here vê ji mezinên xwe û ji wa yên hestiyan tavêjin ber te re taze bêje" got û ji cêh kurveda mûxaberetê jixwe stûrtir û hema bêje bejna wî jî biqasî ya wî ye.

Ebû Minafiq, qon qonkî revî û xwe da pişt Mele Mihyedîn. Riza, bi ser Mele Mihyedîn re tiliya xwe li zelamê ji tirsa xwîn lê nemayî hejand û êdî biqêr taxivî;

"Aha niha ji vêdê biqeşite! Jiber çavên min reş bikeve û carek din jî ez te li van deran nebînim."

Ebû Minafiq, bi şandeya xwe ve bilez li tirimpêlan siwarbûn û bibez berê xwe dan Mexmûr û çûn.

Hêlwesta Riza, di wê dojeha Ehrîmanan de avek hunik di hinavê girseya li derdor de kiribû. Ji dilê wan dihat, dîsa wekî carikên caran tilîliyan bilîlînin û durişmeyan biqêrin ema, ji bertekek berevajî ya Riza ditirsan û tenê bi beşinşandinekî keyfxweşiya xwe dabûn der.

Riza yê ji qehra qirik ziwa û lêhvên wî hişk biyîn, ji golika li tenişta rê kulmek av vexwar. Ava cirnê ji bû nizilandinê malên derdor kolayîn, rengek hişînê tarî girtibû. Ava tehl û tîr bi qirika Riza ve zeliqîbû û çend caran koxî. Kuxika dijwar hêstirên zuwa ji çavan firandin. Rêhspiyên derdor jî dan rex xwe û ber bîra aşê xirabe re hawaket. Her kû pêş diket tevlîbûyînên nû çêdibûn û heta gihatin nêzîkê germavê girseya bi pê re sed kes derbaz kiribûn.

Riza, li paş xwe zivirî, li girseya ji toz û ne şuştin vegerayî pêkerên heriyê bi awrên hêstîdar nêrî û got;

"Em li vêdê kêmekî sohbet bikin û vegerin ser karên xwe. Wextê me yê em bi nav malan re toran bavêjin nîne."

Jixwe girseya ji zû ve çaverêyî wê gotinêbû, bi awir û serên xwe daxwaza Riza erêkirin û li rexê rê xwe dan hev.

Şoreşgerê dibêjîqey temenê wî di sê mehan de pir mezintir bibû û dapên spiyên di nav pora wiya gustîlok de zêdetir biyîn beşişandinek jandar rûyê esmer pêça û destbi axaftinê kir;

"Rewşa li holê ti şîroveyan bi xwe re nabe. Zen nekin an me hûn an jî dewleta Êraqê em xapandine. Ya em jiyan dibin berdêla serî ne tewandina me ye. Ji Dewletên Yêkbûyî bigre heta bi YNK ya Celal Telebanî, ji PDK ya Berzanî bigre heta bi Êraqa Sedam Husêyn û jixwe Turk tên zanîn; her kes dixwaze vîna me bişikîne û me teslîm bigre. Ev ne hewldanek nû ye, roja em derketîn vê rêyê heta îro, ev têkoşîn bi awayek herî dijwar dewam dike û ya dewam jî bike.

Peymana me û Êraqê li ser Ednaniyê bû. Ema, rayedarên Êraqê dixwazin ji me sûd wergirin û bi kevirekî du çûkan bikujin. Yêk; bi qebûlkirina me re dixwazin peyama; "binêrin Kurdên ji Kurdên we direvin (PDK) ez wan dihewînim û ji qirkirinê rizgar dikim" bide dewletên Rojavayiyên dilxwede pêşketî. Du; ji hêz û dewletên dijminên me re gotiye; "ne nêrin ez wan di hewînim û qet mereq nekin, ezê di nav sê, çar mehan de wan biqedînim!" Yanî yê bimre jixwe mir! Yên bimînin jî yên di ser wan de birevin û ew û wijdana xwe êdî."

Bipeyva dawî re qermîçokên eniya Riza kûrtir bibûn û çavên reş firehtir. Gotinên bitosintî û wekî ristika mircanan yêk bi yêk bi dar ve dikirin avek hunik li hinavên wan mirovên serhişk direşand. Zelamê bejna wî dimîne tîrka Esmînê û rûyê zirav di bin pora gustîlok de piçûktir dixwiyê, bi dengek az û tijî gotinên xwe ajotin;

"Gotinek ya pêşiyên me heye, dibêje; "Cihê hîvî jê nebe gazind jê nayên kirin." Hîviyek ya me ji kesî nîne heta em gazindan ji wan bikin. Jixwe di felsefa me ya jiyanê de, cihê gazindan nîne. Me heta niha pişta xwe daye hêza xwe ya cewher û heta dawiya bê dawî jî eva wusa bimîne. Niha di serî de ez û em hemî bimoralek mezin zend û bendên xwe babidin û li vêdê ji xwe re jiyanekî avabikin. Herin ji Mexmûr û gundên derdor tirimpêlan kirê bikin û ji ber ava Dîcle dar û çilo bikişînin û kolikan çêkin. Hûn dibînin, mirov nikarin ji kuçan birê ve herin. Her malbat kuçên derdora xwe kom bikin, ji xwe re kavlekî çêkin û çadira xwe di ser wî kavil de vedin."

Wekî keşfek nû kiribe, destê xwe bi baskî Xirnîf (giyayek bi stirî) a dibin tozê de keskîtiya xwe wundakirî û perîşan dixwiyê ve kir û bikelecan dewamkir;

"Hûn Bohtîne û ji min baştir dizanin ema, cihê Xirnîf lê heyî ava binerdîn li wêdê nêzîke. Biya min, av ne bi ser deh, pazdeh mitroyan re ye. Belkî gotina wê li we xerîb were ema, pêşniyara min; bêkû em wext wundabikin em bi tevr û bêrikan ji xwe re bîran bikolin."

Pêşniyara Riza û giyayê Xirnîfa rewşa wê ne jiya wan

mihaciran baştir dixwiya, zêde bala kesî ne kişandibû. Nahesî û kerixandina mejî û mergên guhdarvanan dagirkirî jî ji bala Riza nerevîbû.

“Îro siba emê pirsgirêka ava vexwarinê çareser bikin û ji meseleya qût jî ne tirsin. Ji we re du, sê roj muhlet. Piştî wê divê herkes vegere saziya xwe û sazûmaniya xwe ava bike. Û ez ji we re soz didim; emê bi hev re li vêdê bajarek biwezbet ava bikin!”

Hevoka dawî ya endamê komîteya navend ya PKK’ê bi kelecanek hîvîbarkirî avakirî, eniya girseya hinavê wan ji têhna di şewite qermiçandibû. Tilsimek xendedar lêhvên wan yên ji têhna terikîn pêçabû û beşişandinek tevzdar di dêman de vedabû. Li ser wê coxrafiya lawirên kûvî nikarin bi tê re derbaz bibin, avakirina wargehek asayî jî sînorên xeyalên toxmê mirov derbaz dike, fikrê bajarek ‘biwezbet’ ji jan-kenokekî wêdetir ne tiştekbû.

Şefîqê Bilehî, serê xwe yê hejhejokî nêzîkê yê Mele Mihyedînê gundiyê xwe kir û devê xwe êxist di ber guhê wî de. Ji bû serê Şefîq li yê wî nekeve Seyda yê kurnaz, destê xwe bilez kir di navbera şaşika xwe û ya şefîq de. Şefîq bi acizî ema hêdika di guhê Seyda de got;

“Tu dibînî Seyda? Em bikutekî anîn avêtin vê dojehê û niha jî henekên xwe bi aqilê me dikin!”

Seydayê ji gundiyê xwe yê serhejênok pir aciztir û nizane çi bike got;

“Bi wê qurana min xendî Şefîq, pîre dêyek ya wî jî li vêdêbûya evqas rihet ne taxivî.”

Rêvebirê bi bin dûvikên çavên xwe re piste pista ne raziyan dişopîne, di dawiya axaftina xwe de keserek kûr kişand û lêkir;

“Wekî tê zanîn, zaroka hevalê Sofî wunda bûye û bihesiya me ne di asta tê xwestin de ye. Çi dibe bila bibe, divê em vê zarokê sax û silamet peyda bikin. Niha bidehan refan çêkin û li bin her kevirî, li ber her latikê binêrin.”

Dema ji bû lêgerîna Nûjînê refên dawî jî ji wargehê vediqetan, Riza ber bi qontara çiyê ve gera xwe ya li nav malan dewam dikir. Her kû bi jor ve diçû rewş kambaxtir dixweya. Her kesî pertalên xwe avêtibûn cihekî û bi awrên xem û kîn têkel barkirî, çaverêyî lêdana zengilê ‘ji vê dojehê bireve’ li Rêveberê rêxistinê dinêrîn.

Hin malan serpûşkek ya çadirê vedabûn û zarokên xwe li ber siha wê dabûn hev. Yên ev şans bidest ne êxistîn û şerpûşkek ya wana çadirê jî tine, betaniyek du daran ve kiribûn û li ber siha wê rûniştibûn. Hin jî aloz û kerixî, bê sih û di bin tîrojên dojehî yên bi nav toza tîr re li qemçika wan didan, lave ji mirinek şîrîn dikirin. Jibû ji xwestek û dengê giriyê zarokan dûr bikevin, hergîz mêran hêncetek peyda kiribûn û dîsa barê giran li ser milê jinan mabû.

Jinekî, ava ji Mexmûr peydakirî û ji germa haxta kel pê were berdabû teştekî de û pê kaxezekî baweşînek lê dikir. Zaroka nû li ser pêkan ketî, destê xwe kir di nav avê de, destê wê şewîtî û bi paş ve kişand. Mecîdê Xirbebestikiyê gir û dirêj, xwe di nav toza di bin tîrojên dijwar de dikele avêtibû erdê, di nav toza hûr de digevêzî û bi dengek lavekar ji hevjîna xwe re digot;

"Heybooo.. keçê avê bi min de bike, ez şewitîm!"

Jina gir, ciwan û ji sikan ne dihat hesibandin ema, di nav toz û xwêhdanê de asar ji kevintiya wê nemayî, bi tevgerên tevzdar ava nû ji Mexmûr anî direşand ser hevjînê xweyê bihuner.

Kurê Dawud axayê Dudêrî Merwanê Simbêl mezin, ew sê rojbû xwe dirêjkirî û qet serê xwe ne hildabû. Zeyneba Hevjîna wî du dar daçikandibûn, binê daran di nav keviran de asê kiribûn û betaniyek di navbera daran de daleqandibû. Binê darekî sabît û yê din jî ne sabît asê kiribû. Her kû roj dizivirî jina gewr û duta jî stûna binê wê ne sabît diguhert û bi vî awayî her li ser Merwanê di aloziyek kûr de sûbayî dikir sihbû.

Jinan av peyda dikirin, bi awayekî sê danê rojê xwarin amade dikirin, pertalên xwe ji toz û bagerê diparastin, li hember mar û dûpiştkan nobedartiya zarokan dikirin û jixwe heke zaroşîr, an jî avisbe ramandinê wê jî sînorê aqlê mêran derbaz dikir.

Gotina; "jin dayîke û dayîk jî ew welatê mayî ye" hat bîra Riza û bi awrên şermokî li bejna xwe ya dirêj nêrî. Jixwe re got;

"Gelo ez jî hev toxmê Merwan û Mecîdim" û evê hizrandinê hinavê wî guvaşt û kilox li mix teng kiribû. Ema, xwe ji vê rewşa ruhiya şermdar zû rizgarkir û li derê mala Mewlûda Şirnexî sekinî.

Jina navser, zirav û dirêj ew bi hêlwestek keyfxweş û bi tevgerên kubar vexwend ber siha serpûşka çadira xwe. Şoreşgerê rikvan, awirtûj û dijwar di şertên evqas neyînî de qet ne li benda hêlwestek evqas kubarbû û bê hemd lingên wî ew kişand ber siha serpûşka çadira jina behremend. Piştî xweş başê, li ser kuçek gincir û sincirî rûnîşt Riza.

Dema malîvana rû gewr, dev û lêhvên wê tenik û ligel hemî êş û kederên jiyanê hê jî tiştek ji spehîtahiya xwe wunda nekirî ji çadana ser tebaxê ça dadigirt, rêvebirê rêxistinê bi dengek ne zêde dilniya pirskir;

"Yadê, hûn mirovên serhatîne û êş û janên koçbertiyê we pir kişandine. Ji bû em bikaribin vî gelî li vêdê bicêhbikin û bêhna neyar û dijminan li me dernekeve pêşniyarek ya we heye?"

Malîvana memikên rûyê wê zêde ne dihatin guhertin û dewsên jiyanek êşdar ema bişeref nixwimadî li nav çavên rêvebir nêrî û bidengek heta bixwazî jixwe bawer û dilniya bersiva da;

"Heke wextê we hebe, ezê ji we re serpêhatiyek ya li ser ava

genî qewimî vebêjim?”

Riza bi hêlwestek li ber xwe ketî beşişî û got;

“Bila kurt be yadê.”

“Pir kurte. Jixwe ez baş jî nizanim. Ema, çend gotinên tên bîra min jî li gor min pir watedar û rê nîşandvanin” û jina dewsên şirikên xwêhdana bitoz li ser dêmê wê zuwabiyîn bihêlwestek zanîndar dewamkir.

“Jinek spehî, jêhatî û xweşbêja gundê me hebû. Me jê re digot; ‘xaleta Xifşê’. Dema em zarokbûn wê ji me re ev çîrok digot û piştî em hatin vêdê rehma xwedê lê be xaleta Xifşê û çîroka wê dîsa hatin bîra min. Çend gotinên ji çîrokê têne bîra min evin;

Binavê Kuling û Kero du birayên mîrza hebûn. Rojekî rêya Kuling li vê beriya Ereban dikeve û li keça şêxê êlek Ereb evîndar dibe. Dema vedigerê nav eşîra xwe, ji eşqadil tebata wî nayê û derdê xwe ji Kero re vedike. Her du bira xwe di şûr û mertalan de dipêçin û berê xwe didin nav êla ereban. Li duryanekî li rasta Kalê hevt rêyanan têne. Zilamê yêxtiyar û serhatî pirsa merema wan dike û ew jî hal û meseleya xwe jêre vedibêjin.

Kalê heftrêyanan dibêje; “lawên hêja, dema we deşta Dîbege derbazkir çiyayê Qereçoxê derkeve pêşya we. Bê nal berê hespên xwe nedin Qereçox, simên hespên we yên bibizirin. Li rojavayê qontara Qereçox ava Genî heye, bila hespên we ji wê avê venexwin yên bi werimin” û her du birayên çeleng û mêrxas bi şîretên Kalo ve xwe tavêjin rê.

Li cem nalbendekî Kero hespê xwe nal dike û Kuling dibêje, “hespên bê nal ji yên naldar rehwaltirin” û hespê xwe nal nake. Piştî deştê derbaz dikin xwe li Qereçoxa şewitî û kuç gincir didin. Li Rojavayê qontara Qereçox li rasta ava Genî têne. Kero nahêle hespê wî ji avê vexwe û Kuling dibêje; “Kalo vira dike” û hespê xwe tajo ser avê.

Ezê kurt bibirim. Li ber qeraxê Dîcle digihêne cem êla bavê Şemsîxanê. Wekî du teyrên baz dadidin nav êlê û keçikê direvînin û siwarên êla ereban jî didin dûv wan. Şer giran dibe û hespê Kuling di werime, simên wî ditebiqin û bê tevger dimîne. Kero, qederekî xwe û Kuling diparêze ema, hespê Kuling di dawiyê de vedixwime û ereb Kuling dikujin. Kero sê roj û sê şevan şer dike û xwe û Şemsîxanê rizgar dike û dizivire nav eşîra xwe.”

Yadê Mewlûde, kêmek beşişî û bi beşişandinê re rêze dinanên wê yên wekî mircanan di nav lêhvên tenik re xwiyan û dewam kir;

“Wekî xaleta Xifşê gotî, çîroka me çû deştê û dê û bavê me çûn buhêştê.”

Şoreşgerê destê xwe pesartî lama xwe û bê lept guhdar dike,

dema çîrok xilasbû wekî ji xew hişyar bibe veciniqî û got;

"Vêca yadê, encamê em ji serpêhatiya Kuling û Kero derxînin çiye?"

"Encam eve; em zozanîne û me warê xwe daniye qontara Qerçoxa şewitî û ser ava Genî. Li vêdê, dijminên me ne tenê dagirker û xwefiroşin; erd û av, kevir û çiya hemî neyarin. Divê em ji her demî rêxistîtir, berxwedanvantir, zanatir û ya ji hemiyan girîngtir jî dijwartirbin. Li vêdê, cêh ji sistahî, nahesî, xemsartî û dest ji xwe berdanê re nîne. Li vî warî xeta di navbera xweşmirovtî û qelsemirovtiyê de an jî mayîn û nemanê de ewqas zirave, di saniyekî de alî dikarin werin guhertin.

Vêca Rizayê min, ya ez dixwazim bêjim eve; li ber her evrazî nişoviyek heye. Niha karwanê me li binê evrazek dijwar û xetere. Ya kifşker, ne qisûr û lewaztiyên bêhnî, ne jî têhnî û birçî mayîna karwanvaniyane; divê ser karwan van tiştan zêde ne fikire. Karê ser karwanek zîrek û jêhatî, karwan bigihîne binecihê."

Xendeyek tilsimdar rûyê qemitî yê Riza da der, serê xwe hejand û got;

"Niha ser karwan ezim?"

"Belê, û ser karwanê jin, zarok, pîr, nekar, tevlîhev û têr dijmin! Êdî tu û jêhatina xwe."

Hê bandora çîroka jina biserpêhatî di serê serkarwan da deng vedida li tirimpêlê xwe siwarbû û ji bû lêgerîna zaroka wundabiyî xwe berda deşta Qereçox.

Mewlûde Îke; di wext û zemanê xwe de terezinek nû gihatî ya mal mezinek ya gundikê Tehlo bû. Spehîtahiya wê li nav êl û eşîrên cihê Bohta deng vedabû û ji bû xwestina wê kurên mîr û wezîrên herêmê li derê mala bavê wê didan ser pişta hev. Ema zeriya Bohta, qîma xwe bi tu kesî ne tanî û dixwest wekî nazdara mala bavê xwe bimîne.

Rojekî ew û kurê mal melayê gundê Girek Muhemet Xalid, wekû rasthatî liqayî hev hatibûn û dil ji hev revandibûn. Lawê Serikê Muhemedê Oso, Berfîna geliyê Hêzil bi qewlê xweda û pêxember ji xwe re xwestibû û heft roj û heft şevan daweta wan lidar mabû.

Çaryêka dawî ya salên heftiyê, hê evîndaran têr hev nedîtî di navbera Muhemet Xalid û leşkerên turkan de şer derdikeve û ji bû tola xwe hilîne berê xwe dide Başûrê Kurdistan, nav pêşmergeyên Partî Demokrata Kurdistan-PDK'ê. Bi demê re hevjîn tevlî zarokan dibin û Muhemet Xalid, hevjîna xwe jî derbazî Başûr dike.

Her çend salan carekî Mele Mustefayê serokê PDK'ê aş betaliyê îlan dike, pêşmerge teslîm dibin, vedigerin malên xwe û Mewlûde bi komek zarok ve xwe li sînorên waleta dagirkirî dide. Belkî bi dehan car sînorê Başûr û Bakur diqetîne û li dûv evîndarê

xwe yê êdî şervanek hêl yê rizgariya welatê bindeste digere. Ne Muhemet Xalid dest ji şervantiya xwe berdide û ne jî Mewlûde bi koma zarokên xwe ve li dûv çûyîna wî dikerixe.

Piştî Partiya Karkerên Kurdistanê PKK li herêma Heftanîn bicêh dibe wekû kurdek welatparêz xizmeta ji Muhemet Xalid tê texsîr nake. Ew şervanek yê rizgariya Kurdistanê bû û PKK jî partiyek ya rizgariya heman welatê bindestbû. Ji bû wî ferqa partî û parçeyên Kurdistanê tinebû û ew şervanê Kurdistana mezin û hevgirtîbû. Ema partiya Muhamet Xalid, komek zarok bê dudil li dûv xwe hiştî, bi salan pêşmergetiya wê kirî, di şerên dijwar de bi caran birîndar biyî û biked û xwîna xwe payetiya fermandartiyê bidest êxistî wusa ne difikirî. Pêşketina PKK'ê wekû tinebûna xwe didît û li cem dagirkerên Muhemet Xalid li dijî wan bûyî pêşmerge cêh digirt.

Piştî salên notê kurê malê Seîd Îke (Kemal) tevlî gêrîlayên PKK'ê bibû û nakokiyên Muhemet Xalid û partiya wî jî kurtir bibûn. PDK'ê, bi caran Pêşmergeyê xwe yê qedîm û dilsoz girtibû, bi mehan bê ser û şûn wundakiribû ema, nikaribû wî ji fikrên neteweyî vegerîne. Piştî Emerîka qismek yê Başûrê welat teslîmê Partiya Demokratê Kurdistanê dike sê salan, heman partiyê pêşmergeyê xwe dubare revandibû û bê ser û şûn wundakiribû. Li gel hemî hewldan û lêgerînên Yadê Mewlûde, carek din jî saloxdanek ji hevjînê xwe ne hilanîbû û bi komek zarok ve li zikakên bajarê Zaxoka Behdînan mabû.

Di bihara heman salê de ev rêvanên niha li qontara Qereçox asê mayîn derbazî Başûr bibûn û Mewlûde jî bi zarokên xwe ve tevlî karwanê wan bibû. Û heta wê gavê jî wekû yêk ji pêşvanê karwan meşa xwe ya azadiyê dewam dikir.

## Xezala Qereçox

Rojê ji zû ve xatir ji cîhana gewrik xwestibûn û bi nav toza tîr re zeraqên stêra şivanan bi zorê dihatin fitrandin. Lêgerîvanên keçika wunda, yên ji segûrê ve derketîn û heta bi tarîtiya şevê lingên xwe ne êxistîn di dibin xwe de dîsa bê mizgînî û dêm xemgîn zivirîbûn. Li ber her kevir û latikê, li her dilok, mesîl û avşuyê bi caran temaşekiribûn. Heta bi gundên derdor, dola Gewre, aşê Bayê jî çûbûn ema saloxdanek ji zaroka ji dûh sibehî ve wunda biyî peyda nekiribûn. Dibêjîqey erd û ezman li zaroka şeş salî hatibû hev û dabelandibûn. Roja paştir bi awayek hê boştir gel, tabûra Fermandar Karker, jin û zarok jî tevlî lêgerînê bibûn ema, bi reş ketina şevê re dîsa dest vale zivirîbûn nav malan.

Beyaniya zû ya roja çarêbû. Dîsa lêgerîvan ji zû ve derketibûn û gir û pêtiyên Qereçox li dûv xwe hiştibûn. Fermandarê parastina

wargehê bi hîviya tabûra wî ve mayî û ji hatina Mexmûr û pêve demjimarekî jî ne vehesayî, bi berbangê re hevalek da rex xwe û bi berwarê ber bi Bakurê Qereçox ve derketin lêgerînê. Dema roja sohr tîrojên xwe nû li kumê Qereçox didan, gihatibûn binê neqeba cesê (gêçê). Li bin keviran, li dolikan, li avşuyan û li her derî dinêrîn ema, ne şopek û ne jî saloxdanek peyda kiribûn. Fermandar ji xwe re got;

“Ne ber bi aqile zarokek şeş salî, xerîb û nenas ji rexê Başûr yê wargehê were heta bi van deran!”

Bi wê remandinê re gêrîlayê ciwan yê biqasekî berwarê jor re dimeşe, destê xwe baskî dolikê ve kir û bi dengek nivz bangkir;

“Hevalê Karker, xezal!”

Xezalek mak, bi ser qubika kevin û ji toza sed salan reng guhertî re û di nîvî dolikê de pozê wê li erdê û bê lept disekinî. Karker kêmek vesikînî, ji qestîka xwe kuxand û xwest xezalê bide revandin. Ema dibêjîqey xezala Qereçox peykerek ji kevirbû û ne dilepitî. Fermandar xwest kuçekî deyniyê, dil nehişt û biber wê ve meylkir. Di navbera wî û xezalê de êdî du gaz mabûn. Heywana şîrîn hê jî bi awrên xemdar û bê lept li ciwanê xerîb dinêrî. Fermandar jî vesekinî û awrên wî û xezala Qereçox li hev qerase bibûn. Xezala mak û ji xelekên stirhên wê kifşe ne bin çar beran re ye bihêlwestek kuldar ema kubar, serê xwe bada û birêket. Bi livandina xezal re liber leftikê reşek piçûk li çavên Fermandar aliqî. Awrên Fermandar di navbera reşê xezalê bicêh hîştî û xezalê de çûn û hatin. Û ji nişkan ve xezal ji çavan wunda bibû. Fermandar zenkir, ya dayîkê bicêh hiştî karxezalek bi pirsgirêke û jixwe re got; “xwezî me belaya xwe lê nedabûya!” Ema dema bi baldartir nêrî, bi nav toza kilsê re kelaşê zarokekî ferqkir û veciniqî! Janek bê hemsal ya ti carî bipêre hevnas nebûyî dilê wî guvaşt û dunya li dorê zivirî. Ji bû ne vexwime li cihê xezal sekinî xwe pesart rizdeya Nûjînê xwe li ber dirêjkirî û bê xatir çûyî.

Bilbizêka Bohta, xwe bi ber latikê re dirêj kiribû. Pêlava lastîka reş û pehnî qetayî di bin serî de bû û li ser tenişta xwebû. Lingek bi ber xwe ve kişandibû û destek yê wê di bin sera de bû. Rûyê gewr û spî ji ber tava Qereçoxa xopan şewitîbû, bibû qitran û vegerabû rijiyê. Pora zera qesebî, wekî şebê spî bibû. Lingên wê yên bê gore jî şweitîbûn. Dema Fermandar destên xwe bi bin re kirin û rakir, laşê zarokê wekî tayek dar hişk bibû û kitek pêlav bi guhê wê ve rabû. Kengê pêlav ji guhê pîvoka Cûdî vekir, cihê devê pêlavê li ser pişta destê êxistî di bin serê xwe de û wêneyê guh li ser mista heman destî çebibû. Dilopên xwîna ji poza hatî ji zû ve li ser lêhvên kelişî zuwa bibûn. Hê li jiyanê û birêve pozê wê ji germa verîsabû û pê devzendkên xwe paqij kiribû û devzendkên wê bixwînbûn.

Fermandar xwest, destê kirî dibin serê xwe de û lingê bi ber xwe ve kişandî rast bike ema, hişk bibûn û ne dilepitîn.

Fermandarê ciwan, kelaşê şewitî ji asayî pir zêdetir bi ber singa xwe ve şidand, pala xwe da kuç û çavên xwe noqandin. Du hêstirên gir ji çavên tijî rijan û bi nav simbêlên zer û zirav re daketin xar. Zarok, hêdîka da ber singa şervanê xwe û di dolikê de, di jor de bezî û bazda ser quba şahidî ji sed salan re kirî. Destên xwe hildan jor, vekirin û heta awaza wî derket kir qêr! Û bi dengek bilind got;

“Soz be Nûjîn! Sond be Nûjîn! Berdêla wê çi dibe bila bibe, ew doza me di oxira wê de tu wunda kirî bigihê serkeftinê!” û ev hevok sê caran dubarekir Karkerê Nerexî.

Gêrîlayê hêstir û mohrikên xwêhdanê di çavên gir û genimî de tevlîhev bûyîn, li ser serê quba pîr wekî pêkerek bi wezbet dixwiya! Destên xwe danîn, serê xwe hejand, çavên xwe yên gir û genimî ji hêstiran paqijkirin û hat xar. Şûtika xwe li zarokê pêça, bi ber singa xwe ve hişk şidand û derketin ser rêya qîr. Pîkabek sekinandin û berê xwe dan mala ji Nûjînê re tenê yêk şevî malîvantî kirî!

Pîkab hat û li ber pertalên bela-wela, di bin tozê de wundabiyîn û dayîka jêdera hêstirên wê ji zû ve çikayîn, bê hal û bi awrên elem ji wan diherike sekinî! Mejî, ruh li Fermandar qerisandibû û cesaret ne dikir Nûjînê di wî halî de nîşa Xecê bike. Ema dayîka êşên cêwî jiyan dibû, rabû ser xwe û bi hêstên têkel kurveda tirimpêla di nav tozê de wundabûyî. Awrên gêrîlayê ciwan yê kelaşê Nûjînê bi ser ranan re dirêjkirî û dayîka ji kezebê birîndar bi cama lewitî re li hev qerisîn. Çavên her du ya jî vegerabûn êtûnek nû vemirî. Karker, çavên xwe yên vegerayîn kûrha hedadan ji yên Xecê revandin û karxezala Qereçox berda ber singa maka wê! Dayîka bêndera kara xwê di hinavê wê de derbiyî, keleşê terezina xwe bi ber singa xwe ve şidand û kir qêr! Dengê wê ewqas bilindbû, li singa Qereçoxa mal şewitî ket û di şûn de beyî!

Nûjîn miribû! Nûjîn, ji têhna fetisîbû! Agirê dojehê rûyê nazik şewitandibû û kiribû rijî!

Gelo dema Zerdeştê Kal, ji qewmê qedîm re sêtî ya başiyan rêzkirî qet sêtiya nebaşiyên bîjiyên Şaristaniyetê ne hizirîbû? Gelo dema teza qencî û xirabiyê pêşxistî, çima sertezek ava nekiribû? Gelo qet ne fikirîbû kû rojekî neviyên wî, binavê qenciyê yê buhişta Baxê Îremê di sêniya zêr de ji Kerdizên Asya Navîn re pêşkêş bikin?

Em ferzbikin Zerdeşt, ne şehrizabû û jixwe jî wusabû. Başe, çima Stiya Stêr tedbîrên şehristaniyên li ser singa warê wê ji malzaroka bazaran derketîn negirtibûn? Qey nizanî yên buhişta wê bikin dojeh, qey nizanî yên bi agirê wê dojehê goştê ter û nazik yê Nûjînên wê bikin rijî? Heke nizanî û nikarî Nûjînên xwe

ji nevî çîçirkên Ehrîmanan biparêze; çima navê 'Star' li xwe danî? Ax.. de bila yêk vebêje; evîn li kûdê kuştin? Dildar, li kûdê hiştin û çavbirçiyên şaristaniyetê ji kû derxistin? Baxê Îremê, buhişta heft olî çawa vegerandin dojeha mişk û maran?

Piştî wundabiyî danûpeza roja çarêbû. Binevşa Baxê Îremê, li girikê Rojavayê mala tenê şevekî stirandî spartibûn axê. Dema Zîna Hevlerî û Xanê ya bûka Hacî Şerîfê Gundikî di bin milan de û Xecê ji ser tirba Nûjînê tanîn got;

"Hûn bi xwîna şehîdankin, bihêlin ez li vêdê bimînim. Ne li vê çol û beriyê, di nav van dûpiştik û maran de sebra kezîzera min tenê nayê!"

**Qey Hûn jî Misilmanin?**

Roja piştî çûyîna Nûjîn berê nivrobû. Şertên jiyanê karxezala Qereçox zû ji rojeva wargehê derxistibû. Heke yên gihatîn tişetk nekiribûna pir Nûjînên li pey wê Nûjînê çûbûna. Karwanê tirimpêlên dar û hesîr barkirî ji zû ve ketibûn nav wargehê û bi hewarî barê wan datanîn. Komîteyên semtan, zend û bendên xwe badabûn û serê qertê pênç darên spîndar û pênç hesîr belav dikirin. Yên dar û hesîrên xwe digirtin, bi zibareyî girşên spîndar bi nîvî re dişeqitandin û pênç dar têxistin deh qet. Du qet têxistin çar stûn, çar qet datanîn ser serê stûnên daçikandîn û yên mayîn jî bi ser nîvê kulikê re wek hev dirêj dikirin. Her pênç hesîrên şelal û malîvanên xwe ji zeraqên tavê naparêzin, li ser pişta kolikan asê dikirin. Jixwe kes li hîviya wê arlkariya biminet ya UNHCR nemabû û tirimpêlên ji Mexmûriyan kirê girtîn, barên dar û çilo ji ber kenarên Dîcle dikişandin.

Xweyî çadiran, biqasî mezintiya çadira xwe kavlek çêkiribûn, çadira xwe di ser wî kavlî de vedabûn û qenc asê kiribûn. Li pêşya çadirê jî di bin kolika nû ava dikirin de eywana rûniştinê amade dikirin. Xaça sohra Êraqê, ava wargehê girtibû ser xwe û li gor soza dayîn, yên ji wê rojê û pêve her roj bi deh tangêran ava vexwarinê bikişandana. Şarevaniya wargehê, bi aşê cemedê yê Mexmûr re peyman çêkiribû û yê her roj du sed qalip cemed ji wargehê re hatibûya veqetandin. Bi wan dar û hesîrên anîn, pir şermokî jî be guhên xebatkarên UNHCR jî hêdî hêdî bi quncikên nependî re dabûn der. Semt hatibûn kifşkirin û dîsa ber bi Bakur ve hêjmar hatibûn rêzkirin. Rexê Başûr semta yêkbû, du û sê di navberê de û rexa wargehê ya Bekur jî wekû semta çar hatibû hêjmarkirin.

Mala Zîna Hevlerî û Merwanê Dudêrî nêzîkê hevbûn. Li gor kifşkirina nû, mala her du ya jî di nîvê semta du de cêh digirt. Zinê ya piştî pêvajoya wargeha Nînûva nebûyî xweyî çadir, Xelîlê hevjînê

wê pîqabek dar û çilo anîbû û kolikek mîranî ji xwe re ava kiribûn. Kolika xwe ligor eywana çadirê avakiribûn û heke çadirek bidest wan biketa, yên wekû paşmezela kolikê vedabûna. Şev û roj tebat li ruhê Zînê û Xelîl ne diket û hema bêje di şertên heyî de rewşa wan ne pir xirab jî bû.

Bîdonek ava vexwarinê di dest de, Zînê hat û li raser serê Merwan sekinî. Zelamê simbêlên stûr di êxirên deva de dadiketin û hîviya jiyanê di bîbûkan de nemayî, di nav pertalên belawela û bostek ax li ser wan bilind biyî de bê hal û taqet ketibû. Kurê Dawud axayê Dawudî Merwanê simbêl mezin, xwe li hember tofana Qereçox ne ragirtibû û Zeyneba hevjîna wî bi teknîka xwe ya nû îcad kirî sih li ser dizivirand. Zînê, bîdonê avê raberî Zeyneba sohr û rûyê wê ji germa Qereçox lûçikî, bûyî birîn û tozê devê birînan nixwimandî kir, siha li raser Merwan bilind dibe nîşakir bideng kenî û got;

"Tu biqedrê xwedêkî hevala Zeynep, ev teknîk û pergal çawa hat bîra te?"

Zeyneba di rastiyê de jinek henekvan, jêhatî û qederê ew jî anî ser hewiyê xwest bikene ema, dev û lêhvên terikîn û rûyê ji nîvî zêdetir lûçikî hatin bîrê û waz lê anî.

"Keçê Zînê, toxmê mêran kêr tengiyê nayê. Dema li wan teng dibe yan direvin yan jî aloz dibin. Em çi bikin, di ser halê xwe de barê parastina wan jî ketiye stoyê me."

Li ber serê Merwanê nefesa wî bi zorê dijene, tozê ser û guh û simbêlên wî yên mezin nixwimandîn û bê hal dirazê Zînê, çokveda û bangkir;

"Hevalê Merwan, hevalê Merwan!"

Merwan, wekî nû bi hatina Zînê hesabe xwe veciniqand, bi hêlwestek siyanetkar rabû û di nav toza xwe de çar mêrkî rûniştî. Bi awrên qeyran ji wan diherikin li Zînê nêrî û bi devoka koçerî got;

"Tu bixêr hatî hevala Zînê, ba keremke."

"Hevalê Merwan, ji hinga em hatîn ve te xwe di bin vê tozê de, bi nav van mar û dûpiştikan re dirêjkirî ye û serê xwe ne rakiriye. Tu ne tiştekî dikî, ne ji van zarokan re starekî ava dikî! Qey ne bese, dema desthilanînê ne hatiye?"

Zelamê wirarên hîviyê di çavên wî de nemayîn, di ser hev de çûyî û biqasî pencekî lê hatî got;

"Zînê, ev der ne cihê desthilanînê ye, warê mirinê ye!"

"Cihek kifş yê desthilanînê nîne hevalê Merwan. Di sêrî de jiyan, kengê nirx û rûmeta mirov ket xeteriyê li wêdê tişta herî pîroz desthilanîne! Û ewder xeta herî zirav û dijwar ya xweşmirovtî û qelsemirovtiyê kifş dike."

"Têkoşînek bê hîvî ne serkeftinê, mirinek sik bi xwe re tîne Zînê."

“Ya têkoşînê hîvîdar dike ne şertên stewayî û ne jî warek xweşe, bawerî û wêrîne. Ankû tu bawer dikî şertên niha em di tê de ji yên Mezloman, ji yên berxwedanvanên zîndana Amedê xirabtirbin? Heke wan di wê xeta herî dijwar û zirav de desthilanîn ne hilbijartana; niha yên ne sond û soza me bûna!”

Gotinên zanîndar yên jina hîviya jiyanê ji rûyê wê yê esmer difûre, mergên kurê axayê eşîra Dawudî hingavtibûn. Tilsimek şermdar dêmê li ber tavê şewitî û çermê wî şelpitî yê kurê Dawud axayê dudêrî pêça û awrên wî şkestin. Ji nişkan ve bideng kenî û bangkir hevjîna xwe;

“Keçê Zeynep, ka pêlava min bîne. Ba, bi xwedê Zînê hetik û helaka me bir!”

Ji berya nîvroya rojek ya înêbû. Derdora ava genî ji çadir û kolikan reng guhertibûn. Her kû diçû dijwartî û germahiya bagera ne niyete belaya xwe ji wan dînemergan veke, zêdetir dibû û hesîrên baş ne hatîn asêkirin wekî pereşûtan li ezmanê wargehê li nav guhê hev têxistin. Wekî meydana hespên bezê, bablîsokan li serê semta çar milên xwe didan hev û lalîk û qoçxaneyên kevaniyan bi semta yêk re derdixistin. Bablîsoka diket di bin kolikan de, destpêkê erdhejek dijwar çêdikir û heke kolik baş nehatibe asêkirin banê wê radikir û bi xwe re dibir. Ne tenê banên kolikan; pîjaqên tiştên navmaliyê jî li çep û rast direşand

Kite mitên serdanvanên aloz û biqeyran hê jî li ber kolika Sofî Tahirê Gundikî daxwaza sersaxiyê dikirin. Sofî Beşîrê Serhêsin hosta û Emerê Batûyî ber hosta, binyata xaniyê Emer danîbûn û çend rêz jî bilind kiribûn. Mirovên niyeta wan nîne li warê mar û dûpiştikan bimrin, bi awrên şaqistî ji wan dibare li hosta û ber hosta dinêrîn, quwetek tevzdar li wan didan û digotin;

“Te xêre hevalê Emer; heke ji me cuda tu tiştekî dizanî bêje? Ji bû em jî dest bi çêkirina xaniyekî bikin?”

Emerê ne têr axaftin û ji gotinê zêdetir kirinê binyat digre, ji bû parastina zarokan pêwîstiya starek qayîm vedigot ema, niyeta wî ya kesî qayîl bike jî tinebû.

Riza, çadira biryargeha xwe li pişta mala Zîna Hevlerî danibû û ji bû binyata xaniyekî Evdurehmanê Gabarî, Ehmedê Bêdengê Hîlalî û çend kesên din benik û şerît dikişandin. Li ber tangêra avê ya bi bin biryargeha re sekinî û li ser sera heşir, tenekeyên pîrekên Gundikremoyiyan ji hewa ve difirîn. Ehmedê Şero yê Hîlalî, di nav jinên domihr de asê mabû, şaşika wî ketibû di stoya de û heta awaza wî derdiket têxist qêr. Endamê nû yê şaredariyê, ji bû belavkirina ava semta du hatîbû erkdarkirin. Dengê zelamê qam qut û perixî, di bin dengê teqe reqa tenekeyan de mabû û tenê Riza biken guhdar dikir. Deziyek zuwa li zelamê cir ne xweş û beden lewaz ne mabû û

şirikên xwêhdanê ji serê poza diherikî tevlî ava bûdîn û tenekeyên jinên har dibû. Zelamê wekî dîkê porê lê hatî, di girtina xurtoma avê de zehmetiyek ne asyî dikişand û xwêhdan û av li ser rûyê wî yê qermiçî tevlîhev bibû.

Birek zelamê tiqwe û ji benîtiya xwedê bi paş ve gav ne avêtîn, piraniya wan yêxtiyar bi nav jin û zarokên ji Mexmûr avê dikişînin re ketin di nav kavlên xaniyên bajarokê wêran de û ji bû mêja înê berê xwe dan mizgevta perîşan. Mexmûriyên şaşik mezin, giştika şalwalên wekî xirarên pembû heta bi bin çengên xwe kişandîn û xwedêyar; bi awrên şaqis li koma wan mirovên di bin toza bajarê wan de perîşan biyîn temaşe dikirin.

Mamosta Ismet, eslê xwe ji Miksa Wanê bû û dema zarokbû bav û mamê wî bi malbata xwe ve hatibûn û bibûn pêşmergeyên PDK'ê. Di dema 'aş betal'iya Mele Mustefa de, revîbûn û hijdeh sala li qampên mihacirên Êranê mabûn. Piştî Amerîka di navbera Êraq û Başûrê Kurdistanê de xeta parelêla sêh û şeş kişand, bi hîviya Kurdistana azad ew jî zivirîbû bajarê Zaxo. Dema Kurdistana dilxwede azad dibîne, xeyalên ew emreke li dûv ketî hûr û heraf dibin û ji bû xeyalên nîvçe mayî tevlî wî karwanê zor dibe. Kesê fer yê di wargehê de  zaravêyê Soranî dizanî Ismet bû û girêdayî vê têkiliyên wî û Mexmûriyan jî xweşbûn. Ew jî li derê dukana beramber mizgevtê sekinibû û bi dukandar re sohbet dikir. Dukandarê wî jî bi ser milê xwehr yê Îsmet re li koma sofiyên hatîn mêja înê dinêrî, bi awayek ne asayî ji Ismet re got;

"Qey hûn jî mêj dikin?"

Îsmetê ji zû ve nêzîkatiyên wan yên neyînî ferqkirîn ema sebebê wê fêhm nekirî, bi hêlwestek ji xwe bawer û dilniya bersiv da;

"Çîma qey em ne misilmanin?"

Zelamê dukandar, gotin di devê xwe de cût û ne xwest ya di dilê xwe de vebêje. Ji bû ya dukandar difikire bêje, Ismet ling da ser û israrkir.

"Ezê ya ji me re hatî gotin bêjim ema, divê di navbera me de bimîne."

Ismet daxwaza dukandar pejirand û dukandar jî ya ji wan re hatî gotin rêht;

"Ji beriya hûn werin vêdê PDK yê zelamê xwe şandin nav me. Gotin; "komek mirovên werin wêdê. Yêk; xwedê nenas û bê olin. Du; bê exlaqin, bav ji keça xwe û kur ji dayîka xwe nabûre. Sê; mindal dizin; zarokan dixapînin û wan direvînin çiyan.

Çar; jixwe dehşikên Sedamin û ji bû Sedam dijminatiya Kurdan dikin."

Ismet, bi hêlwestek qure û tevzdar beşişî û got;

“We jî bawer kir?”

Kirasê şermê rûyê mêrikê dukandar nixwimandibû, awrên wî şkestibûn û bidengek tewanbartî jê dibare dewamkir;

“Belê!

Ema ya ez di têgihiştina wê de zehmetiyê dikişînim eve; ev çil sale mala Berzanî ji me re viran dikin û her cara paştire em ji wan çêtir bawer dikin. Ez nizanim, ne ev ji hostatiya wan ya derewvantiyê tê û ne jî ji kêm zêhniya  me ya mezin!”

## Jeolog

Dawiya hefteya destpêkê ya nû waranbû. Roj zerikbû. Roja ber bi Rojava ve dişemitî dibêjîqey di nav xumama berîstanê de asê mabû û di çûyînê de zehmetî dikişand. Fermandar Karker û Feqeyê Gweyînî yên avakirina kolika asayîşa nû qedandîn, li ser kendalê bilind yê raser germavê rûniştibûn û li wargehê dinêrîn. Ligor rojên destpêkê kêmek jî be bagerê dijwartiya xwe wundakiribû. Ema hê jî kitên bablîsokan ji semta çar ve di ketin nav kolik û xîbetan de, bi xwe re girikên tozê radikirin û biserê Başûr yê wargehê re derdiketin. Toza wekî berfa sohr dibarî ser nû waran, ji bilî rengê xwe ti rengên cuda qebûl nedikirin û di cêh de hemî reng dadibelandin. Karker ji Feqe pirskir;

“Evqas toza hûr ya dibêjîqey moxilkiriye çima ji vî erdî radibe? Jêdera wê çiye?”

Zelamê bejin navîn, dilopên xwêhdanê di bin guliya hilûs re dirijên ser gurmikên qemitî û bilêketina xwêhdanê re şewtek dijwar dibihîze; li hember pirsa jê hatî kirin şewilîbû. Dibêjîqey ya ew şewilandî ne pirs, heybeta fermandarbû. Dema Feqe, xwe ji bû bersiva pirsê amade dikir û gotin û hevok di serê xwe de di gerandin Fermandar li deşta mijdar ya di navbera qontara Qereçox û ava Mezin de tijî gundikên rût û erebî dinêrî. Li gundên mijara gotinê, ne xaniyek birêkûpêk, ne hewşek mezin û ne jî darek hişîn dixwiya. Milên çend xaniyên ji kerpîçên ax dabûn hev û dibêjîqey malîvan mêhvanê rojêbûn. Gotina dayîka wî ya; “filankes Erebê mal bimile” hat bîrê û bîranîna yadê Zelîx xendeyek têkel li dêmê gewr barkiribû. Dengê bikelecan yê Feqe Fermandar ji nav ‘mal bimilên’ deşta Baqirtê zivirandibû.

“Sedemê hûrîtî û zehfîtiya toza vêde eve; bi sedan salan bayê dijwar toz ji berîstana Erebîstanê rakiriye û li vêdê werandiye. Ji ber kû toza dabaşa gotinê pir hûre, ava baranê ne hilanî ye. Yanî, baran li tozê neçûye û di ser de şemitiye. Qepûşka hişk ya bi şilkirina baranê li ser rûyê tebeqeya tozê pêkhatî, toz ji ba û bagera dijwar jî parastiye. Bi vegotinek din, qetek toz ketiye, bi barandina

baranê re rûyê toza mijara gotinê qepûşk girtiye û wê qepûşkê toz li cihê xwe hemandiye. Dubare toz ketiye ser qeta toza qepûşk girtî û dubare barênê qepûşkek nû çêkiriye. Evê rewşê bi hezaran sal ajotiye. Ji berkû axa hûr tebeqe tebeqe ketiye ser hev û nermîtiya xwe parastiye, ji hêlûna dûpiştik û maran re jî bûye war. Bi demê re xwecihên herêmê jî ji ber van lawirên bijehr pez û dewarên xwe nêzîkê vêdê nekirine û girêdayî vê bûye cihek bijûn. Bihatina me re, tebeqeyên tozê yên bi sed salan li ser hev bilind biyîn dibin tekelên tirimpêlên giran de şikestîn û axa bi salan ketî ser hev wekî volkanê teqa."

Awrên Fermandar, bidêmê ji germahiyê kelpitîn û şikestekên kelpitandinê tijî heriya tozê biyîn yê Feqe ve daleqayî mabûn. Beşişî û bi dengek yarîtî barkirî got;

"Dema welatê me rizgarbibe emê payeya jeologtiyê bidin te. Ji xwe re ekîbek pispor ava bike û were axa şewitî, têr toz û dûpiştik vekolîn bike" û keserek kûr kişand. Bi dengek şad û kêmek bikelecan lêkir;

"Emê êdî herin!"

Zelamê nû payetiya Jeologtiyê girtî hilciniqî û "kû"yek ji nav lêhvên şeqitîn felitî.

"Meskenê xwe, yanî çiyan."

Wekî ne li benda nûçeyek wusa be Feqe, kêmek şaş ma û pirskir;

"Qey me hûn pir acizkirin, hûn bi çûyîna xwe evqas şad bûne?"

"Na! Ji her kesî, ji her tiştî bêhtir min hej we kir. Bawer bike, eşq û berxwedana we ya azadiyê baweriya mina bi serkeftinê bidehan qet mezintirkir. Ema, divê em herin û ji bû em bi hev re zûtir vegerin warê bîriya wî hinavê me dişewîtîne şer bikin. Li aliyê din, we xwe kêmek bicêhkir, vegeran ser karên xwe û êdî pêwîstî bi me jî zêde nema."

Heta derengê şevê sohbeta fermandar Karker û endamên wargehê yên hêza xwe parastinê ajotibû. Piraniya wan ji fermandartiya hêza xweparastinê, dema destûr xwestin û rabûn ser xwe, Karker bihejêkirinek jidil destên wan şidand û destê Feqe berneda. Gotinên lib bilib ji nav lêhvên wî yên tenik û ji germa teqayîn dirijan, li toza guhên fermandarên hêza xweparastina koçberan diketin û mergên wan disimtin. Fermandarê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan, wekî xatirên bê dawîtiyê bixwaze awrên xwe pesartin valetiya tarî û şîretên xwe yên dawî rêzkirin;

"Qedrê berxwedana xwe bizanibin. Ev berxwedan wusa erzan û sehl ne gihat qontarên Qereçox. Heriya binyata vê berxwedanê bi hêstirên dayîkan û xwîna pakrewanan hatiye

stirhan. Bila kêm û qisûrên rojane mejiyê we mijûl nekin, xwe xerîb û lewaz nebînin. Dîrok û zeman, ev şans ji we re bexşand û di ferqa mezintiya xwe de bin. Bawer bikin, heke çaryêka we êrîş hatibûna ser wan cihûyên bi Mûsa re derketîn rê, Yaşûa jî di nav de tu kes li dûv ne dima" got û ji hev veqetan.

Feqeyê Gweyînî, bi mejî û fikrek bi peyv û gotinên Fermandar Karker hatîn avdan vegerabû kolika xwe. Li derê kolikê, li rasta Evdurehmanê Hirarşî û Weysiyê gundiyê xwe hatibû. Her du jî keçelbûn, ji germa kefiyên xwe avêtibûn û xwêhdana di eniya wan de dihat xar dibin elenda stêran de diteyîsî. Cilnivînên xwe yên çar tilî toz li ser wan stûr bûyîn rast kirin û xwe dirêjkir. Ji hinga hatîn wî warî ve hema bibêje toxtek xew nekiribû û di cêh de nivist.

Feqe li gundbû. Li pêşya xaniyek du olî, li raser bêrmek girovera mezin û derdora wê bi kevirên necarîndî hatî parastin sekinîbû. Her du oliyên xaniyê di nav hewşek mezin de, bi dîwarên kursiyên spî hatîbûn çêkirin û li pêşya her kuleka mezin û aqidî berkulekek girover û mezin derdiket. Kulîlkên reng bireng yên li derdora berkulekan dadiketin jêr, şaneşîn xemilandibûn. Di nav hewşa dîmenê baxçeyê buhûştê ratêxist ber çavan de, rêze darên gulwas, sêv, mijmijk û bi dehan coreyên darên fikî milê xwe danbûn hev. Û Feqe hew dît, fermandar Karker ji wê ve hat û ew himbêzkir. Destek şal û şapikê kixmeyî liber Fermandarê zirav û bilindbû. Pêlavek ti caran nedîtî di lingan de bû û dibêjîqey temenê wî kêmek mezintir bibû. Dapên spî beyîbûn pora wî ya reng genim ema, tiştek ji sphîtahiya xwe wunda nekiribû û malîvanê ji eşqa dînbûyî, Fermandarê xwe bi deriyê mezin yê hewşê re vexwend hundir. Bi hêlwestek zirav û kubar Farmandar, daxwaza hevalê xwe redkir û got;

"Ez hatime serdana gundê we. Dixwazim tu min kêmekî li nav gund bigerînî."

Her du şoreşgeran milê xwe dan hev û bi rêya ji ferşên kuçên mezin hatî reqifandin re meşîn.  Xemla rêya her du aliyên wê bimilikên kuçên bi hostatiyek zirav hatîn rêzkirin û dîsa li her du kenaran, binavberên ne zêde darên gulwas, sêv û hilûyan hatîn çandin Fermandar şaqis hiştibû. Bigavên giran dimeşîn û Başûrê bêrma ava wê dibiriqî re derbazbûn. Di nîvê gerangeha di nîvê deştika gund ya bi tosintî hatî xemilandin de sekinîn. Di nîvê gerangeha bi darên cor bicor hatî nixwimadin de û ji bejna daran kifşbû sê çar salîne; giroverek biqasî pêncî mitroyan fireh cêh digirt. Derdora girovera di nîvê gerangehê de, bi darên bejna wan ne bilind  hatibû pêçan. Gerkû demsal Peyîz jî bû tevayê nîvê giroverê bi gul û kulîlkên reng bireng hatibû nixwimandin. Belgizên kulîlkên gerangehê tiştek ji spehîtahiya xwe wunda nekiribûn.

Ji gerangehê veqetan û berê xwe dan xaniyê ji her rewşa wî kifşe navenda saziyekî ye. Li ser lewheya dep ya li raser deriyê mezin û aqidî "Navenda Hêza Xweparastina Şehît Ferhan" dinivîsand. Li derê navendê ji fermandartiya hêza xweparastinê Merwan, Serbest û Baran ew pêşwazî kiribûn. Piştî çavek li eywana konferansê, mezela cebilxaneyê û ya fermandartiyê gerandin, bi ber Akademiya re bûrîn. Komek keç û xortê cilên kurdî li ber wan û xwedê dizane gotûbêjek dijwar dikin, li derê akademiyêbûn. Li tenişta Akademiyê Mejlîs û li rex mejlîsê jî Pirtûxaneya gund cêh digirt.

Hemî xanî û navendên saziyên gund, bi baxçeyên bi darên fikî hatîn xemilandin ji hev vediqetandin. Lê, tenê ji derve ve çavek avêtin mejlîs û pirtûkxaneyê û li derê bîra Egîdê Mîrza sekinîn. Bîrek kevinbû û piştî ji nû ve gund hatî avakirin wekû asarek kevin destkarî lê nekiribûn. Ema, kêmekî hatibû restorekirin. Avek wekî hêstirên çavan û dinanan tarîne ji bîrê vexwarin û di nav rêze xaniyên hemî du olî û hewşên mezin li pêşya wan re derbazbûn û hewaketin ser Girkê Navê.

Li Rojhilatê gund, girikek ne bilind û serbixwe hebû û gundiyan wekû "girkê Navê" binav dikirin. Li ser nîvê girik biqasî du kulavan rastikek hebû û li derdora rastikê çend kursiyên dirêj hatibûn rêzkirin. Fermandar, jipiya sekinî û di jor de li gund nêrî.

Li sê aliyên pehnavê, xaniyên du olî û bihewşên mezinên tijî darên fikî û sewze hatîn nixwimandin radiwestan. Hemî xaniyên gundê biqasî heştî, not malan bi kuçên şehkirî hatibûn çêkirin û bi berkulek û bi berbankbûn. Bêrma girover, di nîvê gund de wekî heyva çardeh şevî dibiriqî. Li milê Başûr gerangeh hebû û pişta gerangehê deştikek valebû. Li teniştа Rojavayê valetiyê du dibistanan cêh digrtin û zarokên rû gewr li derdora dibistanan dileyîztin. Tûyek mezina qurm xwehr, li ser zerîtiya di nîvê deştê de wekî qanek kesk sekinîbû û li ser xwehrahiya qurm, sê xezalan dîq li dibistanan dinêrîn. Li aliyê Bakur û cihê boşahiya malan cêh digirt, çar darên bindeqan serê xwe dabûn hev û ber bi ezmanan ve bilind dibûn. Ji bindeqan û pêve, rêza darên sincî mal û rêya qîr ji hev vediqetandin.

Li sê aliyên gundê di pehnavek çal de hatî avakirin, pesarên çiyan bilind dibûn. Tevayê pesaran jêr ber bi jor ve bimeyîl bilind dibûn rezbûn. Leftik û bênikên rezên wekî dirînceyan li ser pişta hev bilind dibîn, ji darên fîkî ne dixwiyan. Di nîvê her rezî de mehserekî cêh digirt. Ji derveyî rezan û li tevayê derdora gund, darên fistaqan milê xwe dabûn hev û çeqilên wan di bin wîşiyên zerên zêrî de xwîs bibûn. Di dola ber bi Başûr û ber bi Bakur ve ji gund vediqeta de kuzên mezin yên garan û keriyên mih û bizinan dixwiyan. Li nêzîkê wan kuzan, elemyonên banên dezgahên sabûn, şîr, fistaq û divs

pêktinin; dibin tîrojên roja peyîzê de diteyîsîn. Ji qontara sumha li ser girê Rojhilatê gund wekî kêlekî disekine, sulavek piçûk diherikî û li tenişta sûlavê embara avê bi ser gund diket.

Fermandar xwest, sûlavê ji nêzîk ve bibîne û bi pişt re herin mala Feqe. Bi rêya ji ferşan hatî reqifandin û li her du rexan dar ji rêzê ve hatîn çandin re xwe berdan û daketin ser sûlavê. Li binê zîzelaqa li teniştа sûlavê komek zerî esmer rûniştibûn û bi awrên xweşvîn li mêhvanê xerîb dinêrîn. Çûkek zelêle, ji ser zîzelaqê firî, bi perên xwe yên rengîn li raser malan dewrek da xwe û li ser bindeqa li ser rêya derketina gund danî. Dema awrên mêhvan çûka rengîn dişopand Feqe, kabên xwe danîbûn erdê û hewldida devê xwe bêxe nav ava zelal û cemidî de. Hê devê wî nû gihatibû avê bi dengê Weysî yê leq ji xew hilciniqî!

Di nav hesîrên li ser pişta kolika di bin dijwartiya bayê reş de zîqe zîqa wê re, zeraqên dijwar li çavên xilmaş yên Feqe didan. Hewlda rabe ema, Weysî yê li raser serê wî sekinî bi îşeratên destan xwest xwe tevnede. Dema li cihê îşareta destê Weysî nîşan dide nêrî, li ber erzena wî ya çar tiliyan ax li ser bilind bûyî dûpiştikek reş û mezin disekinî. Xwe tevbida dûpiştikê bi qirika wî ve bida! Feqe xwe tevneda û Weysî bişivikê bi şêwazê şûrê şervanekî ji hewa ve, ji teniştê ve li dûpiştik da û beyand erdê. Kelaşê wî danî ser her du kelaxên li erdê û got;

“Xewa bindestiyê ketiye di çavên te de. Ji vê sibhê ve eve min şeş dupiştik li ser bejna te ya dilxwede şepal kuştîn!”

Dema hewldida ji nav toza xubar rabe, hê jî wê xendeya şadîtiya xewnê hundirê çavên Feqe ne berdabûn.

***

Hê nîv meha nûwarên Qereçox ne qedabû. Sibeh zûbû û hê sertîrên rojê singa ezmanan xet nedabûn. Çend jinên Xoxa Gundremoyî pêşvantiya wan dike ji bû pêwîstiyên xwe yên destavê, di nav çadirên bi bin biryargiha Riza re hawaketin. Di nav zarokên ji ber germahî, pûşî û dupûştkan nikarin razên û li derê biryargehê xar dileyîzin de, zilamek mezin dileyîst. Zarok, heman wekî hemsalên xwe nêzîkê zilamê pişt tewandî û di nav tozê de hewldide xara xwe bavêje xara li erdê dibûn. Zarokekî bi dengek sîtem barkirî ji Zelamê lingek yê xwe dayî paş û yêk dayî pêş û awrên xwe li xara erdê korkirîn re got;

“Hema bixwidê tu hîla dikî.”

Piştî pîrek nêzîktîr bûn, Eyşê ya di nav koma jinan de herî ciwan, bi hêlwestek şaqis mayî got;

“Keçê pîrekno, ev ne hevalê Riza ye?”

Bi gotina Eyşê re koma pîrekan di cihê xwe de cemidî û bibalkêştir li zelamê êdî rep sekinî nêrîn. Riza jî pîrek ferqkiribûn. Bidemek beşaş hat, roj başek li koma jinan da û yêk biyêk çû destê wan. Dema Riza diçû destê jina dawî, zarokekî destê xwe yê bitoz hişk li rana da û got,

"Hevalê Riza dora teye."

Endamê komîteya navend ya PKK'ê û rêvebirê herî jor yê karwanê Mexmûr, destê bitoz yê zarok ji şalwarê xwe vekir û bihêlwestek zaroktî got;

"Hûn hîlan li min dikin. Êdî ez bi we re naleyizim."

Piştî xweşbaşê Riza, ji koma pîrekan re got;

"Hûn ewqas rê diçin û ji wê ve vale dizivirin. Heke her roj hûn kuçekî bînin, di deh rojan de dibe deh kuç û bi wan kuçan hûn dikarin aliyek ya nalyona xwe dîwar bikin."

Hê nû dawî li sohbeta di navbera Riza û koma jinan de hatibû. Zarokek bibez ji dikana Xwînrêjê Lodî derket, hat û kîsikê tijî çeqolat raberî Riza kir. Riza koma jinan nîşankir û got;

"Hinan bidin dayîkan û yên mayîn jî li xwe behr bikin" û destên xwe li pişt girêdan û di jor de daket nav malan.

Di eksena xwe de vegera cîhanê her dewam dikir û belkî jî qet haya wê ji êş û elema koçberên di nav toz û dûpiştikên Mexmûr de tinebû. Rojan giran giran hev tajotin û kit-mitên malbatên vînqelsên rêka çûkê peyda dikirin, di bin têkeliya hêstên şerm û xofê de ji dizî ve direvîn. Xofa fihêtiyê ewqas bibandorbû piranî malbatên direvîn, yêk an jî du zarokên xwe licêh jibîr dikirin. Li wêdê jî di rastiya rayedarên Êraqê û Dewletên Yêkbûyî de; Turk û PDK li ser hukimbûn û ji bû kesekî, malbatekî ji wargehê birevînin hewlek ne asayî dimezaxtin. Rêvebertiya wargehê rewşa awerte ayan kiribû û bê agahiya asayîşê çûkekî nikarî ji wargehê derbikeve. Etlahî biruhê rêvebertiya asayîşê ne diket. Xeyriyê Mijiniyê qon xwehr, Kamilê simbêl mezinê Silopiyî, Merwanê Dudêrî, Fedîla Mijinî û Robarê Spîndarokî bigomana yên birevin bejin û gewdeyê her kesî zirav zirav di moxila çavên xwe re derbaz dikirin.

Karwanê wan mirovên serhişk û asê li duryana berfa sohr asê mabû. Hemî duryanên li dûv xwe hiştîn dijwar û yemanbûn. Ema ew duryan ji hemiyan yemantir û bixoftirbû. Li duryanên din dijmin, dagirker û xayînbûn. Lê li wê duryanê, dijminê sereke ne ji toxmê mirov, xweza bixwebû. Li hember berfa sohr, bayê reş û har, dûpiştik û maran, germahiya dojehî, bê avî û birçîbûyînê û di ser de jî serdest û xayînan; bi zarok û nekaran ve li berxwedayîn û bi şerefa xwe ve li ser lingan mayîn zehmetbû. Ji zehmetiyê jî wêdetir, hema bibêje ne gengazbû.

Ema bêjeya 'gengaztî' ji bû her mirovî heman wate ne

hildigirt. Belkî jî dînemergtî, ji rêzê derketinbû! Bi zêhniyeta "desthilanîn pîroze" di her mercan de li hember zalim û zordaran serî rakirinbû. Wekî perperîstankê, di tarîtiya zilomat de xwe şewitandinbû! Di wê bêhna zeravên xweşmêr û mêrxasan ji tirsa di bizdan de, bê tirs tifkirina rûyê mirinêbû. Dînemergtî, di mercên herkes wekû ne gengaz dibîne de, ji yên wekû gengaz pêşwazî dikin re dihat gotin. Rêzîtî, li patika yê li pêşya xwe meyzandin, bê şik pêl dewsên wî kirin kesîtiyek nexweş û biqedapbû! Heke ne wusa bûya, dînemerg û aqilmergên çawa ji hev hatibûna naskirin?

Di serî de rêvebertî bê goman, tu kes ji warê nû ne razîbû. Ema, giraniya gel di ferqa leyîstokên hatîn leyîstin de bû û ji bû leyîstikvanên dijber biser nekevin her berdêl dabûn ber çavan. Ji bilî qismek piçûk yên xwe dipesartin û digotin, "di bin ti şertan de em li vî warî namînin" li gor derfetên di dest de koçberên Qereçox bi hewarî xwe bicêh dikirin. Bi zexta şertên jiyanê zû çavnasî derdor bibûn. Bi tirimpêlên Mexmûriyên xwecih, ji ber ava Dîcle dar û çilo dikişandin û ji xwe re kolikên mîranî avadikirin. Ne tenê ji bû malbata xwe, kolika herî mezin û navdar ji bû saziya xwe çêdikirin.

Semt û tax hatibûn kifşkirin û cihê saziyan jî. Hêza xweparastinê cihê xwe yê li pişta germavê ji asayîşê re hiştibû û li qontara banî ya sînorê semta yêk û du ji hev vediqetê ji xwe re kolikek mezin û qayîm çêkiribû. Sazûmaniya xwe ya hundir tekûz kiribû û jixwe ji destpêkê û pêve etlahî biruhê wan ne ketibû. Di gir û çeperên fermandar Karker keşîfkirîn de şev û roj nobedarbûn. Ne tenê di erkê xweparastinê, rêkûpêktiya navxweyî de jî erk digrtin û bi erkdarên navxweyî re alîkarî dikirin. Saziya herî boş, zindî û bitevgerê, saziya xweparastinêbû.

Asayîş jî di întîşarê de bû. Barê giran li ser pişta wan bû. Zû xwe birêkûpêk kiribûn û dewriyên xwe li çar dorên wargehê belavkiribûn. Li ser rêya diçû bajarê Mexmûr derbendek danîbûn û roj bîst û çar demjimar çûyîn hatin venêrîn dikirin. Bê agahiya wan tu kes ji wargehê ne derdiket û nikarî derbikeve. Li pişta çadira navendê kavlek ne ji çeperekî mezintir avakiribûn û banê kavlê biqasî bejna zelamekî bilind, bi betaniyek nixwimandibûn. Muhemet Nûriyê li warê mayî şer derxistî, wekû zîndaniyê yêkemîn di wî kavlî de girtîbû.

Şaredariyê, li binê semta du çadira xwe vedabû û hazirtiya avakirina kolikekî jî dikir. Di rewşa heyî de barê herî giran li ser milê wanbû û etlahî biruhê endamên wê ne diket. Du endamên wê, bi nîvê şevê re diçûn aşê cemedê. Heta sibehî di dorê de disekinîn, du sed qalibê cemedê digirtin û dihatin. Cemeda dabaşa gotinê wekhev li her çar kolikên semtan belav dikirin. Dîsa endamên şaredariyê yên li kolikan hatîn erkdar kirin, cemeda mijara gotinê

wekû çaryêk dikirin qet û li kesên ji êvarî ve di rêzê de belav dikirin. Çaryêkek ya qalibê cemedê bi dused û pêncî dînarê sixte difirotin. Çaryêkên dused qaliban jî têra hemî wargehê ne dikirin. Yên di rêzê de û cemed ne gihatî wan, bi awrên dijwar li belavkeran dinêrîn û qiyamet rast dikirin. Jixwe derfetên herkesî yên kirînê jî tinebûn. Wekî din, peydakirin û belavkirina avê û pir xizmetên din bi hêviya şarevaniyê ve bû.

Destpêka hefteya çaremîn ya warê nûbû. Zû sibeha rojek kêm babû. Saziya UNHCR'a Dewletên Yêkbûyî, dîsa ya layîqê xwe kiribû û tirimpêlek qet û metên çadiran şev avêtibûn pêşya şaredariyê û çûbûn. Çadirên ji koçberên qereçox re anîn bermayiyên kûjan qampêbûn, di binê kûjan embarê de rizîbûn ne dihat zanîn ema, çadirên kevin û peritîbûn. Di nav wan de çendekê saxlem heyîn jî di nav herî sohrkê de reng guhertibûn. Jixwe pir kêmbûn û hêjmara wan bi bin sedê re bû.

Ji rihspî û berhemendên wargehê komîsyonek ya belavkirina çadiran hatibû hilbijartin û Mele Mihyedînê Bilehî, xwe wekû xwezayî berpirsê komîsyonê dihesiband. Qelebalixa Meleyê gotinsar, bi ser mirovên li dora şkêra çadiran kombuyîn diket û ya star! Çadir kêmbûn û komîsyona dabaşa gotinê ya çawa bi awayek behremend belav bike, hizrek ya tu kesî tinebû. Ji her serî dengek derdiket û dîsa dihatin xala destpêkê. Ji sedan heştiyê gel bê çadirbûn û kêyê şêst-heftî çadirên kevin û piraniya wan qetayî bigre û kêyê lixwe bide ji nav hev nedihat derxistin. Biryara çadir û serpûşkên wan cuda werin belavkirin girtibûn û bê goman ew jî ne çarebû. Ema, dest bi belavkirinê kiribûn û bipêre jî dengê hin kesên neqayîl jî bilind bibû.

Komîsyona belavker, çadirek bê serpûşk dabû Aboyê Salihê Şero yê Hîlalî û Mela yê têr qelebalix bi awayek dijwar li dijî wê biryarê derdiket. Abo, dixwest çadira behra wî ketî rake û bibe. Lê Mele Mihyedîn, aliyê din yê çadirê bernedida û gotinên sar di ser zelamê bê merîs de dibarandin. Abo yê xwezayê ew bi kelaşek gir, pehn û bê pergal ji gerekstêrka me re bexşandî, hêza xwe ya kelaşî jî bikaranî, da çadirê û Mela di ser çadirê de devikî da erdê. Û biketina zelamê yêxtiyar re tîr ji kevan derket.

Ihsoyê Sêgirkî, zavayê Mele Mihyedîn bû. Piştî xwezûrê ne tebitî devikî li erdê ket, duvê kupalê xwe yê bisikeh hilda jor û êrîşkir Abo yê hê ne gihati sêhê ema, mûyek por bi sera ve nemayî. Abo yê destek qirêj li ser çermê serê keçel stûr bûyî, destek cilê peritî kelaşê pehn û gir dinixwimane, bedena qemîsê bê qumçe mayî heta bi ûrê bê pirç rût û Ihso gihatin hev! Wekî mêşek li singa latekî bikeve, Ihso li singa Abo ket û di şûn de beyî. Şaşika kelekî ya benîzavayê rû qeşartî, ji serî beyî û serê keçelê hê bi tîrojên dijwar

re hevnas nebûyî li holê bê star ma.

Heta hingê, herkesî berevantiya her du şerkerên keçel û di encama rê şaşkirinekî de bi wêdê re derketîn dikirin. Ema, rewşa zavê di nav pencên heywanî yên Abo de ne baş dixwiya. Ihso, ket û haxta biketa. Zavayê rû tirş, di nav pencên dehbeyî de dihat stirhan û halê wî ji yên helewvanên Sêrtê kambaxtirbi. Û biteybet Pîranî, Feqanên li derdor biser Zavê re tevlî şer bibûn! Li ser serê zilamê dehbeyî kefikên kupalan ji hewa ve li hev diketin û dengê birûskan ji wan vedidan. Piştî biteybet Pîranî û Feqan tevlî şer bûn, yêk ji pêşkêş û rihspiyên Hîlaliyan Eliyê Se'edo, qêrek da gundiyên xwe û got;

"Ma heta kengê Ihsoyê Sêgirkî yê zulmê li me bike? Ma di geliyê Goyan de welatparêzek heye Ihso bi navê dewleta Turk ne gihavtî? Li wî alî çeteyê turkan bû û binavê wan em dihingavtin, dixwaze li vêdê jî binavê PKK'ê li me bide" nav li Hîlaliyan da û dewamkir zilamê yêxtiyar;

"De li wan bidin û yêkî jipiya nehêlin!"

Binavlêdana Eliyê Se'edo re biteybet bavikê Kohnan, Hîlalî daketibûn meydana şer. Bi rabûna Hîlaliyan re Feqayên bi pişt re tevlî şer bûyîn xwe vekişandibûn û Hîlaliyan Ihso didan dest hev. Ne tenê heyfa Abo; dixwestin heyfa zulma li geliyê Goyan kirî jî bi devê benîzava re derxînin. Li tenişta Bakur ya cihê belavkirina çadiran, sikeyên goyîkî ji hewa ve reqsa Torikî dikirin. Sike ji hewa ve li hev diketin û şerker û berevan tevlîhev bibûn. Piştî kêmekî berevanan Ihso yê Sêgirkiyê ser şkestî û wekî nîriya di nav avê de dilerize ji nav lepên Hîlaliyan derxistibûn. Wekî lûlika misîn ji serê keçel yê zilamê sohr û rûsar xwîn diherikî. Cemedaniya her tim serê wî dinixwimand û bişubheta gemiya Çêlik girê dida, di navlepên Hîlaliyan de digevizî. Serê sohr û keçel bê star li holê mabû. Hê jî Ihso, xwe di nav lepên berevanan de dicircirand ema, ji hemî halê wî kifşbû ji derb êxistibûn.

Hê şer ne qedabû. Şerkerên xwe ji nav lepên berevanan difelitandin radihiştin du kuçan û dibezîn. Dubare berevanan hewl didan wan bigirn û li dûv hev dibûn gewlaz. Evdilayê dîn, ji aliyê semta yêk ve hat û ket di nav koma mirovên çadirxwaz de. Asar ji sîsîtiya kevin ya zelamê dîn ne mabû û her derê wî bi tozek stûr hatibû dûtin. Evdilayê di xeybê de, ne qerebalixa çadirxwazan dibihîst û ne jî şeqe, reqa sikeyan. Berê wî ji hewa ve bû û bi peyvên ne dihatin fêhmkirin gazind ji Xwidayê xwe kifş nekirî dikirin. Tam dema ji nav qerebalixa şerker û berevanan derdiket; wekî ji xewnek tehl hişyar bibe veciniqî û sekinî. Li şerkerên êdî sistbûne û di nav lepên berevanan de xwe dicircirînin nêrî got;

"De vêca were û li van mejîkeşkan binêre! Xelkê welatê wan

biriye û ew li vêdê ji bû çadirek qetayî şerê hev dikin!"

Tilsimek xemdar lêhvên wî yên şeqitî pêçan, dîsa serê xwe hilda jor û bikerb dewamkir;

"Bi wî kilamê qedîm, min di xeybê de dîtiye, Apo Pêxembere" û zilamê dîn, an jî dînan ew dîn kiriye nayê zanîn, rêya xwe ajot û çû.

Biqewlê Evdilayê dîn, Feqanî toxmek ecêpbû. Ji geliyê Goyan bigre heta bi Şirnex, li her gundî çend malên xwe wekû 'Feqan' binav dikirin hebûn û têkilî û hevgirtina wan biser ya eşîrî re bû. Feqanên xwe wekû "mal mela" pênase dikirin, di her şertî de pişta hev ne berdidan û wekû çîna jor ya aqilmendên herêmê dihatin hesibandin. Ew qismê dikarkirî, ne gundiyên gund yên esîl, ji derve hatine herêmê.

Tam dema şerê Feqan û Hîlaliyan kêmekî sist bûyî du kevir di destan de Tanzêr, bi rêya ji şaredariyê diçû semta du ve dibezî û dijûn dikirin komîteyan. Du, sê zelaman neqayîlê sist û pehn dişopandin û dilxwede ji bû kesî derb nede pêşiya wî digirtin. Zelamê zik derfik jî dijûnên pîs dikirin û hewl dida kuçên di destê xwe de li erkdarên şaredariyê wer bike. Ema, ji belavkerên çadiran tu kesî Tanzêr mucid nedigirt û baskî wî ve jî ne dinêrîn.

Çadira ji Zîna Hevlerî re ketî, li ser milê du ciwanan û bi ber Tanzêr re derbazkirin. Ya star! Wexte Tanzêr dîn bibe. Kevirên di destên xwe de li hev didan û hin dijûn dikirin kuç pê ji ezmanan dihatin xar. Xwe di nav lepên Mihyedînê spêrtî û Se'dînê Aloşî de dicircirand û berevanên di bin simbêlên xwe de dibeşişin hê bêhtir xwe bi gewdeyê wî yê sist û xav ve dişidandin. Tam dema êdî berevan ji girtina zelamê zik mezin kerixîn û yê berdabûna, Riza gihat hindama wan. Bi çavpêketina Riza re, destên Tanzêr daketin û kevirên di destên xwe de jî ji dizî ve berdan erdê. Rizayê ji serî ve temaşeyî şerê Tanzêr dikir, li hindama wî sekinî. Bi dengek henek û mucid têkelihev got;

"Xêre Tanzêr, dîsa tu mîrdadiyê dikî?"

Zelamê xav, qelew û di wê gav û bêhnê de, li wêdê ne çaverêyî Riza şaş û maşo bû û got;

"Hevalê Riza, ez vê komîsyonê rexne dikim û qebûl nakim. Partiyê çend kesên wekî Mele Mihyedînokê Bilehî, Şefîqokê serhejênok û Mehmûdokê çav şeqitî kirine mezinên me û neheqiyê dikin."

"Keremke rexneya xwe bêje hevalê Tanzêr? Erkdaran çi neheqî kirine, neheqî li kê kirine keremke guhdar dikim."

Li hember hêlwesta safî ya rêvebirê herî bilind yê wargehê, Tanzêr şewilîbû û gotin di deva de xira bibû. Di wan mercên awerte de hêlwesta pûç û beredayî ya Tanzêr, Riza pir aciz kîribû. Ji hemî rewşa rêvebirê bêhnteng kifş dibû kû ji bû zeleyekî ne kişîne binê

guhê zelamê navser xwe bi zorê zeft dikir. Tanzêrê aciziya rêvebir ya di wê astê de nû ferqkirî, qon û qono texûpaş dibû. Tam dema herkes difikirî tîr ji kevan derket, rêvebirê serhatî destên xwe li pişt xwe girêdan û got;

"Çadira te heye hevalê Tanzêr?"

"Belê heye ema, peritiye."

"Ji sedê notê gelê vê wargehê qetek çadira wan ya peritî jî nîne, tu vê jî dizanî?"

"Belê heval."

"Nîha ji ber çavên min biqeşite û zû here mala xwe. Ez te sê rojan li ser van rêyan nebînîm! Erê, te fêhmkir Tanzêr?"

Tanzêrê ti carî ewqas tengehal nebûyî, paş paşkî revî û bibere jî got;

"Bila heval, ser çavan heval" û ji çavan wundabû Tanzêrê Deştedarayî.

Evdilkerimê Egîdê Se'edo yê Hîlalî, zilamek dirêj û temenê wî hê bin sêhê re bû. Çadirek bê serpûşk jê re ketibû û ya star sivorî li ser simbêlên wî dileyîstin! Ew, hevjîn û zarokên xwe li dora çadirê kom bibûn û bişadîtiyek bê pîvan çadira xwe vedidan. Şaditiya malbatê ya ji wê çadira kevin û hê jî wekî bizinek pinat qanê heriyê bipêve jêderbiyî, hêjayî dîtinêbû.

Zelamê kulbeîş, êlekê xwe bi serê stûnek ya nû daçikandî ve kiribû. Êlekê xwerayî û dezî ji dawa wî ristîn li ber baya nû rabûyî liba dibû. Ji nişkan ve wekî teyrek baz dade sûsikekî, bagera ne di hesap de êlêk hawa êxist û bir. Baye reşê ji Bakur ve diherikî; êlek ji nîvê semta sê bi ser semta du re wekî fîşekê tehf dida. Her kû diçû êlek bilindtir dibû û wekî teyrê Laçîn bazkên wî li peravê ezmanan dizivirîn. Li raser saziya hêza xweparastinê ya li milê banî ya semta yêk; bayê êlek li hev zivirand û diravên di berîkê de wekî kerengperan ji hewa ve li navguhê hev dixistin.

Evdilkerîm, bi malbata xwe ve û hemî kesên temaşe dikirin û biteybet zarok; her kes li diravên ji hewa ve dizivirin û kite-mitên wan li erdê diketin temaşe dikrin û ber bi êlekê biqîmet ve dibezîn.

### Riza jî Girî

Êvara roja dawî ya meha Hezîranê bû. Bayî bi hemî dijwartiya xwe diherikî di nav çadir û kolikên wargehê de vedigera bagerê û ya star; stûnên çadiran hildirkirin û li rasar wargehê çadir û hesîr li navguhê hev dixistin. Bablîsokên bêtebat wekî hespên erebî milên xwe dabûn hev û bişubheta dagirkerên talanker çadir û kolik ji holê radikirin, cihê wan jî dimaliştin û derbaz dibûn. Kîsik, hêsîr, lalîk û tiştên sivikên bi tehfdana bablîsokan hawa diketin ezmanan, wekî

teyrên dubirak milên xwe dabûn hev û difirîn. Teqereqa li hevketina dar û firaxên li ezmanan, dengê stirhên nîriyên guhnêr di hişan de zindî dikirin.

Biqewlê Mexmûriyan, Bayê reş rabibû. Bi toza sohra ji berîstana ereban radikir, gerestêrka navê wê cîhan ji zû ve dabelandibû û qiyameta reş rakiribû. Girên toza hûr û gewr ya di nav wargehê de pêl dayî jî radikir jor û tevlî toza berîstanê dikir. Bi hevgihandina her du coreyên tozê re ewrek têkelî gewrê sohrî ve, wekî konek reşê erebî daketibû ser nû warên Qereçox. Hê dereng êvarbû ema, çavan çav ne difitrandin. Dayîkên starên xwe yên nû jî teslîmê bagerê kirîn zarokên xwe di bin dawa xwe de kom kiribûn û xwe bi dîwarên kavlên çadiran ve şidandibûn. Rewşa malbatên hê strên xwe teslîmê pêlên bahozê nekirîn, ji yên teslîm kirîn kambaxtirbû. Bagera har, çadir û xîbetên liberxwedidan  ji bin ve dihejandin û sîqesîq bi ser sing û şerîtên wan têxistin. Hûr û gir tevayê endamên malbatên hê çadirên xwe jidest nedayîn, xwe bi stûn û şerîtên ve dalaqandibûn û ji bû bê star nemînin hewlek mirovatiyê ti caran şahidîtiya wê nekirîn dimezaxtin.

Dibêjin ya; şeva tarî ji êvar ve kifşe. Hê zerik rojbû ema, bayê reş ewrek reşê bê merîs ji berîstanê rakiribû û radabû ser nû warên qontara Qereçox. Bi qewlên Mexmûriyên xwecih, du core bayên dijwar li wê kambaxê radibûn. Ya ji Bakur ve dihat, dijwartiya wê pir zêde, mehê çend caran dubare dibû û her car sê, çar rojan tajot;  bayê Reşbû. Ya ji Başûr ve dihat û germahiya wê pir zêde jî bayê Harbû. Bi îhtîmalek pir mezin ya wê şeva qedapdar rabûyî û ew huner dikir, hevgihandina her du bayanbû. Hem pir germ û hem jî pir dijwarbû. Ya hê xirabtir, dema bayê Har radibû wekî zerzûla kulhan zerzûla dûpiştikan jî radibû û radida nav malan.

Ji hinga karwanê koçberan li wî warî danî û pêve jin, mêr û biteybet jî zarokan bê navber operasyon li ser malbatên dûpiştikan dikirin û ziyanên mezin gihandibûn wan. Giraniya demên rojê, her zarokekî misînek av dibir û derdiket nêçîra dupiştikan. Her kona didîtin peşkek av berdidan di konê de û dupiştikan xwe tavêtin ji der ve. Sedem çiye nayê zanîn ema dema av digihat wan lawirên piçûk û sehwdar, revde bi revde ji kunê derdiketin û nêçîrvanên derketîn seydê jî fatîha wan dixwendin. Hin kesan qewanozên cam bi xwe re dibirin, dûpiştikên girtîn têxistin di wan qewanozan de û pir caran di operasyona yêk, du demjimarî de qewanozên xwe tijî dûpiştikên sax dikirin. Bi hêlwesta seydvanên ecemî qewanozên tijî dupiştkên sax di destên wan de û bi şêwazek qure di nav malan de dimeşîn.

Kelaşê zaroka yêk rojî ya Îsmaîlê Marûfî li ser destan û berê wan li goristana Şehît Nûjîn, komek mirov di derê mala Şerîfê Çelî

de berjêrbûn. Maka zaroka mirî, Xizêma demek dirêje nexweş û bi zorê jipiya disekine bi arîkariya Beyaza bûka Mele Tevfîq û Helîma hevjîna Eshedê Çelî li pey cenaze dixirikî. Bayê dijwar diket di bin dawa jinana de, wekî pereşûtê diwerimandin û li hev dizivirandin. Beriya êlekên zelaman ji hev dibir paş û tîkên wan li navguhê kesên li teniştê didan. Bayê bagerî bi dora koma mirovên li pey cinaze re dizivirî, toza hûra wekî pêlên deryayê li erdê belav bûyî radikir û dieband di dev, çav û konikên pozên wan de.

Komika mirovên bi cenaze re, bi çi kul û halî xwe gihandibûn girikê goristanê. Bi tevrik û bêrikan li rex tirba Nûjînê çala tirba duyemîn jî kolan û kelaşê zaroka yêk rojî spartin axê.

Xelîlê hevjînê Zînê jî bi cenazeyê zaroka Xîzêmê re çûbû goristanê. Di vegerê de Salehê hemgundê wan û mala xwe li rexa goristanê danî, Xelîl vexwend şîvê. Mala saleh, li nêzîkê goristanê, li semta yêkbû û ya Xelîl li semta du bû. Xelîl bi hêlwestek têr fikar got;

“Hevalê Saleh, ez bitirsim ba çadira me bavêje. Destûra we hebe ez herim mal baştire?”

Salehê keçel û destek toz li ser çermê serê wî yê qemitî stûr bûyî, milê gundiyê xwe girt, kişand û bideng kenî.

“Ji Xelîlê me we ye, ew wê malê birêve dibe û wan zarokan xweyî dike. Kuro qey cihê Zînê lêbe tu bihesabî” got û zelamê ciwan ber bi kolika xwe ve tehf da.

“Ji hinga em hatîn vêdê ve Zînê kêmak ne rihete û hema dibêje, “serê min têşê û bê hale.”

“Ser êşandin xêra xwedêye! Ma kê ji me rihete. Bixwedê nîvê me ji vê qir û qiyametê bifelitin em razîne.”

Ji zû ve reş ketibû erdê. Bayê har harîtiya xwe dikir û ya ji ber difelitî jî bayê reş timam dikir. Her tişta diket pêşiya wan dimaliştin, têxistin qafo û li ber xwe dibirin. Kon di ser hev de diqulibandin û hesîrên kolikan bê per li ezmanan difirandin. Zîna Hevlerî, bi stûna paş ya çadirê, Newroz û Peldayê jî bi destên xweyên piçûk xwe bi stûna pêş ve daleqandibûn. Bagera ji zû ve vegerayî bahozê çadir wekî çincîrkê dihejand, radikir jor û dubare li erdê dida. Her du zarokên ji jana jiyanê bê hay, neyîntiya heyî li wan wekî galtan dihat û bidengê bilind dikenîn. Jixwe hêza wan ya çadirê zeft bikin tinebû û sebebê girtina wan leyîstokbû.

Ji nişkan ve xofek dilqelqîn hinavê dayîka esmer dagirt û dilê wê ji asayî pir zêdetir guvaşt. Jana nû bipêre hevnas bûyî, dunya li dorê zivirand û perdeyek reşa stûr êxist di navbera çawên wê û ronahiya zerhimî de. Şewişî ema, ne ket. Dikeya bager çadirê radike û zarokên wê jî pêve dibe liber çavan zindî bibû. Wekî ji xewnek xofdar vecinîqe, stûna di destên xwe de berda û bi ber dergûşa Şîrîna şeş mehên xwe nû dagirtî re bûrî. Her du zarokên lingên xwe

ji erdê birîn, bi stûnê ve dihejên û bi dengê bilind dikenin bilez ji stûnê vekirin û ber singa xwe ve şidandin.

Di carekî de fikrê, zarokan bigre û bireve ji derve wekî birûskê di mejî yê Zînê de vedabû. Mixê wê ew ramana ne bimantiq ne pejirand û zû kir der. Xwest zarokan bigre û here mala Eyşa cîran. Ema "hizira, çadira Eyşê ji ya wê kambaxtire û xwedê dizane heta hingê di bin dijwartiya pêlên bayê har de çîvar çîvar bûye" nehişt tevger bike. Dema Zîna li hember ti êrîşên beşerî ewqas neketî di tengî de, fikek ya revê çêdikir û gelik xira dikirin bayê fîze fîza wî dengê topên dagirkeran derbaz dikir ketibû di bin mûşembeya di binê çadirê de. Rexên mûşembê û binê çadirê bi hev ve asêkirîbûn. Bagera ketî di bin nalyona binê çadirê de, wekî pimpimokekî çadir hilda jor. Fanosa bi stûna devê derî ve daleqandî da erdê, qazyaxa di fanosê de rija û agir pêket! Zînê hewlda nehêle agir gur bibe ema, hewldana wê beytişebû. Çadira ji erdê qutbûyî wekî çincîrkê ji hewa ve diheja. Awrên dayîka bi sê zarokên tifal ve di gokek pêtdar de asê mayî, di nav guriya agirê bi hewarî mezin dibe de xeniqîbûn. Hê jipiyabû û ji bû zarokên xwe ji şewatê rizgar bike kêferatek bê hemta dikir. Lê, çadira wekî gokekî rabûyî jor û di bin pêlên bahoza dijwar de diheje, ne dihişt agir bivemirîne. Bişubheta pêlên oqyanûsê, bagerê mûşembe radikir û li singa çadirê dida. Di dawiyê de dayîka bikêfaret dengeya xwe wundakir û baskî dergûşa Şîrînê ve li erdê ket. Pêla dawî, Newroz û Pelda jî berbi quncikê fanosê ve avêtibûn û pêta agir li ser çadirê ket!

Ya zeravê Zînê jê diqeta qewimîbû. Agir ji quncikê zarok lê mayîn ve pêketibû. Bi hêza bayê mûşembe werimîbû û hema bibêje bi singa çadirê ve şidandibû. Zînê û sê zarokên xwe di qotiya agir de asê mabûn. Ne êdî destên wan digihatin hev û ne jî dikarîn tiştekî bikin.

Hemiyan bi hev re têxist qêr ema, ji dengê bayê wan bi xwe jî dengê hev bizorê dibihîst. Bayê har ketibû di bin çadirê de û çadir ji erdê birîbû. Çadir kiribû qotiyek devgirtî û ji hewa ve dileqand. Zînê û sê zarokên xwe di hundirê wê qotiyê de asê mabûn û wekî xaran li çep û rastê qotiyê diketin. Di navberekî de Zînê hewlda çadir û mûşembê ji hev veke û bi bin keviya çadirê re derbikeve ema, bayê dijwar rê neda û nehişt dengeya xwe avabike. Di nav saniyan de pêtê çadira şimakirî dabelandibû! Pêta bi mitroyan bilind bûyî ne tenê çadir; kolika ji çilo jî dabû ber xwe. Pêta agir vegerabû girek sohr û ber bi ezmanan ve bilind bibû. Dibêjîqey dêwek heft seriyê birîndar rabibû pêdarê. Ya Star! Humên û gumên, qêrîn û nalînek ji pêta agir bilind dibû û xwe li ezmanê heftan dida. Bayê har, stûna agir ji hewa ve li hev badida û ditewnd erdê. Guriya agir, wekî zimanê ejderhayekî erd talîst û dubare radibû jor. Vê carê jî bagerê stûna

pêta badayî diquliband  aliyî din û li navguhê kolik û çadirên li rexê dida.

Mala Peynaz Kawaşî, li pişta mala Zînê bû. Jina navser û di bin pêlên bayê har de bi zorê jipiya disekinî wekû rasthatî derketibû ji der ve.  Bi derketinê re pêta stûna badayî rûyê wê alîst û li erdê da. Peynaza bi awrên tirsdar li stûna agirê di ser de ketî dinêre, tenê têgira; "heware… heware.. gundîno.. mala Zênê şewitîîî...!" ji deva derketibû û vexwimabû. Bi hewara jina ji zû ve ji hîş çûyî re destpêkê tevayê taxê û di nav xulkeyan de tevayê wargehê qulibûbûn derdora çadira Zîna Hevlerî.

Emîn, tiyê Eyşê bû û şelîtên çadira wan û Zînê bi heman singan ve hatibûn girêdan. Destpêkê Emîn gihatbû hewara Zînê. Ema, pêt bibû girek volkanîk û dihîrî. Bihêza bagera dijwar re stûna pêtê dadiket erdê, wekî dêwek heft serî her tiştê kulabên wî jê digirtin didabeland û dubare radibû ezmanan. Pêta wexmek dojehî vedida derdora xwe, destûr ne dida tu kes nêzîk bibe. Heta hingê keviyên çadirê şewitîbûn û di nav guriya agir de Emîn, Zîn didît. Didît ema, nikarî xwe nêzîk bike. Emîn, hem têxist hewar û hem jî bang dikir Zînê. Zînê, bidengek bê xof û asayî got;

"Emîn, zarokan rizgar bike!"

Bigotina wê re Emîn, di bin keviya çadirê re destê xwe avêt û bi milê Zînê re girt. Laşê Zînê helabû û tiliyên wî di goştê laşê wê de çûn xar. Tam dema destê ciwanê li ser kewna xwe gihat Zînê û ji bû bikişîne hemî hêza êxist tevgerê, bayê har guriya agir li dêmê Zînê da û piştikî da erdê. Pêta Zînê dayî erdê, Emîn jî li erdê dabû. Piştî bayê stûna agir quliband aliyê din, ciwanê nîv şewitî rabû ser xwe û heta awaza wî derket kir qêr;

"Hewareee.. Hewareeeee… Hewaree ev mal şewitî" got û êdî kela xwe zevt nekir û bideng girî!

Bidengê Emîn re Rihana Muhemet Xalid, ya di navbera mala wan û Zînê de sê, çar mal heyîn gihatibû ber  çadirê. Keça ciwan, nemerdî nekir û xwe li nav pêta agir da! Zîna bi binê çadirê re bê taqet ketî bi leza bayê da ber singa xwe û ji nav agir derxisti. Jixwe heta hingê agir jî vexwimabû û pêta ji devê wî dêwê sêhrdar dirija daketibû.

Di bin perdeya şeva zilomat de ji her çar aliyên malan mirov ber bi cêhê şewatê ve dibezîn. Şevaqa ji pêta sehwdar vedida li dêmên mirovên xofek bê pênase rûyê wan nixwimandî dida û dojeha di pirtûkên pîroz de dihat dikarkirin derketibû ser rûyê erdê. Koçberên dibêjîqey ji bin hedan nû derketine li derdora çadira dişewite kom bibûn. Pelda ya nû li ser pêkan ketî, di bin awrên şaqis yên bisedan kesî de di nav pêta agir de dimeşî û ber bi koma mirovan ve dihat. Ya hê balkêştir, zarok ne digirî, ne dikir qêr û

bi awrên xofek bê pênase hatîn barkirin li koma mirovên li pêşya xwe dinêrî. Pora wêya gustîlok hê jipiyabû û birh û mijgûlkên wê şewitîbûn. Dêmê wê yê piçûk dibin wecha agir de kelîbû û lûçikîbû. Agir bi cilên wê neketibû ema, cil bi laş ve mabûn û qemitîbûn.

Feqe yê Gweyînî, nû gihatbû ber çadira pêta wê ya har serkeratê dike û wexte vexwime. Zaroka herî mezin ya Zînê, Newroza çar salî di nav koma mirovan de bê deng û bê hay jipiya sekinîbû. Feqe zarok nas dikir û hewlda hej wê bike. Destê xwe danî ser pora wê ya gustîlok. Bigihandina destê wî re por şkest û destê wî di nav porê de çû xar. Feqe, hilciniqî û destê xwe bi paş ve kişand.

Gelê wargehê, her sê zarok û dayîka wan ber bi nexweşxaneya Medya Alemanî ve revandin. Li derê nexweşxaneya çadir û têr toz, Dr. Medya çaverêyî wan bû. Piştî venêrînek bilez zarok û dayîka wan li tirimpêlan siwarkirin û birin Mexmûr. Li nexweşxaneya Mexmûr jî venêrînek asayî re derbaz kirin. Rewşa Şîrîna di dergûşê de baş bû ema, pîleya şewata her sêyên din asta xetertiyê derbaz kiribûn.

Dema Zînê ji nexweşxaneya Mexmûr derxistin û li tirimpêlê siwarkirin ji doktor Medya re got;

“Hevala Medya, ka zarokên min, ew çawanin?”

Medya Alemaniya ji her kesî bêhtir şîrîkatiya kul û kovanên wan rêvanan kirî, lêhva xweya xarê gezda û ji bû neyîntiyekî bi Zînê nede hîskirin berê xwe zivirand û got;

“Ew pir başin hevala Zînê. Tiştek bi wan ne hatiye û rewşa wan pir başe. Jixwe tiştek bi Şîrînê nehatiye. Hîvîdarim tu jî başî. Pileya şewata te jî ne xetere.”

Zînê ya dirêjkirî û serê wê li ser ranê Dr. Medya, bihêrs lixwe da û hewlda rabe jipiya. Medya destûr neda û ew li cem xwe da rûniştandin. Zînê bi çermê serê milê xwe re girt û bikerb kişand. Çermê destê çepê şelpitî û wekî lepikekî bi serê tiliyên wê re derketin. Çermê wekî lepikek sak dirêj bi serê tiliyan ve dihejê nîşa doktor kir û got;

“Ez çûyîme hevala Medya! Dixwazim cara dawî zarokên xwe bibînim” û tirimpêl birêket.

Her du tirimpêlên birîndaran li derketina bajarê wêran li derê qaymiqamtiyê  ji hev kêmekî dûr rawestan. Riza, kaxezên destûrnameya çûyîna Mûsil ji qaymiqamtiyê girtin û hat cem tirimpêla zarok di tê de. Dema derî vekir çavên wî bi kelaşên zarokên şewitî ketin. Newroza çar salî û Pelda ya du salî bi berhev re dirêjkirîbûn. Ronahiya tirimpêlê li rûyê wan yên bûyîn rijî dida. Pora wan şewitîbû û çermê şewitî wekî tenekeyekî reş qemabû. Çavên zarokan noqandîbûn û ji hemî rewşa wan kifşbû, serkerat dikirin. Şîrîna li ber singa Seadeta Hevlerî û bi awrên xofdar li xwişkên xwe dinêrî, heta awaza wê derdiket têxist qêr û digiriya. Ji bû dengê

giriyê wê neçe Zînê, tirimpêla zarokan kêmek dûr sekinîbû. Riza zarokên dirêjkirî bi destên xwe nîşankirin û ji Seadetê re got;

"Çawanin?"

Hêstiran da ser çavên Seadetê û bi nîşana hejandina serê xwe bersiva "bêxêrin" kir. Zaroka bi ber singa xwe ve şidandî bi destê xwe nîşan da û bideng got;

"Ev başe, duadarim ev bifelite!"

Riza deriyê tirimpêlê girt û bi gavên bilez bezî ber tirimpêla din. Dema deriyê tirimpêlê vekir çavên wî û yên Zînê li hev aliqîn. Bi çavpêketina zelamê semax dijwar re dibêjîqey xendeyek ne kifş awrên jina janek xedar ji wan dibare pêçabûn. Beşişî an jî dixwest bibeşişe ji hev ne dihat veqetandin. Şoreşgera di jiyana xwe de li hember ti êrîşên beşerî nebezayî, bêhal ketibû û ev rewşa xwe ne dipejirand. Jixwe heke li raser wê rêxistin hebe, pêwîste rabe ser xwe û bilîlîne. Riza hêzbû, rêxistinbû û hîviya mezinbû. Vîna ji polabû, jiyana lipaş mayîbû, tola şîrînbû, xweyî û starbû. Dîsa xwest wusa bike ema, taqet û jana di ruhê wê de têrê nekir û hewlda jiyana di kûrahiya çavên xwe yên reş de jidest nede. Riza bi dengek tijî jiyan û bi hîvîdartiya her tim got;

"Hevala Zînê tu çawa yî?"

Jina çermê rûyê wê şelpitî, birh û mijgûlk şewitîn, hundirên lêhvan teqayîn û janek bê pênase li awran hatî barkirin bersiv da;

"Ez başim Heval. Ji ciwanan ne çêtirim. Tenê dixwazim bizanibim zarokên min çawanin" got û hewlda ji himbêza Dr. Medya rabe.

Jina Aleman milên wê yên cil şewitîn dewisandin û ket di navberê de û got;

"Zarok pir başin, jixwe tiştek ya Şîrînê nîne. Rewşa Newroz û Pelda jî gelik başe."

"Madem zarok pir başin hûn çima wan ji min vedişêrin?" û destê xwe dirêjî yê Riza kir.

Tevayê destê wê şewitîbû û çermê şelpitî dahelabû. Laşê bê çerm mayî jî qemitibû û goştê wî reş bibû. Bi destê bê çerm mayî bi destê Riza re girt û ji asayî pir bêhtir şdand. Kelegirî ket qirikê ema ne girî. Xaziya xwe daqurtand û bidengek lavedar got;

"Hevalê Riza, ez çûyîme! Hay ji zarokên min hebin. Zarok emanetî Partiyê!" û destê wê di nav yê Riza de sistbûn. Janek dilqelqên dêmê wê yê şewitî nixwimand û çavên wê ketin ser hev.

Riza awrên xwe revandin, desteyek dirav berda di destên Doktor Medya de û bi dengek kelegirî got;

"Çi pêwîst be bikin, ema çi" û bi gavên mezin ji tirimpêlê dûrket.

Li ser bilindahiya li tenişta rê sekinîbû Riza. Doktor Medya,

bi cama ximam re li zelamê efsûndar dinêrî û ewî li ezmanan. Hêstirên ji çavên şoreşgerê bi berxwedana xwe ya zîndanan bûyî efsaneyek jindar diherikîn, di bin elenda stêran de diteyîsîn. Û doktora Alemanî, êdî bideng digiriya. Li ser Zînê û zarokên wê yên li ber serkeratê digiriya, an jî li ser giriyê Riza yê qet bawer nedikir rojekî ew jî bigirî. Dibêjîqey wê bixwe jî ji hev ne derxistibû. Merg û mejiyê jina mirovyar tevlîhev bibûn û tenê digiriya.

Xelîlê hevjînê Zînê jî hat û li heman tirimpêlê siwarbû. Eniya hevjîna xwe ya çermê wê wekî iyarê dewlikê hişk bûyî û hemî şkestî maçkir û tirimpêl bi ber Nûava ya navder ve derket rê.

Berê sibha heman şevê, di navbera pênç xulekan de Newroz û Pelda yê di nexweşxanyê de jiyana xwe ji dest dabûn.

Derengê şeva roja heştê ya bûyera şewatêbû. Dibêjîqey rewşa Zînê ji rojên derbazbiyî pir baştirbû. Riza, hemî komîteya karê ji derve, Dr. Medya, Seadeta Hevlerî û bi tevayî hifdeh kes li nexweşxaneyêbûn. Rêvebertiya wargehê, du mezelên nexweşxaneya teybet kirêkiribûn û nexweşxane vegerandibûn taxek ya wargehê. Dibêjîqey wê eleqeya mezin li ser gêwilê Zînê jî bandorek erênî kiribû û rewşa wê pir baştir dixwiya. Doktor Medya Alemanî, li ber serê dayîka tevayê laşê wê di nav nalyonek teybet de pêçayî li ser kursiyekî rûniştibû û jin jinê sohbet dikirin. Ji nişkan ve Zînê dabaşa sohbetê guhert û got;

“Te gundê me dîtiye hevala Medya?”

“Mixabin na Zînê. Xewn û xeyala mine ema, hê nebûye qismet herêma Bohta bibûnim.”

Kelecanê lêdana dilê wê yê mezin zêde kiribû û wî qalikê di nav nalyonê de pêçayî ruhê wê yê sivik zevt nekir û hewlda rabe ser xwe. Laşê şewitî bersiv neda fermana mejî û hemî hêst herikîn çavên di hewtikek bê serpûşk de dileyîze. Wekî ji laşê xwe bi enire eniya xwe qermiçand ema, nexwest bandorek vajî li ser kelecana xwe bike. Keserek kûr kişand û awrên xwe qeastin zikê mezela spî. Beşişî ema, jana hinavan kenê wê nîvçe hiştibû.

“Gundê me li qontara Rojava yê Cûdiyê Murada cêh digirt. Li cihê deşta Silopî xilas dibû û çiyê destpê dikir. Gundê Şax, yê wekû ‘Şaxa Hevler’ dihat binavkirin diket Bakurê gundê me. Dibêjîqey çiyayê Muradan bibû embara avê û ava ji wê embara bê dawî diherikî di nav gundên qontarê re dipijiqî. Şax û Hevler, ewqas xweş û spehîbûn, Mîrê Bohta wekû havîngeha xwe hilbijartibûn û serê her bosta her du gundan bi asarên navdar hatibûn xemilandin. Dengê şirêna sûlavan, şelûl û bilbilan efsûndartiyek meyxweş li dola Hevlêr bar dikir. Xaniyên gund, di nav darên fikî de wunda bibûn.

Bavê min qaçaxçiyê binxeta welatê parçebiyîbû. Hê ez û birayê xwe piçûk, dewleta Turk bavê min di xetê de kuştibû û

dayîka min em mezinkirin. Nû gihatbûm. Xelîlê pismam, ez jixwe re xwestim û min û dayîka xwe jî qebûlkir. Tam dema em xêlê xwe bikin, sibehikî leşkerên turkan avêtin ser gundê me. Hevalê Mele Elî, li pişta malan şehît êxistin û ez û Xelîl jî girtin. Xelîl birin zîndana Amedê û ez jî birim ya Mêrdînê. Piştî şeş mehan Xelîl ji dadgeha dewleta Turk ya Amedê revî û piştî Xelîl reviyî hefteyekî ez jî berdam. Me dubare li Cizîra Bohta hevdît û şevekî ji dizî dewleta dagirker ve li Cizîrê em zewicîn. Di heman şeva em zewîcîn de Xelîl çû Cûdî gihat hevalan û ez mam Bajêr.

Piştî wê demekî artêşa dewleta dagirker, ji tirsa Hevalan herêmên çiyayî berdan û qad bi tevayî ket di bin serweriya Gêrîlayên me de. Êdî, ji bû me jî roj hilatibû û murada me hasil bibû. Dergûşa zarokatiya me azad bibû û êdî emê bi xewnên tirsdar ji xewa şîrîn ne hilciniqîbûna. Ez jî çûm Cûdî û li nêzîkî gund, di şikevtekî de min û Xelîl ji xwe re hêlînek çêkir. Dewletê gav û sihet bi teyareyan, bi topan li me dida ema, nikarî bi peyatî were û em şad û bexteyarbûn.

Newroza min, di cejna Newroza sala hezar û nehsed û not û çarê de, di wê şekftê de jidayîk bibû û me navê Newroz lê kiribû. Piştî jidayîkbûyîna Newrozê mehekî, dewleta dagirker êrîşkir, dubare derguşa zarokatiya min dagirkir û me berê xwe da Başûr. Me qesta xwişk û birayên xwe yên Başûrî kiribû. Ew jî ji berya hingê sê salan revîbûn cem me û me pir qedrê wan girtibû. Ema wekî em çaverê derneket! Qiphet û kilameta mala Berzanî ne anîn serê me nema û di dawiya dawî de em biqontara Qereçoxa xopan re derxistin."

Wekî ji xew hilciniqe Zînê. Ji nişkan ve awrên xwe yên westayî pesartin dêmê zer yê doktor Medya. Doktora zerîn xafil hatibû girtin û ji bû Zînê çavên wê yên bi hêstir nebîne rûyê xwe zû revand. Ema hêstirên jina zer ji çavên Zînê rizgar ne bibûn. Kêmek vesekinî û bi dengek tijî pesin û hîvî got;

"Doktor ne girî. Em dozvanên welatê Rojêne. Girî li me nayê."

Enternasyonalîsata mezin, êdî hêstirên xwe bi eşkereyî paqij dikirin û beşişandinek jandar qermîçokên dora çavên wê yên zerîn rakiribûn pêdarê.

"Bîriya te ya gund ez hêstdar kirim Zînê. Nixwe ne li ser tiştek neyînî digrîm. Dizanî, em jin kêmekî hêstîne."

Ew xezala kûvî ya di ti qaliban de ne dihat bi cêhkirin û niha kelaşê wê di tabûtek nalyonî de asê mayî, bi dengek hêrsdar pêl gotinên xwe kir û got;

"Belê! Min pir bîriya gundê xwe kiriye. Belkî jî buhişta di pirtûkên pîroz re derbaz dibe, Hevlerek bê Turke!"

Beşişandinek yarîdar rûyê doktora dil mezin pêça û ket di navberê de;

"Ankû dewleta Turk. Ya gelan têxe dijminê hev û bi hev dide

şerkirin dewlete Zînê."

"Nizanim Doktor! Ema, ji berya ev qewmê hov bibe dewlet jî tu kesî xêr ji wan nedîtiye. Dema em zarokbûn dapîra min ji me re çîrokek vedigot.

Digot; dema turk li Asya Navîn birçî dimînin û berê xwe didin welatê me li derdora Xoresanê tavêjin ser warê Kurdan. Zelaman dikujin û jinan direvînin. Şivanê êlê evîndarê keça binavê Gulnare. Piştî dibe dema bêrê û bêrîvan naçin bêriyê, şivan mereq dike û berê xwe dide nav malan. Piştî tê nav malan çi bibîne; kelaşê mêran li erdê ye, kon şewitîne û li rexê jinek yêxtiyar digirî. Şivan pirsa, "çi qewimiye" ji pîrê dike.

Pîrê dibêje; "Kurê min, turkmençe hatin cêhlan kuştin û jin revandin."

Wê hingê mirov li bazarên koleyan dihatin firotin û şivan dizanî Turkmençeyan jin birine bazara firotinê. Şivanê dilbikul destê xwe têxe di bin guhê xwe de dilorîne û dibêje;

"Xwezî ez bibûma berxek dema biharê
Ez biribûma kuçan û bazarê
Belkî min bidîta şîrîn Gulnarê"

Vêca doktor, min di jiyana xwe de çîrokek, ristek, serpêhatiyek û an jî gotinek erênî di derbarê van turkan de ne bihîstiye. Tenê tişta bi navê turkan min wekû erênî bihîstî, hevaltiya Heqî û Kemal ya bi Serokatiyê re bû. Eslê wan her du hevalan jî çiqas turke, ji bû min dabaşa gotûbêjê ye."

Ji berbangê re kêmek mabû. Şevê henesaya xwe girtibû û ji rojek nû re silav sekinîbû. Dibêjîqey pêlên Dîcle rabibûn pêdarê, lingên pirên hêsin dikutan û singa wan talîstin. Pêlên masûrî li peravên Nûava navdar diketin û bilez derbaz dibûn. Di bê dengiya şevê de dengê robarê kulan bilndtir dihat û dibêjîqey hewara welatê bindest diqêriya. Doxtor û hemşîreyên nexweşxaneya Sedam jî vekişabûn hêlînên xwe û di zikakên sar û cemîde de tu kes nemabû. Taxa wargehê ya di hundirê nexweşxaneyê de hatî avakirin jî bi dilniyatiya nexweşa wan baştire serê xwe danîbû û ketibû xewek giran.

Emînê Hevlerî û Doktor Medya, li ber serê Zîna nû ketî xewê diponijîn. Xewê sewdanê wan dagirkiribû û xewnên hişyar didîtin. Ji nişkan ve qirên ketibû textê Zînê û dibêjîqey erd hejek mezin pêkdihat! Emîn û Doktor Medya hilciniqîbûn. Ser û binê Zînê dilerizî û dibêjîqey bi hêzek ne diyar re şerek bê eman dikir. Ew, berxwedanvanek yemanbû. Wê hunerê jiyanê bi têkoşînê hunandibû û ne dixwest ruhê xwe teslîm bike. Piştî liberxwedanek bê hemsal qederekî, êdî westabû. Kef û kincê bi devan re avêt û xîzênek ne asayî ji gewriya wê dihat. Rêvana welatek azad, xezala

Qereçox, Zîna Hevlerî; piştî serkeratek kurt wekû ebedî çavên xwe li jiyanê noqandin.

De bêje Dîcle ya kovendar, wêdetira vê evînê heye?
Bêje, çend evîndar liber peravên te çûn ava?
Bêje, çend Stiyan di nav pêlên te de xwe bi mirinê şuştin?
Bêje, çend heneseyên bê murat singa te mêhtin?
Bêje, çend Zîn û çend Mem dipaşila te de nivistin?
Bêje û ax.. de bêje Nûava sêwî?
Bêje, çend Kawayan li ser sûrhên te agirê azadiyê dadan?
Di wê berbanga bi qedap de Dîcle birîndarbû,
Nûava şîndarbû,
Qereçoxa keçel reş girêdabû êdî
û hemî bi hev re li hember evîna Zîna Hevlerî silav sekinîbûn!

**Xelîl Elçî (Hevjînê Zînê)** vedibêje;

"Ez dereng pê hesam. Min Zînê û zarok li Mexmûr dîtin. Newroz û Pelda pir bê halbûn û qet ne taxivîn. Laşê wan helabû û ji sedan heştî şewitîbûn. Rewşa Zînê ji ya her du zarokan baştir dixwiya. Jixwe dergûşê Şîrîn parastibû û tenê kêmek rûyê wê û serê tiliyên her du lingên wê  şewitîbûn. Bi du tirimpêlên cuda wê şevê me avêtin nexweşxaneyek teybet ya Mûsil. Demjimar sê û sê û nîvê heman şevê, di navbera pênç dekîkeyan de Newroz û Pelda yê dest ji me berdan û çûn!

Sibehî zû min kelaşê her du zarokan girt û anîn wargehê. Piştî Nûjîn û zaroka Xizêma Marûfî, cenazeyên çaremînbû me li goristana wargehê disipartin axê. Heta nîvro me zarok heqkirin û dubare zivirîm Mûsil. Zînê got;

"Xelîl, tu çûbû kû? Ka zarok? Mane te soz dabû, teyê zarok anîbûna cem min?"

Wê gavê ruhê min qerisîbû. Kilox li mix hatibû hev û kêmek mabû mejî diguhên min re bavêje. Janek bê pênase mergên min diguvaşt û ji bû nekim qêr tenê xwidê dizane min şerek çiqas dijwar bi xwe re kiribû. Ema min di wê bêhnê de fêhmkir kû xwezayê mirov qabilê her tiştî afirandiye. Mingot;

"Zînê, wekû tegbîr me şevê din zarok jî anîbûn nexweşxaneyê. Jixwe pir başbûn û tiştek yê wan tinebû ema, dîsa Hevalan xwestin em wan bînin û nîşan doktoran bikin. Kêmek tirsabûn. Piştî vê sibhê me dît rewşa wan başe û tiştek ya wan nîne doktoran gotin; "hûn wan bibin wargehê baştire." Min ew birin spartin Eyşê û hatim."

Dibêjîqey Zînê, di navbera bawerkirin û ne bawerkirinê de dudiliyek derbazkir. Keserek kûr kişnad û wekî dengê wê ji bê

dawîtiyek kûr were got;

"Xwezî te cara dawî nîşa min bikirana û wusa biribûna."

Tevayê şaneyên laşên min direcifîn. Ji bû pê nedim hîskirin zarok çûne, min qedap li bêbextiya jiyanê anî û got;

"Doktoran gotin; zarok dayika xwe di vê rewşê de bibînin yên neyînî bandor bibin. Jixwe hîvîdarim di nav çend rojan de rewşa te jî baş bibe û emê bi hev re herin cem zarokan.

Du hêstirên gir ji çawên wê yên bê mijgûlk û birh mayîn herikîn û li ser gurmikên qelayîn asê mabûn."

**Mamosta Emînê Hevlerî** vedibêje;

"Em gundiyên hevbûn û di wargehande jî me malên xwe li nêzîkê hev datanîn. Ji Nehdaran em di heman tirimpêlê de hatibûn û li vêdê jî me malên xwe li rex hev danîbûn. Ew demek bû Zînê nexweş û ne rihet bû. Ji kevin ve pirsgirêkek ya wê ya mîdê hebû. Piştî em hatin Mexmûr, bi zexta şertan jî nexweşiya wê girantir bibû û ew hê bêhtir aciz dikir.

Jixwe çadira xwe nû girtibûn û baş asê nekiribûn. Êvarî min û wê kuçên mezin ji derdor kom kirin û ji derve ve qulibandin ser keviyên çadirê. Ew demek bû bagerek dijwar rabibû û tiştekî xwe li pêşyê ne radigirt. Ji bû bayê dijwar çadira wan ne bavêje, me baş asêkirîbû. Ew û zarok, şîvê li cem mebûn. Xelîl jî ne li mal bû, piştî şîvê qederekî rûniştin û çûn.

Piştî çûyîn wê ne gelikî, qêrek hat. Dibêjîqey qêr ji kûr û dûr dihat. Ema piştî li pey wê dengê 'hewarekî' hat dubarekirin, min xwe avêt ji derve. Dema min serê xwe ji çadirê derxist, stûnek zer ya pêta agir li raser min bilind dibû. Bagera dimohr stûna badayî ditewand ser pişta çadira me û dubare radikir jor. Li aliyê din ditewand erdê û dîsa berbi ezmanan ve hildida. Û ez di nav wê wexma dojehî de berbi çadira Zînê ve bezîm. Min bi dengek qêr û hewar bankir Zînê. Heta hingê keviyên çadirê şewitîbûn û hundir dixwiya. Zînê, di binê çadirê de rûniştîbû. Dengê min bihîst û got;

"Emîn Zarokan rizgar bike!"

Bi gotinan re min destên xwe avêtin milê wê. Laşê wê helabû. Tiliyên min ji laşê wê şewitîn û bi lêketina pêtê re jî agir bidestê min ket. Tam dema wê bikişînim, bilekimdayîna bagerê guriya agir li dêmê wê da û avêt. Dema pêtê Zînê piştikî li erdê da, lingên xwe li dergûşa xwe da û bizarokê ve tehfda ji derve.

Min di nîvê volkanekî de xwe peydakiribû. Jixwe her der, her tişt germbû û em dişewitandin. Vê carê agirek har ez bosekiribûm û wexma wî têra helandina pola jî dikir. Bêhna goştê mirovan, nalyona helayî, çadira şimakirî û wexma dojehî tevlîhev bibû. Piştî guriya dijwar Zînê piştikî li erdê da û min destê xweyê şewitî kişand, ya herî dawî tê bîra min, Rihana Muhemet Xalid bû! Keça ciwan ji jor

ve hat û xwe li nav pêtê werkir. Piştî wê min sê caran li ser hev got;

"Hewareee.. Hewaree… Hewareee…." û dîmen liber çavên min şêlobibûn êdî."

**Rihana Muhemet Xalid** vedibêje;

"Biser hatian me ya Mexmûr re nû mehek derbaz bibû. Mexmûr dojeha li ser rûyê cîhanêbû û em ketibûn di nîvê wê dojehê de. Belkî jî di ti pirtûkên pîroz de, ti vegotinên ramyaran têra teswîrkirina wê dojehê nekiribe. Berde komek mirovên çiyayî, ji ber keviyên berfa zozanan hatîn; banevank jî di nav de zindiyên herî qayîm yên deştan jî ne di wê hêzê debûn du roja li qontara çiyayê Qereçox, di şertên me de jiyan bibin. Tozek hûra dibêjîqey moxilkirî xwe li navtenga mirovan dida. Roj bîst û çar demjimare bager û bablîsok di nav wargehê de di ber hev de dibezîn. Bagera dijwar toza hûr di ebanda dev, çav û konikên pozê me de û avek ya vexwarinê jî tinebû.

Dibêjîqey ji bû ew axa şewitî wê komika mirovên ne tebitî dabelîne dost, dijmin herkes mûtefiqîbûn. Dibêjîqey tevayê Stî û Mîran, Xwadan û beniyan demek dirêj û bitosintiyek mezin ew war ji bû mirinê amadekiribûn û ji her bêhn, ji her bosta wê mirin dibarî.

Eşa derengbû. Ji bû serê xwe bişûm min ji der ve av li ser tifikê germ dikir. Dengê bagera dijwar hemî dengên heyîn di dewisandin û li ber guhê mirov top biteqana ne dihatin bihîstin. Di navbera çadira me û ya Zînê de sê, çar mal hebûn. Di carekî de 'hewar, hewara xaleta Peynaz, ya dibêjîqey ji geliyek kûr tê liber guhê min ket! Dema mîn li aliyê deng jê tê nêrî, wexma pêta agirê li ser çadira mala Zînê bilind bûyî li wechê min da.

Ez ber bi agir ve bezîm û min got; "xaleta Peynaz çi qewimiye?" Xaleta Peynaz, şewilîbû û peyvên wê ne dihatin fêhmkirin. Û ez gihatim ber çadirê. Min xwe li nav pêta agir da û êdî tiştek nayê bîra min. Ruhê min têra wênekirina wê bûyerê nekiribû. An jî hêza mejiyê min ew dîmen ranekiribû. Trejîdeyek ewqas giran û mezinbû min ne xwest ruhê min dîl bigre û her bêhn û gav dubare heman êşê jiyan bibim.

Tenê ji wê bûyerê dîmenek dilqelqîn qet ji pêş çavên min naçe. Malek cîranê wan hebû digotin, mala Miskê. Malek Nîrehî bû û piştre revîn. Dema di wê heşra mezin de her kesî hewl dida Zînê û zarokên wê ji nav agir rizgar bikin, Miskê û kurê xwe Seîd, qepalên xwe direvandin. Ewê qelbîtiyê ji bûyera şewata mala Zînê bêhtir dilê min guvaşt û kilox li mejiyê min teng kiribû."

**Dr. Medya Alemanî** vedibêje;

"Zînê, Stî jinek bû. Ji gava şewitî heta bi wê bêhna çavên xwe li cîhanê noqandîn bê navber li ber serê wê bûm. Vînek pola û hêzek ya wê ya bi ser mirov re hebû. Pir caran ji min re digot; "Hevala

Medya, ez ji wan ciwanên di oxira azadiya me de canê xwe fedakirîn ne çêtirim" û ew dayîkek dilvîn û şoreşgerek merg fêrisbû.

Jixwe dikeyek yê wê û Xelîl hebû, qet ji ber çavên min naçe. Piştî nîvroya roja piştî şeva şewatêbû. Xelîl, zarokên xwe sipartibûn axê û nû vegerabû nexweşxaneyê. Û hinga ket di mezela Zînê de qêrkir û bidengek bilind girî. Girî û zehf girî. Zînê, bi aramdartiyek ser mirov re guhdarî giriyê hevjînê xwe kir û kengê Xelîl ji girî westa dîsa bi hêlwestek bê pênase ew bi bê sebriyê tewambarkir."

Dr. Medya ya Alemanî, Hevala Medya ya wan koçeran, jina ji welatek hemî xweşîxwazan re bûyî qest, bûyî mebest hatî û bûyî şîrîkê hemî êş û janên wan rêvanan; hêwîtiya çavên xweyên di nav qermîçokên gir de mayîn paqijkir, keserek kûr kişand û vegotina çîroka Zîna Hevlerî ajot;

"Bi du kulan ve çû Zînê û ew kulên di dilê wê de mayîn hê jî di hinavê min de taxivin. Yêk; pir dixwest cara dawî zarokên xwe bibîne û ev ne mûmkûnbû. Du; pir dixwest dayîka xwe bibîne û niha jî min fêhm nekiriye, çima ne şandin pey dayîka wê."

Dibêjîqey Dr. Medya, wê bêhnê, wê gavê jiyan dibe û heyfa dayîka xwe nedîtîna Zînê êşek bê pênase li dêmê wê yê zer barkiribû. Rûye xwe zivirand û êdî ne axivî.

**Ferhat Merdê** vedibêje;

Ferhat Merdê, kesek ji bajarê Qamîşlo yê Rojavayê Kurdistanê bû. Ristvanek baş û girêdayî vê endamê saziya çand û huner ya wargehêbû. Ji berya bûyera mala Zînê wekî hemî saziyan, Riza wan jî kom dike û bi dengek dijwar dibêje; "divê hûn di nava hefteyekî de saziya xwe ava bikin û dest bi xebatên xwe bikin."

Ji tirsa serkarwanê semax hişk, şev û roj heriyê distirhin, bilokên axê çêdikin û dixebitin. Ferhat;

"Ji westandin kêrstû bibûm. Cihek yê me yê em lê bêhna xwe vekin û jiyana xwe ya rojane dabîn bikin jî tinebû. Bi reş ketinê re me kar berda û min berê xwe da mala yadê Xanêya Hîlalî. Bagera dijwar tozek tîr li raser wargehê kom kiribû û toza sohr wekî mijek stûr daketibû ser malan. Çavan çav ne difitirandin û bikutekî min xwe gihandibû mala yadê Xanê.

Pir westabûm û piştî şîvê bê hemd xilmaş bibûm. Dengek biqêr li ber guhê min ket ema, min zenkir xewnek ne xweş dibînim. Her kû çû dengê dibêjîqey ji geliyek kûr derdikve nêzîktîr bibû û ji xew veciniqîm. Bayê dijwar dengê 'hewar, hewara' mirovan li ser wargehê êxistibû. Dest pelankî û çav li xew ji kolikê derketim û bezîm ser rê. Herkes bi aliyekî ve dibezî û min berevajî wan dilezand. Ne li ser hişê xwe bûm, an jî hê di xew de bûm, nizanim. Singa min û çend kesan li hev aliqî û hê jî min berê xwe ferq nekiribû.

Ba ketibû pişt min û bi hêza bagera dijwar jî wekî têza tifekê

dibezîm. Her kû dibezîm dengê qêr, qelebalix û hewar, hewara mirovan ji min dûr diket. Piştî demekî êdî guhên min ti deng ne dibihîstin û min xwe di nîvê deştek rût û zilomat de peydakiribû. Nû têgihiştim, min berê xwe şaşkiriye û ji wargehê dûr ketime. Biser demjimarekî re bezîbûm û li kûme nizanim. Di tarîtiya deştê de qederekî li aliyê çepê bezîm û dibêjîqey kûrahiya deştê min hêdî hêdî dadibelîne. Deşt bibû derya û bê keştî û kelek li ber pêlên wê yên dijwar ketibûm. Wekî pêlên gêravek bi fitlonek bahoza dijwar, ez dizivirandim û zixwirên ji erdê radikrin wekî fîşekan li nav çavên min didan.

Rûyê Nûjîna zarok ya li ber tava dojehî şewitî û biyî qitran li ber çavên min zindîbû û tirkên ket dilê min. Di wê gavê de çok li min şkestin û êdî min hêza livandinê wundakiribû. Di deşta mijdar de çavên min tarî bibûn û perdeyek reşa stûr ketibû di navbera bîbûkên min û cîhanê de. Min xwe di avşûyekî de berda erdê û têhnîtiyek şewabdar hinavê min dişewitandin. Lêhvên minên terikîn hişk bibûn û qirika min zuwa bibû. Kuxikek hişk û zuwa ez girtim û haxta min bixeniqîne. Min jidil bawer kir kû çavên min xirabûne û cihana xeyalan ez dîl girtibûm. Carnan şirêna avên sûlavên Bohta di guhên min de vedidan û carnan jî bê dawîtiya deştê ez dadiqurtandim. Min bawer nedikir taqeta livandinê bi min re mabe û hîviya jiyanê jî li ber serkeratêbû.

Ji nişkan ve wekî hêzek veşartî min hilde û rake jipiya. Piştî rabûm jipiya, êdî çavên min jî reşatiyek ferqkiribû. Wekî Ezraîl ketibe dûv min û ber cihek ne diyar ve bi çargav revîm. Piştî kêmekî di kûrahiya  deştê de dengê reyîna seyekî li ber guhê min ket. Min xwe li wî dengî girt û bi hemî hêza xwe bezîm. Xwêhdan li ser eniya min zuwa bibû û dibêjîqey stirî di qirika min de diçin xar. Ema ne sekinîm û her bezîm. Piştî qederekî bi dengek gefker hilciniqîm û di cihê xwe de rep sekinîm. Çar, pênc gavan  li pêşya min, reşê mirovekî xwiya dikir. Zelamê çekdar, ber bi min ve hat û bi erebî got;

"Tu kêyî?"

Ez şaqis bibûm û awrên min di dêmê reş yê zilamê ereb de qerisîbûn. Min zenkir kû hê jî xeyalan dibînim. Ji cihê xwe ne lepitîm û qet ne axivîm. Reşê li ber çavên min bûyî dêwek sehwdar hat, bi milê min re girt û ez hejandim. Nû min bawerkir ev rastiye û pirsa; "evder kûdere" bi kelecanek xofdar ji nav lêhvên minê şeqitî felitîbûn.

Vê carê zilamê ereb şaş bibû û du, sê caran li ser hev got;

"Mexmûr, Mexmûr! Tu kêyî?"

Ez li Rojaavyê Kurdistan mezin bibûm û min zimanê Erebî xweş dizanî. Min bicewher û bilez çîroka wundabûna xwe ji leşkerê Sedam re vegot û min xwest rêya wargehê nîşa min bike. Leşkerê

nobedar, têr av da min, ez anîm ser rêya qîr û got;

"Vê rêyê bernede. Ya te bibe nav wargehê!"

Rêya tirimpêlabû û rêya fer ya wargehê ew bû. Ema piştî ji leşkerê ereb veqetam kêmekî, dîsa tirsa wundabûnê wekî risasê daket ser dilê min û dubare teşkên min lerizandin. Ji nişkan ve min xwe di nav kêlên tirbên goristanekî de peydakiribû. Li kêlên goran dihiltelipim. Bêkû ferq bikim, bi rê ve kitek ya pêlava min qetaye, ji lingê min ketiye û ser tiliyên lingê xas li kêla gorekî ketin û xwîn jê herikî. Min zenkir kû mirî lingê min gez didin û di carekî zeravê min qetan! Dilê min xaysbû, dubare reşahî ket ser çavên min û revîm.

Piştî kêmekî dubare bi dengek gefxwar hilciniqîm. Reşê mirovekî ji dûr ve lûleya çeka xwe li min rastkiribû û vê neqlê bi Kurdî got;

"Tu kêyî!?"

Dengê di guhên min de vedayî ji nişkan ve ez ji nav kulabên wê xofa dilqelqîn kişandim û hatim ser hişê xwe. Bi dengek şadîtiyek zarokî min da ser hev û got;

"Ez Ferhatim, Ferhat.. Ferhat!"

Nobedarê derbenda wargehê ez naskiribûm û bi awayek şaş mayî got;

"Hevalê Ferhat, tu ji kû ve têyî?"

Piştî min nobedarê wargehê naskir nû hatim ser hişê xwe û wirarên tirsa mirinê li dor min neman. Min çîroka xwe ji nobedarê xweşmirov re vegot û pirsa bûyera êvarî qewimî kir. Ciwanê nobedar got;

"Agir bi mala Zîna Hevlerî ketibû. Ew û zarokên wê şewitîn û rakirin nexweşxaneya Mûsil" û nobedar ket pêşya min û ez birim derê çadira me. Hê nobedar nû ji min veqetabû, Sofî Beşîrê Serhêsin hawaket ser girikê pişta çadira mizgevta semta du û banga sibhê da."

***

Danûpeza roja sêyemîn ya salvegara şehadeta Zîlan-Zeynep Kinacî bû. Di heman demê de roja duyem ya sersaxiya Zînê jî bû. Komîteya amadekar ya bîranîna salvegerê, biryara bi civînekî derbazkirina salvegerê dabû û hazirtiyên wê dikirin. Tangêra ava semta du, li pişta mala Hacî Îsîfê Gundikremoyî rawestabû. Dengê tenekeyên pîrekan li qontara tazî û şewitî ya Qereçox diketin û bi şûn ve dibeyîn. Hesenê Egîdê Hîlalî, erkdarê belavkirina avêbû û di nav pîrekan de vegerabû dîkê porê. Pîrekên dixwestin tenekeyek zêde av bigrin, didan xortumê û Hesen lingê xwe yê kulek qerastibû erdê û heta dengê wî derdiket têxist qêr. Di nav wê pêşbaziya dijwar

de, Pirteqala Hacî ya ji Deştadara yê tenekeya duyemîn jî dagirt û berê xwe da bin kolika xwe ya nû. Dema dayîka deziyek zuwa lê nemayî û bi şadîtiya tenekeya duyemîn ya avê serê xwe êxist kolikê de, bi qîra giriyê Dîlana şeş salî şewilî. Zaroka sîs, li ber tenişta bavê xwe piştîkî ketibû, li erdê digevizî û bê mehwer têxist qêr. Bavê pehn û ûr li ser dila dikeve jî di nîvê kolikê de bêhal ketibû û çav lê şemitîbûn rexê. Dayîkê, tenekeya li ser milê xwe danî û bi Dîlanê ve bezî û bi dengek tirsdar got;

"Kuro Mustefa çi ji Dîlanê hatiye?"

Tanzêrê çav lê sistbûyîn û di axaftinê de zehmetiyê dikişîne bi devoka xwe ya koçertî got;

"Ba wîle nizanim! Min xwe dirêjkiribû û Dîlan li ser singa min bû. Heman dupiştkî hem bi gozeka lingê wê ve da û hem jî bi tenişta min ve."

Pirteqalê zarok da milê xwe û bi qêr û hewar biber sersaxîvanên Zînê re bazda û berê xwe da nexweşxaneyê.

**Pirteqal Hacî** vedibêje;

Neqla duyemîn ya avê min anî û ketim di hundir de. Heman dupiştkî bi Dîlana min û bavê wê ve dabû. Mustefa bê hal li erdêbû û Delala min li erdê diperpitî. Mala me û Zînê cîranê hevbû û roja duyemîn ya sersaxiya wê bû. Min şerm dikir bêxim qêr ema, dîsa jî min pîvoka xwe ya zer da ber singa xwe û bi qêr û hewar çûm nexweşxaneyê. Wekû erkdar xebatkarê tenduristiyê Muhemedê Hacî yê Hîlalî em pêşwazîkirin. Dilxwede derziyek dij jehr li Dîlana min da û got; "bibe mal."

Min zarok dubare anî mal ema, ne li erd û ne li ezman tebata wê nedihat. Bê navber digota;

"Yadê ezê bimrim! Yadê ezê bimrim!"

Min got;

"Yadê, xwelî li xwe bike, ma yadê ya çi bike. Tu mirî, mirî!"

Piştî kêmekî zimanê Kezîzera min giranbû û laşê wê sist bibû. Vê carê bavê wê jî hat û dubare em bezîn nexweşxaneyê. Çavên Dîlana min li nexweşxaneya me şemitîn û êdî deng jê ne dihat.

Tirimpêl jî hazir tinebûn. Doktor Medya Alemanî, zarok hilgirt û wekî dîna ez bezîm ser rê. Bi çi kul û halî me tirimpêlek peydakir û me berê xwe da Mexmûr. Hê em birê ve nefesa Pîvoka min qut bibû. Doktor Medya, hewlda bi deva re bêhnê bidiyê ema beytişebû. Hê em ne gihatîn nexweşxaneya Mexmûr Dîlana min can dabû. "

***

Havîna Qereçox bihunerbû û şêniyên wargehê diqemitandin. Di her bêhna rojê de xwêhdan ji kelaşên wê komika mirovên zozanî dibarand û jiyan li wan kiribû bela. Aş aşokên ji roja nû gihatî cihê danûpeza dirijan, wekî tîrên ji devê kevanên dawudî dibeyîn û dibarîn ser kiloxên wan çiyayiyan. Toz û qîrêja Qereçox reng li nû warên xwe guhertibû û asar ji wî rengê çiyayî ne hiştibû. Dibêjîqey nû ji bin hedan felitîbûn û nîşan ji kevintiya wan nemabû. Dewsên toz û xwêhdana li ser cilên wan hişkbiyî, wêneyê xerîteya erdnîgariya cîhanê ratêxist ber çavan. Heke di navenda wê xerîteyê de 'Mexmûr' hatibûya nivîsandin û xetikên bixwehrik jî hatibûna sererastkirin kêmasî di wêneyê bê hemsal de ne dima.

Koçberên wargeha Mexmûr, nû kelaşê Dîlana şeş salî spartibûn axa sar û bi hev re hatibûn derê kolika Tanzêrê Deştdarayî. Bavê, kêmek qelew û qelewtiyê kelaşê wî pehnkirî, li serê rêza pêşwazîkirina sersaxîvanan sekinîbû. Di ser hev de çûbû û hêwîtiyek mijdar çavên wî yên westayîn pêçabûn. Wekî her kesî, ew jî di bin giraniya zehmetiyên warê nû de xwehr bibû û awrên wî di nav leylanokên ji tavê vedidan de melevanî dikirin. Jiyanê, bêşa warê nû, zû û giran ji Tanzêrê koçerê gundê Deştadara yê standibû. Bêşa ne liçaverê, ew ji asayî pir zêdetir şebikandibû û kelaşê wî yê qelew û pehn di ser hev de qumişandibû.

Koma sersaxîvanên jin û mêr têkilhev, ji derê kolika Tanzêr veqetan û berê xwe dan kolika sersaxiya Zîna Hevlerî. Gelê wargehê, li cihê çadira Zîna roja ji berya wê spartîn axê kolikek mezin avakiribûn û li derê kolika hê çiloyê wê ter Xelîl û Riza, azavan pêşwazî dikirin.

Xerîbe ema, wî warê dojehî tenê di mehekî de Riza yê rikdar, cesûr, dijwar û sewhdar jî pîr kiribû. Gustîlokên pora nû dapên spî beyiyên qijtir bibûn û di bin toz û xwêhdana Mexmûr de rengek lewîtî girtibûn. Qermîçokên eniya di bin biskên pora xelek de piçûktir dixwiyan, kurtir bibûn. Wekû serdarê karwanê di duryana Qereçox de teqinî, hewl dida heybeta xwe wunda neke ema, bûyerên ne ji rêzê yên li pey hev diqewimîn ew jî şebikandibû, şewibandibû û rûyê wî yê zirav di bin wan dewsan de dijwartiya xwe ya biheybet wundakiribû.

Jixwe ne kursiyên sersaxîvan li ser rûnên hebûn û ne jî çadir. Sersaxîvan, li derê kolika li ser xweliya mala şewîtî hatî çêkirin û dibêjîqey kuçên li derdor bermayiyên êtûnek dijwarin sekinîn. Ji rêzê ve çûn destên pêşwazîvanvanan, fatihek xwendin û kesa ji berê ve hatî dest nîşankirin gavekî derket pêş. Jina xavikek lewitî pora wê ya gevoz dihemîne, xemgîniya xwe û hevalên xwe anî ziman. Xweyê sersaxiyê jî spasiya serdanvanankir û sersîxîvan ji cîhê sersaxiyê veqetan.

Ji refa rêberên çiyan, Emerê Batûyî û Îsmaîlê Şirnexî nû ji Gara vegerabûn. Ji sedema cara yêkêbû ji Mexmûr çûyîn çiyê û vegerayîn, li cihê kolika sersaxiyê wargehî li dora wan kom bibûn û pirsa Hevalên çiyan ji wan dikirin. Ji wî welatê pîrozê bi bîriya wî dişewitîn zivirîbûn û her kêyê kû ew didîtin bi eşq û şadîtiyek awerte himbêz dikirin. Ji hîviya xwe gihandina çiyayên bilind mezintir, nirxek pîroz ya avek hunik di dilê wan mirovên şewibî de bike tinebû. Dema ji Nehdaran berê wan ketî qontara Qereçox, tişta herî zêde li zora wan çûyî dûrketina ji Hevalanbû. Bi çûyîn û hatina wan rêberan re diyar bibû kû endîşeya wan valebû û ti hêz nikare destê wan û zarokên wan ji hev biqetîne. Heke destê wan û Hevalan ji hev ne qetê, bi êşên dikişandin razîbûn.

Piştî her kesî xwe ji rêberên nû zivirîn kuhkir, Feqe bi milê Emer re girt û ber bi mala wan ve kişand. Feqe jî yêk ji rêberên heman rêyêbû û bi bîriya rojek zûtir Hevalan bibîne hinavên wî dişewitîn.

“Ka zû bêje hevalê Emer; hûn bû kû re û çawa çûn?”

Bi hêlwestek pir asayî Emer bersiv da;

“Em bi tirmpêlekî ji dizî ve çûn Mûsil. Bi tirmpêla kurdek welatparêz jî çûn gundek yê Êzîdiyan. Gundê dabaşa gotinê li nêzîkê Nehdaran bû û ji wêdê û şûn ve bi rêya me ya kevin re em çûn Gara.”

Feqe, bi çavên mereqdar û şadîtî ji wan dibare pirsên xwe ajotin;

“Çek, cil?”

“Ew mala êzîdî welatparêzbû. Hevalan çek û cil amadekiribûn. Me li wêdê cilên xwe guhertin û di zivrandinê de jî me dîsa li wêdê cilên xwe guhertin û bi heman awayî em hatin Mûsil û jixwe ji Mûsil heta bi wargehê asayiye.”

“Heval çawabûn? Te kûjan heval dîtin, te hevalê Karker dît?”

Belkî jî di wê seferê de pirsa herî zêde Emer jê ditirsa navê ‘Karker’ bû. Şewilî, gotin di deva de xirabû û deng û reng li zelamê bejin navîn û du qevdên simbêlên reş di ser lêhvan de dihatin xar hatibûn guhertin. Peyv di devê xwe de cût û daqurtand. Hêlwesta Emer, kutên êxist dilê Feqe. Şewatek dijwar ûrikê wî yê piçûk pêça û bi îşkek bê eman guvaşt. Ema dîsa di dilê xwe de got; “belkî tiştek din hebe, belkî giran birîndar be, belkî nexweş be” û bi awrên pirs barkirî li çavên Emer yên qetek rohn nixwimandîn nêrî. Awrên Emer û Feqe bi hev ve qerisîbûn. Êdî, çavên her du ya jî tijî avbûn û hev xumam didîtin. Çavên Feqe yên ji berya bêhnekî pirs dikirin êdî lave barkiribûn û dibêjîqey ji hevalê xwe re dibêje “bêje tiştek nîne, bêje ya tu difikirî ne raste, bêje sivik birîndare û tiştek ya wî nîne.”

Tam dema Feqe hewl dida mergê xwe bi hîviyên xapînok mijûl bike ew hevoka bi qedap ji nav lêhvên Emer rija.

“Hevalê Karker şehît ketiye!”

Erdhejek qiyametî di hinavê Feqe de rabibû pêdarê. Awrên xwe pesartin erdê û du hêstirên gir ji çavên wî rijan. Hêstir, di nav qepûşkên kelpitî de asê mabûn. Devê wî ne gera pirsa çawatiya şehadeta Fermandarê xwe bike. Ema Emer ya zor û jê ditirsa gotibû, êdî yên din hêsanîbûn û dewam kir;

“Piştî ji wargehê vediqetê bîst û heft rojan, di çalekiyek ya li ser baregek ya nûkeran de fîşekek li depa singa wî dikeve û bi vî awayî şehîd dikeve.”

Feqe ji Emer veqeta û bigavên bibez berê xwe da kaşê Qereçox. Bi ber cihê êvaran televîzyona semtê lê datînin re bûrî û di bin aş aşokên ji roja sohr rêz dibin de û di valetiya ezmanê Mexmûr de direqisin xwe li singa Qereçox da. Li hindama girikê asayîşê, li cihê wî û fermandarê xwe cara dawî lê sohbetkirî kêmek vesekînî û dubare ber bi lotkeyê ve birêket. Feqe dibezî û xwêhdanê kelşên di rûyê wî de vebûyîn dişewitandin û dikewandin. Bê hedef hilpirijîbû evrazê Qereçox. Yê bi kû ve here, li kû bisekine nizanî. Tenê tiştek dizanî ew jî evbû; dixwest rojek ji ya din zûtir xwe bi spêre çiyayên pîroz. Wê berîstanê, wî qeracê hişk û zuwa ew difetisand û bi wê xebera ne bixêr re haxta bixeniqe.

Feqe, bi gavên bibez bi kaşê çiyayê şewitî û kuç tûj re hawaketibû. Laşê wî, di bin tîrojên roja dijwar de sincirîbû û ji xwêhdanê deziyê zuwa lê ne mabû. Gihat ber girê herî bilind yê di zemanê qedîm de aşê bayê li ser çêkirîn û xwecihên wêdê navê ‘aşê Bayê’ lêkirîn. Hilpirijî gir û li ser nîvê girê herî bilind rep sekînî. Bayek germ û dibêjîqey ji nav guriya agirê sohr derdikeve li dêmê wî yê kelpitî dida. Berê xwe bibaskî çiyayê Gara ve zivirand û çavên wî dûr dinêrîn. Dibêjîqey ji çiyayên di nav xumamek dûr de dixwiyên keziyek bayê hunik eniya wî ya şil alîst û wî hîsî dilniyatiyek ne ji rêzê berdabû hinavê ciwanê her du çavên wî wekî du pêloxan sohr bûyîn.

Bîriya warê Egîdan kiribû Feqe. Bîriya wan heval û hogirên xwe yên li wan çiyayên dûr mayîn kiribû. Bîriya şirêna sûlavan, dengê şalûl û bilbilan kiribû. Bîriya cihê awrên Karkeran lê qerisîn, bîriya meskenê bêndera hîviyan lê digere kiribû. Li ser nîvê girê aşê bayê rûnişt û ji xwe re got;

“Hevrêtiya hemhêstan. Hevaltiya rêya heqîqetê. Hîviya bi hev re xwe gihandina welatek azad. Welatek bê pêxas û teres. Welatek bê xayîn û dagirker. Dema Enkîdoyê Baxê Îremê û Namtara ya Serhedî hatîn kedîkirin, ev toqa neeletê ketibû stûyê me. Tohvê xiyanetê ewan reşand li welatê me. Bû firîz û ket nav me. Ji bû qelandina vê firîzê, ji bû şkandina vê toqa biqedap hê çend Karkerên dinên bê xatir ji me veqetên? Hê çend Zînên dinên bi zarokên xwe

ve bibin xwelî? Hê çend Dîlanên dinên bi awrên neçar li ber singa dayîka xwe biperpitin? Û hê çend Nûjînên dinên li welatê avê ji têhna bifetisin û bibin rijî?”

Rabû ser xwe, her du destên xwe hildan û qêrî;

“Ey dîroka serdestan, ey dîroka biqedap; ez ji te nefret dikim! Ehd û peyman ji hemî Karker û Zînan re, ji Newroz, Pelda û Dîlanan re heta li cihê ev toqa neeletê êxistîn di stoyê me de, ne we hûrkirin û tohvê vê firîza li nav me hatî reşandin ne we qelandin; em dest ji vê dozê bernedin û vî agirî ne vemirînin.”

Bi heman gavên bilez ji aşê Bayê daket û berê xwe da çadira Riza. Zahirê Serhedî, li derê çadirê sekinibû û dibêjîqey çaverêyî kesnanbû. Pirsa Riza jê kir û Zahir got;

“Hevalê Riza li asayîşê ye.”

Feqe, bi ser taxa Gundikremoyan re bi gavên bez hawaket û li derê çadira asayîşê sekinî. Riza, di hundirê çadirê de bikerb taxivî û qêra wî di dola rexê de vedida. Piştî Ehmedê Îsa yê Mijinî û çend xizmên xwe erz şkestî ji çadirê derketin, Feqe ket di hundir de. Bi awayek bêhn veşirî silavek da û ji Riza yê qet ji rûyê wî yê tirş dibarin re got;

“Heval, ez dixwazim herim çiyê!”

Riza ji acizî beşişî got;

“Bawer bike Hevalê Feqe, ji her kesî bêhtir ez dixwazim herim çiyê. Ema bi dest min nakeve. Di nav vê qir û qiyametê de tuyê me bihêlî û bi kû ve herî?”

“Heval, ez we baş fêhm dikim û ya hûn dibêjin raste ema, divê ez herim!”

Riza li rûyê Feqêyê li ber tava Qereçox kelpitî û dewsên xwêhdana şor zivirîn rêkên kerhvanan nêrî. Çavên wî yên tijî xwêhdan sohr bibûn û kîn barkirîbûn. Şopên hêstirên rijandîn hê jî li ser gurmikên kelpîtî diyarbûn. Hej Feqe dikir Riza û ew baş nasdikir; dizanî heke pir ne pêwîstebe ya rêkxistin pêkan nebîne Feqe naxweze û xwe na pesêre. Keserek kûr kişand û bê dilê xwe got;

“Jixwe îşev ref diçe û tu jî rêberî. Piştî we ref gihand binecihê tu ne zivire.”

***

Çileyê havînêbû. Roja sê, çar werîsan bilind bûyî hê ne gihatibû cihê danûpezan. Herkû rojan berbi nîriyê havînê ve hev tajotin germahiya tîrojên wan tûjtir dibûn û rêvanên li qontara Qereçox bicêhbûyîn dijwartir dihingavtin. Seyîdê Nisêbûnî yê çadira xwe li ser bilindahiya li tenişta Başûrê germavê vedayî, li ser kursiyê

xwe yê plastîk rûniiştibû û keyfa wê roja kêm ba û kêm toz dertêxist. Malbata fer ya Nisêbûnî û li wargehê Seyît bû û kursiyê plastîkê fer yê di wargehê de jî niha di bin zilamê kelaş gir, keçel û deng bilind de bû. Zarokên xas û di nav tozê de reng guhertin kom bibûn û bi balkêştî li kursiyê ji salan re meydan xwendî û wekî wan zarokan wî jî rengê xwe wundakirî dinêrîn. Maraqa di çavên zarokan de ji bala zelamê reş û di encama rasthatinekî de tevlî wî karwanî bûyî ne direvî û bidengek bilind dikenî.

Hûr û gir, jin û mêrên Nêrwehiyan li dûv tangêra avê ya nû ji mala Xelîl Denîz bûrî ketibûn û heşir bixwebû. Erkdarê avê Mesudê Kor, hewl dide xortimê ji nav lepên Nêrwehiyan xilas bike û behra taxa Mijiyan bigihîne wan. Li ser berxwedana erkdarê kor û perixî mirovên li dûv tangêrê dibezin zivirîbûn ema, Simê Şîro û Teyrikê Nêrwehî xurtom bernedidan û dijûnên giran ji Mijîniyan re dikirin. Tangêra destekî zincar li ser kelaşê wê stûr bûyî, li derê mala Cemalê Gewdî ket di nav jinên Mijîniyan yên ji sibehî ve rêz girtîn de. Ema, niyeta berdena xurtomê ya Simê Şîroyê yêxtiyar, qam qut, perixî û bedena wî di navbera şalwar û şaşikê de wundabûyî tinebû. Teyrikê bejin dirêj çavek yê wî kor û hewtikê çav jî dadayî, di parastina gundiyê xwe de çik rawestabû.

Xano ya Medo jinek yêxtiyar, gir û azbû. Hevjîna Haciyê Şêxê yê Mijînî bû. Jina sêlm pesartî heftêyê hew xwe girt; stûna li derê kolika Melekê Mijinî rakir û got;

“Wa.. Teyro, wa.. Simo, xwe bigrin ez hatim” û êrîşkir! Stûna stûr di destê jina yêxtiyar de ji hewa ve dilerizî û her du zelamên Nêrwehî tifkirin binê lingên xwe û revîn.

Hê şerê jinên Mijînyan û zelamên Nêrwehiyan nû qedabû, tirimpêla cemedê ji wan bûrî û li raser germavê sekinî. Şêniyên sê, çar taxan li dora tirimpêla kevin kombûn û her kesî baş dizanî, cemeda di tirimpêlê de têra nîvê wan jî nake. Yên çaryêka qalibek cemed bi dest êxistîn li nav paçekî dipêçan, bi ber singa xwe ve hişk dişidînin û bi şadîtiyek bê pênase bi ber mala xwe ve dibezîn. Cemeda heyî, têra ji çaran yêkê kesên hazir nedikir. Ji bû qetek cemeda wekî lûleyek xiloxe û dar û berên Mexmûr di nav xwe de di hevîne, bi diravên xwe bikirin hewlek bê eman dimezaxtin. Yên xwe ne gihandîn cemedê gazindên tûj dikirin û agir dibarandin ser erkdarê şarevaniyê yê çavşeqitî. Mehmûdê Zêwkî yê armanca tîrên gazindan, xwê dixwar û av tinebû di ser de bike. Bi devoka xweya xas dijûn dikirin xwe û kefşîl û xwêhdan di cirnikê çavê şeqitî de bibû peng. Sadiqê Evdalê Mijînî, bi arîkariya bejna xwe ya dirêj qetek cemed ji destê Mehmût girt, dused û pêncî dînarê sixte yên Sedam raberkir û cemeda di destê xwe de nîşa mirovên derdorkir û gotina xwe ji Mehmût re rêkirin;

“Çima nîvê vê cemedê kune hevalê Mehmût? Dilxwede hûn bi niyeta çaryêka qalibekî difiroşin me ema, çaryêka çaryêkê jî nîne.”

Mehmûdê ji êvarî ve di dora cemedê de bê xew mayî û şeqta çavê wî yê şeqitî mezintir bûyî bi dengek aciz bersiv da;

“Hevalê Sadiq, ev bidest me ket. Heke qîma te pê nayê ji kerema xwe bide wî camêrê li tenişta xwe.”

Sadiqê li gotina xwe poşman bûyî, cemeda xwe ya jixwe li ber serkeratê, hê bi giştî nehelayî bi gavên sivik bir û berê xwe da kolika xwe.

**Mehmûdê zêwkî** vedibêje;

“Xweza jî di nav de dibêjîqey her tişt li me hatibû xezebê. Roj bîst û çar sihete, toz wekî berfa Kanûnê dibarî. Tenê balgihek li mala me hebû û ew jî ji paç û maçên zarokan hatibû dagirtin. Dilxwede wekû bav û pêşkêşê malê ew balgeh, min têxista di bin serê xwe de. Dema sibha hişyar dibûm, wêneyê cihê serê min li ser balgih çêdibû û li dora wêne çar tiliyan toz bilind dibû. Ba dibû bager, bager dibû bahoz, bahoz dibû badev û divegara bisedan bablîsokan û li nav pertalên bê parastin diket.

PDK ya mala Berzanî, bi rêya aligirên xwe yên ji Mexmûr tevna revandina mirovên wargehê avakiribû. Ne tenê didan revandin, bi rêya wan kesên sist re bê huzûriyek mezin didan çêkirin. Li aliyê din, ji tirsa wan ti Mexmûriyan newêrî qeda me biqedîne. Her Mexmûrî di heman demê de Hewlêrîbû û dema peşkek av jî dida me li Hewlêr dihat girtin. Dîsa heman hêzê bi rêya bertîlê rayedarên Êraqê jî bandor dikirin û hemî daxwazên me yên jiyanî an ne tanîn an jî dereng dihiştin. Jixwe rayedarên UNHCR serbarbûn.

Piştî em hatîn Mexmûr roja duyabû. Wekû saziya şarevaniyê Hevalê Riza em li ser girikê derê mala Egîdê Se’do komkirin û got;

“Hûn saziya şarevaniyêne. Av, ceyran û binesaziya wargehê aydê we ye. Hûn çi dikin bikin, divê hûn bi awayek rûspî ji bin vî barî derkevin” û di dawiya axaftina xwe ya kurt de lêkir;

“Divê hûn debara saziya xwe jî bikin û ti diravan ji rêxistinê nexwazin.”

Ne kolik, ne çadir û ne jî cihek yê meyê kifşkirî hebû. Û ne av hebû, ne jî starek mirov di bin de were hemandin. Piranî malbatan, an nalyonek hişîn an jî ya spiya tenik vedabûn. Darek êxistibûn di bin nîvê nalyonê de, keviyên wê kuçkiribûn û bi wî awayî zarokên xwe ji tozê diparastin. Jixwe bagera dijwar piraniya wan nalyonan jî qetandibûn û terîşên wan jî ji zû ve bi singa Qereçox ve zeliqandibûn.

Piştî hatina me hefteyekî Xaça sohra Êraqê, serê malbatê pênc ta dar, pênc hesîr û qevdek têl anî. Tiştên anîn ligel hatin belavkin û her malbatê bi wan tiştan ji xwe re kolikek çêkir. Wekû sazî, me jî li binê semta du kolikek çêkir û êdî navnîşanek ya me ya

diyar jî çêbibû.

Piştî hatina daran deh rojekî komîteya karê jiderve ji me re got; "UNHCR, dixwaze ji me re çadiran bîne. Ka lêkolînekî bikin, çiqas mal bê çadirin."

Li ser daxwaza wan me komîsyonek avakir û encamê komîsyona mijara gotinê ji me re anî ev bû; Bi giştî wargeh ji 1112 malan pêktdihat. Ji van malbatan 182 xweyî çadirbûn, 304 serpoşkek ya wa ya çadirê hebû û 626 malbatên mayîn jî an qetek nalyon hebûn û an jî qet tiştek tinebûn. Piştî wê du rojan rayedarên UNHCR şêst û du çadirên piraniya wan qetayîn û dibêjîqey di nav heriyê de hatine stirhan anîn û avêtin derê kolika me.

Ji bû belavkirina çadirên kelaşên wan şkêrikî avêtîn ser hev rêvebertiyê, ji wargehê komîsyonek ya rêhspiyan avakir. Komîsyona mijara gotinê her çadir, weke çadir û serpoşk kir du parçe û li 124 malên qet tiştek yê wan nîne belavkirin. Çadirek bê serpoşk ji behra saziya me re jî ketibû û me çadira xwe liber devê kolika xwe veda. Jixwe heta hingê em çavnasî derdor bibûn û herkesî bi tirimpêlên ji gundên derdor kirêkirîn ji ber Ava Dîcle dar û çilo dikişandin.

Bi awayekî pirsgirêka hewandinê dihat çareserkirin ema, av pirsgirêkek mezin û jiyanîbû. Deh rojên destpêkê me bi ava germavê îdarekir. Ama avek tehl, tîr, debûş û giranbû. Bi sabûnê kef nedida ema, dema dihat kelandin kefek spî û tîr biser diket. Dema dihat dagirtin zelalbû, piştî kêmekî wekî qîrê lê dihat û firaxa di tê de jî dilewitand. Firaxan xwe liber ne digirt û dirizandin. Ew ava di cêh de firaxên hêsin dirizandin, çi ji hinavên mirovan dikir tu bihesibîne.

Carnan leşkerên Êraqê rojê yêk, du tangêrên piçûk av tanîn ema, ew jî ji qenciyê zêdetir dibû sebebê xirabûnê. Bi hewldana komîteya karê jiderve û bi teybet ya hevalê Riza, piştî mehekî Xaça Sohra Êraqê qebûlkir kû tuwaletan çêke û rojê dazdeh tangêr av bîne. Av ji Mûsil tanîn û rê dûrbû. Ava dabaşa gotinê di wan tangêrên lewitî de dikelî. Ji bû gel bikaribe wê avê vexwe pêwîstî bi cemedê hebû. Di rastiyê de, di aliyê cemedê de firsetek ket di destê me de ema, me kêmasî kir û ew firset revand. Di nav deh rojên destpêkê de Selîmê Ehmedê Xatoyê Nêrwehî, Muhemedê Pîranî û çend kesên din bi rêya nasên xweyên Mûsîl ji karxaneyek ya cemedê her roj pêncsed qalibên cemedê tanîn wargehê. Qalibên az û tijî, bi çarsed dînarên Sedam dikirîn, didan pênc sedî û bêşa şarevaniyê jî di nav de. Rojekî hatin û ji me re gotin;

"Karxane dixwaze heta peyîzê bi me re peymanê çêke. Ligor peymana were çêkirin; divê em her roj ji karxanê pênc sed qalib cemed bikirin û dixwazin ji buhayê heyî serê qalibê sed dînar jî zêde bikin."

Em hizirîn, keysê xwe li me anîne û dixwazin me bixapînin.

Heke em xwe giran bikin û di buhayê kevin de israr bikin yê qebûl bikin. Piştî me bi neyînî bersiva karxanê da, êdî cemed nedan me. Piştî wê ji buhayê xwestîn zêdetir jî me teklîfkir ema, nepejirandin.

Tu nebêjî me rewşa heyî şaş şîrovekirîbû. Hema bibêje li welatê Êraqê qet ceyran tinebû û girêdayî vê pêwîstiya her kesî biqasî ya me bi cemedê hebû. Ji berkû ceyran tinebû, karxane pir kêm dixebitîn û jixwe wekî her tiştî xelaya cemedê jî lidarbû. Piştî wê em li hemî karxaneyên Mûsil û Kerkûk geran û tu kesî cemed neda me.

Li navçeya Mexmûr aşek piçûk yê cemedê hebû. Bi zexta rayedarên Êraqê qebûlkirin kû rojê dused qaliban bidin me ema, heke em bikevin di dorê de. Di heman demê de koçber jî di êvar de li derê kolikên semtan diketin di dorê de.

Ji berkû karxane piçûkbû, daxwaz zêdebû û ceyran lewazbû; cemeda nîv çêbûyî derdixistin û didan me. Nîvê qaliban kun dima û tenê tuşik li derdor cemedbû. Me dused qalib li ser çar semtan belav dikirin. Pêncî qalibên ji semtekî re diketin, têxistin çar qet û çaryêk difirotan dused û pêncî dînaran. Ema ji nîvî zêde kesên ji êvarî ve, li derê kolika semtê, di nav wê toz û dûmanê de ketîn di dorê de cemed ne digirtin û bê cemed di ser zarokên xwe de dizivirîn. Ya hê xirabtir, pir malbatên dused û pêncî dînarên wan jî tine hebûn û jixwe wan qet hewla kirînê jî ne didan.

Bi giştî em yazdeh kes endamê şarevaniyêbûn. Polatê Çelî, ji kordînasyonê berpirsê giştîbû. Ez, Şêxmûsê spêrtî, Sedîq û Xelîlê Hevlerî, Evdo Xwisirî, Simalê Rimedan, Eliyê Behdir û Hesenê Egîdê Hîlalî, Hacî Ehmedê Silopî, Elî yê Nêrwehî û Behlûlê Avyanî bûn. Me wekû komîteyên avê, elektrîk û binesaziyê xwe rêkxistin kiribû ema, bê veqetandin em hemî bi av û cemedê ve mijûlbûn. Qet ji bîra min naçe; danê sibehek bê bagerbû û ez û Simalê Rimedan li saziyêbûn. Me dît Hesenê Egîd, ji jor ve tê û şil û pile. Bi awayek bêhveşirî got;

“Pîrekan hevalên me qelandin!”

Em bi hev re bezîn û çûn çar rêya binê navenda hevalê Riza. Em çi bibînin; hemî endamên şarevantiyê û jinên nîvê wargehê ketine di nav hev de. Jinan, serê du hevalên me şkandine û qiyamete. Me kir û nekir me nikarî em dora jinan rast bikin û me endamên şarevantiyê xwe da hev û berê xwe da kolika Hevalê Riza. Jixwe kolika wî bi ser me re bû û pir nêzîkbû. Dema me xwe ji nav koma jinan xilas kir, me dît hevalê Riza li derê kolika xwe jipiya sekiniye û tiq tiqa wî ye bi me dikene. Dizanî em pir acizbûne û hê em negihatîn cem got;

“Hûn çima karê xwe baş nakin” û bi gotina xwe re jî dikenî.

Em jipiya rêzbûn û me got;

“Em nikarin vî karî bikin û em dixwazin îstîfa bikin.”

Hevalê Riza, hê jî dibeşişî ema êdî gotinên wî mucid derdiketin;

"Tehmûl ji hejêkirinê tê, rêxistin zanetiyê dixwaze. Heke hûn nikarin xwe rêxistin bikin û tehemûla hevjîn û keçên xwe bikin wê demê çi karê we li van deran heye?" got û bi rêzê ve li hundirê çavên me nêrî.

Me serê xwe berda ber xwe û em zivirîn saziya xwe."

***

Ruh enerjiye û enerjî herikdare. Her tişt candare û laş qalikê parastina wê enerjiyê ye. Felek, feza û tevayê gerdûnê ji wê enerjiyê pêktên. Heta ruh bilive, enerjî biherike û lepta lebetan dewam bike jiyana her rêya xwe peyda bike. Aha çîroka jiyana serhildanvanên li qontara Rojavyê Qereçok qerasebûyîn, ji vê sêtiyê pêkdihat.

Enerjiya dikara wê tê kirin, di nav heriya toza bi xwêhdanê hatî stirhan de digevizî. Digevizî ema, niyeta wê ya tobekirinê jî tinebû û bê minet desthiltanî. Li rêyek ya serkeftinê digera û şev û roj tebat pê nediket. Wî ruhî; kedkartiya gayê coht, berxwedanvantiya deveha sehrayê, hêzdartiya şêrê daristanê, rehwaltiya pilingê beriyê û nazdartiya kevoka spî ji zû ve li dûv xwe hiştibû. Coyên exlaq û polîtîkaya Stiyên zemanê Berpenîr, li qontara Qereçoxê keçel gihatibûn hev. Pengdabû, bibû sikir û li erdek zexim digera. Li dijî enerjiyê Stiyên Berpenîr xwidayên tarîtiyê binûker û xwilamên xwe ve daketibûn meydanan. Bend li ser bendan avadikirin û ji bû enerjiya Rojyaran di serkehniyê de bifetisînin hewlek awerte dimezaxtin. Dijber bihêzbûn ema, ya encam kifş dike ne hêza tarîtiyê, tirûska fer ya berxwedanvanên evînê ye.

Li qontara Qereçox rojan hev tajotin û di eksena xwe de vegera cîhanê dewam dikir. Koçerên di duryana berfa sohr de asê mayîn şaqistiya rojên destpêkê ji ser xwe avêtibûn ema, di navbera mayîn û nemanê de diperpitîn. Di bin derbên mîrên tarîtiyê de kerixîbûn. Jiyan li wan bibû bela û şebikîbûn. Şewibibûn û ava Dîcle jî têhna wan ne dişikand. Li hêlûnek azad digeran û ji bû xwe ji nav pencên zalim û nûkerên wan rizgar bikin hezar û yêk rê diceribandin.

Biser hifdehîm salvegera bîranîna Rojiya Mirinê re nû hefteyek derbaz bibû. Zû sibehek ya rojek kêm babû. Li ser pesartina rayedarên Êraqê û pejirandina rêvebertiya wargehê neqla yêkem ya ji Nehdaran hatî cihê xwe berdabû û berbi dawiya Semta yêk ve bar dikir. Rûniştvanên semtên din jî bi hewara wan ve gihatibûn. Hinan bipiştiyan û qismekî jî tirimpêlên ji Memxûriyan kirêkirîn malên xwe dikişînin dawiya semta yêk. Jiberkû cihê lê danîn li ser ava

germavêbû, nêzîkê bajarê Mexmûr û ji hemiyan girîngtir jî bibaskî welatê mayî ve bû ne dixwestin barbikin. Jibû cihê xweyê dilxwede mêrg bernedin û berbi qeracê zuwa ve ne vekişên, di navbera wan û rêvebertiya wargehê de berxwedanek bê eman ajotibû. Ema Sebriyê Ker, pîvana welatparêztiyê wekû barkirinê kifşkiribû û vî qewlî berxwedanvan ji desthilanîn êxistibûn. Yên jixwe fihêt bi hewarî malên xwe ber bi dawiya semta yêk ve dikişandin. Ema qismek koçberên li Bakurê cûya germavê bicêhbûyîn, hê jî li berxwe didan û di mayînê de bibiryarbûn.

Rayedarên Êraqê digotin; "evder milkê gelê Mexmûr re û divê hûn xwe ji nav bikişînin erdên beyar." Rayedarên UNHCR jî pesartina xwe ya; "nabe wargehek ya koçberan evqas nêzîkê cihek yê cêhbûyînê be û heke hûn xwe ne vekişînin emê xwe ji nav we bikişînin" bi awayek bê navber tajotin. Qismek Mexmûriyên PDK'ê rêxistin kirîn û milkên wan di nav koçberan de mayîn, ji hêlwesta rayedarên navbûrî cesaret digirtin û şev roj koçber tacîz dikirin. Ew demekbû Riza ne li wargehê û rêvebertiya Sebriyê Ker serkêşiya wê dikir, stoye xwe ji pesartinên dabaşa gotinê re tewandibû. Sebrî, li ser girikê derbenda ketina wargehê, li cem nobedar rûniştibû û bi turkî digot;

"Heke hûn bar nekin, ezê li vêdê bikevim rojiya mirinê û wekî kerekî bimrim!"

Ji xebatkarên şarevaniyê Şêxmûsê Spêrtî û Simalê Rimedanê Hîlalî, li pêşya nobedarê derbendê sekinîbûn. Bazarvanên bi motorokên sê tekel tiştan ji Mexmûr dikişînin li pêşya bêşvanên şarevaniyê rêz bibûn. Bêşvanan, bi awayek tosin sewze û tiştên din yê bazarvanan bi çavre derbaz dikirin, buhayê wan kifş dikirin û serê dukandar wekû bêşa şarevaniyê dused û pêncî dînarê sixte ji wan distandin. Qerebalixa dukandaran li ser ya Sebriyê Ker diket û li hember bêşa şarewaniyê rabibûn serhildanê. Mehmûdê şêwêdî, bi awayek aciz dused û pêncî dînarên qetayî êxistin di destê Simal de û got;

"Ev ne exlaqê PKK'ê ye. Soza xwidê be, heta bi Serokatiyê ez gilhê we bikim. Ka bila hevalê Riza were."

Simalê di nav qêr û ne razîbûyîna dukandaran de gêj bûyî û xwêhdanek tîr ji serê pozê wî yê çelak diherike, bi heman aciziyê bersiv da;

"Ma bi niyeta feydekirinê bazarvantî exlaqê PKK'ê ye?"

Li ser gotina Simal, Bişarê Şiwêdiyê bostek qirêj li ser qemçika wî stûr bûyî xwe avêt holê û bi hêlwestek tevzdar tevlî gotûbêjê bû;

"Em xizmeta gel dikin hevalê Simal. Heke ne ji mebe ev gelê ji têhna bifetise."

Sofî Miho yê Mijînî, denek yê avê li matorokek sê tekel bakiribû û ew jî di nav koma dukandar û bazarvanan de rawestabû. Bi gotina Bişar re xwe di nav komê re kir, hat û li tenişta Simal sekinî. Dûvikê kuplê xwe rakir û baskî tirimpêla cemed barkirî ve kir û got;

"Mamo, tuyê qalibê cemedê bifroşî bi çendê?"

Bişar, bi sond û selewatan ve çû û bersiv da;

"Me ji Mûsil bi yazdeh hezaran kiriye û em neçarin mesrefa xwe jî lêbikin!"

Li ser hêjmara Bişar kifşkirî çavên hemî kesên li wêdê ji şaqistî fireh bibûn. Bê hemd, firîziyek dirêj ji devê Melekê Mijînî rija û bi acizî got;

"Wijdan bikin, wijdan! Ev mirov, di bin vê germa dojehî de heta êvarî li vê deşta xarê bi hezar dînarî ji ereban re silkên sohr kom dikin û tu qalibek cemeda xilole difiroşî wan bi dazdeh hezaran! Ev keys û fesale. Eybe, şerme û gunehe."

Sofî Miho yê qam qut û di ser hev de dewisî, gotin ji devê Melekê gundiyê xwe girt, dûvê kupalê xwe bibaskî denê dimîne kûzek yê divsê ve kir û got;

"Dewra we xilas mamo. Ev denê buhayê wî du hezar dînar, avê wekî qeşayê lê dike."

Hê gotûbêja xebatkarên şarevantiyê û bazarvanên keysvan ne qedayî deng bi nav malan ketibû û her kes ber bi hundirê wargehê ve dibezî. Sebriyê Ker jî dest ji rojiya mirinê berdabû û li nav mirovên dibezin ketibû. Du tirmpêlên jeep û li ser teniştên wan UN nivîsandîn, li derê mala Salhê Heyderê Repinî rawestabûn. Komek boş ya koçberan dor li tirimpêlên UNHCR girtibû û ne dihiştin bi lepitin. Rêvebirê UNHCR Boşmanê çav kunî kunî, di pêşiya tirimpêlê de ji tirsa dilerizî û bi rêya wergervanê xwe yê Soran dikara qanûnên komîsertiya bilind ya mihacarn dikir. Salhê Heyderê por hişîn û zarokên xwe li ser kursiyên li pişt Boşman wekî gulotanekî xwe dabûn hev û awirên wan şekestîbûn.

Yadê Fatê ya gundiyê Saleh, xwe bi nav koma mirovan re kir, hat û xwest deriyê tirimpêlê veke. Deriyê miftekirî venebû. Dûvê darê ji bû şer anî bi rasta serê Saleh re li cama tirimpêla da û got;

"Firşkê te ji xiyanetê ye. Tu qurbana rehma Serok Apo bî! Nîxwe ma tu yê sax hiştinê bû."

Jina qam qut, rû şîrîn û temenê wê bi ser navsertiyê re yêxtiyar; berê xwe da gel û êdî diqêrî;

"Hûn vî rizîlî, vî bêbextî dibînin? Ev xayîn, li gundê Repin serok çetebû. Hevalan di çepera şer de esîr girt, efo kirin û anîn qampê Nînûva kirin mezinê me! Kengê li qona wî tengbû, dîsa diravên qurocîtiyê hatin bîrê û niha dîsa yê here û zarokên me bikuje!"

Yadê Fatê ya ji qehra rûyê wî yê girover wekî lîlozê lê hatî û tipkên kefê wekî taviya heyva Gulanê ji nav pidûyên bê dinan dibeyên, di dawî de nav li girseyê da û got;

“De li wan bidin, qurbana zend û bendên ciwananbim.”

Tam dema Yadê nav li ciwanan dida û girseya li derdor kuçên di destên xwe de li hev didan, wergervanê rêvebirê UNHCR bi milê yadê re girt û xwest laveyên Boşman jê re wergerîne. Tirsek şermdar li îçavên zilamê rûsar hatibû barkirin û dixwest tiştekî ji ya dê re bibêje. Ema jina kerp şewitî rê nedayê. Tifkir nav çavên wergervan û bihêrs got;

“Îbnî sitiyn kelba (kurê şêst seyan).”

Yadê Fatê, erebî dijûn kiribûn û ev bibû sebeb kû rûyên tirş bikenîne. Şehbazê Nêrehî yê hema bibêje bitenga Fatê re û sikeyê kopalê wî ji hewa ve dilerize bitinazî got;

“Fatê, ew bê namûs Erebî nizane. Bi Ingilîzî bêje, Ingilîzî.”

Û tîr ji kevan derketibû. Wekî taviya teyroka biharê kuç dibarîn ser tirimpêlên buhadar. Ajotvananan tirimpêl ajotin ser girseyê û hewldan birevin. Dibêjîqey ji girtina Saleh zêdetir, girseya koçberan peyam dida rayedarên UNHCR û dixwestin wan bitirsînin. Tirimpêl revîn û gel da dûv. Tam dema tirimpêlên di bin kuçên koçberan de bûyîn qafik û di nav tozê de wunda dibûn, Rizgarê Behdînî yê ew demek dirêjbû karmedê UNHCR, bi pê re ne gihatî li tirimpêlan siwar bibe û bi deşta jêr ve bazda. Vê carê jî girse qulibî pey Rizgar û dibin barana kuçan de hiştin. Ciwanan, karmendê xwîn ji sera diherike heta bi cem leşkerên Êraqê yên li deşta jêr ajotibûn.

***

Nîvê şevek ya dawiya meha Tirê bû. Dora nobeta parastina zîndanê ya taxima Tahirê Osmanê Hîlalî bû. Tahir û hemsalê xwe Kamîranê mamosta ji mala Tahir derketin ser cadê. Bi navbera mala Rimezanê Gozareşî û Behlûlê Avyanî re daketin û bi ber tangêra avê ya li sê rêya semta yêk sekinî re bûrîn. Qêr û qelebalix û teqereqa tenekeyên jinên av dadigirtin di singa Qereçox de vedida. Her du xortên zirav, bejin û balan wan heman û hema bibêje nû sêlm pesartîn bîstê ji tangêra avê derbazbûn û di navbera mala Mehmûdê Teyî û Dehamê Avyanî re rêya xwe ajotin. Dema bi ber mala Emerê Batûyî re derbaz dibûn, Kamîran li dîwarê bi kursiyên necarindîn û bi hostatiyek tosin du rêz bilindkirîn û rêza sêyem bê betan nêrî û got;

“Helal be ji xêret û kedkartiya vî zelamî re. Heke li malbûya niha qesrek navdar avakiribû.”

Tahir, keserek kûr kişand û bi dengek kuldar ema nivz bersiv

da;

“Emer şehît ketiye!”

Bigotina Tahir re Kamîran di cihê xwe de qerisî û çavên xwe pesartin çavên Tahir yên li erdê dinêrin û bidengek şaqis pirskir;

“Çawa, kengê, li kûdê?”

“Ji berya hefteyekî. Ema xeber nû hatiye û hê malbat jî nizane. Dema ji Gara dizivirîn, di navbera çiyayê Xêra û Gara de dikevin kemîna Pêşmergeyên PDK’ê.”

Li derê mala Kubara Cinibrî, tirimpêla Elî Filis li ber wan da û bûrî. Wekî tirimpêl bi lezek mezin li nav golek av bide; pejaqên toza ji ber tekerên tirimpêla pir hêdîka diçû bilindbûn û di nav ser û guhên wan de hat xar. Toza tîr, sohbeta wan qutkir û ji bû xwe ji nav toza gewr xilas bikin leza lingên xwe kirin.

Li duryana semta yêk û du ji hev vediqetîne sê, çar zelam li Evdurehmanê Hîlalî kom bibûn û hemî bi hev re û bidengê bilind bi gotinên yêxtiyarê tijî jiyan û henekvan dikenîn. Emerê bîçerê Dudêrî, pala xwe dabû xaniyê xwirî kuç yê nû hatî çêkirin û biqêr dikenî. Piştî xaniyê Riza, xaniyê kuç û kamil hatî çêkirin yê Ebdurehman bû û di nav kolik û çadiran de wekî Birca Belek dixwiya.

Her du heval, bi gavên giran ji kuçika Evdurehman bûrîn û bi derê mala Haciyê Teter re derbazbûn.  Wekî kêlatekî Mehmûdê Zêwkî, li derê çadira şarevaniyê sekinîbû. Silavek li zelamê heriya xwêhdanê bi rûyê wî yê pehn ve ditesyîse dan û piştî vedana silavê Kamîran, bi kubartiya xwe ya her demî got;

“We vê nîv şevê xêre mamê Mehmût? Işileh neyîntiyek nîne?”

Hê Mehmût bersiva pirsa Kamîran nedabû, dewriya jinên asayîşê ya ji Moma bûka Mele Tewfîq û ji Nefîse ya hevjîna Şehît Şervanê Dêrşewî pêkdihatin li wan sekinîn. Momê, bi awayek bêhnveşirî got;

“Mamosta, jixwe em li we digerêne. Hevalê Riza dixwest we bibîne.”

Bigotina Momê re her du ciwan birêketin û birêketinê re Mehmût bi dengek bisîtem û ganzind barkirî bersiva pirsa Kamîran da.

“Mane ev seyîtiya me ya her şeve Mamosta. Divê em demjimar du yê şevê li aşê cemedê bikevin di dorê de. Ez çaverêyî Şêxmûsê Spêrtîme. Xweidê ji wî jî razî be, hingî bêhna wî firehe heta ji mal derdikeve mirov dibeicîne.”

Her du ciwanên cilên wan yên Bohtanî ji tozê reng guhertîn û gora rîs di pêlavên meqab de ji xwêhdanê şil biyîn, bigotinên Mehmût beşişîn û berê xwe dan rêya nexweşxaneya Doktor Medya Alemanî.

Hê ne gihatibûn derê çadira nexwşxaneyê. Misînik di destan de û bi awayek hişk binavrana şalê xwe re girtî Seîdê Xirabreşkî, berbi tuwaletê ve dibezî. Zelamê tengehal û mehwera wî nemayî xwe li deriyê qetayî ya tuwaleta nalyon da û ket hundir. Jixwe ji her neh, deh malan re tuwaletek nalyona çar çavik çêkiribûn û pişta her du çavikan li hevbûn. Malên aydê wan tuwaletan, du çavik ji jinan re û du jî ji mêran re veqetandibûn.

Hê Tahir bi zelamê yêxtiyar dikenî, qerebalixek li derê nexweşxaneyê xwirimîbû. Muhemedê Mijinî yê li Eyaletê birûskê lê dayî û piştî wê her nesax, bi arîkariya du kesan di eywana di navbera her du çadirên nexwaşxaneyê de biqêr taxivî;

"Mamo, ez hej ferq û cudatiyê nakim. PKK, ferqû cudatiyê qebûl nake. Hûn evên tinezan hîlan li me dikin" got û xwe ji tenduristvanê melûl re dicircirand.

Pênc, şeş lib hebikên spî di kaxezek kovîkî de, di destan de Evdila yê Şivanê Şewî, şaqis û bi rûyek şermdar bersiva zilamê nesax da;

"Mamê Muhemet, ma me çi ferq û cudatî kirî ye, derfetên me evin."

Nesaxê şaşikek xilole di ser guhan de hatî xar, xwe bihêrs ji nav lepên her du ciwanên wî jipiya digrin rizgarkir, dûvêkê kupalê xwe li ber lingê Evdila da û hêrsdar got;

"Derfet ne, derfet! Derfet hene, hûn hebikên sohr bidin Hilaliyan û yên spî jî bidin me rebenên Mijînyan!"

Dilê tenduristvanê merema aciziya Mamo nû fêhmkirî rihet bibû û êdî diber xwe de jidil dibeşişî.

Tahirê di deriyê eywanê de guhdarî gotûbêja mamo û tenduristvanê ecemî dike, xwe ne girt û bideng kenî. Ji bû nexweşê jixwe aciz dengê wî ne bihîze, Kamîranê şermokî Tahir tehf da û bipaş ve kişand rexa paş ya çadirê. Dema lixwe zivirîn, çavên Kamîran li derê tuwaletê ket. Di heman demê de Seîdê xwe rihetkirî û vê carê jî doxîna şal di destan de deriyê tuwaletê vekir û bivekirinê re veciniqî. Sê, çar keç û jin li ber deriyê mamê Seîd vekirî di dorê de sekinîbûn. Jinên li hêviya derketina jinekî û di şûna wê de bi depê singa pehn ya Seîdê Xirapreşkî re rû birû mayîn bideng dikenîn. Zelamê gir û temandar hetikîbû. Çavên xwe noqandin û xwe avêt. Dema zelamê ji bê mehwerî ketî di tuwaleta jinan de, ji rêza jinan bûrî di berxwe de ema, bidengek bilind got;

"Qedap bi me bike ve, kuro qey ev hale!"

Muhemê Bilehiyê nû gihatî hindama wan, wekî bersiva Seîd bide got;

"Ji halê xwe re şukirdarbin hevalê Seîd. Nalyon jî be, qet nebe cihek yê weyê destavê heye. Ya me ew jî nîne."

Seîd, bi dengê xwe yê stûr û pêl gotinan dike bersiva Muhemeê komîte da;

"Hevalê Muheme, ji xêra xwidê re, ji mîrê muradan re me jî tinebûya. Ev hetik û helak ne dihat serê me lo..."

Kamîranê fihêtokî, Tahirê ji kena zik û pişt dibe da ber lekman û gihatin hindama mala Seîdê Cizîrî. Li rexa jêr ya mala dikarkirî rêzek dirêj ya zelaman li derê kulika semtê li dûv hev rûniştibûn. Muhemedê Evdo yê Hîlalî û kurê xwe Casim jipiyabûn û ji bû dora cemeda siba devjeniyek sik dikirin. Zelamê yêxtiyar, Mustefa yê Feteh wekû şahid nîşan dikir û bisond û selawat ji kurê xwe re digot;

"Dema ez hatîm vêdê, hê wirarên te jî li van deran ne dixwiyan."

Kamîran, kir nirçe nirc û wekî bixwaze wî dîmenî zû jibîr bike beşişî û got;

"Hevalê Riza, ti xwelîdankan li me jî wer neke?"

Tahirê kenê wî nû şemirî got;

"Xwelîdankên çi?"

"Tu pê nehesayî?"

"Na!"

Bihêlwestek qure û wekî bixwaze di nav ewqas neyîntiyan de wê hêlwestê di navenda mejiyê xwe de bicêh bike û bi şêwazek veqetîndar dest bi vegotinê kir;

"Te dît, ev demekbû hevalê Riza ne li wargehêbû. Di vê navberê de Ebû Minafiq û Boşmanê rêvebirê helefa ling didin ser rêvebertiya wargehê û dibêjin;

"Yan hûnê qismê koçberên mayîn li Bakurê coya germavê jî derbazî aliyê din bikin, yan jî em nahêlin ti xizmet ji wan re were kirin û emê qûtê wan jî bibirin. Û camêran gefa xwe di kirinê de jî pêktînin. Tuwaletan ji wan re çênakin û nahêlin tangêrên avê jî herin nav wan. Li ser van gefan, Sebriyê Kerê xwelîser jî xwe tavêje û diçe semta çar. Gel kom dike û dibêje; "ev fermana rêxistinê ye, yên mala xwe derbazî Başûrê coyê nekin ne welatparêzin."

Li ser gotina Sebrî, erkdar û qismek rûniştvanên jixwe fihêt, malên du mehe bi çi kul û halî anîn rewşa rûniştinê xira dikin û berê xwe didin semta yêk. Yên birû û di nehatinê de bibiryar jî radibin pêdarê û ev mehekbû şerê wan û Sebriyê Ker. Hevalê Riza pêr tê û rêvebertiya Semta çar, jê re dikara vê meseleyê dike. Jixwe hetka Sebrî dibe û ji erk têxe."

Tahirê şev û roj di nobetê de û haya wî zêde ji wan nûçeyan nîne axaftina Kamîran birî û bi dengek şad got;

"Yanî niha em û Sebriyê Ker ji hev xilas?"

"Bawerim wusaye!"

“Ê.. ka zû bêje Kamîran! Nûçeyên şadker li cem tene. Min hin tiştên seresere bihîstibûn ema, ne evqas veqetîndar.”

“Vêca, Hevalê Riza doh rêdike pey Ebû Minafiq û tîne navenda xwe. Jêre dibêje; “ev çi meseleye, çima hûn wusa dikin?” Zelamê Minafiq jî bi awayek qure bersiv dide û dibêje; “proja me û DY eve. Hûn neçarin biryara me bicêhbûnin!” Û li ser vê hêlwesta Ebû Minafiq, hevalê Riza difûre û dibêje; “Jixwe we em xapandin û avêtin vê dojehê, niha jî projeyên xwe dipeserin me!” Xwelîdanka li pêşya xwe radike û li depê singa wî dide û Ebû Minafiq jî pêlava xwe dihêle û xas direve.”

Bi gotina dawî re Tahir û Kamîran li ber derê xaniyê hê bêhna heriya nû jê bilind dibe sekinîbûn. Di wargehê de xaniyê yêkemîn yê biderî, kulek û biban ewbû û yê duyemîn jî yê Evdurehmanê temendarbû. Di rastiyê de, kesê destpêkê dest bi çêkirina xanî kirî Emerê Batûyî bû. Ema, ji sebeba di rêya Gara de şehît ket, xaniyê destpêkirî nîvçe mabû. Her du ciwan, bi deriyê teneke re ketin eywana piçûk ya guriya lempeya bi dîwar ve daleqandî ronahî dike. Ji Hacî Salehê di mutfaqê de firaxan dişû, bi nîşanên çavan pirsa; “Heval li vêdê ye?” kirin. Dîsa bi nîşanên çavan bersiva ‘erê’ ji Hacî Salehê navser giritin û hêdîka li deriyê tenekeyê odê dan û ketin di hindur de.

Bi hatina ciwanan re Rizayê li ber guriya lempeya şevaq geş pirtûkek stûr dixwîne rabû ser xwe û mêhvanên xwe jipiya pêşwazîkirin. Ji berya xweş-başê Riza beşişî, pirtûka li ser derxwîma wê ‘Perîstank’ dinivîse nîşankir û got;

“Ji bû mirov bikaribe bi hîsiyet û rûmeta xwe ve jipiya bimîne, divê herî kêm kes hingê Feyziya Aloşî dilsoz û biqasî Perîstank rikdar û bibîryar be” û rêvebirê awir tûj û merg nazik ciwan vexwendin rûniştinê.

Pirsên ewlekarî, parastin û nobetê ji Tahir û lêpirsîn û agahiyên girtiyan jî ji Kamîran dikirin Riza. Dema Kamîran û Riza dikara dadgeh, hazirtiyên peletforma girtiyan û encamê lêpirsinê dikirin Tahir, xemla kuçka wî ya nû bi çav re derbaz dikir. Mezela bicesê hatî dûtin, rengek spiyê şebî vedida. Bi nîvê taqê beramber ve pencereyek nîvçe, çavikên wê bi nalyonek paqij hatî girtin û her du çavikên wê vekirî li pêşber rawestabû. Wêneyek mezin yê Rêbertiyê bi raser kulekê ve daleqandîbû. Li milê rastê û kêmekî li jêrê wêne lempeyek gurî zer di şûşeyek paqij de direqisî. Di nîvê taqê li çiyê dinêre de jî kulekek heman biqasî ya din hebû û ew jî vekirîbû. Ji derve ve moxilek hûr her du kulek ji mêş û pişûyan diparastin û keziyên bayê bê toz di nav wê moxilê re dirijan hundir. Li quncikê jor yê mezelê pirtûkxaneyek piçûk û tijî pirtûkên stûr hebû. Zikê banê xaniyê ji girş û hesîran pêkdihat, paçek xweşik û bi tosintiyek

zirav hatî lêdan dinixwimand. Ferşek kevin, tenik ema paqij bi binê mezelê re hatibû rayêxistin. Sê doşekên tenik û şilteyî li her sê rexên mezelê hatibûn danîn û balgihên piçûk li ber dîwaran hatibûn rêzkirin. Di carekî de Tahir xwe di qotiyek ya xeyalan de hîskir û di cêh de Mexmûr jibîrkiribû.

Fermandarê ciwan, bi dengê stûr û sik yê Hacî Saleh ji wê xewna hişyar û rastî veciniqî. Dema di şûşeya mezin û biçembil de ça ji destê Hacî Saleh digirt, peyvên; "mala we pir xweşe" bê hemd ji nav lêhvan rijabûn. Rêvebirê li hêncetekî digera dabaşa çekirina xaniyan veke gotin ji devê Tahir girt, bi dengek kêmek rexnebarkirî got;

"Ji bû gel ji xwe re xayîniyan çeke mû bi zimanê me ve hatin. Ema, herkesî xwe êxistiye di bin nalyonekî de û dibêjîqey çaverêyî mirinek sikin."

Bi hêlwestek fêhêtokî Kamîran tevlî sohbetê bû û got;

"Derfet jî kêmin Heval" û gotina Mamosta rêvebirê cir nexweş rakir jipiya!

Riza rabû serxwe û bi rabûnê re, di navbera serê wî yê li ser bejnek qor û dirêj disekine û singa xanî de bostek nemabû. Heke rabibûya ser serê tiliyên lingên xwe, serê wî yê li girşan biketa. Bidestê xwe singa mezelê nîşankir û axaftina xwe ajot;

"Xaça Sohra Êraqê, biqasî têra xaniyek asayî bike ji me re derî, pencere, girş, têl, hesîr, çîmento û xîz aniye?"

Kamîranê bi rabûna Rêvebir re rabûyî jipiya û di amadebaşiyê de disekine berisva; "Belê heval" da.

"Bilokên ax û kuçên me jî hene?"

"Belê heval."

"Tişta em bikirin çiye, mitrekûpek cese" û li Hacî Saleh zivirî û pirskir;

"Mitrekûpa cesê bi çiqasî ye?"

Zelamê wekî kûpkek heşayî dagirtî, xwe ji pişt Kamîran kişand û bi hêlwestek melaq bersîv da;

"Heşt hezara ye."

"Aha mala te ava. Qalibek cemed biçiqasî ye?"

Tahirê ew jî jipiya û bikelecanek şadker guhdarî Riza dike got;

"Pir caran xwe li dazdeh hezaran dide!"

"Wate, bidiravên sê çaryêkên qalibek cemed em dikarin ji zarokên xwe re sitarek wekî vê avabikin" û bideng kenî Riza û lêkir;

"Îro ez çûm serdana hevalên birîndar. We dîtiye, mala Yadê Xanê jî li wêdê ye. Min jê re got "Yadê, zarokên te gihatîne, destê wan îş digre çima hûn ji xwe re starekî çênakin?" Got, diravên me nînin. Bizinek kever li derê çadira wê bû; min got, vê bizinê bifiroşe

û jixwe re bêxe xanî û Yadê dînbû.”

Kêmekî dengê xwe hilda ema, dibeşişî û keyfxweş dixwiya Rêvebir.

“Wate, her tişt heye ema em bixwe nînin. Heta her yêk ji me, herî kêm biqasî Şehît Emerê Batûyî ne bixêret û evîndarê kedêbe, emê nikaribin di bergeşa guran de xwe bigihînin jiyanek serfiraz.”

Bilêhvkirina navê Şehît re xemek mijdar dêmê hemî civatê nixwimandibû. Awir şkestibûn û hewayek giran mezela ronahî dagirtibû. Jixwe mêhvan dereng mabûn û ji bû rabûnê li keysekî digran. Dema destûra çûyînê dixwestin Riza got;

“Siba danê sibehî şîna şehît heye û danê êvarî jî li kolika Semta çar peletforma Mele Mihyedîn, Yahya û Şefîqê Bilehî ya were li darxistin.”

Her du ciwan, ji qesra rêvebir derketin û di nav bera mala Xelîlê Spîndarokî û Evdê Akêtî re xwe li singa girikê çadira zîndaniyan dan. Li derê çadira fer û di tarîtiya şevê de dimîne kuçek mezin ratêxe pêş çavan, di rext û çekan de pêçayî Xabûrê Çelî ew pêşwazîkirin. Kare kara zilamekî ji hundirê çadirê bilind dibû û bi destûra nobedar Kamîranê dozger deriyê dadayî vekir.

Fanosek piçûk ya şûşe lewitî hundirê bitoz ronahî dikir û zeraqên zerhimî yên ji ronahiya kor dirijan dibêjîqey serkeratê dikin. Şefîq, Mele Mihyedîn û Yehya yê Bilehî li quncikekî bê hal runiştîbûn û dest û ling îşk girêdayî Xwînrêjê Lodî, di nîvê çadirê re piştikî li erdêbû. Girtiyê du qevdên simbêlên stûr liber poza, bidengek bilind û kelegirî têkel dixwest, nobedar destên wî veke. Bi destûra nobedar, Kamîran dest û lingên girtî vekirin û ji çadirê derket.

Hê nû fermandarê hêza xweparastinê û dozgerê dadgeha wargehê ji çadira girtiyên aydê milîsan, ber bi dola asasyîşê ve veqetabûn. Li pesarê jêr reşek mezin li ber çavên wan ket. Her kû nêzîkbûn, du kesên dibin çengên kesekî de ji dola jêr ve tînin fitirandin. Mehmûdê Aloşî, di nav lepên wan de, endamê rêvebertiya asyîşê û di heman demê de endamê komîsyona lêpirsînê Xêriyê Mijînî û Mêrxasê Sêrtî jêlil dihatin. Zelamê navser, gir û bilind di nav pencên her du kesên lewaz, kurt û xwehr de bê hal dixwiya. Bi awrên lavebarkirî li dozgerê lêpirsînê nêrî ema qet ne axivî. Dozger jî deng nekir û bi silav dayînekî ji hev bûrîn.

Hê nû ji Mehmût bûrîbûn Tahir, ji dozger re got;

“Çi sûncê Mehmût heye?”

Beşişandinek jandar dêmê dozger pêça û bikenînê re rêzek dinanên hûr bi nav lêhvên tenik re biriqandin. Keserek kûr kişand û bidengek kuldar got;

“Şefîq û Farîqê Aloşî jî li asayîşê girtîne. Dibêjîqey cîhana me

û van Aloşiyan ji hev cuda ye. Êşa mergên me disime ew hîs nakin. Ji bû wan kûder xare, ewder ware."

"Ema, çima ji eyaletê ne veqetan?"

"Nizanim. Ema, kengê piçek tengî bi ser wan de tê, her tiştî ji xwe re rewa dibînin."

Dema di kaşê binê asayîşê re hawa diketin û şirikên xwêhdanê di serê pozê wan de diherikî Tahir pirskir;

"Xwînrêj, ewî çi kirî ye?"

Kamîran, bi kefa mista xwe xwêhdana eniya xwe malişt. Wekî bêje, 'ma cihê vê pirsê ev kaşe' bi awrên dibeşişin li Tahir nêrî ema, pirsa wî bê bersiv nehişt.

"Ew sûtale" got û vesekinî. Çend gav avêtin û gotinên xwe ajotin;

"Exmeqe! Hê jî ne ketiye ferqa girantiya vî karwanî. Hê jî wekû ruhî zaroke û di zikakên Lodê de bi keçikan re heloq dileyîzê" û bi sohbetê re gihatibûn derê asayîşê.

Di rext û çekan de pêçayî endamê rêvebertiya asayîşê Robarê Spîndarokî, her du ciwan li derê kolika asayîş pêşwazîkirin. Zelamê qamqut, ser û rûyê wî dewisîn û di nav tozê de reng guhertî, mêhvanên xwe vexwendin rêvebertiya zinca rezan tîne bîra mirov. Kamîran meyldarê rûniştinê jî be Tahir, xwe girankir û xwest zû derkevin girê nobetê.

Li ser daxwaza Tahir, Kamîran li ser lingan ji Robar re got;

"Çend girtiyên we hene?"

"Yazdeh."

"Ji xeynî yên li cem hêza xweparastinê?"

"Belê."

"Pêwîstbû ji zû ve Muhemet Nûrî yê Mijînî û yên giradêyî wê doza hatibûna berdan, çima hûn wan digrin?"

"Em jî dixwazin berdin ema, zelaman sond dixwin û dibêjin; "Ew cihê Evdo yê Mijînî lê be, em l wêdê namînin."

"Çima, çi pirsgirêka wan bi Evdo re heye?"

"Dibêjin; Evdo ji me re got; "ji Nehdaran bar nekin. Haya Serokatiyê ji van tiştan nîne û ev rêvebertî berê we dide mirinê!" Ew bû sebeb hetka me di nav vî gelî de çû û em şermdarbûn. Bi pişt re jî heman kesî em bi xiyanetê sûncdarkirin."

Kamîran, keserek kişand û di ber xwe de got;

"Bûye girara gavanan. Ne tê xwarin û ne jî em dil dihêlin birijînin."

Li Komserê pêl gotinên xwe dike û 'r'yan stûr dike zivirî û bidengek mucid got;

"Berdin bila herin. Ne ji mafê me ye û ne jî exleqiye em bi zorê kesî li vêdê bigrin. Ewên hemêştiya me nakin îro neçin

yê siba herin” xatir xwestin û berê xwe dan çeperên jor yên hêza xweparastinê. Kengê gihatin çepera ser gir ya Nezmiyê Nêrwehî û Muradê Deştanî diparêzin, Tahir beşişî û got;

“Rola te xilas dozger, evder meskenê mine.”û piştî xweşbaşek li nobedaran dan, avek germ ji bûdonê kiraskirî vexwarin û Tahir bi milê Kamîran re girt û got;

“Were em hawa bikevin ser vê tehta banî. Li wêdê dîmenek xweş ya deşta xarê dixwiyê.”

Hawaketin ser pozê herî bilind û li ser kevirek gincir rûniştin. Kevir hê jî sincirîbû û kemaxên Kamîran şewitandin. Piştî di ber xwe de hin dijûnkirin, kefiya Sêrtikî kir di bin xwe de û rûnişt. Kamîran, di jor de li wargehê dinêrî û ji bû xwêhdana wî zuwa bibe Tahir, rext danîbû û şûtka xwe vedikir.

Di bin elenda stêran de, kolik û xîbetên wargehê wekî girikên tozê dixwiyan. Dibêjîqey garanek boş ya gamêşan di wê palê de mexiliye û vegerane girikên gewr. Di nav wan girikande, car caran zeraqên zexel yên ronahiyê li çavan diketin û ji nişkan ve wunda dibûn. Carnan jî keziyên dengên giriyê zarokan liber guhan diketin û bayê muxalif diherike deng zû li ber xwe dibir. Toza jiber tekelên tirimpila ji semta yêk nû derketî, li pêşya çavikên wê wekî berfa Kanûnê dibarî. Fîşekek xetat, ji baregiha leşkerên Êraqê ya libinê gundê Qesranê rabû û piştî ronahiya dimîne stêrek rijyayî gihat perevên ezmanan, dengê bilind nû perika guhê wî lerizand. Berê wan li Baqirtê, karwanek leşkeriyê boş gihatbû hindama cihê fîşek lê teqayî. Dengê ji matorên tirimpêlên leşkerî bilind dibû, bê dengiya şevê tarûmar dikir. Dibêjîqey şevek henase qutbiyî daketibû ser Mexmûra bajar û haxta bixeniqe. Mexmûra di tarîtiya şevê de noq bûyî, ji bajarek ava zêdetir kavlên warek dîrokî ratêxist pêş çavan. Ronahiya tirimpêlekî bi neqeba Gêçê re da der û ber bi Geyara ve bilez ji Sayloyê bûrî. Sayloya Mamê Emerê Îsîf, di bin reşatiya şevê de jî bi hemî heybeta xwe bilind disekinî.

Tahir, şûtik û rextê xwe girêdan, bi newqa keleşkofa xwe ya rikêp re girt, hat û li cem Mamosta rûnişt.

“Dizanî dozger, mirov qabilê her tiştî ye” got û wekî çaverêyî pirsa bûyî sebebê damezrandina wê hevokê bisekine rawesta.

Kamîranê hê jî li sekna bi heybet ya sayloyê dinêre bêkû serê xwe bizivirîne bersivek razdar da;

“Mirovê armancperest. Nixwe, yên armanca xwe wundakirîn tenê qabilê xwilamtiyêne.”

Tahir, bi serê xwe hevoka Kamîran pêlêkirî û gotî erêkir û wekî bersiva dixwesta negirtibe û bixwaze dabaşê biguhere;

“Ev gotinên li ser mala Şefîq têne kirin rastin?”

Dozger, bi dengek safî û bê dudil bersiv da;

"Li gor belge û delîlên di dest de, belê."

"Wekû tam, eslê meseleyê çiye?"

Wekî di navbera vegotin û ne gotinê de dudiliyê jiyan bibe kêmekî vesekinî dozgerê doza girtiyan. Ema piştî hizrandinek kurt, dest bi vegotina eslê meseleyê kir.

"Nazî yê Kurê Şefîq, zavayê zelamek Zaxoyî ye. Ev zelam, îstîxbareta PDK' ye û Îstîxbareta Êraqê jî vê dizane. Xwezûr û zava civana xwe li Mûsil datînin û li wêdê hevdîtinê pêktînin. Xwezûrê îstîxbareta Êraqê wî dişopîne, li derbenda Aloka bi venêrînek zirav re tê derbazkirin ."

"Ankû îstîxbareta Êraqê ne ji bû vê meselê wî dişopîne?"

"Na, ji bû xwe. Di venêrînê de nameyek bi turkî hatî nivîsandin bixwezûr re tê girtin û polîsên Êraqê bi hênceta wê nameyê xwezûr digrin. Piştî yêkê Êraqiyê bi turkî dizane naveroka nameyê çareser dike, zelam dibêje; "zavayê min li wargeha Mexmûre û wî ev name gihandî ye min û ezê bibim ji PDK re."

Ebû Minafiq jî zelam bi nameyê ve tîne û tê wargehê û doza Nazî dike. Îhtîmalek mezin, di wê navberê de Nazî bi girtina xwezûrê xwe dihesê û ji wargehê direve."

Tahirê guhek yê xwe kirî serad û yê din bêjîng û bi hemî baldartiya xwe guhdar dike, bikelecan axaftina dozger birî;

"Te name dît?"

"Belê!"

"Naveroka wê?"

"Bi awayek nepixandî û ji rastiyê dûr têkiliyên me û hukumeta Êraqê, girêdayî vê, hin nav û nîşanên jiber xwe çêkirîn; bi awayek veqetîndar nivîsandibûn. Rêznava hemwelatiyên wargehê yên meyla wan li ser PDK'ê û rêznava malbatên dixwazin birevin. Û di dawiya nameyê de jî rê û rêbazên xirakirina wargehê rêzkiribûn."

Dema Tahir xwe ji bû pirsek din keysxweş dikir, Sofî Beşîrê serhêsin banga sibhê dida. Kamîran, bilez rabû jipiya û got;

"Niha hevalê Riza, li derê biryargeha xwe toran tavêje û çaverêyî zeraqên rojê ye. Bixwidê nahêle ez toxtek xew bikim."

Tahir bi dengek şaqis û heyrantiyek veşartî hildigre pirskir;

"Birastî jî ev zelam kengê dinive? Şev û roj hişyare!"

Dema Kamîran kefya Sêrtikî tavêt ser navmilên xwe bidengek kûr û têr pesin bersiv da;

"Apocîtî, hunervantiya evînek bê emane" got, xatir xwestin û bibez di kaşê pişta asayîşê de daket.

## Hevaltiya Serok

Zû sibehek ya nîvê Havînê bû. Tîrojên rojê nû ezman bi zeraqên kespir xemilandibûn. Bayê hê ne vegerayî bablîsokan, li dêmên kelpitî diketin û dişewitandin. Wekî her tim keft û lepta mirovên wargehê kun mûryiyek hêlîn xirabûyî ratêxist pêş çavan. Her kes jipiyabû û her kes di tevgerê de bû.

Aydînê Cizîrî û Haciyê Deştelanî, li binê girikê derbenda ketina wargehê çalek kulabûn û bi ava germavê tijî kiribûn. Bi lingan ketibûn di nav heriya zeloq de û heriya bilokan distirhan. Doktor Emerê hukumeta Êraqê ji bû nexweşxaneya wargehê erkdarkirî, bitirimpêla xwe hat û di nav dukandarên di derbendê de bi erkdarê şarevaniyê re devjeniyê dikin re derbazbû û ket di nav malan de. Li ser serê tangêra avê, ya li binê kolika semta çar sekinî heşirbû û dê li weledê xwe ne dibû xweyî. Mele Mihyedînê nû peletforma wî çêbûyî, li ser rêya hindama çadira xwe civat germkiribû û xwidê dizane; ebayê rêvebertiyê bigazindan dadiweşand. Rêveberê semta çar Mele Diyarê peritî, roj başek germ li civata Seyda da û bilez ji wan bûrî. Heta zelamê teşk û peşkên wî yên xwehr di nav tozê de mayîn ji çavan wundabû Seyda yê neqayîl, ji paş ve û bi awrên tevzdar şopand.

Demjimara fik kirina karê rojanebû û rêveber û komîteyên semtan ji zû ve vekişabûn navendên xwe yê dimînin zincên rezan. Evdilayê dîn, ketibû xeybê û li hindama kolika şarevaniyê li ser nîvê rê sekinîbû. Her derê zilêmê di wext û zemanê xwe de kesek sîs û spehî, bi tozek tîr hatibû dûtin û wirar ji kevintî ya wî nemabû. Berê wî ji hewa ve bû û bidengek hêrsdar bixwidayê xwe kifş nekirî re şer dikir. Teşkên wî yên dimînin stûnan bi ber ker erebeya kerê hemis dikîşîne re daleqayîn Muhemedê dîn, bi ber Evdila re bûrî û bideng dikenî. Û rêvebir û komîte ji kolikên semtan derketin û wekî tu kolmek nohk li dîwarekî bidî, li nav malan belavbûn. Sedem çiye hê ne dihat zanîn ema, wê sibha germ rûyê wan cuda dikenî û şadîtiya dêmên wan pêçayî ji dûr ve jî dihat ferq kirin. Li deriyê çadir, kolik û nalyonan didan û digotin;

"Îro, demjimar dehê rojê, li cihê pîrozbahiya cejna Vejînê Serokê bi gel re baxive û divê hûr û gir, jin û mêr herkes were!"

Komîteya semta çar Hacera Mijînî ya koçberan bikeyf û kelecanek mezin vedixwîne cihê pîrozbahiyê, nû gihatibû derê çadira Şehbazê Nêrwehî. Piştî jina çalek destê xwe li tenişta nalyonê da, hevoka taze jiberkirî dubarekir. Yêxtiyarê ew demeke nexweş, jixwe nefes tengiya wî heyî û bi quncikek ya çadirê re dirêjkirî bi hevoka komîteyê re hilciniqî û rabû ser xwe. Bidoxîna şalê xwe re girt û bikelecanek mezin xwe avêt ji derve. Heta mamê Şehbaz ji

çadirê derket, Hacer gihatibû derê kolika cîran. Zelamê ji eşqa nexweşî li dor nemayî li dûv Hacerê bangkir û got;

"Hacer mamo, te got Serokê were wargehê!?"

Hacera ji mamê Şehbaz bikelecantir dixwiyê, li xwe zivirî û bersiva zelamê dengek zexel jê derdikeve da.

"Xwezî mamê Şehbaz, xwezî Serok hatibûya wargehê" got û lêkir;

Na Mamo, na! Min got, yê bi telefonê baxive, telefon!"

Şehbazê xewna wî ya xweş nîvçe mayî êdî jixwe re taxivî;

"De başe keça min, mala xwidê sed carî ava. Deriyê xêrê ji me re jî vebû" û ji bû çûyîna cihê hatî kifşkirin birêket.

Mizgîniya xêrê bi leza berqa birûskê li nav wargehê belav bibû. Bilokvanan dest ji heriya xwe, dukandaran dev ji devjenî û gazindên xwe, pîrekan dest ji ava di nirxê zêr de ye berdabûn û wekî lehiyê ber bi cihê Cejna Vejînê ve diherikîn. Mele Mihyedîn û civata xwe jî hêdî-hêdî birêketibûn û gihatin derê mala Reşîdê Robûskî. Seyda yê dema li ser kewna xwe xweş zelam, li civata li dûv xwe zivirî û bi dengek ji xwe bawer got;

"Bi wê qurana min xwendî, ez dizanim Serokê çi bêje!"

Salehê Naso yê qamqut û pora wî ya spî di bin toza tîr de reng guhertî, bi dengek tevzdar pirskir;

"Seyda, Serokê çi bêje?"

Seydayê dibêjîqey tona dengê tevzbarkirî ya zelamê perixî li xweşa wî neçûyî û gotinên Kurdî, Erebû û Turkî li nav hev dide bi dengek aciz bersiv da;

"Çawa yê çi bêje ez xwilam, çawa yê çi bêje! Yê bêje; ey yonetim, ey Riza Altun; zû wî gelê totak, zewalî, reben û feqîr ji nav wê tozê, ji nav wan eqreb û maran derxîne û bibe cihek yê beşer bikaribin lê jiyan bibin" û hevokek ya xwe jî tevlî şîroveyên xeyalî yên Serok kirin û axaftina xwe ajot;

"Qey, Kurdistan li ser pişta me zewaliya (rebena) ye ez xwilam! Qey ji me zêdetir kurd nînin, Salhê Naso?"

Wekî aqlê wî zêde ji şîroveyên xeyalî yên Seyda negirtibin "xweziyek" ji devê Saleh felitî û ber bi cihê hatî kifşkirin ve rêya xwe ajotin.

Hê ji wextê hatî dikarkirin re du demjimar mabûn. Roja nû biber Qereçox ra dayî der, bitîrojên xwe kolik û xîbetên wargehê dihingavtin. Xwêhdana ji eniyên qeşartî dadiketa, dibû şirik û di serê pozan de dihat xar. Ema tu kesî êş û zehmetiya ji berya mizgîniya xêrê hîs nedikir êdî. Rûyên mirovên dibêjîqey bi heriyek tenik hatiye dûtin, wê beyaniyê cudatir dikenîn. Dengên wan bê endîşetir derdiket û êdî bêhna gul û hendekokan ji toza tîr dihat. Herkesî henesaya xwe girtibû û xeyalên xwe bi bêjeyên Serok dixemilandin.

Ji nîvî zêdetir hemwelatiyên wargehê ji zû ve bikaşikê ji berya du rojan Cejna Vejînê lê hatî pîrozkirin ve runiştîbûn û dîq li rastika binê kaşik dinêrîn. Dibêjîqey rastika dabaşa gotinê ya aha niha biqelişe û ew hîviya enerjiyê vedegerîne volkanê ya bitêre hilfûre. Her du, sê kesan civatek girtibû û li ser gotinên Serokê bibêje texmîn dimeşandin. Şîrove dikirin û her kesî ya di dilê xwe de bi gotinên Serok tanî ziman. Ema bê cudatî, her kes erenî taxivî, erênî difikirî û li cihê gazind û rexneyên ji berya mizgîniya xêrê rabûyîn pêdarê bayê nesîm diherikî.

Demjimara mizgîniya xêrê hat û xwe pesart. Herîkîna ber bi cihê hatî kifşkirin ve jî hêdî hêdî kêm dibû û dayîkên dereng mayîn jî fitlek din jî li kitana xwe didan û dibezîn. Ji xebatkarên çandê Ferhatê Merdê, betaniyek rengtoz anî û li cihê bi hezaran awir bipêve hatîn daleqandin rayêxist. Sêpêyek piçûk jî li ber tenişta betaniyê bicêhkir û çû.

Destek cilê gabardîn li ber bejna wî ya zirav û dirêj Riza li pêş, qotiyek di bin çengan de Zahirê Serhatî li dûv û di jor de ketin di nav girseya awrên wan bi betaniya bê merîs ve qerisîn. Rûyê zelamê di nav cilên gêrîla de bi heybetir dixwiyê jî wê sibhê cudatir dikenî. Bi hatina rêvebir re leptek sivik di nav girseyê de rû dabû û yên jipiya jî rûniştibûn. Riza, li ser betaniya rayêxistî çarmêrkî rûnişt, Zahir qotiya di bin çengê xwe danî ser sêpê, çend gavan bi paş ve çû û jipiya sekinî. Rêvebirê wirarên tirşîtiya kevin li ser dêmê wî nemayîn, xendeyek sivik di rûyê lewaz de hêlîn avakirî telefon ji qotiyê derxist, ahîze rakir û da ber guhê xwe.

Ew bêhna bi hezaran merg bi werîsan dikişandin û ji bû hatina wê bi hezaran dil di sefta singan de diperpitîn hatibû û ya bihata. Ya star! Bagera dijwar ya bayê Nû bi xwe re anî, ji nişkan ve qut bibû. Tîrojên roja bişewt baweşînkên keviyên Fereşînê diweşandin êdî. Jenandina nefesan rawestabû û bi hezaran dil û çav bi ahîzeya telefona li ber guhê Riza ve hatibûn hilawistin.

Piştî kêmekî Riza, bi tevgerek ne asayî rabû serxwe! Bi rabûna rêvebir re hemî girse jipiyabû êdî. Zarokên ji keyfa kelecana dê û bavên xwe bê hay û li derdor berdidan hev jî rep sekinîbûn. Bikelecanek awerte peyvên “Silav û rêz Serokê min” ji nav lêhvên Riza bilind bibûn û dengek biheybet yê heman her du peyvên destpêkê dubarekirîn bi ser telefonê ketibûn. Riza yê hê kelecana xwe ji ser xwe ne avêtî got;

“Serokê min, hemî gel li vêdê amadeye û guhdarî we dike!”

Serok, bi “temam”ekî bersiva gotinên Riza da û kêmekî vesekinî. Bihezaran guh bi wê amêra dengek bi xişexiş jê derdive ve qerîsî mabûn û beden vegerabûn peykerên bê can.

Ji nişkan ve û bidengek biwezbet Serok got;

"Merheba gelê berxwedanvan yê Bohta! Merheba, gelê birûmet û qehreman! Merheba ji we re!" û dil ji sefta singan beyîbûn, mejî ji kiloxan firîbûn û merg rabûbûn pêdarê. Durişmên "Bijî Serok Apo!" di singa Qereçox de vedidan û deşta mijdar dihejand. Ji hinga Qereçox bûyî Qereçox ve, dengek evqas biheybet ne bihîstibû û awazek evqas bi wezbet singa wî ne kutabû. Yadê Fatê ya Repinî, bi bejna xwe ya kurt û girover xwe hiltavêt, ala PKK'ê liba dikir, li dora xwe dizivirî û tevgerên xwebûr dikirin. Dîroka mirovtiyê, ti carî ji evînek evqas sehwdar, ji hizretek evqas bişewt û ji dildartiyek evqas mestvan re şahidîtî nekiribû. Ya ew komika mirovên li qontara Qereçox qeresebûyîn wê rojê jiyan dibûn evînek bê pênasebû û ne dima ti evînên jiberya xwe. Wê evînê, nexweş sax dikirin, birçî têr dikirin, tirsonek wêrîndar dikirin, bênirx nirxdar dikirin û kuldar şad dikirin.

Bi nîşana "rawestin" ya destê Riza re, wekî deng bi şûr were birîn û dubare girse vegerabû bê dengiyê. Piştî çend hevokên berxwedanvantî, esîltî û lehengtiya gelê Bohta pênase dike û hêstîtiyek kûr barkirî li ser amêra pîroz ketin Serok vesekinî. Ema vesekinandinê dirêj ne ajot û êdî tona dengê Serok jî hatibû guhetin.

"Pêşiyên me ev cîhan avakir û di rewşa heyî de serdestên wê, zordar û dagirkerin. We li hember van dagirker û nûkeran serî rakir û ev berxwedana we pêwîstiyek nebe, nabe ya mirovbiyînê ye" got û telefon qutbû!

Bi hezaran çav û guhên bi wî cîhazokî ve daleqayî mayîn nefesa xwe girtibûn û bi awrên lave barkirî li rêveber dinêrîn. Ne kesî xwe dilepitand, ne taxivî û dema kesek bê hemd dikuxî bi dehan awrên rexnebarkirî dizivirîn ser. Piştî rêvebir çend caran heman reqam dubare lêda girêdan çêbû û ew dengê bi heybet dubare bilind bibû. Vê carê dengê ji telefonê bilind dibû ji hêstîtiyê hatibû şuştin û deng gurtir derdiket.

"Hevaltiya min zehmete. Rêya min kaşdar û asê ye ema, di dawiyê de serbestî, serbilindî û welatek azad heye. We hevaltiya min hilbijart û hûn bi min re derketin vê rêya pîroz. Heke hûn bixwazin bi min re dewam bikin, divê hûn ji her demî bêhtir xwe rêxistin bikin û berxwedana xwe bilindtir bikin. Ya layîqê we, ya layîqê gelê berxwedanvan yê Bohta eve.

Dixwazim mînakekî bidim; bizin bizine, dema dixwaze li cihekî bi mexile destpêkê bisimên xwe cihê xwe dixepêre û xweş dike. Dibekû hûn zêde ne di feqa wê de bin ema, çepera we girtî ji bû şoreşa Kurdistanê pir girînge. Di demek pir nêzîk de hûnê bibin pira şoreşa Rojhilata Navîn. Divê hûn wê çeperê xwirt bikin û vegerînin kelhek biwezbet" û dubare girêdan qutbû!

Piştî Riza kir û nekir dubare girêdan çenebû, li hezaran çavên bi lêhvên wî ve daleqayî mayîn zivirî û bi dengek şadîtî jê diherike got;

"Mixabin me nikarî em dubare girêdanê çêkin. Jixwe peyama pêwîst Serok da me û tiştek ya em li şîroveyên Serok zêde bikin nîne. Jixwe êdî telefona me heye û kengê were xwestin em dikarin bi Serokê xwe re sohbet bikin û heval serbestin!"

Bi gotina "heval serbestin" re dayîkan pêşî kişand û govenda 'heta bi serkeftinê berxwedan' destpêkiribû. Govenda ARGK'ê dor vedabû û toza ji ber lingê reqesvanan bilind dibû ne li xema tu kesîbû. Ala partiyê di destê wan de Yadê Fatê ya Kalikî û Yadê Xanê ya Hîlalî, di nîvê gêra govendê de tinê, tinê direqisin û şadîtiya sermestvan hêjayî tevayê cîhanêbû. Hinavên şewibûn vegerabûn mêrgên Berdenazê, nesaxan nexweşiyên xwe jibîr kiribûn, dilên şebikîn rabibûn pêdarê û toza Mexmûr bi xwe re bêhna gul û beybûnên welatek azad tanî êdî.

Evdilayê dîn, li rexa jor ya govendê sekinîbû û wekî her tim ji hewa ve dinêrî û bi peyvên zelal û safî digot;

"Ev mejî keşk nikarin fêhm bikin. Bi wî kilamê qedîm min di xeybê de dîtiye, Serok pêxembere, pêxember" û dînê xeybzan ev hevoka xwe bi caran dubarekir.

Evîn çiye? Ew hemhêstîtiya sewdanan difirîne, mergan difûrîne dibe robarek har û ber bi armancê ve diherikîne çiye? Çiye, ew hêza nesaxan sax dike, zeravan dijwar dike, firşikan helal dike û têxe mebestperestên rêya azadiyê? Kîn û evîn, hêst û raman û lekimdayîna di pişt mebestan de, çawa li awrên li ber serkeratê têne barkirin? Çawa, beşerek dikara hemî qencî, hemî işq û hemî sewdayan di merg û mejiyê xwe de bihewîne û bibe behremendê hemî awrên hîvîdar?

Gelo, mîrîtiya evînê eve? Eve, mîrdadtiya behremend? Li hember sikê serkeftina spehîtahiyê eve? Li hinavên kara xwê di tê de bênder gerandîn, reşandina avek hûnik eve? Eve, di tarîtiya şevê de, di nav zemîteya ketî di dolê de, di zemherîna dojehê de gurkirina agirê azadiyê? Di şevek zilomat de, di berîstanek bê ser û bin de, di nav pencên hirç û hovan de tîmarkirina baweriyê eve? Gelo, enerjiya bê hîviyan hîvîdar dike, birçiyan têr dike, tirsonekan zeravdar dike, nandozan armancdar dike û dojehê vedigerîne buhişta Baxê Îremê eve?

Tu zanyar, bawermend û armancperestan nikariye ûrkeltiya kevokek birîndar bipîve. Ema, ji bû wê komika niha sermest û serxweş û di nav wê toza xeniqandvan de bi dehan gêrên govendê li pişt hev digerîne Serok Apo, hevgihandina hemî spehîtahiyên xwedayîbû. Tenê bi henaseyek ya wî, dikarîn heta dawiya bê dawî

di wê rêya asê û dijwar de berbi armancê ve çargav bibezin.

Mesken, heman meskenbû ema zeman bi nîvî re bibû du qet. Dûh, pir dûr mabû û bibû aydê serdemek kevin. Her kêyê kû bixwaze hevaltiya Serok bike divê xwe rast rêkbêxe, mezin li berxwe bide, çepera xwe vegerîne kelhek qayîm û xwe bêxe pira şoreşa Rojhilaya Navîn. Hejêkirina Serok, bi fêhmkirina mebest û armancên wî re derbaz dibû. Dema bizinek jî bixwaze li cihekî bimexile, destpêkê bisimên xwe cihê xwe dixepêre, xweş dike û wusa dimexile. Ema ew heştî û pênc rojbûn, ew kesên bi awayek dildar û bi evîndartiyek mezin hevaltiya Serok hilbijartîn hê biqasî bizinekî jî cihê xwe xweş nekiribûn. Van hevokan û bi sedan hevokên di vê rastekê de, di merg û mejiyê wan mirovên tozdar de dikir zirme zirm û ji şerma diçûn di bin pelçimek çilû de.

Li Qontara Qereçox zeman bibû du qet. Wekû serdema ji berya axaftina Serok û ya piştî axaftina Serok hatibû pênasekirin. Serdema ji berya axaftina Serok di dûh de mabû û êdî mejî mijûl nedikirin. Cîhan ketibû eksena xwe, roj dîsa ji Zaxrosan diza û bibû hîviya zayînên nû. Qereçox bibû cêwiyê Cûdiyê Muradan û rojev ji bin ve hatibû guhertin. Qewlê, erênî bihizire ji bû jiyan erênî pêşbike ve di fikir û kirinan de serwerbû êdî. Serok, biryara mayîna duryana berfa sohr dabû û hizrandinek herî piçûk ya berevajî jî xiyanetbû. Hevaltiya bi Serok re ev ferman dikir û serdema pêdardayîna merg û mejiyan hatibû êdî. Dem, dema avakirina kelhek qayîm û rêxistinek xwirtbû.

Piştî axaftina Serok, hemwelatiyên wargeha Mexmûr hilperijîbûn qontarên Qereçox. Ne tîrojên bişewt yên rojê, ne rûyên teqayîn û bi xwêhdana şor dihatin kewandin, ne mar û dupiştkên reş û ne jî bê derfetiyên jiyanê; tiştekî nikarî leza wan sist bike. Herkesî kuç hildikirin, kevir dikişandin, herî distirhan û bilokên heriyê çêdikirin. Her malbatê li cihê nalyon û kolikan bi zibareyî dîwar bilind dikirin. Jiyan, bileza têza tifekê dihat guhertin û li qontara Qereçox kavlên xaniyên bajarokekî bilind dibûn.

Di rastiyê de ji bû warê Qereçox, bikaranîna bêjeya 'kavil' kêmek zêdebû. Bêjeya kavil, pêvajoya pêşî ya timamkirina avahiyekî kifş dike. Li wî warî, ew pêvajoya dabaşa gotinê tinebû. Kengê kuç, bilok û darên malbatekî amede dibûn, cîran û derdor lê komdibûn û di heman rojê de, heta di danek yê rojê de avahiya mijara gotinê dihat avakirin. Ne tenê avadikirin; didûtin, ratêxistin û di tê de bicêh dibûn. Jixwe her malbatî yêk an jî du mezel çêdikirin û her mezela zincikî qeysa çadirekîbû. Jiber kû banê xaniyê mijara gotinê bi heman çadirê dihat nixwimandin. Ya dihat guhertin, bilindahî û qayîmtiya xanîbû.

Ji xeynî kite mitên saziyan, her malbatê ji xwe re avahiyek

zincikî ava dikir. Biqasî serpûşka çadirekî an jî nalyonek hişîn, binyata mezelekî bi kuçan datînîn. Piştî du sê rêzên kuç, çar pênç rêzên bilokên herî jî li ser dikirin. Her du serên mezelê yên zirav, bi awayek sêkûzeyî biqasî bejnek dirêj bilind dikirin. Girşek li ser her du cihên herî bilind bicêh dikirin û ji teniştan ve darên bi nîvî re şeqitandîn ji her du aliyan ve dipesartin girş. Banê dabaşa gotinê bi çadir an jî bi nalyonekî dinixwimandin û baş asê dikirin. Yêk du kulekên biqasî serê du bilokan bipesêrin hev û ji bû hewa standinê hiştîn, bi nalyonê dadidan û di şûna derî de betaniyek bi deriyê piçûk ve dadileqandin. Hundirê mezelê bi heriyê didûtin û xaniyê dihat dikarkirin êdî kamil dibû.

Ya li warê Qereçox zehmet, ya wext digirt ne xebata hêza mirovîbû; amêrên xebatêbûn. Mînak; ji deh malan malekî bêrik hebû, di taxekî de çend qalibên bilokan hebûn û jixwe bivir pir kêmbûn. Hêjmara kererebeyên di wargehê de tiliyên destekî derbaz nedikirin û ji bilî wan amêrên barhilgir tinebûn. Jiberkû qismek pir mezin yê gel qet dirav tinebûn û çend filisên di destên wan de mayîn jî ji bû pêwîstiyên pir jiyanî diparastin. Qismê ji bû paşroja xwe kêmek dirav hiştîn jî pir kêmbûn û hêjmara wan tiliyên du destan derbaz ne dikirin. Herkesî ji xizmên xwe yên li Bakur mayîn alîkarî dixwest û yên sed markên Alemanî bi hewara wan ve gihatîn bikomînî dimezaxtin û şûran simbêlê wan ne dibirîn.

Wargeh, komanek xwezayîbû. Her amêra kesekî heyî ya herkesîbû û her amêra kesekî peyda dikir her kesî bikartanî. Bi hev re dixebitîn, hevkartiya hev dikirin û herkes ji bû yêkî û yêk ji bû herkesîbû. Çanda wan, exlaq û zêhniyeta pê mezin bûyîn û mercên jiyana heyî ev dipesart û ferz dikir. Eyba herî mezin ya wî warî, te tiştek hebe û tu bider û cîranên xwe re parvenekî. Ev qibhetbû, sernivzîtîbû û kesên xweyê van teybûtiyan bihêsanî ne dikarîn di nav vê civaka merd de bihewêne.

Azadî dayîne ne standin, parvekirine ne komkirin. Şadîtî, dadmendtî ye. Di oxira nirx û armancên mezin de, bi hev re, wekhev jiyanbûyîne. Belkî jî bihuşta şertê xwe gihandina wê ya yêkemîn mirin û li cihek xwe gihandina wê ne gengaz hatî bicêhkirin; bêçînî bixwe ye. Berevajî, dojeh jî cîhana wujdana xwe wundakirî ye.

***

Salê, berbi peyîzê ve hêdî hêdî perên xwe dikutan. Xebata avakirinê bi hemî leza xwe dewam dikir. Jin û mêr di tev de, herkes hosta û herkes şagirtbû. Hergîz herkes endamê saziyekîbû û di tinetiyê de heyîn dafirandin. Avakirina avahiya mejlîsê ji zû ve qedabû. Şehîdgeha Riza bi rikdartiya xwe dayî çêkirin û ji bû mesrefa

wê ew û qismek rihspiyên wargehê hatîn himberhev, wekî stûna şerefê di nîvê semta du de radiwesta. Şarevantiyê dîwarê xaniyek du mezel û eywanekî qedandibû û girşên wê jî bar kiribûn. Hêza xweparastinê di qontara çiyê de eywanek mezin û sifikek piçûk li pêşyê ji zû ve xilas kiribûn. Li ser girikê li raser Germavê û cihê Fermandar Karker ji bû navenda hêza xweparastinê kifşkirî, asayîşê jî hema bibêje li gor pêwîstiyên xwe eywanek, cihê rêvebertiyê û zîndana girtiyan qedandibû. Li cihê Cejna Vejînê hatî pîrozkirin û Serok bi gel re axivî; bizibareyî xaniyek kuçê mezin ji çand û huner re çêdikirin û ji qirêjê tîran şaşika Ferhadê Merdê ne disima. Dor gihatbû dibistanan û dereng jî mabûn. Li gor biryara mejlîsa gel, her semta dibistanekî çêke û her roj taxeka bixebite. Jixwe mamosta û xwendevanên her tim li ser karbin.

Mamosta Sedîqê Huseynê Hîlalî, Hewarê Şirnexî, Xatûna Hîlalî û bidehan mamosta û xwendevanên pelweste wekî pêşewityan di derdora cihên ji dibistanan re hatîn kifşkirin dizivirîn û kelecana wan hêjayî dîtinêbû. Projeyek çêdikirin û deh xira dikirin. Di dawiyê de, wekû derbazer sê dibistanên seretayî yên ji heft refan pêktên û dibistanek navîn ya ji du refan pêktê hatibû biryarkirin.

Piştî gel dest bi avakirina sitar û saziyên xwe kirîn û biteybet jî xebatên çêkirina dibistanan hatîn destpêkirin; hîviyên rayedarên UNHCR û rayedarên Êraqê ya belavbiyîna wargehê berhewa bibûn. Hê li Nehdaran qewlê şeş mehan yê ji wan rêvanan re birîn hê timam ne bibû ema, di dîtinê de niyetak ya wê komika birik ya belavbiyînê ne dixwiya. Berevajî, bi eşq û rikdartiyek mezin xwe li hîviyê pêçabûn. Ne wekî xêr nexwazan hesapkirî, şikestinek komî pêkhatibû û ne jî ligel hemî hewldanên wan yên şeytanî revek mezin.

**Mamosta Sedîq Huseynê Hîlalî** vedibêje;

"Nêzîkê dawiya Heyva Tebaxê bû. Hevalê Riza, ji tevayên erkdaran re civînek giştî çêkir û got;

"Divê her avan saziya xwe avabike."

Wekû avana mamosteyan kolikak ya me jî hebû ema, avakirina dibistanan hêza me derbaz dikir û me ev rewş di civînê de anîbû ziman. Heval û avana civînê jî ev dîtina me maqûl dîtibûn û biryara 'her semt dibistana xwe çêke' di civînê de hatibû biryarkirin. Ema, wekû mamosta û xwendevanên pelwestê, meyê pêşvantiya wê kiribûya.

Êvara roja civînê, me ji avana mamosteyan û xwendevanên dibistana navîn komîteyek amadekar ya heft kesî hilbijart. Heman roja piştî wê xwirî mamostayên jin û mêr û qismek xwendevan, em hawaketin pişta wargehê û heta êvarî ji bû binyata dibistanan me kuç komkirin. Di heman rojê de biqasî têra binyata her çar

dibistanan bike, me qederê deh tirimpêl kuç komkiribûn.

Ji bû em kevirên xwe bikişînin ber dibistanan, roja piştî wê ez û Mamosta Hacî Ehmedê Gundikî çûn Mexmûr. Ger me ji asayî buhayek pir zêde jî teklîfkir ema, me kir û nekir tirimpêlvan nehatin. Tirimpêlvanan digotin; “heke em karê we bikin PDK ya me li Hewlêr bigre û bêxe di zîndanê de.” Em du rojan li ser hev çûn û tevayê ajotvanên tirimpêlan hemen bersiv didan me. Ji bû karê me nekin PDK ya mala Berzanî gef li wan xwaribûn û tu kesî newêrî xwe nêzîkî me bike.

Di wê navberê de semtan xwe rêxistin kiribûn, her roj dora taxekî û li ber coya germavê bizibareyî dest bibirîna bilokên dibistanan kiribûn. Her roj çar tax li binê derbenda ketina wargehê bilokên heriyê dibirîn û heşra avakirina dibistananbû. Tax bi dorê dixebitîn ema, xwendevan û mamosta her roj kar dikirin. Mamosta û xwendevan di nav taxên xwe de dixebitin û komîteya amadekar berpirsê hemî xebatêbû.

Ji bû kuç kişandinê roja sêyê jî em çûn Mexmûr. Dîsa hemî tirimpêlvanan pişta xwe dan me û tu kesî xwe biber hatinê re nekir. Dema me û ajotvanan gotûbêj dikir, mirovek navser, gir û bilind ber bi me ve hat û got;

“Ezê werim û bibuhayek asayî.”

Li ajotvanên din nêrî û dewamkir;

“Ez Selîm Kerkûkî û hûn hemî min nas dikin. Çi karê van camêran hebe ezê bikim û Partî (PDK) ji bavê xwe ve bê minete.”

Wekî serkeftinek pir mezin bidest me ketibe, em ewqas şad bibûn. Em bikeyfexweşiyek mezin li tirimpêla kevin, tewixî û bê merîs ya Selîm Kerkûkî siwarbûn û hatin wargehê.

Hêdî, hêdî ker erebe û motorokên sê tekel jî tevlî jiyana me dibûn. Ker erebeya Mihemedê dîn, Kamîranê Hesenê Mela, Rêberê Delakî, Sebriyê Heso Iro û çendekên din jî li ser rêya toz ya bi nîvê wargehê re derbaz dibû bi hewarî kuç û bilok dikişandin. Ewqas muşteriyên wan hebûn, pir caran kesên mûhtac bi rojan di dora kererebeyan de disekinîn.

Bê qersel bilokên herî diqelişîn û hev nedigirtin. Motorokek sê tekel ya Cemîlê Îsifê Elyasê Ziravikî hebû. Ji bû li nav pirêzeyên derdor qerselê kom bike me xwe avêtibû bextê wî. Birastî jî camêr ne merdî nekir û heya dawî ji me re qersel kişand. Pir caran wî û xweyê zeviyan şer dikirin, carnan ji ber wan direvî, dema keys didît didîzî ema, ti carî em bê qersel nehiştin.

Di wê navberê de pêşketinek din jî ya hêz û gêwilê me hilde jor qewimîbû. Sebriyê Ker û Yaşarê turk çûbûn û Hevalê Sînanê Sohr hatibû. Gelê wargehê pir hej wî mirovê xeber rû, behremend û civakî dikir. Bê goman ne biqasî axaftina Rêbertiyê ema, hatina

Hevalê Sînanê Sohr hêz û moralek mezin dabû me. Qet ji bîra min naçe, di serî de Bişarê Bilehî û çend kesên din bi hêncetên pûç û vale ne dixwestin tevlî karê çêkirina dibistanan bibin. Hevalê Sînan bela xwe ji wan nevekir, bi caran bi wan re axivî, qayîlkirin anîn û ji me hemiyan bêhtir xebitîn.

Di heman dema çêkirina bilokan tajot de, li aliyê din me hosta û şagirtên xwe rêxistinkirin û dest bi avakirina dibistanankir. Du rêzên binyatê bi keviran hatin danîn û li ser wê bilok hatin lêkirin. Hinan bilok dibirîn, hinan bi kerereban û bi tirimpêla Selîmê Kerkûkî bilok dikişandin û hinan jî dîwar çêdikirin.

Karwanê ker erebeyên me û yên tirimpêlên ji saziyên UNHCR û hukumetê re xîz, bilokên çîmento, hêsin û tiştên din dikişandin tevlîhev bibûn. Ji bû wan her tişt hêsanî û ji bû me zehmetbû. Em û ew ewqas ji hev dûr û biyanîbûn tiştek ya me ne dima hev. Me bi kererebeyan bilokên ax û av dikişand, wan bi tirêleyan xîz, çîmento, hêsin, bilokên çîmento û her tiştê buhadar. Me bi destê xwe ax dikola û bi lingê xwe herî distirha, berçavkên reş li ber çavên wan, ji bû tav li wan nede ji cîbên xweyên bibuha ne dihatin xar.

Çîndartî, telefeta herî mezin ya hatî serê mirovtiyêbû. Çîndartiya aha li vî warî, li qontara van çiyan ji malzaroka bazar û bajaran jidayikbiyî pêl her tiştê spehî kiribû û perçiqandibû. Bi sazîbiyîna dewletê re qirkirin hatibû mayîndekirin û ji berya her tiştî vîn û wujdana mirovtiyê kuştibû. Bihizirin, sebebê fer yên wan maaşdarên ji ber konbaya tirimpêlên xweyên teybet ne derdiketin ji der ve, anîna ewqas tiştên buhadar, avakirina wan qesran û mezaxtina ewqas diravan dilxwede embûn. Ema li halê me binêre û li temtêla wan temaşe bike.”

***

Koçberên Qereçox heyva destpêkê ya Peyîzê jî qulibandibûn û sêlm pesartibûn destpêka meha duyemîn. Banê dibistanan jî timamkiribûn û dor hatibû rêkûpêktiya hundir. Li rexa Başûr ya dibistana Seretayiya Dr. Nûrî Dêrsimî, dibistanek navîn ya ji du refan pêktê avakiribûn û xwendevanên di wê dibistanê de bixwînin hundirê refan bidestên xwe didûtin. Di her refê de bidehan ciwanên keç û kur têkel û nû gihatîn bi işq û kelecanek mezin dixebitîn. Hinan di korta li rexê de bilingên xwe herî distirhan, hinan bi bêrdoşên şkestî dikişandin hundir û yên di hundir de jî bi destên xwe dîwarê xwehr û gincir didûtin. Nêrgiza Xecê ya Hîlalî, keça herî bizêhn û ne tebitî ya dibistanêbû. Keçek zekî, henekvan û gotinxweşbû. Di heman demê de asê û rikdarbû. Nêrgizê, delingên şalê  Bohtanî heta bikabên xwe hildabûn. Gîçikên rût di nav heriyê zeloq de ne

dixweyan. Şirikên xwêhdanê, qanên herî ya dêmê wê yê esmer û qemitî nixwimandî têxistin qet û diherikî. Bêrdoşa heriyê danî ber Mehmûdê Sofî Şukrî û bi ken got;

"Erê Mehmût, em evqas zehmetiyê didin xwe, piştî me dibistana navîn qedand emê çibikin?"

Xortê xweşik û hê simbêlên wî reş nebiyîn, heriya di destê xwe de li dîwar da, bi kefa mista destê xwe hilûskir û bersiv da;

"Emê amedeyî û zanko dewam bikin."

Metînê Eşrefê Gundikremoyî yê taqê beramber didût, beşişî û bidengek bêhn qutbiyî tevlî sohbetêbû;

"Mehmût, xeyalên xemilandî dibûne Nêrgiz. Kanî amedeyî, kanî zanko, emê li kû û çawa bixwînin?"

Du bêrdoşên heriyê di destan de Nazdar ket di hundir de. Xwêhdana di nav çavên keçika dibistanê ya herî spehî û girêdayî vê nazdar û pir henekvan de dihat xar, heriya bi dêmê pembe ve dimalişt û di gerdena dirêj de dirija. Bêrdoşên xwe danîn ber Metîn û bi dengek stewayî tevlî sohbetêbû;

"Mirov biqasî xeyalên xwe ye hevalê Metîn."

Metînê dor lê tengbiyî wekî hewarê bixwaze li Munîr nêrî û gotina xwe ji Nazdarê re rêkir;

"Xeyalên te çinin hevala Nazdar?"

"Xeyala min ya herî mezin, li pêşya refek gêrîla di bin durişm û tilîliyên dayîkan de ketina Paytexta dila ye."

Dengê hêstîdar ya wê keleş kubara giya liber bejna wê ya zirav zer dibe, berê sohbetê ji bin ve guhertibû.

### Serok ji Suriye Veqeta

Herikîna zeman, gera cîhanê û keft û lepta koçberên Qereçox di ber hev de dibezîn. Dibêjîqey di nav pêşbaziyek bê eman de bûn û ji bû hev derbaz bikin hewlek ne asayî dimezaxtin. Bayê dijwar deşta Baqirtê ji zû ve maliştibû û wirarên qersela genimê zer nehiştibû. Çavên Çiyayiyan ji hewa ve li pisîkên peyîzê digeran ema, li wî meskenî ew jî tinebûn. Dibistanên şekil û şemala wargehê ji bin ve guhertîn li ber qedandinêbûn Eşqa ji çavên mamosta û xwendevanên bi derdora wan xaniyên reş re çar dizivirîn, bê pênasebû. Gotin ji keyfa wan re ne dihatkirin û dinanên wan bi nav lêhvên qelişî re qîç dixwiyan. Ew avahiyên li gor xanyokên zincikî yên wargehê diman qesrên mîrekan, gêwilek ne ji rêzê li psîkolojiya koçberan jî barkiribû.

Di rojên dawî de, bi pêşîvantiya Sînanê Sohr li pişta taxa Gundikremoyiyan xebata çêkirina xaniyekî hatibû destpêkirin û ew jî li ber qedandinêbû. Raza wê avahiya xweser û bi tosintiyek

mezin dihat çêkirin ji bala wargehiyan ne revîbû. Li ser wî xaniyê sedema çêkirina wî wekî razekî dihat veşartin, biteybet endamên hêza xweparastinê dixebitîn. Avahiya bi kulek û pencere, ji du mezel û eywanek piçûk pêkdihat, serşuk û tuwalet di hundir de û ji bû mesrefa wê rêvebertî ji ti mezaxtinan ne direvî; çima û ji bû kê dihat avakirin, ne dihat zanîn. Belkî jî ya ewqas bala mereqdaran dikişand ne şekil û şemala xanî, raza lê hatî barkirinbû. Wargeh, bi demê re hatibû rewşa malbatek mezin û raz di nav de ne dihatin veşartin. Li hember êrîşên mereqdaran wê raza piçûk jî zêde li berxwe nedabû û hê Şiyarê Garisî nû dest bi dûtina dîwarên ji derve kiribû, navê 'Mala Serokatiyê' lê hatibû kirin.

***

Êvara şevek ya Cohtmehê bû. Bayê reş demsala Peyîzê jî dabû pişt xwe û bi hemî dijwartiya xwe di ser koxikên zincikî de diherikî. Ew wexma dojehiya bayê bi xwe re tanî, kêm jî be şkestibû. Pir firk jî be, keziyên hunuk rûyê mirovên wekî lehiyê ber bi kolika televîzyona semta yêk ve diherikin diferikand û derbaz dibû.  Bayê xedar û bê navber di nav koxikên zincikî de diherikî, toza wekî mewcên deryayê  di nav wargehê de pêl dayî ji zû ve maliştîbû û li gelkû bayek dijwar jî rabibû, ezmanê wargehê çîk sahîbû.

Ew demekbû ji sebeba Serok Apo dihewîne, rayedarên dewleta Turk gefên şer li Sûriye dixwarin. Ji bû çavtirsandinê; Amerîka, Cihû û Turkan li Derya Spî tetbiqatek leşkerî dabûn destpêkirin û hevkartiya zorhêzan dewleta Turk fok û har kiribû. Şer derket û haxta derbikeve.  Li hember bereka dewleta Turk şûrkêşiya wê dike hêlwesta dewleta Sûriye, Serok û PKK'ê dihat mereqkirin û şîrove û nirxandinên di wê derbarê de rojeva wargehê ji bin ve guhertibû. Evê rewşa tirsdar, merg û mejiyê koçberên Qereçox dihingavt û bi ekrana Med TV ve daleqandî hiştibûn.

Tam di vê demê de, Hiznî Mûbarek'ê serok komarê Misrê serdana xwe ya Arabîstana Suodî di nîvî de birîbû û şeşê Cohtmehê peyama gef barkirî ya rêvebertiya DYA biribû Şamê û ji wêdê jî derbazî Ankara bibû. Di heman roja Hiznî Mûbarek nameya gefan ya DYA gihandî Şamê, wezîrê kevin yê ragihandina Yewnanîstan û mebûsê PASOK'ê Kostas Baduvas li biryargaha Rêbertiyê bû û binavê sed û neh mebûsên Yewnan Serok vedixwend welatê xwe.

Piştî qazidê Misrî û tê îdîakirin casûsek kohne yê CIA yê ye ji Şamê veqetayî sê rojan, nûçeya 'Serokê Partiya Karkerên Kurdistan Abdullah Ocalan; ber bi cihek nayê zanîn ve ji Sûriye veqeta' wekî berqa birûskê di mejî û mergên koçerên Qereçox de teqabû.

Wargehiyên di kolikên têr toz de nûçeya du serî û her du ser

jî tûj û sincirî ji Med Tv guhdarkirîn, xwe avêtibûn ji derve. Çavên her kesî li mala Serokatiyê digera û di dilê xwe de digotin; “gelo ma heye carekî bazih li ser dara me jî deyne.” Ema na! Xaniyê şîrîn, di bin reşahiya şevê de sêwî û bê xweyî dixwiya. Avahiya di wargehê de tenê dîwarê wî yê ji derve bi axa spî hatî dûtin û di bin tarîtiya stûr de wekî hêkekî dixwiya, ker û lalbû. Zeraq ji kulekên wê ne diçûn û dibêjîqey di tarîtiya şevê de şîn girêdabû.

Hemwelatiyên ji kolika televîzyona semta yêk derketîn kom bikom li derdor belav bibûn û ji bilî çend pîrekên zaroşîr hema bibêje tu kesî ne dixwest qesta mala xwe bike. Şîroveyek xilas dibû û nirxandinek din destpêdikir. Ji her serî dengek derdiket û hevgihandina dengan huminek sivik tevlî wê zû şeva avis dikir. Ema pişka şîrîk û ti goman tevlî rastiya wê nabin, herkes erênî dihizirî û meyla şîroveyên wan erênîbûn.

Hacî Cewherê Avyanî, qesta komika Fazil Buldan wekî kêlatekî bi ser dikeve kir û şev başek li wan da. Piştî bersîva beşdarvanên nû girtin, Zekiyê Geverî ji cihê mayî şîroveya xwe dewamkir. Zelamê sohr û dibêjîqey çavek yê wî şkestiye, her der kir teraf û kêmek mabû bibêje, pîrê Misrî wekû qazidê Serok çûye Ankara. Hacî Cewher li Mam Fazilê ji hemî rewşa wî kifşe nerihet û aqlê wî ji şîroveyên zêde xweşbîn yên Zekî nakeve zivirî û got;

“Hûn çi dibêjin mamê Fazil?”

Zilamê pîr û şaşikek piçûk serê tûj dinixwimîne û stoyê wî yê lewaz di tarîtiya şevê de dirjtir dixwiyê, mizek kûr li çixara xwe ya nû pêçayî û bi serê darçixareyek direj ve da û bidevoka Geverkî got;

“Ezîzê mamo, ez wekî hin kesan ne dilniyame. Piştî kuçê giran ji cihê xwe qulibî yê li kû bisekine ne kifşe.”

***

Zû sibehek ya rojek hunikbû. Jin, zarok û zelamên pembûçin wekî gulotanan di paşya pîqab û tirimpêlan de, di navbera dukana Avdilayê Bilehî û Akîfê Bilikî de diçûn xar û ji wargehê derdiketin. Betonvanên bi xebatê banê saziyên UNHCR vale dikin, bidimohrî dixebitîn û qîr û heleketa wan bi ser wargehê diket. Dukandarên êdî bêşa xwe wekû mehane didan, bê minet bi derbendê re derbaz dibûn û bilez qesta dukanên zincikî dikirin. Mirovên cemeda şarevaniyê bidest wan neketî, li pey tirimpêlên bibuhayek ne asayî cemedê difiroşin dibezîn. Ew demekbû Xaça sohra Êraqê enirî, av netanî wargehê û dîsa xelaya avê serî rakiribû. Rêza jin û zarokên bi bîdonan av ji Mexmûr dikişandin, di navbera derbend û bajarê xopan de dîmenê kakêşokê ratêxistin ber çavan. Ji nişkan ve keç û

jinên galon di destên wan de berê xwe ji Mexmûr guhertin û ber bi pişta semta çar ve leza lingên xwe dikirin. Piştî kêmekî, Sînanê Sohr, Mustefayê Cizîrî û Muhemedê Mijînî jî di heman aliyî de ji çavan wunda bibûn.

Hukumeta Êraqê lûleya avê ji zû ve kişandibû. Ema, embara anîna wê saziya UNHCR girtî ser xwe, bi hêncetên pûç dereng têxist û Êraqiyan jî serê lûlê dadabûn. Zarokek netebetî, li pişta semta çar lûleya hêsin ji dizî ve kunkiribû û ava ji kunê hildipijiqî biqasî spîndarekî bilind dibû. Jinên tevayê wargehê li ser serê wê dayîna ne di hesap de kom bibûn û heşir bixwebû. Jinan lekmên dijwar li hev didan û deziya zuwa li kesî ne mabû. Qelebalixek doxeyî li cihê avzêmê ketibû û tu kesî dengê ya din ne dibihîst.

Ji rêvebertiya Semta dabaşa gotinê Muhemedê Bilehî, hema di cêh de komîteyek ya ava avzêma nû ji jinan avakiribû. Ema, komîteya sê kesî ya ji Rehîma Ziravikî, Pîjana Şiwêdî û Cewahira Şirnexî pêkdihat jî ne dibû çare û tu kesî guhdarî kesî ne dikir. Ava şid ya ji lûleyê dipijiqî ji hewa ve dibû şîp û di ser serê Muhemed, komîteya nû û hemî jinan de dihat xar û deziya zuwa li kesî nehiştibû. Dema pîrekekî ya din tehf dida û hemiyan hev didan ber lekman, qêrek bi bin wan re xwirimî û dengê şer bala jinan kişand ser xwe. Muhemedê Soran û çend kurên xwe yên ji aliyê PDK'ê ve hatîn rêxistinkirin û îdîa dikin kû hemî qontara Qereçox milkê waye, dîsa bela xwe li Menaf û Mecîdê Şirnexî dabûn û şer derketibû. Ji dehan zêdetir kur û xizmên Muhemed xwe dabûn hev û êrîşî her du zelamên wargehê dikirin. Rehîma Ziravikî, nav li jinên hev tehf didin da û bi jin û zelam ve herkes qulibî wî alî û li ser serê êrîşkaran bibû qiyamet. Muhemedê qermiçî yê bi nijdeye xwe ve dibin barana kuçan de mayî, zêde li berxwe nedan û zû şkestin. Jin û zelamên wargehê ketibûn pey êrîşkarên bê mehwer direvîn û tajotin.

Bi qewlê zanyar, ristvan û mîrê gotinê Melayê Cizîrî "Keys ketibû û muhlet li nik herambû." Dema jinan Muhemedê Soran û nijdeya wî diqewitandin, Muhemedê bilehî komîteya avê jî girt û hat ber avzêma Zekî yê dîn bexşandî. Galonên di ser hev de ketîn û her yêkî beyî aliyekî komkirin, rêza wan tekûzkir û destbi dagirtina wan kir. Heta pîrek ji şer zivirîn qederek firax hatibûn dagirtin û êdî nehiştin rêz xira bibe.

***

Bi ser ji Sûriye derketina Serok re nû hefteyek derbaz bibû. Roja nû hilatî wargeh di bin siha Qereçox de hiştibû. Bagerek sivik aş aşokên tozê rakiribûn û li navguhê xwendevanên rû qemitî dida. Biteybet xwendevan û mamosta, kelecana wê sibhê li ser rûyê

hemwelatiyên wargeha Mexmûr hêjayî dîtinêbû. Yê deriyê xwe yê ji betaniya helefan pêk dihat vedikir xwe tavêt zikakê û yêkser berê xwe dide dibistanan. Ji şeva bûrî ve agahî hatibû belavkirin û ew roj destpêkirina sala perwerdeya 1998/99'ê bû.

Riza Altun, Sînanê Sohr û tevayê hemwelatiyên wargehê tam tekmîl li ser linganbûn. Li pêşya dibistanên bi şêwaza tîpa "U" hatîn çêkirin heşir bixwebû. Ji bû cara dawî û bihêstek cuda ji hundir ve wan şaheseran bi çav re derbaz bikin Sînan û Mustefayê Cizîrî, berê xwe dan deriyê refa li ser kaxezekî bitîpên mezin 4/A û 1/C nivîsandî. Dema serê xwe êxistin di hundir de, bêhnek xweş ya heriyê ter firnikên pozên wan gizgizandin. Taqên kort û çal bi heriyek spî hatibûn dûtin. Seranserê di nîvî refê de zikakek yêkpê hebû û li her du aliyên zikakê di şûna kursî û mêzan de bilokan ax hatibûn rêzkirin. Du rêz bilok li ber hev hatibûn rakirin, rêza pêş du bilok û ya paş du qetên wê hatibû bilindkirin. Rêza pêş kursî û ya paş perpalkbû. Di heman demê de rêza bilind û berpalk, dibû mêzeyê rêza pişt wê jî. Di nîvê zikê refê re du girş liber serê hev hatibûn dirêjkirin û stûnek di bin serê her du girşan de hatibû bicêhkirin. Stûna di nîvê refê de hatî daçikandin, di dîtinê de hundirê refê parçe dikir û xweşikatiya wê binsih dikir. Depê nivîsandinê bi du bizmarên mezin, bi nîvê taqê li rastê derî ve hatibû daleqandin. Wêneyek yê Serok Apo, li milê derî yê rastê û li beramber refê hatibû bicêhkirin û tenê xemla taqên xwehr û mehro ew wênebû.

Tevayê wargehê qulîbîbû derê dibistanan û te xwelî hilbavêta li erdê ne diket. Defter û qelemên wan di qewlikên paç de, derbenên qewlik di stoyê wan de û zarokên rû qemitî ji her çar aliyên dibistanan ve dibezîn. Dêmên qemer û hê jî bidewsên kelpitandinê nixwimandîn, ji kelecanê birengek pembeyî hatibûn pêçan. Zarok, di nav boşahiyê mezinên xwe re derbaz dibûn û li rastika derê dibistanê bilez rêz digirtin.

Keçikek zerik, qewlikek kincik di ser kirasê qermiçî de daleqandî, pêlavek nalyona pehnî pînekirî di lingan de û di jor de dibezî. Keçika bikelecan, leza xwe negirt û li navguhê ciwanê pesartî kupalekî jipiya disekine ket û di şûn de beyî. Ciwanê nestêleh û aliyek yê wî şeht, veterisî ema neket. Zaroka rûyê wê yê xweşik rengê toza Mexmûr girtî, ji fihêtiyan sohr bibû. Zivirî, hat û li ber ciwanê bejna wî zirav, dirêj û dibeşişe sekinî. Keça xweşik bi hêlwestek fihêtokî û liber xwe ketî got;

"Bibûrîne hevalê Şoreş, bê hemdê min çêbû!"

Xortê çav genim û rêza simbêlê wî nû rast bûyî got;

"Na, xem nake. Navê te çiye keçika spehî?"

"Zehra."

"Hevala Zehra tu keça kêyî, qey tu min nas dikî?"

“Belê heval. Ez keça Muhemedê Emerim, carna ji we re mast tînim.”

Xortê aliyek wî şeht û bi desteka kupal jipiya disekine bi dengek yardar got;

“Ya.. tu keça Mamê quto yî. Belê, min tu naskirî Zehra. Vêca tu ya herî refa çend?”

“Seretayî çar.”

“Tu zîrekî Zehra, mamostayê te kê ye?”

“Keçika ji bandora fihêtiya destpêkê rizgar bûyî û êdî bisteh taxive got;

“Belê zîrekim. Li Nînûva mamostayê min hevalê Kamîran bû. Li vêdê hê nizanim.”

Xortê rûken û dibêjîqey dixwaze şerma Zehraya zarok bide revandin got;

“Kanî ez pirsekî ji te bikim, heke bersîva rast bidî tu zîrekî.”

Keçika ji her rewşa wê kifşe bileze û dixwaze zû here nav hevalên xwe di wateya erênî de navmilên xwe hildan û got;

“Bila heval, kerem bike.”

Hevalê rûgewr û îhtîmalek mezin ji bandora birîndartî û şertên jiyanê rûyê wî zirav bûyî, wekî henekan bike tîliya nîşanê ya destê xwe yê sax da lama xwe û pirskir;

“Paytexta Kurdistanê kûdere?”

Zehra, bi hêlwestek bê dudil û bi dengek bisteh bersiva “Mexmîr” da!

Li hember bersivê Zehra xortê Şoreş bideng kenî û lêkir;

“Mixabin, bersivek şaş Hevala Zehra. Ya rast, Amede” û destê xwe li singa xwe da û dewamkir;

“Ankû bajarê mine” û ji bû keçik li berxwe nekeve destê xwe bi serê wê ve anî û axaftina xwe domand;

“Başe Zehra. Ezê pirsa duyem ji te bikim û heke tu bersiva vê pirsê rast bidî emê bersiva pirsa yêkêm jî wekû rast derbazî qeydê bikin. Tu amadeyî?”

“Belê heval.”

“Di vê cîhanê de, herî zêde tu hej kê dikî?”

“Serok Apo!”

Hêstiyiyek watedar dêmê tenik yê Şoreş pêçabû. Kêmek mabû hêstirên zuwa ji çavên bireng bibeyên. Destê xwe li pişta zaroka pêlava wê ya qetayî bi lingan ve narabe da û got;

“De here, ji te re sed!”

Dema keçik bibez ji Şoreş vediqeta, Mamosta Çinar zengilê sifir û mezin dihejand. Dengê nerm û bilind yê zengilê sifir, temtêla xwendevan û serdanvaniyan ji bin ve guhertibû.

Xwendevanên dibistana navîna Şehît Jiyan wekû çar rêz

li rexê Başûr û hemî xwendevanên dibistana seretayî ya Dr. Nûrî Dêrsimî li tenişta wan rêz girtibûn. Sînanê Sohrê di nivê rêza mamosteyan de cihê xwe girtî, gavekî derket pêş û li ser wate û girîngiya perwerdeyê dest bi axaftinê kir. Di dawiya axaftiana xwe ya kurt de got;

"Serok Apo, bi pêş we hemiyan ve got; "Zarokên Mexmûr, zarokên minin." Ev pênaseyek pîroz û biqasî pîroz jî girane. Ji bû hilgirtina vî barî hêza zanînê pêwîste û ev avahiyên we bi destên xwe yên piçûk û xwêhdana eniya xwe avakirîn jî cihê peydakirina vê hêzê ye. Divê em bi hev re vi qedrî mezin û bilind bikin."

Piştî ji dayîkan Mewlûda Şirnexî, Xoxêya Gundikremoyî, Fatma Bilehî, Xanêya Hîlalî û ji rêvebertiyê Sînanê Sohr qurdeleya ji paçek kesk, sohr û zer pêkdihat birîn, xwendevan ji rêzê ve ketin refan. Di hemwextê wê şahiyê de, li dibistana seretayî ya Muhemet Karasungur û Saleh Kendal jî şahiyên vekirina dibistanan hatibûn lidarxistin. Ema ji sedema dibistana navîna Şehît Jiyan û Seretayî ya Dr. Nûrî Dêrsimî li rex hevbûn, şahiya navend li derê wan hatibû lidarxistin.

***

Koçberên Qereçox, bagare erêntiyên li pey hev jiyan dibûn dabûn pişt xwe û wekî berqa bûriskê diherikîn. Axaftina Serokatiyê, hatina Sînanê Sohr û vekirina dibistanan gêwilê wan rakirbû ezmanan û ti neyîntiya nikarî wan zevt bike. Şêwazê ji Sûriye veqetandina Serok û gote gotên di derbarê rewşa wî de dihatinkirin, kêmekî mejiyê wan mijûl bike jî hizrandina "heke Serok ber lingê xwe nedîta gava xwe ne tavêt" hemî nîşanên pirsê ji mejiyê wan dimaliştin.

Hema bibêje çûyîna Serok ya Rûsya mîsoger bibû. Çalekiyên xwebaxşane, fedayiyane yên dîlên Kurdên di zîndanên dagirkerên turk de li pey hev jiyan dibin, wekû saroxdanên xetertiyek mezin dihatin şîrovekirin. Kuleka fer, ya Mexmûrî bi tê re cîhanê dibînin ekranên Med TV bû. Merg û mejiyên Nûmexmûriyan bi wê kuleka cemidî ve hatibûn hilawistin û kesên herî nahes jî nûçeyek tenê jî ne direvand. Rûniştvanên semta du nûçeyên êvarî guhdar kiribûn û bi werîsan demjimara axaftina Serok dikişandin.

Li dewleta Seyîd Reîsê Êraqê, sêlên televîzyonan qedexebûn. Lê li wargeha xweser, ew qedexe û ti qedexeyên din yê rayedarên Sedam derbaz ne dibûn. Ema, ne derfetên gel yên televîzyonan bikirin hebûn û ne jî pergala wê. Ji bilî televîzyona birîndar û nexweşan, çar televîzyonên wargehê hebûn. Her televîzyon aydê semtekîbû û ji her semtê berpirsek yê televîzyonê hebû. Televîzyonên dabaşa gotinê jî

ji aliyê rêvebertiyê ve hatibûn dabînkirin. Ji bû gel bikaribe nûçeyan bişopîne, ji bû her televîzyonê kolikek mezin hatibû avakirin. Di hundirê kulikên dimînin zincên mezin de, singên bi qasî zendekî hatibûn kutan. Qetên girşên dîsa ne ji zendekî stûrtir piştikî li ser serê wan singan hatibûn bicêhkirin. Ji bû hemî temaşevan bikaribin televîzyona li cihek bilind hati bicêhkirin bibînin; kolik li cihek pal hatibû avakirin. Li gel palbiyînê, singên li pêş kurt û her kû bi paş ve diçû bejna singan dirêjtir dibû. Bi seranserê nîvê zincê re rêzek stûn hatibû daçikandin û girşên banê zinca mezin dinixwimandin li ser wan stûnan hatibûn barkirin. Bi nîvê binê zincê re û di navbera singan de neqebek yêkpê hatibû hiştin. Jin û zelamên li ser wan daran rûnîştîn bê deng li cama wê sebetoka piçûk dinêrîn. Zarokên ne fêhm û ji qiyameta di hundirê dê û bavên xwe de bê hay, dizikaka teng de berdidan hev û toza ji ber lingên wan radibû nefesa temeşavanan qut dikir. Şivikek di desta de Silêmanê Nêrwehî yê erkdarê televîzyonê, çep û rast berida zarokên ne tebetî. Ema, piştî kêmekî dîsa zarokan ya dizanîn ew  dikirin.

Wext hatibû û zeman sekinîbû! Dengê cedelvan, gur, zîz û zelal yê Serok ji televîzyonê bilind bibû. Dîsa Rêberê çavbelek, gernasê çar gurçik û hîviya hîvîdaran jixwe bawer û bê minet taxivî. Di navberekî de hevoka; “Ev cîhana serdest zordarên wê, ne me avakirî ye û divê Gelê Kurd ji her encamî re amadebe” ji nav lêhvên wî herikîbû û wê hevoka xetertiyek ne diyar dihewand mergên temeşavanan hişk guvaştibû. Serok, axaftina xwe ya dirêj ajotî bi durişmeyek nû qedandibû;

“Em ji Ankara derketin bûn Partî, bi çûyîna Rojhilata Navîn re bûn Artêş û bi derketina cîhanê re emê bibin Dewlet” got û axaftina xwe qedand.

Hevokên dawî avek hunik bi bimergên dê û bavan de kirinbûn, hemî nîşanên xetertiyê maliştibûn û li ber xwe biribûn.

Li gor çiyayiyan; heyva dawî ya Peyîzê Zivistan bû û divê destên xwe siviktir kiribûna. Bi qedandina dibistanan re, kar ne qedabû. Rêxistina taxan ya ji bû çêkirina dibistanan hatî avakirin berdewam dikir. Semta çar û yêk dîwarê goristanê çêdikirin û ya du û sê jî xayniyê çand û huner û gergera wê amade dikirin. Deravê bîst û yêkemîn salvegera cejna Jidayîkbûnêbû û divê leza xwe kiribûna.

Nîvroyek ya demsala Peyîzê bû. Şewta tîrojên roja wekî qursek zêr liraser rawestayî qederekî bandora xwe wunda kiribûn. Ema, hê jî xwêhdanek tîr di serê pozên paleyên bi zibareyî dîwarê goristana Şehît Nûjîn çêdikin de diherikand. Paleyên semta çar yên nû ji firavînê zivirîn gihatibûn rasta dibistana Saleh Kendal. Qewlikên defter û qeleman di stoyê wan de, du xwendevan bi nav koma palan re bibez bûrîn û ketin di hewşa dibistanê de. Rembo

yê tenik, kurt û qor xwe li pêşiya palan dihejand û Sefqanê Bilehî belaya xwe lê dida. Rembo, xwe aciz dikir û Sefqan ji kenan zik û pişt dibû. Ji hemî tevgerên wan kifşbûn, Mehmûdê Kadûnî û Farîqê Êwilî sohbetek siyasî dikirin û haya wan ji galteyên Sefqan û Rembo tinebûn.

Li hindama şarevaniya xaniyê wê nû hatî qedandin, silavek li Evdila Yilmaz dan û bilez derbazbûn. Evdaliyê destê wî lipiş, sivorî li ser simbêlên wî reqsa bablekan dikin û dibêjîqey hertim ji qestîka dikene, bikeyf silavan palan vedabû. Hê nû ji şarevaniyê bûrîbûn, wekî êdî ji koma paleyan re baxive Farîq, dengê xwe bilindkir û got;

"Hûn bi qedrê xwidêkin, bes yêk ji min re bibêje; belkî ev hezar sale ev Mexmîr bajar û hê goristana wê ne dîwarkirî ye. Ev du rojin em hatîn vêdê û belkî em heyvek din li vê xopanê nemînin, ev Heval vê ecêba dîwar bi me didin çêkirin?"

Sefqan, gotina Farîq birî û bi awayek tinazî tevlî sohbetê bû;

"Belkî deh sal din jî em li vêdê bimînin, ma kê dizane!"

Farîq, her du destên xwe li hev dan û bi awayek ecêb mayî bersiv da;

"Deh sal! Kuro ez salek din bimînim vêdê, ezê bêjim ding û biteqêm!"

Mehmûdê gir, bilind û tîrojên roja peyîzê li ser serê wî yê tazî reqsa Torikî dikin, keserek kûr kişand û got;

"Wusa nebêje Farîq, bextê zorhêzan nîne."

Remboyê çarkuçkek li ser mila û bejna xwe ya xwehr ji asayî zêdetir dihejîne, axaftina Mehmût birî û bidengek misoger got;

"Dilê xwe rihet bikin. Hey xwadê hes bike, ev peyîza me ya dawî ye."

Nîvê meha Mijdarê bû. Bi qasî were hîskirin germ şkestibû û bayêkur tozek sivik ji  nav malên zincikî radikir. Serok, çûbû Romayê û di nexweşxaneyek teybet de dihat girtin. Vê nêzîkatiya dewleta Îtalya Kurd rakiribûn serhildanê û cîhana zordaran ji bin ve dihejandin. Şervanên Kurdistanê, li pey hev û bê navber çalekiyên fedayî dikirin û di mejiyê xwînkaran de diteqan. Şervanên dîl, bedena xwe didan ber agir û biteybet dîmenên Tayhan Kahraman û Ahmet Yildirim'ê xwe li Moskov şewitandîn zerevên zarokên şaristaniyetê diqetandin.

***

Li qontara Qereçox zeman rawestabû. Kilox li mejiyan teng bibûn û dil sefta sing bê mehwer dihingavt. Cîhana xwînkaran bibû yêk û gotinek ya xêrê ji devê wan ne derdiket. Nebza Kurdan li Romayê dijenî û ew pêvajoya du serî û her du serên wê jî bi agir

ya çawa û li kûdê bidawî bibûya tukesî nizanî. Ahûra Mazda û Ehrîman di ber hev de dibezîn û wê cedela bê mefer merg û mejiyê Mexmûriyan dîl girtibûn. Dayîk û keçên ji bû dûtina zincikên xwe ji axkemkan ax dikişandin, ji xwêhdanê şil bibûn û êdî destên wan li îş ne digera. Muhemedê dîn, li derê dibistana Muhemet Karasungûr li ser pişta kererebana xwe rûniştibû û êdî ne dikenî. Kerê zeyîf û ji nîriyekî ne mezintir, biguhên xweyên şilûpe mêş ji xwe difirandin û dibêjîqey tevlî xema xweyê xwe bibû. Dengên mamostayên ders didan, an jî şerê xwendevanan dikirin ji hev nedihat cudakirin û heta bi ser cadê dihat. Bi Şiyara, 'em li Serokê xwe xweyî derkevin' di bin pêşvantiya Riza yê rêvebir de sêsed kes li şarevînêyê ketibûn rojiya mirinê. Çalekvanên di bin kolika dihewşa şarevaniyê de serdenvanên xwe pêşvazî dikirin, hêstek du serî jiyan dibûn û wirarên wê dilniyatiya kevin di dêmên wan de nedihat dîtin. Li her çar aliyên cîhanê Kurd rabibûn ser lingan ema, ji serê wê mehê ve YNK jî tevlî eniya PDK'ê û Turkan bibû û li dijî Tevgera Serok Apo têkoşînek bê heya dabûn destpêkirin. Bi durişmeya 'em li Serokê xwe xweyî derkevin' rabûna Kurdan çiqas hîvîdar be, xiyaneta her du dilxwede partiyên Kurdan jî ewqas hîvîkujbû.

Gelo, ev çîroka yeman û du serî tenê ji behra me kurdan re ketibû? Xwedayên şaristaniyetê ev qeder li ser eniya me nivîsandibûn? Dema Bavê Kal didutiya tarîtî û ronahiyê ji majên xwe re vedigot, dikara vî encamî ne kiribû? Gelo çima heywanan jî bêbextiya Enkîdo nepejirandibûn û di nav xwe de ne hewandibûn ema, di roja me de bi hezaran hemtoxmên Enkîdoyên hemdem ji bû Girgamêşan êrîşî Xan Bavan û Stiyên bisk kesk dikirin? Gelo, vê cenga bê eman û bê dawî ya wekî du hespên rehwal di ber hev de dibezin, ji hinga Enkî yê qurnaz sed û çar '**mê**'yên Stiya Stêr dizîn ve destpêkiribû? Gelo, ev şerê hêstên bijûn û mejiyên analîtîkbû? Bi gotine Serok Apo ve "Dîrok, di roja me de û em di destpêka dîrokê de veşartîne!"

Belkî jî ji wê cenga Stiya Stêr li hember Enkî yê qurnaz wundakirî ve, ya hatî guhertin tenê navbûn. Ji neseban ribat ne birhabûn û her dixwirîn ema, toqa qedapdar jî hê nehatibû hûrkirin.

Rêberê hêstên bijûn, mergên azad piştiyê cîhanek behremend li pişta û rime rima dengê lingên wî di guhê Neron û Mussolînan de vedida. Wekû artêşek yêk kesî Sefera fetehkirina kelha zulmê dabû destpêkirin û zîqe zîqa bizmarên dergahê Kelha zordaran zeravê nevî çîçirkên Enkiyan diqetandin. Hêstên bijûn rabibûn pêdarê, bibûn lehî û ber bi Roma yê ve diherikîn. Li hember wê cîhana azad û behremenda yêk kesî, tevayê cîhana xwînkaran xwe di şûr û mertalan de pêçabûn kemîn girtibûn, kuzikên xwe asê kiribûn û bi çav sohrî êrîş dikirin. Li hember mirovek merg tazî,

hemî cîhana zordest û bi tevayê hunermendîtiya xwe ya bêbext ve rep sekinîbû. Nûkerên hemtoxim û hevalên hêst çêrayîn jî li rex.

Serok serbest hatibû berdan û di xaniyek asayî de hatibû bicêhkirin! Girêdayî vê pêşketinê, çalekvanên rojiya mirinê jî bi meşek biheybet dawî li çalekiya xwe anîbûn. Beyaniya roja bîst û yêkemîn ya salvegera Cejna Jidayîbûnêbû. Koçberên Qereçox, bi hêstên li ber fûrandinê bibûn lehî û ber bi qada pîrozbahiyê ve diherikîn. Qada ji berya mehekî parçeyek çola dest lê nedayî, êdî binavend, dike û gergere beşdarvanan xwe pêşwazî dikirin.

Xalê Xatir, zelamek navser û kesek misexirbû. Berpirstiya çêkirina dirîncên gergerê girtibû ser xwe û bi wê erka xwe şad dixwiya. Di nîvê gergera nîvheyv de li ser dirîncikekî sekinîbû û bikeyfek mezin li şah esera xwe dinêrî. Cemedaniyek reşbeleka ji qirêjê reng guhertî serê keçel dinixwimîne ristvanê wargehê Ferhadê Merdê, bi gavên bilez û bikelecanek mezin bi dora dikeyê nû hatî qedandin re dizivirî. Hunermendên bejin û bala xwe bi cilên Kurdî xemilandîn, li derê xaniyê xwirî kuç û li gor zincikên wargehê dimîne Birca belek diqijwijîn. Seranserê pişta dikeyê biqasî bostekî bilind û betona wê nû; stûn hatibûn daçikandin û rûyê wan stûnan bipaçek mezin hatibû nixwimandin. Wêneyek mezin yê Rêber Apo, bi bin nivîsandina ‘’21. Salvegera Cejna Jidayîkbûnê Pîroz be” hatibû hilawistin û ji rêzê ve wêneyên pêşvanên di damezrandina Partiyê de rol û keda wan mezin.

Kirasek Bohtaniyê sohr yê dawa wî erdê dimale li ber bejna wê ya zirav û dirêj Hemra ya Şiwêdî, mikrîfon di desta de li cem miksêrê sekinîbû. Dengê strana ‘Serok Apo, Bilind Apo’ ya ji aperloyan bilind dibû, di qontara Qereçox de vedida. Hema bibêje yêk ji keça herî spehî ya wargehê pêkêşvana rojê Hemra Şiwêdî bû. Pêlava bipehnî ya di bin kirasê Kurdî de wergirtî, bejna wê ya dima tîrika esmînê bi wezbetir ratêxist pêş çavan. Xal xalok diketin pora lib lib kirî û wekî hervîşim direcifî. Pora qemer, biteşbîha fitlên marê reş dirija ser kemexan û leylanokên jê vedidan çav diterifandin. Kelecana zerî esmera gerden gaz, ji dûr ve jî dihat ferqkirin.

Koçber, li ser leftikên gergera ji fikrên Xalê Xatirê Torî zayîn rûniştibûn û çaverêyî zarokên Serok Apo rawestabûn. Û Pêşiya xwendevanan dabû der. Her yêkî bi aliyek yê wêneyê mezin û çarçovekirî re girtîn Mehmûdê Sofî Şukrî û Nazdara Hîlalî li pêş, li pey wan Metînê Eşrefê Gundikremoyî û Nêrgiza Hîlalî ya lewheya navê ‘Dibistana Navîna Şehît Jiyan’ li ser nivîsandî hildigirtin û hemî mamosta û xwendevan li dûv wan. Xwendevan, bi meşa leşkerî di ketin diqada cejnê de û rime rima bi aheng ya lingên wan ezmanê heftê dihejand. Dengê pêşkêşvana narîn ya xêrhatina xwendevana dikir li singa qereçox diket û bilind vedida.

Ji rêvebertiya wargehê Sînanê Sohr, derket ser dike û li ser wate û girîngiya rojê axaftinek kurt kir. Zelamê zer, por gustîlok, simbêlên sohrê dibêjîqey henakirîne di ser lêhva jor de dihatin xar, bejin navîn û tijî; axaftinek hêstî ya girêdayî rewşa Serok Apo kiribû. Rêveberê temenê wî ne gihatî sih û pêncê û destek cilê Bohtanî bejna wî ya girover dinixwimîne, di dawiya axaftina xwe de sê caran durişma; “Bijî Serok Apo” qêrî û girseya gel jipiya dubarekiribû.

Piştî axaftina rêvebirê Sohr, bernameya xwirî girêdayî rewşa Serok hatî tekûzkirin, heta piştî nîvro ajotibû. Bernameya fermî ya şahiyê qedabû û bêhna herkes liçaverê hat û xwe pesart. Pîr û ciwan, keç û xortan govend girtibûn û gêra govendê di navbera şarevanî û mala Muhemedê dîn de fireh dizivirî. Toza ji ber lingên reqasvanan radibû, li raser vedigera çêlek ewr û rûyê rojê dinixwimand. Xwêhdan di serê pozên sergovendiyan de dibû şirik û kefî ji dest hev direvandin. Bi malavayiya pêşkêşvana spehî re dawî li şahiya Cejna Jidayîbûnê hatibû û herkesî berê xwe dabû derê kolikên televîzyonan.

Meha Kanûnê ber bi dawiya salê ve perên xwe dikutan. Ji berya nîvroya rojek sarbû. Bayêkur, ewrê reşê ji doh ve kombiyî û hîviya taviyek baran avakirî tert û belav kiribû. Bayê hişk û zuwa tozek sivik û tûj hawa têxist jor û  wekû bablîsokan di ser xaniyên zincikî de diherikand. Ji endamên hêza xweparastinê Qehremanê Şehrikî û Metînê Heletî, tîkên êlekên wan li ber bayê liba dibûn û di derê mala Dexîla ziravikî de daketin. Her du zelamê tenik û şidayî li hindama deriyê mezin, bilind û bitîpên mezin UNHCR li ser nivîsandî sekinîn. Deriyê hêsin, stûr û ji asayî pir bilindtir dergahê hewşa navende Saziya UNHCR bû. Dîwarê hewşa bilind, xaniyê ji nîvê taxek ya wargehê mezintir daquratndibû. Li ser dîwarê bilindahiya wî sê mitroyan derbaz dike têlek girover û bistirî hatibû gerandin. Dîwarê bi çîmentoyê hatî dûtin, biboyaxek gincira teybet hatibû boyaxkirin. Li rasta deriyê hewşê mezelek bi kulek, pencere û du derî hatibû çêkrin. Deriyê paş yê  mezela bendeyan jî derdiket heman hewşê.

Li tenişta rastê ya kelha kor xaniyek bi heman boyaxê hatî boyaxkirin, derî û pencereyên wî teybet û hewşek piçûk li pêşyê hebû. Li dawiya rêza xaniyên mezin û bi awayek teybet hatîn çêkirin, nexweşxaneya hê kavil û nû biser re hatî girtîn disekinî. Gerkû nexweşxane hê ne hatibû dûtin, bê derî û pencere jî bû, dest bikar kiribû û erkdarên tendûristiyê yên ji wargehê di hewşa wê de diqijvijîn. Li ser girikê li beramber nexweşxaneya kavil, li derê xaniyê ew jî nû hatî çêkirin, bê hewş û bi boyaxek hişîna tarî hatî boyaxkirin leşkerek jipiya sekînibû. Leşkerê kumek xwehr û bê merîs di ser guhên wî yên bel de dihat xar û delingek ya wî li jor yêk li jêr, zîq li Ferîdeya endamê tenduristiyê dinêrî. Hinga awrên

Qehreman li çavên şemşirî yên leşkerê qehb hatîn qerastin Metîn, destê xwe li dîwarê hewşa kelha UNHCR da û bihêrs got;

"Tu bi qedrê xwidêkî Qehreman; bi diravên li dîwarê vê hewşê mezaxtîn dikarîn çend xetên avê ji me re bînin?"

Wekî li rûyê mejiyek xeşûm binêre Qehreman, bi awrên kûr li dêmê Metîn nerî û di hemdê xwe de axivî;

"Wê hingê wateya xwedatî û bentiyê ne dima. Nîşana xwidêtiyê, di qesir û sereyan de keyf û galteye û ya benîtiyê jî di kolik û kuxikan de êş û îza ye."

Dengê tirimpêla buhadar ya Muhemet Elî yê rêvebirê UNHCR sohbeta wan birîbû. Toza ji ber tekelên tirimpêla ajotvanek tilzir tajo û Rêvebirê keçel li rex rûniştî di navguhê wan de barîbû. Hê tirimpêl ne gihatî ber derî, dergahê mezin bixwe vebû, tirimpêl çû hundir û deriyê mezin û du felq li paş hat dadan.

Her du heval, bi toza xwe ve û bi pêyan ber bi Mexmûr ve ketin rê. Di ketina Mexmûr de, du yêxtiyaran delîngên şalên xwe heta bi kabê kişandibûn, çarmêrkî li ser çîmentoya li tenişta cadê rûniştibûn û dam dileyîstin. Jipiya sê çar kes liraser leyîstvanan rawestabûn û bikelecanek mezin digotin; "biro, biro!" Qehreman, li koma leyîstvan û temeşavanên kelecana wan di lotkeyê de nêrî û ji Metîn re got;

"Nîvê nîriya havînêbû. Hê em nû hatibûn vî warî. Dîsa ez carekî hatibûm Mexmûr û dîsa ev dîmen li vêdêbû. Ne germ û ne jî serma van mirovan tesîr dike. Qey ev çi toxmên beşerane?"

Metînê jixwe li hêncetekiye neyînî baxive, bideng kenî û bersiv da;

"Yan em ne mirovin, yan jî ew. Di navbera me de pirsgirêkek ya hevtoxmiyê heye."

Her du ciwanên çiyayî û qevzên xwe bilind tavêjin, leyîstvanên têr temaşevan lipey xwe hiştin û bi nav xaniyên bêhnek genî ji zikakên wan difûre re rêya xwe ajotin. Bi pişta xaniyê fer duqet û xwirî ji kursiyên kuçên necirandî pêktê re derbazbûn û ketin di bazara genî de. Ji bazara ji çend erebaneyên sewze, fîkî û hûr û mûran pêktê bêhnek genî difûrî. Avên ji serşûk û mutfaqan diherikîn, bi cokên nav bazarê re derbaz dibûn. Rûyê qirêja di cokan de berhev bûyî wekî qîrê reş dikir. Xwarina wekî qafûyê xwe dayî kenarê cokan rizîbû û bêhnek sifto li firnikên pozan dida. Metîn, bi pozê xwe girt û Qehreman destê xwe kiribû baweşînik û bêhn jixwe dûr têxist. Her du xerîbên di nav cilên biyanî de, bilez ji bazarê derketin. Bi cada fer ya bajar di nîvî re têxe du qet re biqasî sed mitroyan çûn û li destê çepê zivirîn. Piştî kêmekî, bi deriyek nivz re ketin di hewşek mezin de.

Jin û mêr têkel, hema bibêje nîvê hemwelatiyên wargehê di

wê hewşê de bûn. Biqasî bîst kesan li dora zelamê por hişîn bibûn hevşî û yên din jî di nav hewşa bê xweyî de belav bibûn. Ji Evdilayê Spêrtiyê li devê derî bi çavên xwe nîşana neyîntiyê kirî bûrîn û berê xwe dan zelamê li ser kursiyekî rûniştî. Zelamê pora hemiza sîx serê wî mezintir dixwiyîne, bê navber li tûşên telefonek ahîzedar dida. Qehreman, bi arîkariya bejna xwe ya dirêj bi nav koma ji telefonê bê hîvî bûyîn re bûrî û got;

"Mam Sefer, xet heye?"

Zelamê navser, destek cilê Kurdî keleşa wî yê girover distirîne, bi bin dûvikên çavên xwe re li Qehramn nêrî, dest bi lêdana reqemek nû kir û bersiva; "Înşaallah, înşaalhah" da. Mam Sefer, heman bersiva "xwa kerîme, Înşaallah" dida hemî muşteriyên xwe. Ema, ji sibehî ve ne telefonek derketibû û ne jî telefonvan ji lêdana reqeman kerixîbû.

Qehreman, kaxeza reqema telefonê li ser nivîsandî ji kûrika xwe derxist û raberî zelamê por xemor kir. Zelamê bê navber li tûşên telefonê dide ji Qehreman re got;

"Ez reqema te dizanim!"

Bi gotina telefonvan re çavên Qehreman firehbûn û bi hêlwestek bê yêqîn pirskir;

"Tu henekan dikî, qey tu çawa reqema min dizanî?"

Zelamê şaqistiya muştêriyê xwe bi hêlwestek xwezayî pêşwazî kirî beşişî û reqema Qehreman hêjmar bi hêjmar hêjmart û got;

"Ma tu ji berya hefteyekî jî nehatibû vêdê?"

Qehreman bersiva; "belê" da.

"Reqema ez carekî li telefonê bidim, demek dirêj jibîra min naçe. Hem dengê xweyê reqemê û hem jî reqem di mejiyê mîn de tomar dibe" got û destê xwe bibaskî koma mirovên êdî ji telefonê bê hîvî bûyîn û belav dibin ve kir. Ji bû fêrbûna xweya zêhndar delîldar bike gotinên xwe domandin;

"Ez navê yêk ji van mirovan nizanim ema, hêjmara telefona hemiyan dizanim. Tu kûjanî dixwazî bangbike bila were, ezê reqema wan ji te re bibêjim."

Yê ewil hatî bîra Qehreman hevalê wî bû. Bangkir Metîn û kengê mam Sefer çav bi Metîn ket, reqema wî ji rêzê ve hêjmart.

Koçberên ji derketina telefonê bê hîvî bûyîn hêdî hêdî belav dibûn. Qehreman û Metîn li cem Mam Sefer rûniştin û dest bi sohbetek kûr kirin. Ji destê wî yê tenik û ji tiliyên zirav kifş dibû kû mam Sefer, demek dirêj karmendîtiya mêzeyê dewletê kiribû. Bi destê xwe avahiya mezin ya li derê wê rûniştîn û camên pencereyên wê şkestîn nîşakir û bidengek hêstî sohbeta xwe ajot.

"Ji berya hêsara Amerîka evder postaxaneyek mezinbû. Tam

bîst û heft salan min di vê postexaneyê de karmendîtiya telefonê kir."

Qehreman, bi heyrantiyek mezin got;

"Vêca raza jiberkirina reqemên telefonê çiye, rêbazek ya wê ya teknîkî heye?"

"Na. Mitalebûne, fêrbûne. Min demek dirêj ev kar kir û fêrbûm. Daxwaze, tu çi jidil bixwazî tuyê fêr bibî."

Metînê heta hingê tevlî sohbetê nebûyî û tenê guhdarvan ji nişkan ve got;

"Mam Sefer, di vê cîhanê de tişta herî zêde dixwazî çiye?"

Zelamê dapek reş li serî nemayî û porek hemiza hişîn serê wî yê mezin dinixwimîne, dibêjîqey ew pirs bû daxek sohr û li serê dilê wî ket. Xwe guvaşt û avek rohn cirnikê çavên wî dagirtin. Kelgiriya di qirika xwe de daqurtand û got;

"Tenê dixwazim herim gundê xwe!"

"Gundê we li kûye?"

"Li başûrê Qerac, li ber ava Dîcle ye."

"Gundê we valeye, niha kes lê heye?"

Zelamê hê jî dewsên şilahiyê di çavan de diyar keserek kûr kişand û lêkir;

"Sedam, em derxistin û gundê me da Ereban. Niha gund tijî Erebên Şemarin."

Dema Metîn xwe hazir dikir pirsek din jî bike, dengê Melayê merxebê bi ser kavlên Mexmûr ketibû. Mam Sefer, demjimara xwe nîşakir û got;

"Bibûrînin, divê herim mêjê" û ji hev veqetan.

## Tu Kes Nikare ROJ'a Me Tarî Bike

**"Hîvî, ji serkeftinê binirxtire."**
**Serok Apo.**

Çileyê zivistanek zuwabû. Zû sibeheka rojek ya Şemiyê bû. Bayek hişk û zuwa rûyê xwendevanên li dûv hev, bê lept rêz girtîn û di amadebaşiyê de sîroda Ey Reqîb dixwendin zele dida û derbaz dibû. Cilên bedena zarokan disitirandin jirêzêbûn û piraniya wan ne yên demsala zivistanêbûn. Ji serma serê pozên xwendevanan sohr bibûn û lêhvên wan şeqitîbûn. Kursî û mêze jî di nav de refên xwirî ax, bê sopebûn û amêra fer ya germkirinê nefesa wan bixwebû. Li gor welatê jor û ew komika mirovan aydê wê, zivistana Mexmûr ne dijwarbû. Gerkû her du mehên destpêkê yên demsala zivistanê qulibandibûn jî ne taviyek barana dijwar dîtibûn û ne jî lingên wan li berfa spî ketibû. Ema Havîna wê xopanê çiqas tengvan be, Zivitsanê wê jî ewqas hişk, zuwa û acizkerbû.

Mexmûr, li Başûrê rojavayê Kurdistan li ser xala dawî ya tixûbê welatê Êraqê cêh digirt. Ew bajarê qedîm yê di navbera çemê Dîcle û çiyayê Qereçox da hatî avakirin, di wextê xwe de bajarek navdarbû. Ligor etîmolojiya Kurdî, bêjeya "mexmûr" xwimamtî, mijdartî û şêlotiyê nîşan dike. Qereçox, ji çiyan kêmtir sirtekbû. Wê silûma rût û keçel, ji Bakurê bajarê Kerkûk destpêdikir û berbi Bakur ve heta bi çiyayê Kezwana yê Hesekê dirêj dibû. Di zimanê Kurdî de "qer" tê wateya reşêtarî û "çox" jî erd. Ankû, erdê reş.

Piştî serkeftiyên şerê Cîhanê yê yêkemîn welatê Kurdistan kirin çar qet, bajar ketibû di bin desthilatdartiya Ingilîzan de û wekû navçeya Nûava di xerîteya siyasî de cihê xwe girtibû. Di

rastiyê de bajar, ji Nûava (Mûsil) bêhtir nêzîkê Hewlêr bû. Ema ji sedema hegemon û dagirkerên herêmê Nûava wekû navendek ya asîmîlasyonê hilbijartibûn, Mexmûr jî girêdayî wê qeyd kiribûn. Avhewaya warê wekû embera dexlê dihat pênasekirin û xweyê axek pir zexim, ji avhewaya xweş ya Kurdistanê ne pir dûrbû. Ema, jiberkû di tixûbê berîstana erebîstanê de cêh digirt, di astek bilind de nesîbê xwe ji toza berîstanê digirt û bi bager û girêdayî wê bi toza xwe navdarbû.  Aha, ya ew êşa dimohr bi Kurdistaniyên çiyayî dida jiyandin ew tozbû.

**Ezvantî**

Ezvantî û kesvantiya ji malzaroka bazar û bajaran jidayîkbûyî destpêkê dayîka xwe û her tişt kuştibû. Çîroka Mardoq û Tiyamat vegotina vê rastiyêbû. Nandoztiya di zemanê Berpenîr de sernivziyek bê şeref, wekû 'doza nan' hatibû wergerandin û hemî ruswatiyên pîroz liwê hatibûn barkirin. Bêje li hev guhertibûn, spehî sik kiribûn, qedap pîroz û pîroztî wekû qedap di mejiyên nandozan de hatibû tomarkirin. Ji sed û bîst û çar hezar pêxemberan sebebê 'eleyhî ne'eleta' Bavê Kal encamê vê fetehkirina zêhniyetanbû.

Bajarên mezin avakiribûn û olî li ser hev barkiribûn. Benî kiribûn dergehvan û xwedayên şaristaniyeta nandoz hawaketibûn ezmanan. Wujdan kuştibûn, exlaq kedîkiribûn, hêst çêrandin, jiyan li hêjmarên matematîk barkiribûn û ber bi qiyameta sohr ve ajotibûn. Xela rakiribûn û mirov bê hiş kiribûn. Zayîn bê qedir kiribûn û maka zayînan di guldankên zalimgehên xwe de kiribûn xemla dîtina çavan. Tuxûp kişandibûn, kelaş pişk kiribûn û bedenên zayîngehên pîroz vegerandibûn sergûyên qesrên xwe.

Gelo, heye dîsa giya li ser koka xwe hişîn bibe? Wekî carikên caran dîsa ser tîrên roja pîroz ji Zaxrosan bidin der û cemeda li ser mejiyan bihelîne? Benî qeyd û leleyên xwe biçirînin û bi teşkên xwedayên şaristaniyeta bîjî re bigrin û di qesran de bînin xar?

Gelo heye dîsa, çiraxa şevên Kurdistanê çerxa feleka me Kurdan rast bizivirîne û vegerîne Îrema Baxê Bohtanê? Pêlên Dîcle li ber dengê Mîrê gotinê rabe pêdarê, bibe tofan û hemî qeyd û leleyên Enkiyan li ber xwe bibe!

Sibatoka dîn hat û xwe pesart. Ji hinga Serok ji Roma yê veqetayî û pê ve nûçeyên binakok ji hewa ve difirîn. Xwedayên şaristaniyetê dinanên xwe qîç kiribûn û xwîn ji lixabên wan diherikîn. Kefşîla ji London diza li Waşhîngton dibû gol û li tevayên paytextên pergala mêhtinvan digera. Mijokdarên bi xwîna beniyan til zirkirîn, bi yêk dengî direyîn û dixwestin dubare û carek din Roja Zaxrosan tarî bikin.

Li qontara Qereçox merg qerisîbûn û dilan di sefta xwe de kêferat dikirin. Mejiyan hukmên xwe wunda kiribûn û bi singa kolikên televîzyonan ve asê mabûn. Qalik li ruh, kilox li mejî û sing li dil hatibûn hev. Her kû bêhna wê komika bosekirî teng dibû, li derê navenda çand û huner kom dibûn. Bi al û durişme birêya pişta Germavê re dimeşin, bi derê navenda UNHCR'e dizivirîn û dîsa dihatin heman cihê destpêkirîn. Û dîsa li xwe dizivirin û nefsa xwe ceza dikirin. Ew komika mirovên merg resen, di nav sînorên wargeha Mexmûr de hatibûn asêkirin û li hember xwe ji leşkerên şepirze yên Êraqê zêdetir tu kes ne didîtin. Gelo, ew meş û rojiya çendêbû, ne dihat zanîn. Ema, bê kerixandin û birikek mezin jipiyabûn û ji qayîmtiya vîna wan kifş dibû kû yên her jipiyabûna.

Beyaniya roja şazdehê Sibatoka dînbû. Ji hefteyê roja Sêşemê bû. Gerkû zû sibeh jî bû, bayê har keziyên germ li dêman didan û derbaz dibû. Mîlên demjimara elefiringî ber bi heftê ve dijenîn. Kesî dil ne dihişt bi awayek eşkere bîne ziman ema, Mexmûriyan bêbextiya cîhana şaristan ji zû ve hîskiribûn û şikestekên hîviyên dawî jî di mergên wan de diperpitîn. Ne dihat zanîn ew şeva çendêbû rêya xewa şîrîn bi çavên wan neketî ema, sibeha wê şeva bê henase dîsa ji dervebûn û dîsa li ser pêyabûn. Şivikên radyoyên xwe kişandibûn û bi hêstên qerisî mejiyê wan bi wê amêra qedapdar ve hatibû qulfkirin. Bidilek kul û pazdehên birîndar çaverêyî nûçeyên BBC rawestabûn.

Ew demjimara nakokiyek yeman lîwê hatî barkirin hatibû û ya bihata. Ti carî nakokiyek evqas dijwar, du serî û her du serên wê daxdar li qetek zemanê ewqas kurt nehatibû siwarkirin. Û pêşkêşvana pişkek baş ya benîtiyê jiwê re ketî wekû sernûçeya destpêkê got;

"Abdullah Ocalan, li Turkiye ye!"

Tirkên ketibû dilan, cîhan ji eksena xwe beyîbû û qumên ketibû wargehê. Kesî ji kesî tiştek pirs ne dikir, kes bi kesî re ne taxivî û herkes ber bi navenda UNHCR'a Dewletên Yêkbiyî ve dibezî. Penga lehiya Mexmûriyan li derê kelha kor bibû gol. Deng ji kesî ne derdiket û çav vegerabûn pêlûxên sohr û di valetiya ezmanan de li hedefekî digeran.

**Hemra**

Hemra, keçek spehî, bejin zirav û bilindbû. Belkî jî yêk ji keça herî bedew ya wargehêbû û temenê wê nû gihatbû bîstê. Ji gundê Şiwêd ya Qulaban bû û bi malbata xwe ve tevlî karwanê qetek axa azad bibû. Deng xweşbû û endamê saziya Çand û hunerbû. Ew hefteyekbû di çalekiya rojiya birçîbiyînê de bû. Ew jî bi bira destpêkê

re gihatibû derê navenda UNHCR. Dema ciwan bi hêrsdartiyek mezin hildipirijîn dîwarê hewşa kelha kor ew li tiştek din digera. Ji bû hatina qiyametê bisekinîne, dixwest çalekiyek mezintir bike. Ema şekil û şêwazê çalekiya liwê digera, di serê wê de safî nebibû. Hêstên wê difûran û mejî hukmê xwe jidest dabû. Dema hemî xişmên ji awrên kîndar dibarîn ser tirimpêla rêveberê DY, mejiyê Hemra yê bilind vedida. Çavên wê yên wekî du pêloxên sohr bûyîn, ji nişkan ve bi deriyê serşûka mala Muhemedê Ziravikî ve aliqîbûn. Tebaxa gurî, bi ber betaniya erka derî dibîne re dixwiya! Dîmenê awrên wê dîl girtîn, wekî berqa birûskê mejiyê wê hingavtibû. Belkî jî ya lê digera peyda kiribû.

Ew terezina nazenîn û li ber keviyên Kêla Memê gihatî, bi gavên bê dudil ber bideriyê serşûkê ve meşî. Betaniya li ber derî rakir, bi her du çengên xwe yên şepal tebaxa tijî qazyax û guriyek kesk li ser dikeve hilda û bibez derket. Di nav nîvê koma mirovan de tebax rakir û qazyax bi pêta agir ve rijand ser serê xwe! Û di cêh de ew bejna şepal vegerabû gokek ji agir.

Bi hezaran awrên şaqistî ji wan dibarîn, vegerabûn ser wê şenge jina kelaşê wê vêgerayî stûnek bipêt. Hemrayê çengên xwe yên şepal rakiribûn jor, bi tiliyên xwe yên zirav û dirêj nîşana zaferê dikir û bê navber durişma, “Tu kes nikare ROJ’a me tarîbike” diqêra!

Teybeta Hîlalî, bi jêhatinek bi ser asayî re betaniya bi devê serşûkê ve ji şelîtên wê qetand, li nav ava di stilî de hilanî û bi hostatiyek mezin avêt ser serê Hemra yê. Bi arîkariya kesên li derdor jî keça fedayî dan erdê û betaniya şil liwê pêçan. Di wê navberê de bidehan kesên din bi galon, stîl û bêrdoşan av dibarandin ser pêta dengek tirsdar jê bilind dibû.

Hemra, giran birîndar bibû. Dema girseya gel li ser destan ew ber bi nexweşxanyê ve dibezandin, hê jî tiliyên destên wê yên çermê wan şelpitî û goştê sohr bê star mayî nîşana zaferê dikirin û hê jî durişma “Tu kes nikare Roja me tarî bike” diqêra!

***

Mala birîndaran li qontara jor ya semta sê, li rex mala yadê Xanê ya Hîlalî bû. Nêzîkê pazdeh kesanbûn û ji sedema piraniya wan şeht, bê ling û nekaribûn, rêvebertiyê ji wan re televîzyonek piçûk dabîn kiribû û di xwaringeha wan de bicêhkiribû. Bibihîstina xebera ne bi xêr re, piranî bi çûkanan û hemiyan berê xwe dabûn xwaringahê. Televîzyona ji êvar ve li ser sata turkî mayî, nûçe û dîmenên girtina Serok bi alan û dîlan û wekû nûçeya lezgîn dubare, dubare nîşan dida. Xwîn di laşên birîndarên giraniya wan ciwan û her yêkî di şerê azadiyê de aliyêk yê laşê xwe wundakirîn de

qerisîbû. Belkî di şertên zehmet yên şerê Namûsê de ya herî neyînî jî hesabindibin ema, girtina Rêberê xwe qetiyen!

Bi çavpêketina ewil re, ciwanê lingê wî yê rastê biranê stûr re qutbiyî û bi arîkariya her du çûkanên di bin milên xwe de jipiya disekine; jidil çûbû û vexwimihabû. Yêk dinê çavên wî wekî du pêlûxên sohr bûyîn, serê xwe li stûna di nîvê xwaringehê de dida û xwîn ji eniya divizikî. Di mergan de qiyamet rabibû û herkes digiriya.

Şoreşê Amedî, di şerê not û pêncê de hê hijdeh salî bi birîndarî ketibû di destê Pêşmergeyên mala Berzanî de. Fîşek, bi ser dutayiya re li sêvoka çepê ketibû û di milê din re avêtibû. Birîna wî giranbû û nikarî laşê xwe bilîvîne. Di wî halî de derman ne kiribûn û demek dirêj îşkenceyek giran liwî kiribûn. Şoreşê ciwan, di nav lepên nûkeran de şeht bibû û ketibû ser piştê. Şoreşgerê êdî nikarî laşê xwe bilepitîne par biharê ji îşkencexaneyê derxistibûn û avêtbûn ser sergûyek ji derveyî Duhokê. Piştî demekî di nav sergû de dimîne, wekû rasthatî şivanek li rasta wî tê. Şivanê ji dîtina wan dîmenan ne biyanî, pirsa daxwaza wî dike. Şoreş, ji zelamê navser re dibêje;

“Heke tu bikaribû ji dizî pêşmergeyan ve min bigihînî wargeha Nînûva, ezê qenciya te qet jibîr nekim.”

Wujdana zelamê şivan, li hember bêçaretiya ciwanê xweşik radibe pêdarê.  Gerkû kuştin jî bi serê wê ve hebû, zelam jibiya wujdana xwe kiribû û bi awayekî Şoreş gihandibû Wargeha Nînûva. Ji hingê ve rêvebertiya wargehê Şoreş spartibûn mergê şefadar yê Yadê Xanê. Dayika dildar, serê wî dişû, dohnê zeytê li laşê wî dide û rojê sê caran laşê wî yê şehtkirîn mesaj dike. Niha êdî Şoreş, bê çûkan û kupal radibû ser xwe. Bê minet digera û yêk meş û pîrozbahî ne direvandin.

Xortê tenik, bejin navîn nûçeya bêbextiya cîhana desthilatdar ji radyoyê guhdarkirîbû. Di mezela nivz û piçûk ya razanê de li ser betaniya xwe ya wekû doşek bikartanî rûniştîbû û daketibû nav mitelêyên kûr. Fikek çêdikir û deh jî diherifandin. Dibêjîqey awrên wî yên bi taqê beramber ve daleqayî mayîn, di valetiya piçûk de li hedefekî digeran. Ema çi û navê hedefa bi xendegên mergên xwe bihingêve çibû? Hevalên Şoreş, ciwanê di xwaringehê de vexwimayî; di nav xwe re kirin, anîn û li cihê wî yê rexê re dirêjkirin. Xortê ji berya demekî fîşek ji patika xwe xwarî, fişekê biçavê rastê re avêtî û çavê wî yê teqayî wekî cirnikekî kûr mayî, bê navber jipesna taxivî û digot; “na, na” û dubare ji hiş diçû.

Şoreş, demek dirêj bi awrên hizirdar li dêmê tenik û li çavê cirnik yê hevalê xwe nêrî. Ji bû here ber televîzyonê meylda rabe ema, biryara xwe guhert û dubare li cihê xwe rûnişt. Ewî dewleta turk baş nasdikir û dîmenên bidin pêş jî texmîn dikirin. Ji ber wê

ne dixwest here û Rêberê xwe di wê rewşê de bibîne. Piştî kêmekî dubare biryara xwe guhert û bi arîkariya destê xwe yê sax rabû ser xwe. Li pêşya mezelê sifikek piçûk hebû. Dema di sifikê de pêlava xwe werdigirt çavên wî li tifeka qayîşa wê di nav betaniyan de daketî ket. Ji asayî pir dirêjtir awrên wî bi keleşkofa sîxo ve daleqayî mabûn. Dibêjîqey haxta destê xwe dirêj bike û rahêje tifekê, ema na! Di deriyê teng û nivz yê sifikê re derket, bikaşikê di navbera mezela Yadê Xanê û xaringehê re hawaket û ket di xwaringehê de.

Dema çavên wî li ekrana televîzyona wekî qotiyek piçûke ket, janek ti carî hîs nekirî ûrikê wî yê piçûk şewitand û jana bê pênase dilê wî guvaşt. Pêşkêşvana dimîne bûkek lastîk û ji eşqa devê wê li pişta guhan, bikeyfek mezin dikara awayê girtina Serok dikir. Bi ber axaftina pêşkêşvana ji zû ve toxmê wê hatî guhertîn re vîdeoyên çav girêdayî yên Serok tanîn ekranê. Li pey wê, dîmenek çavên Serok vekirî, ew awrên şehla westayî dixwiyên û sê çar kesên rûgirtî li raser dubare dubare anîbûn ekranê. Heman piştî wan dîmenan, Bûlent Ecevît'ê serok wezîrê dewleta turk û birek mexlûqat li piş sekinîn, cama televîzyonê dagirtibûn. Matorkê Başûrê rojhilata cîhana dilxwede modern û zelamê dibêjîqey bi zilqan ketiye digot;

"Tîmên me yên qehreman, şevê din bi operasyonek serkeftî serê terorîstan Abdullah Ocalan, li Neyrobû ya Paytexta Kenya girtin û anîn Turkî ye."

Bi gotina dawî ya zelamê bi zorê jipiya disekine û dimîne mirîşkek bizilqan ketî re Şoreş, betaniya deriyê xwaringehê dinixwîmine rakir û derket  ji der ve. Li serê kaşikê di navbera deriyê sifika mezela razanê û xwaringehê de kêmek vesekinî. Serê xwe hilda jor û bi çavên dimînin du pêloxên agir li ezmanê hişîn nêrî. Roja jêdera fer ya jiyanê, rengek gewrîn li ezmanê bê leke barkiribû. Dengê giriyê zarokekî, wekî xendengên sohrkirî dilê wî daxda û hilciniqand. Giriyê melûl bala şoreşgerê ciwan ji ezman birî û kişand ser xwe. Zehra ya porzer û netebetî, bi awrên bê çare li Şoreşger dinêrî û di ber xwe de dinehwirand. Dibêjîqey keçika şîrîn û por qij, bi awir û giriyê xwe yê melûl ji Şoreş re digot;

"Tiştekî bêje, tiştekî bike û bes tiştekî!"

Ji hinga xebera ne bixêr bihîstî ve cara yêkêbû hêstên wî difûrîn û serdestî jê distandin. Kelegiriyek bê şerm di gewriya ciwanê dilpêt de bibû îşk û asê mabû. Dibêjîqey girêka bişewt bêhna wî qutkiribû û haxta bixeniqanda. Du hêstirên gir ji çavên genimî rijan û dubare kelegiriya xwe daqurtand. Jidil hezidî giriyê zaroka xweşik. Xwest kelegiriya di qirika xwe de azad berde û heta awaza wî derdikeve bêxe qêr! Ema, ew APOCÎ bû! Mergê wî, bi hêstirên dayîkan, bi xwîna şehîdan hatibûn sitirhan. Ji girî wêdetir, ji girî zêdetir tiştek ji wî dihat xwestin. Jixwe belkî ya zaroka çav bireng

dixwesta jî ev bû!

Şervanê di nav kulabên nûkeran de nîvê kelaşê xwe ji dest dayî, bigavên bilez xwe berda derê sifikê. Bi deriyê piçûk re ket di hundir de û yêkser berê xwe da çeka wêneyê wê di mejiyê wî de hatî kolan. Çeka di nav betaniyan de derxist, bi erdê re dirêjkir û bi destê xweyê sax lib bir ber. Ji bû kes biwî ne hesê û çalekiya wî asteng neke bilezbû Şoreşê bê murat. Qontaxa çekê danî erdê û di jor de li devê lûleya wê nêrî û di dilê xwe de got;

“Bê Serok jiyan nabe û SOZ be Rêberê min, min fêrî tinetiya we nekin!”

Û li ber tifeka bi destê xwe yê sax jipiya girtî rûnişt. Erzena xwe danî ser devê lûlê û cara dawî biber betaniya bi derî ve li ronahiya rojê nêrî. Hê jî dengê giriyê Zehra yê dihat. Dengê melûl û ji mergek sêwî bilind dibe, dubar û li ser hev li mejiyê wî diket û dibêjîqey stûna erşan dixwirimand. Û bi tiliya nîşanê ya destê xweyê sax pêl tetikê tifekê kir Şoreşê Amedî! Zaroka dibêjîqey bi hizrîna di mejî yê Şoreş de hesabû, bi dengê çekê re kir qêr û got;

“Heware.. heware.. Hevalê Şoreş xwe kuşt” û bezî!

Ji berya herkesî Zehra gihatbû ser kelaşê xortê temen perîstank. Ciwanê zulma dagirker, êşa bê welatiyê, eşqa Apocîtiyê û bê tirs tifkirina rûyê sik yê nûkertiyê di jiyana xweya kurt de bicêhkirî; niha li ser tenişta PDK ya mala Berzanî şehtkirî, bê can ketibû. Birîna di bin erzena wî de teng û goştê dora birînê şewitîbû. Guleyê qetek mezin ji nava serê wî rakirbû û hê jî dû ji biska pora wiya di nav kijûlekan de asê mayî diçû. Çavên wî yên genimî belbûn û xendeyek bibeşaş dora wan pêçabûn.

***

Girseya di kevçikek av de dixeniqe hilpirijîbû diwarê bilind yê hewşa kelha kor. Têlên girover û bistîrî qulibandin û ketin di hewşê de. Deriyê mezin vekirin û boşahiya li ber derî jî wekî pêlên robarek har rada hundir. Rêvebirê UNHCR Muhemet Eliyê Lubnanî, bi şufêrê xwe ve li tirimpila buhadar siwar bibû, mekîna tirimpêlê hê jî dixebitî û deriyên tirimpêlê ji hundir ve qulf kiribûn. Xwînê xwe ji dêmê pimişî yê zelamê di pişt camê de kişandibû, tirsek şermdar li çavên şemşirî bar bibûn û dilerizî. Dengê, “hilînin, hilînin” yê ciwanê kuçek mezin bi her du destan rakirî jor û berbi tirimpêlê ve dibezî, bêdengiya dilqelqîn xwirimandibû. Ciwanê tenik û cirnikên çavan vegerayîn du bizotkên agir, kuçê liraser serê xwe li himdama zelamê tilzir li camê tirimplê da. Cam herifand û kuçê cama stûr burha hêza wî kêmkirî li ûrê mezin ket û li ser her du ranên Muhemet Elî sekinî. Rêvebirê wekî nîrya di nav avê de direcife û hê jî ew fêrisê kuça li ser

ranan, derî vekir, cama xwe anî xar û bidengek lavekar got;

"Bes me nekujin, hûn çi bixwazin emê bikin!"

Kupalê wî di dest de Sînanê Sohr, bi çengê stûr yê zelamê qelew re girt û kişand ji der ve. Dema Sînan zelam dixirand, kuçê li ser ranan ket di nav teşkan de û xwîn ji gozeka wî herikî. Bi wergervantiya Nahîda Porspî, Sînan ji zelamê ser û bin dierize re got;

"Tuyê aha niha bi pêş me ve, bi navenda xwe ya li Cenewre re baxivî û bêjî, "heke tiştek bi Serok Apo were, destpêkê te û emê hemî cîhanê bişewitînin!"

Hê wergervanê nû destbi wergerandina gotinên Sînan kiribû, zelamê keçel bi dengek bê dudil û melaq got, "hay hay, hay hay" û dest avêt ahîzeya telefona ji zû ve zengilê wê lêdide.

Dema rêvebirê Lubnanî bi Ingilîzî gotinên Sînan ji navenda xwe ya herî bilind re dubare dikirin û dengê, "soz be, ya ji destê me were em texsîr nekin" ji aliyê din dihat, komek ciwan li ser pişta kelha kor ala Dewletên Yêkbûyî dişewitandin.

Rêvanên azadiyê rêvebirê Lubnanî berdabûn ema, yê bi kû ve herin, çi bikin û kîna di mergên xwe de bibarînin ser kê, nizanîn. Awir ti carî ewqas neçar û kîn ti carî ewqas sêwî nemabûn. Li Qereçox şînbû û herkes digiriya. Mejî qerisîbûn, merg bibûn êtûn û çavan hêstir dibarandin. Jina hemî zarokên xwe di têkoşîna azadiyê de şehît dayîn Fatma Huseynê Repinî, li derê kolika televîzyona semta çar xwe avêt stoyê Teybeta Hîlalî û biqêr û girî got;

"Ez rebena wan çavên belekim! Ez rebena Serokê Kurda me! Em dikarin bê zarok jiyan bibin ema, bê Serok qetiyen!"

Tam di wê navberê de yêkî ji Xanê ya Hîlalî re got; "zarokên te xwe kuştin!" Xanê ya jixwe piştkul, da ber tilîliyan û bibez berê xwe da mal! Dibêjîqey dengê tilîliyên Yadê Xanê ji dayîkan re îlham anîbû, berê xwe dan cihê çalekiyê û bi hev re dan ber tilîliyan!

Koçberên Qereçox, ji derê qesra Muhemet Eliyê Lubnanî veqetabûn û li derê kolikên televîzyonan kom bibûn. Qismek mezin yê gel jî li cihê çalekiya di hewşa şarevaniyê de hatibû cem hev. Televîzyonên semtan hatibûn pêxistin û ji temeşekirina heybeta serhildana hemwelatiyên xwe zêdetir tiştek ji destên wan ne dihat. Jixwe ya herî zêde li zora wan diçû jî ew bû. Ew, di wê têkoşînê de ne temeşevan avekerên leyîstokêbûn. Ema, di wê roja nîrxê wan yê herî pîroz, hîviya fer ya jiyana wan, ser û Rêberê berê wan ketî di nav kulabên Roma reş de û wan tenê temaşa dikir.

Dîrokê ticarî şahîdîtiya awrên evqas kîndar û neçar nekiribû. Di mejiyan de bahoza milyon qet ji bagera reş mezintir, dijwartir û hartir rabûbû pêdarê. Hedar û tebetan ne dihat. Di nav pir kesan de bixefî û ji dizî ve dikara întîharên komî dihatin gotûbêjkirin. Jiyanek

bê Serok nedihat ramandin. Çavên xwe bi Serok re li Felekê xayîn vekiribûn. Bi wî re fêrî têkoşîna jiyanê bibûn. Bi hêza ji wî digirtin li dijî hemî dagirker, nûker û zoriyên jiyanê li berxwe didan. Ema wê rojê ronahiya feleka wan, hîviya jiyana wan, mejî, çav û mergê wan, rêzan, rênas û rêberê wan di nav lepê dijminan de bû. Û nikarîn tiştekî bikin. Êdî di wê zulimgeha tarî de, bê ser û çav yê çava pêşya xwe bidîtana, çawa berê xwe kifş bikirana û bikê nav li xwe bidana!?

Li derê şarevaniyê bi hezarên çavên wekî taviya heyva Gulanê hêstir ji wan dibarîn bê deng êrîşî Riza dikirin. Dibêjîqey bi çavên wekî du pêlox agir li wan hatîn, bilave diqêrin û digotin;

“Bes tiştekî bêje, tenê gotinekî! Bêxe qêr, dijûnan bike, şerê me bike ema tenê baxive!”

Lêhvên zelamê bejna wî ya zirav û dirêj tewayî, xwînê xwe ji dêmê esmer kişandî û bi awrên kîndar li valetiya ezman dinêre bi hev ve resisîbûn. Gelo di wê bêhnê de, di germ germa wê qir û qiyametê de Riza, zexta awrên li ser xwe kom biyîn hîs dikirin? Ew jî ne dihat zanîn. Ema ji hemî rewşa wî kifşbû, qiyameta di mergên wî de xwirimî ji ya herkesî mezintir û bişewtirbû. Dibêjîqey ya rêvebir di valetiya ezmanan de lê digera peydakiribû. Bi gavên giran berbi kolik ve meşî, li paşiya kolikê çarmêrkî rûnişt û got;

“Ez, dest bi rojiya mirinê dikim!”

Dengê Riza, bê dengiya dilqelqîn ji bin ve xwirimandibû û mirên ketibû nav girseyê. Teybeta Hîlalî çû, li rex Riza jipiya sekinî û got;

“Ez jî!”

Û hûr û gir, jin û mêr ketin rêzê û herkesî bi yêk dengî heman têgir dubare kiribûn. Cêh di kolika mezin de nemabû û çalekvanan hewş û xaniyê şarevaniyê jî dagirtibûn.

Riza, biryara çalekiya rojiya mirinê dabû. Dibêjîqey bi vê biryarê re, xedengên daxdar yên dibarîn ser mergên wî siviktir bibûn û vê hêstî vedana xwe di rûyê wî de jî peydakiribû. Piştî biryara Riza, bar ketibû ser milên Sînanê Sohr. Di wê bêhn û gava saxbîrên xwebûr jî aqil teslîmî hêstan kirîn, pêwîstî bişîreta şîretkarekî hebû. Nixwe dibekû bûyerên encamên wan qet ne dihatin texmînkirin jî rû dabûna. Bi teybet kadroyên rêxistinê û rêvebertiya wargehê bi awayek lezgîn li mejlîsê kom kiribûn Sînan. Hevalên lêhvên wan bi hev ve risisîn û di mejiyê wan de qiyamet rabiyî bi dengê gur yê Sînanê Sohr hilciniqîbûn.

“Ji kêm mayîna hevaltiya me û ji bêbextiya xayînên xwe wekî dost nîşan dikirin Serokê me teslîmê dewleta turk hat kirin. Bê goman ji bû Têkoşîna Azadiyê ev derbeyek mezin û pir girane” got û vesekînî Şoreşgerê rû zîwan.

Ji bû hêstên liber fûrandinê serdestiyê ji aqilê wî nestînin

şerek bê eman bi xwe re dikir rêvebirê kohne. Dema kelegirî diqirika de dibû girêk radiweste û piştî girêka di qirika xwe dadiqurtand ji cihê mayî dewam dikir.

“Hejêkirina Serok ne xwe kuştin, ne girî û ne jî li hember hêstên xwe bibinketine. Serok, bi ked û xebata xwe ya çil salan ne ev fêrî me kir; ji vê pir wêdetir û zêdetir ji me dixwaze. Dibekû îro Serokê me di destê dijminê me de dîl be ema, divê em vê têkoşînê bigihînin serkeftinê” û hidetek dijwar zelamê sohr girt û mohrikên xwêhdanê bi eniya wî ya piçûk re dabûn der. Wirarên wê hêstîtiya dema dest bi axaftinê kirî nemabûn, tiliya xwe repkir û bi dengek ji her demî gurtir axaftina xwe domand;

“Bila dost jî û ew bê bext jî vê baş bizanibin; heta Têkoşîna Rizgariya Gelê Kurdistan bi serkeftinê ne we tacîdarkirin, agirê şoreşa Serok Apo hilkirî hergîz û hergîz navemire. Hêza ti hêzdaran, ya têra tefandina vê evînê neke!”

Di wê roja reş de her gotinek ya Sînan, wekî mihendek deh kêlo li mejiyên qerisî diketin û hildiciniqandin. Di dawiya axaftina xwe de got;

“Rabin, biteyebet li kolikên televîzyonên semtan û li malan belav bibin. Hîviyê bidin gel! Ji bû bikaribin xwe ji bandora vê derbeya giran rizgarbikin hêzê bidin wan. Ji wan re bêjin; “hejêkirina Serok, ne şîne, ne giryane, ne xwe kuştine; di oxira armanca û mebestên wî de li berxwedayîne. Herifandina kelha dagirkere, xwe gihandina welatê azade!”

Piştî Sînan axaftina xwe qedand wekî tiştek jibîrkiribe vesekinî û wekî ya jibîrkirî hatibe bîrê eniya xwe qermiçand û lêkir;

“Du heval jî çekên gaziyan kom bikin, bila çek li malên birîndaran nemînin.”

Sînan, bilezbû.  Ji berya hevalên xwe ji mejlîsê veqeta û ber bi kolika semta çar ve derket rê. Li derê mala Reşoyê Cizîrî, singa Sînan û Rehîma Çelî li hev sekinî. Qedemên jina pîr, hûr û tenik şkestibûn, pişta wê tewabû û bê mehwer digiriya. Dema çav bi Sînan ket, êdî kir qêr û xwe avêt stoyê wî. Yêxtiyara biqasî pencekî lêhatî ne tenê digiriya, dibêjîqey bi dengê giriyê xwe lave dikirin û hewar dikir.

Zelamê sohr, mergên xwe qerisandibûn û ji her rewşa wî kifşbû ji bû tevlî giriyê Rehîmayê nebe, şerek bê eman bi hêstên xwe re dikir. Piştî dayîka yêxtiyar têr girî, bi dengek lave barkirî got;

“Ez li bextê şerefe weme Sînanê min; me di oxira vê têkoşînê de gelik berxikên liber dilê xwe wundakirin. Vî dijminê dagirker bicaran kezeba me şewitand. Hûn heyfa zarokên me li erdê nehêlin û dilên dijmin û xayînan li me xweş nekin!”

Sînan, wekî pêkerekî di navlepê pîreka kezeb şewitî de sekinîbû. Tenê carnan bi destê xwe li pişta wê diket û ji bû jina

yêxtiyar çavên wî yên tijî av nebîne li ezmanan dinêrî. Piştî Sînan kelegiriya di qirika xwe de daqurtand û jina dibêjîqey xwêya karan hinavên wê dişewitîne jî xwe ji stoya berda got;

"Yadê, hûn mirovên biserhatî û we pir rojên reş û biqerqaşe derbazkirine. Ya Serok ji me dixwaze ne şîn û giriye, di oxira mebestên wî de lîlandina tilîlî dane. Em soz didin hemî dayikên şehîdan, em heyfa zarokên wan li erdê nehêlin û nahêlin! Niha bi zivire kolika televîzyonê. Hevalên erkdar jî çûne wêdê. Û ya ez ji te dixwazim, ji vêdê bilîlîne heta bi wêdê."

Jina derbenê berçavkek cam stûr bi ser kitana xwe re hişk girêdayî, ji xwesteka Sînan jî baştir daxwaza wî bicêh anîbû û wî jî ber bi semta çar ve rêya xwe domand. Hacî Ehmedê Silopî, li derê mala xwe sekinîbû û ji hinavên xweyên di şewitin re li peşkek ava sar digera. Bi çav pêketina Sînan re daket ser rê û wekî her tim, dîsa bi sofîtî destê xwe dirêjî zelamê hîviyên bi hezaran çav lê hatîn barkirin kir û bêkû tiştekî bêje ket dûv.

Li çar rêya biryargaha Riza, Sînan xwe di nav şîn û giriya Gundikremoyiyan de peydakiribû. Eyşa Dehlî, ji koma jinan re jandil dinehwirandin û yên din kûr kûr digiriyana. Kengê çavên wan li Sînanê herkes wî wekî endamek yê malbata xwe dibûne ket, kela hêstên wan zêdetir bibû. Di çarçoveya axaftina ji Yadê Rehîma re kirî, ji wan re jî axaftinek kurt kir û berê wan jî da kolika televîzyona semtê.

Sînan, serê xwe hildabû û ji her demî biheybetir dimeşî. Bisedan mirovên dibêjîqey ji erdhejek giran felitîne li wî dinêrîn û wî jî li ezmanan. Dixwesta zû bigihê cihê xwe û leza lingê xwe dikir. Hacî Ehmedê meşqaz li dûv dibezî ema, dîsa jî bipêre ne digihat. Li derê mala Qasimê Nêrwehî, keçikek por qij bezî û li pêşya wî sekînî. Zaroka esmer û şopa hêstirên barandîn hê jî li ser rûyê wê yê girover dixwiyan, bi dengek kelegirî got;

"Te di televîzyonê de Serokê me dît hevalê Sînan? Çavên wî giradayîbûn" û hêstirên wê yên nû şemirîn dubare wekî avzêmên biharê dabûn der. Ti dengan, ti jandilan, ti axînan biqasî dengê wê zarokê mergê Sînan ne herişandibû. Serê zarokê girt û bi ranê xwe ve şidand. Ema, bi israr çavên xwe ji yên wê direvandin. Di wê roja reş de cara ewilbû Sînanê dilpola, dihezidî dengê giriyek kûr û azad. Ema baş dizanî, şansê wî yê girî tinebû, nikarî bigirî û ne girî. Lê hêza serdestiyê ji şewta hinavê xwe jî bistîne wundakiribû. Tenê li ezmanan dinêrî û dibêjîqey di bin awrên zaroka şîrîn de dişewişî. Bi zehmetî jî be kelegiriya di qirika xwe daqurtand û xwe zû da hev. Destê xwe bi serê zaroka bê mehwer digirî re anî, maçek li dêmê wê yê şil da û bûrî.

Piştî hevalê xwebûr, tixûbê semta sê derbazkir her kêyê li

derdor dîtî da rex xwe û bi derê mala Tahirê Egîd re daketin derê kolika telvîzyona semta çar.

Bi hatina Sînanê Sohr re livandinek sivik ketibû di nav mirovên li derdor wekî pêkeran sekinîn. Silavek da û ket di hundirê kolikê de. Televîzyona li aliyê rastê devê derî li ser sêpêyêkî hatî bicêhkirin vekirîbû û hunera heybeta rabûna Kurdan pêşkêş dikir. Di wê roja qiyametî de cara ewilbû çavên Sînan bi ekrana televîzyonê diketin. Xwest kêmekî temeşayî kîna rêxistî ya rijayî zikakên xwînkaran ya  biwezbet bike û li pêşya televîzyonê jipiya sekinî. Roja reşbû. Qiyameta di pirtûkên pîroz de dihat dikarkirin rabibû û heşir bixwebû. Dîsa çerxa feleka kurdan çep zivirîbû û dixwesta wan bavêje ji derveyî zeman. Ema Rojyarên welatê Zaxrosan vê neqlê bi ser û ber, bizanîn û rênamebûn. Xwe dişewitandin û cîhana hegemon û dagirkeran jî bi wan ve dişewitî. Kîna bihezaran sal rêxistinkiribûn û rêhtibûn zikakên zordaran. Hegemonên di dîroka xwe de nebûyîn şahidê hêrsek ewqas mezin vekişabûn zulimgehên xwe û mewta mirinê avêtibû siketên wan.

Piştî Sînan gihatî kolika semtê, dibêjîqey bagera di hinavan de dixwirimî siviktir bibû. Li tevayê cîhanê û bi teybet li her çar parçeyên Kurdistanê bi awayek ewqas biheybet rabûna kurdan, kêm jî be avek hunik di agirê  mergê wî de kiribû. Ema guriya dibêjîqey kêmekî vexwimaye, şopên newin jêbirin li pey xwe hiştibûn. Serok, ji bû wî û hemî kurdan ne tenê serokekbû; hizirbû, evînbû, ronahîbû û heneseya jiyanêbû. Feleka xayîn carek din jî çep zivirîbû û hewl dida şah rayê jiyanê qut bike. Di bin kêra şaristanên bê wujdan de kêferata parastina jiyanê ya Kurdan avek hunik di hinavên wî de kiribû. Hevalê Sînanê wan rêvanan, bi wê hizrandinê fîşa televîzyonê kişand û jenetora wekî çeqçeqoka aşê avê di mejiyê wî de vedida dabû vemirand. Li pêşiya televîzyonê berê xwe zivirand û awrên xwe yên bi îfadeyek têkel hatîn barkirin pesartin koma mirovên şebikîn. Bi dehan awrên kîn û girî ji wan dibare xwe qerastibûn çavên wî. Dibêjîqey di nav zemîta çileyê zivistanê de berfa bidûvik li wan mirovan bariye û qufilîbûn. Ji şebikandinê jî wêdetir, çavên wan yên wekî du pêloxan sohr bûyîn di bin şaqistiyek şermdar de diteyîsîn û wekî avzêmên biharê diherikîn.

Nayîfê Nêrwehî, ciwanek kêmî bîstêbû. Ji zikmakî seqetbû û ji navtengê û pêve şehtbû. Bi du çûkanên sik xwe li wê jiyana dijwar pêçabû û koşkertî dikir. Li rex kolika semta çar ji xwe re kolikokek avakiribû û bibuhayek bê qîmet pêlavên qetayî pîne dikirin û didûrûtin. Her kû rêya Sînan bi kolika rêvebertiyê diket, hergîz pirsa halê wî dikir û moralek mezin ji wî mirovê jiyanyar digirt. Ligelkû Nayîf, wekû mirovek şeht tevlî wê jiyanê bibû jî ema, ji gelik kesên saxlem xweşvîntir, jiyanhestir û mirovyartirbû. Evîndarek bê eman

yê azadiyêbû û ew azadiya bi wan lingên şeht ve li dûv ketî, di çavên belek yên Serok de peyda kiribû.

Nayîf, dizikaka di navbera her du aliyên rûniştinê de li ber stûnekî ketibû û bi awrên neçar li Sînan dinêrî. Çûkanên wî dûr beyîbûn û wirarên hîviya carê, di bîbûkên çavên wî de ne mabûn. Hêstirên wî bê deng dibarîn û kerbek qiyametî ji awrên melûl vedidan. Sînan, Nayîf didît ema, bi israr çavên xwe jê direvandin û newêrî lê binêre. Nayîf, sêwî mabû êdî û biqêrînek bêdeng dinalî. Dibêjîqey dixwaze biqêre ema, dengê wî ne derdiket û awrên wî di valetiya kolikê de dîl mabûn êdî. Ewî dîmenê tukes nikare biwêne bike, agirê di hinavê Sînan de gurtir kiribû. Carekî xwest bide ber qêran û xwe li singa Qereçox bide. Terke dunya bibe û carek din ne vegere wî welatê ketî ber xişma xwedayên tarîtiyê. Li ser hev çend henaseyên kûr kişandin û ji bû xwe ji zexta giran ya wan çavên sêwî mayîn bişemitîne, şerek mezin bi mergên xwe re dikir. Kir û nekir nikarî mejiyê xwe yê tofan di tê de rabûyî kom bike û bi hevoka dixwaze dest bi axaftinê bike. Ji nişkan ve û bihêzek ser viyînê re peyvên ti carî ewqas hêstî û rêkûpêk ji nav lêhvan ne rijayîn rêz bibûn;

"Hin êş, hin bûyer û hin hîs hene vegotina wan li peyvan nehatine barkirin. Tenê mergên wê janê jiyan dibin dikarin hîs bikin. Îro jana bişewt ya wî hîsî dil û hinavê me dişewitîne" got û wekî hêzek ne diyar ji nişkan ve qirika wî bi xetimîne vesekînî.

Rêvebir bixwe jî bi gotinên hêstî yên hêzek ne diyar ji nav lêhvên wî diherikîne hêstdartir bibû. Vesekinî û awrên wî li dêmê qermiçî yê Xana Şêxê aliqîbûn. Ji çavên jina yêxtiyar û biskên hişîn bi bin xavika lewitî re daketîn wekî lehiyê hêstir dibarîn. Bê hîvîtiya ji awrên di bin jandartiya salên dirêj de westayîn diherikî, wekî xedengan dilê Sînan dihingavtin. Dibêjîqey bi xedengên ji awrên bê hîvî ya jina yêxtiyar dirijan, mejiyê wî yê hêstan dagirkirî simtibûn û bi êşa simtandinê hilciniqî Sînan. Eniya wî qermiçî, vegotinek bi êş ema kîndar rûyê wî yê zer nixwimand û ji cihê mayî ema bi tonek cuda axaftina xwe ajot.

"Efendiyên nevîçîçirkên bêbext yên Zeûsê tirek û kerdizên Asya Navîn ev qeder layîqê me dîtin. Ema bila dagirker, xayîn û bêbext vê bêxin guhar û bêxin di guhê xwe de; heta yêk kurdê bixêret li ser vê gerekstêrkê jiyan dibe ev agirê her gur be! Hêza ti hegemon, dagirker û nûkeran ya têra vemirandina vî agirî neke!"

Sekvanê Şefîqê Bilehî, ji rêzên paş bê destûr rabû ser xwe û bidengek kelegirî axaftina Sînan birî;

"Heval, gotin qedaye û axaftinê wateya xwe wundakiriye. Êdî, em dixwazin tiştekî bikin! Em hew dikarin bi awrên neçar hêstirên dayîkên xwe bihêjmêrin. Ma, ji xelkê av û ji me xwîn tê?

Pêşiya me berdin" û kelagirî qirika xortê nû bîst derbazkirî dagirt û rê neda axaftina xwe dewam bike. Ciwanê bejin navîn û rengzer, bi her du destan bi stûna bikelem ya li pêşya xwe re girt û da ber bûçan. Xwîna ji eniya wî ya pehn diherikî, tevlî hêstiran bibûn û dipiziyê de wunda dibûn.

Dibêjîqey axaftina Sekvan, raza zimanên lal bûyîn vekiribû. Ji aliyê jinan, keçek ciwan destûr xwest û rabû ser xwe. Keça spehî ya lamên wê yên kelpitî di bin taviya hêstiran de rengek pembeyî girtîn, bi dengek hêrsdar got;

"Ez dixwazim tevlî refên ARGK' bibim" û hê keça ciwan jipiya, xortek din heman biryar dabû.

Nayîf jî di nav de, destên sê çaryêk kesên di kolikê de ji hewa ve bûn êdî. Ji bilî dayîk û zelamên ji derbketî hema bibêje destê herkesî ji hewa ve bû. Herkesî dixwest tevlî Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê bibe û heyfa bêbextiya li wan hatî kirin rake.

Rêvebirê nizanî çawa dest bi axaftinê kiriye êdî hinavên wî pir aramtir û kêmek mabû rûyê wî yê ji normalê pir zayîtir dixwiyê bikene. Êdî dayikan jî dengê giriyê xwe şemirandibûn û qerisandina devan jî helabû. Hewayek hîvîdar kolika tozek dijwar ji binê wê radibe dagirtibû û livandinek sivik bi avana kuldar ketibû. Rêvebirê her tişt ji hesabê wî sehltir pêşketî û êdî dengê wî aramtir derdiket, serpêhatiyek ya ji Mûsa Enter guhdarkirî vegot. Piştî serpêhatiya xwe qedand axaftina xwe ajot;

"Ez spasiya we dikim. Jibû pêşiya bûyerên nayên xwestin bidim girtin û we hêdibikim ez hatibûm vêdê. Ema, min moralek mezin ji sekna we girt û niha pir saxbîrtir dikarim raman bibim. Lê dîsa jî dixwazim bibîrbînim, dermanê me rêxistine. Çi hatibe serê me, ji bê rêxistînî hatiye. Heke em dixwazin Serokê xwe sax û silamet ji nav kulabên dagirkeran rizgar bikin, divê em rêxistina xwe ji her demî mezintir, qayîmtir û bilindirt bikin."

Sînanê sohr, axaftina xwe bi hevoka; "emê li cihê çalekiyê komîteyek ya çûyîna nav hevalan ava bikin û yên dixwazin tevlî bibin, an jî herin şer bila navê xwe bidin komîteya dabaşa gotinê" qedand û derket ji derve.

Li kolikên her çar semtan heman sondên tolhildanê hatibûn xwarin. Di avakirina wê hewaya erênî de rola çalekiyên fedeyane yên gêrîlayan û rabûna Gelê Kurd kifşkerbû. Li aliyê din, Hevalên erkdar û bê erk li nav gel belav bibûn û hewl didan hîviya koçberan jipiya bigirin. Ema bêbextiya li wan hatîkirin ne jirêzêbû û nikarîn bixwe bidin xwarin. Bêbextî ya Navdewletî wekî konek reş daketibû ser wargeha Mexmûr û janek ti carî hîs nekirîn hinavên wan dişewitand.

Şeva duyemîn ya piştî Roja Reşbû. Ji nîvê şevê kêmek

derbaz bibû. Ba ne dilivî û şeva bê henase mayî wargeha Mexmûr dabelandibû. Heyva çardeh şevî di nav girên ewrên reş de xeniqîbû û dibêjîqey di şev tarîka wê şevê de ew jî di nav lepên hûtan de diperpitî. Şevê ber avêtibû û bi hilatina rojek azad ne avisbû êdî. Şînek giran daketibû ser zincikên li qontara Qereçox û haxta xweyên wan bifetisîne. Wargeh, hê jî jipiyabû. Dengê jandilên dayîkan û mirovên bê navber bi ser rê re derbaz dibin humênek sivik li şeva xemdar bar dikirin.

Komek xwendevanên dibistana Şehît Jiyan, li derê mala Mewlûda Şirnexî bela wela rûniştîbûn. Sinirên wan jipiya û hêstên wan şidayîbûn. Yên nahes û hîvî şikestî, bi şêwazek gazindokî ne gengaztiya tifaqa Kurdan didan pêş û digotin; "her tişt xilas." Qismekî jî encamgirtina çalekî û serhildanên Kurdan yên li tevayê cîhanê belavbiyîn misoger dinirxandin û hîviya welatek azad heta bi derbenda wargehê anîbûn. Qismê mayî jî li dijî kurdan behsa ezameta tifaqa cîhanê dikirin û pêvajoya piştî Serok, reş û tarî şîrove dikirin. Dengê jandilên Peynaza Kawaşî ya ji çadira jêr bilind dibû, mergên civata xwendevanan ker ker dikirin. Bêduayên Mêrdîna Silopî ya mala wan li kaşê jor, tevlî jandilên Peynazê dibûn û ber bi erşê ezîm ve bilind vedidan. Mehmûdê Sofî Şukrî yê demek dirêje guhdarî kul û gazindên hevalên xweyên xwendevan dike, bi dengek rexnegir tevlî sohbetê bû û got;

"Mirovên têkçûyî pir hej vegotina êşên xwe dikin."

Ezmîra Xalid ya nû gihatî û dilê wê li ser Mehmût heyî, bi dengek pêşîgir bersiv da;

"Ankû çi? Hemî cîhan, bi xayîn û nûkerên me ve bûye yêk û tê ser me. Qey çi ji me hatiye û me ne kiriye?"

Dilê Ezmîra ya hemî xeyalên xweyên jiyanê li ser wî xortê esmer avakirîn qusabû. Pê hesabû. Ruhê Mehmût, di qalik de bicêh ne dibû û yê bi derekî re biteqa. Jixwe belkî heta bi wê demjimarê, sebebê fer yê mayîna keça fîtoz ya li wêdê ew kulbû. Tilsimek jandar qermiçokên dora çavên reş yên Mehmût pêçan, ji normalê zêdetir li devê mezin yê lêhvên gir dadidin nêrî û bi dengek jixwe qayîl got;

"Ankûya wê eve Hevala Ezmîra; gazind, nexweşiyek bê derman ya mirovên bindeste. Gazindan ji celadê xwe jî dikin ema, nafikirin ji rêya ji wan re hatî kişandin derkevin û li dûr binêrin."

Gulistana keça malê û bi balkêşî guhdarî gotûbêja hevalên xwe dike, bi dengê xwe yê az û tijî pirskir;

"Hevalê Mehmût, ka merema xwe kêmek vekirîtir bêje. Tu ne mecbûrî evqas kûr û felsefîk baxivî."

"Vekiriya wê eve hevala Gulistan; Turkan welatê me dagirkir, nirxên mirov têxin mirov û ji alema heywanan vediqetînin hemî ji me standin. Niha jî dixwazin me serbir bikin û em bi awayek reben

li vêdê guhdarî jandil û bê duayiyên dayîkên xwe dikin."

Xelefê hûrik û li ber siha kelaşê gir yê Ezmîra wundabiyî, gotina Mehmût birî;

"Ezmîra rast dibêje. Herkes dikare bibe gêrîla û fîşekan biteqîne. Ya girîng, em keysê di destê xwe de rast binirxînin, bibin xweyê pîşeyek baş û têkoşîna xwe di wê coyê de pêşbêxin."

Jirêzêtiya Xelef û biteybet melaqtiya wî ya ji bû Ezmîra, giraniya civatê aciz kiribû. Ema, herkes çaverêyî gotina dawî ya Mehmût bû û gotin ji wî re hiştibûn.

"Ez bawerim jana bê welatiyê ji me mezintir kesî ne kişandiye. Piştî hêlînek ya tu di tê de bisitrî, parçeyek axa tu li ser jiyana xwe biparêzî tunebe, tu pîşedarbû çiye, an jî bazirgan."

Keça dibistanê ya herî spehî û ewqas jî tosin û bijare Nazdar, wekî Mehmût destek bike bi dengek tijî got;

"Yê bikaribe vê bê şereftiyê bipejirîne, heta bi profesortiyê jî rêya wan vekirî ye. Herkes di hilbijartina şêwazê jiyana xwe de azade."

Gotinên Nazdarê, di mejiyên şêlo de wekî berqa birûskê vedabû. Hizirînên mijdar û sahî bi awayek zelal ji hev veqetandibûn û biryara xwe tûj danîbû holê. Dibêjîqey ya Mehmût çaverê ew bû û bi wêrîna ji keça bedew girtî bi dengek kelecanek bê pênase lê hatî barkirin got;

"Min biryara xwe daye, ez tevlî ARGK' dibim!"

Ezmîra, bi dengek kelegirî dubare axaftina Mehmût birî;

"Jixwe dilê min li te qusabû. Min dizanî merema te eve. Ez bixwe nayême. Qey em tinê Kurdin!"

Mehmût û hemî civatê, niyeta Ezmîra ji zû ve fêhmkiribûn. Bertekên wê yên ji rastiya wê civatê dûr mucid nedigirtibûn û li dilketina wê bexşandibûn. Ema dîsa jî Mehmût, hêlwestek ewqas sehl û qelp ji dilketiya xwe hîvî nedikir û yê çi bêje nizanî. Awrên xwe pesartin çavên xezalî û awrên wan bi heve ve qerisî mabûn. Ava di çavên Ezmîra de kombiyî di bin elenda heyvê de diteyîsî. Jana ji çavên gir û şil vedayîn bibû pêlek xwîna germ û ruhê Mehmût pêçabû. Tevzînekên jandar dilê wî dîl girtin û îşk şidandin. Heneseyek kûr kişand û risteyek ti carî ava nekirî ji nav lêhvên wî yên zuwa bûyîn herikî.

"Me ji dildaran toxtek evîn kerkir heval. Û ji bû dayîna kerê xwe, niha em dibin evîndar" got û awrên wî di waletiya tarî de gindirvarîbûn û çûn.

Wê risteyê, şikestekên hîviya dawî jî maliştibûn û li ber xwe biribûn. Kelegiriya Ezmîra bi zorê di qirika xwe de zevt dikir berdabû û bideng digiriya êdî. Piştî wê kêmekî tarîtiya şevê keça dilketî daqurtand û dewsên wê jî ji dilan biribûn. Xelef û çend kesên

dinên wekî wî difikirin jî li dûv Ezmîra ketibûn û çûbûn.

Metînê Gundremoyî yê ji serî ve guhdarvan û ji eşqa çavên wî di hêlîna xwe de ne dihewan bidengek gur û misoger berê sohbetê rastkir. Dibêjîqey dengê xortê esmer ji tarîtiya Ehrîmanan re meydan dixwend.

"Emê îro biryara tevlîbûyîna van şeş kesan ji hevalê Sînan re ragihînin. Piştî hingê emê seferbertiyek ya tevlîbûyînê di nav ciwanan de bidin destpêkirin" got û jidil beşişî.

Dibekû piştî girtina Serok cara yêkê be dibeşişî û dibêjîqey dengê wî hewaya neyînî ya Ezmîra li pey xwe hiştî ji dilan maliştibû. Erêntiya ji dengê xortê nû pazdeh derbazkirî vedayî ji bala wî bixwe jî ne revîbû û dewamkir.

"Divê em bi artêşek mezin derkevin pêşya dê û bavên xwe, soza xwe bidin û herin."

Nazdar, Nêrgiz û Minûrê Hîlalî, Metînê Gundikremoyî, Mehmûdê Garisî û Gulistana Şirnexî di wê kebara sihbê de SOZ dan hev û ji bû rojek nû ji hev belavbûn.

***

Cîhana xwînkaran li aliyekî û Kurd li aliyê din. Kurdan kîna xwe vegerandibû agirê semawet û wekî lehiyê rêhtibûn zikakên zulimgeha cîhana şaristan. Qiyameta sohr rabibû û stûna ezmana şkest û haxta bişkê. Şaqistiyek tirsdar rûyên sar yên mîr û begên cîhana zordar nixwimandibû û bi hemî derfetên xwe êrîşî Kurdan dikirin. Piştî girtina Serok, roja sêyemînbû. Şîna daketî ser wargeha Mexmûr, her kû diçû girantir dibû û jiyan bi tevayî tevizandibû. Şivanan pezên xwe bê xweyî berdabûn, kevaniyan mala xwe jibîrkiribûn, dukandaran deriyên dikanên xwe dadabûn û wargeh qerisîbû. Tenê cihên wirarê jiyanê lê dixwiyan, kolikên televîzyonan û hewşa şarevaniyêbû. Ji nîvî zêdetir hemwelatiyên wargehê di hewşa şarevaniyê de kom bibûn û di çalekiya rojiya mirinê de bûn. Çalekvan û serdanvan tevlîhev bibûn û hema bibêje wargeh bitevayî birçîbû û tu kesî xwarin ne dixwar.

Pencereya fer ya wê komika mirovan bi tê re cîhana ji derve didît ekrana Med TV bû û merg û mejiyên wan bi vê kulekê ve daleqayî mabûn. Şervanên Artêşa lehengan, bê navber çalekiyên fedayî dikirin û di mejiyê dagirkeran de wekî berqa birûskê diteqan. Bê veqetandin zarok, jin û mêrên Kurd bedenên xwe êxistibûn agir û bi dirûşma "tu kes nikare ROJ'a me tarî bike" li dora Rêberê xwe sûrhek ji pêtê avakiribûn. Jixwe keça sêzdeh salî ya xwe li Mahabadê şewitandî, bibû agirek mezin û herder dişewitand. Li derê sefaretxaneya Îsraîl ya Berlînê, Cihûyan sê xort û keçek ya

kurdan kuştibûn û bi vî awayî heyfa dê û bavên xweyên Hîtler di firnan de kirîn sabûn rakiribûn.

Riza, ji cihê xwe rabû û ber bi televîzyona li ser sêpiyek nivz hatî bicêhkirin ve bi gavên giran meşî. Piştî biryara rojiya mirinê dayî, cara yêkêbû ji cihê xwe radibû. Li cem televîzyona bi weşana zindî nûçeya wezîra jiderve ya Amerîka par vedike sekinî. Madeleîne Albrîght'a eslê xwe Cihû, perixî û dimîne pîrhevokek sihar, bi dêmek tirş û tirsdar digot;

"Li hember girtina Abdullah Ocalan, em ne çaverêyî bertekek evqas mezin û dijwar bûn."

Bi vê nûçeyê re dêmê Riza tirştir bibû û televîzyon girt. Li hevalên xweyên bi awrên xemdar li dêmê wî yê reşqelayî dinêrin zivirî û got;

"Rêxistinê çalekiya me taswîp nekir û redkir. Wekû mafdar, rexneyên giran li şexsê min hatinkirin. Ya rast, di wê bêhnê de hêstan serdestî ji aqilê min stand û bû sebeb em herin vê biryarê."

Dibêjîqey ji poşmantiyê zêdetir heyfek giran pêl dengê zelamê esmer dikir û ji bû wê gotina dawî nebêje ji qestî xwe mijûl dikir. Bi çend hevokan bêbextiya feleka xayîn, heybeta rabûna kurdan û encamê mûhtemel yên bi xwe re bîne ravekir û gotinên xwe ajotin;

"Wekû hevalên Serok Apo, ji mirinê mezintir û wêdetir tiştên ji me têne xwestin hene û mixabin me ya sehl hilbijart. Niha, dema em hêstên xwe deynin aliyekî û bi aqilê xwe bihizirin hatiye. Fermana rêxistinê ye û ez neçarin jibiryara xwe vegerim. Pêşniyara min; hûn jî çalekiya xwe vegerînin dorveger û em bi hev re enerjiya xwe di şêwazên encamgirtir de bikarbînin."

Riza, ji kolikê derket û bi nav rêza mirovên ji bû çûyîna şer navên xwe didin nivîsandin re derbazbû û derket ser cadê. Hê çend gav ne avêtibûn Evdilayê dîn bezî û kopalê xwe da pêşyê. Rêvebirê bejna wî ya zirav û dirêj tewayî, pora gustîlok wekî erzêlekî dixwiyê sekinî û li çavên şil yên Evdila nêrî. Evdila ne taxivî û zîq li nav çavên Riza dinêrî. Çavên xweyên şil û xemdertiyek kûr ji wan dibarî qerastin yên Riza û ji cihê xwe ne livî. Riza, ti carî Evdila di wê rewşê de ne dîtibû. Zelamê dîn; bitevger, hêst û awrên xwe hatibû guhertin û wekî mirovek cuda li Riza dinêrî. Dema rêvebir xwe hazir dikir pirsa merema wî bike, hêstirek gir ji çavên kûr û şil yê zilamê dîn rija û di nav riha boz û lewitî de wundabû. Radyoya jixwe bêhtir hejê dikir, her tim şivika wê li ser sera diket û dil ne dihişt deyne erdê, hilda û bihêrs li navguhê kuçê li tenişta rê da. Qetek ji radyoya piç û parî bûyî beyî û ket ser nîvê rê. Zelamê dîn bezî, bikînek mezin pêl qetê radyo xwe kir û di erdê de kir xar. Dûvikê kupalê xwe hilda jor û êdî bideng digiriya. Riza, ti carî giriyê Evdila xeyal nekiribû û

cara ewilbû şahidîtî ji rijandina hêstirên wî re dikir. Wekî bihilciniqe Evdila, ji nişkan ve giriyê xwe şemirand û kupalê xwe yê ji hewa ve bihêrs hejand. Her dijûnek ji xwidayê Serokê wî teslîmê Roma reş kirî re dikir, pê kuç ji ezmanan dihatin xar.

***

Sulêman Benek, xortek bîst û sê salîbû. Ji gundê Hîlal bû û xwarziyê Osmanê Hîlalî bû. Li Bakur zankoya turkan terk kirîbû û bi dayîka xwe ya yêxtiyar ve tevlî wî karwanî bibû. Sulêman, armanc û mebestên karwan jî şekil, şemal û awayê zêhniyeta wan jî zêde ne dieciband û li rexê disekinî. Ne dixwest ciwantiya xwe di oxira bêjeyên ‘welat, azadî, namûs û rûmetê’ de heba bike û ji bû xwe ji wê dojehê rizgar bike li keysekî digera. Meyla wî li ser çûyîna Ewrupa bû û rêka çûkê peyda kiribya çirkeyekî jî li wêdê ne disekinî.

Bi ser Roja Reş re nû hefteyek derbaz bibû. Ji nîvê şevek ya Sibatoka bêbext re kêmek mabû. Bayê zuwa ewrê tenik ber bi Başûr ve tehf dida û dîmenê gelaksiya li raser daleqiya xira dikir. Sulêman û Tahirê kurxalê xwe ji cem çalekvanên di hewşa şarevaniyê de veqetan û berê xwe dan semta sê. Endamê fermandartiya hêza xweparastinê Tahirê xezalên Qereçox dihezidin sphîtahiya çavên wî, biryara tevlîbiyîna gêrîla dabû û Sulêman bi hêlwestek dijwar li dijî wî derdiket. Ji bû Tahir ji biryara wî vegerîne û bi hev re herin Ewrupa, hewlek bê eman dimezaxt. Sulêmanê moderntiya bajaran hemî şaneyên mejiyê wî dagirkirîn û ji gundîtiya gundiyên xwe şermek giran dibihîst, wê şevê xwe baş amdekiribû û di zena wî de dikare bandorek misoger li ser biryara kurxalê xwe bike. Li hindama dibistana Navîna Şehît Jiyan Sulêman vesekinî û bi awayek tevzdar beşişî. Destê xwe bibaskî dibastana di bin elenda heyvê de wekî xirbeyek bê merîs dixwiyê ve kir û bi turkî got;

“Ew civaka dahatûya xwe di bin van xirbeyan de û bi aqilê kesên baş xwendin- nivîsandina wan jî nîne bigihîne, ya kengê û çawa bigihê asta civakên modern?”

Tahir, merema kurmetkê xwe baş dizanî û hingî jê dihat bi bersivên kurt derbaz dikir. Xendeyek tinazdar dêmê wî yê esmer nixwimand û bi dengek mucid bersiv da got;

“Jixwa derdek yê meyê, em xwe bişibhînin wan civakên tu dikar dikî nîne.”

Sulêman, wate ne dida hêlwesta Tahir ya evqas jixwe bawer û biryardar. Ji ber wê zû aciz dibû û dema aciz dibû bilez û li ser hev taxivî. Dîsa wusa kir.

“Me hemiyan bi hev re û gav, bigav di weşana zindî de temaşekir. Hemî cîhan bi hev re; bi zorhêz, Musilman, Xiristiyan û

Mûsewiyên xwe ve, bê veqetandin bûn yêk û êrîşî Serok û girêdayî vê PKK'ê kirin. Di encam de ew cîhana her core mirov di tê de dihatin hewandin, Serokê gelekî ne hewand û teslîmê turkan kir. PKK ya bê serok mayî, nikare demek dirêj liberxwe bide. Evê ne ez dibêjim; di serî de zane û şîrovevanên Ingilîz û hemî şerzan û zaneyên cîhanê dibêjin."

Xortê şehriza û turkiyek bê qisûr bikartîne, zenkir kû şîroveya wî ya ji peyvên bijare pêktên bandorek erênî li kurxalê wî kiriye û wê zenê ew hê bêhtir gurxweş kir. Zenkir dor li Tahir girtiye û wekî derba dawî deyne pirskir;

"Tu biqedrê xwedê bikî ji min re bêje kurxal; di vê dema ev fêrsa cîhanê bi hemî zordar û derfetên xwe yên pêşketî ve êrîşî komikek mirovên bê serî mayî dikin de, hûn bi çiya xwe bawer dikin?"

Tahirê bi awrên yardar li zarokên pêxas û daw şewitî yên li derê mala Huseynê Xazî berdidan hev dinêrî, vesekînî. Dibêjîqey yan di bersivdayîna de dudilî jiyan dibû û yan jî dixwest kurmetkê wî yê şehriza bêhna xwe veke. Li nav çavên Sulêmanê kêmek ji xwe kurtir nêrî, îfadeyek biryardar çavên wî yên belek pêçan û bersiv da;

"Em, ji şîr helaltiya xwe bawerin. Ji hêstên xweyên bijûn, ji rêname û fikrên Serokê xwe yêqîn dikin. Heke hemî cîhana zordar êrîşî me dike, wê demê wekî tu dihizirî em ne komikek bê ser û ber û neçarin."

Suleyman, gotina Tahir birî û wekî tevzê xwe lê bike got;

"Çima ev Apocî ji rastiyên xwe zêdetir tu rastiyan qebûl nakin?"

"Ji ber kû rastiyên me û dilxwede rastiyên bi we modernan dayîn fêrkirin berevajî hevin."

"Ya tu biqedrê xwidê bikî kurxal, dev ji van gotinên şîfredar û girover berde. Were, dest ji van xeyalên beyhûde berde. Min xalê xwe jî qayil kirî ye. Her tişt aydê min, emê xwe bavêjin welatek yê Ewrûpa û li keyfa xwe binêrin."

Tahir, serê xwe hejand. Dibêjîqey xwest bideng bikene ema, nekenî. Xendeyek jandar dêmê wî yê girover pêça û bi hêlwestek dilniya bersiv da;

"Ev, firşik heramtiye!"

Sulêymanê ji bû yêk gotin Kurdî bikarneyne hewlek berbiçav dimezêxe, li kurxalê xweyê yêk peyv turkî bikarnayîne zivirî û pirskir;

"Fîrşîk çiye?"

Wekî serve bike, Tahir got;

"Firşik, ne 'fîrşîk'?"

"Deka çibe, ew çiye?"

“Ji wê firo (şîrê ter) ya piştî candarên gihanewer jidayîkdibin, destpêkê vedixwin û dibe haveynê pêkhatina jiyana wan re tê gotin, firşik” û lêkir Tahir;

“Di çanda me de dema kesek xiyanetê li haveynê bûyîna xwe, ankû li xwebûna xwe bike ji wî re dibêjin; ‘firşik heram’, an jî ‘şîr heram.”

Sulêman, bi hêlwestek misoger û dijwar ev pênase redkir û got,

“Di zanistê de pênaseyek wusa nîne. Ev gotinokên dapîr û bapîrên meyên paşketîne.”

Tahir, li deriyê biqasî kulekekî û bi betaniyek lewitî hatî nixwimandin yê mala Ehmedê Şero nêrî. Zeraqên zerhimî yên ji fanosoka piçûk dirijan, heta bi çavên wî dihatin. Bi dengek dibêjîqey ji kûrahiya hêstên bijûn û li rasta xiyanetek mezin hatî, destê xwe bibaskî derî ve kir û got;

“Biqasî di nav rûpelên wan pirtûkên te xwendî de bicêh nebin, zanînên razdar di bin van kuxikan de veşartîne” keserek kûr kişand û lêkir;

“Dizanî Sulêman; di çanda me de du bêjeyên bê qerekteriya kes pênase dikin hene. Yêk; şîr heramtiye û ya din jî nandoztî ye. Niha tu ji min re dibêjî; xiyanetê li şîrê wê dayîka tu mêjandî, hejandî bike û were li ber dîwarên xelkê bibe nandoz. Ez hêstên li lorandinek ya dayîka min hatî barkirin, bi tevayê cîhana te di xeyalên xwe de avakirî na guherim” got û jandilek tevlî girî axaftina Tahir qut kiribû.

Dengê ji nav zincikên jor dihat, her du ciwan mestkiribûn û lingên wan bi erdê ve hiştibûn. Dengê destpêkê tevlî nehwirandin û girî destpêkirî, êdî bi gotinên zîz, zelal û ji mejî vedidan digot;

“Bejna Serokê min rihane, rihana tere.<br>
De dayê, bejna ezîzê min rihane rihana tere.<br>
Ya hişînkirî vê xopana zozanê erde gere.<br>
Weyla kulê, tuya sêsed kulbû û bikevî mala Qudîsê Kenya.<br>
Ji nîvika vê şevê û pêve Serokê min girtin û birin bi xwe re.”

Dibêjîqey carekî girî serdestî ji dengê dayîka di kavlek piçûk de firaxan dişû stand û peyv diqirikê de asê hiştin. Ema, jina dilşewitî kelegiriya di qirika xwe de zû daqurtandibû û dengê xwe yê ji mix tê dubare berda;

“Ax dilê min goyîna xwidê, êtûnek ji êtûnên vî berwarî<br>
Heyla ez evdalê, bi çûyîna Serokê min re bûye piç û parî<br>
Me ehd daniye, sond xwariye bi sonda arî<br>
Yan emê welatê romê bişewtînin, Kurdistana sêwî bêxin gola xwînê,<br>
Heyla ez nemînim, yan jî emê Serokê xwe rizgar bikin ji

destê vî neyarî.

Hewar û hîviya min goyîna sêwiya berîstanan, li bazên çiyan.

De bila hilweşînin kelha zulmê, welatê bêbextên van romiyan."

Û hêdî hêdî, lorandina ahengek muhteşem li dengê pîreka yêxtiyar bar dikir, vegerabû girî û peyv di gewriyê de xira kiribûn. Êdî tenê dengê giriyê tevlî nehwirandin dihat.

Sulêman, li erdê dinêrî û haya Tahir ji erdheja di hundirê wî de pêhatî tinebû. Serê xwe hejand û bi dengek têkel got;

"Êşên mezin Yadê Xanê kiriye xwezan" û ji bû birê bikevin destê xwe li milê Sulêman da. Sulêman, jixwe bûrîbû. Xendengên ji jandila ji nav wan kavlikên xirbe barîn ser mergan, dil û mejiyê lawikê bajarî kiribûn serad û di tê de asê mabûn. Bi lêketina destê Tahir re hilciniqî û hat ser hişê xwe Sulêman. Li xwe zivirî û awrên xwe pesartin yên Tahir. Heybera rohn ya bîbûkên çavan nixwimandî di bin elenda stêran de diteyîsî. Tahir, bi milê Sulêman re girt û rêya xwe ajotin.

Dibêjîqey lawikê şehriza, zimanê xwe yê gava din wekî bilbilan dixwend daqurtandibû û Tahir jî çaverêbû ew dest bi gotinê bike. Li derê mala Teybeta Hîlalî li Tahir zivirî û li pêşya wî rep sekinî. Çavên xweyên hê jî şilin pesartin yên Tahir û dibêjîqey dixwest tiştek pir girîng bêje û devê wî peyv çênedikirin. Wateyek ti carî Tahir nebûyî şahit li çavên Sulêman barbibû û bîbûkên wî dibiriqandin. Kelecanbû, an jî şaqistiya lixwe vegerêbû ji hev ne dihat veqetandin. Ji nişkan ve û bi awazek bikelecan got Sulêman;

"Ez jî yê bi te re werim!"

Tahir, merema gotina ciwanê ji ûrkeltî dengê wî dilerize baş fêhm kiribû, ema dîsa jî pirskir;

" Werî kû?"

"Çiyan! Ez jî yê tevlî ARGK' bibim!"

Her du heval qederekî bê deng meşîn û li derê mala Muhemedê dîn Tahir got;

"Heke tu ji biya min bikî, tuyê kêmek din jî bihizirî."

Wekî lêbûrîna xwe bixwaze Sulêman;

"Mereq neke, biryara di bin tîrên nalîna dayîkekî de hatî girtin şîr helale."

Tahir bi "bila"yekî gotinên wî erêkirin û dewamkir;

"Ezê serekî li kolika navenda me bidim, tu jî nayî?"

"Na. Hê dayîka min ne nivistî ezê herim mal û ji wê re bêjim; "yadê, min xiyanet li şîrê te nekir!" û ji hev veqetan.

## Xewn

Xewn, xeyal û hîskirin. An jî bi vegotinek din, pêhesîna mejî? Gelo xewn, dubareya vedana hizir û ramanên hişyar yên di xew de tên dîtinin? Li cîhana mirov ya rûhî de têkiliya pêhesîna mejî, hîskirin û xewnê çiye? Li ser wan qewlan, çiqas bandora xeyal û hizrandina kes heye? Behra wan ya rastiyê çiqase? Heke rastbe, ji bû hemî hizrandinan derbazdare, an jî ji bû hin bûyerên ruh dihingêvin?

Ehmedê Şehbazê Nêrwehî vedibêje;

“Serok, nû ji Roma yê veqetabû. Bi wê veqetandinê re xemek giran cihê şadîtiya me dagirtibû. Ez endamê hêza xweparastinêbûm û di taxima Tahirê Osmanê Hîlalî de bûm. Fermandarê taximê jî di nav de em hemî bi tenga hev re û hevserbûn. Di nav hêza xweparastinê de navê ‘taxima ciwanan’ li me kiribûn. Bi fermana hevalê Riza, taxima me li tenişta navenda hêza xweparastinê zîndanek bihucre avadikir.

Di bêhnvedanê de, me di nav xwe de rewşa Serokatiyê gotûbêj kiribû. Ji xwe axaftin, sohbet û rojeva me ya fer ew bû. Min, Kawayê Afarof Mehmût, Fikretê Îsmaîlê Çelî û pir hevalên din rewş erênî nirxandibû û jixwe esareta Serokatiyê sînorê hêza xeyalên me derbaz dikir. Ema Tahir bi me re ne hemhizirbû û bi awayek mucid bûyera bazara Xelîcê Faris û Qubris rû bi rû dikir. Gerkû Tahir hemsalê me jî bû ema, sekna wî ya stewayî bawerî dida û me hemiyan nêrînên wî mucid digirt. Evê nirxandina wî ez pir bibandor kiribûm û giraniyek wekî risasê êxistibû ser mejiyê min.

Bi wê hizrandinê ve ez hatîm mal û nivistim. Ez di jiyana xwe de ne çûbûm Amedê û min navê Licê jî ji dîroka partiyê bihîstibû. Di xewnê de; ez, Serok û sê hevalên din di sirtek ya Licê de dihatin xar. Aliyek yê sirtê daristanbû û aliyê din rût. Em bi ber aliyê bi daristan re dadiketin jêr. Ji nişkan ve singa me û leşkerên dijmin li hev sekinîbû û min biqêr got;

“Serokê min dijmin em girtin” û min destê xwe avêt yê Serokatiyê.

Destê min ji destê Serok felitî û Serok di milê din de çû xar. Û min kir hewar û ez girîm. Ez wusa girîme, bi dengê giriyê dayîka xwe hişyarbûm. Ez di xewnê de, bideng girîbûm. Dayîka min bi dengê giriyê min hîşyar bibû û hewldabû min ji wê xewna tirsdar hişyar bike. Ema kiribû û ne kiribû ez hişyar nebibûm û wê jî li ser giriyê min dest bi girî kiribû. Piştî ez hişyarbûm min temaşekir, balgihê min ji hêstiran şil û pil bûye. Min xewna xwe ji dayîka xwe re vegot û heta sibehî ne nivîm.

Sibehî zû çûm mala Selo yê Cano. Mamê Selîmê yêxtiyar,

şîretkar û akilmendê gundê me dihat pejirandin. Di wext û zemanê xwe de xebatkartî û dil qayîmtiya wî bi nav û dengbû. Piştî kurek yê wî di nav Hevalan de şehît dikeve û temenê wî jî pir bi pêş ve diçe dilê wî pir nazik dibe û li ber stranek asayî jî hêstirên xwe zeft ne dikirin. Ez li ber serê mamê Selîmê ew demeke nexweş û nexweşiya wî pir giran rûniştim. Zelamê guştê laşê wî helayî, cirnikên çavan kûr bûyîn û biqasî pencekî lê hatî got;

"Vê kebarê te xêre Ehmedê min, îşileh neyîntiyek nîne?"

Min ji zelamê şîretkar re ta bi derziyê ve kir û bi awrên mereqdar çaverêyî bersiva wî sekinîm. Zelamê yêxtiyar, çavên xwe yên kûr pesartin yên min û qederekî zîq li min nêrî. Min jî bi heman awayî li çavên wî yên bê mijgûlk û westayî dinêrî. Çavên wî yên wekî hewtikan, hêdî hêdî tijî avbûn û ava di çavan de kombûyî wekî şirikê di ser rûyê qermiçî de herikî. Destê xwe yê piçûkbûyî dirêjî min kir û min destê wî girt. Xwest destê min bişidîne ema, quweta wî nemabû. Bi arlkarî ya min rabû, pala xwe pesart balgih û bi kelegirî got;

"Min jî xewnek nêzîkê xewna te dîtiye û eve bi dehan kesên dinên di heman çarçoveyê de xewn dîtîn jî hatîn cem min. Dibêjin; giriyê di xewnê de şahî ye. Ev ne raste. Girî, giriye. Girî, şîne! Herin ji hevalan re bêjin; Serok di tengahiyê de ye û bila zû ne dereng tiştekî bikin. Bê Serok, em ji birek pezê gêj wêdetir ne tiştekin."

Li ser şîreta yêxtiyarê zanîndar, min betaniya deriyê mala zincikî dinixwîmîne rakir û derketim ji der ve. Kêmekî hizirîm û yêkser û bi gavên bez min berê xwe da derê navenda hevalê Riza. Li ber derê deriyê navendê texûpaşbûm û rep sekinîm. Min ji xwe re got;

"Gelo, hevalê Riza yê bertekek çawa li hember vegotina xewna min nîşan bide? Xewn, pêhesînek metafizîke û ew meteryalîste û ji van tiştan bawer nake."

Werhasil yêk ji dilê min û yêk ji aqilê min, li hev nekirin û ji devê derî zivirîm. Hatim û li çar rêya di bin navendê re sekinîm. Xem û xewna min ditî dil û mejiyê min dagirkiribûn û hedara min ne dihat. Xewna dabaşa gotinê ewqas mejî û hişê min êxsîr girtibû, min jinên li ser çeşmê mijdar didîtin û teqe reqa dengê tenekeyên wan ne dibihîst.

Bi wan hizrên mijdar ve qederekî li wêdê sekinîm. Ne dikarim dûr bikevim û ne jî herim navendê. Dil û mejiyê min bi hev re şerek bê eman dikirin û yêkî guhdarî yê din ne dikir. Dilê mîn digot;

"Hergîz divê tu xewna xwe, xem û şîretên mamê Selo ji partiyê re vebêjî. Belkî feydeyek ya wê çêbe."

Mejiyê min digot;

"Xewn, xeyalên razayîne. Hevalê Riza ji van tiştan bawer nake û yê erza te bişkîne."

Ez, wê sibhê sê caran ji devê deriyê navenda Partiyê zivirîm û min cesaret nekir herim hundir. Niha jî ew xwezî wekî kulek giran li ser dilê mine û her kû tê bîra min mergê min dişewitîne."

Zelamê êdî dapek reş di porê de nemayî û pirçek hemiza hişîn serê wî dinixwimîne, kela diqirika xwe de hew zeftkir û girî. Dibêjîqey ew xewna tirsdar dubare dubare didît û qêrînên bêdeng ji awrên wî vedidan.

**Tolhildan**

Heyf, hêstek miroviye. Ew komana nikaribe heyfa xwe rake, ne koman, şkêrek mirovên bê xêrete.

Meha bêbext, xwe li Kurdan liba kiribû, zîpên xwe jî girtibûn û çûbû. Rime rima lingên Newroza pîroz lehiya Basimbarê rakiribû. Di çanda Kuyîstaniyan de Sibat çiqas bêbext be, Adar ewqas bexteyarbû. Bidehan çîrok, meselok û serpêhatiyên nehsdar li ser Sibatê hatibûn ristin û ewqas pesin û wesif jî ji bû Adarê hatibûn rêzkirin. Li gor salnameya Newrozê, navê 'Zîp' li her sê rojên dawî yên meha Sibatê hatibû kirin û xedartiya Zîpan bibû dabaşa qiset û dikaran.

Zîpin, zîpedarin,
Bibarin û ne barin,
Her xedarin.
Gîskê giro dibêje;
"Çirt û çirt Sibatokê.
Ez gihatim Adarokê.
Bezê kevin ma li karokê."

Li hember vê biserxwe çûyîn û bê rêziya gîsk, çavên Sibatê sohr dibin, xwe tavêje mala Adarê û dibêje;

"Xwêka Adar,
Bide min sê roj ji van rojên xedar.
Ji bû ez bi lingên gîskilok re bigrim û di sergû de bêxim xar!"

Adar, sê rojan ker dide Sibatê an na, nayê zanîn. Ema, di çanda Kurdan de Sibat zîpdar û Adar Basimbare. Yêk rût û tazî dike û ya din jî başî û qenciyê dibarîne. Sibatê, wê salê ne tenê Kurd rût kiribûn, Feleka xayîn jî dabû pişt xwe û dixwest wan serbir jî bike. Ema, Nûroj hatibû! Xwezayê tirh dabû û keysa pêçana bîrînên Sibata bêbext di dil de vekirîn ji birîndarên xwe re bexşandibû.

Hefteya destpêkê ya meha Newrozê bû. Danê sibehek hunikbû. Tîrojên roja ji zû ve hilatî li şîna giran ya wargehê dida û di şûn de dibeyî. Kerba hîviyên birîndar hêst rakiribin pêdarê û

li dermanekî digera. Ramandina ‘xwîn bi xwînê tê paqijkirin’ kîn ji mergên xişimdar dibarandin û ber bi amancê ve diteyîzandin. Jiyan, binirx û pîroztiyên xwe watedar dibû û digihat asta hêjatiya mirov di oxira wê de bibe lêgerînvanê heqîqetê.

Seferbertiya fedayîtiya Seok Apo ya bi pêşvantiya xwendevanên Şehît Jiyan hatî destpêkirin, hewaya wargehê guhertibû û ya biguhere. Dilên dê û bavên şîndar ji asayî zêdetir sefta singan dihingavt û hêstên du serî û her du serî jî sincirî jiyan dibûn. Wê sibhê şahiya SOZ dayîna refa destpêkê ya fedayiyanbû û hemî wargeh ber bi gergereya çand û huner ve bibû lehî û diherikî. Sînanê Sohr li pêşiyê, refa destpêkê ya fedayiyan xwe ji hewşa şarevaniyê berda. Di bin awrên yardar yên wekî şapeya heyva Gulanê dibarin ser wan de bûrîn û li ser dikeyê nivz û girover wekî rêza ristika mircanan rawestan.

Gelo, fedayîtî çiye? Çima mirovan navê ‘FEDAYÎ’ li kesên xwebûr kiriye? Evdaltiye? An jî ji evdalltiyê jî wêdetir ji bû parastina hîviyên birîndar xwe dayîne? Çima, dema  ew civakên şikestekên hîviyên dawî di awrên wan de diperpitin çav didin kesên xwebûr, di dil de hîvî dibe lehî û wêrîn radibe pêdarê? Çawa ew kesê doh jirêzê, îro dikare bibe lehengê xewnên hemî dilên evîndar? Dikare bibe suweyda ser dilan, sênca hemî hîviyan?  Gelo, raza vê spehîtahiyê çiye? Zanîne, wêrîne, hêste û an jî lotkeya hevgihandina hemiyane?

Li serê rêza ji bîst û du kesan pêkdihat, temenê hemiya di bin bîstê re û giraniya wan xwendevan; Metînê Eşrefê Gundikremoyî rawestabû. Bi anonskirina navê wî re xortê bejin navîn, esmer û guliyek reş di ser eniyê de dirijê; bi gavên giran hat û li ber mîkrofonê sekînî. Bihatina lawê xweşik re hemî girseya pêşber rabibû jipiya. Girseya jipiya nefesa xwe girtibû û çevên hîvîdar bi eşq û sewdayek bê pênase bi lêhvên wî ciwanê nû pazdeh xilaskirî ve daleqayî mabûn. Dibêjîqey xwezayê ew ciwanên niha li pêşber rêzgirtîn, bi çingalan ji ezmanan daxistibûn û cara destpêkêbû wan û koma mirovên bi eşqek mezin bi ser milên hev re li wan dinêrîn hev didîtin. Ne tinê girseya jipiya, kelecana li ser rûyê Metîn û hevalên wî jî hêjayî dîtinêbû. Ciwanê cilên Bohtanî bejna wî ya tenik bi wezbetir ratêxe pêş çavan got;

“Li cihê nirxên pîroz, haveynê havgirtina komanekî di bin êrîşên gefa dijminan de bin, li wêdê erka lezgîn ya ciwanên komana mijara gotinê singa xwe kirina mertale.”

Ciwanê kelecana dêma ne vedida dengê wî û bi dengek bê qusûr taxivî, bi awazek kîndar axaftina xwe ajot.

“Van xwînxwaran, ji berya sed salan ji bê rêxistiniya me keys dîtin û welatê me dagirkirin. Girêdayî vê hemî nirxên em kirîn em ji me standin û xwilamtiya xwe jî ji me re zêde dîtin.”

Êdî Metîn, bi nasnavê xwe yê nû ‘Zafer’ bidengek bilind û xîtabî taxivî. Dengê wî yê zelal û agir jê dibarî, di qontara Qerçox de vedida û şîna wekî konek reş daketî ser wargehê tert û belav dikir.

“Wekû Gelê Kurdistanê, dema me di bin derbên kuştinê de serkerat dikir xwezayê û dîroka zemanê Berpenîr ji me re rizgarvanek bexşand. Wî Rêberî, wî rizgarvanî bi ked û hewlek bê eman, bi tosintiya hekîmek bihes birînên me dermankirin, em rakirin jipiya, rêxistinkirin û ji nû ve vejandin.”

Têkiliya di navbera çavên girseya jipiya û ya wî ciwanê bê qusûr taxivî  de wekî berqa birûskê vedida û hemî bê çaretî li ber xwe dibirin. Zarokên fedayî, yên dê û bavên di wargeha Mexmûr de hatîn dorpêçkirin serî rakiribûn û ji zordaran re dixwirîn. Dayikan devê xwe di êxistin ber guhên hev de û bi serbilindî digotin;

“Hewla dagirkirina gelek têr fedayî exmeqtiye!”

Bi vê enerjiya ji awrên dê û bavên xwe digirt bidengek gurtir û biheybetir axaftina xwe ajot Zefer.

“Îro dijminên xwînkar, dagirker û nûkeran xwe kiriye yêk, dîsa dixwazin me bê ser û ber bihêlin û di taristana xwe de dabelînin. Ema wekû zarokên Serok Apo, em li vêdê ayan û beyan dibêjin; hêza tu kesî ya têrê neke Roja me tarî bike!”

Xortê şewqek efsûnî ji çavan dibarin û herkû taxive dengê wî stewayîtir derkeve vesekinî. Ciwanê di tevayê axaftina xwe de li xalek sabît dinêrî, çavên xwe bi ser mirovên li beramber bi eşqek mezin guhdar dikin re şemitand û axaftina xwe domand;

“Ez dixwazim bi hevokek ya Serok Apo li Romayê bilêhvkirî dawî li axaftina xwe bînim;

“Heta armanca wan keçên hijdeh saliyên xwe şewitandî negihê serkeftinê, ez ne xwe û ne jî tu kesî mêr dipejirînim!”

Vêca bila tu kes xwe nahes neke, di van zikakên bitoz de bejna xwe liba neke û dikara mêrantiyê ji zarokên xwe re neke. Roj, roja namûs û şerefê ye. Roja parastina rûmet û xêretê ye” got û dirûşma “tu kes nikare Roja me tarî bike” bi girseyê re sê caran qêrî.

Piştî berdevkê ciwanên fedayî axaftina xwe qedand, refa fedayiyan li dora mêzeyek mezin û bi ala rengîn hatî nixwimandin kombû. Li ser nîvê mêzê çekek keleşkofa fermil û manîfestoya bi navê ‘Rêya Şoreşê’ hatibûn bicêhkirin. Ciwanan, bi hev re û bi ahengeyek ritmîk sonda beşdar bûyîna gêrîlayên Kurdistanê xwendin, bi komikî silavek dan dê û bavên xwe û ji dike veqetan.

Ji neçartiyê dijwartir şewta hinavan nîne. Û ji heyfa wê şewtê mezintir hêstek rakêş û şîrîn jî nîne. Tuyê bi ûrkeltiya tîvîlkekî ji xwe re nirxekî mezin bikî. Hemî xeyalên xweyên pîroz li wî nirxî barbikî. Ji xwe re bêxî nasname, ronahî û hîviya hêlînek azad. Zordarekê derkeve, bi xap, bêbextî û bi darê zorê ji te bistîne û bibe. Lehengtî,

di taristana zordaran de tifkirina rûyê mirinê ye. Aha wan ciwanên spehî wê sibhê, avek hûnik di mergên dê û bavên xweyên ji neçartî dişewitîn de kirin û çûn.

Zordarên cîhanê, derbik giran li Kurdan dabûn. Kurdên derba xedar ji mejiyê xwe xwarîn weşişîbûn ema, ne ketibûn û li berxwe didan. Li dora Rêberê xwe sêncek ji agir çêkiribûn û her roj ew sênc qayîmtir û mezintir dikirin. Xwînkaran di guhertina Kurdan de û Kurdan di xwebûna xwe de israr dikirin. Ew cengek ewqas dijwar û bê wujdanbû, bergiriya berberê wê jî ewqas bê eman û biwezbetbû; her du kes rûniştibûn û qiset dikirin. Wê cenga ji dîroka hilberîna xweda û beniyan ve dewam dikir ya kengê û li kûdê xilas bibûya, nedihat zanîn. Ema ya hergîz û rastiya wê gotûbêjê bi xwe re nabe, hê wî hevîriyê pir av hilanîbûya.

***

Rojan hev diqulibandin û Xwedayê şev û rojê çerxa feleka Kurdan çep dizivirand. Şîna wekî konek şil daketî ser wargeha Mexmûr tiştek ji giraniya xwe wunda nekirîbû. Yên dora wan dihatin, çek û çelteyên xwe hildidan û ref bi ref ji wargehê vediqetan. Berê her kesî li çiyanbû û bi kîna tolhildanê dagirtîbûn. Ciwanên soza tevlîbiyîna Artêşa Gel dayîn xwe bi leşkertî tekûzkiribûn û li dol û niwalên Qereçox belav bibûn. Şev û roj perwerdeya leşkerî didîtin û xwe ji cengek yeman re amade dikirin. Êvara şevak ya deravê Cejna Vejînêbû. Jin û mêr rijabûn derê kolikên televîzyonan û bi bê aramtiyek mezin çaverêyî nûçeyên Med TV  rawestabûn. Piştî dubare û carek din seyra wezbeta çalekî û serhildana Kurdan kirîn, di serî de kevaniyên zaroşîr vegerabûn zinc û çadirên xwe û yên dixwestin televîzyonê temaşe bikin jî mabûn.

Li pey bûltena mak, bernameya Baxçeyê gulan derketibû. Bernameya zindî û Gulistan Perwer pêşkêşvantiya wê dikir, bi rêya telefonê fikir û nêrînên gel digirtin û li stodyê yê jî mêhvanên wê hebûn. Pêşkêşvana dihezidî celadên xwe û ji bû xwe bişiphîne jordestan hewlek mezin dimezaxt tîq, tîqa wê bû û bê sebeb dikenî. Kenek ewqas bê ar û sik dinanên wê qîç hiştibûn kû dilê kesên li ser wan darên hişk û gincir çaverêyî bûyer û qewmînan mayîn qeliqandibûn. Teybeta Hîlaliya li aliyê pêş ya beşa jinan rûniştî, xwe hew girt û bi dengek bilind got;

“Niha çi karê vê li ser televîzyona me heye? Heke bi destê min ketibûya, minê lingê xwe danîbûya ser lingê wê û ew  bi nîvî re êxistibû ya du qet û tijî xwêya kara kiribûya!”

Mustefa yê Hamidê li rexa beramber rûniştî, mizek kûr li çixareya xwe ya nû pêxistî da û bi dengek xemdar got;

“Teybet xwiha min, qey jixwe ne van hêst çêrayiyan ev telafet di serê me de anîn. Ser û binê xwe ji hev nas nedikirin, Serok dan hev, mezinkirin û vêca li devê wê yê nankor binêre.”

Teybeta hêrsa wê rakirî jipiya û haxta êrîşî televîzyonê bike got;

“Hûn bi serê Serok bikin yêk ji min re bêje; niha çi ferqa vê û wan bûkên lastîkên di televîzyonên turkan de heye?”

Ehmedê Îsifê li rex Mustefa rûniştî, şaşika melkebî ser û siketê wî yê qermiçî daqurtandî axînek kûr kişand û tevlî sohbetê bû.

“Hê li kûye.. Ev destpêke. Xwe ji hunerên wan nandozên heta niha li dora Serok wekî perwanê dizivirîn re amede bikin. Bê hisiyetên me, ne kêmin. Wekî rûviyên xirabûyîne. Bêhna tomikek xweş ji kû were, dûvê xwe li wêdê dihejînin.”

Teybetê hew xwe girt, di ber xwe de hin dijûn kirin û wekî ji xwe re baxive;

“Yên ev derxistîn ser vê televîzyonê ji wê xirabtirin” û fîşa televîzyonê bihêrs kişand û derket ji der ve.

***

Êvara cejna Newrozê bû. Ji kelecanê zêdetir dilşkestinek kîndar ji awrên xwendevanên Mexmûr dibarî. Ji rika dagirker û xayînan ve xwe baş amedekiribûn. Her ciwanê wargehê û biteybet xwendevanan meşale hazirkiribûn. Qotiyek teneke ya avbacênê bi serê depek zirav û biqasî mitroyekî ve bizmar dabûn. Qotiya biqasî lîtreyekî tijî xweliya tenorê kiribûn û xweliya di qotiyê de têr qazyax kiribûn. Li gel meşaleyên destçêkirî hin ciwanan jî têlfafûn amedekiribûn.

Sulêman, Tahir û Mamosta Kamîranê Hîlali, berendamê gêrîlatiyêbûn. Biryara xwe dabûn û êdî gêralîbûn. Li hêviya şahiya soz dayînêbûn û rêvebertiyê jî şahiya sozdayîna wan lirasta cejna Newrozê anîbû. Sulêmanê bi jandila Yadê Xanê dest ji çûyîna Ewropa berdayî û biryara tevlîbiyîna gêrîla dayî, di çapemeniya wargehê de kamerevanbû. Bi her du hevalên xwe yên navbûrî re kamera xwe girt û bi roj avabûnê re xwe li singa Qereçox dan. Li ser girikê li raser cihê ciwanan bi tîpên mezin li ser erdê nivîsandina ‘Newroz Pîroz be’ kulayîn û cokên tîpan tijî xwelî kirîn bicêhbûn.

Bi reşketina şevê re ciwanan, cokên nivîsandina ‘Newroz Pîroz be’ tijî qazyaxkirin û agir berdanê. Ew di heman demê de nîşana destpêka pîrozkirina cejna Newrozê jî bû. Bi wê nîşanê re li derê her çar dibistanan deryayên ji agir pêkhatibûn. Piştî kêmekî ew derya ber bi qontara çiyê ve bûn robarên ji pêtê û herikîn. Guriya

meşaleyên di destên xwendevanan de, di tarîtiya şevê de bibûn yêk û dîmenê robarên ji agir dertêxistibûn holê. Her dibistan, bi hindama xwe re ber bi qontara çiyê ve derketibû rê û diruşme diqêrîn. Bi sê xetên sohr wargeh kiribûn qet û dîmenek awerte li tarîtiya şevê barkiribûn. Pêl pêlokên masûrî diketin pêlên robarê ji pêtê û ber bi çiyê ve diherikî. Tahir, ji Sulêmanê her kêliya wê şeva biheybet bi kamereya xwe qeyd dike re got;

"Baş bikişîne Sulêman. Hin hêst, hin dîmen hene dubarekirina wan ne gengaze."

Kamîranê bi yardartiyek mezin li heybeta xwendevanên xwe temaşe dike, bi dengek heyfdar tevlî sohbetêbû û lêkir;

"Wekî şeva me ji Nînûva barkirî!"

Tahir, destên xwe li hev dan û gotina Kamîran birî.

"Heyfa wê şevê. Tu hunermend, ti hêz nikare wî dîmenî dubare bike. Ne qeydek û ne jî wêneyek li dûv ma."

Sulêymanê bi baldartiyek tosin robarên ber bi qontara çiyê ve nêzîkê hev dibin û haxta tevlîhev bibin dikişîne, di hemdê xwe de bersiv da;

"Ma kamera û makîneyên we hebûn, me ne kişand?"

Her sê nûgêrîla jî bi bersiva kamarevan beşişîn û bi bin cihê pêta agirê nivîsandina 'Newroz pîroz be' bilind dibe re cobarên ji agir gihatin hev û Qereçox bi agirê Newrozê hatibû xemilandin.

Şahiya Newroza ewil ya piştî roja Reş heta bi derengê şevê ajotibû. Pênesaya 'şahî' ji wê şevê re zêdebû ema, Mexmûrî bibiryarbûn şîn û reşa xwe bi agirê Newrozê bişûn. Jixwe her bi wê rêbazê jipiya mabûn. Kengê duryanek asê derketî pêşiya wan, êşek giran di ser wan de hatî, bi êrîşek mezin re rû bi rû mayîn; mêrxas û lehengên nû derketibûn pêş, canê xwe danîbûn holê û ew neyîntî berteraf kiribûn. Ema derbeya wê carê ji mejiyê xwe xwarîn, ji hemî êşên jiyan bûyîn bi caran girantir û mezintirbû û berdêlê wê jî xwe bi agir şuştinbû. Bê goman berdêlên wê derbê jî ya ji derbên din pir buhatir û jandartirbûya.

Sibeha roja Cejna Newrozê bû. Hemwelatiyên xewê ji zû ve rêya xwe bi çavên wan ne êxistî, li gergereya çand û huner kom bibûn. Ji cejnê zêdetir, kelecana sozdayînên nû sefta singa wan dikuta. Jixwe coht hêstiya dê û bavên gêrîlayên nû jiyan dibûn bê pênasebû. Piştî artêşa zarokên Serok Apo bi meşa leşkerî ketîn di gergereyê de bernameya pîrozkirina cejnê jî destpê kiribû. Ya herî zêde bal kişandî û hêstir ji çavên dayîkan herikandîn, hêjmara xwendevanên Şehît Jiyan bû. Dibistana hêjmara xwendevanên wê bi ser sed kesî re, niha bîstek qels û lewaz mabûn. Yên mayîn jî di bin awrên tevzdar de perçiqîbûn û peritî dixwiyan.

Xwendevana berê ya Şehît Jiyan û gêrîla nû bişkivî Nêrgiza

Hîlalî, pêşkêşvana pîrozbahiya cejnêbû. Piştî pêşkêvana bejna zirav bi ser navîn re kêmek dirêj û di nav cilên gêrîla de biheybetir dixwiyê xêrhatinek germ li hevalên xwe yên kevin da, malikek ya ristê ji nav lêhvên wê yên dimînin perika sîrê herikî;

"Şeva bêdeng bû hêlîna kul û êş û derd û janan.
Dilê xemgîn ji birînan bûye bûka gulistanan.
Tu bûyî xewnek girêdayî li nav ewrên zivistanan.
Li hêvya te ez dilketim reştarîka van zîndanan."

Li ser wê axa qedîm ti carî gotinê qedrê xwe wunda nekiribû. Ema ti carî wekî wan risteyên hunandîn yên ji nav lêhvên wê Stiyê diherikîn, mergên mêhrîdarên xwe ne hingavtibûn. Ew, di mêhrava mêhrîdaran de bi agirê mêhrê hatibûn şuştin. Dibêjîqey, rista xwendî bandor li dengê pêkêşvana dêm gulî jî kiribû. Çavên xezalî yên xemla dêmê pembeyî biwezbetir dikir, hatibûn guhertin. Ema di ferqa erk û berjenga xwe de bû û xwe zû komî serhev kiribû. Bi dengek xem û hejêkirin têkel dubare axaftina xwe ajot û got;

"Ezê niha peyama Serokê Serokan ya Serok Apo bixwînim" û bi wê hevokê re hêst bibûn lehî, volkana di mergan de rakiribû pêdarê û çav wekî avzêmên biharan der bibûn.

Pêşkêvana qurmên keziyên hunandî wekî fitlên marên reş di ser kemaxan de dadiketin, dest bi xwendina peyama Newrozê ya Serokê xwe kiribû.

*"Gelê me yê binirx!*

*Newroza pêwîste bikeyf, coş û hejêkirina biharê were pêşwazîkirin; di vê dema li ser bingehê ewlehiya yasayî, di nav aştiyê de bi awayek siyasî hewla çareserkirina pirsgirêkên we tên dayîn; wekû Cejnek ya aştî û xwişk û biratiyê ziman, ol û çanda wan çi dibe bila bibe, em bi hev re pîroz bikin. Di vê pêvajoya hatî de, ez bang dikim her kesî; di hewldana aştiyê de bibin yêk û di rêya vebiyî ya azadiyê de bimeşin. Roj ne roja tolhildanê, roja aştiyê, roja bi xwişk û biratî em xwe ji hev himbêzkirinê re amade bikin.*

*Mêhra we hemiyan; gel, ax û mirovan jan û hêstîtiya min ya herî mezine. Piştî axaftinên herî mezin yên îdîaya bi milyonan di çav û mergê xwe de dihewîne, bê goman ev ya herî zore. Ema ev jî piştî bêbextiyek wusa ya navneteweyî û hem jî xiyaneta bê bexşandin ya kesên xwe dost nişan dikirin tê fêhmkirin.*

*Ez we hemiyan bi hejêkirin û mêhrîdar himbêz dikim û silav dikim.*

*19 Adar 1999*
*Abdullah Ocalan*
*Girava Îmralî"*

Bi gotina dawî ya Gula Apoyî ya nû bişkûvî re dengê durişmeya “tu kes nikare Roja me tarî bike” û “bijî Serok Apo” ya girseya peyam jipiya guhdar kirî Qereçox carek din hejandibû.

Mêhrav, bi hêsanî nayên avakirin. Hêstên sehl, mergên çêrayî û kînên kuh nikarin bibin mêhredar. Ew mêhrava cesa binyata wê bi mergên mêhredaran nehatî stirhan, bi hêstirên dayîkan nehatî dûtin û mîrê muradan hostatiya wê nekirî, ne pîroze. Ew mêhrava bi milyonan mêhredar di agirê wê de nehatîn şuştin, ne qeste û ne mebeste. Ew mîrê bixendengên evîna xwe mergên milyonan muradxwazan ne hingavtîn û di mergê xwe yê mêhrîdar de ne hewandîn nabe Mîrê muradan. Aha ji ber vê spehîtayiyêbû, ji ber vê mêhredartiyêbû; wekî perîstankê bi milyonan muratdar lidora Mîrê muradan  bibûn perwane û xwe bi agirê evîna wî dişuştin.

Ew bêhna dê û bavên mêhredar bikelecan û bê sebriyek mezin çaverê hatibû. Li serê rêza şazdehemîn û hêjmara sed û heştî û çaremîn Mamosta Kamîran rep sekinibû. Çavên tevayê girseya li gergerê rûniştî,bi bejna wan ciwanan ve zeliqî mabû. Dê û bavên ciwanên wekî ristika mircanan li ser dike bûyîn rêz, hêstirên xwe dirijandin hinavan. Bi anonsa pêşkêşvana deng zîz re Mamostayê bejin navîn û nû sêlm pesartî bîstê derket pêş. Mîkrîfon ji destê hevala xwe girt û piştî xweşbaş û cejna Serok Apo, gelê Kurdistan û gundiyên xwe pîrozkir vesekinî. Kêmekî hizirî û dubare destpêkir.

“Di nav me kurdan de, gotina ‘ser û ber’ pir tê bikaranîn. Ema, li ser kûratiya wateya li van peyvan hatîn barkirin zêde nehatiye remandin. Ser; hizre, bîre, hişe, fike, fikre û ronahiye. Ankû bûrdoziye. Ber; rêye, rêbaze, rêgeze, polîtîkaye, armance. Ankû qada ser ya kirinî ye. Dema ser diçe, ber jî namîne. Mirov an jî komana bê ‘ser û ber’ berde ji bû nirxên xwe yên mirovtî têkoşînê bike, kes wan bi xwilamtî jî na pejirîne” got û vesekinî Mamosta yê zarokên karwanên rêya azadiyê.

Gotinên bijare, lib bilib û yên wekî bidarvekirina mircanan ji devê gêrîlayê nû dirijan, dibûn avek hûnik û li hinavên guhdarvanan werdibû. Girseya beramber, bê qeliqandin û bi baldartiyek mezin guhdarî wî mirovê zanîndar dikir. Mamostayê ev cudatiya xwe nû ferqkirî tona dengê xwe şidand û dewamkir;

“Zorhêzên cîhana me, bi dagirker û nûkerên xwe ve dixwazin me bê ser û girêdayî vê bê ber bihêlin. Piştî wê me di taristana xwe de dabelînin û ji holê rakin. Ema wan di hesabên xwe de şaşîtiyek kirî ye. Wan nizanî dabelandina ruhê Serok Apo avakirî, ewqas ne sehle.”

Ciwanê heta hingê nerm û rihet taxivî tiliya xwe hejand û êdî dengê wî kîndar û bihêrs derdiket. Ew li hember bêbextiya cîhana zordaran dixwirî êdî.

“Ez li vêdê soza şerefê didim we, heta fikir û armancên Serok Apo negihên serkeftinê ev agir ne vemire û ala şehîdan spartî me li erdê nekeve.”

Girseya bi hevoka Memosta ya dawî re rabûyî jipiya, bi durişma ‘ tu kes nikare Roja me tarî bike’ ber bi erşê ezîm ve bilind bibû. Mamosta û refa xwe jî tevlî durişma dê û bavên xwe bibûn û piştî şahiya sond xwarinê ji dike veqetabûn.

Mele Heyder, bi çavên eşqek bê panese ji wan diherike li rêza şervanên nû ji dike veqetayîn dinêrî. Piştî rêza şervanên nû sozdayîn bi ber dibistana Dr. Nûrî Dêrsîm ve nependî bû devê xwe nêzîkî guhê Sînanê Sohr kir û bi dengek hêdîka got;

“Serok dibêje; “Roj ne roja tolhildanê ye” û ciwanên me sonda tol standinê dixwin, ev ne nakokiyeke hevalê Sînan?”

Rêveberê kohne, bêkû tekûztiya sekna xwe xira bike bi bersivek tekez got;

“Na” û bi hevokek teşbîhî dewamkir.

“Bazih, ji firindeyên din dûrtir dibînin.”

Mele Heyderê zekî û yêk ji mêhredarên herî dil bişewat yê Mêhrava Mîrê muradan, bi hejandina serê xwe pêneseya teşbûhî ya Sînan erêkir.

Pîrozbahî heta danê êvarî ajotî bê govend qedabû.

Gelo çima mijara hemî mîtolojî û destanên vejînê yên qewmên qedîm, xwedan pêktînin û ya Kurdan mirovek hêsinkar? Hemî qewmên pêşvantî ji damezrandina şaristaniyetê re kirîn, avakirina cîhanê ji xwe didin destpêkirin û Kurd, berxwedana li hember wan? Lehengên hemî destanên xelkê xwedayên bihêzin û yê Kurdan mirovek kedkar? Çîma, lehengên destana Kurdên bi ked û şoreşên xweyên bê hemsal makîtî jidayîbûna hemî qewmên qedîm re kirîn, ne xwedayên heft serîne? Çîma kesek karker, hêsinkar û mirovek asayî ye? Hemî qewman Rêberên destanên xwe bi hêz û desthilatdartiyê sembolîze kirine û Kurdan bi hêsin? Bi teybet ji bû Kurdan û bi giştî ji bû mirovtiyê çi wate li hêsin hatiye barkirin? Çima Kawayê hêsinkar, ne ji bû desthilatdartî, qesir û hêzê; ji bû parastina jiyanê şer kirî ye? Ne bi çek û hêza xwedayî, bi çarkûçê xwe yê hêsinkartiyê desthilanî ye? Gelo çima xwidayên hemî gelên desthilatdar zelamên dêwin û yên Kurdan Stiyên Stêr’in?

***

Dereng êvara roja duyemîn ya hefteya lehengtiyêbû. Bi ser wextê nûçeyên Med TV re kêmek derbaz bibû. Mirovên bi hîviya guhdarkirina nûçeyan kom bûyîn zû belav bibûn. Mîrîtiya hevgirtî, dergûşa Magna Carta, Brîtanya Mezin ya M. Sykes, W. Churchîll û P.

Cox, bi hênceta gel teşvîkê dijwartî û serhildanê dike ekranên Med TV reş kiribû. Seîdê Xirabreşkî, kelaşê xweyê gir û pehn pesartibû kupalê kefik fisayî û li derê kolika televîzyonê mitale dikir. Ehmedê Amînê, yê mala wî cîranê kolika televîzyonê ber bi Seîd ve hat û got;

"Seîd, ev dunya çi ji me dixwaze, çima bela xwe ji me na veke, qey me çi ji wan kirî ye? Willeh, billeh, tilleh ez dikim û nakim nikarim fêhm bikim. Me welatê kesî dagir nekiriye, çav ne berdeya mal û namûsa kesî, kes talan nekirî ye. Ne ez fêhm nakim Seîd, bixwidê nikarim fêhm bikim."

Zelamê simbêl qij, pora hişîna hemiz li ser serê mezin wekî erzêlekî dixwiya û riha dapên reş lê nemayî qermîçokên rûyê wî nixwimandîn di ber xwe de ji qestîka kenî. Dibêjîqey bi ne fêhmatiya Ehmet dikenî. Birha pişta xweya tevandî baştir berda ser kefka kupal û êdî bideng kenî. Bi dengê xwe yê zir û quretî jê dibare got;

"Çawa tu fêhm nakî Ehmet, çawa?" Ev gûyê Silhedînê Eyûbû ye bi teşka me ve mayî."

Destê xwe yê têr kulîmek bibaskî deşta Baqirtê ve kir, cokên qermîçokên eniya wî kûrtir bûn û dewamkir;

"Camêro bi hezaran xortên me ji ber van pêxasên dawdirêj dan kuştin û gûyê wî jî bi me ve ma."

Ehmedê temenê wî, avana laşê wî, ser û guhê wî û bicilên li ber dibêjîqey cêwiyê Seîde lê vegerand û got;

"Behra wê jî hebe lê, ez dibêjim qey mesele kûrtire."

Şîretkarê zanebûna wî ya dîrokî heta bi Silhedîn diçû, dabaş guhertibû. Bi kalînek heyf barkirî destê xwe li ranê xwe da û got;

"Ax.. ax Ehmet! Xwezî ji mîrê muradan re, ev bapêş ji van qedeman derketibûya û dîsa wekî carikên caran ez vegerabûma ser kewna xwe."

Wê xweziya kûr û pêkhatina wê ne gengaz, dilê hemsohbetê wî jî guvaştibû. Her du jî bi temenbûn û hênceta wan ya zirtan xweşbû. Ehmet, gotina Seîd birî û lêkir;

"Her sê teleqê bê fito û fito ne li erd û ne jî li ezman lê nakeve Seîdê bira. Wextê min çek û rext li xwe dipêçan û ez birê diketim, bazih bi min re ne digihatin."

Seîd, serê xwe yê mezin ji kul hejand, gotin ji hevzirtê xwe girt û da nav;

"Ma ez Ehmet, ma ez! Bi wî xwidayê şev û rojê, dema min awra xwe li sêhka bisfingê kor dikir û li navguhê baregihên romê dida erd û ezman diheja."

Li derê kolika Ingilîzan sêwî hiştî, civat germ bibû û zirt û xwezî ji hewa ve dinirijîn hev. Ema, pirêzeya zeman diyarbû û gengaztiya bicêh hatina xweziyên wan yêxtiyaran tinebû. Di dawiya kunê re zeraq ne dixwiyan û taristanek zulomat cihê xweziyên

xweziyan daqurtandibû.

Zeman, ber bi ne kifşbiyînê ve bilez diherikî. Êş û kederên bûyîn qafû li ber xwe dibirin ema, dewsên birînên kûr xira ne dikirin. Di dilan de evîn qerisibûn û li hêviya biharên din mabûn. Wê komika mirovan, di pêvajoya wê rêvantiya zehmet de hemî êrîş û sikîtiyên dagirker û nûkaren bi bin êxistibûn. Hemî zorî û zehmetiyên jiyanê bi serbilindî pêşwazî kiribûn. Hemî sênc û duryanên asê bi mergên xwe qulibandibûn. Bi tinetiya xwe ve hemî toz, germa dojehî, têhnîtî û zehmetiya Mexmûr jî daqurtandibûn. Ema li qontara Qereçoxa xopan Feleka bêbext derbeyek ewqas giran li wan dabû, ne dikarîn bi binbêxin û ne jî bidaqurtînin.

***

Zû sibehek ya Gulanê bû. Li warê Qereçox hê nû salek timamkiribûn. Xeparvanên ji jin, zarok û mêran pêkdihatin, şkêrikî li sandoqa tirimpêlên bê merîs siwar bibûn û di darbenda wargehê de çûbûn xar. Tirimpêlên xîz, çîmento û tiştên din ji sê dibistanên nû saziya Qendîl dest bi çêkirina wan kirî re dikişandin, girên tozê li dûv xwe dihiştin. Dukandarên bi motorokên sê tekel ji Mexmûr tişt ji dukanên xwe re dikişandin, xwe li nav toza tirimpêlan didan û dijûn dikirin. Jin û keçên bîdon û galonên xwe li pêşya çeşmeyên taxan rêzkirin, bi bê aramtiyek mezin çavrêyî hatina avêbûn. Xwendevanên di xew de mayîn, an jî dayîkan zû amede nekirîn, diteyîzîn û wekî birûskan ber bi dibistanan ve dibezîn. Beşdarvanên perwerdeya dewreya Kongra şeş bê mad, ber bi mala perwerdê ve diherikîn.

Kemalê Şirnexî, pirtûka stûr ya ji belgeyên Kongrê pêkdihat yêkser ji turkî werdigerand Kurdî. Rojda ya turka mamostayê perwerdê, bi çavên xwe yên kûr li beşdarvanan vedinêrî. Beşdarvanên tevlîhev û giraniya wan navser, bi baldartî guhdarî Kemal dikirin. Ema gotin û hevok, ji devê wergervanê yêkser werger dikir qet û pet derdiketin û wekî findoqan li mejiyê guhdarvanan diketin. Ji deh gotinan, gotinek û ji deh hevokan, hevokek ne dihat fêhmkirin û dengê wergervan wekî zirmênek sik di mejiyê avana perwerdê de vedida.

Piştî wergervan qasê hatî kifşkirin xilaskir, awrek kubar avêt rûyê qermiçî yê Rojdayê û li pişt mêzeyê bi ala rengîn hatî nixwimandin rûnişt. Bi rûniştina wergervan re jina tenik û bejin navîn, li gor navîna temenê kadroyên PKK'ê kêmek temendar dixwiyê, rabû ser xwe û bi turkî pirsa; "cihên ne hatîn fêhmkirin û hûn dixwazin werin dubare kirin hene" kir.

Ji avana qismek gelik mezin qet zimanê Turkî fêhm nake û bi

çavên xilmaş dinêrin, çistên derneketibû. Ev hêlwest, dihat wateya 'her tişt qence û her tişt baş hatiye fêhmkirin' û wekû xwezayî Mamosta ya Turk jî wusa şîrovekiribû. Piştî jina perwerdevan dirêj-dirêj beşa gotûbêj û rexneyên di kongreya şeşmîn ya Partiya Karkerên Kurdistan de hatîn pêşxistin û ji aliyê Kemal ve hatî weregerandin nirxand. Navberek kurt da û beşdarvanên perwerdê bi komîsyonê ve derketin ji der ve.

Asya Şaxî, yêk ji beşdarvanên perwerdê ya herî yêxtiyarbû. Jinek tenik, bejin navîn û di bin êşên salên dirêj de perixîbû. Jixwe şîna esareta Serok ew perçiqandibû û çavên wê yên dema li ser kewna xwe reş û belek, niha kûrbibûn û her tim şilbûn. Kurek yê xwe di Têkoşîna Azadiyê de Şehît dabû û du keçên wê jî di nav ARGK'ê de gêrîlabûn. Hevjîna bi kurekî ve li dûv Qelender mayî li cembû û vê jî jana kulên wê mezintir dikir. Di rûyê neviyê xwe de Qelenderê xwe didît ema, dayîka ciwan û jinebî mayî, êş û belabû.

Yadê Asya, qet bi zimanê turkî nizanî. Di jiyana xwe de cara destpêkê ji devê Yaşarê turk peyvên turkî bihîstibûn. Bi romiyan re hevnasî turkîtiyê bibû û ew jî ji kuştin, şewitandin û heke şansdarbin ji lêdanê pêkhatibû. Di pêvajoya wê rêvantiyê de û bi derketina Med TV re hevnasî ekranên televîzyonan bibû. Sînorên cîhana wê ya teknolojiyê nûçeyên Med TV dagirtibûn. Di zena wê de cîhana televîzyonan ji Med TV pêkdihat û ew jî ji aliyê neviyên Edwardê çeq dirêj ve hatibû reşkirin. Dayîka mêhredar li ber siha xaniyê zincikî û dîwarê wî xwirî kuç, bi çavên şil li raser Gabar sekinî. Bi dengek kelegirî û wekî gotinê ji derdor veşêre got;

"Gabarê min, qey PKK xira dibe?"

Gabarê yêk ji beşdaravanên herî ciwan û kêmek di dibistanên turkan de xwendî, bi hevoka Yadê Asya avakirî re hilciniqî û rabû jipiya. Dayîka kitana wê ya spî tebixî û biskên wekî şebê bi ber re dixwiyên Gabar vexwend rûniştinê û ew jî li rex rûnişt.

"Kurê min, jixwe ez ji zimanê vê hevala turk tiştekî fêhm nakim û çend gotinên vê sibhê min ji Kemal fêhmkirîn jî zeravê min qetandin. Ka bêje Gabarê min; çi diqewime?"

Ciwanê di wargehê de wekû mamosta dihat binavkirin, bi çend hevokên sehl û safî gotubêjên di kongreyê de hatîn pêşxistin û wateya rexne û rexnedayînên hatînkirin ji Yadê re şîrovekirin. Dayîka ji şîroveya Gabar qayîl dixwiyê, hêstirên çavên xwe paqijkirin û bidengek dilniyatir sohbeta xwe ajot.

"Xwedê ji van Hevalan razî be. Nizanim, ne kesek du gotinên Kurdî bîne ber hev nemaye û ne jî dixwazin me bi zorê bêxin turk. Eve pêncî û çar roje ez tême vê perwerdê. Ne ji wergera Kemal tiştekî fêhm dikim û ne jî ji zimanê vê hermeta turk" got û vesekînî Asya ya ji havîngeha mîrekan.

Wekî bixwaze encamên zehmetiyên jiyan dibe baştir vebêje, pêl gotinên xwe kir û axaftina xwe domand;

"Bawer bike kurê min, di van pêncî û çar rojan de tiştên min dizanîn jî jibîra min birin. Tenê zirme zirma dengek acizker di mejiyê min de vedide û ser êşek bê debar bi min re çêkiriye. Ez newim eybe û ez werim aha encam eve."

Ciwanê nizane yê çi bibêje, bi hejandina serê xwe xemên Yadê erê dikir û bi memikên rûyê xwe tevlî rexneyên wê dibû. Tenê carnan bi çend gotinên ew jî ji wan bawer nake, bi ber dilê jina yêxtiyar ve diçû û jidil guhdar dikir. Ema, ji geşbûna rûyê çermek spîçelokiyê tenik dinixwimîne diyar dibû kû ew çend gotinên şkestî jî têra rihetkirina dilê wê yê şewitî dikirin.

Dibêjîqey dayîka çav westayî ji nişkan ve dabaş guhert û bi pê re dengê wê jî hatibû guhertin.

"Êdî wekî berê dilê min ne rihete Gabarê min. Ez, ditirsême! Ji her kesî, ji her tiştî ditirsême êdî! Piştî girtina Serok pir ditirsême" û kengê bêjeya 'Serok' ji nav lêhvên wê yên tenik û qepûşik girtîn rija, kela di qirika xwe de zeft nekir û girî. Hêstirên gir wekî şapeya heyva Gulanê ji çavên wê yên kûr û westayî dibûn lehî, li ser lamên gewr û lewaz dibûn şîp û di nav fitlên xavika tebixî de wunda dibûn.

Di rastiyê de dayîka xemdar ne mijar guhertibû. Jêdera xemdartiya çavên wê şildikirin, hinavên wê dişewitandin û tehfî wê tirsê dikir ew dabaşbû. Piştî xaziya xwe daqurtand, tevlî girî vegotina xemên xwe ajot.

"Zen neke baweriya min şkestiye kurê min. Na, qetiyen! Ev dunya bi qulibe aliyek din ez dest ji xwîna Qelenderê xwe bernadim. Lê delalê min, Serok ji bû me her tiştbû, her tişt. Hîvîbû, bawerîbû, hêzbû, wêrînbû, ronahîbû, nan, av û hewabû. Xwedê mala zalim û xayînan xira bike Gabarê min. Serok, em sêwî û bê kes hiştin û çû!"

Kelegiriya di qirika yadê Asya de asê mayî, nefesa wê qut kiribû. Bibû hêstir û wekî avzêmên biharê bi çavên wê re teqabûn. Bi awayek dil pêşewitî destê xwe baskî cihê komîsyonê ve kir û got;

"Ev rebenên, me li hember van zalim û xayînan biparêzin! Giriyê min ne ji ariye Gabarê min, ne ji arî ye."

Dengê li hev ketina destên Kemal, sohbeta Yadê Asya ya Şaxî û Gabarê Gabarî qedandibû. Ew, 'nîşana navbera dirêj ajotî xilas û herkes herin di hundir de' bû.

Yadê Asya, bi awayek bêhnveşirî pozê xwe kişand, bi tîka xavika xweya reng guhertî hêstirên çavên xwe paqaijkirin û wekî bibêje; "gotin di navbera me de" awrek watedar avêt çavên hemrazê xwe û bi hev re ketin di hundirê dibistanê de.

Bêkû li avana xwe ya di nav xem û xeyalên de digevize binêre, jina perwerdevan xwe kêmekî bi kaxezên li ser mêze mijûlkirin. Di

nav qermîçokên kûr yên dora çavên wê yên hûr de wirarên kelecanê ne dixwiyan. Serê xwe rakir û got;

"Hevalno, me bi hev re guhdarî gotûbêj, rexne û rexnedayînên hevalên kongreyê kirin. Niha mafê axaftinê yê we ye. Ema hevalno, hûn dixwazin wekû rexne jî bipejirînin; tevlîbûyina gotûbêjê ya avana me pir lewaze. Em dixwazin, hûn hemî rabin û nêrînên xwe bûnin ziman. Wextê me pire, ji dirêjkirina perwerdê ne tirsêne û kerem bikin."

Bê dengiyek kûr hundirê dibistana kursiyên wê ji qetên darên spîndar û tertên axê ji binê wê radibin dagirtibû. Avana bi awrên mijdar li dêmê Rojda turk dinêrîn, xilmaş dixwiya. Dema çavên mamostaya perwerdê di şemitin ser wan, awrên xwe direvandin û li qemçika yên li pêşya xwe dimeyzandin. Piştî qederekî li quncikê paş destek qermiçî bi awayek fihêtokî rabû jor. Eşqa wê bêhnê ya komîsyona turk hêjayî dîtinêbû û di cêh de keremek ji kesê dest hildayî re pêşkêşkir. Şaşikek melkebî serê hinge maziyekî yê zelamê qam qut û tenik dinixwimand. Cilên şoreşgerî jî têra veşartina eybên bejna wî ya perixî ne dikirin. Zelamê sîs û çermek kelpitî gurmikên rûyê wî dinixwimîne bi devoka goyîkî got;

"Haval nuhöge, baweriya me bi partiya me bê dawiye. Her çendö Serökê me ne hazir jî be, divê em tifaqa xwe xira nekin. Heke ez tevlî perwerdê nebim, nobedar di nobeta xwe de binive, komîte ferq û cudatiyê bike, rêvebertî her roj here mala cîranê min û slavekî li min nede, dukandar bi keyfa xwe bikevin, pîrek li ser avê şerê hev bikin tifaq di nav me de namîne. Tişta ez bînim ezman eve" û rûnişt.

Piştî Methiyê Repinî, Bêrîvana Avyanî rabû. Jina navser, kirasek Bohtanî bejna wê ya girover dinixwimîne û ji welatparêziya xwe razî bi hevoka; "Ez tevlî hevalê Methî dibim" dest bi axaftinê kir.

"Heval, wekû mînak, mala Seyniyê Aloşî cîranê me ne. Wekî tê zanîn, bav ker û yêxtiyare û sê zelamên seqet û li ser piştê di mal de ne."

Jina navser û Stiya Stêr ti zarok jiwê re ne bexşandîn, fitlek din jî li xavika xwe ya spî da û bi awayek kelegirî axaftina xwe ajot.

"Kezep, ez nemînin! Tinê xwêka wan Feyziya li ser linga ye û barê wan seqetan hemiya daye pişta xwe. Ji bêbextiya navdewletî ve, ne ji rêveberîtiyê û ne jî ji komîteyan tu kesî serê xwe ne êxistiye di mala wan de. Heke em li seqet, nekar û feqîrên xwe ne nêrin, emê çawa hêst û hîsê hevretiyê ava bikin?"

Sebriyê Şehrîkî, ji destpêka perwerdeya wê rojê ve diponijî û ji aliyê kesê li tenişta xwe ve dihat hişyarkirin û dubare di nav mitaleyên xwe de bi xew ve diçû. Sebriyê dirêjê bi dengê Bêrîvanê hatî ser hişê xwe, destê xwe hilda û rabû jipiya. Zelamê bi ser navsertiyê re kêmek yêxtiyar, gir û dirêj yêk du caran koxî û vesekinî.

Kêmekî li girşê haxta serê wî lê bikeve nêrî û bi dengek aciz dest bi axaftinê kir;

“Eve sê mehe min ji rêvebertiya wargehê re raporek nivîsandî û heta niha jî bersiva rapora min nedane. Heke ev rêvebertî kêrî hilgirtina vî barî nayê bila ji rêxistinê re eşkere bibêje.”

Rojda, axaftina Sebrî birî û ket di navberê de;

“Dabaşa me ne eve heval” got û xwest mijara perwerdeyê belav nebe.

Bav û birayê sê şehîdan Sebriyê dirêj, wekî berteka xwe li hember turkiya jina komîsyon bide nîşandan, bi dengek erzşkên bersiva wê da û rûnişt.

Wekî gelik rêvanên wî karwanî çîrokek jandar ema bişeref ya Sebriyê dirêj jî hebû. Xwenasî û têkildartiya wî ya bi siyasetê re xwe dipesarta salên ji berya derketina PKK’ê. Piştî nav û dengê Tevgera Rizgariya Gelê Kurdistan li cihê Bohta belav dibe, Sebrî jî dibe aligêrek dijwar û jidil yê wê Tevgerê. Piştî şerê çekdarî du salan, birayê wî (Zekî) jî di nav de refek ciwan ji gund rêxistin dike û tevlî şervanên azadiyê dike.

Di bihara sala not û yêkê de, di encama gilehê xayînan de Beho Axa (Bahatîn Aktug) bi çete û romiyên turkan ve di sêkûzeya gundê Sebrî (Şehrika), Şkeftêspî û Dilopkê de  dora refa Zekî bose dikin û bi pênc hevalên wî ve şehît têxin. Di nav refa şehît êxistîn de kesê fer yê ji herêma Harûna Zekî bû. Ji bû zêdetir êşê bi dê û bav û malbata Zekî bidin kişandin, çeteyên Beho Axa, gapikekî têxin stûyê Zekî, dixirînin û tavêjin derê mala Sebrî. Sebrî, di bin wê êş û îzayê giran de dişewişê ema, nakeve. Ji bû çeka mamê xwe rakin, kur û keçek ya xwe amede dike û berê wan dide nav Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan.

Hê nû du salên şervanên wî qedabûn. Romiyên dewleta turk bi pêşmergeyên mala Berzanî ve êrîşê PKK’ê kiribûn. Peyîza hezar û nehsed û not û du yê li Heftanîn, her du zarokên wî li ser hev şehît ketibûn. Êdî dor gihatbû bav. Xebera şehadeta çavreş û kezîzera wî ji dûr hatibû û pêwîstbû çeka wan li erdê nemîne. Ji bû çeka zarokên wî li erdê nemîne ew bixwe jî tevlî refên şervanên Kurdistanê bibû. Di wê navberê de çeteyên Beho Axa û romiyên dagirker jî vale ne sekinibûn. Her roj tavêtin ser mala wî, hevjîn û zarokên wî yên mayîn di îşkencexaneyên Basa re derbaz dikirin. Di dawiya dawî de, mala wan dişewitînin û derbederê bajarên xelkê dikin.

Dem diçû dewran dizivirî. Baregihên dagirker, yên li qadên çiyan li hember êrîşên şervanan êdî nikarîn li berxwe bidin û direvîn. Qismek mezin ji herêmên çiyayî rizgar bibûn. Girêdayî wê çiyayê Gabar jî êdî azadbû. Malbata Sebrî ya mizgîniya xêrê zû girtî, berê xwe dabû Gabar û li gundê Xwirsê bicêh bibû. Di heman demê

de Sebriyê Yêxtiyar jî gêrîlayek yê herêma Gabar bû. Piştî hevjîna wî bi komek zarokên hûr ve li Xwirsê bicêh dibe, rêvebertiya rêxistinê pêşniyara; 'di nav zarokên xwe de têkoşîna li paş eniyê bimeşîne' ji Sebrî re dike. Sebrî, pêşniyara rêxistinê dipejirîne û êdî têkoşîna xwe wekû milîs didomîne.

Hê di qadên azad de salek ya malbatê ne qedabû. Artêşa dagirker tevgerek mezin dabû destpêkirin û dubare Gabar dagir kiribû. Sebrî dubare tevlî gêrîla bibû û malbat di destên romiyê roma reş de dîl mabû. Piştî ezab û îzayek mezin, qismek zarokên wî berdabûn û hevjîn û keçek pelweste bi xwe re girtibûn. Cewahir (hevjîna Sebrî), bi keça xwe ya gihatî ve şeş mehan di nav romiyan de li girek yê çiyayê Gabar dîl girtibûn.

Êdî Sebriyê yêxtiyar ji derb ketibû û bi wî re êşa dil jî rûdabû. Di şertên gêrîla de zehmetiyên mezin dikişandin û nikarî zêde bi rê ve here. Li ser wê rewşê, rêvebertiya Rêxistinê biryar digre û Sebrî rê dikin Eyaleta Etrûş. Ji hingê ve Sebrî wekû "zigurt" di nav milîsên Gabar de têkoşîna xwe didomand.

***

Zivistanek zuwa havînek dijwar li dûv xwe hiştibû. Jixwe li warê Qereçox sal du demsalbûn. Havînê bihar û peyîz dadibeland û li quncikek yê salê Zivistanek zuwa û tamsar diperpitî. Yên çûyîn çûbûn û yên mayîn di nav toz û germahiya dojehî ya Mexmûr de, di nav xwêhdana xwe de digevizîn. Ji bêbextiya navdewletî ve ji bilî sê dibistanên seretayî ya saziya Qendîla DY dida çêkirin û nû banê wan girtîn, guhertinek mucid di pêkerê wargehê de nehatibû pêkanîn. Tevzandina bi bêbextiya mezin re laş qerisandîn, jiyan şeht kiribû û destê tu kesî li avakirina jiyanek nû ne digera.

Ciwanên herî xweşik tevlî gêrîla bibûn. Hema bibêje nifşek çûbû û li dûv xwe di dilê dê û bavan de valetiyek jandar hiştibû. Li aliyê din, ji hemî qismê civakê ji çaryêkê zêdetir mirov berbi çiyan ve çûbûn û hê jî herikîna ber bi çiyan ve bi hemî germahiya xwe didomand. Hema bibêje ji her malbatê yêk du kes çûbûn û vê jî bandorek mezin li ser tevgera wargehê kiribû. Kurdan, biberxwdanek bi wezbet û ya xwînkarên cîhana şaristan şahidîtî ji hemsalê wê re nekirîn bizmarên pergala Kapîtalîst leqandibûn. Bi wan bi paş ve gav dabûn avêtin û Serokê xwe ji sêdarê rizgar kiribûn. Ema ji hejandina di berberên xwe de dayîn çêkirin pir mezintir, wan jî xwîn wundakiribû. Rêberê wan êdî di destê dijminên dagirker de dîlbû û wî fêrsê kelaşa yê bê Rêber çawa rê bigirta, ne dihat zanîn.

Roja dawiya hefteya yêkemîn ya piştî cejna Vejînêbû. Piştî girtina Serok cejna yêkemîn, ji hemî cejin û pîrozbahiyên çax û

zemanan biheybetir hatibû pîrozkirin. Kifşeyên ji gêwilê pîrozbahiya cejnê mayîn, hê jî li ser dêmên hemwelatiyên wargehê zindîtiya xwe diparast. Seferbertiya perwerdeya xwendin û têgihiştina nameyên Serokatiyê, hemî rojeva wargehê guhertîbû. Li rex perwerdeya her sazî di bin banê xwe de dimeşîne, dewreyên giştî jî li darbûn.

Perwerdevanên nû ji dibistana perwerdê ya semta yêk derketîn navbera nîvro, bigavên lez di nav wargehê de belav dibûn. Yê malên wan nêzîk şansdarbûn û xwêhdan bi bin çengên yên semtên sê û çar re diherikî. Hê perwerdevanên semta çar nû negihatîbûn malên xwe. Destpêkê teqînek dijwar û bi pişt wê re jî dûyek reşê mezin ji binya goristana Mexmûr bilind bibû. Teqîn ewqas dijwarbû, şerîtên xîbetên semta yêk hejandibûn. Bi dengê teqînê re jin û mêr, herkesî pêlava xwe dabû ser lingên xwe û ber bi bajarê Mexmûr ve dibezîn.

Leşkerên Êraqê û pêşiya hemwelatiyên wargehê bi hev re gihatibûn cihê teqînê. Teqîn, li ser kererebeyekî pêkhatibû. Bombeya teqayî heywanê erebê dikişand kuştibû û erebeya ji parçeyên tenekeyên zincar pêkdihat perixandibû. Du ciwanên temenê wan li derdora pazdehê li tenişta rê di nav xwînê de digevizîn. Yêk ji ciwanên birîndar ji hiş çûbû û vexwimabû û yê din bê navber lave dikirin û digiriya.

Leşkerek bipaye yê Êraqê, lûleya çeka xwe êxist serê ciwanê di nav xwînê de mayî û tirsek şermdar awrên wî nixwimadîn û bi erebû got;

“Zû bêje, we yê çi ji vê bombayê kiribûya û hûn endamên kûjan rêxistinê ne?”

Ciwanê wekî şirikê xwîn ji ser û pir cihên wî diherike, piştikî bi erdê re dirêjkirî her du destên xwe dan ber xwe û bilave got;

“Ez dexîlê teme min nekuje Seydî. Em ne endamên tu hizbane, em Mexmûrîne. Mesûlê Mexmûr yê Partiyê (PDK) du hezar dînarê esîl dan me û xwest, em vê bombayê bibin li derê mejlîsa wargehê biteqînin. Û hê ciwanê pêxas, bûcîrmeyek navran qetayî li ber axaftina xwe timam nekirî, leşker pehînek li tenişta wî da. Bombevanê ji tenişta xwe derbek dijwar xwarî di ser hev de bû qumş û qulibî ser teniştê. Leşkeran, keleşên her du bombevanên ciwan avêtin di paşiya tirimpêlek leşkerî de û ber bi bajarê Mexmûr ve revandin.

Gotûbêja; “Pêwîste lêpirsîna kesên bombevanan me kiribûya” di navbera şêniyên wargehê û leşkerên Sedam de vegerabû devjeniyek dijwar. Bûyer ji derveyî sînorên wargehê û li ber tenişta baregaha leşkerî ya Êraqê rûdabû û ev bibû sebeb, hemwelatiyên wargehê devjeniyê ne vegerînin şerek sing bising. Piştî kelaşên bombevanan ji destên wan felitîn, hemwelatiyên wargehê bela wela

û bê rêkûpêk berê xwe dan warê xwe. Li hindama bîra aşê Qesranê û êdî kifşeyên binyata wê jî nemayîn Hesenê Kinyanişî ji Mele Heyderê Amadî re got;

"Seyda, dewleta Turk nahêle mala Berzanî belaya xwe ji me vekin."

Seydayê şirikên xwêhdanê di nav çavan de dihatin xar, xîzxîz bi ser gewriyê ketî vesekinî û bi beşişandinek tevzdar li Hesen nêrî. Hesenê wate nedayî beşişandina Seyda ya razdar, pê destmalê xwêhdana eniya xwe paqijkir û pirskir;

"Qey min tiştek şaş got hevalê Seyda?"

Zelamê pora wî ya wekî şebê di nav toz û xwêhdana Mexmûr de gevoz dixwiyê, vêca bi deng kenî û got;

"Belê!"

Ciwanê tenik beden û tu birewêjî bistikek goşt li ser tine bi awrên mereqdar û kêmekî jî şaş mayî pirskir;

"Çi?"

Yêxtiyarê bê malbat wekû zigurt tevlî wî karwanî bûyî, devzendik û devdelingên cilê wî yên Bohtanî qusayîn bê kû li hemsohbetê xwe binêre bersiv da û got;

"Ne tu tenê, em kurd hemî vê şaştiyê dikin. Di zena me de mala Berzanî Kurdin, girêdayî vê PDK jî partiyek ya Kurdaye. Lê, dijminên Kurdistanê ji hin lewaztiyên wan sûd digrin û wan bikartînin" û li Hesen nêrî û wekî rastiya nêrîna anî ziman tekez bike pirsakir;

"Ma, ne wusaye hevalê Hesen?"

"Belê Seyda, herî kêm ez wusa difikirim."

Wekî dilê wî bişewite, eniya bixwêhdan ya di bin tava dojehî de di teyîse qermiçand û dewamkir Seydayê zandar;

"Ne tu tenê, rewşenbîr û şîrovevanên me jî wusa difikirin. Ji ber kû zorhêzên xwe ji me re kirîn quble, wusa dixwazin. Em jî bê lêpirsîn gotinên wan wekî qewlên xwidayî qebûl dikin."

"Ya rast û were lêpirsînkirin çiye Seyda?"

"Ya rast, mala Berzanî dewleta turk bikartînin. Ne tenê dewleta Turk, li hember têkoşîna azadiya Kurdistanê hemî zorhêz û dagirkeran bikartînin. Ji berkû sebebê heyîna wan, rayên jiyana wan eve. Qey ji berya niha sê salan li dijî Yêkîtiya Niştimanperwerên Kurdistanê dewleta Êraqê bikar ne anîn û bi tangên dewleta Sedam di kelha Hewlêr de li ser kelaşên pêşmergeyan gerê nekirin?"

Wekî Hesen bixwaze nêrîna Seyda tekez bike pirskir;

"Dibêjin, tiliya wan di girtina Serok de jî heye?"

"Belê, ew xefka zemanê tarîne. Dawî du sed sale, yê ev xefk dîtî û ne ketiyê Serok Apo bû. Kîn û dijminatiya wan ji vêdê tê."

Li derê mala Sedîqê ziravikî, Sînanê Sohr gihat wan û

sohbeta Hesen destpêkirî û Mele Heyder tajot birîbû. Piştî xweş başê rêvebirê ji xwêhdanê şil bûyî, ji Hesen pirsa; "perwerdeya we çawa diçe" kir.

"Pir başe Heval."

"Tevlîbûn çawaye?"

"Ew jî ne xirabe ema, vê meseleya dewletê mejiyê me li bin guhê hev êxistiye."

Rêvebirê rû zîwan merema Hesen fêhmkiribû ema, wekî bixwaze tekez bike pirsa; "çima" kir.

Hesen, wekî nirxek yê xweyê pîroz ji dest dabe, dengê xwe lerizand û got;

"Bê dewletî malxirabûne hevalê Sînan."

Şoreşgerê rûyê wî yê zerîn di bin tava Mexmûr de kelpitî, bi beşişandinek yardar li rûyê esmer û dirêj yê Hesen nêrî û bi dengek tinazdar got;

"Qey dewleta we hebû, me xirakir?"

Mele Heyder, bi tinaza Sînanê sohr zik û pişt kenî û li Hesen zivirî û bidengek dilniya ema bihenekî  got;

"Hevalê Hesen, çend kirasên kurdî li mala Berzanî kiribin, ewqas kirasên qenciyê jî li dewletê hatine kirin. Ema rastiya di bin wan kirasên xweşik de pir cudaye."

***

Çileyê havînê perên xwe ber bi dawî ve dikutan. Erdheja girtina Serok hemî zehmetiyên jiyanê di bin xwe de hiştibûn û ferqa di navbera xweşî û nexweşiyan de ji holê rakiribû. Hîvî û xeyalên par govenda azadiyê dikirin, êdî mijdar dixweyan. Ji ber wê hatin û çûyîna demsalan, xweşî û zehmîtiyên bi xwe re tanîn tiştek îfade ne dikirin. Li cihê mirin li dar be, kesî dikara tayê ne dikir.

Zûsibehek ya dawiya meha Tebaxê bû. Li warê Qereçox mirov ji berya hilatina rojê hişyar dibûn û keft û lepta jiyanê ji zû ve destpêkiribû. Koçberên ji Ereban re silkên sohr hildikin, ji zû ve ji wargehê veqetabûn. Kit û mitên xweyî pez û yên bazarvantiya heywanan dikirin ber bi meydana pez ve diteyîzîn. Ji bilî bazarvan û dukandaran,  kesên ji bû pêwîstiyên xwe yên rojane berê wan li bazara Mexmûr, di nav zeviya ji bê baranî beyar mayî li dûv hev bibûn rêz. Bazarvan, di nav boşahiya meydanê de wunda dibûn û yên din jî ber bi bajar ve dibûrîn. Qerebalixa bikir û firotavanan, dengê delal û mêh û bizinan tevlîhev dibûn û wê sibha zû di qontara Qereçox de vedida.

Her yêkî ji aliyekî ve, du kesan destê Sedamê Ereb yê delalê meydanê û Osmanê Hedadê repînî bi hev ve hişk şidandibûn û buhayê

beranê qemer dibirîn. Sedamê biqasî qormê çinarek sed sale, egala wî xwehr û digdaşeyek xirarî kelaxê wî yê stûr dinixwimîne; beranê qemer bi heftî û pênc hezar dînarên Sixte firot Osman. Osmanê cilên Bohtanî bejna wî ya qor dabelandî, beranê nû kirî bi xerboqên wekî dapên kewan di nav meydanê de hatîn reşandin ve girê da û ji bû qismetek din veqata.

Hê nû Osman ji cem delalê meydanê veqetabû, Mehsinê mala Zade wekû rasthatî liqayî beranê qemer hat û pirsa buhayê wî kir. Delal, bi keyfxweşiyek minafiqî dest bi bazara beranê ji berya kêmekî firotî Osman kir. Yêk kêm, du zêde delal heman beran firot Meshin bi heştî hezarî. Hê nû Mehsin du şedeyên bîst û pênc hezarî raberî Sedamê Ereb kiribûn, Osman li ber wan sekinî û pirskir;

"Li ser xêrê be hevalê Mehsin, te çi kirî?"

Mehsin beranê qemerê Osman girêdayî nîşakir û got;

"Tu saxbû hevalê Osman, min ev beranê he kirî!"

Hê gotin ji devê Mehsin xilas ne bûyî Osmanê hûr hilciniqî û ji acizî beşişî! Dilopên xwêhdanê di eniya wî ya qemitî re dan der û çav lê sohrbûn! Bidengek şaqis û bi devoka goyîkî got;

"Te ku go, te ku go!? Kuro, ew beranê mine. Ji berya deh deqîqeyan min ji vî dehbeyî kirî bi heftê û pênc hezaran" û li Sedam zivirî.

"Seyda ma tu yê heman beranî çend caran bifiroşî?"

Delalê bê pakî û pêncî hezarên Mehsin di kûrika cemikî ya digdaşeyê xwe de bicêh dike, bi destê xwe nîşana "diravên mayîn jî bide" li Mehsin kir û tehfek li Osman da. Mehsin, xwe êxist di navbera Sedam û Osman de û bidengek aram got;

"Seydayê Sedam, nabe tu heman beranî du caran bifiroşî. Beran yê Osmane, diravên min bide."

Sedam, zelamek ciwan, gir û bilindbû. Kurê axayek yê Şêxê êlek ya Erebabû û tu kesî ne wêrî biber siha wî re jî bibûre. Di meydana pez de, zeravê her kesî ji zelamê bitir diqeta û ji Sedamê mezin zulimdartirbû. Li heremê dewlet Sedam bû û rojê deh kes didan hingavtin. Ne tenê dihingavtin; tavêtin zîndanê û bi mehan di zîndanan de dihiştin. Sedamê piçûk, tiliya xwe ya wekî rotikekî li zelamên wargehê hejand û gefên kuştinê li wan dixwarin. Bi qelebalixa wan re, Cemîlê çemanî yê çend gotin erebî dizanî di wêdê re da der û ket di navbera wan de. Êdî vergervanek yê bikirên wargehê jî hebû û Cemîl ji Sedam re got;

"Ya tu dikî zulme. Em Apocî ne û kes nikare zulmê li me bike!"

Bi gotina Cemîl re Sedam kulmek li nav çavên wî yên kelpitî da û şer destpêkir! Ya star! Erebên li ser wê axê, di wê meydanê de ti mêr li ber pozên xwe nedîtîn egalên xwe hejandin û ji çar aliyan

ve êrîşkirin. Dûvikên sikeyan û egalên reş ji hewa ve digihatin hev û çîkên agir ji ber derbên wan dinirijin hev.

Muhemedê Xiyalê, mirovek navser, qamqut, perixî û şaşikek goyîkî serê wî yê keçel daqurtandibû. Bi bêhn tengiya xwe navdarbû û her tim cixareyek stûr di êxira devê wî de daleqayibû. Sikeyê kupalê wî ji hewa ve diheja û ji aliyê din yê meydanê bi kerb dibezî. Zelamê navrana şalê wî bi erdê re dixira xwe wundakiribû û xerboqên wekî dapan di meydanê de hatîn reşandin jibîrkiribûn. Li nêzîkê cihê şer, lingê wî ket xerboqekî û devikî bi erdê re dirêjbû. Di ber xwe de hin dijûn kirin, lingê xwe ji xerboqê derxist û dubare bezî. Hê du gav ne avêtibûn dubare bi erdê re dirêj bibû. Dema cara sêyemîn jî lingê wî ket xerboqê kir qêr û got;

“Kuro ev kusa ye? Werin min ji nav van dapan xilas bikin, hey Sedam hûhû li we kirî!”

Kurdên cilên Soranî li wan û di jiyana xwe de nebûyîn şahit, di wê meydanê de mêran li hember Sedam dest rakirî, meydan berdan û revîn. Erebên bidigdaşe û Kurdên cilên Bohtanî li wan, bi ber hev ve dirêj bibûn. Ji berya herkesî Sedam bi erdê ve hatibû pehnkirin. Gerkû hêjmara ereban pir zêde jî bû hev ne ragirtibûn û şkestibûn. Nû Memxûriyên xwe bi Serok û partiya xwe navdidin, erebên bitir û bê egal mayîn di deşta jêr de  tajotin. Muhemedê xiyalê yê şaşika xwe di nav dapan de wundakirî, biskên dor guhê wî liba dibûn, di ketina Mexmûr de kuçek li serê Sedam yê bê egal mayî da û dubare şkand.

Tam dema Muhemedê mala Zade, hewl dida hevalên xwe bi awayek lezgîn bi zivirîne wargehê û leşkerên Êraqê dor li wan giritin. Li ser gilehê Sedamê Delêl Muhemedê Zade, Cemîlê Çemanî û Mehsin hatin kelepçekirin. Dema leşkeran hewldidan girtiyan ber bi navenda şirteyan ya Mexmûr ve bibin, yên mayîn xwe ne razî kirin û xwestin; yan hevalên wan berdin, yan jî hemiyan bigirin. Û vêcarê devjenî, lekim û tehfdan di navbera bazarvanên wargehê û şirteyên Êraqê de destpê kiribû. Li ser nerazîbûna wargehiyan, leşkeran pêşî û derdora wan gulebarankir. Ema, hemiyan bi hev re singa xwe vekirin û xwe ji leşkeran ne vedan. Leşkeran nekarîn wan ji hev veqetînin û bi hev re birin navenda şirteyan. Her sê girtî bi cemaata Sedam ve tehf dan hundir û yên din jî li derê baregihê rawestan.

Girtî, li pêşiya mêzê lewitî, mêş li ser pişta wî dansa Îskoçî dikin rawestandibûn. Fermandarê navser, lêhv hişîn û di nav cilên xakî de li pişt mêzê xwe pehnkirî, bi awrên kîndar li wan dinêrî. Cemîlê Çemanî yê qamqut, çermê serê wiyê keçel di bin tava bişewt de kelpitî û qet jê bilindbûyîn; êlekek kevin û mezin di ser cilên Bohtanî de daketî, şûtikek nalyon navtenga wî ya zirav dewisandî,

pêlavek meqaba mezin, perçiqî xemla bejna wî timam dike li serê rêzê sekinîbû. Li rex wî Muhemedê yêxtiyarê şaşikek belek navguhan de tê xarê û li tenişta wî jî Mehsinê kêmekî birêkûpêktir ema, tenik û zeyîf disekinî. Li serê rêza ereban jî Sedamê serê mezin bê egal mayî, digdaşeyê spî di nav xwînê de belek bûyî û wekî dêwekî perişan radiwesta.

Fermandarê ereb, bi awrên tevzdar kêmekî li rêza gunehkar û birîndaran nêrî û bideng kenî. Ji nişkan ve kenî wî qut bû, awrên tûj ji yên wargehê vedan û bi kerb got;

"Hûn pir li serxwe çûne, we sînorê tehemûla me derbazkir. Hûn niha xwe çi dihesibûnîn" û bihêrs rabû serxwe.

Cemîlê, çend gotinên şkestî yên erebî dizane bi awayek qure got;

"Seydî, em Hizbil Omalin, em cimeta Ebdila Ocalan'in! Em zulmê qebûl nakin."

Hingî awaza wî derket fermandarê ereb kir qêr û got;

"Îskut" û vesekinî. Wekî nîşana xilasiyê bike, destên xwe li hev dan û bi hêlwestek tevzdar dewam kir;

"Evdila Ocalan çû, Hizbil Omal nema, xilas. Ezê niha we daleqînim û teslîmê wujdana Sedam bikim!"

Muhemed, ji Cemîl re got;

"Çi qar qara vî dehbeyiye mamo, çi dikara Serok dike?"

"Mamo dibêje; Serok çû, PKK qediya xilas."

Muhemed, di hemdê xwe de û bê fikar got;

"Mamo, ji vî meymûnî re bêje, xwelî li xwe û bavê xwe dike." Dengê xwe bilindkir, tiliya xwe li fermandar hejand û bi acizî dewamkir;

"Ji wî re bêje, heta yêk kurdê bixêret heye ne Serok diçe û ne jî PKK xilas dibe. Bêje Cemîl, heman peyvên min ji vî re bêje."

Cemîl, gotinên Mam Muhemedê Pîranî ji fermandarê ereb re wergerandin û lêkir;

"Seydî, tu dizanî me çima şer kiriye?"

"Çima?"

Destê xwe bibaskî zikê mezin yê Sedam ve kir, sebebê derketina şer bi çend gotina da serhev û lêkir;

"Evî zelamî dijûn kirin kesê em enîn vêdê. Başe, ez ji te dipirsim Seydî, kê em anîne vêdê?"

Wekî hilciniqe fermandar firî jipiya û bidengek pesindar bersiva; "Seyîd Reîs Sedam El Huseyn" da.

"Aha, vî zelam tilmeşk dijûn kirin Seyîd Reîs û me ji ber wê şer kir." Cemîlê, bi menawreyek şeytanî rêya felitandina xwe vekirî bi hêlwestek melaq ema aram pirskir;

"Qey dibe em qebûl bikin kû kes ji malîvanê me re dijûnan

bike?"

Fermandarê ereb, ji cêh kurveda Sedam û da ber zeleyan û kir qêr. Li rêza mirovên wargehê zivirî û bi hêlwestek minetdar got;

"Hûn herin. Ez dizanim ezê çi ji van seyên kurê sa bikim."

Cemîl û hevalên xwe, tif kirin binê lingên xwe û derketin ji der ve. Ji koma yên ji der ve sekinîn Muhemedê xiyal, bi awayek şaqis mayî got;

"Aaaa.. Kusa hûn berdan?"

Mamê Muhemed, bi dêmek beşişî çavkir û got;

"Dev ji wê berdin. Leza lingên xwe bikin û zû xwe bigihîn wargehê."

**Komara Demokratîk**

*"Di wateyek fireh de demokrasî, dikare wekû xwebirêvebirina komanên dewlet û desthilatdartî nasnekirîn were pênasekirin."*
*Rêber Apo*

Bi teybet ji destpêkirina mihacirtiyê ve komana Wargehê û bi giştî ji destpêka dîrokê ve komana Kurd, ti carî bi awayek dildar dewlet û desthilatdartî nasnekirîbû. Yan bê dewlet û serbixwe jiyan bibû û yan jî dema ew şansê xwe ji destdayî, bê dil û bi darê zorê dibin desthilatdartiya dewleta qewmek cuda de jiyana xwe ajotîbû. Gatiyên, wekû pêşiyên destpêkê yên Kurdan têne pejirandin û nivîskarên Sûmeran kuç li wan barandîn, ne ji aliyê mîrek an jî xwidamîrekî ve, ji aliyê konsêyek mirovên asayî ve hatîbûn birêvebirin. Girêdayî vê, di dîroka mîr û xwidêmîran de navê qralek yê Kurdan derneketibû pêş. Dîsa ji rêzê ve Hûrî, Mîtanî û yên din jî wekeza. Pêkhateya Kurdan ya herî navdar Medya jî ji konfederasyona eşîran pêkhatibû û ji aliyê mejlîsa ji wan eşîran pêkdihat ve hatibû birêvebirin. Li aliyê din, bi dehan mîrîtiyên di astên cuda de piştî zayînê şansê serbixwetiyê peydakirîn jî ti carî avakirina dewletekî bala wan nekişandibû. Gelê Kurd ji çandek gundîbû û wekî ji nexweşiyek vegira mirinvan bireve, ji dewlet û malzaroka dewletan ji bajaran dûr sekinîbû. Jixwe ji bû vê teybetiya wê, di demek dirêj yê dîrokê de wekû "Gundvan" hatibû binavkirin.

Gelo, pirsgirêka exlaq, zêhniyet û avana komanî ya Kurdan û sazûmaniya navê dewlet liwê hatî kirin çiye? Bi vegotinek din, çima ava çanda Kurdan û desthilatdartiya dewletê di coyekî de neherikiye? Gerkû qewmek herî kevin û hêzdar yê dîroka qedîme, çima dîrokê împeretortiyek navdar û girêdayî vê împeretorek Nemrût bi navê wan qeyd nekirî ye? Ev sêhra wan çima qet ne hatiye xirakirin? Çima Kurd, ji dewleta wekû sazûmaniya pîroz, sênc

û stara komên mirovan, xweyê bêkesan, taca zêrîn hatî pênasekirin; dûr sekinîne û wekû dijmin dîtine? Tenê ne jiwê dûr sekinîne, di heman demê de qedap lê barandine û jiwê revîne, çima? Raza vê pirisgirêka girift û vê nakokiya yeman çiye? Ev sazûmaniya mîna tofilên sîrê bi sedan qilifên pîroz hatî qilifkirin, çi ji kurdan standiye û çi li wan zêdekirî ye? Heke dewlet wekî ji aliyê dewletvanan ve hatî pênasekirin pîroz be; sazûmaniya ewlehî, parastin, rêxistin û hevgirtinê be, çima Kurdan evqas qedapdar dîtiye? Na, heke berevajî wateyên liwê hatîn barkirin be; kê evqas qilifên pîroz liwê kirine û çima ji bû veşartina rastiya wê evqas heyhedan hatiye lidarxistin?

Serîwanvanên aliyê komana kurd yê kûvî pêktanîn û ti caran di nav sînorên dewletekî de nehatîn kedîkirin, pênesaya *"demokrasî, xwebirêvebirina komanên deshilatdartiya dewletê nasnekirîne"* bê qisûr pêkanîbûn. Karwanvaniyên karwanê ji Bakur destpêkirî û piştî pênc salan li qontara Qereçox qeresabiyîn, ti carî desthilatdartiya dewletekî nasnekiribûn. Bi mehan birçî mabûn, bi dehan kezîzer û çavreşên dayîkan fedakiribûn ema, ne hiştibûn postala dewletvanekî warê wan bilewitîne. Ji bû jiyanek serbixwe derketibûn wê rêyê û tama azadiyek bê sînor, karîbû hemî tamên tehl û dijwar bidaqurtîne.

Qesir û oliyên wan tinebûn û di bin çadirên zincikî de jiyan dibûn. Sûk û bazarên wan ji çend dukanên çadir yên ji toza tîr reng guhertîn pêkdihatin. Amêrên wan yên gihadinê, kererebe û matorokên sê tekelbûn. Dewleta Turk mal û milkên wan desteser kiribûn û terş û talanê wan jî PDK'a mala Berzanî dizîbûn. Ne karek biwê bikaribin jiyana xwe dabîn bikin hebû û ne jî jêderek. Hêjmara wan biqasî gundek asayîbû û li qontara Qereçox, li warê mar û dûpiştkan hatibûn asêkirin. Ema rêxistîbûn, serbixwebûn û xwe bixwe rêvedibirin. Mejlîs, rêvebertî û hêza wan ya xweparastinê hebû. Bê îstîsna her hemwelatiyê wargehê endamê saziyekîbû û tu kesê bê sazî û rêxistin tinebû. Azadbûn û bi pergalek demokratîk dihatin rêvebirin. Ji saziya zarokan bigre heta bi ya yêxtiyaran, ji mejlîsa malbatên şehîdan bigre heta bi ya ciwanan herkes, her qismê civakê bisazî û mejlîsbûn. Wargeh malbetekbû û malbetek wargeh bixwebû. Zêhniyeta, 'yêk ji bû herkesî û herkes ji bû yêkî' bê qisûr serwerbû.

### Ji Aştiya Pesartî Azadiyê Binirxtir Tiştek Nîne

Wextê pisîkên peyîzê hatîbû û ji zû ve bûrîbû. Ema ne li warê Qereçox giyayê pisîkan çêbibû û ne jî di wextê xwe de pisîkên peyîzê liber bayê ketibûn. Sibeh zûbû û hemwelatiyên wargehê di

nav xaniyokên zincikî de diqijvijîn. Jixwe her kes ji berya hilatina rojê hişyar dibû û ji roja Zaxrosan re silav disekînî. Deravê vekirina dibistananbû û bixebatek bê navber mamosteyan ders amade dikirin. Ji bû fik kirina karê rojane, rêveber û komîteyên semtan biber navendên xwe ve diteyîzîn. Xebatkarên tenduristiyê ber bi nexweşxaneyê ve û her endam biber saziya xwe ve ji zû ve derketibû rê. Hema bibêje, her şêniyek yê wargehê endamê saziyekîbû û pir ji wan, du an jî sê saziyan de erkdarbûn. Piştî girtina Serok sist û leq jî şidabûn û bi wefadartiya girêdana bi Serokatiyê ve herkesî xwe dabû karê rêxistinî.

Di bin banê xwe de, avana her saziyê perwerde didît. Ji bilî perwerdeya teybet ya saziyan, dewreyên mezin û dirêj yên perwerdê li dûv hev dihatin lidarxistin. Serok, dîsa hêza şaşkirina dost û dijminan nîşakiribû û gavek berevajî fikrandina herkesî avêtibû. Dema hemî aliyan xwe ji bû cengek dijwar amade dikirin û biteybet Kurdan di hundirê xwe de agirê tolhildanê geş dikir; ewî şer sekinandibû û pêlên hîviya li hevhatinê belavkiribûn. Bi rêya parêzeran name li ser nameyan birêdikirin û di nameyên xwe de, ji bû xwe gihandina li hevhatinek demokratîk pêşniyar rêz dikirin. Ji bû xwe ji pêvajoya nû re amade bikin û daxwaz û pêşniyarên Serok rast fêhm bikin, gelê wargehê seferbertiya perwerdê dabû destpêkirin. Dawa kirasan û tîkên êlekên perwerdevanan wê sibha zû liba dibûn û ber bi dibistana perwerdê ve diherikîn. Hecerê Qulabî û Mehmûdê Kadûnî roj başek li Hacî Ehmedê Silopî dan û ber bi wî ve çûn. Hacî Ehmet, xirxalê dawî jî ji bîrê kişand, bizenda xwe xwêhdana eniya xwe paqijkir û got;

“Jixwe em jî li hêviya webûn. Ji kerema xwe alîkarî bikin, em hevalê Huseyn ji bîrê derxînin. Bila ew taştêya xwe  bixwe û em jî yê herin perwerdeya xwe.”

Mehmût, di jor de li bîrê nêrî. Zelamê di binê bîra biqasî hifdeh, hijdeh mitroyan çûyî de wekî pencekî dixwiya. Werîsê bêrdoş bi serî ve berdan di bîrê de û dema dengê “bikişînin” ji bîrê hat, Hacî Ehmet û Hecer xirxal zivirandin. Piştî kêmekî pora tenik û kurt ya bi serê biqasî maziyekî ve û şirikên xwêhdanê jê diherikin da der. Bîrkolê navdar Huseynê Xazî yê Hîlalî, derxistin ser devê çalê. Deziya zuwa li zelamê temendar nemabû. Zik û pişt bi hev ve mabûn û bihata rewajtin bistikek goşt li ser tinebû. Kedûnek av di cirnikên çavên wî yên ji xwêhdanê sohr bûyîn de bicêh dibû. Pişta wî qof û dibêjîqey ew bi mehanbû xwarin di gewriyê de ne çûyî xar. Di binê bîra teng de laşê wî qeyîmîbû û bi zorê gav tavêtin. Mehmût got;

“Mamê Huseyn, li vê semtê av di çend mitroyan de derdikeve?”

Yêxtiyarê dibêjîqey xwe li nav avê hilaniye û tona dengê wî

jî hatî guhertin, bidengek westayî bersiv da;

"Cêh dizane, di bîst û bîst û pênç mitroyan de av dixweyê."

"Vêca hûn mitroyên biçiqasî dikulin?"

Zelamê nîşanên jiyanê di bîbûkên wî de nemayîn eniya xwe qermiçand. Wekî şerm bike û gotinê ji hinan veşêre bersiv da;

"Bixwidê buhayek bê qîmete ema, îş nîne û herkes feqîre; du hezaran."

Perwerdevanan, bi mamê Huseynê pidûyên wî yên bê dinan mayîn nanê hişk bi zorê dicû û dimîne sohrkelaşokekî re çayek vexwarin û ber bi dibistana perwerdê ve derketin rê. Bi rê ve liqayî Melek û Hacera mijînî hatin û bi hev re çûn dibistana semta yêk.

Piştî avana perwerdê bi deriyê nivz û piçûk re ketin dibistana zincikî û xwirî kuç de, komîsyona du kesî jî dabû dûv wan. Bi ketina hundir ya komîsyonê re avan rabû jipiya û bi nîşana destê mamostayê nû rûniştin. Hê nû avana jin û mêr têkel rûniştibû, bi dengê zelamê porek hemiza reş serê wî yê girover dinixwimîne re dubare rabû jipiya. Piştî deqeyekî, mamostayê bejin navîn û ji sikan nayê hesibandin got;

"Bîranîna şehîdan ronahiya rêya meye" û dengê çepikek germ singa akedemiya kursiyên wê ji qetên darên spîndar pêktêne şarand.

Mamostayê li pişt mêzêye bi ala rengîn hatî nixwimandin, rêvebirê nû yê wargehêbû. Yarê koçberên wargehê, mirovê adil, sebrîn û behremend Sînanê Sohr çûbû û di şûna wî de ew mirovê esmer hatibû. Avan, biçavên 'hergîz nikare valetiya Sînan hiştî dagire' li rêvebirê nû dinêrî. Zelamê ji îfadeya ji awrên gomandar vedidan bê hay, jipiya sekinîbû. Çavên xwe yên reş û birhên hemiz xemla wî timam dikin biser avana peritî ema şidayî re şemitandin û got;

"Ez hevalê Xebat" û destê xwe bi baskî ciwanê li rex xwe ve kir û dewamkir;

"Jixwe hûn hevalê Egît nas dikin. Emê biqasî çil û pênc rojan bi hev re nameyên Serokatiyê bixwînin, gotûbêj bikin û vebêjin. Serokatî ji me re pir tiştên nû dibêje û em bixwe jî di têgihiştina pir beje û qewlan de zehmetiyan dikişînin. Ev, peletformek azade."

Rêvebirê qevdek simbêlên reş xemla rûyê wî yê esmer timam dike, bejin navîn û nû sêlm pesartî sêhê axa ji zikê dibistanê werayî ser mêzê bi destê xwe paqijkir û axaftina xwe ajot;

"Ji bû em bikaribin armanca peradîgmaya nû ya Serokatiya xwe baştir fêhm bikin, divê em nakokiyan di mejiyê xwe de ne hilînin û her xala li remana me taliqe vekirî bînin ziman. Heke hin pirsên asta fêhmkirina me derbaz dikin hebin, hevalên ji me baştir têgihiştî hene û emê hewara xwe bigihînin wan."

Mamostayê xîtapxweş ema, bernavên mê û nêr tevlîhev dike û daçek, lêkir û gihandek avêtîn rexekî û hevok di nav şkêra peyvên tazî de dinale axaftina xwe domand;

“Em demjimarên xwe yên perwerdê jî kifş bikin û derbazî perwerdeya xwe bibin.”

Piştî pêşniyarên li ser wextê perwerdeyê hatîn, ji dengdana avanê re hatin pêkêşkirin, pêşniyara; danê sibhê, heft û yazdeh û danê avêrî, yêk û pênc hat biryarkirin. Êdî her tişt timambû û perwerdeyê destpêkir. Egîdê Dîlanê, yê wekû wergervan hatî erkdarkirin destbi xwendina desteya kaxezên di destê xwe de kiribû. Wergervanê ciwan û ji aliyêk yê xwe şeht, xwe baş amadekiribû û name yêkser ji Turkî werdigerandin Kurdî. Di xala heştemîn ya di nameya di dîroka duyê Tebaxa 1999’ê de Serok digot;

*“Heke ji milê me û ji aliyê dewletê ve pêşketinên wusa pêşbikevin, êdî li Turkiye û bi Turkiye re wateyek ya têkoşîna çekdarî namîne. Heke pêvajoya demokratîk ewledar bajo û baweriya pêkanînên wê zêde bibe, êdî bersiva em bidin ya ne wusa bilindkirina pêvajoya şoreşa çekdarîbe, berevajî divê em xwe di rêya pergala demokratîk û çareseriya wê ya aştiyane de ji pêvajoya siyasî û yasayî re amade bikin.*

*Em bêjin, ev xeyal û hîviyeke. Ema, di her halî de ev ne tiştek xirabe. Heke ev nebe û her tişt hê xirabtir derbikeve, wê demê hûn azadin. Tu kes nikare we ji ceribandina her rê û rêbazê vegerîne. Ema pir vekiriye kû rewşa gel, ya we û heta ya cîhanê di astek mezin de girêdayî doza mine.”*

Di nameya dirêj û tijî bêje û têgihên nû de Serok, pêl peyvan dikir û didomand;

*“Yên şerên mezin kirîn, dizanin aştiya wê jî mezin bikin. Yên di aştiyê de qisûrê bikin, yê bikevin rewşa nikarin wateyê bidin şerê xwe jî. Di vê wateyê de aştî, çalekiyek ji şer jî bilindtir, bipêşvetir, exlaqî û siyasî ye. Heke bikûrahî pêk were, qesta min ya “em xwe pir baş ji berpirsiyartiya wê re amade bikin” eve. Heke pêşnekeve, jixwe xetek ya we ya hatî kifşkirin heye. Ema dîsa jî dixwazin kifş bikin; bi baweriya min, divê derfetek sînordar ya aştiyê bi serkeftinek girîng ya şer newe guhertin. Di zarokatiyê de jî xeta min evbû. Ji aştiya pesartî azadiyê binirxtir tiştek nîne.”*

Di dawiya nameya dirêj de bi sernavê “Ji Rayagiştî ya Turkiye û ya Cîhanê re:” beşek hatibû veqetandin.

*“Hola şer û dijwartiya li Turkiye, li pêşiya pêşketina mafên mirov û demokrasiyê astengiyan pêktîne. Dijwartiya bi giranî jêdera xwe ji pirsgirêka Kurd digre, di vêdê de rolek girîng dileyize. Wekû rêya çareya vê pirsgirêkê û ji bû vekirina vê girêkê, pêwîste dawî li*

*şer were.*

*Girêdayî vê, ji pêvajoya agirbesta yêk aliya PKK ji yêkê Êlûna 1998'ê ve hewl dide pêkbûne, ez bangdikim; ji yêkê Êlûna 1999'ê û pêve dawî li têkoşîna çekdarî bînin û ji bû aştiyê hêza xwe bikişînin ji derveyî sînor. Ez baweriya xwe ya di rêya çareseriya demokratîk de û pêşketina pêvajoya axaftin û li hevhatinek nû bi vî awayî kifş dikim.*

*Ji bû serkeftina vê pêvajoya aştî û biratiyê, ez bangdikim hemî payedarên dewlet û komanê yên têkildar; bihes tevbigerêne û bibin destek. Bi vê re, hukûmeta netew û yên navnetewî û saziyên wan; li ser binyatek erênî alîkarî bikin."*

Piştî wergervan dawî li xwendina nameya mijara gotinê anî, dor ji rêvebirê perwerdê re hişt û rûnişt. Perwerdekarê bikelecan dixwiyê, awrek avêt avana bêdeng rûniştî û bi awrên mijdar liwî dinêrin û got;

"Me bi hev re guhdarî nameya Serokatiyê kir. Niha mafê axaftin û nirxandinê yê hevala ye û kerem bikin."

Bi gotina perwerdekar re Îsmaîlê ji Başûrê Piçûk, mafê axaftinê girt û rabû ser xwe. Zelamê zer, enî rût û êdî ji navseran dihat hesibandin rabibû ser xwe ema, hê dest bi axaftinê nekirî rengê wî bi caran hatibû guhertin û dilerizî. Dibêjîqey gotin di qirikê de asê mabû û haxta bixeniqanda. Li ser eniya rût mayî, mohrikên xwêhdanê milê xwe dabûn hev û dirijan ser hewtikên kûr yên çavên wî dihewandin. Piştî bi caran qirika xwe paqijkir û di dawiyê de got;

"Eve bîst sale em ji bû avakirina Kurdistanek serbixwe, hevgirtî û sosyalîst şer dikin. Me partî û pêkhateyên doza otonomî û muxtartiyê dikirin, bi reformîstî tewambar dikirin. Niha ji muxtartiyê jî kêmtir, em doza demokratîk kirina komara Turkiye dikin. Ez di têgihiştina vê stretejiyê de zehmetiyan dikişînim û baş fêhm nakim" û xwêhdan bi serê pozê wî yê fîno ve bûyî şirik, wekî xwe ji latek bilind bavêje kemaxên xwe bi awayek hişk li darê gicir da û rûnişt Îsmaîl.

Bi nirxandina Îsmaîlê teknîkvan û gêrîlayek kohne yê PKK'ê re, di dibistana zincikî de erdhejek dijwar pêkhatibû. Cîhan ji eksena xwe derketibû û wekî aşê bayê dizirvirî. Wê zivrandina lezdar serî gêj kiribûn û dil qeliqandibûn. Hê Îsmaîl jipiya bidehan destên ji hêrsan dilerizin rabibûn ji hewa ve. Ji endamê fermandartiya hêza xweparastinê Rizaqê Çelî, mafê axatinê girt û rabû serxwe. Zelamê gir û bilind, keçek ya wî gêrîla û kurê wî jî piştî esareta Serokatiyê tevlî gêrîla bûyî, wekî bersiva Îsmaîl bide dest bi axaftinê kir;

"Heval, min ti dibistanan de hibir ne rijandiye, xwendin-nivîsandina min jî nîne û ez ne mirovek zaneme jî. Girêdayî vê, ez tiştên hatîn gotin û têne gotin jî baş ji hev naveqetînim. Ema, baweriyek ya min heye û baweriya min jî eve; Serok Apo, xwe ji me

re kir ronahî û em ji zilomata mirinê rizgarkirin. Em ji serkeratê rakirin jipiya ruh da me. Em bihîviya jiyanek azad tamijdandin û bi dev û ezman kirin. Xwe ji me re kir wêrîn û em bi nirx û armanckirin."

Rizaq vesekînî, awrek dijwar ji qemçika biqirêj ya Îsmaîl veda û bidengek têkelî kîn û hêstî axaftina xwe ajot;

"Şert çi dibin bila bibin, ew Kurdê hîviya namûs û şerefê ji xwe dike, çawa nikaribe gomanê ji mirovtiya xwe bike; divê wusa jî nikaribe gomanê ji rastiya Serokatiyê bike. Ew kurdê gomanê ji gotinek tenê ya Serokatiyê bike xafile, bê wujdane û bê îmane."

Li dûv Rizaqê Çelî, Hacî Şerîfê Gundikî mafê axaftinê girt. Zelamê yêxtiyar û bikupal birêve diçû, ji axaftvanê ji pêşya xwe pir dijwartir di ser Îsmaîl de çû û di dawiya axatina xwe ya dijwar de got;

"Bila tu kes zen neke kû bi çûyîna Serok re meydan vale maye. Ev ne rêxistina qelsemirov û bê baweraye. Her yêkî ji me bidehan zarok hene û em amadene di vê oxirê de dûtana xwe biqelînin."

Li gel mûdaxaleya komîsyonê jî ji jin û mêran, bi dehan kesan mafê axaftinê girtin û di heman rastekê de axaivîn. Jixwe Teybeta Hîlalî qadir hebû êrîş bike û Îsmaîl di nav dest û lepên xweyên gir de biperçiqîne.

Gelo Îsmaîl çi gotibû, an jî wan mirovên di oxira welatek azad de ji yêkî zêdetir zarokên xwe şehît dayîn çi ji wî fêhmkiribûn? Ya refleksên wan rakirîn pêdarê û pêt ji devê wan dibarand pirsa Îsmaîl bû an jî hîsên xeter yên dahatûyêbûn, ne dihatin zanîn. Ema ya tekez û li pêşçav Îsmaîlê teknîkvan, li rasta şehtkirinek mezin hatibû û perçiqibû.

Hacî Şerîfê Gundikî; ji berya şerê çekdarî çend mehan li Mêrgemara ya Besta çar ciwanên çekdar çîtên konê wî hingavtibûn. Zû bi wan ciwanên siyanetkar, mirovyar û nefs piçûk re hevnas bibû û hej wan kiribû. Bi teybet di nav ciwanên têr raz, sêhrdar û wêrek de kesek binavê Egît (Mehsûm Korkmaz) hebû û di dîtina destpêkê de xwîna wî kirijîbû wî ciwanê esmer, bejin navîn û çav bazih. Wan mêhvanên bi her tiştên xwe ji herkesî cuda, mergê Hacî Şerîf û malbata wî zû fetehkiribûn.

Bi şerê çekdarî re nav û dengên Hevalan li welatê Bohta belav bibû û li gel temendartiya xwe jî Hacî Şerîf, bibû yêk ji aligirê wan yê herî dilsoz. Êdî Hacî Şerîf, bi werîsan hatina biharê dikişand û bi hasreta dîtinan Hevalan derdiket banehî û zozanan. Hacî Şerîf, mirovek maldarbû û piranî dost û nasên wî yên kevin aligirtiya dewletê hilbijartibûn. Ji bû ew jî derbazî aliyê wan bibe, teklîfên mezin ji wî re pêşkêş kiribûn. Ema zelamê bi tîrê mirovyartiya Egîdan hatî hingavtin ti carî di welatparêztiya xwe de dudiltî nekiribû.

Zivistana hezar û nehsed û heştê û nehê kurê wî yê herî ezîz û di dahatûyê de ji bû rêvebertiya malbatê dihat hazirkirin Xalid, tevlî Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê bibû. Êdî Hacî şerîf ne alîgir, bavê Hevalan bû. Piştî çûyîna Xalid sê salan kurê Hacî Şerîf yê herî mêrxas, serdarê meydana şeran û yê bavê wî xwe di kuçik û civatên şer de bi wî navdida Xelîl; di şerek yê li himber artêşa romê de şehît ketibû. Piştî şehadeta Xelîl, xwişka wî Dêrsîm (Hacer Sanri) tevlî refên gêrîlayên Kurdistanê bibû. Êdî Hacî Şerîf PKK bixwebû û barê giran yê Kurdistana azad bibû piştiyek sewhdar û qulibîbû ser pişta.

Piştî çûyîna Hacerê salekî ew dizek, virek û qehbekên bi navê rizgariya Kurdistanê (PDK-KUK) li cihê Bohta xelk dişelandin, jin û keç direvandin pêşvantiya nûkertiya dewleta dagirker kiribûn. Li gundê Hacî şerîf li Gundikê Melê jî çetatiya turkan destpêkiribû. Êdî Hacî şerîf hatibû duryanek asê. Yan yê xweyî li xwîn, xwêhdan û armanca zarokên derbiketa û yan jî yê derbazî sefa dijber bibûya. Gerkû di wext û zemanê xwe de, bi sebebên cor bicor ew bi caran çûbû Başûrê Kurdistanê û wî bêbextiya PDK ya mala Berzanî baş naskiribû jî li ser daxwaza Hevalan neçar mabû berê xwe bide Başûr.

Êdî Hacî Şerîf, bi malbata xwe ve di welatê xwe de mihacirbû û rêvanek yê karwanê azadiya armanca zarokên xwebû.

**Hacî Şerîfê Gundikî** vedibêje;

"Malbata me maldar û têr pezbû. Em zivistanê li gund û bi biharê re derdiketin banehiyan. Wê salê me kuza Mêrgemar ya Xirbikê Bestê kude kiribû û em li wêdê mabûn. Şevek ya nîriya çileyê havînê bû. Seyên me reyîn û min ji zarokan re got;

"Ka binêrin, ev se diçin mirovan."

Zarokên li dûv reyîna sa çûyîn, bi çar xortên çekdar re zivirîbûn. Jixwe gundê me navenda PDK ya Êraqê, KUK û hizbên dinbû. Wan mirovên dilxwede binavê Kurdistana Serbixwe û azad çek rakirîn, pozê romiyek yê Romê jî xwîn nekiribûn. Ema bidarê zorê keçên xelkê direvandin, dest dirêjî namûsa gundiyên herêmê dikirin, dizî dikirin, rêvan dişelandin û me ji ber wan dabû qaqa reş. Ji ber wan serseriyên bê exlaq, em ji hemî hizb û tevgerên dilxwede bi navê Kurdistanê taxivin dûr disekinîn. Me mêhvanên wê şevê jî di çarçoveya wan kesan de nirxandibûn û min xwest malî xwe nêzîkê wan nekin.

Ema di dîtina destpê de min hîskiribû, mêhvanê wê şevê qet ne diman wan kesên heta himgê me dîtîn. Siyanetkartiya wan, rabûn û rûniştana wan, sekin û şemala wan xwe zû dabû der. Me dest bi sohbetêkir û her kû zeman bipêş ve çû sohbeta wan mêhvanên rakêş bêhtir li xweşa me çûbû. Jixwe xortek bejin navîn, kelam şîrîn û çav bazih di nav wan de bû; mirov qet û qet ji sohbeta wî têr ne dibû. Wan ciwanên wekû "Heval" xîtabî herkesî dikirin û xwe wekû Apocî-

PKK binav dikirin, heta sibehî li cem me man. Me hej wan kir û jixwe ew ji zû ve ji hejêkirina me re amadebûn. Wê şeva sêhrdar em ji bin ve guhertibûn. Cêh û zeman hatibe guhertin jî hevalên kevin çûbin û yên nû hatibin jî qet têkiliyên me ji wan mirovên spehî, wêrek û mirovyar qut nebibûn. Di wê navberê de Xalidê min tevlî Hevalan bibû û êdî qetek ya kezeba min jî di nav wan de bû. Xalid, ji bû min hîviya jiyanêbû, xerantiya dahatûyêbû. Di nav zarokên min de lawê herî wêrek, zîrek û jêhatîbû Xalid. Min ne dixwest ji min dûr bikeve. Ema ji berya herkesî ew çûbû û êdî ne aligir ez PKK bixwebûm.

Êdî em alîbûn. Dijminatî bê minetîbû. Ew kesên bi navê PDK-Ê – KUK û partiyên dinên dilxwede bi navê rizgarkirina Kurdistanê em dişeladin, çav berdidan nav û namûsa me hemî bibûn çeteyên turkan û dîsa heman karên xwe vê carê bi navê parastina dewleta dagirker dikirin. Êdî me nikarî em li gund debar bikin. Dewleta xwînxwar, cehşîtî dipesarta me. Yan me yê xiyanet li xwîn û xwêhdana zarokên xwe bikira, yan jî rêyek din ji xwe re peyda kiribûya. Em gihatbûn duryanek asê û divê me di navbera jiyanek bişeref û bê şereftiyê de rêyek hilbijarta.

Li ser pêşniyara Hevalan berê me ketibû Başûr. Wekû kes, çûyîna Başûr li min pir giran hatibû. Ji berya hingê bi sebebên cor bi cor ez bi caran çûbûm Başûr. Min PDK û mala Berzanî baş naskiribûn. Me kirî-firotin dikir. Carna me mal ji Bakur dibir Başûr û carnan jî berevajî. Me her seferê bi zêdahî bêş dida pêşmergeyên PDK'ê û carnan bidarê zorê dest datanîn ser malê me. Carekî tenê ji berkû şelandina wan qebûl nekirin ji gundiyên me; Hacî yê Yaqob û Ehmedê Gurgîn li ber çavên min kuştin. Di gundê me de du zelamên ewqas nestêleh tinebûn. Her yêkî komek zarok hebû û ji ber çar dînarên zêde nedabûn pêşmergeyan zarokên wan sîwî hiştibûn. Ema, êdî Heval hebûn û bibaweriya wan em derketin vê rêya dijwar.

Dewleta turk, not û duyê Xelîlê min kuştin. Hevjîna wî bi keçekî ve bê mêr û bav hiştin. Dêrsima mina ji bû rakirina heyfa birayê xwe derketî çiyan, not û heştê şehît êxistin. Aha Tîrmeha îsal, xebera şehdeta Xalidê min ji Gêra Berana ya Elkê hat. Piştî girtina Serok, neviyê min Xalidê Piçûk (Saleh Sanri) jî tevlî refên ARGK bû û em bi şehît û şervanên xwe serbilindin."

Zelamê sêlm pesartî heftiyê, riha yêk hefteyî qermîçokên rûyê wî yê şîrîn nixwimandîn û şaşikek Bohtanî serê wî pêçayî bi devzendka xwe çavên xwe yên şil paqijkirin. Mizek kûr li çixara xwe ya nû pêçayî da û bi dengek hêrsdar dewamkir;

"Ji wê şeva hevalê Egît deriyê konê min kutayî ve ez alîme û dûtana min jî biqelê ezê her alîbim. Kêyê kû di xeta Serokatiyê de û li ser şopa xwîn û xwêhdana zarokên min bimeşê ez alîgirê wanim. Şert çi dibin bila bibin, heta dawiya bê dawî eva wusa be."

Beyaniya rojek ya çarşemêbû. Ji salvegera bîst û duyemîn ya damezrandina PKK'ê re tam deh roj mabûn. Bayek hişk û zuwa wekî zuxwirên berbestan li rûyê xwendevanên li derê dibistana seretayî ya Şehît Saleh Kendal rêzgirtîn diket û mûyên bi rûyên wan ve dikirin sîx. Mamosta Xatûna qamqut û lêhvên kurt pidûyên gir na nixwimîne, li pêşiya xwendevanan di amedebaşiyê de rawestabû. Muhemet Nûrî, Denîz, Muhemedê Tahirê Hîlalî û mamostayên din li piş xwendevanan di rêzê de bê qelq sekinîbûn. Xwendevanên dereng mayîn, bi hêlwestek şermokî di nav rêza mamostayan re derbaz dibûn û rêz digirtin. Piştî hêşedarê rojê li demjimara xwe nêrî, bi dengek hişk û leşkerî fermana; "dest li ser mil" da. Zarokên xwendevan bi tevgerên yêkîneyek leşkerî destên xwe dirêjî ser milê hev kirin û vê tevgerê rêzên xwendevanan tekûztir kiribûn. Piştî fermana "amedebin, rawestin" bi dengek gur û bilind durişmeya "Bican, bixwîn em bi te re ne ey Serok" avêtin û ji rêzê ve ketin di refan de.

Dawa jinan û tîkên êlekên zilamên li akedemiya semta yêk perwede didîtîn û dewreya dirêj ajotî li ber qedandinê li ber bayê diketin û ber bi akedemiyê ve diherikîn. Xwendevan û perwerdevanên dereng mayîn, bilez bi ber hev re derbaz dibûn û ji bû li navguhê hev nekevin hewlek mucid dimezaxtin. Li hindama şarevaniyê tirimpêla Qadirê Geverî (Fetah Teymûr) ya xirbe û dûyê şemendeferekî li ser dikeve di nav perwerdevanan re bûrî. Zelamê li Mexmûr tevlî wî karwanî bûyî rêvan dibirin Misûl û bi wî awayî debara koma zarokên xwe yê hûr dikir. Şufêrê rûken û spehîmêr, rêvanên Mûsil kom dikirin û hêdî hêdî ber bi derbenda derketina wargehê vê tirimpêla xwe tajot. Li nêzîkê derbendê Tahirê Heletî jî girt, silavek germ li mirovên li ber ava germavê bilokên herî çêdikin da û ber bi Mûsil ve derket rê.

Dr. Jiyan, ji navenda Yêkîtiya Azadiya Jinên Kurdistan (YAJK) ê derket û bigavên lez berê xwe da navenda kevin ya hêza xweparastinê. Kelecana jina bejin navîn, rûgewr, por zer û pirtûkek stûr di bin milan de ji dûr ve jî kifş dibû. Jina li hevhatî, li derê navenda nivz û kulekên wê yên piçûk bi nalyonê hatîn girtin; roj başek germ li perwerdevanên kom bikom sekinîn da û deriyê nivz û teng re ket di mal de. Ew nêzîkê hefteyekîbû dewreya perwerdeya xweser û xwirî jin destpêkiribû. Ji dewreya xweser re bernameyek dewlemend hatibû amadekirin û wekû dewreyek du mehî hatibû fik kirin. Dabaşên dersên dewreyê wekû dîroka cîhan, Kurdistan û partiyê; rastiya Serokatiyê, îdeolojî û polîtîka, jin û civak û çand û huner hatibû dabeşkirin. Jixwe wekû dersek teybet her hefte nameya Serokatiyê dihat  xwendin. Ji bû her dersê mamostayek hatibû amadekirin û mamostaya dersa dîroka Kurdistanê Dr. Jiyan

bû. Dabaşa dersa rojê, di dîroka Kurdistanê de Împeretoriya Medya bû. Piştî mamostaya wekî navê xwe tijî jiyan, xîtab zelal û rûken bi awayek berfireh hemî aliyên Împeretortiya mijara gotinê vegot; derbazî pirsên avanêbû û got;

"Di derbarê mijara Împeretortiya Medya de pirs û nirxandinên hevalan, kerem bikin."

Rehîma Mijînî, ji aliyê paş yê dibistana nivz û çal mafê axaftinê girt û pirsa wateya bêjeya "Medya" kir.

Mamostaya dersê, mafê bersivdayînê ji avanê re hişt û xwest avan bersiva pirsa hatîkirin bide. Fedîlayê mafê axaftinê girt û bersiva pirsa gundiya xwe da.

"Biqasî ez dizanim û ya pir dîrokvan jî hemfikir, navê Medya ji "maden"ê tê û ev navlêkirinek Aşûriye" got û wekî keşfek nû kiribe bi awayek qure rûnişt.

Hemî tevlîvanên piştî Fadîle yê mafên axaftinê girtîn şîroveya wê destek kirin û wekû xwezayî herkes çaverêyî şîroveya mamostaya bi awayek baldar guhdar dike mabû.

Mamostaya wekî civayê nikare di cihê xwe de bisekine, enerjiya potensiyel di qalikê wê de bi cêh nabe û gotin di cêh de be guhên wê dilepitin, ji pişt mêzê ye bi ala rengîn nixwimandî rabû ser xwe û wekî her tim beşişî. Bi beşişandinê re rêze dinên wê yên wekî mircanan di nav lêhvên tenik re dan der û got;

"Wekû kes nikarim tevlî vê nêrînê bibim. Sebebê tevlî nebiyîna min û pesarteka nêrîna min eve; desthilatdarên şaristaniyeta navendî belge û zanînên me yên nivîskî ji holê rakirine. Ne tenê tinekirine, yên ji wan re pêwîst dizîne û bi navê xwe qeyd kirine. Girêdayî vê, peyv û bêjeyên aydê me jî dizîne û wekû rastiya dîrokî bi navê xwe li me vegerandine."

Wekî nebza avana xwe venêrîn bike Dr. Jiyan, çavên xwe li ser jinên di dibistana sar de xwe di ser hev de kirîn qumş gerandin û li ser Sebrê ya Heştanî sekinand. Awrên xwe pesartin çavên keça hûr, sîs û ji serma lêhvên wê hişîn bûyîn û xwe bi kelaşê gir yê Fatma Bilehî ve şidandî û bi yardartî kenî. Kenî ema, dibêjîqey di kûrahiya çavên wê yên genîmî de janek nependî mejiyê wê diguvaşt. Bi dengek hê mucidtir û wekî bixwire dewamkir.

"Em hemî hemfikrin kû gelê Kurdistanê wekû koman, civak, dîrok, çand û ziman yêk ji gelê herî qedîm yê Mezra Bohtane. Heke ev nêrîn rast be, wê demê çawa çêdibe heta bi navê "Kato"yê li navsera Bohtanê jî Yewnanî ye? Wekeza, navê Mezra Bohtan, nevê Bilîsê û ya ji hemiyan kilametir jî navê Kurd û Kurdistan! Yan nêrîna "Kurd, qewmek qedîm yê Mezra Bohtan"e şaşe, yan jî ev nav û bêjekirinên bajar, gund û çiyayên me yên xelkê bi navên xwe qeyd kirîn. Tuyê xwe qewmê herî qedîm yê mirovtiyê pênase bikî, zimanê

xwe kevintirîn zimanê mirovrtiyê bihesibûnî ema, navê gundê te jî yê bi zimanê xelkê be. Ev paradoksek kilamet û bi awayek lezdar hêjayî lêkolînê ye" got û vesekinî Mamostaya hingî bixwazî xîtabeta wê xweş û peyvan wekî mohrikên ristikekî bidarve bike gotin û hevokên hunandî ji nav lêhvên wê diherikin.

Jina zandar, heneseyek kûr kişand û wekî di mejiyê xwe de li tiştekî bigerê awrên wê di valetiya dibistana zincikî de noq bibûn. Piştî kêmekî wekî ya liwê digera peyda kiribe sivik hilciniqî û kelecana peydakirina ya liwê digera dêmê wê yê gewr û girover pêçabû. Bideng û xitabetek hê rakêştir şîroveya xwe ajot.

"Biya min, ya rast û delîldar jî eve; madem xelkê belge û zanînên me yên nivîskî talankirine û dizîne, pêwîste pesarteka me etîmolojî û fîlolojî be. Ankû bi zanista kok û binyat, bi rêya ziman lêkolînkirina çanda komanê be.

Mînak; bi sed salan bêjekirina navê Bilîs'ê, Bitlîs'ê, yan jî Bedlîs'ê wekû navê fermandarek yê Îskenderê Mekedonyayî me di pirtûkên dîrokê de xwend û ne tenê xwend; me bawer jî kir. Ema, yên bajarê Bilîsê dîtîn baş dizanin, cihê bajar hemî lat û zinarên bilindin û bi wan tehtan ve niha jî tijî lîsên teyr û firindyan hene. Lîs, mala firindeyane û di Kurdî de daçeka "bi" hêmaya xwebûnê ye. Ankû hêmaya "bi" û "bê" dijberê hevin. "bi" heyînê û "bê" neyînê nîşan dike. Wate, bi-lîs, ankû lîsdar - cihê lîs lê heyîn.

Li aliyê din bêjeya "kato". Hûn Bohtîne û giyayê "ket" xweş nas dikin. Giyayê ji bû heywana herî sûdar ket'e. Heta, dema pezê yêkê pir zexim be, tê gotin, "ma ket xwariye". Û çiyayê Kato warê herî dewlemend yê vî giyayî ye û navê xwe jî ji vêdê girtiye.

Em werin ser pirsa xwe ya navê "Medya". Di zimanê Kurdî de silsileyek bêjeyên pîroztî li wan hatîn barkirin û bi hevgirtina peyva "da-dan" hatîn timamkirin hene. Wekî tê zanîn, em Kurd ji Allah re dibêjin "Xwe-da".Kurdên Êzdî, vê pênaseyê şînbertir û kitir dikin û navê "Ez-da" lê dikin. Bi dîtina min, bêjekirina navê Medya jî endamê vê birepeyvê ye û "Me-da" ye. Bi demê re wekû "Medya" hatiye bilêhvkirin.

Mamosta Dr. Jiyana, di dawiya şîroveya xwe ya fîloloîk de bi şermokî beşişî û şîroveya xwe ajot;

"Ez ne zimanzanim ema biya min, peyva "da" tûrhek ya peyva pîroz "za" ye. Girêdayî vê, bêjeya "xwe-za, mîr-za, şehri-za, xwêh-za" û wekî din pir bêjeyên din jî aydê vê birepeyvêne.

***

Êvara dereng ya heman rojêbû. Baranek xwinavî hûr dibarî. Dexîlaya Şirnexî û keça xwe ya zarok, bilokên pelehişkî bûyîn

datanîn ser hev û bi nalyonek peritî dinixwimandin. Xwendevanên nû dersa wan qedayî û perwerdevanên ji akademiyan derketîn di zikakên xaniyên zincikî de tevlîhev bibûn û dîmenek bitevger li wargehê barkiribûn. Tirimpêla biyanî ya nû ketî di nav wargehê de, di bin awrên hemwelatiyan de hêdî hêdî ber bi semta yêk ve bipêş diket. Tahirê goyî, di pêşiya tirimpêla peritî de, li rex ajotvan rûniştibû û bi awrên xemdar li hemwelatiyên wargeha xwe dinêrî. Tirimpêla dabaşa gotinê li derê mizgevta Emerê Batûyî ya ji yêk mezela ax pêkdihat rawesta û tabûtek mezin jê peyakirin.

Mala Qadirê Geverî, li beramber mizgevtê li rex firna semta du bû. Bavê heft zarokên hûr di rêya Mûsil de hatibû kuştin û di tabûta nû ji tirimpêlê peyakirîn de kelaşê wî diraza. Piştî kêmekî dengê qêr û giriyek bişewt ji mala sêwî mayî xwirimîbû. Ya star! Dengê giriyê Zarîfe ya hevjîna Qadir û şeş, heft zarokên hûr, tevlîhev bibûn û hinavên mirov diherişandin. Cehşên Parastinê yên mala Berzanî Qadir, di rêya Musil de kuştibûn û komek zarokên hûr sêwî hiştibûn. Zarîfe ya nû hatî wargehê û di nav hemwelatiyên wargehê de biyanî, bi heft zarokan ve jinebû hiştibûn.

**Tahir Goyî** vedibêje;

Li wargeha Nînûva kurê Mehmûdê Zêwkî Xalid, dabû ser mayînê û lingê zarokê şeş salî qut bibû. Ji bû lingê xwe yê protez biguhere me dibir nexweşxaneyê. Ji ber kû min kêmek zimanê erebû dizanî, ez biwî re çûbûm. Ji xeynî min û Xalid, pênc rêvanên din jî di tirimpêlê de hebûn. Bi rê ve otomobîlek bi marqeya Malîbû, çend caran da pêşiya me û dubare sist dikir. Min ji Qadir re got;

"Dibêjîqey ev tirimpêl me dişopîne."

Qadir, mirovek pir niyet paqij bû û tenê bi gotinên min beşişî.

Hê nû em ji derbenda polîsên Êraqê ya ketina bajarê Mûsil bûrîbûn. Kengê em kaşê di navbera darbendê û bajar de daketin, tirimpêla mijara gotinê ji çepê ve nêzîkê tirimpêla me bû û bi du xedareyan em gulebarankirin. Bi teybet ajotvan hedef girtibûn û ji nişkan ve serê Qadir werxeliha ser mengenê. Ez li rex Qadir, di kursiyê pêş de runiştibûm û ji bû tirimpêl ji rê ne derkeve min bi mengenê girt. Ema, ji ber kû Qadir vexwimabû ser stop û benzînê, me nikarî tirimpêlê rawestînin. Tirimpêl wekî fîşekê di kaş de dirija û tenê min mengene dizivirand. Piştî qergeşeyek mezin rêvanekî destê xwe gihand stop û me tirimpêl rawestand. Bi şînika destpê re tirimpêla em gulebarankirî revî û ket di nav bajar de. Qadir, bi dehan guleyan hatibû hingavtin û di cêh de can dabû.

Piştî bûyera Qadir çend heyvan dilxwede ji bû tevlî gêrîla bibe kesek yê em gulebarankirî hatibû wargehê. Asayîşa wargehê ji wî kesî ketibû gomanê û lêpirsîn kiribû. Piştî sûncê xwe îtîraf dike

wekû şahidê bûyerê bangkirin min jî.

Zelamê eslê xwe Zaxoyî, ji berya wê çend salan tevlî gêrîlayên Kurdistanê bibû. Piştî tevlîbûyînê demek ne dirêj, ji qada Gabar revîbû û teslîmê romiyên romê bibû. Li wêdê kiribûn qontra û tevlî pir karên qirêj bibû. Dema wargeh derbazî Mexmûr dibe, bi rêya îstîxbareta PDK –Parastin- derbazî Başûr dibe û bi pazdeh kesan ve ji bû kuştina hemwelatiyên wargehê tê erkdarkirin. Zelam di îtîrafên xwe de got;

"Em sê refên pênc kesîbûn. Em bi navê rêxistina îstîxbarî Parastina PDK'ê dixebitîn. Ema MÎT'a dewleta Turk maaş dida me. Têkiliyên me bi Muxaberata Êraqê re jî hebûn. Ji bû her çalekiya me li ser hemwelatiyên wargehê kiribûya, dused û pêncî hezar dînarên esîl didan me. Bi caran me sûîqast li tirimpêlên wargehê kiribûn ema, me zêde encamek bi mirinê encam bibe pêkne anîbû. Wargeh gelik hîşyar û baldarbû. Meseleya bombaya li ser kererebê teqayî jî hevalên me rêxistin kiribûn. Ema, bombe bi kesên me rêxistînkirî ve teqabû."

**Girkê Huner**

*"Biya min, NÇM dikare destana Derwêşê Evdî yê kesîtiyek ji Memê Alan hê biwezbetir bêxe filîm."*
Rêber Apo

Piştî şîva şevek tarî û sarbû. Hûr barana nû destpêkirî bi awayek xwinavî dibarî. Di wê şeva tarî û nerm de, wirarên bayê reş û har ne dixwiyan. Sara (Sakîne Cansiz) û Dr. Jiyan, ji mala xwe veqetan û hindama mizgevta ji yêk mezela nivz û piçûk pêkdihat re derketin ser rê. Ji bû temaşeyî provayên desteya şano ya Banga Rojê bikin, berê wan li navenda çand û hunerbû. Sara ya nû hatî wargehê, li Dr. Jiyana jixwe kurtir û hûr dilopên barana xwinavî li ser pora wê ya genimî reqsa goyikî dikin zivirî.

"Biqasî hatî gotin, Mexmûr ne cihek xirabe Doxtor" got û serê xwe hilda jor. Rûyê xwe yê zîwanî da ber peşkên baranê û dewamkir;

"De li spehîtahiya barîna vê xwinavê binêre."

Doxtora hertim bilez, dibêjîqey xwe ji çeqilekî diqevêze çeqilê din û wekî ji hûr barana Mexmûr pêştir tiştek mejiyê wê mijûl dike hebû; bi dengek bikelecan ema keziyên endîşeyê ji nav diherikin pirskir;

"Ankû tu dibêjî, kongre serkeftî derbazbû? Di gotûbêjên ne fermî de çi hebû?"

"Di nav avana Hevalan de tênegihiştinek mucid ya

paradîgmaya nû hebû ema, baweriya bi Serok hemî neyîntî di bin siha xwe de dihiştin."

Bi gotina Sara re jina çist û şidayî û çend gavan li pêş dimeşe, ji nişkan ve li xwe zivirî. Bi zivrandina wê re birûskekî veda û şewqa berqa birûskê awrên xemdar yên ji çavên Dr. Jiyan vedaidan gihandin çavên Sara. Rep sekinî û bidengek kîn barkirî got;

"Tirsa min ne ji netêgihîştiya ye; ji wan kesên dilxwede têgihiştî ema, têr qeymene."

Belkî di nav wê rojê de Doktor, pêncî caran di heman çarçoveyê de heman pirs dubare kiribû û ji hevala xwe ya nû ji kongreyê zivirî heman bersiv girtibû.

Dema gihatin derê navenda çand û huner Sara got;

"Doxtor, bê xem be! Yên xwe bi Serok re negihînin yê serikî li erdê bikevin" û dengê ristvanê ji kuleka piçûk û nalyonkirî dirija sohbeta wan birî.

Li ber kuleka zeraqên lempeya qazyaxê çavikên wê yên nalyon na simin sekinîn û guhdarî ristavanê bikelecanek tevlî hêstî dibêje;

*Ruha,*
*Hezar sal zivistan, ba, bahoz, bager û berf.*
*Ne havîn, ne bihar.*
*Gul çilmisîn, di xemên xwe de fetisîn.*
*Laş qerisî, ziman tevizî, dinan lerizîn,*
*Û zivistanê xwe kir kefenê mêrg û çîmen.*
*Weşiyan pelên daran,*
*Perperîk man bi hasreta findên geş.*
*Çemên bipêl şêlobûn,*
*û sûretê Ruha di eynika çeman de nema hate dîtin.*
*Hezar sal tarî!*
*Ne çav awirên xwe dibine, ne guh denge xwe dibihîze,*
*û şeva bê stêr li bedena Ruha hat pêçan.*
*Hezar sal Ruha di bin xeleka sêdarê de tirba xwe bi rondikên xwe dikola.*
*Wê kê Ruha bibûne, wê kê Ruha nas bike, wê kê biqêrîna Ruha şiyar bibe?*
*Wê kê bikaribe keziyên Ruhayê li ber bayê azadiyê liba bike?*
*Hezar sal Ruha di halê xwe de ma!*

Ristvanê bi kuleka nalyonkirî re siha tevgerên wî dixwiyan, navber dabû xwendina rista xwe. Her du jinên ji dizî ve guhdar dikirin jî bi deriyê teng û tarî yê xaniyê kuç re ketin di zamboqa zilomat de. Bi destpelênkî xwe li zeraqên zerhimî yên ji nav kelşên deriyê dep dirijan zamboqê girtin û bi neqeba tarî re pêşketin. Deriyê nivzê dep vekirin û ketin di hundir de. Zeraqên zerhimî yên

lempeya şûşe lewitî kurt diketin û hundirê mezela çal ronahî ne dikirin. Cemedaniyek reşbelek li serî, defterek di desta de Ferhatê Merdê, li ber lempeya guriya wê serkeratê dike sekinîbû. Ciwanê qam qut û rihek reş dêmê wî yê piçûk nixwimandî, bi gotinên ristê re radibû ser serê tiliyên lingê xwe û wekî bihêrs tiştekî bike der destên xwe vediweşandin. Ji bû qonsantreya Ristvanên risteyên kelegirî jê bilind dibin xira nebe, heta rista xwe ya dirêj qedand her du hevalan li ber derî guhdar kirin. Ferhadê bi bandora rista nû çêkirî ji hiş çûyî û sermest dixwiya bi çepikên her du jinan hilciniqî. Cemedaniya reşbelek ya ti carî serê wî rût nehiştî, bi destên xwe rastkir, kenek fihêtokî rûyê wî yê di nav rihê de wundabiyî pêça û heval kerimandin ser betaniya li teniştê. Sara, bi kelecanek ji ya Ferhat dijwartir got;

“Rista we pir xweşbû û te jî pir jidil û xweş dixwend. Gotinên wê aydê tene?”

“Belê Heval. Ji ristê zêdetir em bêjin, ‘hêstên minin’ ya rastir be.”

“Hizir, hêst û hişê te saxbin. Ji ristê jî wêdetir pir xweşe” got û dewamkir Sara;

“Em ne rûniştinê hevalê Ferhat. Em li desteya şano ya mamosta Gabar digerêne. Qey provayên xwe ne li vêdê dikin?”

“Na. Jeneratora me nîne, ew li navenda ciwanan prova dikin.”

Ferhat, ket pêşiya her du jinan û kaşikê derê çand û huner re hawaketin û bi ber jenetora dibêjiqey haxta bixeniqe re bûrîn û ketin hundirê navenda ciwanan ya ji mezelek piçûk pêkdihat.

Bi çavpêketina destpêkê re, her du jin ji şaqistî hilciniqîbûn. Xwe ji nişkan ve di civatek ya Kurdên sedsalên 12, 13 de peydakiribûn. Şanogerên bi tîr û kevan, bi şûr û mertal; hatina temeşavanên xweyên bikelecan jî ferq nekiribûn. Jixwe kelecana derhênêre hemî jest, tevger û gotinên şanoya Derwêşê Evdî û Edolê di xwe de dihewîne û jest û memikên wî dansa Îskoçî dikin hêjayî temaşekirinêbû.

Her du jinên huneryar dereng mabûn û ne gihatibûn destpêka provayê. Dikeyê heşt, nû destpêkirîbû. Li ber dengê muzîka strana Derwêşê Evdî û Edolê, Edola kofî kêl bang dikir siwarê li hespek rehwal siwar;

*“Eyyyyyy siwarooooo...! Ev sê roj û sê şevin, Delalê min xwe berdaye Deşta Nûava û ti agahî jiwî nîne. Tu bi Zend Awesta û bi agirdanên Bavê Kal bikî; delalê min li kûye!?”*

Siwarê di xwînê de xemilî, çaroxek mîranî lingên wî yê di zengoyê de dihewîne bersiva Edolê da û got;

*“Hey, bûka delal! Gelik delal hene kû bûk bi hena destên xwe ve li benda wanin. Ji van delalan yek birîndare û yê din jî bi Siwêrekê*

*re çûye! Ka ji min re bêje, nîşana Delalê te çiye?"*

Edolê;

*"Nîşanên Delalê min kifşin; cilên wî Melezîne, şûrê wî Dawudiye, ebayê wî Eganiye, li pişta Delal kember heye. Şalwalê Delal Felemiye, li serê Delal kefî heye. Simbêlên wî sohrin, bi hena Ruha yê hatine henakirin. Rûyê Delal hinarî ye, mertalê wî Amedî ye!"*

Siwar, xebera birîndartiya Derwêş ya li deşta Nûava da Edolê û kofî kêla navkêl tiştîr, li ber dengê bilûla xemdar qêrek dijwar da û got;

*"Delallll"* û ji dike derket.

Di dikeyê nehemîn de, Edolê li deşta Nûava di nav kelaşên kuştiyan re dibezî. Kofiya wê ya mîranî bi ber re dixira û li ber şkêrekî li rasta Delalê xwe hat. Serê Delalê birîndar rakir û bi dengek tevlî girî nehwirand;

*"Delaaal... Xwezî wekî Eyûbê kurman xwarî, kurman ez jî xwaribûma û min Delal di vê rewşê de ne dîtibya. Ka ji min re bêje; birîna te xedare an na?!"*

Derwêş;

*"Negirî Edolê; bilîlîne, bilîlîne! Tu bûka welatê evîndarayî. Êdî di warê evîndaran de xiyanet û dagiriya hişîn nebe. Pir hej te dikim Edolê"* û bi gotina dawî re serê wî werxela rexê.

Edolê, serê Derwêş danî ser ranê xwe, bi dengek melûl û ristane lorand;

*"Delal rabe, Delal rabe.. Bejn û bala min zirave ji bû te tewaye. Eniya min spiye ji bû te vekiriye. Birhên min ziravin, mijgolkên min reşin, çavên min belekin ji bû te min bi kilê sibhanî kildane. Di vê cîhanê de ez ne layiqê turkan, ne ereban û ne jî farsame. Ez layiqê simbêl sohrê kurê Evdî yê Şerqîme. Ez layiqê tirbên reş, yên li goristana Şingala xwe ya di nav guriya agirdana de me.*

*Piştî te ezê nemînim Delal!*

*Sond li canê min ketîbe; êdî ez ji kesîre qehwa Yemenê ne kelînim. Di kuçika Paşê de ne gerînim. Bejn û bala xwe nexemlînim. Çavên xwe kil nedim û xwe li serê govendan ne hejînim. Ezê darê ti dergûşan ne hejînim. Piştî te bextê minê bireş be. Ezê êdî daxwaza mexsed û miradê nekim. Ezê derkevim serê çiyan û bilorînim. Ezê rondikên bixwîn birijînim.*

*Soza min heye Delal; pîştî te ezê hej kesî nekim. Tu mêhvanê mala bavê minî. Ezê tim bêjim delal. Derkevim serê çiyan û bêjim delal. Ezê bi dengê bilûla şivanan re bêjim delal. Ezê bibim bûka siwaran, ezê bibim evîndara bê muradan."*

Bi nîşana derhêner dawî li provaya şanoya Derwêşê Evdî

û Edolê hatibû. Ji westa hilhil li ser dilê Dîcle ya rola Edolê dileyîst ketibû û ji şerma sohr bibû. Bi pêş herkesî ve û bi teybet jî bipêş hevalên keç ve serê kurê xelkê danîbû ser ranê xwe û jandilên evînê li ser barandibûn. Ev, di jiyana wargehiyan de destpêkekbû û hingî bixwazî zehmetbû. Di serî de Dîcle û hemî şanovan, li dora derhênerê qamqut bibûn hevşî. Bi qasî çend deqeyan Derhêner, li ser jest, memik, hevtememkirina tevger û gotinê û rast bikaranîna zeman axivî û gotin ji mêhvanan re hişt.

Dr Jiyan;

"Ez we pîroz dikim. Bi qasî min temaşekirî muhteşem bû. Hevala Sara nû hatiye wargehê û pir mereqdarê hunera şanoyê ye. Jixwe bi xêra wê îşev dîtîna vî dîmenê wezbetdar ji min re bû nesîp."

Saraya kelecana wê ne ji ya Dîcle kêmtir ji derhêner re got;

"Senaryo, we nivîsandiye?"

"Belê."

Bi hêlwestek hê bêhtir şaqis mayî pirskirina pirsên xwe ajotin;

"Bi rastî? Ema we pir xweş û spehî nivîsandiye" û li koma leyîstvanên ji kelecanê rûyên wan yên cemidî pembe dixwiyan zivirî Sara. bi awrên yardar li zelamên bi şal û şapik, rih dirêj û yêk ji wan cil spî; xortên bi tîr û kevan, şûr û mertal û jinên kofî kêl, kirasên lewndî li ber wan nêrî û pirskir;

"Piranî xwendevan û hûn jî mamostane?"

Derhênerê ecemiyê pesnan bi dengek şermokî bersiv da;

"Hemî xwendevanên amadeyîne û ez jî mamosta me."

Sara;

"Wekî tê zanîn, Serok pir girîngiyê dide qada huner û bi teybet hunera şano. Jixwe nirxandinên wî yên di derbarê destana Derwêşê Evdî û Edolê de ji aliyê me hemiyan ve tên zanîn."

Ji şanovanan Selîmê Muhemt Xelîlê Çelî, tevlî sohbetê bû. Ciwanê rola bavê kal dileyîst, rihek dirêja spî rûyê wî nixwimandî û cilên spî li ber got;

"Jixwe li ser rexneyên Serok ya qada huner me ev deste pêşxist û navê jî "Desteya Huner Banga Rojê" ye."

Jina bejna zirav û dirêj heybetek cuda li tevgerên wê bardike, du çavên gir xemla dêmê wê yê kêmek dirêj timam dike û jixwe pir bawer dixwiyê, mertalê ji sêlek ya nan pêktê û nîvê hundir ve çembilek hatî lehîm kirin, ji destê Bûlendê Cibraîlê Geverî yê rola Siwar dileyîst girt û got;

"We ev çêkirine" û şûrê bi boyaxa risasî hatî boyaxkirin û heman wekî şûrê rastî yê di destê Bûlent yê din de xwest. Dema şûr girt bi awayek şaqis mayî got;

“Ay, ev pir sivike.”
Derhêner;
“Belê. Dare, me bixwe çêkiriye.”
“Perwerde, dekor, cil ankû kes alîkarî bi we re dike?”
Derhêner bi hêlwestek tinazdar beşîşî û got;
“Xwezî bela xwe ji me vekiribûna, bila alîkarî nekiribûna” û dewamkir;
“Perwerde û provayên xwe em bixwe dimeşînin. Her leyîstvan, cil û konstîmên xwe ji nav gel peyda dike.”
Şadîtiya her du jinên şoreşger ji bîbûkên çavên wan difûran. Biteybet Sara, qadir hebû bifire. Li koma şanogerên bibaldartiyek mezin guhdar dikin zivirî got;
“Nîşaneya herî kifşker ya hunervantiya şoreşger, afirandvantiye. Huner, ji bû tevgera me qadek ji girîngtiyê jî wêdetir jiyanî ye. Serok di nameya xwe ya pêncê Mijdara bûrî de dibêje;
*“Wekû teybet ji jinan re vê dibêjim; zelam mêrên herî baş û herî evîndar jî bin, hergîz destûr nadin te. Bila rista têkildarî Manî, ya min ji berya niha dikarkirî bixwînin û dubare binirxînin. Bila avanîteyên nû yên huner pêkbînin. Bêxin leyîstok. Biya min, dikarin leyîstokek pêncî rûpel ji wê derxînin. Li wêdê hevokek wusa heye û wekî heyî dibêjim;*
*Te nivîsand, nivîsand û ne xwendin.*
*Te got, wan bi awayek cûda fêhmkir.*
*Di vê cîhanê de ew,*
*Jiyanek bi awayek din jiyanbûn.*
*Ez xwe di vêdê de peyda dikim. Van hevokan diyarî herkesî dikim.”*
Dubarekirina gotinên Serok, jina por xelek hêstdar kiribû. Li Dr. Jiyan zivirî û dewamkir;
“Tiştên Serok ji me re dibêje, ev ciwan têxin meryetê. Em deyndarê wan yê spasekîne û li derhêner zivirî. Jana dilê wê guvaştî tevlî beşişandina dêma bibû û bi hêlwestek siyanetkar axaftina xwe ajot;
“Ev karek pir pîroze, em spasiya we dikin” û wekî ne xwaze xwe ji wan mirovên di nav wan kavlên tarîde, bi derfetên pir kêm wan şaheseran dafrînin zanetir bide nîşandan, bişermokî beşişî û dewamkir;
“Bêkû vê xalê kifş bikim naxwazim ji we veqetêm; wekî şaristanên kedxwar di dîroka xwe de dinivîsin, şano ne ji Dionysosê rezvan yê Girekî destpêkirî ye. Ji gergereyên bajarên qirkirî yên welatê me kifşe, dema Girekiyan Dionysos keşifkirîn, şano li welatê me hunerek pîrbû. Ankû hunera şano, hemsalê

mirovê destpêkê ye.”

Ji nîvê şevê re kêmek mabû. Hûr barana hê jî dibarî zikakên wargehê vegerandibûn teqna heriyê. Reşên xaniyên zincikî di nav tarîtiya stûr de bi zorê dihatin fitrandin. Her du jinên şoreşger, derhêner jî dabûn rex xwe û di aliyê rastê yê girik re ber bi rêya giştî ve pêş diketin. Ji xaniyê li ser cihê herî bilind yê girik lorandina dengek zîz û zelal guhên wan alîst û bipêve zeliqî. Bi bihîstina deng re Sara sekinî û guhê xwe ji lorandina dibêjîqey ji bîrek kûr derdiket re kir sêl. Her kû bi baldartir guhdar kirin, strana ji awaza zelamekî bilind dibû ruhê wan dagir kiribû. Derhêner got;

“Evdilayê Teyiye. Dengê çiyane. Ev edetek kevne. Di zena min de ji şêwazê jiyana kevin tê. Ji ber wê, di wargeha me de, dem û meskenê stranê nîne. Kengê hêstên wan difûrin ji xwe re dinehwirînin.”

Sara, xwest herin serdana mala dengbêj û ji sedema wext ne guncave, Dr. Jiyan li dij derket. Ema, jina rikdar hevalên xwe zû qayîkirin û berê xwe dan mala Evdilayê Teyî.

Piştî kêmekî her sê mirovên huneryar li derê xaniyê zincikî û betaniyek şil deriyê wî dadide sekinîn. Şewqa ronahiya bi ber betaniyê re dirija ji derve lewaz û zerhimî dixwiya. Dema gihatin devê derî, gotinên ji dengê mejî bilind dibûn, fesîhtir li guhê wan diketin. Gotinên hunandîn yên bi bêhna dîrokek jandar barkirî bi teybet Sara, ruhên guhdarvanên xwe yên dizker zû fetandibûn. Bi awayek bê deng Sara, bi çepilin xweyên dirêj hevalên xwe sekinandin û bi hêstek mestdar guhdarî strana dengbêj kirin.

*Lê lê xezalê, ezim xezala mal di gung de.*
*Minê xwilama sê biskên zerî, zirav,*
*tana kirasê kitan di êvara perê gundan û vir de.*
*Ristika zêran girêdaye di bin de.*
*Ax de rabe Xezalê, gewra min lê lê.*
*Xezalê hogirê xweş hevalê.*
*Hiznayê bi cemalê.*
*Kûviya çolê, kediya malê.*
*Şekira li nêv destmalê.*
*Ezê heft sala mame li balê.*
*Ez têr nebûm ji dîtinê, ji bejin û balê, ji galgalê.*
*Ax de rabe xezal, de rabe gewra min lê lê.*
*Ezim xezal, xezala li vê kêmê.*
*Nêçîrvano ez nizanim,*
*xwe berdim kûjan notik, niwal, dolikê û ji kû ve bêmê.*
*Mala nêçîrvanê te xezalê xana xwedê, ne avabe.*

*Çawa çavê xweyê kore, tiliya xweya şkestî,*
*Çavê xwe noqand, tiliya xwe qeliqand,*
*Xirakiriye cihê pelika xezama kepiyê te xezalê.*
*Ax de rabe li min xezalê, de rûnê li min xezalê.*
*Hiznayê bi cemalê.*
*Dest bi bazin, ling bi xirxalê.*
*Bixwidê ezê heft sala mamê li malê.*
*Ez têr nebûm ji dîtinê, ji galgalê, ji bejin û balê.*
*Xezala Rendê Muheme;*
*piştî te ezê lixwe heram bikim,*
*Ref û nêçîra çiyakê vê Şingalê.*
*Ax de rabe gewra minê lê, lê.*

Dema dengbêjê şevê xwe ji mewalek nû re amade dikir Dr. Jiyan, bi dengek keyfxweş got;

"Şev baş malê. Hûn mêhvanan dihewînin?"

Piştî mêhvanan bi dengek ji yê xwe jî keyfxweştir bersiva erênî girtin, bi ber betaniya ji aliyê jina navser ve hatî vekirin re ketin hundir. Hevjînan û du zarokên pelweste mêhvanên xwe di eywana piçûk de jipiya pêşwazî kirin. Li dawiya eywana sê çar gav, du zarokên piçûk bê rêkûpêk li pişta sopeya eledîn nivistîbûn. Hevjînan zarokên nivîstî kişandin mezeloka bê derî û çend zarokên din jî di tê de nivîstî û rê ji nû hatiyên av di serê pozên wan de bûyî şirik re vekirin. Malîvanan, bi keyfxweşiyek Bohtanî mêhvanên xwe li quncika ji zarokan xalî mayî û li ser doşeka ji du betaniyên bi hev ve durîtîn pêkdihat dan rûnîştandin.

Durê ya ji sebebê dîtina mêhvanan şadîtiyek ne asayî ji çavên wê yên gir dibarin got;

"Hevala Doxtor, vêca kûjan bayê xêrê hûn avêtin mala me?"

Doktor, bideng kenî û bersiv da;

"Bixwedê yadê xêrbe, gunehbe; bayê hevala Sara em avêtin ber stara we."

"Wey tu bi hevalên xwe ve gav bigav pêl çavên me bikin."

Piştî fesla sohbeta jinan qeda, dengbêjê bejin zirav, porek hemiza dapên spî nû belek kirî spehîtahiya rûyê wî timam dike bitinaz tevlî sohbetê bû û got;

"Hevala doxtor, ji xwe em hev nas dikin, ev jî mamostayê me ye, lê min ev hevala delal nas nekir?"

"Ew hevala Sara ye, ankû Sakîne Cansiz. Ji bû karê perwerdê nû hatiye wargehê."

Hevjînan bi siyanetek mezin destê xwe dan singa xwe û Durê got;

“Ez ji çavên xwe bawer bikim hevala Sara! Me zarokên xwe bi çîrokên lehengtiya we mezin kirin.”

Piştî fesla xweşbaşek germ, hevnasî û pirskirina hal û hewalan Sara got;

“Em bi rê re derbaz dibûn. Dengê we yê mestker em girtin û anîn vêdê. Jixwe me li ber derî ji dizî ve Xezala çiyayê Şingalê bi zewqek mezin guhdarkir. Vêca heke zarok aciz nebin, tu dikarî bi dengê xwe yê xweş stranek din jî bi me bidî guhdarkirin?”

Durê beşişî û ket di navberê de;

“Na heval, aciziya çi. Jixwe ev nizanê di demên asayî de bistirîne. Yan derengê şevê yan jî bi berê sibhê re lotka wî lê dide.”

Evdila;

“Ma em çi bikin heval. Derdê bê welatiyê girane. Ji jana li piş çûyiyan mayîn mezintir tiştek nîne.”

Sara;

“Di nav Hevalan de zarokên we hene?”

Lêhvên zilamê riha du hefteyî rûyê wî yê girover nixwimandî û biskên spî belek kirîn lerizîn û got;

“Na! Şehît ketin.”

“Kengê?”

Malîvan awrên xwe pesartin fanosoka guriya wê bi taqê nivz û bel yê beramber ve dilerize û li xalek sabît nêrî. Awrên wî yên bi guriya zer û zerhimî ve daleqayî mayîn şilbûn êdî û rohnîtiya di çavan de berhev bûyî dibiriqî.

“Gulana sala not û duyê du bira û kurek yê min bi hev re tevlî Hevalan bûn. Ji birayan yêkî navê Mezlom û yê din jî Doxan li xwe kir. Şîrînê min jî navê xwe kir Kemal.

Piştî tevlîbiyînê sê salan Kemalê min di dorpêça Kêrya reş de şehît ket û hevalan kelaşî wî anîbû Heftanîn. Wê demê ez jî li Heftanîn bûm û min kelaşê delalê xwe bi destê xwe spart axa sar. Ya hê jnadartir, kelaşê di tarîtiya şevê de bi baldartî û tosintiyek mezin min binaxkirî, min nizanî yê ezîze mine.”

Durê ya ji çadana tewixî ça dadigirt, bi kefiya xwe hêstirên xwe paqijkirin û wekî li erza hevjînê xwe bide;

“Deka Evdila! Hevalan bi êşên xwe aciz neke. Bi dewla serê Serok bi hezaran Kemalên me hene êdî.”

Bêjeya Serok, bibû xala fûrandina hêstên hemî civatê. Ema

herkesî ji dizî ya din ve girêka di qirika xwe de daqurtandibû û malîvanê dengbêj ber guhertibû;

“Ezê ji we re peyîzokekî bêjim. Di çanda me Kurdan de pir coreyên stranê hene. Ema peyîzok, stranên yên li dûv çûyiyan mayîne. Yên weqetayiyane.”

Dengbêjê rûken, dev û lêhvên tenik û li hevhatî xemla dêmê girover timam dikin, destê xwe êxist di bin guhê xwe de û qêrkir.

“Peyîze, evdalê, goyînê, xirabê,  
Peyîzê li min evdalê guhê gundan kir gazî.  
Li kurebayên kêriyên bilind,  
xemlika xezaman xwe berdan binê darên mazî.  
Peyîze jarê, evdalê li min derenge  
Serkehniyên esîl çikan,  
ji dûvkehniyan nayên ti cobar û denge.  
Hey mala min hedîmî.  
Herekola mîran bilinde,  
serikê wê xopanê li min berfîne.  
Bi ser re otêle, bi bin re çemkarê rengîne.”

Ji bû di mesken û zemanek hê guncavtir de dengêbêjê dengxweş mewal, peyîzok, serêlî, bêrûte û qewlên xwe bi mêhvanên xwe yên ezîz re parvebike, qewl jihev standin, xatir jihev xwestin û mêhvanên bêwext ji mal derketin.

Hûr barana ji êvarî ve dibarî cihê xwe ji bayek dijwar û sar re hiştibû û erdê herî zuwa kiribû. Sara ya di wê şeva tarî û xwinavî de, li wî warê sêhrvan xwe ji nişkan ve di girava huner de peydakirî, bi dengek şad û xemdartî têkel li derhêner zivirî û got;

“Navê vî girikî çiye?”

“Navek yê wî yê teybet nîne, aydê semta du ye.”

“Pêşniyara min, em navê “huner” li vî girikê şîrîn bikin.”

Her du hevalan pêşniyara jina tarîtiya şevê jî kelecana dêmê wê ne diveşart, bi serê xwe erêkirin û li riknê baxçeyê Serokatiyê Derhêner xatirên xwe xwestin û ji hev veqetan.

***

Sêyemîn salvegera roja Reş hat û xwe pesart. Birînên kûr axivibûn û edabek tîr girtibûn. Herkû diçû pêlên dûvajoyên erdheja roja Reş xwirtir xwe dipesartin û nîşanên erdhejek hê mezintir bixwe re tanîn. Hîviyên stûr û stewayîn yên di kûrha Serok Apo de hatîn siqakirin, di nav têkilî û nakokiyên dijwar de tenik û nazik bibûn. Pîroztiyên di qir û qiyametek bê eman de, bixwîn û xwêhdana

bihezaran Rojyaran hatîn avakirin di zikakên bê merîs yên wargeha Mexmûr de xwîn wunda dikirin.

Paçên reş yên li raser xaniyan liba dibûn, tîrojên roja çend werîsan bilind bûyî dimêhtin. Tirhên zirbiyên nû bejin didan, di bin zeraqan de diteyîsîn. Darên bitosintiyek mezin dihatin xweyîkirin, xemlek nû li dîmenê sik yê wargehê barkirîbûn. Nalyonên banên xaniyên nivz û piçûk dinixwimandin, di bin şewqa rojê de dibiriqîn. Dukandaran dukanên xwe, sazkaran saziyên xwe ne vekiribûn û herkes di nav cilên reş de ber bi gergereya çand û hunerê ve diherikî. Bi ser roja Reş re du fêrisên salan derbiz bibûn û ne Nûmexmûrî fêrî tinetiya Serokê xwe û ne jî warê Qereçox bibûn.

Di zikaka li himdama mala Emerê Kulek de, zilamek navser merheba li zarokê paçek reş bi serê şivikekî ve kirî û dihejîne da û derbazbû. Zarokê rûyê wî yê zerik di nav cilên reş de xweşiktir dixwiya, biheman giranî û cidiyetê silava zelamê enîfireh veda. Hêlwesta zarok, bala zelamê navser û nû çend gavan ji zarok bûrî kişand û zelam vesekinî. Li zarokê xas û paçê di destê xwe de bê navber libadike zivirî û bihêlwestek mucid got;

“Zarokê xweşik, navê te çiye?”

Zarokê hê jî paçê liraser xwe libadike û ji her halê wî kifşe ne tebetiye bersiva “Bîrhat” da.

“Ya, çi navek xweşe! Çend saliyî Bîrhat?”

Bîrhat, binê şivika paç bi serî ve danî erdê, tiliyên destê xwe yê rastê vekirin û bersiva “Pênc” da.

“Maşileh, emir dirêj be. Ev çi ala reşe di destê de?”

Zarokê zerik û dimîne kabikek şekir, bihêlwestek ji xwe razî got;

“Ev ne ale, şîne, şîn. Qey tu nizanî?”

Zelamê gewr û dapên spî nû beyîn simbêlên wî yên hemiz, bişêwazek bê hay got;

“Na. Şîna çi?”

“Wiy… Tu jî tiştekî nizanî. Turka îro Serokê me girtiye û em jî reşa wî girêdidin.”

Zelamê destek cilên gêrîla liber, navrana şarwalê wî daketî û delingên wî li ser pêlava perixî kombûyîn, ji gotinên dawî yên zarok hêstdar bibû û wekî bixwaze dabaşê biguhere pirskir;

“Bîrhat, tu diçî dibistanê?

“Erê.”

“Refa çend?”

“Refa sifir!”

Zelam bi awayek tinazî got;

“Ya! Qey refa sifir jî heye Bîrhat?”

Wekî neheqî lê hatibe kirin Bîrhat, rûyê xwe tirşkir, navmilên

xwe hildan û got;

"Ez çûm dibistanê mamostayan ez qeyd nekirim. Ema heval, ez ji hemiyan baştir dizanim."

"Tu dizanî navê xwe binivîsî?"

Zarok, bersiva "erê" da û bi gotina xwe re, xwe di nav heriya nû zuwabûyî de avêt erdê û bi darikekî li ser axê "Bîrhat" nivîsand. Li zelamê li raser xwe sekinî û bibaldartî nivîsandina wî dişopîne nêrî û dewamkir;

"Ez dizanim her tiştî binivîsîm, ka binêre; Serok Apo" Roja Reş" nivîsand û herkû dixwaze tiştek nû binivîse ya kevin bikefa destê xwe jê dibe û li cihê wê peyvek din dinivîse.

Zelamê li hember zekîtiya wî zarokê awerte şaqistiya xwe na veşêre pirsî;

"Tu dizanî navê min jî binivîsî?"

"Erê. Ka navê xwe bêje?"

"Abas."

Piştî zarok navê wî jî bê qisûr nivîsand jê re got;

"Navê zarokên te çinin? Bêje ez wan jî binivîsîm."

"Zarokên min zehfin Bîrhat. Tu nikarî navê hemiyan binivîsî" û bi milê zarok girt û ji erdê rakir. Cilên wî yên têr pîne û kêlî weşandin, maçek li lama wî ya pembe da û pirsa; "dema mezin bibî tuyê bibî çi Bîrhat" kir.

"Ezê bibim Heval û Serokê xwe ji zîndana Turkan rizgar bikim."

Zelamê memikên rûyê wî bi derbegotinên zarokê zêhndar dihatin guhertin, çeqolatek ji kûrika êlekê xwe derxist û raberkir.

Wekî fihêt bike serê xwe tewand û bi "nirçênekî" bertîla zilamê têr zarok redkiribû Bîrhat.

"Çima Bîrhat? Ez van çeqolatan kom dikim û li zarokên xwe belav dikim."

Zarok, bidengek jixwe qayîl bersiv da;

"Îro rojiye rojî, qey tu nizanî? Îro rojiya Serokatiyê ye. Eybe mirov çeqolata bixwe."

Zelamê bihevnasiya Bîrhat şad dixwiyê got;

"Tu mafdarî hevalê Bîrhat ema, bigre piştî fitira bixwe, başe?"

Abas (Duran Kalkan), xwe tewand, maçek din jî li lama zarokê sîs da û destê xwe dirêjkir. Bîrhat jî çû destê hevalê xwe yê mezin û ji hev veqetan.

Wargeh şîndarbû û xwe reş xemilandibû. Li raser her malê paçek reş liba dibû û herkesî xwe bi cilên reş pêçabûn. Piştî xwendevanên her pênc dibistanan jî hatin, girseya li derê şarevaniyê

kombûyî bi durişma “Tu kes nikare roja me tarî bike” derketibû rê. Zelamê têr zarok, di nav zarokên xwe de li pişt panqerta “Bê Serok Jiyan nabe” cihê xwe girtibû û bidengê bilind durişme diqêran.

**Dawiya pirtûka duyemîn…**

# WÊNE





Jiyan bi xwe têkoşînek bê emane. Yên pêwîstiyê vê têkoşînê pêkneyinin bi awayek serkeftî jiyan nakin.
Ji kûrahiya meraqên xwe, di têkoşîna jiyanê de ji were serkeftinê daxwaz dikim.

02.06.02

H. GABAR






EM AŞİTİ
DİXWAZİN
S. MALBATÊ ŞEHİDAN
Dİ SEDSALA




1
4
5
6























